

ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN JÎNDAR
MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind



EL-CEWAHÎRU'R REŞADÎYE FÎ SÎRETÎ'N-
NEBEWÎYYE YA MELA NÛRÛLLAHÊ GODIŞKÎ
(METN Û LÊKOLÎN Û FERHENG)

Fahri TÎTÎZ

171302106

Şewirmendê Tezê

Doç. Dr. M. Zahir ERTEKÎN

BÎNGOL – 2020

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi



MOLLA NURULLAH GODIŞKİNİN
EL-CEWAHÎRU'R REŞADÎYE FÎ SÎRETÎ'N-
NEBEWÎYYE ADLI ESERİ
(METİN, ANALİZ VE SÖZLÜK)

Fahri TİTİZ

171302106

Tez Danışmanı

Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN

BİNGÖL – 2020

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Fahri TİTİZ tarafından hazırlanan *El-Cewahîru'r Reşadiye Fî Sîrefî'n Nebewîyye ya Mela Nûrullahê Godişkî (Metn û Lêkolîn û Ferheng)* başlıklı bu çalışma, 17.08.2020 tarihinde yapılan tez savunma sınavı sonucunda [*oybirliği ile/ oy çokluğu ile*] başarılı/başarısız bulunarak jürimiz tarafından [*Kürt Dili ve Edebiyatı*] Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans tezi olarak kabul edilmiştir.

Tez Jürisi Üyeleri (Unvanı, Adı ve Soyadı)

Başkan : Doç. Dr. Hayreddin KIZIL İmza:

Danışman: Doç. Dr. Mehmet Zahir ERTEKİN İmza

Üye: Dr. Öğr. Üyesi Hemin Omar AHMAD İmza:

ONAY

Bu Tez, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Yönetim Kurulunun/...../2020 tarih ve sayılı oturumunda belirlenen jüri tarafından kabul edilmiştir.

Doç. Dr. Abdulnasır SÜT

Enstitü Müdürü

NAVEROK

NAVEROK	II
KURTE	XIV
ÖZET	XV
ABSTRACT	XVI
PÊŞGOTIN	XVII
KURTEBÊJE	XIX
TABLOYA ELFABEYA TRANSKRÎPSİYONÊ	XX
DESTPÊK	1
1. Girîngî û Armanca Tezê	3
2. Çavkaniyên Sereke Yên Tezê	4
3. Rêbaza Lêkolînê Ya Tezê	5
BEŞA YEKEM	8
KESAYETA MELA NÛRÛLLAH Û NAVEROKA DESTXETÊ	8
1. KURTEJİYANA MELA NÛRÛLLAH	8
2. ‘ILM Û KESAYETA MELA NÛRÛLLAH	10
3. BERHEMÊN MELA NÛRÛLLAH	13
3.1. Dîwana Beytan	13
3.2. El-Hemaîlû Fîş Şemaîlî	13
3.3. Es-Sebaîk Fîl Menasîk	13
3.4. El-Cewahîru’r Reşadiye Fî Sîretî’n-Nebewîyye	13
3.5. Çenta Yefîman	13
3.6. Kufrul Kebaîr	13
3.7. Camîul Me’anî	13
3.8. Şerha Beyta Dilo	13

3.9. Şerha Mewlûda Kurmancî	13
3.10. Şerha Tecwîdê	14
4. ZIMANÊ MELA NÛRÛLLAH Û DEVOKA HERÊMA WÎ	14
5. ŞÊWAZA MELA NÛRÛLLAH	19
5.1. Navê Berhemê	19
5.2. Sebebê Nezmandina Berhemê	19
5.3. Sebebê Hûnandina Bi Kurdî	20
5.4. Baweriya Bi Gotina “Lewlake Lewlake”	20
5.5. Bangiya Li Qelemê	20
5.6. Hinek Taybetiyên Din Ên Berhemê	21
6. JI ALIYÊ RÛXSARÎ VE BERHEM	22
6.1. Serencama Nusxeya Destxetê	22
6.2. Teşe û Naveroka Destxetê	22
BEŞA DUYEM	25
SÎYERÊN KURDÎ Û ANALÎZA BERHEMÊ	25
1. SÎYERÊN MENZÛM	25
1.1. El-Hemaîlû Fîş Şemaîlî	25
1.2. El-Cewahîru’r Reşadiye Fî Sîretî’n-Nebewîyye	26
1.3. Rewdu’n-Ne‘îm	27
1.4. Gulzara Şêx Tahirê Şoşî	27
1.5. Mewlûda Sîyer a Xerxurî	28
2. SÎYERÊN PEXŞAN	29
2.1. Di Roniya Qur’anê de Dîroka Pêxemberan	29
2.2. Reng û Rûyê Pêxember	29
2.3. Sîyerê Nebî Bi Ziwanê Dimilî	29
2.4. Dîroka Jiyana Pêxemberan Ji bo Biçûk û Zarokan	30

2.5. Jiyana Pêxemberê Me Hz. Muhemmed	30
2.6. Siyera Nebî	30
2.7. Jiyana û Tekoşîna Hz. Muhemmed	31
2.8. Pêxemberê ‘Alemê Hezretî Muhemmed	31
2.9. Jiyana Pêxemberê Xuda	31
2.10. Kovara Siyer	31
2.11. Pêxemberê Min	31
3. WEZN Ê SERWAYÊN BERHEMÊ	32
3.1. Qaliba Arûzê	32
3.2. Ji Serwayên Berhemê Hinek Nimûne	33
4. HUNERÊN EDEBÎ YÊN BERHEMÊ	34
4.1. Teşbîh	34
4.2. Îstî‘are	34
4.3. Mecazê Mursel	35
4.4. Kînaye	35
4.5. Îrsalî Mesel	36
4.6. Tekrîr	36
4.7. Îstîfham	36
4.8. Terdîd	37
4.9. Teşxîs û Întaq	37
4.10. Sîhrê Helal	38
4.11. Pirs û Cewab	38
4.12. Tecrîd	38
4.13. Îrsad	39
4.14. Tenasub	39
4.15. Leff û Neşr	40

4.16. Tefrîq	40
4.17. Tewriye	40
4.18. Telmîh	41
4.19. Îdmac	41
4.20. Îqtîbas	42
4.21. Tezad	42
4.22. Îltîfat	42
4.23. Husnê Te'lîl	43
4.24. Tarsî'	43
4.25. Mubalaxa	43
4.26. Redul'ecuz 'Elesedr	43
4.27. Îştîqaq	44
4.28. Nîda	44
4.29. Cînas	44
4.30. Alîterasyon û Asonans	45
5. GOTINÊN PÊŞÎYAN	46
6. BIWÊJÊN KURDÎ	47
7. AYETÊN QUR'ANÊ	52
8. HEDÎSÊN PÊXEMBER	54
ENCAM	60
BEŞA SÊYEM	63
METNA BERHEMÊ YA TRANSKIRÎBEKIRÎ	63
RÛPELA SERQAPAXÊ	63
RÛPELA BERYA NAVEROKÊ	64
NAVEROKA BERHEMÊ	67
FÎHRÎSTA CEWAHÎRUR REŞADIYE FÎ SÎRETÎN NEBEWÎYYE	67

1. BÎSMÏLLAHÎRREHMANÎRREHÎM WE BÎHÎ NESTEÎ'NÛ	74
2. SEBEBÊ NEZMA KITÊBÊ	74
3. DI HEQÊ NESEBÊ RESÛLÛLLAH DE ('E.S)	83
4. BEHSA WEQTA HEMLA WÎ Û TARÎXA WÎLADETA WÎ (S.'E.W)	85
5. BEHSA 'ELAMETÊN PIŞTÎ WÎLADETA WÎ (S.'E.W)	89
6. BEHSA YÊ KU ŞÎR DANÊ Û YÊ KU EW HEWANDÎYE Û WEFATA BAV Û DÎYA WÎ (S.'E.W) Û KEFALETA KALÊ WÎ Û APÊ WÎ EBÛ TALÎB	90
7. BEHSA GIHAŞTINA WÎ (S.'E.W) BAL BUSRAYÊ Û ĞEYRÎ BUSRAYÊ VE Û GOTINÊN RAHÎBAN DERHEQÊ WÎ DE	94
8. BEHSA HER DU CARÊ DERKETINA WÎ ('E. S): BAL BÛSRAYÊ VE Û JIBO TÎCARETÊ DIGEL MEYSEREYÊ ĞULAMÊ HZ. XEDÎCE (R.'ENHA)	96
9. BEHSA ZEWACA WÎ (S.'E.S) YA BI XEDÎCE (R. 'ENHA) RE Û AVAKIRINA KE'BEYÊ	97
10. BEHSA WEZÎFEDARKIRINA WÎ (S.'E.W) YA BI PÊXEMBERTÎ	99
11. DI HEQÊ MÎ'RACA WÎ (S.'E.W) DE	108
12. DI HEQÊ ÎSLAMBÛNA ENŞAR DE (RAZÎBÛNA XWEDA LI SER WAN BE)	135
13. DI HEQÊ HÎCRETA WÎ (S.'E.W) YA BAL MEDÎNÊ VE Û TIŞTÊN PEY WÊ DE	137
14. DI HEQÊ MEŞRÛ'BÛNA AZANÊ DE	147
15. DI HEQÊ ĞEZWEYÊN WÎ (S.'E.W) DE: ĞEZWA EBWAÊ	150
16. ĞEZWEYA BÛWAŦ	150
17. ĞEZWEYA 'UŞEYREH	151
18. ĞEZWEYA SEFWAN	152
19. BEHSA GUHERÎNA QIBLEYÊ	152
20. ĞEZWEYA BEDRÊ YA MEZIN	153
21. ĞAZWEYA BENÎ SELÎM	183

22. ĞEZWEYA BENÎ QEYNÛQA'	184
23. ĞAZWEYA SEWÎQ	186
24. ĞAZWEYA ĞETEFAN (ZÎ EMR)	187
25. ĞEZWEYA BEĤRAN	189
26. ĞEZWEYA UHÛD	189
27. ĞEZWEYA ĤEMRAEL ESED	208
28. ĞEZWEYA BENÎ NADÎR	211
29. ĞEZWEYA ZATURRÎQA	215
30. ĞEZWEYA BEDRÊ YA DAWÎN	218
31. ĞEZWEYA DEWMETUL CENDEL	221
32. ĞEZWEYA MUREYSÎ'	222
33. ĞEZWEYA XENDEQ	230
34. ĞEZWEYA BENÎ QUREYZE	243
35. ĞEZWEYA BENÎ LEĤYAN	248
36. ĞEZWEYA ĞABEH	248
37. ĞEZWEYA ĤUDEYBÎYE YANÎ ŞULĤA WÊ	250
38. ĞEZWEYA XEYBER	265
39. ĞEZWEYA WADÎL QURA	276
40. 'UMRETUL QEDA	278
41. ĞEZWEYA FETHA MEZIN A MEKKEYA XUDA ŞEREF DAYÊ	283
42. ĞEZWEYA HUNEYNÊ	308
43. ĞEZWEYA TAÎF	316
44. ĞEZWEYA TEBÛK	322
45. DI HEQÊ SERÎYEYÊN HZ. MUHEMMED (S. 'E.W) DE (Pêncî û Şeş in) ..	329
46. SERÎYEYA HZ. HEMZE B. 'EBDULMUTTELÎB (R. 'E) YA LI SER KARWANÊ QUREYŞÎ YA JI ŞAMÊ TÊ	330

47. SERÎYA ‘UBEYDE B. HERS B. MUṬṬTELÎB BAL NEWALA RABÎĜÊ .	331
48. SERÎYA SE’D B. EBÎ WEQQAS (R.‘E) A BAL XERARÊ VE	332
49. SERÎYA ‘EBDULLAH B. CEḤŞ (R.‘E) BAL NEWALA NEXLEYÊ	332
50. SERÎYA ‘UMEYRÎL E’MER ÎBNÎ ‘EBDÎ (R.‘E) JIBO KUŞTINA ‘EŞMA BÎNTÎ MERWAN A YEHÛDÎ	335
51. SERÎYA SALÎM B. ‘UMEYR(R.‘E) BO KUŞTINA EBÎ ‘EFEKÊ YEHÛDÎ	335
52. SERÎYA MUHEMMED B. MUSLEMEYÊ EWSÎ (R.‘E) JI BO KUŞTINA KE’B B. EŞREF	336
53. SERÎYA ‘EBDULLAH B. ‘ETÎK (R.‘E) JI BO KUŞTINA EBÎ RAFÎ’ SELLAM B. EBÎL HEQÎQ	339
54. SERÎYA ZEYD B. ḤARÎSE (R.‘E) YA BAL QARDEYÊ, SER KERWANÊ QUREYŞAN VE	341
55. SERÎYA EBÎ SELEME ‘EBDÛLLAH B. ‘EBDULESEDÎ (R.‘E) YA BAL QETENÊ VE	342
56. SERÎYA ‘EBDULLAH B. UNEYS EL CUHEMÎ ESSULEMÎL ENŞARÎ (R.‘E) JIBO KUŞTINA SUFYAN B. XALÎDÊ HUZELÎ	342
57. SERÎYA ‘AŞIM B. SABÎT ELEŞARÎ (R.‘E) YA BAL RECÎ’Ê VE	344
58. SERÎYA QURRAE (R.‘ENHUM) BAL BÎRA MU’EWNE VE	346
59. SERÎYA MUHEMMED B. MUSLÎME BAL QURṬAÊ VE	348
60. SERÎYA ‘UKAŞE B. MEḤŞÎL ESEDÎ (R.‘E) BAL ĞEMR MERZÛQ	348
61. SERÎYA MUHEMMED B. MUSLÎME (R.‘E) BAL ZÎLQIŞŞE VA	349
62. SERÎYA ZEYD B. ḤARÎSE (R.‘E) BAL BENÎ SELÎME LI CEMÛM VA .	350
63. SERÎYA ZEYD B. ḤARÎSE (R.‘E) BAL ‘ÎŞÊ VA	350
64. SERÎYA ZEYD B. ḤARÎSE (R.‘E) BAL ṬERFÊ VA	352
65. SERÎYA ZEYD B. ḤARÎSE (R.‘E) BAL ḤISMA VA	352
66. SERÎYA ZEYD B. ḤARÎSE (R.‘E) BAL WADÎL QURA VA	355
67. SERÎYA ‘EBDURREHMAN (R.‘E) BAL DÛMETUL CENDEL VA	355

68. SERÎYA ‘ELÎ B. EBÎ TALÎB (R.‘E) LI SER BENÎ SE’D B. BEKR	356
69. SERÎYA ZEYD B. HARÎSE (R.‘E) BI SER UMMÎ QIRFÊ VA	357
70. SERÎYA ‘EBDULLAH B. REWAHE ELEŒARÎ ELXEZRECÎ (R.‘E) SER USEYRE	358
71. SERÎYA KURREZ B. CABÎR EL FÎHRÎ (R.‘E) BI SER QEBÎLA ‘EKL Û ‘UREYNÊ VA	360
72. SERÎYA ‘EMRÎ B. UMEYYE DEMRÎ (R.‘E) BI SER EBÎ SUFYAN VA .	362
73. SERÎYA ‘UMER B. XETTAB (R.‘E) BAL TURBET VE	364
74. SERÎYA EBÎ BEKRÊ ŒIDDÎQ (R.‘E) BI SER BENÎ KÎLAB VA	365
75. SERÎYA BEŒÎR B. SE’D ELEŒARÎL XEZRECÎ (R.‘E) BI SER BENÎ MURREYÊ LI FEDEKÊ	365
76. SERÎYA ĞALÎB B. ‘EBDÛLLAH ELLEYSÎ (R.‘E) BAL MEYFE‘A NAHÎYA NECDÎ VE	366
77. SERÎYA ĞALÎB B. ‘EBDÛLLAH ELLEYSÎ (R.‘E) BI SER MULÛHÊ LI KEDÎDÊ VA	367
78. SERÎYA ĞALÎB B. ‘EBDÛLLAH ELLEYSÎ (R.‘E) BAL FEDEKÊ VE	369
79. SERÎYA ŒUCA’ B. WEHB ELESEDÎ (R.‘E) BI SER BENÎ ‘AMIRÊ SÎYYÊ VE	370
80. SERÎYA KE’B B. ‘UMEYRÎL ĞEFARÎ (R.‘E) BAL ZATU ETLAHÊ JI ERDÊ ŒAMÊ	371
81. SERÎYA MU’TE	372
82. SERÎYA ‘EMR B. ‘AŒ (R.‘E) BI SER BELDEYÊN BELÎW ‘UZRE VA ...	377
83. SERÎYA XEBTÊ	378
84. SERÎYA EBÎ QETADE (R.‘E) BAL NECDÊ VA	380
85. SERÎYA EBÎ QETADE (R.‘E) DÎSA BAL ÎDEMÊ VA	380
86. SERÎYA XALID B. WELÎD (R.‘E) BAL NEXLEYÊ VE JI BO XERAKIRINA ‘UZZA	382

87. SERÎYA ‘EMR B. ‘AŞ (R.‘E) JIBO XERAKIRINA PÛTÊ SUWA’	383
88. SERÎYA SE’D B. ZEYD ELEŞHELÎ (R.‘E) JIBO XERAKIRINA PÛTÊ MENAT	384
89. SERÎYA EBÎ ‘AMIR ELEŞ‘ERÎ (R.‘E) BAL EWŤASÊ VA	385
90. SERÎYA ŤUFEYL B. ‘EMRÊ DEWSÎ (R.‘E) BI SER ZÛLKEFEYNÊ VA	386
91. SERÎYA QEYS B. SE’D (R.‘E) BAL ŞUDA’ VA	386
92. SERÎYA ‘UYEYNE B. HİŞN EL FEZARÎ BAL BENÎ TEMÎM VA	387
93. SERÎYA WELÎD B. ‘UQBE (R.‘E) BI SER BENÎ MUŞTELÎQ VA	389
94. SERÎYA ‘EBDÛLLAH B. ‘EWSECE (R.‘E) BAL BENÎ ‘EMR BÎN HÂRÎSE VE	390
95. SERÎYA QUTBE B. ‘AMIR XEZRECÎ (R.‘E) BAL XES‘EMÊ VA	391
96. SERÎYA DEHĤAK B. SUFYAN KÎLABÎ (R.‘E) BI SER BENÎ KULABÊ	391
97. SERÎYA ‘ELQEME B. MUCZÎRÎL MUDLÎCÎ (R.‘E) BI SER HEBEŞÎYÊN ŤAÎFÊ VE	392
98. SERÎYA EMÎRUL MUMÎNÎN ‘ELÎ (R.‘E) JIBO XERAKIRINA FELSÊ PÛTÊ ŤEYYÎ	392
99. SERÎYA ‘UKAŞE B. MUĤŞÎN ELESEDÎ (R.‘E) BAL CÎBABÊ ERDA ‘UZRETÊ VA	393
100. SERÎYA CUREYR B. ‘EBDÛLLAH ELBECELÎ (R.‘E) BAL ZÎLXELEŞETÊ VA	393
101. SERÎYA USAME B. ZEYD (R.‘E) BAL UBNAYÊ VE KU WÊ DEMÊ PÊXEMBER WEFAT KIR Û EBÛBEKİRÊ SIDDÎQ (R.‘E) BÛ XELÎFE	394
102. DI HEQÊ QASIDÊN WÎ (S.‘E.W) DE, ŞANDINA ŞIDDÎQ (R.‘E) JIBO ÎNSANÊN LI HECCÊ	399
103. ŞANDINA EBÛ MÛSA ELEŞ‘ERÎ WE MU‘AZ B. CEBEL (R.‘E) BAL YEMENÊ VE	400
104. ŞANDINA XALID B. WELÎD (R.‘E) BAL BENÎ ‘EBDULMEDANÊ LI YEMENÊ VA	401

105. ŞANDINA ‘ELÎ BÎN EBÎ TALÎB (R.‘E) BAL YEMENÊ VA	402
106. HECCA XATIRXWESTINÊ	403
107. DI HEQÊ HEYETÊN HATINE CEM PÊXEMBER (‘E. S) DE	405
108. HEYETA NEŞRANÎYÊN NECRANÊ	405
109. HEYETA TEMÎMÊ DARÎ (R.‘E) Û HEVALÊN WÎ	406
110. HEYETA SEQÎFÊ	407
111. HEYETA BENÎ ‘AMIR BÎN ŞE’ŞE‘E	408
112. HEYETA DEMAM BÎN SU’LEBE	410
113. HEYETA ‘EBDULQEYS	411
114. HEYETA BENÎ HENÎFE	412
115. HEYETA TEYYÎ	414
116. HEYETA ‘EDÎ BÎN HATEMÊ TAÎ	414
117. HEYETA ‘URWETÎL MURADÎ	415
118. HEYETA BENÎ ZUBEYDÎ	416
119. HEYETA KENDE	416
120. HEYETA EZDÊŞENÛ‘E	417
121. HEYETA QAŞID HARÎS B. KELAL Û HEVALÊN WÎ	418
122. HEYETA QASID FERWE BÎN ‘EMRÊ CIZAMÎ	418
123. HEYETA HARIS BÎN KE’B	419
124. HEYETA RUFA‘E BÎN ZEYDÊ XUZA‘Î	419
125. HEYETA HEMEDAN	419
126. HEYETA QEBÎLA TUCÎBÎ	420
127. HEYETA BENÎ SU’LEBE	421
128. HEYETA SE’DÊ HUZEYMÊ JI QUÐA‘E	422
129. HEYETA BENÎ FEZARE	422
130. HEYETA BENÎ ESED	423

131. HEYETA BENÎ ‘UZRE	424
132. HEYETA BENÎ BELÎYY	424
133. HEYETA BENÎ MURRE	425
134. HEYETA XEWLAN	426
135. HEYETA BENÎ MUḤARÎB	426
136. HEYETA ŞUDA’	427
137. HEYETA ĞESSAN	428
138. HEYETA SULAMAN	428
139. HEYETA BENÎ ‘EBS	429
140. HEYETA MUZEYNE	429
141. HEYETA ŞA‘IRAN	430
142. HEYETA DEWSÎ	430
143. HEYETA ṬARIQ BÎN ‘EBDULLAH ELMUḤARÎB (R.‘E)	432
144. HEYETA BEHZAE	433
145. HEYETA ĞAMID	434
146. HEYETA EZDÎ	434
147. HEYETA BENÎ MUNTEFÎQ	435
148. HEYETA NEXE’	435
149. DI HEQÊ MEKTÛBÊN WÎ (S.‘E.W) YÊN JI MELÎK Û SEROKAN RA	437
150. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA JI QEYŞERÊ MELÎKÊ RÛMÊ RA	438
151. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA KÎSRAYÊ MELÎKÊ FARIS RA	441
152. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA JI NECAŞÎYÊ (R.‘E) MELÎKÊ ḤEBEŞ RA	442
153. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA JI MUQEWOIS RA	443
154. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA JI MUNZÎR B. SAWÎYÊ TEMÎMÎ RA	444
155. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA JI DU ZARYÊN CULENDÎ YÊN MELÎKÊ ‘UMMAN RA	445

156. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA JI HEVZE B. ‘ELÎYÊ HENÎFÎYÊ LI YEMAME RA	446
157. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA JI HERS B. EBÎ ŞEMRÎYÊ ĞESSANÎ RA	447
158. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA JI BENÎ NEHD RA	448
159. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA JI ZÛLMÎ’ŞARÊ HEMEDANÎ RA	448
160. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA JI QETEN B. HARÎSEYÊ ‘ELÎMÎ RA	449
161. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA JI WAÎL BÎN HÛCER RA	449
162. DI HEQÊ TIŞTÊN JI MU’ZÎCATÊN WÎ (S.‘E.W) DE	450
163. DI HEQÊ WESFÊN ZATÊ ŞERÎF (S.‘E.W) DE	463
164. DI HEQÊ WEFATA WÎ (S.‘E.W) DE	473
165. DI HEQÊ HEJMARA XANIMEN WÎ (S.‘E.W) YÊN TAHIR Û ZEKÎ DE	484
166. BEHSA EWLADÊ WÎ (S.‘E.W)	487
167. BEHSA MAM Û METIKÊN WÎ (S.‘E.W)	488
168. BEHSA KOLEYÊN WÎ (S.‘E.W) YÊN AZADKIRÎ	489
169. BEHSA XIZMETKAR Û MUHAFAZÊN WÎ (S.‘E.W)	491
170. BEHSA KATIB Û EMÎRÊN WÎ (S.‘E.W)	492
171. BEHSA KESÊN KU DI HIZÛRA WÎ (S.‘E.W) DE LI SITÛYÊ DUJMIN DIXISTIN Û MUEZZÎN Û ŞA‘IRÊN WÎ (S.‘E.W)	493
172. BI KURTAYÎ BEHSA SÎLEH Û KINCÊN WÎ Û EŞYAYÊN MALA WÎ (S.‘E.W)	495
173. PAŞGOTINA KITÊBÊ	506
174. DERBARÊ NESÎHETA LI XELKÊ DE	508
ÇAVKANÎ	525
PÊVEK	528

KURTE

Mela Nûrûllahê Godîşkî (1921-2003), bi terz û mijarên helbestên xwe, bi berhemên xwe dikeve kategorîya helbestvanên klasîk yên Kurd. Yek ji wan şa‘ir û ‘alimên herêma Bedlîsê ye ku bi wasîteya terîqet û medreseyan gihaye. Berhema xwe ya bi navê “Elcewahîrur Reşadîye Fî Sîretîn Nebewîyye” (Cewherên Rê Nîşan Didin Di Siyera Pêxember De) bi meqseda ku gelê Kurd, heyeta pêxember bi zimanê Kurdî qenc fêm bike û bizanibe, bi nezmê nivîsandiye.

Armanca xebata li ser vê destxeta di vî warî de nûser ev e ku ev destxet veşartî nemîne, bighê ber destê helbestxwaz û Kurdîxwendîyan, cî di nav siyerên nezmê de hilîne, şêwaz û ziman û şarezaiya nivîskarê wê derkeve holê, li ser nivîskar bandora şairên beriya wî yên klasîk û medresê hinekî eşkere bibe.

Bi vê xebatê, serpêhatiya nivîsandin û serencama destxetê hatiye îfadekirin, her weha hatiye zanîn ku Mela Nûrûllah, ne tenê di nezmê de belkî di lêkolîna dîroka Îslamê û tarîxê de, kategorîzekirina bûyer û mijarên siyerê de, di wesifandina exlaq û şemaîla pêxember de jî hoste û zana ye.

Mela Nûrûllah bi vê berhema ku siyer û şemaîla pêxember dihewîne, di vî warî de valahîyeke mezin dagirtîye. Beriya wî di seha nivîsîna siyerê ya bi nezma Kurmancî û ewqas berfireh û li gorî çavkanîyên saxlem de, kesek derneketiye meydanê. Di demeke nêzîkî sedsala bîst û yekemîn de nivîsandina berhemeke weha, jibo nivîskar û berhemê, qîmeteke cûda dihewîne.

Peyvên Sereke: Mela Nûrûllahê Godîşkî, El-cewahîru’r Reşadiye Fî Sîretî’n-Nebewîyye, Siyerên menzûm ên Kurdî, Siyer, Medrese

ÖZET

Molla Nurullah Godiškî (1921-2003), eserleriyle, şiirlerindeki tarz ve hususlarla klasik Kürt şairleri sınıfına giriyor. Bitlis bölgesinin, tarikat ve medrese vasıtasıyla yetişen âlim ve şairlerindedir. Elcewahirur Reşadiye Fî Sîretîn Nebewîyye (Peygamberin siyerinde yol gösteren cevherler) isimli eserini, Kürt halkının peygamberin hayatını daha iyi öğrenip anlamaları için nazımla yazmıştır.

Kendi alanında özgün ve kıymetli olan bu elyazması üzerindeki çalışmanın amacı budur: Elyazması saklı kalsın, kürtçe şiir severlere yetişsin, nazımla yazılan siyerler arasındaki yerini bulsun, yazarın tarzı, dili ve ustalığı meydana çıksın, kendisinden önceki klasik ve medrese şairlerinin yazarın üzerindeki etkisinin anlaşılmasına bir aralama yapsın.

Bu çalışmada, eserin elyazması ve akibeti ile ilgili süreç anlatılmış, Molla Nurullah'ın sadece nazımda değil, İslam tarihini araştırmada, siyerin olay ve kısımlarını sınıflandırmasında ve peygamberin ahlak ile şemailini vasıflandırmasında olan ustalığı ve bilgisi de anlaşılmıştır.

Peygamberin hayatını anlatan bu eserle Molla Nurullah, bu alanda büyük bir boşluğu doldurmuştur. Kendisinden önce peygamberin siyeri, bu şekilde Kürtçe nazımla, geniş ve sağlam kaynaklara göre yazılmamıştır.

Anahtar Kelimeler: Molla Nurullah Godiškî, Elcewahîrur Reşadiye Fî Sîretîn Nebewîyye, Kürtçe menzûm siyerler, Siyer, Medrese

ABSTRACT

Mollah Nûrûllah Godiškî (1921-2003), with his works, the style, and specialities of his poetries, is one of the classic Kurdish poets. He is one of the scholars and poets who completed his education through tareeqats and madrasahs (Islamic sects and muslim religious schools) in Bitlis region. He had written his work, the “Elcewahirur Reşadiye Fi Siretîn Nebewiyye” (The guiding quintessences in the life of the prophet Mohammed) in poetry, with the aim of teaching better the life of the prophet to the Kurdish people.

The main purpose of studying on this unique and valuable hand written work is to prevent the work to be remaining hidden, and to be able to reaching out it to the poetrylovers. Also, it has been aimed to find the work’s value within siyer (the life of the prophet) works which written in poetry, and to uncover the style, language, and the speciality of the poet and to show influences of previous classic and madrasah poets on him.

Moreover, the process of writing and the fate of the work has been mentioned in this study. It has been found out that Mollah Nûrûllah is not successful only in the poetry, he is also a master and wiseman in researching Islamic history, in classfying parts and incidents of siyer, and in qualifying the morality and şamael (appearances) of the prophet.

Mollah Nûrûllah has fulfilled a big gap in the field of poetic siyer with his work. The life of the prophet hadn’t been written so wide based on safe sources in Kurdish poetry, before him.

Key Words: Mollah Nûrûllahê Godiškî, Elcewahîrur Reşadiye Fî Sîretîn Nebewîyye, Poetic Kurdish Siyers, Siyer, Madrasah

PÊŞGOTIN

Di helbestên klasîk ên Kurdî de hûnandina mî'rac û şemaîla pêxember, mijareke belavbûyî ye. Lê belê di nav klasîkan de nezmandina jiyana pêxember, digel şarezayîya helbestkariyê, 'ilmê siyer û tarîxê jî dixwaze. Bi mewlûda Melayê Bateyî, alimên medreseyan dest bi nivîsandina heyeta pêxember kir. Feqet nezm û berhemên wan kurt bûn û pirê wan heta wîladeta Hz. Muhammed (s. 'e.w) behsa siyerê kiribûn. Hinek jî li ser hinek cûrbecûr mijarên siyera pêxember rawestiyabûn mîna mî'rac û mu'cizat û şemaîla pêxember.

Mela Nûrûllahê Godîşkî, terza li jor hat behskirin guherand û siyereke kronolojîk nezimand. Destxeta wî ya bi navê "*El-cewahîru'r-Reşadiye Fî Sîretî'n-Nebewiyye*" di vî warî de berhemeke nûser e. Bi nezma xwe, bi naveroka xwe, xwedî taybetiyeke xas e, cîyekî girîng digre di nav klasîkan de. Ji bo xwendekarên medreseyan, ji bo xwendevanên zimanê Kurdî û ji bo hezkirîyên helbest û siyerê, kitêbeke balkêş e. Di dewreke ku xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî qedexe bû, hatiye nivîsandin. Ji ber van taybetiyan, min ew wek mijara tezê pejirand. Bi vê wesîleyê li ser siyerên menzûm û mensûr jî hatiye rawestandin.

Ev xebata tezê, ji sê beşan pêk tê. Beşa ewil li ser jiyana û şexsiyet û berhemên Mela Nûrûllahê Godîşkî ye. Ziman û şêwaza şair û naverok û mijarên berhemê jî hatine ravekirin. Beşa duyem li ser siyerên Kurdî ye û analîza berhemê dihewîne. Siyerên menzûm û mensûr yê bi Kurmancî û Dimilî hatine diyarkirin. Wezn û qalib û hunerên edebî yê berhemên hatine dayîn. Her wiha gotinên pêşiyên, biwêjên Kurdî, ayetên Qur'anê û hedîsên pêxember ên di berhemê de derbas dibin jî hatine komkirin û diyarkirin. Encam û tenkîda li ser berhemê hatiye gotin. Di beşa dawîn de transkîrîpsiyona berhemê hatiye dayîn.

Di amadekirina vê tezê de ez di serî de malavahiya Sefa Özdemirê kurê Seyda Nûrûllahê Godîşkî dikim ku deriyê xwe li me vekir. Transkîrîpsiyon û lêkolîna li ser destxeta Mela Nûrûllah qebûl kir û fotokopiyeke wê da me. Her weha ez malavahiya şêwirmendê xwe M. Zahir Ertekin, Hêmin Omer Ahmad, Cihat Bakırhanê neviyê Mela Nûrûllah Godîşkî, Cevdet Karaman, A. Samed Yalçın û Cihan Turan dikim ku

hem di pejirandina mijarê de, hem di transkirîpsiyona kitêbê de hem jî di amadekirina tezê de tu carî ez bi tenê û bêalîkar nehiştim.

Mela Nûrûllah û mustensîxê kitêbê Mela Fadil, li ser vê berhemê gelek cehd û xeyret kirine. Destxeteke tekûz li pey xwe hiştine. Hêvî dikim ku li gorî dil û meqseda wan, ev tez hatibe amadekirin, di nav klasîkên Kurdî de cî bigre û bi wê armancê jê sûd bê wergirtin.

Fahri TÎTÎZ

Bîngol – 2020



KURTEBÊJE

Amd: Amadekar

b: Bîn (law)

bn: Berhema navborî

bnr: Binêrin

b.t: Bê tarîx

c: Cild

‘e: ‘Erebî

Ed: Edîtor

f: Farisî

h.b: Heman berhem

hej: Hejmar

hwd: Her wekî din

Hz: Hezretî

m.n: Maqaleya navborî

R.‘E: Redîyallahû ‘enhû

r: Rûpel

S.‘E.W: Sellaallahû ‘eleyhî wessellem

t: Tirkî

TDV: Türkiye Diyanet Vakfı

w: Wefat

Tablo: Elfabeya Transkirîpsiyonê ya Berawirdîya ‘Erebî û Kurdî¹

Herfên ku di elfabeya latînî ya kurdî de tên bikaranîn û transkrîpsiyona wan				Herfên ku nayên bikaranîn û trasnkrîpsiyona wan	
ا	Aa, Ee	ش	Şş	ء	'
ب	Bb	ف	Ff	ث	Ş ş
پ	Pp	ڤ	Vv	ح	H h
ت	Tt	ق	Qq	ذ	Z z
ج	Cc	ك ك	Kk	ص	Ş ş
چ	Çç	گ گ	Gg	ض	Đ đ
خ	Xx	ل	Ll	ط	Ṭ ṭ
د	Dd	م	Mm	ظ	Z z
ر	Rr	ن	Nn	ع	‘‘
ز	Zz	ه	Hh	غ	Ġ ġ
ژ	Jj	و	Ww, Ūû, Oo		
س	Ss	ي	Yy		

¹ Ji bo Elfabeya Kurdî ya latînî bnr. Kadri Yıldırım, *Kürtçe Dilbilgisi*, 2. Baskı, Mardin Artuklu Üniversitesi, Mardin 2012, r. 19-20.

DESTPÊK

Klasîkên Kurdî, di warê ziman û edebiyatê, dîrok û mîtolojiyê, çand û huner û kevneşopiyê, jiyana û şaredariyê, ‘ilm û zanîstiyê, bîr û baweriyê yê millet de cîyekî girîng digrin. Ji dîn, ‘eşq, ‘îrfan, tesewwuf, tarîx, astronomî, coğrafya, felsefe, sosyolojî, psîkolojî, mûsikî, huner, edebîyat, adetên bav û kalan, destan û qehremanan behs dikin. Ji gelek hêlan ve rewşa civak û milletê nîşan didin.

Berhem û helbestên edebiyata Kurdî ya klasîk mîna Mem û Zîna Şêx Ehmedê Xanî, Dîwana Melayê Cizîrî, Mewlûda Bateyî, Rewdu’n-Ne‘îma Şêx Evdîrehmanê Axtepî ku di vê sehayê de weka çirayên biriqandî ne, nîşan dane ku gelê Kurd jî ehlê ‘ilm û me’rîfet in, ehlê eşq û hîkmet in, ehlê huner û heqîqet in. Şêx Ehmedê Xanî di behsa sebebê nivîsandina Mem û Zînê de vê heqîqetê weha tîne zimên:

Da xelq-i nebêjîtin ku Ekrad

Bê me’rîfet in, bê esl û bunyad

Enwaê’ milel xwedankitêb in

Kurmanc-i tenê di bê hesêb in

Hem ehlê nezer nebên ku Kurmanc

‘Îşqê nekîrin ji bo xwe amanc¹

Yek ji wan klasîkên Kurdî jî, destxeta Mela Nûrûllahê Godîşkî ya bi navê “*El-cewahîru’r-Reşadiye Fî Sîretî’n-Nebewîyye*” ye. Berhema destxet behsa dîrokê dike. Mijar yekser siyer û şemaîla pêxember e. Piranî li ser bûyerên jiyana pêxember radiweste. Wekî her şa‘îrê ku li ser pêxember nezmandiye Mela Nûrûllah jî ji bo razîbûna Xweda û gîhaştina hezkirina pêxember ev xebata edebî daye ber çavê xwe. Li gorî çavkaniyên sîreta pêxember, bi qasî 5024 beytan berfireh, qisim bi qisim heyata pêxember, exlaq û şemaîla pêxember kronolojîk nezmandiye.

Du heb nusxeyên destxet ên vê berhemê hebûne. Mela Nûrûllah bi xwe a ewil bi destê xwe yekser nivîsandiye. Feqîyekî Mela Nûrûllah, bi armanca bide çapkirin vê nusxeyê bi xwe re dibe Lubnanê. Lê ji ber şerê navxweyî yê Lubnanê yê navbera salên 1975-1980î, ji feqîyê han û ji nusxeyê careke din tu salox nayê hîlanîn. Beriya

¹ Ehmedê Xanî, , *Hemû Berhem*, Ed. Kawa Nemir, Lîs, Stenbol 2008, r. 41.

ku here Lubnanê, bi navê Mela Fadiî Koxaka feqiyekî din ê Mela Nûrûllah, ji ber vê nusxeyê bi xeta xwe berhemê dinivîsîne. Li hinek deveran Mela Nûrûllah jî bi destê xwe nivîsandiye. Bi vî awayî berhem bi vê nusxeya tekane tê parastin. Tez, vê nusxeya destxetê pîvan digre. Destxet bi herfên ‘Erebî û herekeyê hatiye nivîsandin û jî 220 rûpelî pêk tê. Piştî rûpela serqapaxê çel û yek gotinên Mela Nûrûllah hatine dayîn. Rûpelên naverokê bûne du beş û di herdu beşan de bi kurtasî sernavên mijaran hatine nivîsandin. Bi gelemperî her rûpel 23 beytan dihewîne. Sernavên mijaran bi ‘Erebî hatine dayîn. Di her sernavî de li kêleka rastê hejmara beytên sernavê berê bi reqem hatiye nivîsîn. Li kêleka çepê jî heta wî sernavî yekûn hejmara beytan, bi reqemên ‘Erebî hatiye diyarkirin. Li çend deveran ev hejmar tevlihev bûne, lê paşî hatiye rastkirin. Di her rûpelê de li ser gelek peyvan bi armanca bêtir bê fêmkirin, haşiyê hatine nivîsandin. Li hinek rûpelan beytên ku hatine jibîrkirin an jî yên awayê rast li kêlekê hatiye diyarkirin. Di numrokirina rûpelan de jî carna şaşîfî çêbûye. Di rûpela sed û yazdehan de diwazdeh beyt hene. Di rûpela pey wê de pênc beyt di şûna ewê li jor bê nivîsandin, li jêr bi awayê berê nivîsê li jêr be hatine nivîsandin û ser hemiyên hatiye xêzkirin, her weha rûpel jî nehatiye numrokin. Dawiya nivîsê ya temambûnê, pexşaneke bi ‘Erebî ye. Diyarkirina hejmara hemî beytan û dîroka qedandina destxetê jî dihewîne.

Dema ev berhem hatiye nivîsandin, nivîsîn û xwendina bi zimanê Kurdî qedexe bû. Ji ber vê yekê eser qedreke zêde dihewîne. Berhem di seha xwe de nûser û neqane ye. Ji lew derbarê analîz û trasnkirîpsiyona wê de tez hatiye pejirandin. Digel transkirîpsiyona berhemê, li ser kurtejiyan û şexsîyeta Mela Nûrûllah, ziman û devoka herêma wî, şêwaz û berhemên wî, siyerên menzûm û mensûr, hunerên edebî yên di berhemê de jî hatiye rawestandin.

Berhem eger bi herfên latînî nehata transkirîbekirin, di vî warî de ewê kêmasiyek peyda ba. Lewra dewlemendiya zimanekî, bi hejmara berhemên giranbiha yên bi wî zimanî hatine nivîsandin xuya dibe. Eserên bi zimanî Kurdî yên bi wasîteya medreseyan hatine nivîsandin, dewlemendiya zimanê Kurdî nîşan didin. Îro edebiyat û zimanê Kurdî ji gelek aliyan ve deyndar û minnetdarê van berheman in.

1. Girîngî û Armanca Tezê

Edebîyata Kurdî ya Klasîk, destpêk û bingeha tarîxa edebîyata Kurdî ava kirye. Lewra berhemên ewil û nivîskî yên ku gihastine roja me, yên vê dewrê ne. Ji lew hewce bi xebat û lêkolînên akademîk ên li ser van berhemên heye da ku dewlemendbûna edebiyata Kurdî derkeve holê û payebilindbûna wê ya di warê edebiyata dinyayê da eşkere bibe. Bi hinek sedeman gelek berhemên vê qadê, veşartî mabûn. Lê di demên dawîn de bi xêra xebatan, evan berhem derdikevin holê. Edebîyata Kurdî tê nasîn, kesên ji edebîyatê hez dikin, ji van berhemên çavnas dibin.

Berhemên edebîyata klasîk bi piranî ji medreseyan derketine. Pirê wan jî nezm û helbest in. Sebebekî wê ev e ku nezm û helbest rihet hatiye ezberkirin û bi vî awayî belav bûne di nav xelkê de. Aheng û dengê nezm û helbestê, zêde bandor kiriye li ser hest û ramanên însanan.

Gelek berhemên ku fêkiyên medresa ne û bi nezmê hatine nivîsandin, qesîde, xezel û mesnewî nin. Di mesnewîyan de jî mijara mewlûd û şemaîl û mîraca pêxember zêde hatine hûnandin. Di edebiyata Kurdî ya klasîk de mijar û ûnsûr bi piranî li ser têgehên dînî ne.² Berhemên ku yekser li ser siyer û heyata pêxember hatibin nivîsandin, ne ewqas zêde ne. “*El-cewahîru’r-Reşadiye Fî Sîretî’n-Nebewiyye*” di vî warê de esereke taybet e. Yek ji wan berhemên veşartî ye. Ji bo ev berhem derkeve ronahiya warê edebiyatê û şairê wê bê naskirin, xebata li ser wê hewce bû.

Armanca vê xebatê ev e ku ji aliyê ruxsarî, naverok, hunerî, ziman û şewazî ve li ser berhemê lêkolînek bê kirin. Metnê berhemê bê latînzekirin. Di warê edebiyatê de berhem bighê pileya qîmeta xwe.

Armanceke din ev e ku kesayet û hostetîya Mela Nûrûllah di qada nezm û weznê de, di kategorîzekirina mijarên siyerê de, di hûnandina wesf û şemaîla pêxember de derkeve meydanê. Her weha têkilî û berawirdkirina berhemê bi yên şairên din ku pirê wan wek mewlûdnameyan hatine amadekirin re zelaltir bibe û ji sehayên lêkolînên akademîk re mijarên girîng derkevin holê.

² Ji bo çavkaniyên fikrî yên edebiyata Kurdî ya klasîk bnr. Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk*, Çapa yekem, Nûbihar, Stenbol 2013, r. 31-37.

2. Çavkaniyên Sereke Yên Tezê

Çavkaniya sereke û ewil ji xwe destxeta “*El-cewahîru’r-Reşadiye Fî Sîretî’n-Nebewiyye*” ye. Ji bo xebata li serê, hewce bi destxetê hebû. Mela Sefayê kurê biçûktirîn ê Mela Nûrûllah, fotokopiyeke destxetê da me. Ji xwe nusxeya ewil ne xuya ye. Tek nusxeya ku ji ber a ewil bi destê Mela Fadilê ji Koxaka Bilanixê hatiye nivîsandin li cem wî dimîne. Mela Fadil, feqiyê Mela Nûrûllahê Godîşkî ye, niha rehmet kiriye.

Dîsa berhemeke din a Mela Nûrûllah ya bi navê “*El-hemaîlû Fî’ş-Şemaîlî*” jî hewce bû. Lewra ev berhem jî şewaza wî nîşan dide û hem jî li ser şemaîla pêxember radiweste.

Di heqê kurtejiyan û kesayeta Mela Nûrûllah de agahî hewce bûn. Ji lew ji van çavkaniyan sûd hat wergirtin:

- ✓ Cihat Bakırhan, *Mele Nurullahê Godîşkî’nin Çenta Yetîman Adlı Eserinin Transkripsiyonu, Türkçeye Çevirisi, Tahlil Ve Tenkidi*, Teza Masterê a Neçapbûyî, Zanîngeha Mûş Alparlanê, Muş 2017.
- ✓ Feqî Huseyn Sağnıç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2002.

Mijara berhemê siyer e. Ji ber vê yekê hewce bi berhemên derheqê siyerê de jî çêbû. Di hinek deveran de nav û cî û bûyer eşkere nehatibûn dayîn. Bi kurtasî hedîse hatibûn gotin. Ji lew bi gelemperî ji van berhemên di heqê siyerê de ên li jêr hat îstîfadekirin:

- ✓ İbn Sa’d, *Kitabut Tabakatil Kebir (Resûlullah’ın Kutlu Sîreti)*, Ed. Adnan Demircan, Siyer Yayınları, 2. Baskı, İstanbul 2015.
- ✓ *İslam Ansiklopedisi*, TDV Yayınları, İstanbul 2012.
- ✓ M. Asım Köksal, *İslam Tarihi*, Köksal Yayıncılık, İstanbul, 2005.

Di siyerê de, gelek peyvên ‘Erebî, Farişî û hinek Osmanî jî derbas dibûn. Ji lew ferhengên ‘Erebî û Farişî û Osmanî lazim bûn. Ji bo peyvên ‘Erebî, Farişî, Osmanî û Kurdî, li gorî rêza zimanan ji van çavkanîyên nivîskî hat îstîfadekirin:

- ✓ Mevlût Sarı, *El-Mevarid Arapça-Türkçe Lûgat*, İpek Yayınları, İstanbul

- ✓ Rağîb El-İsfahanî, *Müfredat Kur'an Kavramları Sözlüğü*, 4. Baskı, Yarınlı Yayınları, İstanbul 2015.
- ✓ Arif Etik, *Farsça-Türkçe Lûgat*, Salah Bilici Kitabevi Yayınları, İstanbul 1968.
- ✓ Abdullah Yeğîn, Abdulkadir Badıllı, Hekimoğlu İsmail, İlham Çalım, Osmanlıca -Türkçe Ansiklopedik *Büyük Lûgat*, Türdav, İstanbul 1992.
- ✓ Zana Farqînî, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2013.

Derbarê hunerên edebî de hewce bi çavkaniyên nivîskî hebû. Ji bo rave û nimûneyan ji van berheman sûd hat wergirtin:

- ✓ 'Elî Baqustanî, *Mewlûd (Metn û Lêkolîn)*, Amd. M. Zahir Ertekin, Zanîngeha Soran, Çapa Yekem, Hewlêr 2017.
- ✓ Cem Dilçîn, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Türk Dil Kurumu, Ankara 2016.
- ✓ İskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Kapı Yayınları, İstanbul 2004.
- ✓ Numan Külekçi, *Açıklamalar ve Örneklerle Edebî Sanatlar*, Akçağ, 6. Baskı, Ankara 2013.

Di heqê dîroka edebiyata Kurdî ya klasîk û mijarên mesnewiyê de ji van pirtûkên Abdurrahman Adak hat îstîfadekirin:

- ✓ *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk*, Nûbihar, Çapa Yekem, Stenbol 2013.
- ✓ *Teşeyên Nezmê Di Edebîyata Kurdî Ya Klasîk De*, Nûbihar, Çapa Yekem, Stenbol 2019.

Ji bo mealên ayetên Qur'ana pîroz jî ji *Meala Qur'ana Pîroz a Kurdî*, Amd. Hüseyin Gündüz (Êsî), Mehmet Seyhan, Çapa Yekê, Weşanên Serokatîya Karûbarên Diyanetê, İstanbul 2015 hat îstîfadekirin.

3. Rêbaza Lêkolînê Ya Tezê

Ewilî li ser transkirîpsîyona berhemê xebat pêk hat. Orjînalê destxetê li cem min tunebû. Min jî fotokopîya wê îstîfade kir. Ev jî carna hin problem derdixistin

holê. Hinek herf baş nedihatin xwendin. Di latînezikirinê de gelek caran Mela Cahît Bakırhan û A. Samed Yalçın alîkarîya min kir. Peyv û transkîrîpsiyona ku min ew fêm nedikir, min ji wan re dişandin, an jî min dida ber a wan, yan jî fikra wan distend. Bi vî awayî latînîze bidawî bû.

Latînîzekirin li dû hev hate kirin. Hejmara rûpelên fotokopîyê, di latînîzekirinê de nehat destnîşankirin. Li gorî alfabeya standard a transkîrîpsiyonê, listeya muqabilên neh herfên ‘Erebî, li jêr hatiye dayîn:

ث s S

ح h H

ذ z Z

ص ş Ş

ض d D

ط t T

ظ z Z

ع ‘ ‘

غ ğ Ğ

Mela Nûrûllahê Godîşkî, li ser hinek peyvan an jî koma peyvan, bi şeklê ku wê rasttir be yan jî bi wî awayî jî bê gotin, esseh nivîsîye û destnîşan kiriye. Evan esseh di jêrenotan de bi haşîye hatin nivîsandin.

Misrayên ku bi ‘Erebî hatine gotin, maneya wan a Kurdî û beyana hinek dîrokan di jêrenotan de hatine dayîn. Her wiha jibo fêmkirina hinek peyvan an jî misrayan, di jêrenotan de wateya wan a temam hatin destnîşankirin.

Peyvek ‘Erebî yan jî Farisî derbas biba û gelek wateyên wan hebana, ji ferhengê ma’neya wan dihat derxistin. Li gorî mijara berhemê kîjan wate munasîb

ba, ew dihat pejirandin. Hinek peyvên ku di ferhengan da peyde nedibûn, li gorî haşiyeyên Mela Nûrûllah wateya wan hatin dayîn. Mela Nûrûllah di berhemê de, hinek daçekên xwe li gorî gotina Farisî nivîsandine mîna “ba /be” (bi Kurdî bi), “ez” (bi Kurdî ji). Evan edat, nehatin guhertin. Mela Nûrûllah peyv û daçek çawa nivîsandibin, ew bi wî awayî hatin parastin. Her wiha peyvên herêmî yên ku bikar anîne mîna “çan” yanî “çawan” jî bi heman şiklî hatin nivîsandin.

Di berhemê de gotinên pêşîyan, biwêjên Kurdî hatin komkirin. Di serê kitêbê de mustensîxê kitêbê Mela Fadilê feqiyê Mela Nûrûllah, hinek gotin û nukteyên Mela Nûrûllah nivîsandine. Ev gotin jî wek gotinên pêşîyan, heqîqetan nîşan didin û pir dişebihin gotinên pêşîyan. Lê ji ber ku Mela Fadil, ew nîsbetî Mela Nûrûllah kirine, di nav gotinên pêşîyan de nehatin nivîsandin. Berhem ji ber ku bi nezmê ye, raste rast gotinên pêşîyan zêde nehewandine.

Ayet û hedîsên ku di berhemê de derbas dibin jî hatin lîstekirin. Mealên Kurdî yên van ayetan, navên sûreyên wan û nimroyên wan jî hatin dayîn. Hedîs û çavkanîyên hedîsan jî hatin dayîn. Ji ber ku berhem behsa jiyana pêxember dike, di berhemê de gelek gotinên pêxember yên wek xeberdanên rojane hene. Nexasim di mijara mî’racê de di navbera pêxember û Cibrîl de gelek xeberdan derbas dibin. Min ev xeberdan, nexistin nav lîsteya hedîsan. Tenê gotinên meşhûr ên pêxember di lîsteyê de hatine diyarkirin.

Di berhemê de gelek peyvên ‘Erebî û Farisî, hinek jî peyvên Tirkî derbas dibin. Di jêrenotan de yên ‘Erebî bi (‘e)yê, yên Farisî bi (f)yê û yên Tirkî jî bi (t)yê hatin destnîşankirin û wateyên wan ên Kurdî hatin dayîn. Hinek peyvên Kurdî yên ku wateyên wan zêde nayê zanîn, an jî ew peyv îro zêde nayên bikaranîn di jêrenotan de wateyên wan jî hatin dayîn. Ji bo zimanê Mela Nûrûllah bê fêmkirin, hinek peyvên Kurdî, Farisî û hemî peyvên Tirkî, di mijara ziman û devoka herêma wî de hatin dayîn.

BEŞA YEKEM

KESAYETA MELA NÛRÛLLAH Û NAVEROKA DESTXETÊ

1. KURTEJIYANA MELA NÛRÛLLAH

Mela Muhemmed Nûrûllahê ku bi navê Mela Nûrûllahê Godişkî û bi leqeba Godişkî tê zanîn, li gorî Mîladî di sala 1921ê de (1337ê Rûmî), li Xarsa (Güneyik) gundê Tila (Korkut) Mûşê hatiye dinyayê. Bavê wî Mela Ehmedê Godişkî û dîya wî jî Hurrîyet e. Bi ‘eslê xwe ji nesla Mûhemmed et-Têlanî yê ji meşayîxên Cizîrê ye. Bapîrên wî ji Tîlana gundê Misirca (Kurtalan) Sêrtê koçî Şimlaka (Dağdibi) gundê Dêrxasa (Hasköy) Mûşê dikin û paşê ji wir jî diçin li gundê Godişkan (Alıcık) a gundê Mûtkiya Bedlîsê bicî dibin. Ji ber ku bav û bapîrên wî li Godişkan jiyane, bi navê Mela Nûrûllahê Godişkî tê nasîn.¹

Mela Nûrûllah, dema sê mehî ye, bavê wî Mela Ehmed wefat dike. Bi wefata bavê xwe hem zaroktîyeke dijwar dibuhure hem jî ji mal û milkê xwe dibe. Lewra gava bavê wî diçe ber rehma Xwedê, beg û xulamên wê demê dest datînin ser mal û mulkê wan. Seyda Mela Nûrûllah vê rewşê di otobîyografiya xwe ya ku di sala 2000î de ji Feqî Huseyn Sağnîç re şandîye de weha tîne zimên: “*Ez bûme sê mehî, babê min daxilê rehmeta Xwedê bû. Şêx ‘Eladînê kurê Şêx Fethûllahê Werqanîsî (w.1899) ji min re gerandin wesî. Ewî jî teqîratî nekir. Di wê çûwîna babê min de began, xulamêd wanê zorker, malê min talan kirin. Tiştêk ji min re nehiştin. Her wekî ku tiştêk min tê de tune bû û min ji deftera mîresê derxistin.*”²

Cihat Bakirhan di teza xwe de dide zanîn ku Mela Nûrûllah pey wefata bavê xwe di nav şertên dijwar de mezin dibe. Demekê li gundê Xarsê li cem mamê xwe Mela Mistefa dimîne, piştê diçe ba pismamê xwe Mela Sidîq. Wê demê Mela Sidîq li gundê Nokê (Koç) bû ku nêzî gundê Xarsê bû. Li cem wî Qur’anê xetim dike û bi heyata medreseyê dinase. Di neh-deh salîya xwe de diçe Oxînê (Koyunlu) cem Şêx ‘Eladîn (w.1949) Ji teref bavê wî Mela Ehmed ve Şêx ‘Eladîn jê re wesî hatibû

¹ Cihat Bakirhan, *Mele Nurullahê Godişkînin Çenta Yetîman Adlı Eserinin Transkripsiyonu, Türkçeye Çevirisi, Tahlil ve Tenkidi*, Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî, Zanîngeha Mûş Alparslanê Enstîtuya Zanîstên Sosyal, Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî, Muş 2017, r. 26.

² Feqî Huseyn Sağnîç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2002, r. 610.

tayînkirin. Di medresa Şêx ‘Eladîn de dest bi tehsîlkirina ‘ilmê Îslamê dike. Îcaza xwe ji Şêx Xalid distîne. Dema îcaza xwe ya tamamkirina ‘ilmên medreseyê werdigre, ji Werqanisa (Kasımlı) gundê Hawêla (Baykan) Sêrtê bi Seyyîde Fatima Xanima keça Seyyîd ‘Ebdurrehîm re dizewice.³

Mela Nûrûllah li ser xwendin û feqîtiya xwe îfade dike ku mamê wî Mistefa pir li xwendin û serkeftina wî ya di tehsîla ‘ilmê de xebitiye da ku kitêbên bav û bapîrên wan bêxwedî nemînin. Di feqîtiyê de gelek cefa dibîne. Salekî li cem pismamê xwe Mela Sidiq dixwîne. Paşê diçe Oxîna gundê wesiyê xwe Şêx ‘Eladîn. Mela Nûrûllah di otobiyografiya xwe de weha dibêje: *“Ewî pir rind li min mêze kir. Wesîtîkî pir delal kir û muhîm danî ser însanîyet û jorketina min. Xweda jî tewfîq da û roj bi roj derketim jor. Elhemdülillah min li wir Farisî jî xwend û hîra bûm û ez bûme nivîskar jî.”* Di dewama beyana xwe de weha dibêje: *“Şêxê min jî di van xusûsan de ji min razî bû. Temamê xwendina xwe ya rêzê min li mala wan xwend. Seydayê min heqîqî Şêx Xalidê kurê Şêx bû. Pir mela bû û pir baş li min dinihêrî. Gelek caran jî min li cem babê wî dixwend û car caran jî li bal birayê wî yê mezin Şêx Mezher dixwend. Xweda dereca wan pir ‘alî bike û serwerîya wan payîdar bike.”*⁴ Mela Nûrûllah li medresa mala Şêx, mîrîtiya feqîyan dike. Di wê wezîfê de jî zehmetîyan dibîne ji ber ku tamamker û mesûlê kêmasîyan e. Lê wê çaxê jî ji fezl û bereketa wan, ji hevalên xwe jêhatîtir e.

Piştî dizewice, li Qerebo (Yukarı Karaboy) ya gundê Bedlîsê li ser daxwaza Şêx ‘Eladîn dest bi melatîyê dike. Salekê lê dimîne, li wir îdarekirin û debarî kêm bû, ji lew diçe Şikranîsa (Yoncabaşı) gundê Tetwanê. Li wê medreseyekê vedike û dest bi dersdayîna feqîyan dike. Li ser gihandina feqîyan disekine. Li wir sêzdeh salan dimîne. Li derûdor jiber xizmet û karê wî, navê wî bi bilindayî belav dibe. Lê jiber ku debarî li wê jî zehmet bû û nifûsê wî jî zêde bû, diçe li gundê Kizwakê (Sarıkum) bicî dibe. Gund li ber devê gola Wanê ye. Li vî gundî jî neh salan dimîne û dersa feqîyan dide. Ji ber hinek mani’an, paşê derbasî gundê Xizorkînê (Hanelmalı) dibe. Ew gund jî li ber devê behrê ye. Li vir jî du salan dimîne. Li wir jî îdara dinyayê tengasî bû. Dûre diçe Kuştîyana (Alakır) gundê Xelata Bedlîsê. Dema li vî gundî ye, tayîna wî ya resmî derdikeve û derbasî nahîyeya Sorpê (Reşadiye) dibe. Dema dibe

³ Bakırhan, Teza Li Ser Çenta Yetîman, r. 26.

⁴ Sağrıç, Dîroka Wêjeya Kurdî, r. 610.

îmamê resmî, pazdeh salan li wê derê dimîne. Ji wir jî diçe Koxaka (Dokuzpınar) gundekî Bilanixa Mûşê. Sê salan jî li wê derê dimîne û ji wezîfê teqawîda xwe distîne û pey melatîya 47 salan tê li Tetwanê bi cî dibe û heta wefata xwe li wir dijî. Di Nîsana 2003an de diçe ber rehma Xweda. Qebra wî li Sûlava qebrîstana Oxîna gundê şêxê wî Şêx ‘Eladîn e.⁵ Rehm û razîbûna Xweda li ser wî be.



⁵ Ji bo wefata Mela Nûrûllah bnr. Bakırhan, Teza Li Ser Çenta Yetîman, r. 27.

2. 'ILM Û KESAYETA MELA NÛRÛLLAH

Mela Nûrûllah yek ji 'alimên herêma Bedlîsê ye¹. Di medresa Oxînê li cem mala Şêx 'Eladînê kurê Şêx Fethûllahê Werqanisî 'ilmê xwe yê rêzê tamam kiriye. Ji ciwantîya wî heta wefata wî bi 'ilm û xwendin û dersdayîn û nivîsandinê meşxûl bûye. Haya wî ji 'ilmê tesewwufê jî heye. Lewra ji malbateke şêx tê û hem jî li cem mala Şêx Fethûllah xwendiyê û hînî Farisî jî bûye. Ji lew di 'Erebî, Farisî, Kurdî de zana û şareza bûye. Bakırhan di teza xwe de îfade dike ku di 'ilmê Îslamî û karê medreseyan de, bi berhem û helbestên xwe yên bi van her sê zimanan jîr bûye. Hê di ciwantîya xwe de meraqa wî ji edebîyata Kurdî re çê bûye û li cem feqîyan dest bi nivîsandina şî'ran kiriye. Li ser vêya di otobîyografiya xwe de weha dibêje: *"Ya xetat û meyla min zêde li ser kitêbêd aşîqan bû. Zêdetir ji yêd Kurdî. Lewra zimanê min û ajara (binemal) min bû. Xwedayê 'alî cenab miyêser kir ku di nezmê de jî, bijor ketim û di ber hevokêd Kurdî de jî ji hevalan bihorîm û navê min danîne şa 'ir..."*²

'Alim û şa'irê ku di berhemên xwe de mexlesên xwe wek Mela Nûrûllahê Godîşkî, Mela Nûrûllahê Tetwanî, Mela Nûrûllahê Xwêtî, Nûrûllah, Nûrî bikar anîne, heyateke zor û zehmet derbas kiriye. Lê digel ewqas cefa û dijwarî jî tim 'aşîqê 'ilm û edebîyatê û evîndarê pêxember û mala şêx bûye. Ji xwe terbîye û edeba xwe li cem mala şêx hilanîye. Ji ber ku mala şêx xwedîtî lê kiriye, di helbestên xwe de methê mala şêx dide. Di şairtîya xwe de serdest û şareza ye, helbestên bi arûzê û nûser hûnandine. Di helbestên wî de tesîra Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Şêx Ehmedê Xanî û Şêx 'Ebdirehmanê Axtepî heye. Di dîwana xwe de li ser hinek şî'rên Melayê Cizîrî texmîs nivîsandine.³ Her weha gava dest bi behsa mîraca pêxember dike, mîna Şêx 'Evdirehmanê Axtepî gazî qelemê dike. Di Elhemaîlû Fîş Şemaîlî de weha dibêje:

Qelem rabe meqsed jibo me bibêj

We xûta dilê xwe jibo me birêj

¹ Ji bo şairên herêma Bedlîsê bnr. Abdurrahman Adak "Helbestvanên Klasîk Ji Perspektîfa Herêmî: Nîmûneya Herêma Bedlîsê" *The Journal of Mesopotamian Studies* 1.1 (2016): 33-56.

² Sağrıç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, r. 610.

³ Bakırhan, *Teza Li Ser Çenta Yetîman*, r. 27.

**Tu reyhana Xanî bûyayî, bira!
Qesem dê serê te minê jê kira**

**We yan jî tu Qamûşa Axtepîyî
Bûyayî, dê bikrama bedbextîyî⁴**

Di van malikan de Xanî, Şêx Ehmedê Xanî ye, Qamûş jî hespa Şêx ‘Evdirehmanê Axtepî ye.

Mela Nûrûllah di helbestê xwe de ewqas serdest e ku dikare peyvên rojane bi wezn û helbeskî bêje. Feqî Huseyn Sağniç vê yekê di pirtûka xwe de îfade kiriye û daye zanîn ku rojêke sar û şilî de gava Mela Nûrûllah bi wî halê şilîw şerpezehî ketiye kargerîya wan, ji ber ricifandî nikaribû bipeyive, ji lew kaxiz û qelem xwestîye û weha nivîsandîye:

Min dît pilingek ji kaf û dalan

Kur rêyek di navê ra diborî

Destê min girt û xweş rahejand go,

“Bixêr hatî seyda Mela Nûrî⁵”

Mela Nûrûllah, digel nexweşîyan û zehmetîyan xwe ji tehsîla ‘ilmê, gihandina telebeyan, nivîsandina kitêban, xizmeta xelkê nedaye paş. Vê yekê di otobîyografiya xwe de weha tîne ziman: *“Hasilul kelam heta gihîştîme vî umrî, min pir perîşanîya canî kêşand. Lewre ji umrê bîst û çar salîya min hetta heştî, çende niha canê min bi êş û elem bûye, dîsa jî ji xizmetê nemame li paş û erd jî gelek ji ber min çûye elhemedûlîllah. Niha jî çehvê min li xizmeta hevalan e bi qasî ku ji min bêtin”⁶*

Mela Nûrûllah, xwe ji siyaseta dinyê parastîye, xwe ji sîyasetê dûr xistiye. Di dawîya *“Elcewahîrur Reşadîye”* yê de di nesîhetnameyê de jî şîret dîke ku mirov xwe ji siyaseta dinyê dûr bike;

⁴ *Elhemailû Fîş Şemalî*, Amd. Zeynelabidîn Zinar, Çapa yekem, Doz, Stenbol 2007, r. 149.

⁵ Sağniç, *h.b.*, r. 609.

⁶ Sağniç, *h.b.*, r. 611.

Nebî cem te jibo dunya sîyaset

Be wê eşla nekiryê kes rîyaset⁷

Ji nesîhetên Mela Nûrûllah diyar dibe ku li ser heq û qencîya hemî sinif însanan sekînîye. Heq û rastî, mirovatî û biratî, çûna li pey şer‘a pêxember derxistîye pêş, welew dijmin be jî xaîntîya li însanan lomandîye. Êşandina heywanan jî şermezar kiriye. Xatirê dost û nasan zane, hurmeta ‘alim û mezinan zêde digre. Ji xwe di otobîyografiya xwe de dide zanîn ku bi fezl û bereketa mala Şêx Fethûllah, di ‘ilm û helbestê de jîr û jêhatî bûye û gelek berhem amade kirine.

Sefayê kurê Mela Nûrûllah îfade dike ku Mela Nûrûllah, ji ‘ilm û kitêban pir hez dike, bi xwe re kitêb tim peyde dike, heta di nexweşîya xwe de li nexweşxaneyê ji ewladê xwe hinek kitêb xwestine. Mela Nûrûllah bi ‘Erebî û Farisî baş dizane, di berhem û helbestên xwe de ev ziman bikar anîne. Di kitêbxana wî ya malê de hema bêje di hemî eseran de haşîyeyên wî hene. Her wiha kurê wî dide zanîn ku Mela Nûrûllah tenê bi ‘ilmê dînî re meşxûl nebûye, bi ‘ilmên wek tarîx, coğrafya, matematîk hwd re jî îştîxal kiriye. Ji ‘ilmên Îslamî di siyer û fiqih û tefsîrê de li derûdorê navdar bûye, pê re hatiye şewirîn. Mela Sefa dîsa îfade dike ku bavê wî gelek caran dil kiriye li ser tarîxa bavik û ‘eşîrên Kurdan bixebite, lê ji ber ‘umrê wî yê zêde teqat nekiriye ku bigere û agahîyan berhev bike, ji lew ev yek di dilê wî de wek derdekî maye.⁸

Taybetiyeke din a Mela Nûrûllah ew e ku di berhemên xwe de mîna filologekî di helbestan de li ser gelek peyvên bi haşîyeyan beramberê wan nivîsandine. Peyvên Kurdî bi Erebî rave kirine, yê Erebî û Farisî jî wateya wan ên Kurdî li ser wan nivîsandine. Bi vî awayî hem di van zimanan de jîr û jêhatîya xwe nîşan daye hem jî weka ferhengokê peyvên ku ewê xwendevan nezanibin, beyan kirine. Hem bi vî şiklî hinek peyvên Kurdî jî parastine. Di berhem û helbestan de wate bêşek girîng e. Heger ku zêde neyê fêhmê, zêde nayê ‘ecibandin jî. Şêx Ehmedê Xanî di Nûbihara Biçûkan de ji bo hînkirinê me’neyên peyvên Erebî bi Kurdî dane. Mela Nûrûllah her çiqas bi vî awayî nekiribe jî, jibo bîhînkirin wateya gelek peyvên bi haşîyeyan daye hînkirin.

⁷ Mela Nûrûllah Godîşkî, *Elcewahîrur Reşadîye Fî Sîretîn Nebewîyye*, r. 213.

⁸ Bakirhan, *Çenta Yetîman*, r. 29.

3. BERHEMÊN MELA NÛRÛLLAH¹

3.1. Dîwana Beytan: Zêdetirî 285 şî'r û helbestan û zêdetirî 75 rûbaîyan dihewîne. Qesîde, xezel û rûbaîyatên seyda bi Kurdî, Erebî, Farisî û pir hindik jî bi Tirkî hatine nivîsandin.

3.2. El-Hemaîlû Fîş Şemaîlî: Mesnewîyeke ku ji 5569 beytan pêk tê. Bi piranî li ser exlaq û şemaîlê pêxember radiweste, bi kurtasî heyeta pêxember jî tê gotin. Berhema menzûm bi Kurdî ye û seha xwe de neqane ye. Zeynelabîdîn Zinar latîfîza wê kiriye. Di 2007an de ji aliyê Weşanên Dozê ve hatiye çapkirin.²

3.3. Es-Sebaîk Fîl Menasîk: Ev eser mensûr û bi zimanê Kurdî ye. Behsa îbadeta heccê dike.

3.4. El-Cewahîru'r-Reşadiye Fî Sîretî'n-Nebewiyye: Ev esera menzûm ji 5024 beytan pêk tê. Hem heyeta pêxember hem jî şemaîla wî hatiye nezmandin. Li gorî kitêbên siyerê hatiye nivîsandin. Di 1967an de nezmandina wê qediyaye.

3.5. Çenta Yetîman: Jibo zarokên Kurdan hatiye amadekirin. Li ser 'eqîde û îbadetan bi Kurdî hatiye nivîsandin. Cihat Bakirhan li serê teza xwe ya lîsansa bilind amade kiriye. Hê nehatiye çapkirin.

3.6. Kufrul Kebaîr: Mela Nûrûllah, esera Şêx Fethullah Werqanisî ya bi navê "El-Kufr wel Kebaîr" bi Kurdî nezmandiye û ev berhem amade kiriye.

3.7. Camîul Me'anî: Şerha Mela Nûrûllah e ku li ser esera Şêx Ehmedê Xanî ya bi navê "Eqîda Îmanê" bi Erebî hatiye nivîsandin.

3.8. Şerha Beyta Dilo: Ev şerh jî bi Erebî ye, li ser helbesta Feqîyê Teyran a bi navê "Dilo Rabe" hatiye nivîsandin.

3.9. Şerha Mewlûda Kurmancî: Şerha Mela Nûrûllah e ku li ser mewlûda meşhûr a Melayê Bateyî, bi Erebî hatiye nivîsandin.

¹ Ji bo eserên Mela Nûrûllah bnr. Bakirhan, Teza li ser *Çenta Yetîman*, r. 30.

² Zeynelabîdîn Zinar her çiqas berhemê nîsbetî Şêx Fethûllah Werqanisî bike û berhem li ser navê Şêx Fethûllah hatibe çapkirin jî, ewladên Şêx bi îmze û îfadeya xwe bi mektûbekê beyan dikin ku bi vî navî esereke bavê wan tune. Mektûba wan di pêvekan de hatiye dayîn.

3.10. Şerha Tecwîdê: Şerha Mela Nûrûllah e, bi Erebî ye. Li ser esera Şêx Alauddîn a bi navê “Hîdayetus Sîbyan” ku der heqê tecwîdê de ye, hatiye nivîsandin.

Tê îfadekirin ku dîwaneke biçûk jî ya Mela Nûrûllah hebûye. Lê jiber te’deyên darbeya 1971ê ji aliyê malbata wî ve hatiye şewitandin.³



³ Bakirhan, *h.b.*, r. 30.

4. ZIMANÊ MELA NÛRÛLLAH Û DEVOKA HERÊMA WÎ

Mela Nûrûllah, li herêma Bedlîsê, li hinek gundên Mûşê jiyaye, pirê heyata xwe li medreseyan û di melatîyê de derbas kiriye. Gihabûn û tehsîla wî li ser vê terbiye û zarî bûye. Ji ber vê yekê di berhemê de zimanê serdest, zimanê herêma Serhed û Botî ye û di bin tesîra medrese û tehsîlkirina ‘ilmên Îslamî de maye. Meqseda wî ew e ku eser hem xîtabî xwendekarên medreseyan bike, hem jî xelq karibin bi rihetî bixwînin.

Eser bi Kurdî ye û bi devoka herêma Bedlîs-Mûş-Sêrtê hatiye nivîsandin. Eser bi wezna arûzê hatiye hûnandin, her çiqas tê de peyvên ‘Erebî, Farisî, Tirkî hebin jî, Kurmanciya wê herikbar e. Ji aliyê peyvên Kurdî de zimanê wî gelekî dewlemend e. Gelek peyvên ku îro ya nayên gotin yan jî pir hindik tînan bikaranîn, di nav beytan de hatine reşandin. Belkî hinek ji wan herêmî bin. Lê belê bi vî awayî evan peyvên Kurdî hatine parastin. Ji van peyvan wateya nêzî sê sedî di jêrenotan de hatine dayîn. Ji bo peyvên Kurdî carna ji ferhenga Zana Farqînî hat îstîfadekirin.¹ Ji bo hinek peyvên herêmî jî bi Mela Cîhad Bakırhanê neviyê Mela Nûrûllah re şêwir hat kirin. Hinek nimûne li vir hatine rêzêkirin:

Bezaştin (derxistin), bêzî (nefret), bîşî (şewla, hemîya daristanê), boşê giranî (zêde bi qûwwet), çapik (hijdfîn), dilêr (mêrxas), dîzek (kûz), evraz (berjor, qiyame), êvişandin (textsîrkirin), heman (‘eynî), heqî nîne (ne heq e), hila kir (bi dest xist), hinartin (şandin, avêtin), hingeding (qerepere, lêdan), hîre bûn (hîn bûn), ji birsan (ji birçînan), kencaf (şemate, heytehol), kudandin (bi rê ve çûyîn), mamo (ey apê min), nêv (nava), nihandin (bi dawî kirin), nuşûv (serberjêr), periştin (teftêş/kontrol kirin), pîgar (kesê alîkar, destek dide), pîk (xeberbêj), pûlûr (pelûr, têkilhev), qepaçe (dorpêç, şidyayî), qerizî (qerimî), qerzîl (pel), rehîştin (hılanîn), rihakî (xelaskî), sil (tirsîn), şûrhingivîn (şerê bi şûran), teka kir (‘effû kir), tilp (durd, tort), tîrhingiv (tîravêj), vijî (vala), welê (hêla Botî û Hekkarî), wisan (hêla Diyarbekir, Batman), xalet (xaltîk), zikê defter (zik li hêla Farqînê tê gotin), zo (bi me’na encax).

Ji ber ku bi devoka Serhedê ya hêla Bedlîs û Mûşê nivîsandîye, peyvên Tirkî jî bikar anîne. Di vê devokê de di xebirdanên rojane de, carna peyvên Tirkî tînan gotin. Peyvên Tirkî yê ku Mela Nûrûllah di nezma xwe de bikar anîne, di jêrenotan de

¹ Zana Farqînî, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, İstanbul 2013.

hinek bi wateya xwe Kurdî hatine dayîn, hinek jî ji ber ku di Kurdî de jî bi heman wateyê ne di jêrenotan de nehatine dayîn. Hemî peyvên Tikrî yên hatine bikaranîn ev in:

ade: girav, ateş: agir, başqe: dîtir, bayloz: hors, geran, beyraq: ala, beyreq, boğaz: gewrî, qirik, boş: vala, bulûk: kom, bölük, çamûr: herrî, çapa: ‘ewn, çaba, çayir û çîmen: mêrg û zêrçin, çop: çop, ting, degiş kir: guherand, dizgîn: hevsar, dîdîqodî: paşgotinî, dîlek: daxwaz, dîrik: dîrek, dizgûn: serrastkirin, doşek: nivîn, dûz: rast, engel: asteng, mani’, êpe: gelekî, epey, geber bû: mir, gemîçî: keştivan, înan: bawer, yeqîn, kağid: kaxiz, kotî: xerab, lanbew fener: lembe û fener, loqme: parî, miğare: şikeft, mûroğ: yextîyarê hezizî, orta/orte: nav, navîn, qaf: serî, qarşî: li hemberê, qelawuz: rêber, qoç: beran, sağ: rast, şalî: roja sêşembê, tawe: miqilk, tava, taze: teze, terr, temîz: paqij, top: civandin, kombûn, yardım: alîkarî, yatağ: nivîn, yeğme: talan, yoldaş: rêheval, zopek: qutek dar, sopa

Li gorî devoka Botî, herfa “t”yê anîye pey lêkeran. Mîna bikêşit, biçit, têt, nemînit hwd. Li gorî devoka herêma Bedlîsê jî peyva “çan”ê pir bikar anîye. Çan bi me’na çawan e. Dîsa bi vê devokê peyva “hîre” bi wateya hînkirin / ‘elimandin bikar anîye.

Her wiha morfema “di”yê wek şairên klasîk di nezma xwe de bikar anîye. Mîsalek li jêr hatiye dayîn.

Hemû ehdê di wî mîşaqê wan bû

Hemû cehdê di wî ewşaqê wan bû (r. 79)

Cihat Bakırhan di teza xwe de ji vê morfemê re dibêje “pêveka piraniyê”² Hayreddin Kızıl di maqaleya xwe de dûr û dirêj li ser vê morfemê sekiniye. Li gorî gotarê, morfem ji bo tekîdê/pitkirinê hatiye bikaranîn ne ji bo piraniyê.³ Di vê mîsala li jêr hatiye dayîn, ev yek diyar e. Di vê beytê de peyva “şems” peyveke yekjimar e.

Çikû şemsa di wan hey bêzewal e

We seşwa wan jî hey hey bêmelal e (r. 91)

² Bakırhan, *Çenta Yetîman*, r. 35.

³ Hayreddin Kızıl, “*Di”Ya Kırpandinê/Tekîdê Di Kurmancî De*” Kovara Enstîtuya Zimanên Jîndar a Zanîngela Bingolê, c. 5, hej. 10, 2019, r. 47-74.

Di hinek beytan de peyva “ji bo ra” bi me’na “ji wî re” bikar aniye: **Jibo ra anî Cebraîl du şasek**. Dîsa di hinek deveran de “ji ta” bi me’na “ji te ra” bikar aniye.

Di hinek deveran de qertafa “ê”yê anîye dawîya lêkeran û xisûsiyeteke cûda daye wan, kiriye qertafa cînavkê. Gava ku Helîma Se’dîya, pêxember jibo şîrdanê bi xwe re dibe, jinê din ji Helîmê re hin tiştan dibêjin. Nivîskar vêya weha dinezmîne: **Digotanê jinê ‘eyla hevalan** yanî “digotin wê”, jinên malbatên hevalan ji Helîmê re digotin. Dîsa di mijara hedîsa Şeqqus Sedr de weha pêvekê tîne dawîya fiîlê: Helîme zû gehiştê go çi hal e. “gehiştê” yanî “gehişte wî”

Carna jibo xurtkirin û kurtkirinê û jibo weznê, peyv kin û sivik kirine û devoka herêmî bikar aniye. Ji dêleva “Qur’ana me” gotiye “Me Qur’an, nasixê her defteran e” Di şûna “bigerîne”yê ya bi me’na bike, “gêre” gotiye.

Di zimanê ‘Erebî û Farisî de şareza ye. Haya wî ji Osmanî û Tirkîya nûjen jî heye. Ji lew tê de peyvên ‘Erebî û Farisî gelek in. Sebebê vê yekî ev e ku hem mijar sîyer e, mijareke Îslamî ye, behsa gelek babetên dînî dike; hem jî li gorî adet û metoda hûnandina eserên menzûm ên ji nav medreseyan derketine, divê peyvên Farisî jî di xwe de bihewîne ku li cem edebîyatnasan bi qîmet be. Lewra Farisî li nav ehlê medresê, yek zimanê helbestê tê hesibandin. Mela Nûrûllah hem peyvên Farisî, hem jî hinek edatên Farisî bikar anîne. Peyvên Farisî di jêrenotan de bi wateya xwe Kurdî hatin diyarkirin. Nêzî 130 heb peyvên Farisî hatine gotin. Ji bo peyvên Farisî carna ji ferhenga Arif Etik⁴ û ji ferhenga Osmanî-Tirkî ya ansîklopedîk⁵ hat îstîfadedekirin. Li vir hinek wek nimûne hatine rêzêkirin:

Ba/be (bi), bed (xerab), çehar (çar), daniş (‘ilm û zanîn), der (li), dilkuşa (dilrihet), dirûg (derew), dîger (dîtir), durust (rast, durust), ez (ji), gedenfer (xezanfer), goşîdar (guhdar), gûş (guh), hergîz (qet’îyen), kemalateş (kemalatên wî, di vir de pêveka “eş” Farisî ye), lahorî (şûrek), nehwet (nod), nîk (xweş, qenc), peyember (pêxember), salar (mezin), sîlehşor (çekdar), sîpah (esker), şîr (şêr), xerûş (qêrîn), xûb (qenc, baş), zîndeganî (jîn, heyat), zuban (ziman) ...

⁴ Arif Etik, *Farsça-Türkçe Lûgat*, Salah Bilici Kitabevi Yayınları, İstanbul 1968.

⁵ Abdullah Yeğin, - Abdulkadir Badıllı, - Hekimoğlu İsmail, - İlham Çalım, *Osmanlıca -Türkçe Ansiklopedik Büyük Lûgat*, Türdav, İstanbul 1992.

Mela Nûrûllah, hinek peyvên ‘Erebî jî li gorî rêzimana Kurdî bikar anîne. Şemm, bihnkirin e. Pêveka “and”ê anîye dawîyê û kiriye şemmandî. Dîsa “rekîb” peyveke ‘Erebî ye û bi me’na “lê siwarbûn” e. Pêveka Kurdî “dar” anîye dawîya wê û kiriye “rekîbdar”ê bi me’na kesê rêhevaltiyê dike, jibo Cibrîlê emîn ev peyv bikar anîye.

Mela Nûrûllah, carna hinek peyvên ‘Erebî yên mê wek nêr bikar anîne. Mîna: “*Di dil da nûrê îmanê bi cî bû*” di vê misrayê de “nûr” peyvek mê ye, divêya bigota “nûra îmanê” “*Li wan hilde şedayê xwe mubarek*” di vê misrayê de jî peyva seda, wek nêr hatiye bikaranîn. “*Bikem raşet vexwem vê avê hanê*” Dîsa di vê misrayê de jî peyva “av”ê Kurdî ye û mê ye, lê şair wek nêr bikar anîye. Di vê misrayê de jî peyva “talan”ê wek nêr bikar anîye: “*Di Îslamê eva talanê ewwil*” Di misra “*Be sirra sîne û îmanê safî*”yê de jî “îman” wek peyveke nêr hatiye bikaranîn. Di vê qismê de “*Xuda baranê reşmet şande ser wan*” peyva “baran”ê peyveke Kurdî û mê ye, lê wek nêr hatiye bikaranîn.

Di nezmê de zêdetirî neh sed peyvên ‘Erebî jî hatine bikar anîn ku di Kurdî zêde nayên zanîn. Ev peyv di jêrenotan de bi wateya xwe ya Kurdî hatin diyarkirin. Peyvên ‘Erebî yên ku Kurdî de tên bikar anîn û wateyê wan tên zanîn, neketin vê hejmarê. Ji bo peyvên ‘Erebî ji ferhenga Mevlût Sarî⁶ û Mufredata Raxib El-Îsfahani⁷ hat îstîfadekirin.

Digel van xisûsiyetan, Mela Nûrûllah di vê sîyera menzûm de li gorî rewşa mijaran, hest û heyecana xwe di beytan de nîşan daye, di cîyê şahî û qenciyê de şukra Xwedê anîye zimên, di cîyê dilêş û huznê de jî xemgîniya xwe xuya kiriye. Her wiha di beyt û misrayan de pirê hunerên edebî bi hostayî bikar anîne. Bi wezna arûzê, bi kafiyyên zengîn jî aheng û sewta peyvan xurt kiriye. Di mijara wîladeta pêxember de weha şahîya xwe dibêje:

Xudaya! Şadîya me newgiha ye

Şefaa me bulend e, bêbiha ye (r. 85)

Li ser şehadeta Hz. Hemze (r. ‘e) jî weha dibêje:

⁶ Mevlût Sarî, *El-Mevarid Arapça-Türkçe Lûgat*, İpek Yayınları, İstanbul

⁷ Rağîb El-Îsfahani, *Mufredat Kur’an Kavramları Sözlüğü*, Çapa Çarem, Yarın Yayınları, İstanbul 2015.

Gelek zor û giran bû nekbeta ha

Fe wahren summe wahren summe waha⁸ (r. 208)

Ergatîvî tayebetîyeke zimanê Kurdî ye. Li gorî vê xisûsiyetê di hemî demên borî de dema di hevokê de bireser hebe, lêkera gerguhêz li gorî bireserê tê kişandin.⁹ Mela Nûrûllah carna guhnedaye vê qaîdeyê. Lê carna jî xweşik bikar aniye. Her weha tewandina nav û peyvên jî di hinek ciyan de der qaîde bûye. Lê dema hatiye bikaranîn, qenc li ser hatiye sekinîn. Sebebê vê yekê ew e ku li gorî wezna berhemê çûye. Li jêr hinek nimûne hatine dayîn:

Dema wildî diya wî şîrî daê (r. 91)

Di vê misrayê de peyva “şîr” peyveke nêr e, hatiye tewandin û bûye “şîrî” Her çiqas tewandina peyvê rast be jî, dem dema borî ye, li gorî qaîdeya ergatîvê divê peyva “şîr”ê ku bireser e, nehata tewandin. “Wildî” jî bi me’na “welidî” ye. “daê” yanî “daye wî”

Ji wana şewqê da ser ummetê jî

Temam hildan bi wî hem dewletê jî (r. 91)

Di vê beytê de peyvên “şewq” û “ummet” û “ew” rast hatine tewandin û bûne “şewqê” û “ummetê” û “wî”. “dewlet” divê nehata tewandin, lê ji bo weznê hatiye tewandin.

Ji Mîkaîlî ra Cîbrîl digo hem

Werîn teştek zerîn ez abê zezem (r. 109)

Di vê beytê de navê “Mîkaîl” ji ber daçeka “jî”yê rast hatiye tewandin û bûye “Mîkaîlî”

Resûlullahî qemçek jê hilanî

Di dev werda we rêhte nêvê kanî (r. 326)

Di vê beytê de jî misra ewil, dema borî nîşan dide. Peyva “Resûlullah” kirde ye û rast hatiye tewandin, bûye “Resûlullahî” Peyva “qemçek” jî bireser e. Bi wateya

⁸ Gelek zor û giran bû ev felaketa ha, wax tiştê hatî serî wax tiştê hatî serî

⁹ Samî Tan, *Rêzimana Kurmancî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2011, r. 85.

kulmeke av e. Li gorî rêzika ergatîvê nehatiye tewandin û rast hatiye bikaranîn.
“Hilanî” fîleke derbasok e.

5. ŞÊWAZA MELA NÛRÛLLAH

5.1. Navê Berhemê

Mela Nûrûllah, li vê xebata xwe navê “*El-cewahîru’r-Reşadiye Fî Sîretî’n-Nebewiyye*” daniye. Dema tayîna wî ya resmî derdikeve, diçe nahîyeya Sorpê (Reşadîye) ya Tetwana Bedlîsê, dibe îmamê resmî, pazdeh salan li wê derê dimîne. Ne diyar e ku bi navê kitêbê bal vî navê gund ve kînaye kiriye yan na.

5.2. Sebebê Nezmîndina Berhemê

Mela Nûrûllah sebebê vê nezma xwe di van beytan de weha tîne zimên ku di wê wextê de kesek li ser vê mijarê nexebitiye, ji lew ew ketye vê rêyê.

Ji destê bêkesî ketme pîyasê

Li xwe wergirtîye min vê kirasê

Ji destê bêkesî navê mi mîr e

Çikû rovî di xalî çolê şîr e

Gerandin çehvê xwe lawan nedîn kes

Ji bil vî Nûrîyê naçîz û nakes (r. 77-78)

5.3. Sebebê Hûnandina Bi Kurdî

Li gorî Mela Nûrûllah berhem ger bi zimanê Kurdî be, hem di vî warê de kitêbên bi Kurdî zêde dibin, hem jî xelk bi Kurdî behsa ji pêxember pir dicibîne. Lewra xelkê Kurd zêde muhîbê pêxember e. Di meclîs û civatan de gava behsa heyata pêxember tê kirin, gelekî guhdar dikin û ji hev re dibêjin. Hem ji bona ku kesên ecnebî zimanê Kurmancî, li hember milletê Kurd nexebitînin. Di van beytan de sebebê nivîsandina bi zimanê Kurdî dibêje:

**Bi ezmanê me bit da em bimînin
Kîtabê me bi ezmanê me kê m in**

**Ji eşnafê umem Kurdê me çêtir
Muhibtir bûn jibo wê xeyrê çêtir** (r. 78-79)

5.4. Baweriya Bi Gotina “Lewlake Lewlake”

Mela Nûrûllah jî weke gelek şairên aşiqê pêxember, di wê baweriyê de ku ewilî nûra pêxember hatiye xuliqandin, paşê kaînat hatiye afirandin, nûra Hz. Mûhemmed, sebebê xulqeta kaînatê, ‘efûbûna Hz. Adem e. Mîna gelek van helbestvanan, bi baweriya gotina “*Lewlake lewlake lema xelegtul eflak*” yanî “(Ya Mûhemmed!) Ne ji te ba, min ev kaînat nedixuliqand” hûnandiye. Hinek ‘alim dibêjin ku ev gotin ne hedîs e, lê gotineke rast û di cî de ye. Hinek jî dibêjin hedîseke zeîf e. Hedîs di van berhemana de derbas dibe: Aclûnî, *Keşf-ul Hafâ*, 2/164; Aliyy-ul Qarî, *Şerh-uş Şîfa*, 1/6.

Mela Nûrûllah ev baweriya xwe di van beytên xwe de weha nezmandiye:

**Dila Ehed hebû ‘alem nebû hêj
Hebîbê rebbî bû Adem nebû hêj**

**Ji nûra wî bû Adem hate kewnê
Çewan kullî mukewwen hate lewnê** (r. 86)

5.5. Bangiya Li Qelemê

Mela Nûrûllah, dîsa weke şairên berîya xwe yê medreseyê, di nezmandina berhemê de bangî qelemê dike. Di vî warî de xisûsen di mijara mî’raca pêxember de daye ser rêça Şêx ‘Evdirehmanê Aqtepî. Di serê beytên ewil ên qismê sebebê nezmandina kitêbê de weha bangî qelemê dike:

**Qelem furşet ji meydanê hilîne
Di meydana te beşlek xaşî nîne**

**Li hev bade tu tîlê her zemanan
Xeber de tu bi her new‘ê zimanan** (r. 74)

Şêx ‘Ebdurrehmanê Aqtepî jî di Rewdîne‘îma xwe de gelek caran bangî qelemê dike.

We be’dû were ey qelem guh bidêr

Di emrê me qaîm bibe şubhê şêr

Di vî warî de Mela Fethîyê Hezroyî jî bangî qelemê kiriye û bi qasî 124 malikan qesîdeyek hûnandiye.¹

5.6. Hinek Taybetiyên Din Ên Berhemê

Mela Nûrûllah, kiriye meqsed ku xelk heyata pêxember bi Kurdî bixwîne, jê agahdar bibe. Siyera pêxember jî li gorî çavkaniyên di warê siyerê de saxlem hûnandiye. Weka metoda edebiyat û medreseyê, nezma xwe mîna mesnewiyên berî xwe ava kiriye. Ji hêman û şêwaz û gotinên şairên berîya xwe îstîfade kiriye. Zêde li ser mî’rac û şemaîla pêxember sekinîye.

Hem siyer hem jî şemaîl anîne cem hev. Ev taybetiyeke wî ye. Taybetiyeke din jî ew e ku di dawîya kitêbê de nasîhatnameyeke dirêj ji bo xwendekar û xelkê hûnandiye. Her wiha nezma xwe bi biwêj û îfadeyên neqane dewlemend kiriye.

¹ Cihan Turan, Teza Lîsansa Bilind, *Dîwana Fethî, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Jîndar, Bingol 2017, r.30.*

6. JI ALIYÊ RÛXSARÎ VE BERHEM

6.1. Serencama Nusxeya Destxetê

Li gorî beyana Sefa kurê Mela Nûrûllah, ji Yakoya (Ûnaldî) gundê Bedlîsê feqiyekî Mela Nûrûllah, dibe ku navê wî ‘Ebdulezîz be lê ne emîn e, bi armanca ku li Lubnanê çap bike ji seyda xwe vê nezmê dixwaze û diçe. Lê ji ber şer û aloziya navxweyî ya li Lubnanê ya di navbera salên 1975 û 1980yî de, careke din tu saloxê ji vî feqiyê hîlnaynin. Di heqê destxetê de jî tu agahiyê bi dest naxin.¹ Lê berîya ku destxetê bibe Lubnanê, dîsa feqiyekî wî bi navê Mela Fadilê ji Koxaka Bilanixê, ji orjînalê destxetê, dinivîse û ev destxet bi vî awayî hatiye parastin. Niha ya di destê kurê Mela Nûrûllah de ev nusxe ye. Di destpêkê de derbarê vê destxetê de agahî hatibûn dayîn.

6.2. Teşeyê û Naveroka Destxetê

“*El-cewahîrur-Reşadiye Fî Sîretî'n-Nebewiyye*” xebateke mesnewî ye. Tê de siyer û şemaîl û evîna pêxember, mu'cîzat û xezweyên pêxember, seriyyeyên eshaban hatine nezmandin. Mêranî û pehlewaniya hevalên pêxember hatiye hûnandin. Di dawiyê de jî pendnameyeke dirêj heye. Ji ber van taybetiyan mesnewiyeke dînî, dîdaktîkî, lîrîkî û epîk e. Ji beytan pêk hatiye. Metoda cotserwayî aa, bb, cc ... ye. Bi besmele, hemdele û selweleyê dest pê kiriye. Bi qaliba arûzê, bi hejmarê 11 heceyan hatiye nivîsandin. Ji Behra Hezecê li ser qaliba nesalim a “*Mefa ‘ilun mefa ‘ilun fe ‘ulun*” hatiye hûnandin.²

Di rûpela berîya fîhrîsta kitêbê de Mela Fadil, hinek gotin û nukteyên seydayê xwe Mela Nûrûllah nivîsandine. Nukteyên ku bi Kurdî nin, bi qafiye nin û heqîqetan nîşan didin, dişebihin gotinên pêşyan. Fîhrîst û sernavê her mijareke berhemê, bi

¹ Bakırhan, *Çenta Yetîman*, r. 29.

² Ji bo mijar û cûreyên mesnewiyan bnr. Abdurrahman Adak, *Teşeyên Nezmê Di Edebiyata Kurdî Ya Klasîk De*, Nûbihar, Çapa Yekem, Stenbol 2019, r. 273-344.

‘Erebî hatine îfadekirin. Xezwe li dû hev hatine behskirin. Her weha serîyye, qebûlkirina heyetan û heyetên hatine şandin jî li dû hev hatine nezmandin. Di qismên dawîyê de şemaîla pêxember, zar û zewceyên Wî, mam û metikên Wî, kole û xizmetkarên Wî, eşya û heywanên Wî jî hatine behskirin. Di dawîya kitêbê de li xelqê hinek şîret û tewsiye jî hatine kirin.

174 sernavên (qismên) berhemê hene. Di serî de fihrist heye, lê heta sernavê 155an, navên mijaran hatine nivîsandin. Yê din di fihristê de nehatine nivîsandin. Piştî fihrist û besmeleyê sebebê nezma kitêbê hatiye nezmandin. Mijarên pey wê bi rêzê weha ne: Nesebê şerîf, weqta hemla wî û wîladeta wî, ‘elametên piştî wîladeta wî, dayikên ku şîr danê û wefata dê û bavê wî, sefera wî ya bal Bûsrayê ve, sefera wî ya bi karwana Xedîcê re, zewaca wî, wezîfedarkirina wî ya bi pêxembertî, mî’raca wî, muslumanbûna Ensar, hîcreta wî û meşru’bûna azanê.

Qismê heyata Mekkeyê, nexasim mijarên îşkenceyên li eshabê pêxember bi kurtasî hatiye behskirin. Lê mijara mî’racê û hîcretê berfireh hatine nezmandin. Mî’raca pêxember bi qasî 304an beytan hatiye hûnandin.

25 qism li ser xezweyan in. Qismek behsa ‘umretul qeda dike, lê di nava xezweyan de nezmandiye. 57 qism behsa seriyeyên pêxember û eshabên wî dikin. 4 qism behsa şandiniyên wî yê bal derûdora ve dikin. Pey re Hecca xatirxwestinê hatiye nezmandin. 30 qism behsa heyetên ku hatine cem wî dikin. 13 qism jî behsa şandina mektûbên wî yê ji melîk û serokan re dikin. Pey behsa mektûban bi rêzê, behsa mu’cizatên wî, wesfên zatê şerîf, wefata wî, xanimên wî, ewladên wî, mam û metikên wî, koleyên wî yê azadkirî, xizmetkar û muhafîzên wî, katib û emîrên wî, şûrkêş û muezzîn û şa’irên wî, sîleh û kinc û eşyayên mala wî dikin. Di dawîyê de jî paşgotina kitêbê û nesîheta li xelkê dihewîne. Li ser temambûna kitêbê bi ‘Erebî pexşanek heye.

Mijarên ku di berhemê de zêde beytan dihewînin ev in: Mela Nûrûllah bi qasî 304 beytan behsa mî’raca pêxember dike. Hejmara beytên hîcrename 106 in. Bi qasî 324 beytan behsa herba Bedrê dike. Bi 213 beytan herba Uhûdê rêstiye. Herba Xendeqê 149 beyt in. Sulha Hûdeybiyeyê bi 173 beytan hûnandiye. Hejmara beytên Xezweya Xeyberê 133 nin. Bi 304 beytan behsa Fetha Mekkeyê dike û bi 153 beytan jî mî’cizyên pêxember dihûne. 107 beyt li ser şemaîla pêxember û 119 beyt jî li ser

wefata wî hatine hûnandin. 121 beyt behsa sîleh û kinc û eşyayên mala wî dike. Nesîhetên li xelkê jî bi qasî 164 beyt in.

Di xebatê de li ser dewra Mekkeyê zêde nehatiye rawestandin. Mijara Hilfil Fudûlê, zaroktî û ciwantiya pêxember pir bi kurtasî hatine gotin. Îşkenceyên li eshabê pêxember, teblîx û îrşada ehlê îmanê, musulmanbûna Mekkiyan, hîcreta Hebeşîstan û çûna Taîfê pir hindik hatine nezmandin. Li Medîneyê jî tevger û têkiliyên civakî û yên bi cihûdan re, avakirina dewleta Îslamî, Wesîqeya Medîneyê, meseleyên malbatî û aborî û ‘îbadî nehatine behskirin. Pir zêde li ser xezwe û seriyye û qebûlkirina heyetan hatiye rawestandin. Gihandin û xwendina zarokan û eshabên pêxember nehatiye gotin. Li ser bûyeran daketina ayetan, nivîsandina ayetan zêde nehatine behskirin. Di jiyana pêxember de meseleyên civakî ji yên herb û seriyyeyan zêdetir in. Pêxember di hukmê 23 salan de li hemî ‘Erebistan û derûdora wê vexwendina dîna Îslamê belav kiriye. Ev tevger û teblîx gelekî hindik hatiye nezmandin. Lê ji aliyê siyerên menzûm ve ji gelek berheman dirêjtir e.

BEŞA DUYEM

SÎYERÊN KURDÎ Û ANALÎZA BERHEMÊ

Di tezê de xebata li ser siyerên Kurdî, tenê bi yên ku bi zimanê Kurmancî û Dimilî hatine nivîsandin ve sînordar e.

1. SÎYERÊN MENZÛM

1.1. El-Hemaîlû Fîş Şemaîlî

Nezma Mela Nûrûllahê Godîşkî ye. Qismek hindik nezmândina siyer e, yên mayî li ser şemaîla pêxember hatiye hûnandin. Bi latînîzekerina Zeynelabîdîn Zinar, berhem di 2007an de ji nav weşanên Dozê de, li ser navê Şêx Fethûllah Werqanîsî çap bûye. Mela Nûrûllah di dawîya kitêbê de li ser qedandina nezmê îfade dîke ku di 1399ê Rûmî, 1983ê Mîladî de li Tetwanê temam bûye.¹

Berhem bi dirêjahî li ser şemaîl û hal û tevgerên pêxember radiweste. Exlaq û tevgera pêxember, boyaxkirin û kilkirina wî, lixwe kirina kincan, nivînên wî, razan û rabûn û rûniştina wî, perestîna wî, îbadet kirina wî, rojîya wî, ken û girî û tinaz û axaftin û xwarin û vexwarina wî, navên pêxember, carîye û jin û zarokên wî, xulamên wî, mam û metên wî, alav û sewal û dewarên wî û heta xîma xanîyê wî jî hatine nezimkirin.

Kitêb bi beşa “**Di Derheqê Xweşiya Xwedê Da**” bi vê beytê dest pê dîke:

Hezaran hezar û hezar qumriyan

Bila ‘ed belabil digel tutiyan²

Bi vê beytê jî diqede:

Fe tem-el kalam û we ebdel meram

Mîn asarî şîmetî xeyrîl enam³

Di van beytan de meqseda nivîsandina Şemaîl wiha tê gotin:

¹ Werqanîsî, *Elhemaîlû*, r. 18.

² Werqanîsî, *Elhemaîlû*, r. 21.

³ Werqanîsî, *Elhemaîlû*, r. 481.

**Ji bona Muhemmed şemaîl bike
Li zendê rîsalet Hemaîl bike**

**Bi durrê di şehwarê Kurdî bin ew
Gelek goşîwarê di rindî bin ew**

**Bila seh biken Kurdî ji xas û ‘am
Şemaîl çi ne yê di Xeyr-îl Enam**

**Çi ku ez dibînim ku pur talib in
Li hubba Nebiyê xwe pur xalib in⁴**

1.2. El-Cewahîru’r-Reşadiye Fî Sîretî’n-Nebewiyye

Ev eser jî nezma Mela Nûrûllahê Godîşkî ye. Destxet e. Siyereke kronolojîk e. Di sala 1967an de hatiye temamkirin. 5024 beyt in. Mela Fadiîlê feqiyê Mela Nûrûllah ji ber orjînalê destxetê nivîsandiye. Temamkirina nuxxeya wî di bîstê Nîsana sala 1978an de qedîyaye. Ji 220 rûpelan pêk tê. Di hinek ciyan de Mela Nûrûllah bi xwe jî bi xeta xwe nivîsandîye.⁵

Kitêb bi van malikan dest pê dike:

**Be navê wî Xwedayê layezalî
Emê hemd û şena ken zatê ‘alî**

**Şelat û hem selamê bînîhayet
Li ser qafîle salarê rîsalet**

**Digel al û şehabê wî kîramî
Şefî’ bin ew temam bo me temamî⁶**

Û bi van beytan jî diqede:

**Şelatullah selamullah bîla ‘ed
Li ser rûhê resûlullah Mûhemmed (w.‘e.s)**

⁴ Werqanîsî, *Elhemaîlû*, r. 30.

⁵ Destxeta Seyda Nûrûllah, di pêvekê de hatiye diyarkirin.

⁶ Godîşkî, *Elcewahîrûr Reşadiye*, r. 2.

Li ser al û li ser eşhabê wî hem

Li ezvac û zurrîyatê di wî hem

We hem etba ‘û tevda ummeta wî

Xuûşen çarê yarê heçreta wî⁷

1.3. Rewdu’n-Ne‘îm

Ev berhema mesnewî ya Şêx ‘Evdirehmanê Axtepî ku mijara wê mî’rac û şemaîla pêxember (s.‘e.w) e, di sala 1884an de hatiye nivîsandin. Ji 4513 beytan, ji 35 bendan (qisman) pêk hatiye. Di benda 29an de beşek bi serê xwe li ser şehîdbûna Hz. Hesên û Hz. Huseynê nevíyên pêxember hatiye nivîsandin. Eser bi piranî li ser mî’raca Nebî radiweste, lê behsa şemaîla pêxember jî dike. Zahir Ertekîn di gotara xwe de dide zanîn ku cara ewil di 1966an de bi nivîsa Mela Ehmedê Qoxî hatiye çapkirin. Paşê di 1986an de Mela Zeynelabîn Amedî (Çiçek) bi destê xwe nivîsandiye û li serê şerheke Erebbî jî hazir kirye û çap kirye. Zeynelabîdîn Zinar (Kaya) jî di 1988an de li Swêdê latînzê kiriyê û çap kiriyê. Ev berhem di sala 2011an de li Dihokê ji aliyê Tehsîn Îbrahîm Doskî ve hatiye weşandin.⁸

Bi vê beytê dest pê dike:

Bi namê xwedawendê herdu sera

‘Efûwwû Xefûr û Kerîm û Xuda

Û bi vê beytê jî diqede:

Îlahî tu Rûhî nekî şermîsar

Kerr û lal û gêj e tu nîne medar⁹

1.4. Gulzara Şêx Tahirê Şoşî

Navê kitêbê “Gulzar: Destana Dîroka Bo Misilmantiyê û Jiyana Pêxemberî” (Silavêt Xwedê Li Ser Bin) ye. Ji teref Şêx Tahirê Şoşî (1917-1962) ve hatiye nivîsandin. Menzûm e. Di sala 2012an de li Dihokê, lêkolîner Hemze, ji aliyê Weşanên Hozan ve daye çapkirin. 310 sernav ên biçûk in. Ji 603 rûpelan pêk tê.

⁷ Godîşkî, *Elcewahirur Reşadiye*, r. 219-220.

⁸ Zahir Ertekîn, *Qelem Di Rewdîne’îma Şêx Ebdurrehmanê Aqtepi de*, Kovara Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Bîngolê, 1:2, Bîngol 2015, r. 8-27.

⁹ Ertekîn, *m.n.*, r. 26-27.

Qism qism û beyt be beyt hatiye nezmanandin. Pesn û methê eshabên pêxember jî hatine kirin.

1.5. Mewlûda Sîyer a Xerxurî

Xebata Mela ‘Ebdurrehmanê Xerxurî el-Perwarî ye ku di 27ê Şe’bana 1431ê Hîcrî, 2009ê Mîladî de tamam kiriye û di sala 2013an de ji aliyê Weşanxaneyê Duayê ve hatiye çapkirin. Ferqa wê ji mewlûdnameyên din ev e ku hem bi hejmara beytan hem jî bi dirêj behskirina sîyerê ji yên din zêdetir e. Berhem tevî beyta neqaratê 910 beyt in. Ji 15 qisman pêk tê. Hîcreta pêxember û eshabên wî, heta gihaştina Medîne, hatiye nezmanandin. Qismê merheba beşa 13an e û piştî ku pêxember digêje Medîne hatiye nezmanandin. Beyta tekrar dibe jî ev e:

Ger dixwazin hun herin darus salam

Her bidin daîm selatû hem salam

Li ser dewra Mekkeyê hatiye rawestandin. Li gorî kitêbên derbarê siyera pêxember de hatiye nivîsandin. Zimanê wê ji aliyê xelqê ve tê fêmkirin, bi qaliba arûzê hatiye hûnandin. Qismê dawîn du‘a ye. Mewlûda Sîyer bi vê beytê dest pê dike:

Hemd jibo rebbê me rebbê îns û cin

Rebbê kewn û masîwa ‘erşê mezin¹⁰

Bi vê beytê jî diqede:

Hûn jibo pêxember û mew salihan

Al û eshaba bixweynin fatîhan¹¹

Weşanxaneyê berhem hem bi herfên soranî, hem jî bi herfên latînî daye nivîsandin û çapkirin.

¹⁰ ‘Ebdurrehman Xerxurî, *Mewlûda Sîyer*, Weşanxaneyê Dua, Stenbol 2013, r. 5.

¹¹ Xerxurî, *h.b.*, r. 63.

2. SÎYERÊN PEXŞAN

Di vê dewra paşî de siyerên pexşan, bi zimanên cûrbecûr zêde derketine ku êdî bi awayekî zanebûn hatine amadekirin. Hinek xîtabî zarokan, hinek xîtabî ciwanan dikin û hinek jî ji bo mezin û xwendekaran hatine amadekirin. Her yek bi şiklê ku xwînerên wê jê îstîfade bikin, xweşik hatine çapkirin. Her weha hinek ên ji bo zarok û ciwanan, bi resmên balkêş jî hatine neqîşandin. Hinek ên bi zimanê Kurdî ku hatine nivîsandin ev in:

2.1. Di Roniya Qur'anê de Dîroka Pêxemberan

Kitêb behsa heyeta pêxemberan dike, armanca şandina pêxemberan, wezîfeya wan, qissetên pêxemberan dihewîne. Ji aliyê Mûrad Celalî ve hatiye nivîsandin. 175 rûpel in. Bi elfabeya latînî ya Kurdî hatiye nivîsandin. Çapa yekem di sala 2007an de ji teref weşanxaneya Nûbiharê ve hatiye weşandin.

2.2. Reng û Rûyê Pêxember

Navê berhemê “Şemaîla Nebî, Reng û Rûyê Pêxember” e. Xebata Mela Husnî Hezîn e. Ji navê pirtûkê jî diyar e, li ser şemaîla pêxember e û bi Kurdî ye. Bi elfabeya ‘Erebî hatiye weşandin. 240 rûpel e. Di sala 2009an de ji aliyê Nûbiharê ve cara ewil hatiye çapkirin. Hal û tevgerên pêxember, cil û bergên wî, alav û eşyayên wî, rabûn û rûniştina wî, li ser hinek rewşan duayên wî, vexwarina wî, tiştên di jiyana pêxember de hatine diyarkirin.

2.3. Sîyerê Nebî Bi Ziwanê Dimilî

Ev sîyer weka ji navê wê jî tê fêmkirin bi zimanê Dimilî (Zazakî) ye, ji aliyê Mela Cımayo Babij ve hatiye amadekirin. 104 rûpel e û di sala 2009an de ji teref Nûbiharê ve hatiye çapkirin.

2.4. Dîroka Jiyana Pêxemberan Ji bo Biçûk û Zarokan

Xebat, wergera esera Ebu'l Hesên en-Nedwî ye. Ewilî ji nav berhemên Weşanên Nûbiharê bi navê “*Qisseyên Pêxemberan Ji Bo Zarokan*” di sala 2010an de bi qasî 192 rûpelî, bi wergera Mela Muhemmed Bêrkevanî hatiye çapkirin.

Wergera berhema bi navê, *Behcetü'l-Mutteqîn fi Tercemet-i Qissesî Nebiyyîn* a Ebu'l Hesên Elî el-Hesên en-Nedwî, bi nivîsa nesixê hatiye nivîsandin. Rêzên rûpelan 16 in. Rûpelên berhemê bi numero ne. Di rûpelan de peyva teqîbê heye. Di qeyda temmetê de sala qedandina wergerê hatiye nivîsandin. Berhem bi tevî fihrista xwe 225 rûpel e. Zimanê wergerê rewan e û bi awayekî vegotina dersdayîna medreseyan hatiye çêkirin. Zeynelabidîn Amidî, teqrîza Seyyîd Kutub û pêşgotina Elî el-Hesên a di serê berhemê de jî wergerandiye Kurdî. Berhema ku çap bûye jî 432 rûpelan pêk tê. Ji aliyê Weşanxaneyê Nursabahê ve li Libnanê di sala 2012an de hatiye çapkirin. Di dawiya berhemê de Amidî li ser xebata xwe wiha nivîsandiyê:

“Ev tercuma bi navê Dîroka Jiyana Pêxemberan Ji bo Biçûk û Zarokan temam bû li ser destê werger Zeynelabidînê Amidî kurê Mele Remezan. Hêvî û rica min ji Rebbê muste‘an da ku pê menfe‘et bidit zarok û tîfalên kurmancan. Û di roja heşrê de ji bo min bibit wasita xelasiya ji ‘îqab û ‘ezaban. Ya Rebbî tu ji bo me nesîb bike çûna bal bihiştan ji bo xatirê xatemê enbiyan. Amîn. Tarîxa temambûna tercumeyê 20ê zîlhîcce 1430ê hîcrî, 7ê kanûna pêşîn 2009ê miladî, Diyarbekir.”¹

2.5. Jiyana Pêxemberê Me Hz. Muhemmed

Ji teref Mûrad Celalî ve hatiye amadekirin. Xebateke îlmî û lêkolînî ye. Gelek kitêbên derbarê siyera pêxember de hatine vekolîn û ev kitêb li gorî wan çavkaniyan hatiye nivîsandin. Kîtab 640 rûpel e. Bi herfên latînî ya Kurdî hatiye amadekirin. Di sala 2011an de ji aliyê weşanxaneyê Nûbiharê ve cara ewil hatiye çapkirin.

2.6. Siyera Nebî

Ev siyer jî aliyê Ebu'l-Hesên en-Nedwî ve hatiye nivîsandin. Jibo zarokan hatiye amadekirin û li nav alema Îslamê gelekî belav bûye. Ev eser bi armanca ku zarok bi zimanê Kurmancî heyata pêxember hîn bibin, jî teref Mela Mûhemmed Bêrkevanî ve hatiye wergerandin. 152 rûpel e û di sala 2011an de weşanxaneyê Nûbiharê ew çap kiriye.

¹ Zeynelabidîn Amidî, *Jiyan Berhem Û Xebatên Wî Yên Destnivîsî*, Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Mardin, r. 40.

2.7. Jiyana û Tekoşîna Hz. Muhemmed

Ev berhem jî îlmî ye, bi lêkolîna li ser siyera ji teref Said Özbey ve hatiye amadekirin. Kitêb 200 rûpel e. Bi elfabeya latînî ya Kurdî hatiye hazirkirin û ji aliyê weşanxaneyê Bangaheq ve di sala 2013an de hatiye çapkirin.

2.8. Pêxemberê ‘Alemê Hezretî Muhemmed

Doç. Dr. Abdulhadi Timurtaş li ser xebitîye û ev berhem derxistiye holê. Ev siyer ewilî ji nav weşanên Nûbiharê, wek xebata ‘Ebdullah Botî bi navê “*Pêxemberê Umemtê Hz. Muhemmed*” hat çapkirin. Çapa çarem di sala 2014an de derket. Kitêb ji aliyê Serokatîya Karên Dîyanetê ve jî di mijdara 2015an de bi navê “*Pêxemberê ‘Alemê Hz. Muhemmed*” hatiye çapkirin.

2.9. Jiyana Pêxemberê Xuda

Ev siyer ji aliyê Muhammed Rida ve hatiye nivîsandin û Mela Îbrahîm Xelîl el Amedî jî ew wergerandiye Kurdî. 654 rûpel e û ji teref Weşanxaneyê Seyda ve di sala 2016an de hatiye çapkirin.

2.10. Kovara Siyer

Kovara bi Tirkî ya bi navê “Siyer Çocuk” di rêvebirîya Meshher Şeker de û bi editoriya Muhammed Ali Alioğlu hatiye wergerandin bal Kurdî ve. Kovara bi Tirkî sê meha carekê der tê. Hem a lêkolînê hem jî a jibo zarokan heye. Hemî hejmarên Tirkî nehatine wergerandin. Tenê çend heb in. Hejmara diduwan a Nîsan-Gulan-Hezîranê di 2017an de hatiye weşandin.

2.11. Pêxemberê Min

Ev siyer jî jibo zarokan e û her weha werger e. Siyer ji teref Feyzûllan Zerey ve bi zimanê Tirkî hatiye amadekirin. Sê cildên biçûk in. Weşanxaneyê “Yarım Elma”yê di 2019an de ev xebata Tirkî daye çapkirin. Mamoste Farûq Şemrexî û Mustefa Rêzan ev xebat wergerandiye Kurmancî. Lê ev wergera bal Kurmancîhê ve nehatiye çapkirin.

3. WEZN Ê SERWAYÊN BERHEMÊ

3.1. Qaliba Arûzê

Her du beytên ewil ên Elcewahîrê ev in:

Be navê wî Xudayê layezalî

Emê hemd û sena ken zatê ‘alî

Selat û hem salamê bênhayet

Li ser qafîle salarê rîsalet

Li jêr di vê beytê de heceyên kurt bi “+”yê û yên dirêj jî bi “-”yê hatine nîşandan:

Selat û hem / salamê bê / bênhayet

+ - - - + - - - + - -

Li ser qafî / le salarê / rîsalet

+ - - - + - - - + - -

Li gorî weznê herfên “ê” û “î”yê carna dirêj û carna jî kurt hatine bikaranîn. Li gorî vê weznê, Mela Nûrûllah, nezma “*Elcewahîrur Reşadîye Fî Sîretîn Nebewîyye*”yê ji Behra Hezecê bijartîye û wezna wê li ser qaliba nesalim a “*Mefa ‘ilun mefa ‘ilun fe ‘ûlun*” hûnandiye. Ji yanzde heceyan pêk tê.

Wezna vê berhemê ji ya mewlûdnameyan û ji ya Elhemaîlû Fîşşemaîlîyê cûda ye. Lewra pirê mewlûdnameyan ji Behra Remelê, bi qaliba nesalim a Fa‘ilatun fa‘ilatun fa‘ilunê ve hatine nivîsandin.

Wezna Elhemaîlû Fîşşemaîlîyê weha ye: Behra Muteqarîbê, qaliba nesalim e. Wezna berhemê jî *Fe ‘ûlun fe ‘ûlun fe ‘ûlun fe ‘ûl* e. Her du beytên ewil weha ne:

Hezaran / hezar û / hezar qum / rîyan

+ - - + - - + - - + -

Bîla ‘ed / belabil / digel tû / tîyan

+ - - + - - + - - + -

Tezerwan û şehîr û goyîn û we qaz

Remêl û quling û kewê hûlqebaz

Mela Nûrûllah, herdu berhemên xwe Elcewahîr û Elhemaîlû bi awayê serkeftî bi qalibên arûzê hûnandine.¹

3.2. Ji Serwayên Berhemê Hinek Nimûne

Ji serwaya “*Elcewahîrur Reşadiye*”yê hinek nimûne li jêr hatine dayîn.

Leqayê fexrê ‘alem bû li Cuħfe

Be hecret ew jî bû xwey behr û tuħfe (r. 291)

Di vê beytê de peyvên “Cuħfe” û “tuħfe” di dawiya misrayan de ne û herdu jî kok in. Tu herfê din li wan zêde nebûye. Ji lew di vê beytê de redîf tune ye, yanî beyt bi bêpaşserwa ye. Serwa yanî qafîye di herdu peyvên dawîn de ye. Ahenga di herdu peyvên de bi “uħfe”yê pêk hatiye. Ji lew qafiyeya beytê “uħfe” ye.

Li hev berhev bike muşterîyê xwe

Ji nav nase ji dil can merîyê xwe (r. 77)

Di vê beytê de peyvên “muşterî” û “merî” kok in. Di herduyan de ahenga wek hev bi “erî”yê pêk hatiye. Ji lew serwa “erî” ye. Tiştên li herdu peyvên zêde bûne redîf in, yanî paşserwa nin. Redîf jî ji “yê xwe”yê pêk tê.

Hemû ehdê di wî mîşaqê wan bû

Hemû cehdê di wî ewşaqê wan bû (r. 79)

Her wiha di vê beytê de jî di misra ewil de “mîşaq” û di misra dudan de “ewşaq” kok in. Di herdu peyvên de qafîye bi “şaq”ê pêk hatiye. Herf û bêjeyên li herdu peyvên zêde bûne jî redîf in. Redîf bi “ê wan bû”yê pêk hatiye.

¹ Ji bo behr û qalibên helbesta Kurdî bnr. A.Rahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Nûbihar, Stenbol 2013, r. 334-340.

4. HUNERÊN EDEBÎ YÊN BERHEMÊ

Di “*El-cewahîru’r-Reşadiye Fî Sîretî’n-Nebewîyye*”yê de gelek huner hatine bikaranîn. Li jêr di mîsalan de, di nava parantezan de hejmara ewil, nimroya sernavê mijara berhemê ye, hejmara din jî nimroya rûpela ku mîsal tê de derbas dibe nîşan dide. Hunerên hatine bikaranîn ev in:

4.1. Teşbih: Di navbeyna du tiştên ku bi çend awayî dişibin hev de şibandina yê lawaz bi bal ê xurt ve ye. Di vê şibandinê de piranî edatên “weke”, “mîna”, “şibhê”, “şubhetê”, “mislê” û wekî din têne bikaranîn.¹

Îlahî şubhê barana biharê

Li ser qebra wî rehma te bibarê (37 / 264)

Şair, “rehmeta îlahî” dişibihîne barana biharê. “Rehmeta Îlahî”, tê şibandin. “Barana biharê”, lê tê şibandin. “Şubhê”, daçeka şibandinê ye. “Barîn”, hêla şibandinê ye.

Li wê bûn Heyder û şiblê Hesen jî

Nikarin bê Nebî em got ewî jî (41 / 286)

Di vê beytê de Hesenê kurê Hz. ‘Elî dişibihîne çêlyê şêr. Şibl çêlyê şêr e. Ji çar unsûran tenê ya tê şibandin û ya lê tê şibandin hene. Evya dibe teşbihê belîx.

4.2. Îstî‘are: Peyvek bi meqseda şibandinê di şûna peyveke din de bê bikaranîn, hunera îstî‘arê derdikeve holê. Divê peyv di me’na xwe ya heqîqî de nehatibe bikaranîn.²

‘Elî go: Ruhniya Çavan! Çehvê xwe

Nikam hildem bibînim ber pîyê xwe (38 / 268)

Di vê beytê de bi “ruhniya çavan” cenabê pêxember hatiye qestkirin. Hunera îstî‘ara vekirî pêk hatiye.

¹ ‘Elî Baqustanî, *Mewlûd (Metn û Lêkolîn)*, Amd. M. Zahir Ertekin, Zanîngeha Soran, Çapa Yekem, Hewlêr 2017, r. 42.

² Numan Külekçi, *Açıklamalar ve Örneklerle Edebî Sanatlar*, 6. Baskı, Akçağ, Ankara 2013, r. 51.

4.3. Mecazê Mursel: Bêyî meqseda şibandinê, peyvek di şûna heyîneke ku bi me'neyê têkildarî wê ye de tê bê bikaranîn, jê re mecazê mursel tê gotin. Peyv ne di me'na heqîqî de ye. Di biwêjan de ev celeb huner zêde tê bikaranîn.³

Be emrê asîmanî bû xeberdar

Resûlullah bi wî halî we kirdar (38 / 271)

Di vê beytê de bi “emrê asîmanî” ayeta Xweda yan jî emrê Xweda hatiye qestkirin.

Yeqîn e Nûhî jî lawê Lemek bû

Kurê Metoşleg ji Îdrîsî fek bû (3 / 84)

Di vê beytê de jî “fek” bi me'na xwe ya heqîqî, vebûn an jihevqetîn e. Lê “fek bû” bi me'na welidîn/hatina dinyayê hatiye bikaranîn. Bi vî awayî mecazê mursel pêk hatiye.

4.4. Kînayê: Di edebiyatê de ji ber meqsedekê, hem di me'na heqîqî de hem jî di me'na mecazî de bikaranîna peyvê ye. Di kînayê de him wateya rastî him jî ya mecazî heye. Lê di kînayê de wateya mecazî ji ya rastî xurttir e.⁴

Devê xwe pîs kir û pur îffîra kir

Xwe musteşeq jibo nar û ceza kir (32 / 226)

Di vê beytê de behsa serê munafîqan Lawê Ubeyy hatiye kirin. Peyva “devê xwe pîs kir” bi me'na “gotinê neqenc kir” hatiye bikaranîn.

Evî navî bihîst nava dilê wî

Qeta zanî ku nêze ecelê wî (38 / 269)

Şervanê yehûdî Murehbû, di heyama şerê Xeyberê de gava li pêşber xwe hz. ‘Elî dibîne û navê wî dibihîze zêde ditirse. Şair ev tirs di beytê de nezmandiye. Peyva “nava dilê wî qeta” di me'na “tirseke mezin ket ser wî, taqet pê re nema” de ye.

4.5. Îrsalî Mesel: Jibo xurtkirina fikr û peyvê, di misrayê de bikaranîna gotina pêşiya ye.⁵

³ Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Türk Dil Kurumu, Ankara 2016, r. 414.

⁴ İskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Kapı Yayınları, İstanbul 2004, r. 276.

Ji destê bêkesî navê mi mîr e

Çikû rovî di xalî çolê şîr e (2 / 77)

Di vê beytê de “rovî di xalî çolê şîr e” gotina pêşîya ye. Jibo şexsê xwe gotiye, jiber ku ji wî pêve kesekî din li ser vê mijarê di wê wextê de nexebitiye, yanî meydan jê re maye.

4.6. Tekrîr: Bi meqseda qewîkirina me’nayê, di qîsmeke menzûm yan jî mensûrê de tekrarkirina kelîmeyê yan jî komên kelîmeyê ye.⁶

Mebêj îro şibe lew paşî nîne

Ji ber îro şibe paşî nedîne (2 / 76)

Di vê beytê de peyvên “îro, sibe û paşî” tekrar bûne.

Şena kir ser Xuda her yek şenayek

Nebî go dê bikem ez jî şenayek (11 / 118)

Di vê beytê de jî peyva “sena”yê hatiye tekrarkirin.

4.7. Îstîfham: Raste rast têkildarî heyecanê ye. Bi eşkerebûna heyecan û hestên mîna heyirîn, şefqet, elem, kîn û nefretê derdikeve holê.⁷

Şevêk çan çû û hatî puştî ev dem

Be pût û latê tesdîqa te nakem (11 / 134)

Gava cenabê pêxember, çûn û hatine xwe ya mî’racê eşkere dike, ji muşrîkan Mût’îm dibêje ku çan (çawa) di şevêkê de çûye û hatîye. Li gorî wî ne mumkîn e ku pêxember di şevêkê de here Mescîda ‘Eqsayê û ji wê vegere. Ji lew wê heyirîna xwe bi pirsê tîne zimên.

4.8. Terdîd: Me’na terdîdê, reddkirin e. Di edebiyatê de dawîya vegotinê, bi awayê ku xwendekar texmîn neke bidawîkirin e.⁸

Diborî dî jinek destan we zendan

Li hev hilmiştîye zînatê berdand

⁵ Kûlekçi, *h.b.*, r. 45.

⁶ Dilçin, *h.b.*, r. 452.

⁷ Pala, *h.b.*, r. 240.

⁸ Kûlekçi, *h.b.*, r. 147.

**Nîda da ey Nebîyyê babê Qasim
Bisekne ta ji te tişteke bipirsim**

**Nebî borî, nekir qeṭ îltîfatê
Kî ye go şahibê vê zeyyînatê**

**Digo Cîbrîlî dunya ye eger te
Cewaba wê bida dê ummeta te**

**Hemî vê ra bikirna dost û yarî
Li ser ‘uqbayê bikran îxtîyarî (11 / 116)**

Di heyama mî'racê de jinek ji pêxember re tişteke dipirse û jê dixwaze ku lê bisekine. Cenabê pêxember li gorî exlaqê xwe, rûyê xwe ji kes û pirsan nazivirîne, lê guhnade vê jinikê û lê nasekine. Paşê ji Cîbrîl dipirse ku kî ye. Cîbrîl jî bi cewab dike.

4.9. Teşxîs û Întaq: Gava wesf û xisûsîyetên însanî li heyînên xeyrî însan mîna yên candar û eşya bikin, ev dibe teşxîs. Gava evan heyînên xeyrî însan bêne axaftin, ji vê re dibêjin întaq. Di her întaqê de teşhîs heye lê di her teşhîsê de întaq tune. ⁹

**Nebî çan çûbû, çûbû garê Sewrê
Bila Sewrê be wê garê ke fexrê (13 / 141)**

Di vê beytê de şa'îr dibêje bila Sewr, bi wê şikeftê bike îftîxarê. Şanazî û îftîxarî wesfeke însana ye. Sewr şikefteke e, lê jiber pêxember li wir maye, bila bi vê îftîxar bike. Di vê beytê de xeberdana heywanekî heye.

**Dibên Ye'fûr kerê fexra rîsalet
Xuda jê ra bulendî kir delalet**

**Nebî wî girt dema Xeyber fetih bû
Dema hat cem Nebî pur munşerih bû**

**Nebî ra kir tekellum pur be şêrîn
Digot ez cem yehûdek bûm di pêşîn**

⁹ Pala, *h.b.*, r. 452-453.

Dibûm ‘aşî li ser wî pîse merdî
Ditirpilyam mi wî davête ‘erdî (162 / 458)

4.10. Sîhrê Helal: Di misra ewil a beytekê de, kelîmeya dawîn yan jî koma kelîmeyan a dawîn meriv karibe hem bi ser me’na misra ewil hem jî bi serê misra dudan ve bixe, ewçax ev huner der tê holê.¹⁰

Nebî go emrê rebbê ‘erş e, î’lan
Bikem vî sîrrê nav koman û ‘îlan (11 / 133)

Di vê beytê de peyva “î’lan” hem li misra ewil tê hem jî meriv dikare bi serê misra dudan ve bixe. Yanî “Nebî go emrê Rebbê ‘erş e î’lan(kirin)” yan jî “îlan bikem vî sîrrê nav koman û mezinan”

4.11. Pirs û Cewab: Di vê hunerê de pirs û cewab di beytê de bi hev re tên bikaranîn.¹¹

Kî nin go ev, ewê geybetgûzîn in
Dibêjit xelqê ‘eybê wan dibînin (11 / 115)

Di heyama Mî’racê de pêxemberê Xuda ji Cibrîl dipirse halê wan kesan, Cibrîl jî cewab dide ku ewên xiybeta xelqê dikin, li ‘eybê wan digerin.

4.12. Tecrîd: Di hunera edebiyatê de tecrîd ev e: Şa’ir xwe mucerred dihesibîne yanî xwe wek kesekî cuda difikire û xîtab dike. Li gorî rewşê bangê kesekî din dike, lê bi rastî xîtabî nefsa xwe dike.¹²

Qelem wergir libasê zewq û şahî
Bireqşe serserî lew bûye şayî
Li şehna defterê ne’re hilîne
Fetiḥ ke muşkîlan her kes bibîne
Bike şadî we şadan ke evînan
Nihayet hatê lew cewra nevînan (41/ 283)

¹⁰ Kûlekçi, *h.b.*, r. 212.

¹¹ Mewlûda Baqustanî, *h.b.*, r. 38.

¹² Kûlekçi, *h.b.*, r. 160.

Di van beytan de şair her çiqas xîtabî qelemê bike jî, muxatab nefsa wî ye.

4.13. Îrsad: Wateya peyvê çavdêrî ye, yanî rasadkirin e. Li gorî hunera edebî jî tê vê me'neyê: Di gotineke kafiyeî de, ewê dawîya îfadeyê çawa bidawî bibe, berî ku biqede bi peyvê yan jî bi me'neyê tê îmakirin. Ji vêya re “tesnîm” jî tê gotin.¹³

**Dibêjin Xalidî seyfê Xuda ye
Xuda bo şewketa dînê xwe daye**

**Bibêjî heqretî Xalid hemû kes
Dinasî wî gelek meşhûr e wî hes** (40/ 283)

Di beyta ewil de methê Xalid tê kirin. Di beyta din de di misra ewil de tê îfade kirin ku gava tu bibêjî Xalid, hemû kes wî nas dikin. Bi peyva “hemû kes dinasî wî” peyva “gelek meşhûr e” îma kiriye.

4.14. Tenasub: Bêyî çêkirina tezaadê, bi hev re bikaranîna dudu yan jî zêdetir peyv û terman e ku ji aliyê wateyê ve nêzî hev in.¹⁴

**We go îzzet Nebî ra yew zelîl î
Tu pîs î, hem tu bêrûy û rezîl î** (32 / 229)

Di misra dudan de peyvên pîs û bêrûy û rezîl bi hev re hatine bikaranîn.

**Zikê defter tijîke durr û cewher
Di kuza xwe tijîke ab û kewşer** (2 / 75)

Di vê beytê de jî peyvên durr û cewher û peyvên ab û kewşer nêzî hev in.

4.15. Leff û Neşr: Bi me'neya lugatî ve berhevkirin û belavkirin e. Li gorî hunera edebî jî ev e: Di misra ewil de di heqê tiştên tîn behskirin de, di misra dudan de hin beyanat tê kirin.¹⁵

**Di mabeyna du şexşê nûrê ummet
Ku Hemzew Ce'ferê Teyyarê heybet** (11 / 109)

¹³ Külekçi, *h.b.*, r. 117.

¹⁴ Pala, *h.b.*, r. 448

¹⁵ Dilçin, *h.b.*, r. 437.

Di misra ewil de dibêje du şexs. Di misra din de jî navê wan dide ku Hemze û Ce'ferê Teyyar in.

4.16. Tefrîq: Jibo mezinkirin û bilindkirina tişteki ji ya din ku bi me'neyekê digihêjin hev, destnîşankirina ferqa navbêna wan e.¹⁶

Munewwer ne wekî şems û qemer bû

Gelek çêtir ji wan û nûrîtir bû (163 / 464)

Şair jibo cenabê pêxember dibêje. Ronî û nûranîyê jibo Wî û Şems û Qemerê bi kar anîye, lê cenabê pêxember ji wan çêtir û nûrîtir îfade dike.

Çiqas merdê dirêjî bê feşalî

Li ber meşya, Nebî bû dîse 'alî (163 / 468)

Dîsa di vê beytê de jî behsa qameta pêxember dike ku kîja kesê dirêj pê re bimeşiya, ewê pêxember ji wî bilindtir ba.

4.17. Tewriye: Di edebiyatê de hunera tewrîye ev e: Kelîmeke ku dudu yan jî zêdetir wateyên wê hebin, wateya wê ya nêz tê gotin, lê ya dûr tê qestkirin.¹⁷

Bibêjit Nûrî bûye kelbê alî

Bila miskîn nemînit der melalî (148 / 436)

Di vê beytê de “nûrî bûye” bi me'na xwe ya nêz hatiye gotin. Yanî ruhnî bûye. Lê meqsed me'na wê ya dûr e ku ew jî Nûrîyê nivîskarê berhemê ye.

Gelo hûn kî ne bêjin hem ji min ra

Nebî got “Em ji avê ne” ji wî ra (20 / 161)

Di vê beytê de jî pêxember heqîqetekê îfade dike lê yextîyarê li pêşberê wî ava deverekî fêm dike.

4.18. Telmîh: Di nava îfadeyê de bêyî zikirkirin, bal qisseyekê, bûyereke borî, hîkaye û efsaneyên meşhûr, şexsekî nas, ayetan, hedîsan yan jî gotineke pêşîyan a belavbûyî ve îşaret tê kirin.¹⁸

¹⁶ Kûlekçi, *h.b.*, r. 199.

¹⁷ Kûlekçi, *h.b.*, r. 86.

¹⁸ Dilçin, *h.b.*, r. 461.

**Şemîmek hukmê wî daye Suleyman
Nesîmek hikmetê wî daye Luqman**

**Ji yek feqlê wî ye ‘Îsayê Meryem
Dikir heyayê mewtê ku demadem**

**Li Mûsa narê kifşe nûrê wî bû
Ne tenha şewketa der Tûrê wî bû**

**Li Îbrahîm vemirya narê Nemrûd
Ji feyda wî bû hem ew behrê mewrûd**

**Vebû pê dergê tewbe li Adem
Be wî kir dîlek û zarî di ew dem (172 / 498)**

Di van beytan de bi wesîla xêr û nav û fezîleta Hz. Mûhemmed (s.‘e.w), behsa hukmê Suleyman pêxember, hikmeta Loqman, Îsayê Meryem ku heyat dida kesê mirî, Mûsayê li Tûrê, vemirîna agirê Nemrûd li Îbrahîm û vebûna deriyê tewbe li Adem tê kirin.

4.19. Îdmac: Li gorî hunera edebî îdmac, pesnê di nav pesnê de ye, yan jî zemma di nav zemmê de ye. Pesna qat bi qat, yan jî zemma qat bi qat jî tê îfadekirin.¹⁹

**Bi xwe pîs e, xwedî feşîyû zanî
Hemû kes jî wekî xwe hem dîzanî (32 / 226)**

Dema serê munafiqan Lawê Ubeyy, îffîra li hz. ‘Aîşe dike, şair bi vê beytê zemma wî munafiqî dike.

**Ne‘îmê eşce‘ê şecca‘ê mêran
Xuda avête dil gerya musulman (33 / 239)**

Di vê beytê de behsa herba Xendeqê dike. Ne‘îm wê gavê hê musulman nebûbû. Şair behsa mêrxasîya wî dike. Mêrxasîya wî pur mezin nîşan dide. “Eşce”, “şecca” û “mêr” jibo mêrxasîyê hatine bikaranîn.

¹⁹ Kûlekçi, *h.b.*, r. 120.

4.20. Îqtîbas: Şair jibo wateyê xurt bike an jî peyvê xweşik bike, ayet û hedîsan an jî qismê ji wan dixê nav helbestê.²⁰

Sebeb ku rehetel lîl‘alemîn e

Zebûnî puştî wî nasan nedîne (172 / 498)

Di vê ayetê de îşaretî bal ayeta “We ma erselnake îlla rehmetel lîl‘alemîn” (Me tu encax ji ‘aleman re bi rehmetî şandiye. Sureya Enbiya-107) dike.

4.21. Tezad: Bi hev re bikaranîna du fikr û hîs û xiyal in ku herdu di me‘neyê de ziddî hev in.²¹

Bîlalan wî şiyand banê bulendî

Eba Cehlan kişand suflî be tundî (172 / 503)

Di vê beytê de banê bulendî, îzzet û şeref e ku Bîlal û yên wek wî gihanê, suflî jî zillet û rezîlî ye ku Ebû Cehîl û yên wek wî ketinê.

4.22. Îltîfat: Îltîfat, bi awayê hunera edebî ev e: Di heyama vegotina mijarekê de, ji ber hestên nû peyde dibin, guherîna hêla xîtabê ye.²²

Ne‘îmê eşce‘ê şecca‘ê mêran

Xuda avête dil gerya musulman (33 / 239)

Di vê beytê de şa‘ir, ewilî behsa mêrxasîya Nu‘aym b. Mesûd dike. Di misra duda hêla behsê diguherîne û behsê dibe ser musulmanbûna Nu‘aym.

4.23. Husnê Te‘lîl: Gava rewşek yan jî bûyerek, ji xeyrî sedema wê ya heqîqî, bi sebebekî xweşik ve bê girêdan, ev huner derdikeve holê. Sedama pêkhatine tiştêkî rast bi xewn û xeyalan ve girêdan e. Lê divê bingeha vê sedemê bi hukmeke teqez be.²³

Be nûra wî dibînit ruhnîya çav

Ji feyda wî ku dikşit kehnîya av (172 / 501)

²⁰ Dilçin, *h.b.*, r. 465.

²¹ Pala, *h.b.*, r. 455.

²² Kûlekçi, *h.b.*, r. 155.

²³ Dilçin, *h.b.*, r. 443.

Di vê beytê de şair, îfade dike ku dîtina çav û derbûn û herikîna ava kanîyan bi xatrê hz. Pêxember e.

4.24. Tarsî’: Eger peyvên misrayên beytekê ji aliyê hejmara herfan, wezn û kafiyyê, hev kêşe û hevaheng bin, yanî misra sîmetrîkê hev bin, jê re dibin tarsî’.²⁴

Hemû ehdê di wî mîşaqê wan bû

Hemû cehdê di wî ewşaqê wan bû (2 / 79)

4.25. Mubalaxa: Li gorî heyecanê mezinkirin an jî biçûkkirina bûyerê ye. Eger mubalaxa li gorî ‘eql û ‘adetê be, jê re dibên teblîx.²⁵

Ne Qeyser, ne Muqewqis ne kesî dî

Nika wî hukmê ket ku min li wî dî (37 / 256)

Muşrîk jibona bi pêxember re xeber bide, Ebû Sufyan dişînin Medîneyê. Piştî ku tişteki bi dest naxe, Ebû Sufyan vedigere Mekkeyê û di heqê pêxember de bêhemdê xwe Mekkîyan ditirsîne. Şair jî ev heqîqet ji devê Ebû Sufyan nezmandiye.

4.26. Redul’ecuz ‘Elesedr: Peyva ku di serê beytekê de bê gotin, di nava wê yan jî di dawîya wê beytê de bi awayekî tekrar bibe, ev huner derdikeve holê. Sedr serê misrayê, ecuz jî dawîya misrayê ye.²⁶

Digot îqre’ ne xwenda me digota

Ĥeta sê car digot û vê digota (10 / 101)

Di beyta li jor de peyva “digot” di serê misra ewil de hatiye bikaranîn, di nava û di dawîya misra din de tekrar bûye.

Bila bên û bila bên û bila bên

Digel Rûmê me cengê xweş bila bên (44 / 324)

Di vê beytê de jî peyva “bila bên” di serê misra ewil û di dawîya misra dudan de tekrar bûye.

²⁴ Kûlekçi, *h.b.*, r. 248.

²⁵ Pala, *h.b.*, r. 338.

²⁶ Kûlekçi, *h.b.*, r. 252.

4.27. Îştîqaq: Di nezmê de yan jî di nesrê de ji bo xemilandina vegotinê, kelimeyên ku ji ‘eynî kokê hatine çêkirin, bi hev re bên bikaranîn, hunera îştîqaqê der tê holê.²⁷

Ji bo ra Cebraîlî got Mûhemmed

Ĥemîd û Ĥamid û MeĤmûd û EĤmed (11 / 120)

Di vê beytê de ji koka “ĥmd”ê peyvên Mûhemmed, Ĥemîd, Ĥamid, EĤmed pêk hatine û bihev re hatine bikaranîn.

4.28. Nîda: Ji bo diyarkirina hîs û heyecanên şedîd, ev huner tê bikaranîn. Gelek caran bi edatên “ey, ya, eya, hey” tê kirin.²⁸

Bibên amîn behev ra ey birader

Qebûl ket belkî ew Ellahê Ekber (172 / 506)

Di vê beytê de bi “ey bîrader”ê nîda pêk hatiye.

Xudaya! Şadîya me newgiha ye

Şefaa me bulend e, bêbiha ye (4 / 85)

Di vê beytê de şair, gazî Xuda dike. Xudaya, bi me’na “ey Xudayê min/me” e.

4.29. Cînas: Cînas di navbêna wan kelîmeyan de pêk tê ku nivîsandina wan yek e, lê wateyên wan cûda ne.²⁹

Musulman nedbûyan îman netanîn

Serî ber fexrê ‘alem ra netanîn (77/ 367)

Di vê beytê de “netanîn”, di misra ewil de di şûna “nedianîn” de, di misra dudan de jî di şûna “nedatanîn” de hatiye bikaranîn.

Eger ku ew nebî, ‘alem çira ye

Di țarî ‘alem ew jê ra çira ye (172 / 498)

“çira ye” di misra ewil de bi me’na “çi qîmeta wê heye”, di misra dudan de jî bi me’na çirayê ku derûdora xwe ronî dike hatiye bikaranîn.

²⁷ Kûlekçi, *h.b.*, r. 217.

²⁸ Pala, *h.b.*, r. 358.

²⁹ Kûlekçi, *h.b.*, r. 224.

Nebî zanî ku ev emrê Xweda ye

Ne ku seknandina wê ba xwe da ye (37 / 253)

Di vê beytê de jî “Xweda ye” û “xwe da ye” bi eynî şiklî hatine nivîsandin, yanî rastnivîsîna wan li hev hatine. Lê wateyên wan cûda ne. Ji vê cînasa pêkhatî re “cînasa mutesabîh” tê gotin.³⁰

4.30. Alîterasyon û Asonans: Ji bo çêkirina ahengê, di misrayê de yan jî di beytê de tekrarkirina herf an jî heceyan e. Heger herfa dengdar (bêdeng) tekrar bibe, dibe alîterasyon. Ger herfa dengdêr bê tekrarkirin, dibe asonans.³¹

Be heqqê beyt û zemzem wan meqaman

Be heqqê meş‘er û dîf û temaman (172/ 505)

Di vê beytê de bi herfa “m”yê alîterasyon, bi herfa “e”yê jî asonans çêbûye. Herfa “m”yê heft caran, herfa “e”yê jî yazde caran tekrar bûye.

³⁰ Kûlekçi, *h.b.*, r. 228.

³¹ Mewlûda Baqustanî, *h.b.*, r. 39.

5. GOTINÊN PÊŞÎYAN

1. Biçîne dê hilînî bêdera xwe (r. 76)
2. Ji destê bêkesî navê mi mîr e (r. 77)
3. Çikû rovî di xalî çolê şîr e (r. 77)
4. Gelek car çêtir e lingê revînê (r. 210)
5. Bila reh bî, bila dûr bî here lê
Bila bûr bî, bila kûr bî, were lê (r. 520)
6. Dibên ‘eqlê sivik barê giran e (r. 521)
7. Nebe mîna reşê hafa rezê xwe
Ne bêkifş e ji wanê ber pezê xwe (r. 521)
8. We meşhûr e dibêjin ku bizin mir
Sehil bû îş û ‘îş û hem vemir gir (r. 339)
9. Ji bo şulhê şivêlek rê bihêle (r. 515)
10. Nebe muhtacê dînan û nemerdan
Nerêje abê rû pêşî çû merdan (r. 509)
11. Bila xûna te birjê abê rû ne
Çikû xûn tê kirîn lê abê rû ne (r. 509)

6. BIWÊJÊN KURDÎ

1. Diket herbek Xuda hefza xwe lê ke
Ku Rustem jî nikaribû welê ke (r. 203)

(Li ser mêranî û mêrxasîyê hatiye gotin.)

2. Gula bagê di wan şên û cuwan bit
Felek hey hey li pê keyfê di wan bit (r. 474)

(Li ser şad û xweşiyê hatiye gotin ku mîna li ber dilê wan tim bihar be.)

3. Yeqîn zanîn ku wan şewket nemaye
Li wan kelha mûşîbet hilweşaye (r. 288)

(Bi me'na ku taqeta wan a şerkirinê nemaye, bêçare mane.)

4. Mija reş hate ser erd û semaê
Ximara reş kişa çetr û seraê (r. 479)

(Li ser rewşa huzn û nexweşiyê hatiye gotin.)

5. Xulaşê Teybe bû gola girînê
Dihejya û dirijya pur ji şînê (r. 481)

(Jibo wefat û şînê hatiye gotin.)

6. Be şed derdê giran qebra wî kolan
Dil û canê xwe jî vê ra dikolan (r. 483)

(Li ser şîn û dilêşiyê hatiye gotin.)

7. Bihatana ger be ser roja sipî geş
Wekî şev dê bibûna tarîyû reş (r. 483)

(Li ser mûşîbetê ye, peyva Fatimaya keça pêxember e.)

8. Kul û derdê dilê xwe pê didotin (r. 481)

(Li ser nîşandayîna êş û eleman hatiye gotin.)

9. Ewan av dey be cobarê dilê xwe
Kefa destan bikey tawe jibo wan
Dil û cergê xwe pêjî tê da bo wan (r. 514)

(Li ser xatirê dê û bavan û xizmeta ji wan re hatiye gotin.)

10. Xwe xemlandin wekî nûroz û şahî
Çevan kil dan jibo dîna wî mahî (r. 416)

(Li ser şahî û bextewariyê hatiye gotin. Ehlê Medîne bi hîcreta pêxember dilşad bûne.)

11. Di pozê wan ve mewtê bîne xwarê (r. 417)

(Bi me'na li wan bixe bi awayê bîn kuştin.)

12. Li nav Mekke bibû heşr û qiyamet (r. 404)

(Li ser kombûn û qerebalixeke mezin hatiye gotin.)

13. Me dil dîna te ye bînahîya me (r. 476)

(Bi me'na meqseda me dîtina te ye ey ronîya çavên me.)

14. Felek puşt û li ogir dan berê xwe (r. 398)

(Bi wateya bê tirs û endîşe jibo armancê ketin rê.)

15. Di şe'ran da şebîhê nar û barûd (r. 411)

(Di helbestê de pir şareza ye.)

16. Ji başûka felek nakem fikarî (r. 362)

(Bi me'na tirsê wî/wê ji eqîbetê tuneye.)

17. Qiyamet te digo rabû wê gahî (r. 376)

(Jibo qewimîneke mezin hatiye gotin.)

18. Reha çar sa'etan wî deng diçûya (r. 314)

(Bi me'na dengê wî zêde dût diçe. Jibo dengê hz. 'Ebbasê mamê pêxember hatiye gotin.)

19. Heman lingek ji baê girt emanet (r. 359)

(Bi me'na pir zêde lezand.)

20. Zirava mewtê anî pozê wî da (r. 270)

(Li ser rewşa kuştina bi şiddet hatiye gotin.)

21. Mija mewtê xwe da alî we rabû (r. 357)

(Bi me'na mûsîbet û mirin bi dawî bû.)

22. Reha rojek şevê jî yek didîta (r. 358)

(Jibo kesê ku çavên wî pir dût dibîne hatiye gotin.)

23. Li cem 'Eyşo Xeco kem keyf û şuhbet (r. 325)

(Li ser kêf û zewqê hatiye gotin.)

24. Evî zikmeşkê bê geyret serê ha (r. 299)

(Jibo kesê qelew û xerab, ji şerefê mehrûm hatiye gotin.)

25. Xuda lewra li tayê Muştefa ye (r. 264)

(Bi me'na Xweda alîkarê pêxemberê xwe ye.)

26. Diçirkandin jibona we diranan
We şonda we dixwarin wan cuwanan (r. 210)

(Bi me'na jibo heyf û hicûmê xwe dijdandin.)

27. Li ser lêva cehennem hađir e ew (r. 227)

(Li ser rewşa ya nêzî xeternak weya bi me'na nêzî cehennemê ye hatiye gotin.)

28. Li hev bade tu têtê her zemanan (r. 74)

(Bi me'na li gorî şewaza dem û çaxa xwe binivîsîne)

29. Heman lê dan û kuştin lawê baban (r. 277)

(Lawê baban, bi me'na mêrxasan hatiye gotiye.)

30. Zikê defter tijîke durr û cewher
Di kuza xwe tijîke ab û kewşer (r. 75)

(Bi me'na peyv û gotinên herî xweşik û bi huner bihûne.)

31. Gemî berde li ser behra dewatê (r. 76)

(Bi me'na serbestî û rihetiya di hûnandin û nezmandinê de hatiye gotin.)

32. Ji destê bêkesî ketme pîyasê (r. 77)

(Li ser rewşa mecbûrîyetê hatiye gotin.)

33. Gerandin çehvê xwe lawan (r. 78)

(Jibo rewşa lêgerîn û saxkirina kesekî şareza li hawêrdor hatiye gotin.)

34. Bi dolaba nezim çend tayê rêşî (r. 78)

(Bi me'na çend misrayên xweş hatine nezmandin)

35. Mi navê pişt guhê xwe der şefae't (r. 80)

(Bi me'na min roja qiyametê jibîr neke hatiye gotin.)

36. Kişand leşker wekî şapew suyûlan (r. 194)

(Bi wateya hejmareke zêde ya esker li dû hev rêz kir û şand.)

37. Go 'Ezraîl suwarî nedgiha wan (r. 187)

(Li ser rewşa bezîn û revîn û bazdana zêde bilez hatiye gotin.)

38. Meger başûkî ketne pê guraban (r. 174)

(Bi me'na kesên mêrxas û pehlewaniyan bi pey kesên newêrek bikevin hatiye gotin.)

39. Neçû pir Îbnî Newfel xwarê mergî (r. 103)

(Xwarê mergî yanî mirin vexwar, bi me'na wefatê ye.)

40. Kurê Metoşlegê ji Îdrîsî fek bû (r. 84)

(Fek bû, bi me'na welidînê yanî hatina dinyê ye.)

41. Ji 'ewrê fetretê der bû Mûhemmed (r. 100)

(Bi me'na di dewra ku demeke pir dirêj bû, pêxember nehatibûn şandin de Hz. Mûhemmed tê dinyayê.)

42. Suwarê serçelengê herdu 'alem (r. 111)

(Jibo pêxember, bi me'na seyyîd û efendiyê kesên her du dinyayê hatiye gotin.)

43. Difirya te digo cinnê çeyare (r. 92)

(Jibo Bûraq, bi me'na zêde bi lez û bez hatiye gotin.)

44. Umeyye çerzê gamêşê nerabû (r. 157)

(Terzê gamêşê, jibo rewşa ku ji ber giranî û keslaniyê nikare tevbigere hatiye gotin.)

45. Dikir 'ewde bibit nedhate ferheng (r. 115)

(Nedhate ferheng, bi me'na taqet nedianî, nikaribû, jê nedihat hatiye gotin.)

7. AYETÊN QUR'ANÊ

Jibo mealên ayetan ji “*Meala Qur’ana Pîroz a Kurdî*” ya Weşanên Serokatiya Karûbarên Diyanetê hat îstîfadekirin.¹

1. Îqre’ bîsmî rebbîk (r. 101)

“Bixwîne bi navê rebbê xwe” (‘Elaq 1)

2. Ya Mudessîr, qum fe enzîr (r. 103)

“Ey pêxemberê ku bi cilê xwe xwe nixumandiye! Rabe, (xelkê bi emr û fermanên Xwedê) hişyar bike.” (Muddesîr 1-2)

3. Digota heqqî hat û dînê batîl
Heman bû muđmeñîl borî we zail (r. 305)

“Bibêje, heq hat û batil jî ji bin ve rabû. Bi rastî jî batil her ê çûyînê ye.” (Îsra 81)

4. Dema “Elyewme ekmeltu lekum” hat (r. 404)

“Îro min dînê we jibo we kemiland.” (Maîde 3)

5. Mubahelet biken em we hemana
Jin û zar û hemû ehlan cemi’ ken
Biken le’net li ser ehlê şeni’ ken (r. 406)

“De werin, em gazî zarokên xwe û zarokên we, gazî jinên xwe û jinên we û gazî xwe û we bikin; piştî em bihev ra nifiran bikin û le’neta Xwedê li derewînan bibarînin.”(Al-î İmran 61)

6. Weşşemsî (r. 465)

“Sond bi rojê” (Şems 1)

7. Welleylî (r. 465)

“Sond bi şevê” (Leyl 1)

¹ *Meala Qur’ana Pîroz a Kurdî*, Amd. Hüseyin Gündüz (Êsî), Mehmet Seyhan, Çapa Yekê, Weşanên Serokatiya Karûbarên Diyanetê, İstanbul 2015.

8. Qesem bîl mewtetel ûla çunîne

Ji ta mewtek dîger êdî çunîne (r. 480)

“Em ji mirina xwe ya pêşîn pê ve namirin”(Saffat 59)

9. Xuda “înneke meyyîtun” virê kir (r. 481)

“Muheqqeq tuyê bimirî” (Zumer 30)

10. Dema “wellahî yu’şîmûke” tenzîl (r. 491)

“Muheqqeq wê Allah te mihafaza bike” (Maîde 67)

**12. Subhane rebbîke rebbîl îzzetî ‘emma yeşîfûn we selamun ‘elelmurselîn
welhemdûlillahî rebbîl ‘alemîn** (r. 524)

“Rebbê te rebbê îzzetê, ji ya ku ew wî pê diwesifinî pak û berî ye. Selam li hemî
pêxemberan be. Hemd jî jibo rebbê ‘alemê ye.” (Saffat 180-182)

8. HEDÎSÊN PÊXEMBER

Li gorî rewş û deveran cenabê pêxember xîtabî kesan, heyetan kiriye, jibo eşya û heywanan peyv bikar anîne. Evana nehatin komkirin. Her weha di heyama hedîseya mî'racê de jî cenabê Pêxember û Cibrîl bi hev re xeber didin û digerin, pêxember rastî pêxemberan û hinek kesan û rewşan tê. Li hinek deveran dipeyive, carna jî rewş û kesan ji Cibrîl dipirse. Evan gotinên di navbeyna wan de jî nehatin komkirin. Tenê yên zêde tene zanîn hatin civandin û çavkaniyên wan hatin diyarkirin.

1. Nebî got "Em ji avê ne" (r. 161)

Hz. Pêxember berî herba Bedrê digel Hz. Ebûbekir, nêzikî Bedrê rastî Sufyanê Damrîyê yextiyar dibe. Ji yextiyar di heqê hejmara muşrîkan de pirsan dike. Yextiyar bi şertê ku xwe bide naskirin qebûl dike. Yextiyar piştî ku peyva xwe diqedîne ji pêxember dipirse bê ji kê ye. Pêxember jî vê gotina li jor jê re dibêje¹. (Îbnî Îshaq, Îbnî Hîşam, Sîre, c. 2, r. 267-268.)

2. Digo xalet wekî ummî şefîq e (r. 281)

"Xaltîk di şûna dê de ye"² (Tîrmîzî, Bîrr, 6; Buxarî, Sulh, 6)

3. Çimkî herb keyd û xuda'e (r. 165)

"Herb hîle ye."³ (Îbnî Îshaq, Îbnî Hîşam, Sîre, c. 3, r. 240; Her wiha di Tîrmîzî, Cîhad, 5; Buxarî, Cîhad, 157; Muslîm, Cîhad, 17an de jî derbas dibe.)

4. Nebî go piştî min wergirt libasê

Şerî, caiz nîye kem in'îkasê (r. 194)

"Pêxemberek, piştî ku zirxê xwe li xwe kir, heta ku Allah di mabeyna wî û dijminê wî de hukum bike, wî zirxê ji xwe nake. Heger hûn sebir bikin û wezîfa xwe pêk bînin, ewê Allah zaferê bide we."⁴ (Îbnî Îshaq, Îbnî Hîşam, Sîre, c. 3, r. 68; Waqidî, c. 1, r. 214)

¹ M. Asım Köksal, *İslam Tarihi*, c. 3, Köksal Yayıncılık, İstanbul 2005, r. 309.

² Mehmet Boynukalın, *İslam Ansiklopedisi*, c. 41, TDV Yayınları, İstanbul 2012, r. 58

³ Köksal, *h.b.*, c. 5, r. 91.

⁴ Köksal, *h.b.*, c. 4, r. 123.

5. Nebî lingê mubarek lê hilanî

Şela da go Uḥud ma tu dizanî

Li ser te yek Nebî ye, yek jî Şiddîq

Di wê dîtir şehîd in hem be teḥqîq (r. 455)

“Ey Uḥûd! Sakîn be. Li ser te pêxemberek, siddîqek û du şehîd hene.”⁵ (Bûxarî, Eshabên Nebî, 5; Tîrmîzî, Menaqîb, 18; Musned, c. 3, r. 112)

6. Resûlullahî gote şahîbê wê

Neke gedrê di bar û ratîbê wê

We gote wê jî serkêşî beşemrîn

Di fermanê tu gerden dîse dayîn (r. 457)

Ji ‘Ebdullah b. Ce’fer b. Ebî Talîb hatiye rîwayetkirin. Deve tê cem pêxember û xwediye xwe gilî dike. Li ser şîkayeta devê, pêxember ji wan re vê nesîhetê dike. (Muslîm, 342 û 2429; Ebû Dawûd 2549; Musned I/205; Îbnî Mace 340)

7. Resûlullah go beyraqê şebaḥê

Didem destê yekî qencê sîpaḥê

Muḥîbê bo Xuda û bo Resûl e

Li bal wan jî xwedî dest û qebûl e (r. 268)

Cenabê pêxember di herba Xeyberê de jibo Hz. ‘Elî weha gotiye: “Sîbê ezê sancaxê bidim yekî wisa ku Allah û Resûlê wî jê hez dikin û ew jî ji Allah û Resûlê wî hez dike. Ewê Allah bi destê wî fethê muyesser bike.”⁶ (Îbnî Îshaq, Îbnî Hîşam, Sîre, c. 3, r. 349; Waqidî, c. 2, r. 653; Îbnî Sa’d Tebaqatul Kubra, c. 2, r. 111; Bûxarî, Sehîh, c. 4, r. 207; Muslîm, Sehîh, c. 3, r.144.)

8. Du şahî kir Nebî, yek jê be Ce’fer

Yeka dî jî be fetḥa kelhê Xeyber (r. 273)

⁵ Muhammed Hamidullah, – Casim Avcı, *İslam Ansiklopedisi*, h.b., c. 42, r. 54-57.

⁶ Köksal, h.b., c. 6, r. 56.

Piştî ku Xeyber tê fetihkirin, Hz. Ce'fer û hevalên xwe jî ji Hebeşîstanê vedigerin. Jiber vê yekê Resûlê Xweda weha dibêje: "Ez nizanim bi kîjan kêfxweş bibim, bi fetha Xeyberê yan bi hatina Ce'fer?"⁷ (Îbnî Sa'd, *Tebaqatul Kubra*, c. 4, r. 35)

9. Resûlullahî go celd û qewî bin

Be bez werne tewafê şidşidî bin

Qureyşî da nebêjin tayê Yeşîrb

Ewan hêlaye jar û bê meratîb (r. 280)

Di heyama 'Umreya Qezayê de Hz. Pêxember, bi meqseda ku muşîrk nebêjin hewa Medîneyê li musulmana nehatiye û tev zeîf kirine, ji eshabê xwe dixwaze ku qewî û bi weqer tewafê bikin û weha dibêje: "Îro kî qûwwetê nîşan bide û muşîrkan têxe dehşetê, bila rehmeta Xweda li serê bibare."⁸ (Îbnî Îshaq, Îbnî Hîşam, *Sîre*, c. 4, r. 12; Bûxarî, *Sehîh*, c. 4, r. 161; Muslîm, *Sehîh*, c. 2, r. 923)

10. Nebî go Bûbekir mîna Xelîlî

Melahîmî welêkin wî zemîlî

'Umer wek Nûh e, wî pur bîhnî teng e

Heman haqîr di dest da şûrê ceng e (r. 289)

Piştî herba Bedrê li ser rewşa hêsîran muşîrkan, pêxember fikra eshabê xwe guhdarî kir. Li ser gotina Hz. Ebûbekir û Hz. Omer, weha gotiye. "... Ey Ebûbekîr! Tu dişebihî halê Îbrahîm ('e.s) ... Ey Omer! Tu jî dişebihî halê Nûh ('e.s)..."⁹ (Ehmed b. Henbel, *Musned*, c. 1, r. 383; Taberî, *Tarîx*, c. 2, r. 295; Zehebî, *Mexazî*, r. 87-88)

11. Nebî çû ser devê bîrê nîda kir

Be navê wan çira go we wiha kir

Ûeta hûn bûne mehrûmê ji dunya

Çewan bûn ehlê dozex hûn di 'uqba

We kir tekzîbê wehy û hem rîsalet

Ji dor ve xel bi min hatin hîdayet

⁷ Îbnî Sa'd, *Tebaqatul Kubra*, c. 4, Siyer Yayınları, İstanbul 2015, r. 35

⁸ Köksal, *h.b.*, c. 6, r. 180.

⁹ Köksal, *h.b.*, c. 3, r. 388.

We min der kir ji erd û merbeê' min
Gerîban cî kirim bûn tabiê' min (r. 179)

Di herba Bedrê de li ser devê bîrê Hz. Pêxember xîtabî muşrîkên kuştî dîke.¹⁰ (Îbnî Îshaq, Îbnî Hîşam, Sîre, c. 2, r. 293; Waqidî, Mexazî, c. 1, r. 112; Taberî, Tarîx, c. 2, r. 285)

12. Qesem kir go Xuda ger ket muyesser
Ji wan bukjum ezê heftadê serwer

Wisani bînim serê wan kes nedîbî
Hilînim heyfê Hemze we'de lê bî (r. 207)

Hz. Pêxember, li ser wehşeta ku bi serê hz. Hemzeyê şehîd de anîne weha dibêje.¹¹ (Îbnî Îshaq, c. 3, r. 101; Waqidî, c. 1, r. 290; Taberî, c. 3, r. 25; Beyhaqî, c. 3, r. 286)

13. Ji ewwel derbê birq avête Şamê
Şukir kir, go wê distînim temamê

Yeka dî Qeşrê Faris tê xuya kir
Şukur mîftahê faris min hila kir

Yeka şê birqê avête Yemen va
Birûska çan şeva tarî bi den va

Şukur go dê emê bigrin Yemen jî
Nekin şayîşiya te'ba beden jî (r. 232)

Di herba Xendeqê de Hz. Pêxember radihêje hors û li ta'tê dixê û her carê mizgîna fetha deverekê dide.¹² (Îbnî Îshaq, Îbnî Hîşam, Sîre, c. 3, r. 230; Beyhaqî, Delaîlun Nubûwwe, c. 3, r. 417-418)

14. We got êdî nema ew bêne herbê
Ji vir paş em diçen ser wan be herbê (r. 242)

¹⁰ Köksal, *h.b.*, c. 3, r. 364.

¹¹ Köksal, *h.b.*, c. 4, r. 196.

¹² Köksal, *h.b.*, c. 5, r. 35.

Piştî herba Xendeqê ku muşrîk perîşan û bêçare vedigerin, Hz. Pêxember weha dibêje: “Êdî Qureyşî piştî vê sala we, ewê nikaribin bi we re herbê bikin, feqet hûnê bi wan re herbê bikin.”¹³ (Îbnî Îshaq, Îbnî Hîşam, Sîre, c. 3, r. 266)

15. Qesem kir go çi tiştê ew bixwazin

Ji te’đîma Herem dê kem ne gazin

Ji heqqê ‘eqrebatî qencî başî

Di mabeyna min û qewmê Qureyşî

Eger çi zehmet û zor û cefa bit

Eger weqfa riđa emrê Xuda bit (r. 253)

Li Hudeybiyeyê berî lihevkerinê dema deva wî Qaswa pêş de naçe weha dibêje.¹⁴ (Îbnî Îshaq, Îbnî Hîşam, Sîre, c. 3, r. 324; Waqidî, Mexazî, c. 2, r. 587)

16. Hezar û çar şedî bey’et kirine

Resûlullahî go tev cennetî ne (r. 259)

Jibo eshabên tevî bey’eta Ridwanê bûne dibêje.¹⁵ (Ehmed b. Henbel, Musned, c. 3, r.350; Ebû Dawûd, Sunen, c. 4, r. 213; Tîrmîzî, Sunen, c. 5, r. 695)

17. Nebî got hûn biseknin hûn nezanin

Di paş weqtê eva tev çerrê wan in (r. 261)

Piştî sulha Hûdeybîyeyê gava hz. Omer nerazîbûna xwe tîne ziman, Hz. Pêxember weha dibêje.¹⁶ (Waqidî, Mexazî, c. 2, r. 609)

18. We go elhemdû lillahîl lezî ku

Şîyandî min jibo reħmet bibim ku

Li ser eşnaf û ‘enwaê’ di ‘alem

Mubeşşîr munzîrê ewladê adem

Gerandî ummeta min xeyrê ummet

Nihandî hem ji min ewzar û tuhmet

¹³ Köksal, *h.b.*, c. 5, r. 115.

¹⁴ Köksal, *h.b.*, c. 5, r. 271.

¹⁵ Köksal, *h.b.*, c. 5, r. 301.

¹⁶ Köksal, *h.b.*, c. 5, r. 324.

Bilind kir nav û zîkra min ji hemyan
Gerand fatiḥ we hem xatem li hemyan (r. 118)

Di heyama çûna Mî'racê de ji pêxemberan re gotiye.¹⁷ (Taberî, Tefsîr, XIV, 424-428; Bezzar, Musned, XVII, 8 (9518))

19. Nebî gote 'Elî, îşev di cî min

Di yatagê mi da razê li cî min

Welê kurkê mi jî ser xwe werîne

Neîirse dê te mekrûhek nebîne

Diseknî ta emanatan di şubhê

Bikey teslîm û bêy tê puştî şubhê (r. 140)

Pêxember berî ku hîcret bike ji hz. 'Elî re weha dibêje.¹⁸ (Îbnî Îshaq, Îbnî Hîşam, Sîre, c. 2, r. 126-127 û 129; Taberî, Tarîx, c. 2, r. 244)

20. Resûlullah dua' kir ya Îlahî

Ji ser me refî' ke tu ev dewahî

Li me xweş bènî Yeşrîb şubhê Mekke

We em hej jê biken buhter ji Mekke (r. 147)

Piştî hîcretê gava li Medîne muhacir û pêxember bi taya Medîne diêşin, vê duayê dike.¹⁹ (Îbnî Îshaq, Îbnî Hîşam, Sîre, c. 2, r. 239; Muslîm, Sahîh, c. 2, r. 103; Bûxarî, c. 2, r. 225)

¹⁷ Ahmed Badla, *Resulullah'in (s.a.v) Hutbeleri 2*, Siyer Yayınları, İstanbul 2019, r. 330.

¹⁸ Köksal, *h.b.*, c. 2, r. 334.

¹⁹ Köksal, *h.b.*, c. 3, r. 125.

ENCAM

Mela Nûrûllahê Godîşkî, şair û ‘alimekî herêma Bedlîsê ye, bi wasîteya terîqet û medreseyê gihaye, bi nezm û helbestên xwe dikeve kategorîya helbestvanên klasîk. Di nezmê de bi piranî di bin bandora Şêx Ehmedê Xanî û Şêx ‘Evdirehmanê Axtepî de maye.

Di wezn û nezmê de, di bikaranîna peyv û îfadeyên ‘Erebî û Farisî de, di siyer û fiqh û ‘eqîdeya Îslamî de zana û şareza ye. Di hûnandina mî‘racname û şemaîla pêxember de jêhatî ye û di vî warî de bi şairên berî xwe re dibeze. Wek filologekî di helbestên xwe de li ser peyvên xwe sekinîye. Di dewreke ku xwendin û nivîsandina Kurdî qedexe bûye de bi Kurdî eser nivîsandine. Di nezma xwe de ji rêz û rêzikên medreseyan, murşîdên xwe û şairên berî xwe yên vê kategoriyê dûr neketiye.

Destxeta Mela Nûrûllahê Godîşkî ya bi navê “*El-cewahîru’r Reşadiye Fî Sîretî’n-Nebewîyye*”yê siyereke kronolojîk e, bi qasî 5024 beytan bi nezm û qaliba arûzê hatiye hûnandin. Hem bi dirêjîya xwe hem bi naverok û saxlembûna xwe, nûser e. Bi vî awayî terza nivîsandin û mijara mewlûdan guherandiye. Di warê bi Kurdî nezmandina sîret û siyera pêxember de valahiyeke mezin dagirtiye. Mela Nûrûllah îfade kiriye ku di vê sehayê de nivîsandina berhemêke weha, ji ber bêkesiyê mecbûriyet peyde kiriye. Bi armanca ku xelk heyata pêxember bi rihetî fêr bike û hîn bibe, bi durr û cewherên bi zimanê xwe hûnandiye.

Naverok û mijarên berhemê têr û tijî ye. Bi terza mesnewiyan bi hemdele û selweleyê dest pê kiriye, piştî beyana armanca nivîsandina eserê, bi neseb û wîladeta pêxember dewam kiriye. Siyer mijar bi mijar kronolojîk hatiye nivîsandin. Xezwe, seriyye, hatin û şandinên heyetan û şandinên mektûbên vexwendina bi bal Îslamê ve li dû hev hatine rêzkirin. Mijarên wek mî‘rac, hîcret, herba Bedr û Uhûd û Xendeqê, Sulha Hûdeybîyeyê, Fetha Xeyber û Mekkeyê, wefat û şemaîla pêxember û nesîhetnameya li xelkê dîvdirêj hatine nezmandin. Nexasim 56 seriyye, qism bi qism hatine behskirin, heta bi netîceya seriyyeyê û xenîmet û zayîtatên wan jî hatine nezmandin.

Zimanê berhemê, digel zêdebûna peyvên ‘Erebî, peyvên Farisî jî dihewîne. Di xebatê de peyvên Kurdî yên zêde nayên bikaranîn, di nezmê de hatine reşandin û bi

vî awayî hatine parastin. Ji ber bi devoka herêma Bedlîs û Serhedê ye, tê de peyvên Tirkî jî hene. Her wiha peyvên herêmî jî di nav beytan de hatine reşandin. Bi zimanê xwe lîrîk e, li gorî mijara siyerekê munasîb û lihev ‘edilandî ye. Wezn û kafiye li gorî qaliba arûzê serkeftî û dewlemend in. Gelek hunerên edebî hatine bikaranîn. Lê huner û bikaranîna huneran, ne bûye armanca ewil. Meqseda ewil, hûnandina siyer û fêmkirina wê ye.

Di berhemê de ayet û hedîsên pêxember, gotinên pêşfyan û biwêjin Kurdî jî cî digrin. Di nezmê de bikaranîna van mefhûm û gotinan, hostetiyeye bikêr û jêhatî dixwaze. Mela Nûrûllah di vî warî de şareza ye. Nexasim biwêjin Kurdî bi serkeftî hatine reşandin. Hest û heyecana xwe bi van peyv û peyvikan xweşik îfade kiriye. Peyvên ‘Erebî, Farisî û Tirkî jî li gorî qaîdeyên rêzimana Kurdî bi awayekî jêhatî lihev ‘edilandine. Lê carna bi armanca hevahengiya weznê û şêwaza herêmî, guh nedaye cinsiyeta hinek peyvan.

Siyerên bi Kurdî nexasim di demên dawîn de her çiqas hatibin nivîsandin jî, bi pîranî pexşan in. Evan berhemên pexşan, bi armanceke agahî û dîdaktîkî (hînkirin) hatine amadekirin. Siyerên menzûm, ji xeyrî hinek mewlûdnameyên hinekî dirêj, pir hindik in. Ji lew ev berhema Mela Nûrûllah, di vê sehayê de taybet e. Mîna “Mem û Zîn”a Şêx Ehmedê Xanî û “Rewdi’n-Ne’im”a Şêx Evdirehmanê Axtepî, di dewra xwe de girîngiyeye mezin dehewîne.

Parastina destxetan û berhemên kevin ên bi Kurdî nivîsandî, wezîfeke girîng e. Ji ber ku li serê zêde nehatiye sekinandin, heta dewra me gelek berhem wenda bûne. Xebata li ser wan û derxistina wan a nav ronahiya warê edebiyata Kurdî, zehmetiyeye dîtir e. Cehd û xeyretên di vî warî de jî girîng in. Ji vî alî ve Mela Fadilê feqiyê Mela Nûrûllah, xizmeteke mezin kiriye. Eger Mela Fadil, ev berhem îstînsax nekiriba, ji vê eserê bi destxeta xwe nenivîsandiba û li cem xwe nehiştiba, ewê ev berhem jî wenda bûba.

Di gelek siyerên mensûr de ya piştî mijarê yan jî di dawîya kitêbê de ders û îbret hatine dayîn. Mela Nûrûllah, li gorî vê terzê neçûye. Lê nesîhetnameyeye li xelkê xistiye dawîya berhemê. Bi vê terzê berhem, di seha xwe de xwedî taybetîyê ye. Nesîhetname herikbar e û gelek mijar û xisûsiyetên bi ferd û civakê re eleqear di

xwe de dihewîne. Nexasim li gorî edeb û şîretên şerîetê, bi zimanêke rihet û fesîh, mîna gotinên pêşîyan bi heqîqetên ceribandî û giştî xîtabî xelq û ehlê xwende dike.

Destxet di sala 1967an de hatiye tamamkirin. Esereke ku di vê dewrê de hatibe hûnandin, jê hêvî tê kirin ku zimanê wê jî nêzî xebardana vê demê be. Feqet ne wisa ye. Ji bo berhemê ev ne kêmasiyek e. Belkî bi peyvên xwe orjînalîte û klasîkbûna xwe qewî kiriye. Lê belê ji bo siyereke bi Kurdî, bikaranîna zêde peyvên ‘Erebî, belkî ji bo xwîneran hinek zehmetiyan derdixîne holê. Ji dêleva hinek peyvên, bi meqseda ku xwendevanan bêtir fêhm bikira, dikaribû peyvên Kurdî bihûnanda.

Ji aliyê mijarê ve jî, di eserê de li ser dewra Mekkeyê zêde nehatiye sekinandin. Îşkence û zordestiyên muşrîkan ên li ser eshabên pêxember, hîcreta Hebeşistanê, çûyîn û teblîxa li ehlê Taîfê, heyama teblîxa bi dizî û eşkere, beriya pêxemberiyê Peymana Hilful Fudûlê, herbên Fîcarê nehatine behskirin, an jî bi çend beytan hinek hatine bilêvkirin. Di nav ehlê ‘ilmê de û li gorî usûla hûnandina siyera pêxember, dewra Mekkeyê jî gelek muhîm e. Lewra ji bo di qelban de bicîkirina îmanêke saxlem û li ser vî esasê saxlem avakirina ummeteke xêrtirîn, dewra Mekkeyê wek destpêk tê hesabandin.

Di dewra Medîneyê de jî mesele û tevgerên civakî, malbatî, aborî, îbadî nehatine behskirin. Têkiliyên bi civaka Cihûdan re, Wesîqeya Medîneyê, xwendin û gihandina eshabên pêxember û zarokên eshaba nehatine nezmandin. Medîne avakirina dewleta Îslamê ye, lê ev yek nehatiye nezmandin. Di berhemê de yek bi yek li ser seriyyeyan hatiye sekinandin. Ji aliyê mijarên siyerê ve evan babetên li jor hatin behskirin jî bi qasî seriyyeyan bihatana hûnandin, ewê berhem kamiltir bûba.

Meriv dikare li ser berhemê, ji gelek bergeh û mijaran ve lêkolînên akademîk bike. Ji ber ku mijar siyereke kronolojîk e, di çarçoveya siyer û hedîs û tarîxê de çavkaniyên berhemê, sehakek xebata vî warî ye. Di berhemê de mî’racname, hîcretname, şemaîla şerîf, wefatname, nesîhetname berfireh hatine rêstin. Ji van mijaran her yek û muqayesa wê ya bi yên şairên din re dîsa mijara lêkolînê ye. Berfireh xebateke li ser zimanê berhemê û taybetiya wê ya parastina peyvên Kurdî, mijareke din e. Her weha di berhemê de evîna pêxember û muqayesa berhemê bi Elhemaîlû Fîş Şemaîlî re, li hêviya lêkolînê ne.

BEŞA SÊYEM

METNA BERHEMÊ YA TRANSKIRÎBEKIRÎ

RÛPELA SERQAPAXÊ

Hesbî

Şahîbul kîtabî Fađilul heqîrul kesîr, ‘effahû rebbîl celîl: Xwedyê vê kitêbê Fadilê rebenê belengaz e. Rebbê wî yê Celîl wî ‘effû bike

Qalennebiyyû sellellahû ‘aleyhî wessellem “Elîzzû bî yazel celalî wek îkram” Nebî (Selat û selama Xweda li ser wî be) got: Bi “Ya Zelcelalî wel îkram”ê qewet bistînin.

“El-Cewahîru’r-Reşadiye Fî-Sîyerî’n-Nebewîyye” (Navê kitêbê. Di Siyera Pêxember de Cewherên Ku Rê Nîşan Didin)

Fîl cubnî ‘arun we fîl îqdamî mukerremetun. Welmer’û bîl cubnî la yencû mînel qeder: Di tirsê de rezîltî heye. Di cesaretê de ‘esalet heye. Însan bi tirsê ji qederê xelas nabe.

Kanetîd dunya lî qewmîn qeblûna, rehîlû ‘enha, fexulûha lena: Dinya berî me ji qewmekî din re bû, wan jê bar kir, wê ji me re hiştin.

Westerzîqullah mîmma fî xezaînîhî. Feînnemel emrû beynel kafû wennûnî: Ji Xwedê ji tiştê di xezîna wî de daxwaziya riziq bike. Lewra emrê wî di nav kaf û nûnê de ye.

RÛPELA BERYA NAVEROKÊ

Meqalatun mîn meqalatîl molla Nûrullah. Neqelehû Fađil: Ji gotin û nukteyên Mela Nûrullah hinek gotin û nukte. Fadil wan neqil dike

Mêr ew e ku emek bidit ku kirê me'newî vejînit, ne ew e ku bixebitî û kirê maddî birjînit.

Dîger: Kerê barkêş, çêtir e ji kurê serkêş.

Dîger: Kur kur e, lê sernerm çêtir e, serhişkê hucûmker gur e.

Dîger: Dujminê 'eqilmend çêtir e ji dostê eħmeq, dujminê eħmeq betertir e ji şeytanê cazû¹.

Dîger: Eger dikarî, koşkek ji xwe ra çêke; eger te nikarî kolika xwe ji destê xwe neke.

Dîger: Eger 'eqil heye bikir, eger ku tine ye xwe nefroşe.

Dîger: Xefî gotî malê xelqê ye, çi negotî pertalê te ye.

Dîger: Çi ji dilê te hate ser zimanê te, dibî pertalê xelqê, îdî nikarî jê bistînî.

Dîger: Jina emekdar jin e, devçortî û zimandirêj dujmin e.

Dîger: Bila bira bit, bila ne li vira bit. Roj heye ku haja² te heye.

Dîger: Xweyê xiraban dilxapandi ye. Xweyê qencan gemrevandi ye.

Dîger: Şîreta dostê 'eqilmend ji hingivînê şîrintir e, we ger çi dilê te jî jê biêşit.

Dîger: Mêran biceribîn bi şuglê giran, jinan bi xeberê xef.

Dîger: 'Umrê dilan dirêj e, yê delalan kurt e.

Dîger: Xezna emekdaran li malan e, 'enbara beşalan li newalan e.

Dîger: Bağê Tûraniyan, siha biyan e; çola xebatkaran bağê tirpan e.

¹ cazû ('e): yê ji hed derketiye

² haj: hay, xeber, salox

Dîger: Dunya gûza bê kakil e, bagvanê wê bê hiş û bê ‘aqil e.

Dîger: Dikarî navê xwe derneyne, ku derket dengê xwe bi kes ra derneyne.

Dîgre: ‘Ilm û şen’et jibo rewalan, zêrê gilopînê³ li malan, ne diz dibînî ne talan.

Dîger: Qîmeta mêran huner e, yê jinan zînet û cewher e.

Dîger: Jina hukumdar, şûrê dujminan radiweşînî.

Dîger: Ji kevirê hişktir parsuyê jinan e, digel wî qasî jî xwe belengaz dizane.

Dîger: Kurê kerê ji babê xwe maqûltir e, çikû barê giran dikşîne.

Dîger: Şorba Faço ku temîz bit, ji goşt û birinca mala mîr çêtir e.

Dîger: Şorba Fato bi pîvaz û sîr çêtir e ji goşt û birinca mala mîr.

Dîger: Kağizê piyangoyê yek kortifaqî ye, dido naheqî ye, sisê ehmeqî ye.

Dîger: Çiyayê mezin berf jê xelaş nabî, çan ku dehlê mezin bê cinawir nabî.

Dîger: Eger malê te zaf e, bibe kefilê neberxweketiyan, eger ‘eqlê te heye (zaf e) nebe hevalê nezanan.

Dîger: Hifza xwe ji dostê ehmeq purtir bike ji dujminê zana. Lewra ‘eqil her fêkiya şêrîn didet.

Dîger: Zimanê paşîn fêkiya zemanê pêşîn e, eger çi pêştirînan nedîne.

Dîger: Çiqas roj diçî, însan didirî; çiqas însan didirî, zêde bela dikirî.

Dîger: Kizîran nekne wezîrê dewletan û rizgaran, heyf e. Wezîran jî nekne kizîrê neciwanmerdan, li wan heyf e.

Dîger: Te nav û qîmeta bilind divê sifra nanê xwe hê bîne ber mîhvanan. Te dengê bilind divê kerê berde çayir û çîmenan.

Dîger: Eger te divê sirran qenc eşkereki, bêje dujminan. Eger te divê direwan pêve zêdekî bêje jinan.

³ gilopîn: di haşiyeyê de “kulçe” hatiye gotin.

Dîger: Kî jinan bibe sûkê deyndar e, kî zaryan bibe tengezar e, kî bawer neke ber dîwar e.

Dîger: Yê nezanî cahil e, yê bizanîw neke ehmeq e

Dîger: Ehmeq ne ew e ku şuglê nezanî dike, belkî ehmeq ew e ku bi xeberê nezanan dike.

Dîger: Eger ji kerê ra bibêjî cahil, dixeyîdî ceh naxwe.

Dîger: Cihê kerê li serê jor e, yê seyê li ber derî ye, çendan jê maqûltir e.

Dîger: Bûka pişt perdê jî ku zehf birçî bî, dizid bî; we ger pur têr bî, dê biçir bî.

Dîger: Loqma xweş bide dostan, zimanê xweş bide dujminan, zewala te çênabit.

NAVEROKA BERHEMÊ

| | |
|--|----|
| FÎHRÎSTA EL-CEWAHÎRU'R REŞADÎYE FÎ SÎRETÎ'N-NEBEWÎYYE ¹ | |
| SEBEBÊ NEZMA KÎTABÊ | 2 |
| DI HEQÊ NESEBÊ ŞERÎF (S. 'E.W) DE | 6 |
| BEHSA WEQTA HEMLA WÎ TARÎXA WÎLADETA WÎ (S. 'E.W) | 7 |
| BEHSA 'ELAMETÊN PIŞTÎ WÎLADETE WÎ (S. 'E.W) | 9 |
| BEHSA YÊN KU ŞÎR DANÊ, YÊN EW HEWANDÎYE Û WEFATA DÊ Û BAVÊ WÎ (S. 'E.W) | 10 |
| BEHSA GIHAŞTINA WÎ BAL BÛSRAYÊ Û ĞEYRÎ BÛSRAYÊ VE Û GOTINÊN RAHÎBAN DI HEQQÊ WÎ (S. 'E.W) DE | 11 |
| BEHSA CAREKE DIN DERKETINA WÎ (S. 'E.W) BAL BÛSRAYÊ VE DI TÎCARETÊ DE JIBO XEDÎCE (R. 'ENHA) | 12 |
| ZEWACA WÎ(S. 'E.W) BI XEDÎCE (R. 'ENHA) RE Û AVAKIRINA KE'BEYÊ | 13 |
| BEHSA WEZÎFEDARKIRINA WÎ (S. 'E.W) YA BI PÊXEMBERTÎ | 14 |
| DI HEQÊ MÎ'RACA WÎ (S. 'E.W) DE | 18 |
| DI HEQÊ ÎSLAMBÛNA ENSAR DE (XWEDA JI WAN RAZÎ BE) | 31 |
| DI HEQÊ HÎCRETA WÎ (S. 'E.W) YA BAL MEDÎNÊ VE Û PIŞTÎ HÎCRETÊ .. | 32 |
| DI HEQÊ MEŞRÛ'BÛNA AZANÊ DE | 37 |
| DI HEQÊ ĞEZWEYÊN WÎ DE: ĞEZWA EBWAÊ | 38 |
| ĞEZWEYA BÛWAṬ | 38 |
| ĞEZWEYA 'UŞEYRE, ĞEZWEYA SEFWAN, GUHERÎNA QIBLEYÊ | 39 |
| ĞEZWEYA BEDRÊ YA MEZIN | 40 |
| ĞEZWEYA BENÎ SELÎM | 54 |

¹ Nimroyên rûpelên mijaran, ên destxetê ne.

| | |
|---|-----|
| ĠEZWEYA BENÎ QEYNÛQA | 54 |
| ĠEZWEYA SEWÎQ | 55 |
| ĠEZWEYA ĠEṬEFAN (ZÎEMR) | 56 |
| ĠEZWEYA BEHRAN | 57 |
| ĠEZWEYA UHÛD | 57 |
| ĠEZWEYA ḤEMRAEL ESED | 66 |
| ĠEZWEYA BENÎ NADIR | 67 |
| ĠEZWEYA ZATURRÎQA | 69 |
| ĠEZWEYA BEDRÊ YA DAWÎN | 70 |
| ĠEZWEYA DEWMETUL CENDEL Û MUREYSÎ' | 72 |
| ĠEZWEYA XENDEQ | 76 |
| ĠEZWEYA BENÎ QUREYZE | 83 |
| ĠEZWEYA BENÎ LEḤYAN Û ĠEZWEYA ĠABEH | 85 |
| ĠEZWEYA ḤUDEYBÎYE YANÎ ŞULHA WÊ | 86 |
| ĠEZWEYA XEYBER | 94 |
| ĠEZWEYA WEDÎL QURA | 99 |
| 'UMRETUL QEḌA | 100 |
| ĠEZWEYA FETHA MEZIN A MEKKEYA XUDA ŞEREF DAYÊ | 103 |
| ĠEZWEYA HUNEYNÊ | 114 |
| ĠEZWEYA ṬAÎF | 118 |
| ĠEZWEYA TEBÛK | 121 |
| BEHSA SERÎYEYÊN WÎ (S. 'E. W), 56 IN | 124 |

| | |
|---|-----|
| SERÎYEYA HEMZE B. ‘EBDULMUTTELÎB YA LI SER KARWANÊ
QUREYŞAN YÊ JI ŞAMÊ TÊ | 124 |
| SERÎYA ‘UBEYDE B. HERS B. MUTTELÎB BAL NEWALA RABÎGÊ VE .. | 125 |
| SERÎYA SE’D B. EBÎ WEQQAS A BAL XERARÊ VE | 125 |
| SERÎYA ‘EBDULLAH B.CEHŞ A BAL NEWALA NEXLEYÊ VE | 126 |
| SERÎYA ‘UMEYRÎL E’MER B. ‘EBDÎ JIBO KUŞTINA ESMA BÎNTÎ
MERWANA YEHÛDÎ | 127 |
| SERÎYA SALÎM B. ‘UMEYR JIBO KUŞTINA EBÎ ‘EFEKÊ YEHÛDÎ | 127 |
| SERÎYYEYA MUHEMMED B. MESLEMEYÊ EWSÎ JI BO KUŞTINA KE’B B.
EŞREF | 127 |
| SERÎYA ‘EBDÛLLAH B.’ETÎK YA JIBO KUŞTINA EBÎ RAFÎ’ SELLAM B.
EBÎL HEQÎQ | 129 |
| SERÎYA ZEYD B. HARÎSE YA BAL QARDEYÊ, BI SER KERWANÊ
QUREYŞAN VA | 129 |
| SERÎYA EBÎ SELEME ‘EBDÛLLAH B. ‘EBDULESED BAL QETENÊ VE .. | 130 |
| SERÎYA ‘EBDULLAH B. UNEYSÊ CUHEMÎYÊ ENSARÎ YA JIBO KUŞTINA
SUFYAN B. XALID | 130 |
| SERÎYA ‘ASIM B. SABÎT YA BAL RECÎ’ VE | 131 |
| SERÎYA QURRAÊ (R. ‘ENHUM) YA BAL BÎRA ME‘ÛN VA | 132 |
| SERÎYA MUHEMMED B. MUSLÎME BAL QURTA’ VA | 133 |
| SERÎYA ‘UKAŞE B. MEHSÎL ESEDÎ BAL ĞEMRÊ MERZÛQ VA | 133 |
| SERÎYA MUHEMMED B. MUSLÎME BAL ZÎLQIŞŞE VA | 134 |
| SERÎYA ZEYD B. HARÎSE YA BAL BENÎ SELÎME BÎLCEMÛM VA | 134 |
| SERÎYA ZEYD B. HARÎSE YA BAL ‘ÎSÊ VA | 134 |

| | |
|---|-----|
| SERÎYA ZEYD B. HARÎSE YA BAL ẒERFÊ VA | 135 |
| SERÎYA ZEYD B. HARÎSE YA BAL HİSMA VA | 135 |
| SERÎYA ZEYD B. HARÎSE YA BAL WADÎL QURA VA | 136 |
| SERÎYA ‘EBDURREHMAN YA BAL DÛMETUL CENDEL VA | 136 |
| SERÎYA ‘ELÎ B. EBÎ ẒALÎB A LI SER BENÎ SE’D B. BEKR | 137 |
| SERÎYA ZEYD B. HARÎSE YA BI SER UMMÎ QIRFÊ VA | 137 |
| SERÎYA ‘EBDÛLLAH B. REWAHÎYÊ ENSARÎ YA BAL USEYRE VA | 138 |
| SERÎYA KURREZ B. CABÎRÊ FÎHRÎ YA BI SER QEBÎLA ‘EKL Û ‘UREYNEYÊ
VA | 139 |
| SERÎYA ‘EMR B. UMEYYE EDDEMİRÎ YA BI SER EBÎ SUFYAN VA | 140 |
| SERÎYA ‘UMER B. XETTAB A BAL TURBETÊ VA | 141 |
| SERÎYA EBÎ BEKRÊ SİDDÎQ (R. ‘E) BI SER BENÎ KÎLAB VA | 141 |
| SERÎYA BEŞÎR B. SE’D ENSARÎ BI SER BENÎ MUREYYÊ FEDEKÊ VA | 141 |
| SERÎYA ĞALÎB B. ‘EBDÛLLAH ELLEYSÎ YA LI SER EHLÊ MEYFE‘A
NAHÎYA NECDÎ VA | 142 |
| SERÎYA ĞALÎB B. ‘EBDÛLLAH ELLEYSÎ BI SER MULÛHÊ LI KEDÎDÊ | 142 |
| SERÎYA ĞALÎB B. ‘EBDÛLLAH ELLEYSÎ YA BAL FEDEKÊ VA | 143 |
| SERÎYA ŞUCA’ B. WEHB ELESEDÎ YA BI SER BENÎ ‘AMİRÊ SÎYYÊ VA | 144 |
| SERÎYA KE’B B. ‘UMEYRÎL GEFARÎ YA BAL ZATU ETLAHÊ JI ERDA
ŞAMÊ VA | 144 |
| SERÎYA MU’TE | 144 |
| SERÎYA ‘EMR B. ‘AS YA BI SER BELDEYÊN BELÎW ‘UZREYÊ VA | 147 |
| SERÎYA ELXEBTÊ | 148 |

| | |
|---|-----|
| SERÎYA EBÎ QETADE YA BAL NECDÊ VA | 148 |
| SERÎYA EBÎ QETADE YA BAL ÎDEMÊ VA | 149 |
| SERÎYA XALID B. WELÎD BAL NEXLEYÊ JIBO XERAKIRINA ‘UZZA | 149 |
| SERÎYA ‘EMR B. ‘AS YA JIBO XERAKIRINA PÛTÊ SUWA’ | 150 |
| SERÎYA SE’D B. ZEYDÊ EŞHELÎ JIBO XERAKIRINA PÛTÊ MENAT | 150 |
| SERÎYA EBÎ ‘AMIR ELEŞ‘ERÎ YA BAL EWṬASÊ VA | 151 |
| SERÎYA ṬUFEYL B. ‘EMR EDDEWSÎ YA BI SER ZULKEFEYNÊ VA | 151 |
| SERÎYA QEYS B. SE’D A BAL ŞÛDA’ VA | 151 |
| SERÎYA ‘UYEYNE B. ḤISN ELFEZARÎ YA BAL BENÎ TEMÎM VA | 152 |
| SERÎYA WELÎD B. ‘UQBE YA BI SER BENÎ MUŞTELÎQ VA | 153 |
| SERÎYA ‘EBDÛLLAH B. ‘EWSECE YA BAL BENÎ ‘EMR B. ḤARÎSE VA | 153 |
| SERÎYA QUTBE B. ‘AMIRÊ XEZRECÎ YA BAL XEŞ‘EMÊ VA | 153 |
| SERÎYA DEHHAK B. SUFYANÊ KÎLABÎ YA BAL BENÎ KULABÊ VA | 154 |
| SERÎYA ‘ELQEME B. MUCZÎRÊ MUDLÎC BI SER ḤEBEŞÎYÊN ṬAÎFÊ ... | 154 |
| SERÎYA EMÎRUL MU’MÎNÎN ‘ELÎ BO XERAKIRINA FELSÊ PÛTÊ ṬEYYÎ | 154 |
| SERÎYA ‘UQAŞE B. MUḤŞÎNÊ ESEDÎ BAL CÎBABÊ ERḌA ‘UZRETÊ VA | 155 |
| SERÎYA CUREYR B. ‘EBDÛLLAHÊ BECELÎ BAL ZÎLXELEŞETÊ VA | 155 |
| SERÎYA USAME B. ZEYD BAL UBNEYÊ VA | 155 |
| DI HEQÊ ŞANDINÎYÊN WÎ (S.‘E.W) DE, ŞANDINA ŞIDDÎQ (R.‘E) JIBO
ÎNSANÊN LI HECCÊ | 157 |
| ŞANDINA EBÛ MÛSA ELEŞ‘ERÎ Û MÛ‘AZ B. CEBEL BAL YEMENÊ VA | 158 |
| ŞANDINA XALID B. WELÎD BAL BENÎ ‘EBDULMEDANÊ LI YEMENÊ .. | 158 |
| ŞANDINA ‘ELÎ B. EBÎ ṬALÎB BAL YEMENÊ VA | 159 |

| | |
|---|-----|
| HECCA XATIRXWESTINÊ | 159 |
| DI HEQÊ HEYETÊN HATINE CEM PÊXEMBER (S.‘E.W) DE | 160 |
| HEYETA NESRANÎYÊN NECRANÊ | 160 |
| HEYETA TEMÎMÊ DARÎ Û HEVALÊN WÎ | 161 |
| HEYETA SEQÎFÊ | 161 |
| HEYETA BENÎ ‘AMIR B. SE’SÊ‘E | 162 |
| HEYETA DEMAM B. SU’LEBE | 163 |
| HEYETA ‘EBDULQEYS | 163 |
| HEYETA BENÎ HENÎFE | 163 |
| HEYETA TEYYÎ | 164 |
| HEYETA ‘EDÎ B. HATEMÊ TAÎ | 165 |
| HEYETA ‘URWETÎL MURADÎ Û YA BENÎ ZUBEYDÎ | 165 |
| HEYETA KENDE Û YA EZDÊŞENÛ‘E | 166 |
| HEYETA QASID HARÎS B. KELAL Û HEVALÊN WÎ | 166 |
| HEYETA QASID FERWE B. ‘EMRÊ CIZAMÎ | 167 |
| HEYETA HARIS B. KE’B | 167 |
| HEYETA RUFA‘E B. ZEYDÊ XUZA‘Î | 167 |
| HEYETA HEMEDAN | 167 |
| HEYETA QEBÎLA TUCÎBÎ Û YA BENÎ SU’LEBE | 168 |
| HEYETA SE’DÊ HUZEYMÊ JI QUDA‘E | 168 |
| HEYETA BENÎ FEZARE Û YA BENÎ ESED | 169 |
| HEYETA BENÎ ‘UZRE | 169 |

| | |
|--|------------------|
| HEYETA BENÎ BELÎYY Û YA BENÎ MURRE | 170 |
| HEYETA XEWLAN | 170 |
| HEYETA BENÎ MUHARÎB Û YA SUDA' | 171 |
| HEYETA ĞESSAN | 171 |
| HEYETA SULAMAN Û HEYETA BENÎ 'EBS | 172 |
| HEYETA MUZEYNE Û HEYETA ŞA'IRAN | 172 |
| HEYETA DEWSÎ Û HEYETA TARIQ B. 'EBDÛLLAH ELMUHARÎB | 173 |
| HEYETA BEHZAE Û HEYETA ĞAMID | 174 |
| HEYETA EZDÎ, HEYETA BENÎ MUNTEFÎQ Û HEYETA NEXE' | 175 |
| DI HEQÊ MEKTÛBÊN WÎ (S.'E.W) DE YÊN JI MELÎK Û SEROKAN RA ... | 176 |
| BEHSA MEKTÛBA WÎ (S.'E.W) YA JI QEYSERÊ MELÎKÊ RÛMÊ RA | 176 |
| BEHSA MEKTÛBA WÎ (S.'E.W) YA JI KÎSRAYÊ MELÎKÊ FARIS RA | 178 |
| BEHSA MEKTÛBA WÎ (S.'E.W) YA JI NECAŞÎYÊ MELÎKÊ HEBEŞ RA ... | 178 |
| BEHSA MEKTÛBA WÎ (S.'E.W) YA JI MUQEWQIS RA | 179 |
| BEHSA MEKTÛBA WÎ (S.'E.W) YA JI MUNZÎR B. SAWÎYÊ TEMÎMÎ RA | 179 |
| BEHSA MEKTÛBA WÎ (S.'E.W) YA JI DU ZARYÊN CULENDÎ YÊ MELÎKÊ
'UMMAN RA | 180 ² |

² Fihrist li vir qedîyaye. Mijarên din nehatine nivîsandin.

METNA BERHEMÊ

1. BÎSMÎLLAHÎRREHMANÎRREHÎM WE BÎHÎ NESTE‘ÎNÛ

Be navê wî Xwedayê layezalî¹

Emê hemd û şena² ken zātê ‘alî

Şelat û hem selamê bênihayet

Li ser qafîle salarê rîsalet³

Digel al û şehabê wî kîramî

Şefî’ bin ew tamam bo me tamamî

Rîca ken ew ji rebbîl ‘alemînî

Ku ev şugla me nivîşkan⁴ nemînî

Li wechê xêrê ew bête nihayet

Be wechek ehse û mubdî kiramet⁵

Şerefbexş û şerefaz⁶ û şerefnam

Lî wechîllahîw bil îfa û îtmam⁷

Digel nef’a ‘ûmûmê bo unasan⁸

Xisûsî bo biran û cumle nasan

¹ layezalî(‘e): zewala wî tuneye

² şena(‘e): dana pesnê

³ qafîle salarê rîsalet: Karwanê serokên pêxemberîyê

⁴ nivîşkan: nivçe

⁵ mubdî kiramet(‘e): destpêka qenciyê, esasê şerefê

⁶ şerefaz: li ser şerefê zêde bi hirs û meraq

⁷ jibo wechê (riza) Xwedê pêk bê û tamam bibe.

⁸ nef’a ‘ûmûmê(‘e) bo unasan: jibo feyda temamê dostan

2. SEBEBÊ NEZMA KITÊBÊ

Qelem furşet ji meydanê hilîne
Di meydana te beşlek xaşî nîne

Li hev bade tu têlê her zemanan
Xeber de tu bi her new'ê zimanan

Ji eþwalê cuwanan xweş xeber de
Ji min ra lew gelek meqşûd û derd e

Ji tecwalê¹ di wan bêje bi tefsîl
Be lez bîne beyanê lew mi te'cîl²

Çiku gûdaşîker³ çavan li rê ne
Gelek tihên⁴ beyana defterê ne

Qelem rabe hilîne zend û bendan
Bide azadîya her qeyd û bendan

Zikê defter tijîke durr û cewher
Di kuza xwe tijîke ab û kewşer

Bike têrav hemû guhdar û haðir
Qedeþ pirke li pêşî cumle şa'ir

Bide 'edla meqalat û beyanan
Bike kerxa⁵ hemû kar û ziyanan

Didêrî ger gelek sermayeê baş
Ji bazarê nemîne lehzekî paş

Qelem hilde sîlahê ser dewatê
Bide helhel⁶ cuwananê welatê

¹ tecwal('e): ger, seyahet

² te'cîl('e): bi lez

³ gûdaşîker(f): kesên seh dikin, xeberdar dibin

⁴ tihên: tîbûn in

⁵ kerx: kerixîn, nefretkirin

⁶ helhel: şadî

Bizanin qencê da mîrek çewan î
Çeperdar⁷ î we betl û pehlewan î

Di me'na xwe serê top û tivingî
Ji ber hukmê te em tev mane bengî⁸

Serê xwe dane secde qeş nerabe
Bihîndan⁹ çêkî bo te pir xerab e

Mebêj îro şibe lew paşî nîne
Ji ber îro şibe paşî nedîne

Qelem bigre reha mişter li kağid
Meke serkêşî, nîn in te mu'anid

Cîhada te di deşta defterê ye
Te tedbîr pêşî lanbew fenerê ye

Gemî berde li ser behra dewatê
Bira hêl¹⁰ gaziyê xwe ser cevâtê

Bike ageh bi meqşûda xwe 'alem
Bike işbatê de'wa xwe tematem

Megir sistî, jita¹¹ sistî nebaş e
Çiku xerwarê¹² sistî hey li paş e

Tilîw pêçî qelem raken xebatî
Be angora¹³ xebata vî welatî

Li wifqa¹⁴ sermîyanê me feqîran
Heye keyfek bide mîr û wezîran

⁷ çeperdar: bi sîper

⁸ bengî: bêhişketî

⁹ bihîndan: sekin

¹⁰ hêl: bilind

¹¹ jit: însiyak, bi tirkî îçgüdü

¹² xerwar: çewalê mezin

¹³ angor: anegor, li gorî

¹⁴ wifq('e): li gorî, liyaqî, munasîb

Ricaa min ew e şermî nemînî
Li pêş karê biran xwey rû bimînî

Biçîne dê hilînî bêdera¹⁵ xwe
Ji heq mebre¹⁶ ummîd û mehdera¹⁷ xwe

Binêre mêşê hûrik hingivînî
Ji cehda xwe dixwe her dem şirînî

Gelek mu'teber e bi pêş debîran¹⁸
Şerefdar e di her cemî' wezîran

Zuban ma tune lalî de xeberde
Jibo guhdarekan keyfî beserde¹⁹

Li hev berhev bike muşterîyê xwe
Ji nav nase²⁰ ji dil can merîyê xwe

Ji sewqa gotinan ma hilibijêre
Mebêje ku dikana min li jêr e

Eger hêjayî bî berjor diçî tu
Be dîwana gelek berjor diçî tu

Dikey zêde xwe yêmê ger kehêl î²¹
Dimînî paş eger bergîr rehêl î²²

Bi ummîda qebûlê mi hilanî
Li destê xwe evê riqlê giranî²³

Ji min bawer mekin şuglê wehakî
Xudaya, min ji bin barî²⁴ rihakî

¹⁵ bêder: bender

¹⁶ mebre: nebire, qut neke

¹⁷ mehder('e): şefaet

¹⁸ debîr(f): îdarevan

¹⁹ beserde: bide ser

²⁰ nase: nas bike

²¹ kehêl: hespê 'esîl

²² rehêl('e): derketina rê

²³ riqlê giran: karê pir biqîmet

Ji destê bêkesî ketme pîyasê
Li xwe wergirtîye min vê kirasê

Ji destê bêkesî navê mi mîr e
Çikû rovî di xalî çolê şîr e²⁵

Gerandin çehvê xwe lawan nedîn kes
Ji bil vî Nûrîyê naçîz û nakes

Muhîm danîne ser dê tu birêsi²⁶
Bi dolaba nezim çend tayê rêsi²⁷

Ji ehwalê nebîyê mew sehaban
Çewan rast e ji rastê wan kîtaban

Digel herb û di wanê nijdevanî²⁸
Heçî tê da ku kirne pehlewani

Bi ezmanê me bit da em bimînin
Kîtabê me bi ezmanê me kê m in

Gelek muştaqê sehkirna wî yin em
Gelek muştaqê zanîna wî yin em

Ji lew em jî ji hîzbek ummetê ne
Ji lew em jî tebayê de'wetê ne

Çira mûhtacê bin derê gerbîyan
Bibin minnetkeşanê her edîban

Çira şûrê mi be xel pê bilîze
Bidem xelqê jîyan şimşîr û nîze²⁹

Ji mala me wekî sufra me bêtin
Li ser navê me ew xanî divêtin

²⁴ barî: bar, peywîr

²⁵ şîr(f): şêr

²⁶ birêsi: helbestan binivîsîn

²⁷ rêsi: werîs

²⁸ nijdevan: êrişker

²⁹ şimşîr û nîz(f): şûr û rim

Heqîqet min gelek tefîşî kir bû
Ji tehqîqê gelek dilrîşî³⁰ kir bû

Ji eşnafê umem kurdê me çêtir
Muhibtir bûn jibo wê xeyrê çêtir

Ji behşa fexrê ‘alem ger bihîstan
Wekî tuhfe³¹ didane heft û bîstan

Direvandin ji dev hev wê meqalî³²
Jibo hubba Resûlê fexrê alî

Dema bihîstina navê Mûhemmed(‘e.s)
Dibû kalîn jibo şahê mumecced³³

Dixwestin behşê wî bit meclîsa wan
Di vana hemsê³⁴ wî bit mebhêsa wan

Hemû ehdê di wî mîşaqê³⁵ wan bû
Hemû cehdê di wî ewşaqê³⁶ wan bû

Ğidaa rûhê wan bû şîretê wî
Heyata eqlê wan bû şîretê wî

Ji rûhê xwe gelek zêde di vana
Ji can û mal û ewlad û tevana

Ji zana û edîbê xwe di pêşîn
Gelek gazindeyan dikran diêşîn

Çira tedbîrekê bo me nedîne
Gelo ma qeṭ ne em jî ademî ne

³⁰ dilrîşî: dilbirînî

³¹ tuhfe(‘e): hediye, mucewher, şaheser

³² meqal(‘e): gotin

³³ mumecced(‘e): kesê mezin û bişeref

³⁴ hems(‘e): dengê veşartî, pispisandin

³⁵ mîşaq(‘e): peyman

³⁶ ewşaq(‘e): piraniya bend û təkiliyan

Çira her kes bi me ender heşar³⁷ in

Çira ev qasê ha em ustûxwar in

Meger dîndarîya me qeş nema ne

Ku para me ne pir hindik nedane³⁸

Ji halê wan dilê min sohtî agir

Ewî daî' digo min da nîda kir

Ji mecbûrî mi rahêla sîlahê

Ketim vê me'reka³⁹ fewz û felahê

Bikarim belkî nîvek meqşeda wan

Welê dûr û giran e me'heda⁴⁰ wan

Xuda yardim bike wer ne giran e

Ne heddê gotin û qewl û ziman e

Deî'f im ya îlahî min qewî ke

Belîd⁴¹ im min bi zanaî rewî ke

Wekî Mûsa dixwazim şerhê singê⁴²

Di vê şuglê nede min wehna lingê⁴³

Heşêb ke her jibo xwe ya îlahî

Nebî se'ya 'ebes⁴⁴ pûçû tebahî⁴⁵

Bibitin nefî' bo îxwanê dînî

Dua' ket kî bixwînî yan bibînî

Ricaa min ew e Fexra Rîsalet

Mi navê pişt guhê xwe der şefae't

³⁷ ender heşar(f): li nav dorpêçkirinê

³⁸ nedane: nezanî

³⁹ me'reke('e): meydana herb û şer

⁴⁰ me'hed('e): cîyê hatiye ehdkirin, cîyê hevdfîtinê

⁴¹ belîd('e): sersem, nezan

⁴² şerhê singê: firehiya qelb

⁴³ wehna lingê: sistî û bêqûwetiya gavê

⁴⁴ 'ebes('e): pûç û bêfeyde

⁴⁵ tebahî('e): mehvûyî, xerabûyî

Wefadar û şefîq û pir henûn e
Ji wî qeṭ bêwefaî çê nebûne

Qebûl ket wer neket mecbûrê wî me
Sitûxwar û dexîlê darê⁴⁶ wî me

Xuda hez ket emê dê wî bibînin
Di ‘erḍa meḥşerê xwe pê gehînin

Xwe pêxin cil xwe têxin mil nikarî
Be î’raḍa⁴⁷ rica me rûne xwarî

Hilînit zend û bend û hûçikê⁴⁸ xwe
Bike mehder⁴⁹ jibona kûçikê xwe

Xuda jî dê qebûl ket mehdera wî
Resûlûllahî geş bit meḥḍera⁵⁰ wî

‘Edûwwê le’netê⁵¹ meḥzûn bimîne
Xweyê se’ya ‘ebes⁵² meḡbûn⁵³ bimîne

Nebe şabit li ser fê’la bedê⁵⁴ xwe
Ji poşmanî di hev miz de yedê⁵⁵ xwe

Muqabîl murselînan şahê mazin
Wisa ket ku şefae’t tev bixwazin

Newêroka xwe pê danîn bibin xûl⁵⁶
Di mehder da be mehder bibne meşgûl

⁴⁶ Dar(‘e): mal

⁴⁷ î’raḍ(‘e): dûrxistin

⁴⁸ hûçik: parçeyê kinc ê cîyê desta

⁴⁹ mehder(‘e): şefae’t

⁵⁰ meḥḍer(‘e): cîyê lê hazir bibe

⁵¹ ‘edûwwê le’netê(‘e): dijminê mel’ûn

⁵² se’ya ‘ebes(‘e): karê pûç û bêfeyde

⁵³ meḡbûn(‘e): xapandî, şaşbûyî

⁵⁴ fê’la bed(‘e): tevgera xerab

⁵⁵ yed(‘e): dest

⁵⁶ xûl: tewandî

Hezaran wek min rûreş û gunehkar
Ji wan musteheqqê cehennem û nar

Xelaş ken bêtime ‘erda necatê
Nebîn şermî li nav kom û cevâtê

Çikû şerma hevalan jê giran e
Ji narê cehnemê parçek bizane

Îlahî me nexî şerma hevalan
Me nespêrî li nefis û bedfea’lan

Li pêşber her hevalan me li rûkî⁵⁷
Li me negrî xeşa û sûc û sûkî⁵⁸

Li ser me şa nekî dujmin nevînan⁵⁹
Nekî mehzûn muhîban û evînan

Eger çi şahîbê curm û xeşa in
Ne axir em ji teb’ê’ Muştefa in

Xeşaê me eger mîna çîya ye
Di bin rehma te da qeş naxuyaye

Ne şe’nê te me yê mîna zûbabê⁶⁰
Bikêşî tu bi qehrê bîn ‘ezabê

Ne nefî⁶¹ te heye der taetê me
Ne derra⁶² te heye der saetê me

Xulaşe em ji umîdê venabin
Ji rehma te tu car bêhêvî nabin

Bi ‘edla te heman jî raqî⁶³ in em
Bi ‘edla te hemû jî qadî⁶⁴ in em

⁵⁷ li rûkî: bi rû bike

⁵⁸ sûkî(‘e): sûyekê, xerabîyekê

⁵⁹ nevîn: kesê nexoşnûd, nerazî

⁶⁰ zûbabê(‘e): mêş

⁶¹ nefî(‘e): feyde

⁶² derra(‘e): zerar

3. DI HEQÊ NESEBÊ RESÛLÛLLAH DE (‘E.S)

Resûlullah Muhemmed Mustefa ye

Ji pîrmehmûdî ye ku lê xuyaye

Ji hed zêde kemalateş⁶⁵ bizanin

Ku navê wî hezar navê tamam in

Ji ‘Ebdullahê ‘Ebdîlmuttelîb hem

Reîsê cumleyê ewladê Haşîm

Kurê ‘Ebdulmenaf îbnû Quşeyyî

Kîlab û Murre û Ke’b û Lueyyî

Ji Ğalîb lawê Fehrê lawê Malîk

Kurê Neđîr Kenane zîlmesalîk⁶⁶

Xuzeyme, Mudrîke, Îlyasê îbnî

Muđer lawê Nezar, Mue’ddê îbnî

Ewî ‘Ednanê ku mucme’ ‘eleyhî⁶⁷

Li wî lê xulf e mîn adem îleyhî⁶⁸

Sebeb ku wan deman nîbûn kîtabet

Bi vê țerzê nebû ayîn û ‘adet

Zeman pîr tê bihurî hifzî rabû

Bi ‘eynî navî ez zîhnî cûdabû

Ku tarîx û kîtabet kevtê rolê

Xilaf ji vê ra tev derkevtê çolê

Xilaf çendî ku tê da bê ‘eded bû

Welê gotin ku ewladê Uded bû

⁶³ rađî(‘e): razî

⁶⁴ qađî(‘e): yê fîne cî

⁶⁵ kemalateş(f): kemalatên wî

⁶⁶ zîlmesalîk(‘e): bi rêya

⁶⁷ mucme’ ‘eleyhî(‘e): li ser wî di ‘eynî fikrê de ne

⁶⁸ xulf e mîn adem îleyhî(‘e): ji wî pê ve îxtîlaf heyê

Ku îbnî Elyese' bû lawê Ye'reb
Kurê Yeşcer ku Qeydar e ewî eb⁶⁹

Ku ew jî lawê Îsmâ'î zebîh e⁷⁰
Ku ew jî lawê Îbrahîm melîh e⁷¹

Kurê Tarex kurê Naḥûd bizanin
Kurê Şarûx kurê Ergû bizanin

Kurê Faliğ kurê 'Abir ji Şalix
Kurê Erfexşedê Sam e be şalix

Ku ew jî lawê Nûḥ e bêxelaf e
Ḥetta Adem bila meyn û gezafe⁷²

Yeqîn e Nûḥî jî lawê Lemek bû
Kurê Metoşleg ji Îdrîsî fek bû⁷³

Kurê Yerdê îbnî Mehlaîl Qeynan
Bizan lawê Enûş e ew be înan⁷⁴

Ji wî Şîs Xudanê feḏl û huner bû
Ku lawê Ademê babê beşer⁷⁵ bû

Evanan cumle eşref efḏelûn⁷⁶ in
Bi kufr û şîrkê qeṭ'a nezebûn⁷⁷ in

Hezaran qencîyû feḏl û hunerha⁷⁸
Keramethayê şed jîr û zeberha⁷⁹

⁶⁹ eb('e): bav

⁷⁰ zebîh('e): qurban

⁷¹ melîh('e): xwedî hîlm û nermîyê

⁷² bila meyn û gezaf('e): bê niqaş û şubhe

⁷³ fek bû: hat dinyayê

⁷⁴ be înan: bi yeqîn

⁷⁵ babê beşer('e): bavê însaniyetê

⁷⁶ eşref efḏelûn('e): kesên xwedî fezîleta pir bişeref

⁷⁷ nezebûn(f): nemubtela

⁷⁸ hunerha(f): xwedî huner û me'rifetan

⁷⁹ zeberha(f): xwedî bilindîyan

Ji wana dîtine mustegnîye⁸⁰ da
Bibêjem ta beyan bînim di vir da

Me dur⁸¹ dîtî şedef lê ken qiyasê
Çiku wan tev ji dur girt in'îqasê⁸²

Dîya wî Amîne qîza Weheb la
Wê wî 'Ebdîlmenafê zehre şehla⁸³

Hemû ehlê nîkahê wefqî şer'ê⁸⁴
Nebûn tê da ji cahiltî tu bid'ê

Ji aba⁸⁵ û ji ummehatê⁸⁶ fexrê
Ne facirtî hebûn ne yê di 'uzrê

⁸⁰ mustegnî('e): zengînî

⁸¹ dur('e): durr, bi tirkî incî

⁸² in'îqas('e): şewq

⁸³ zehre şehla('e): çiçeka pir xweşik

⁸⁴ wefqî şer'ê('e): li gorî / bi emrê şerîetê

⁸⁵ aba('e): piraniya bav

⁸⁶ ummehat('e): piraniya dê

4. BEHSA WEQTA HEMLA WÎ Û TARÎXA WÎLADETA WÎ (S.‘E.W)

Xudaya! Şadîya me newgiha¹ ye

Şefaa me bulend e, bêbiha ye

Dilê rûhê me pur şadî dixwazî

Li pêjna şadîyê ye ku dibazî

Meger qal û bela da pê hîsabû

Ji ew geh² lew muhîbbê Muştefa bû

‘Eceb çawan di ew berzex nebazî

‘Edem nedrand³ û negha serfirazî

Çewan karî şebir kir ta be ev dem

Çewan meydan ne hilda pêşî Adem

Dila Eħmed hebû ‘alem nebû hêj

Ĥebîbê rebbî bû Adem nebû hêj

Ji nûra wî bû Adem hate kewnê

Çewan kullî mukewwen⁴ hate lewnê⁵

Ji sebğa fedl û tekrîm û wucûdê⁶

Te‘eccub sed te‘eccub tê şuhûdê

Çewan wî seyyîdê Adem Xuda kir

Ji nesla Ademî çewan wî rakir

Rica Adem be wî kir hêj nebûyî

Çewan babê heyî bit yê nebûyî

Welê ĥikmet dizanim meħdê tefdîl⁷

Ku her ĥukmek bi ĥukmê wî ye tebdîl

¹ newgiha(f): nû kemilî

² ew geh: wê demê

³ nedran: ne çirand

⁴ kullî mukewwen(‘e): hemî mexlûqat

⁵ lewn(‘e): reng

⁶ sebğa fedl û tekrîm û wucûdê(‘e): pîrbûna fezîlet û şeref û hebûnê

Xulaşê weqtê hikmet kir zîyade
Te‘elluq kir bi meqşûdê îrade

Şedef cî kir evî durra heqîqî
Di zîlhîcch di eyyamît teşrîqî⁸

Şebih cem‘ê di bîstê mahê Nîsan
Li nik wustayê cemret⁹ çan nivîsan

Nehê mahê Receb hin kirne meşhûr
Gelek jî qîl û qalan kirne mestûr¹⁰

Welê tercîhê wan de‘ba¹¹ me nîn in
Bi wî qasî quşûra min nebîn in

Di Meke lê di nav erdê Mînayê
Mînayê jî hilanî her munayê

Ji ummî¹² wî xudan feql û keramet
Suqatê¹³ rawîyan tînin rîwayet

Ku qeṭ‘a zehmet û seql û giranî
Nekêşaye ji hemla newciwanî

Nebû eger ji wê hemla be es‘ad¹⁴
Ji bil ku qeṭ‘î bû ew heydê mî’tad¹⁵

‘Eceîbha¹⁶ di xewnê da didîta
Ji mizgîna di xeyrê pir didîta

Ebî Adem we ûlûl‘ezmê ruslan
Didayê mujdeya wî xeyrê ruslan

⁷ mehdê tefdîl(‘e): tercîha saf, meztir dîtina bêşek

⁸ eyyamît teşrîqî(‘e): rojên teşrîqê yên deh û yanzdeh û diwazdehê Zilhîcceyê

⁹ wustayê cemret(‘e): Ji Mînayê ber bi Mekkeyê ve cemreya navîn e.

¹⁰ mestûr(‘e): xet, rêçik

¹¹ de‘b(‘e): xûy, ‘adet

¹² umm(‘e): dê

¹³ suqat(‘e): emîn, pê bawer

¹⁴ es‘ad(‘e): mesûdtir, yê herî bextîyar

¹⁵ heydê mî’tad(‘e): heyza ‘adetî

¹⁶ ‘ecaîbha(f): ‘ecaîban

Gula bağê rîsalet bû geş û xweş
Wekî bilbil bû Îbrahîm û Nûheş¹⁷

Be firyad û fîğanê bû şukuften¹⁸
Sehergeh¹⁹ kengî pişkefte li çîmen

Ji hemlê neh mehan çûne bi ser da
Li setha²⁰ erdê ummet rojê ser da

Ji eşşeh rawîyan têtin rîwayet
Ku zehra²¹ Amîne weh²² kir hîkayet

Sehergaha duşembe dazdehem bû
Rebîul ewwelê şem'a²³ me hil bû

Ji nageh²⁴ ruhni bû dîwarê xane
Ji nûra tel'eta bedra²⁵ yekane

Wekî fecrê delîlê rojê tali²⁶
Ji wê ruhni dibî meşrîq metali²⁷

Kewakîb²⁸ hatine nêzîkî erdê
'Enaqîdê 'îneb san²⁹ nêzî erdê

Şîşê alayê kesk wê gê³⁰ çikandin
Li Ke'be yek li şerq û gerb nihandin³¹

Şeyatîn ketne fîzar û fîğanan
Li me rê girt ji çûna asîmanan

¹⁷ Nûheş(f): Nûh jî

¹⁸ şukuften(f): vebûn

¹⁹ sehergeh: weqta seherê

²⁰ seth('e): rû, zemîn

²¹ zehra('e): weka hêvê pir biriqandî

²² weh: weha

²³ şem'a('e): nûr, çira, tîrêj

²⁴ Nageh(f): nuşka ve

²⁵ tel'eta bedr('e): xweşkahiya çardeha hêvê

²⁶ tali('e): hilatî

²⁷ metali('e): cîyê hilatinê

²⁸ kewakîb('e): piraniya sitêrkan

²⁹ 'enaqîdê 'îneb san('e): sênika gurşiya tirî

³⁰ wê gê: wê demê

³¹ nihandin: bi cî kirin

Sekî mazin³² diçû ser Bûqubeysi³³

Li xwe berhev dikir zuryet wî pîsî

Digiryana dikirna zare zarî

Wekî tofan bela bû lê dibarî

Jibo me rehmet û bo wan bela bû

Bi wî, şemla şeyatînan bela bû³⁴

Weđi' kir bê ezayayê wîladet³⁵

We hem bê wan qirêjayê di 'adet

We hem mextûn³⁶ û çehvê wî bi kil bû

Muwecceh ba sema³⁷ rif'et di dil bû

Di sala filê piştî şeş hezarê

We çil û sê ku Âdem hate xwarê³⁸

Di eyyama Nûşîrewanê 'adil

Ku hil bû³⁹ nûrê wî qendîlê kamil

Di panşed heftê û yek ref'ê 'Îsa⁴⁰

Li esmanan li me fanos teyîsa⁴¹

³² sekî mazin: kûçikî mezin yanî îblîsê le'în

³³ Bûqubeys: Çiyayê Ebû Qubeys

³⁴ şemla şeyatînan bela bû: koma şeytanên ji hev belav bû

³⁵ Weđi' kir bê ezayayê wîladet('e): hatina dinyayê bê eziyet pêk hat

³⁶ mextûn('e): sunnetkirî

³⁷ muwecceh ba sema('e): berê wechê wî li asîman bû

³⁸ 6043 sal piştî Adem pêxember

³⁹ hil bû: bilind bû

⁴⁰ 571ê mîladî

⁴¹ teyîsîn('e): biriqandin

5. BEHSA ‘ELAMETÊN PIŞTÎ WÎLADETA WÎ (S.‘E.W)

Ji şahî Ke’be ket hejyanê ew şev
Dewam kir lerze ta sê roj û sê şev

Bi şiddet bû ewê hejyan be dansan¹
Kesê hadir ji hedma wê diñirsan

Li Kîsra wê şevê eywanê şeq bû
Bi çarde şeq hetta xîmê² be heq bû

Ji ñirsan bû bi qelqel hem be dêşan³
Li hev top kir remildar⁴ û keşîşan

Gelo ev çi ‘eceb halew hewadiş
Çi ye gotin tefaye narê Faris

Mecûsan hildikir salan hezarî
Venedmirya diçûn secda wî narî

Diger gotin “Çikaye behrê Sawe”
Rewan bû ew newala nav Semawe

Ji ñirs û ñirsê ñirsek dî hilanî
Tekellum îdî nedhate zibanî⁵

We hem sulţan gelek bûn lal û exres⁶
Ji îrhaşa⁷ Nebîyyê Şahê eqdes

Remildar û xeberdaran digotin
Di îşev weldîye⁸ mulûdê mazin

Ewê rake sicûdê pût û latan
Ewê bistîne her erç û welatan

¹ dansan: dibe ku mîna dansê be

² xîm(f): esas

³ be dêşan: bi komanî

⁴ remildar: yê/ya li fa’lan dinêre

⁵ ziban(f): ziman

⁶ exres(‘e): lal

⁷ îrhaş(‘e): xerîqûlade

⁸ weldîye(‘e): welidîye, hatiye dinyayê

‘Ereb vegre hetta Rûm û ‘ecem jî
Ewê bişkîne her pût û şenem jî

Çewan dîtî şenem jî sernuxûn bûn
Heqîr û pîs û bêrû û zebûn bûn

Yeqîn ku rast e piştî van delîlan
Gemek hatî te dişbande ‘elîlan⁹

Çewan weldî ji wê nûr îstîla kir
Ku qeşr û buşreyê¹⁰ tê da xuya kir

Çi bêjim bê hesab in wî ‘elamet
Ku her ew rê bibit xetmê rîsalet

⁹ ‘elîl(‘e): seqet

¹⁰ buşr(‘e): menzere

6. BEHSA YÊ KU ŞÎR DANÊ Û YÊ KU EW HEWANDÎYE Û WEFATA BAV Û DÎYA WÎ (S.‘E.W) Û KEFALETA KALÊ WÎ Û APÊ WÎ EBÛ TALÎB

Wucûda wî ku dunya kir muzeyyen

‘Ereb fexra mezin hilda mu‘eyyen

Xuşûşa wuldê ‘Ednan û Qureyşî

Benû Haşim şeref hilda di pêşî

We ‘Ebdulmuţţelîb ser çû semaê

We zêde ‘Ebdullah Amîne daê

Çikû şemsa di wan hey bêzewal e

We sehw¹ wan jî hey hey bêmelal e²

Ji wana şewqê da ser ummetê jî

Temam hildan bi wî hem dewletê jî

Dema wildî diya wî şîrî daê

Suweybe hem li bal ummî wî daê

Jibo murdîe’³ yê³ heşt in tamamî

Hinan gotin deh in lê yê dewamî

Helîme Se’dîye xweş Se’dîkan e

Şerîf e hem kerîm e xweş eman e

Di hîna ku ewî bir nêvê malan

Digotanê⁴ jinê ‘eyla hevalan

“Yetîm e, dê çi xêrê jê bibînî?

Kî nef’a tîflê jalî⁵ ebeweynî”

Digot zaro nema bûn lew min anî

Tewekkul min li rebbê asîmanî

¹ sehw(‘e): şiyarbûnî

² bêmelal: bêacizî, bêxem

³ murdîe’(‘e): dîya şîr

⁴ digotanê: jê re digotin

⁵ jalî: ji aliyê

Kerek wê bû, dimanî komê hestî⁶
Meger nîşan nehildabû ji hestî

Dema hilda Nebî lê bû suware
Difîrya te digo cinnê teryare

Heval û xelqê karîwan ‘eceb man
Çikû ew çû heval westan te‘eb⁷ man

Ji e‘cazê xeber da wê etanî⁸
Li pişta min Nebîy axir zemanî

‘Eceb nîn e eger bifrim hewayê
Wî bighînim bi sedrîl muntehayê

Çewan çû, qewmê Se‘dî ket feraxê⁹
We bû erzanî wê erdîyyû axê

Melek hatin li wî şeq dane singan
Deranîn nuqteya eswed ji singan

Digotin hezzê¹⁰ şeytan e, xebîs e
Nemerdîyyê jibo zatê reîs e

Dema Dûmre¹¹ birayê wî wiha dî
Be tîrs û lerz hewar kir hate wadî

Werin exî Qureyşî nijdeyan bir
Qebîle qefle qefle bûn û bir bir¹²

Bi hev ra tev bezîne wê hewarê
Ku dîn rûniştîye jorî nezarê

⁶ komê hestî(f): qafila heyî

⁷ te‘eb(‘e): westan, betilîn

⁸ etan(‘e): kera mê

⁹ ferax(‘e): hêşînûn û firehî

¹⁰ hezz(‘e): nisîb, par

¹¹ Birayê Wî (‘e.s) yê şîr ‘Ebdûllah

¹² bir bir: grûb grûb

Helîme zû gehîştê go çi hal e
Fidakar im jibona te tîfal e

Digo dayê ji geybê du nefer bûn
Cilê wana sipî dorê mi wer bûn¹³

Kelaştin sîne û min jê nedî êş
Welê vaye cîyê şeqqê wê bê rêş¹⁴

Helîme tîrsîya û gote zewcê
Divê em vê bikin teslîmî fewcê¹⁵

Ku hêjan ew selîm û bê melal e
Hêbîb û dilrîba¹⁶ û pir delal e

Welê narê fîraqa wî di dil bû
Birînê dil gelek bû zêde kul bû

Hilanîn hatine beḥayê¹⁷ Mekke
Welê wenda kirin nêzikî Mekke

Hewar birne jibo ceddî bi te'cîl¹⁸
Bi lez rabû bi temcîd û bi tebcîl¹⁹

Digel wî îbnû Newfel bû ku dîtin
Li bin darek ku nasîn wî hilatin

Heta anîne mal û munşerîh²⁰ bûn
Dewar û pez kirin qurban fereh bûn

Muqîmê xîdmeta wî Ummû Eymen
Bereket carîya da Zeydê ehzen

¹³ wer bûn: pêçan

¹⁴ bê rêş: bê birîn

¹⁵ fewc(‘e): qebîle

¹⁶ dilrîba(f): dil distîne, dilrevîn

¹⁷ beḥa(‘e): newal, erda dîz an jî navekî kevn ê Mekkeyê

¹⁸ bi te'cîl(‘e): bi lez

¹⁹ temcîd û tebcîl(‘e): kirina medh û hurmetê

²⁰ munşerîh(‘e): dilrihet

Di piştî çar û yan şeş sal tamam kir
Diya fexra Benî Zuhre wefat kir

Çewan babê wefa kir ku hemil bû
Hinan gotî belê wê geh tîfil bû

‘Eceb nîne ku ma bê da û babê
‘Eceb bû ger ‘ezîz bûbya be babê

Yetîmî şe’nê wî durra yetîm e
Çukû muxtarê²¹ wî şahê ‘elîm e

Xuda nedxwest ku kes minnet nihîne
Li ser muxtarê ku cem wî emîn e

Kefîl ceddê wî ‘Ebdulmuţţelîb bû
Heta heşt sal û du meh munqelîb bû²²

Ji wî paşê Ebû Talîb bitin ma
Kefalet qencî kir yewmen fe yewma²³

Xuda zanit çi kêşa ‘emmê mişfeq²⁴
Heta ecra Xuda kir heqqê mutleq

²¹ muxtar(‘e): yê bijartî

²² munqelîb(‘e): guherî

²³ yewmen fe yewma(‘e): roj bi roj

²⁴ ‘emmê mişfeq(‘e): mamê bi şefqet. Di haşiyê de “mamê mişfeq” derbas dibe.

7. BEHSA GIHAŞTINA WÎ (S.‘E.W) BAL BUSRAYÊ Û ĞEYRÎ BUSRAYÊ VE Û GOTINÊN RAHÎBAN DERHEQÊ WÎ DE

Di ‘umrê heftê salî çehvê êşa

Birin ‘Ukkazê ba rahîbkî dilşa

Çû ‘Ebdulmuţţelîb kir gazî rahîb

Cewaba wî neda ewwel ve rahîb

Ji nageh dî ku hejya dêrê muħkem¹

Revî derve yeqîn kir bibte muhdem²

Nîda kir gote ‘Ebdulmuţţelîb ev

Nebîyyê axirê dewr e yeqîn ev

Eger xaric nebûma ez ji dêrê

Dibûya munhedîm der ħalê dêrê

Evê bistîne Rûm û Turk û Tacîk

Ewê ummet bigêre Kurd û Gurcîk

Nedin nîşanî her ehlê kîtaban

Biparêzin ji şerrê wan kîlaban

Çikû wechê bibînin dê binasin

Li şerrê wî dixebtin elxennasin

Yehûdê pîs û mirdalê³ di cî dîn

Li ðerrê⁴ wî ne her daîm ji mêjîn

We go dermanê wî dîna li bal e

Ji tûka wîyyê ‘ezbê⁵ hem zelal e

Çewan bir rîqê⁶ wî lê da şîfa bû

Çikû cem Rebbê xwe ew muşţefa bû

¹ muħkem(‘e): saxlem, zexm

² muhdem(‘e): hedimî, xerabûyî

³ mirdal: mirdar

⁴ ðer(‘e): zîrar

⁵ ‘ezb(‘e): şêrîn

We go wellahî rîqa wî şîfa ye
Jibo her derd û emrađan⁷ dewa ye

Di sinnê⁸ dazdehê da çûbû Beşra
Çewan ku dîtî wî Cercîs Behîra

Bezî destê wî, bûsî⁹ pir bi îkram
We ehlen got bixêr hatî bi en‘am¹⁰

We go wellah nebîyê axerîn e
Ber û dar diçne secde ku dibîne

Ji bil pêxemberan ra secde nabin
Çewan qaîl bi vî cumle kîtab in

Ji dûr ve min didîta min yeqîn kir
Nebîy ye min bi teşdîqê emîn kir

Xwezî wî kes ku pê îman werîne
Xwezî ew kes ku wî de‘wet bibîne

Xwezî ew kes ku bibte ummeta wî
Xwezî ew kes ku bighê nuşreta wî

We gotî xwe bihevzîne gelek baş
Ji keyda wan yehûdî pîsê qellaş

Neçe Şamê ji lew tîrsim Yehûdan
Te bukjin wan pelîdan¹¹ û hesûdan

Belê hafîz Xuda ye haşa haşa
Ku sûtqêşdike bête temaşa

Ewê hamî jibo wî her Xuda bit
Qelawûzê wî çawan jê cuda bit

⁶ rîq(‘e): tûk, ava dev

⁷ emrađ(‘e): nexweşî

⁸ sin(‘e): sal, temen, ‘umr

⁹ bûsî(f): maçî kir

¹⁰ en‘am(‘e): lutûf, qencî

¹¹ pelîd(f): xerab, şeytan

Meħal e ew biçe ku rahîyyê da
Ne mumkin ku bimîne tarîyê da

8. BEHSA HER DU CARÊ DERKETINA WÎ ('E. S): BI BAL BÛSRAYÊ VE Û JIBO TÎCARETÊ DIGEL MEYSEREYÊ ĞULAMÊ HZ. XEDÎCE (R. 'ENHA)

Gehište sinnê bîst û pencê salan
Digel Meyseret û cem'ek hevalan

Helatin çûne Buşra carekî dî
Bi qeşda tacîrîyyû rebh û se'dî¹

Ecîr bû ew jibo feqla Xedîce
Di berya hêj negêrabû wî zewce

Gehište Şamê çûne sûqê Buşrê
Xu da tenha seha darek wê bedrê

Ji dûr ve dîtî Nestûrayê Rahîb
Sual kir ev kî ye ey ehlê mewkîb²

Muħemmed lawê 'Ebdullahî gotin
Emînê Haşeman e ey tehîmtin³

Qesem wellahî go ma ev resûl e
Xudanê 'îzz û temkîn û qebûl e

Ji lew ğeyrî nebîyyan kes nikarî
Li bin vê darê ha bigret qerarî

Digot Meysere wellahî di tavê
Du şexşan wî dihifzandin ji tavê

Çewan ku saye⁴ dabû ser gemame⁵
Wekî şemsê bû nêzikî 'emame⁶

¹ rebh û se'dî('e): qazanc û bextî

² mewkîb('e): karwan, qefîle

³ tehîmtin('e): bi bejn û bal, gernas

⁴ sa: sî

9. BEHSA ZEWACA WÎ (S.‘E.S) YA BI XEDÎCE (R. ‘ENHA) RE Û AVAKIRINA KE’BEYÊ

Di hîna ku ricû’ kir wî ji Beşra

Ticaret rubhî bû ecren fe ecra⁷

Nikaḥ kir wî Xedîcetul emîn e

Tebarek ew ku ummul mu’minîn e

Henîen şed henîen⁸ bo dîya me

Xudeyce ev çî en‘amek tamam e

Tebarek şed tebarek xu neda paş

Ji vê kana⁹ şeref feḍla gelek baş

Ji nîkê bextê¹⁰ bû hem bextîyarî

Ku xeyrê ‘alemê kir îxtîyarî

Ji ‘eql û feḍl û teşrîfa mu‘ezzem

Ku bû zewcê supehsalarê¹¹ adem

Qerînê wê di firdewsa birînî

Ḥeta ḥeta celîsê wî dimînî

‘Umur çû bîst û pênc salan¹² Qureyşan

Kirin te’mîrê beytê ku dihilşan

Li hev de’wa kirin weḍ‘a berê reş¹³

Li cî dê kî nihe, bû de’we û gelş¹⁴

Kesê dane şeref dê ew hilînit

Riyaset dê ji wî ra her bimînit

⁵ gemame(‘e): ewrê sipî

⁶ ‘emame(‘e): şaşika li serî

⁷ ecren fe ecra(‘e): qezenc li ser qezencê

⁸ henîen(‘e): ‘efiyet be, mubarek be

⁹ kan: me’den

¹⁰ nîkê bextê(f): bexteke baş

¹¹ Supehsalar(f): serleşker

¹² divê sîw pênc be ne bîst û pênc

¹³ weḍ‘a berê reş: bicîkirina kevîrê Hacerul Eswed

¹⁴ gelş: pirsgirêk, mesele

Ji puştî de'we û qîl û şîqaqê
Bihev ra cumlekan kir îttîfaqê

Ji babê¹⁵ Şeybe va ye'nî kesê bê
Bila ew dane em tev rađî in pê

Ji nageh ve Mûhemmed dîn ku derket
Ji wê dergê ve ƣali'¹⁶ bû beser ket

Hemî gotin Mûhemmed xweş emîn e
Hemana ev ji hemyan ƣitîrîne

Nebî go bîn cilek yan ji 'ebayê
Biken tê da hilînin tev tebayê

Belê weqta birin ser cî ve yoldaş
Bi ten¹⁷ cî da Mûhemmed ew berê baş

Be destê xwe mubarek her wî danî
Jibo ku cî bibit wî cawîdanî¹⁸

Gelo tiştê ku danit kes dê hilde
Fela kella qesem bîllah ne rind e

¹⁵ bab('e): derî

¹⁶ ƣali'('e): hilatî, derketin

¹⁷ bi ten: bi tenê

¹⁸ cawîdanî(f): ebedî

10. BEHSA WEZÎFEDARKIRINA WÎ (S.‘E.W) YA BI PÊXEMBERTÎ

Bibin mujde jibona ‘alemîn e

Eva hat serwerê dinya û dîn e

Şukur hat Maḥiyê¹ pûtan û latan

Şukur hat ruhnîya erd û welatan

Şukur qendîlê hil bû, rah xuya kir

Şukur kufr û qelalê berheba kir

Şeyatîn û Ebû Cehlan be şarî

Kerr û gêj man, be wan ma şar û ‘arî

Terîka musteqîm ket înfî‘alê

Qelalet hate ser tilma zewalê²

Li Şiddîqan vebû dergeh ji xeyran

Hîdayet da biken da geşt û seyran³

Li wan şîn e gula dînê henîfî

Ji wan zail bû her wehn⁴ û qeîfî

Li wan mizgînî vaye hate Qur’an

Li wan mizgînî geş bû dîn û îman

Ji ‘ewrê fetretê der bû Mûḥemmed

Ṭulû’ da ser şerî’et ew mumecced⁵

Di weqta hate înzala nibûwet

Li wî xweş bû bi tenhaî we ‘ûzlet

Diçû garê herayîtin⁶ be tenha

‘Îbadet tê dikir rozan û şebha⁷

¹ Mahî(‘e): Navekî cenabê pêxember yê mehv dike

² tilma zewalê: girika li ber wendabûnê

³ Haşiyê: Hîdayet da biken xweş û seyranê

⁴ wehn(‘e): şek, şuphe

⁵ mumecced(‘e): yê bi şeref

⁶ herayîtin(f): elbet, mutleq, herhal

Xedîce daîma tedbîr didîta
Heman weqtê wê yê mî'tad⁸ bidîta

‘Îbadet her ‘îbadet her ‘îbadet
Jibo xwe wî dikir pîşe⁹ we ‘adet

Didîta xewnê şadiqê muşeddeq
Dihatin çan ku şubhê bit mufelleq¹⁰

Ji nageh dît ew namûsê ekber e
Hebûtê garê kir¹¹ Ellah ekber e

Bi qûwwet wî Nebî girt wî givaştî
Û heta ku cehd û te'ba tam gihaştî

Digot îqre' ne xwenda me digota
Û heta sê car digot û vê digota

Xwe îqre' bîsmî rebbîk xwend û berda
Welê pir tîrs û xewfê wî bi ser da

Ewî anî heta xwarê cebel bû
Bi lingî xwe li erdê da, we der bû

Ji wê kehnî¹² we Cibrîlî wuqû¹³ kir
Bi wê fi'lê we te'lîmê wuqû kir

Du rek'et kir nemaz û go wihaye
Nimêja ku munacata Xudaye

Ji wê ew çû sema ew hate malê
Bi tîrs û xewf û lertzîna wî halê

⁷ rozan û şebha(f): bi roj û şevan

⁸ mî'tad('e): tabîî', 'adetî, normal

⁹ pîşe(f): meslek, kar

¹⁰ mufelleq('e): perçivî, hilatî

¹¹ hebûtê garê('e) kir: daket şikeftê

¹² kehn: kanî

¹³ wuqû('e): destlimêj

Hîkayet kir çî dîbû bo Xedîce
Ji wî ra jî henîen gote zewce

Nubûwet ez dizanim hatî bo te
Heyatê cawîdanî hatî bo te

Ji ‘erşan bo te Cibrîl hate xwarê
Ji ta¹⁴ tenzîl û wehyê anî xwarê

Tu bûyî serwerê eflak û emlak¹⁵
Tu bûyî mehbeţê¹⁶ esrar û lewlaq

Hemana wî bire nik Îbnî Newfel
Hîkayet kir hemî tefşîl û mucmel

Digotî ger şewab zeyîbî namûs
Jibo hatî ji nik Sebbûhê Quddûs¹⁷

We go weqtê ku îzâa¹⁸ te bikran
Qureyşan ez hebûma dê mi bikra

Ji her enwaê’ neşret hem jî teşdîq
We hem yarî we hem e’zaz¹⁹ û teşfîq

Xwezî cuz‘ek bibûma wî zemanî
Bibûma ummeta axir zemanî

Di weqtê ku te der bikran ji Mekke
Minê neşret bida ser ehlê Mekke

‘Eceb go dê ewê min jê bider kin
Qûreyşî dê li min zecr û geder²⁰ kin

¹⁴ ji ta: ji te ra

¹⁵ eflak û emlak(‘e): erd û asîmanan

¹⁶ mehbeţ(‘e): ciyê daketinê

¹⁷ Digotî ger rast be Cibrîlê emîn
Jibo te hatiye ji cem Allahê Quddûs

¹⁸ îzâ(‘e): eziyet

¹⁹ e’zaz(‘e): qûwet, mezinantî

²⁰ zecr û gedr(‘e): heqaret û ta’de

Belê go lew nema kes ku wekî te
Gehište dewleta cawîdî wek te

Meger ‘udwanîyû zulm û te‘edda²¹
Ji qewmê wî tea’qub²² hatî serda

Gelek tewşîye û zahir fereh kir
Li ser kehlîtîya²³ xwe pir esef kir

Neçû pir Îbnî Newfel xwarê mergî²⁴
Ji wî paş, emrê wehyê bû derengî

Ji ew fetret Nebî pir geştê²⁵ mehzûn
Mudamî çehvenêra durrê mehzûn

Heta sê sal tamam bû pur qeleq²⁶ ma
Be wir di îbtîda Sûrê ‘Eleq ma

Ji nageh hat û gotê Ya Mudessîr
Îla emrîl îlahî qum fe enzîr

Ji wehyê pir ku hildabû giranî
Be ta ketbû digota deşirranî²⁷

Li pêy hev wehyî hat û pir bû tenzîl
Mudam teşrîf dikir bal wî ve Cibrîl

Ku ewwel hat jibo ra bo nubûwwet
Ku şanî²⁸ hat rîsalet girtî qûwwet

Be xef teblîg dikir emrê îlahî
Nebû mamûrê îzharê wê gahî

²¹ te‘edda(‘e): êriş, zulm, dijmintî

²² tea’qub(‘e): encam, ‘eqîbet

²³ kehlîtî(‘e): yextîyarî

²⁴ xarê mergî(f): mirin vexwar yanî wefat kir

²⁵ geştê: gihîşte

²⁶ qeleq(‘e): fikar, bêqerarî, diltengî, zehmetî

²⁷ deşirranî(‘e): min binixumînin

²⁸ şanî(‘e): cara dudan

Nemazek kê dikir diçwa se'aban²⁹

Be xef dikra ji ber xewfa 'ezaban

Dibên Se'dê Ebî Weqqaş û cem'ek

Nimêja xwe be xef dikran di kehfek³⁰

Ji wan kuffarê bê dîn û bê însaf

Be wan hesyan kirin cîdal û kencaf³¹

Li nav mejyê yekî da Se'dî derbek

Şikîna re'sê wî bû şubhê herbek

Dibêjin xûnê ewil ku rijandin

Eva bû pê perê nuşret hejandin

Li hev top bûn Nebîyyû ummeta xwe

Di Darul Erqamê cî furşeta xwe

Ûeta ku Hemze û 'Ûmer ji dewlet

Xeber hildan û hem geryan ji ummet

Qureyşan dest bi cewr û ezyetê kir

Şehaban be'dê³² qeşda hîcretê kir

Sebeb ku îzni herb rebbe nedabû

Ji bil hîcret ji wan re reh nemabû

Muhacîr bûn we çûne nik Necaşî

Şehê mulkê Hebeş pir qenc û başî

Bihîstin wan li wê dî ku Qureyşan

Sucûd kirne tevî Nebîyê zîşan

Muferreh bûn ku ew bûne mewafîq

Nezanîna ku ew pîsid munafîq

²⁹ se'ab('e): best, rêya lehîyê

³⁰ kehf('e): şikeft

³¹ kencaf(f): şemate, heytehol

³² be'd('e): qismek

Ji pût û latê ra bû secdeya wan
Ji geyrî Heqqê ra bû we'deya wan

Vegeryan hatine Mekke be dilxweş
Wekî dîsa kufaran kir cefakeş

We be'dek jî mu'ezzez man Hebeş da
Gelek Necaşî bo wan keyfê xweş da

Qureyşan dî ku 'ezza wan tamam e
Be Necaşî hemî tên xaş û 'ame

Digel îmanê Farûqê mu'ezzem
Li wan pir zor û zehmet bû mufexxem³³

Li hev du cemi' bûn şehbê nîfaqê
Xebîşûnê di eşhabê şîqaqê

Ku dibukjin Nebîyyê fexrê 'alem
Ebû Talîb bihîstî re'sê Haşem

Cemi' kir Haşemîw Muttelîban
Nexaftin³⁴ wan Nebî ji destê gebîsan

Qureyşan dîn ku hîla wan nemaye
Di nav qewmê xwe da jî Muştefa ye

Li hevdu cemi' bûn ehlê şîqaîq
Ji mabeyna xwe wan rakin 'elaîq³⁵

Be cem 'û kom nivîsîn kağidek pîs
Be te'lîma bed ustadyê îblîs

Ku mîret³⁶ men'î ken em tev ji wana
Ne jin bînin ji wan, ne bidne wana

³³ mufexxem('e): kesên mezin û bi şeref

³⁴ nexaftin: parastin

³⁵ 'elaîq('e): têkiliyan

³⁶ mîret('e): xwarin, erzaq

Di Ke'be daliqandin kağidê xwe
Welê gafil ji domaya bedê³⁷ xwe

Dibên yê ku nivîsî destî şel³⁸ bû
Ji îşlahê wî destî bê emel bû

Du salan hin dibêjin şê diborî
Nehat tiştek be nav wan geyrî sirrî

Ji wê kişan gelek îza û heyîf
Hinan jî qeşdî kirin neqda şehîf³⁹

Welê zanî kêzik ku tev hemî xwar
Ji geyrî îsmê neqşê rebbê cebbar

Eba Talîb xeberdar kir ji halê
Ewî jî çû ji wan ra kir hewalê

Zuheyr û Zem'e û Bulbuherî bûn
Digel Huşşam û Muţ'îmê 'Edî bûn

Kirin şozê xwe yek, van merdê hişyar
Ku tîş ken⁴⁰ vê şehîfa pîsê geddar

Zuheyrî go ezê ewwel xeber dim
Jibo derdê di wan jehrê li ser dim

Di şubhê ku ewan girt meclîsê xwe
Zuheyrî wergirt ehsen melbesê xwe

Li dorî beytê heft caran tewaf kir
Berê xwe paşî ser cemi' di wan kir

Go ey sadat û eşrafê şenadîd⁴¹
Çi însaf e ku em ken ref û tecrîd

³⁷ domaya bed(f): 'eqîbeta xerab

³⁸ şel('e): felcî

³⁹ neqda şehîf('e): betalkirina rûpelê

⁴⁰ tîş ken: biçirînin

Benû Haşem birayê me bimînin
Di vê tengasîya ku hûn dibînin

Qesem hetta neqelşit⁴² bed şehîfe
E rûnanime cîh da bê neşîfe⁴³

Ebû Cehlê le‘în go tu nikarî
Tu kezzab î meger kes jî nikarî

Cewab da Zem‘e jî ekzeb tu yî got
We hem Bulbuherî jî ‘eynê wî got

We Mût‘im go qesem ew rast dibêjin
Evî qewlî şemîmî em dibêjin

Le‘înî go eva şewra şevê ye
Ne vê erdê bûye ka kî derêye

Dema anîn ku tiştek nîne tê da
Nehîşt kêzik ji bil Allahê tê da

Ji wê derkeftine xeşb û feraxê⁴⁴
Hinan dîsan ji wan ra kir tewaxê⁴⁵

Di sala de Ebû Talîb wefa bû
Hezar heşret ku neşrê Muştefa bû

Nebî jê ra girîyyû matemî bû
Çikû jê ra emekdarek qewî bû

Welê gem nîne wî mewla Xelîl e
Mudebbîr bo wî mewlayê Celîl e

Xedîce hem wefa kir hem di ‘amî⁴⁶
Muşîbet ser Nebî gerya tamamî

⁴¹ sadat û eşrafê şenadîd(‘e): kesên giregir, mezin

⁴² neqelşit: neyê qelaştin, neyê qetandin

⁴³ neşîf(‘e): sernixumandî

⁴⁴ xeşb û ferax(‘e): pîrbûnî û firehî

⁴⁵ tewaxî(‘e): daxwaz, xwestin

Nebî çû Taîf û qewmê Seqîfê
Jibo nûşret ku îfa ket wezîfê

Gelek cewr û cefa dan fexrê ‘alem
Bi kevran lê didan lingan dibû dem⁴⁷

‘Edasê xadimê ‘Utbe we Şeybe
Ji wî ra anî qaţûfek ‘uneybe⁴⁸

Çewan zanî Nebî ye ew be tehqîq
Heman anî be wî îman û teşdîq

Nebî dî ku Seqîfî nefî’ nakin
Vegerya hate Mekkehê welakin

Li rê Cinnê Nûşeybîn heftê merdan
Be teşdîqa wî û îman xeber dan

⁴⁶ ‘am(‘e): sal

⁴⁷ dem(‘e): xwîn

⁴⁸ qaţûfek ‘uneybe(‘e): gurşiyek tirî

11. DI HEQÊ MÎ'RACA WÎ (S.'E.W) DE

Qelem hilde murekkeb Nûrî sade

Ji nûra Quşê ke îstîfade

Xeber de hem be şewtî hem be nûrî

Tijîke durrê der lêwhê bîlûrî

Vejîne rûhê şiblencî¹ ji nû ve

Nihe sirra dilê dehlân² ji rû ve

Hemî dîtir bikêşe camê tefşîl

Miradê qeş neke tehwîl û tebdîl

Suqatê³ rawîyan çawan rîwayet

Kirin 'eynî wê qasî ke hîkayet

Bibêje ka xudanê seyf û îman

Çewan mî'racê kir çû 'erşê Rehman

Ji rawî seh kirin cemi' dilêran⁴

We hem gotin gelek mahir xebîran

Nibûwwet dazde salan pê ve borî

Receb jê bîst û şeş rojan bihûrî

Li ser eşeş rîwayet ger çi çendan

Xilaf kirne di wê da çendî merdan

Şevê dewletfîzûnî⁵ nûrê 'alem

Ku cem beytê nivîstî⁶ fexrê 'alem

Di mabeyna du şexşê nûrê ummet

Ku Hemzew Ce'ferê Teyyarê heybet

¹ şibl('e): çêlyê şêr

² dehl: hemî, xerz

³ suqat('e): emîn, bawerî pê tê

⁴ dilêr: mêrxas

⁵ dewletfîzûn(f): xwedî heybetek zêde

⁶ nivîstî: xilmaşî bû

Ji nageh şê nefer hatin be muhtem⁷

Hilanîn wî birin ser bîrê zemzem

Wisani ku pê nehesyandin hevalan

Jibo ku nebne mani' bo fi'alan

Yekî Mîkaîl bû hem yekî Cebrîl

We dî jî şexşê Esrafil be te'cîl

Nebî serpiştî danîn û qelaştin

Hinavê wî hemû zahir bezaştin⁸

Ji Mîkaîlî ra Cîbrîl digo hem

Werîn teştêk zerîn ez abê zemzem

Emê sîne bişon û hem temîz ken

Be emrê rebbê 'alem pir 'ezîz ken

Dîçe cayek bulend û pir be hürmet

Dîçe mîhmanîya wî rebbê 'izzet

Dîçe wî cayê mexlûqan nedî qet

Dîçe 'erşan ku Cebrîl jî nedî qet

Dîçe cayê ku hergîz⁹ cayê nîne

Ku ew jî la mekane reybê¹⁰ nîne

Berî ez her qerar û her hewadîş

Munezzeh ez kem û keyf û newafîş¹¹

Belê menzîlgeha 'alî dixwazî

Nezafet pir temîzayî dixwazî

Deranî qelb û şê caran gesil kir

Di teştê zer ji zemzem avê lê kir

⁷ muhtem('e): girîng, muhîm

⁸ bezaştin: derxistin

⁹ hergîz(f): qet'î, esla

¹⁰ reyb('e): şek, şubhe

¹¹ Ji çiqas û çawa û nefsan berî

Qirêjê jê derînanand û be avêt
Çikû hezzê¹² le'în bû jê der avêt

Be sê teştê dîger şuştin we malîn
Delal û tahîr û pakîze danîn

Diger teştek tijî îman û hîkmet
Verîhtin¹³ qelbê serdarê nubûwwet

Tijî kir 'ilm û hîlm û hem jî Îslam
Yeqînî pir be teşdîr¹⁴ û be îkram

Cihê şeqqê dirûtin bê cerahet¹⁵
Wê bê te'b û ezîyet pir be rahet

Muhur kir nav milan hinda vî qelbî
Nubûwwet muhrî bû ev dayê rebbî

Eva tezyînîbû wî xemilandin
Jibo mîhmanîya rebb kemilandin

Ji bo¹⁶ anîn Bûraqê ba gem û zîn
Suwar bû lê be her e'zaz û temkîn¹⁷

Buraqê dest ku davête nuşûvê¹⁸
Dirêj destî dibû nedma nuşûvê

Be evrazê¹⁹ diçû ling bo dirêjî
Di ristan yek bû ling û destê wê jî

Ûeta çehvê wê didya gavê davêt
Wekî berqa birûskê gavê davêt

¹² hezz('e): par, paye

¹³ verîhtin: verêtin, bi ser da kirin

¹⁴ teşdîr('e): îcrakirin, destpêkîrin

¹⁵ cerahet('e): 'emelîyat

¹⁶ ji bo: ji wî ra

¹⁷ e'zaze û temkîn('e): qûwet û saxlemî

¹⁸ nuşûv: serberjêr, nişîv, pal

¹⁹ evraz: berjor, qiyame

Suwarê serçelengê herdu ‘alem
Difîrya ew be emrê rebbê ‘alem

Gelek rah çûn û Cîbrîl go peya be
Du rek‘et ke nemaz û hem suwar be

Nimêj kir gotî Cîbrîlî te zanî
Nimêj kir te li cî erd û mekanî

Eva ye Teybe²⁰ cayê hîcreta te
Eva ye Yesrîba cî raĥeta te

Suwar bû careke dî hem lezandin
Heta hat Medyenê wî dî nihandin²¹

Du rek‘et dî nimêj kir hem suwar bû
Heta hat Tûrê Sîna lê peya bû

Nimêj kir hem du rek‘et jî li ew der
Li vir go Tûrê wî Mûsa peyember

Lezandin ta gihane Beytul Laĥmê
Du rek‘et jî li wê kir xeyrê qewmê

Li vir weldîye go ‘Îsayê Meryem
Xweyê Încîlê ew Şahê mu‘ezzem

Di wê rê da didîya pir ‘ecaîb
Dihatî rastê wî bêhed geraîb

Li rê bû, seyr dikir ‘îfrîtekî dît
Ku pêta agirê dev ve diavêt

Dua’ te’lîmê kir Cebrîl jiber bû
Çewan xwend ew li ser dev ket geber bû

²⁰ Teybe: navekî Medîne

²¹ nihandin: sekinîn

Ji wê hatin sefer kêşan û borîn
Li ser qewmek diçandin zer²² û roj dîn²³

Diçinyan dîsa ew wek xwe digerya
Çiqas bidrûna dîsa divegerya

Ji Cebrîl pirsî ey ex ev çi hal e?
Be hişyarî ye, xewn e yan xiyal e?

Mucahîd der sebîlillah e go ev
Be heft şed de'fê²⁴ ecra wan e tev ev

Çi dane nefis û esp û barê berdard²⁵
Hemeh tedbîreha jê ra dibit bar

Şemmandî²⁶ bîhnekî xweş go çi bîhn e
Ku jê pir musterîh hem qelb û devn e²⁷

Digo Cebrîl eva bîhna delalî
Hemîmî²⁸, musteqîmî, pir kemalî

Ewê pora keça Fîr'ewnê kafir
Dişiknanda dihûnanda ku axir

Ji kufra wê xeber da bîntî mekkar²⁹
Ewê pîsî ji hâlê kir xeberdar

Li wan teklîfê kufre kir ewê pîs
Qebûl nekrin nebûn îtba'ê îblîs

Ewê û zewc û etfalê³⁰ wê kuştin
Be keyfa cenneta baqî gehîştin

²² zer'(e): zîraat

²³ roj dîn: roja din

²⁴ de'f'(e): car

²⁵ berdard: bi semere û bereket

²⁶ şemmand: bîhn kir

²⁷ devn: difn, poz

²⁸ hemîm(e): semîmî, hevalê ji dil û can

²⁹ bîntî mekkar(e): qîza hîlebaz

³⁰ etfal(e): zarok

Ji şûrav û gulav û miskê cennet
Ku pir ser xwe reşand û bîhn û hîkmet

Ji wê borîn we çûn dîtî ku qewmek
Dipelxînin serê wan carê carek

Dîger taze dibin dîsa diken kar
Emînallah³¹ kî yin go ev cezakar

Ev in go ew kesê dikrane sistî
Di mefrûdatê mêja³² heqperestî

We dî qewmek ku pînek pêş û yek paş
Ji zeqqûmê diçêrîna di mer‘aş³³

Dipirsî kî ne vî hal û şîfatê
Digo vana ew in nadin zekatê

Didît qewmek li cem wan goştî pehtî
Di dîzek³⁴ yekî dî pîs û nepehtî

Dixwarin yê mirar û yê temîzî
Diterkandin we nedbûn têze dîzî

Dipursî go evê hana çi fewc e
Digot ev zanîyê cem wane zewc e

Didî darek muşewwek³⁵ kî diborî
Cilê wî tîş dikir paşî diborî

Çiye ev gotî, ev qatî’ terîq e³⁶
Jibo êzingeya dozex³⁷ heqîq e³⁸

³¹ Emînallah: Hz. Cebrail

³² mefrûdatê mêj(‘e): ferzên nimêjê

³³ mer‘aş(‘e): ciyê hejandinê

³⁴ dîzek: kûz

³⁵ muşewwek(‘e): bi dirî, bi strî, bi kelem

³⁶ qatî’terîq(‘e): şaqîyê rê dibire

³⁷ dozex: cehennem

³⁸ heqîq(‘e): mustehaq

Şenayî³⁹ dî diket yek behrê xûn da
Kevir davê devê xwe ew be şûnda

Kî ye ku ev digot fayîzxwer e ev
Di dozex da kevir dê bavête dev

Didî yek gurzekî zêde ji taqê⁴⁰
Dike pirtir hemana ser nişaqê⁴¹

Kî ye got go ewê hilde emanet
Nikare hilgire barê emanet

Li ser qewmek bihurî dî ku dibrin
Zuban û lêvê wan çawan ku dibrin

Heman 'ewde⁴² dibit dîsa wek ewwel
Dipirsî ku çiyê ev şuglê mu'şel⁴³

Ev in got ku diken we'zê li nasan
Be qewlê xwe 'emel nakin çu nasan

Didît qewmek ku pencê wan çû bazî
Dixerşandan rû û sîngê xwe tazî

Kî nin go ev ewê geybetgûzîn⁴⁴ in
Dibêjit xelqê 'eybê wan dibînin

Didî şewrek⁴⁵ ku derket ez qulek teng
Dikir 'ewde bibit nedhate ferheng⁴⁶

Çiyê go ev meqalê go xweyê wî
Peşîman e çira min gotiye wî

³⁹ şenayî('e): fi'lên pir bi guneh

⁴⁰ taq: bi şax û gulî

⁴¹ nişaq('e): kember, peştamal, qûşak

⁴² 'ewde('e): veşer

⁴³ mu'şel('e): girîft, zor û zehmet

⁴⁴ geybetgûzîn(f): pir xiybetê dikin

⁴⁵ şewr('e): ga

⁴⁶ nedhate ferheng: qûwet û taqet nedidî

Di seyra xwe diçûna dî ji nageh
Li alî rastê dengêk bû be ageh

Cewaba wî neda pirsî kî ye ev
Nidakarê yehûdan e digo ev

Cewabê ger bidayê her kesî te
Yehûdî dê bigeryana pesî⁴⁷ te

We dengêk dî bihîstî jalîyê çep
Ne guh lê kir, ne fekrî⁴⁸ rast û yan çep

Dipirsî kî bû daî' aşîkarî
Digot ev daî'yê qewmê neşarî

Eger ku te cewaba wî bidaya
Neşarî ummeta te dê geraya

Diborî dî jinek destan we zendan
Li hev hilmiştîye zînatê berdan

Nîda da ey Nebîyyê babê Qasim
Bisekne ta ji te tiştêk bipirsim

Nebî borî nekir qeç îltîfatê
Kî ye go şahîbê vê zeyyînatê

Digo Cîbrîlî, dunya ye eger te
Cewaba wê bida dê ummeta te

Hemî vê ra bikirna dost û yarî
Li ser 'uqbayê⁴⁹ bikran îxtîyarî

Meger qelbê te nûranî gera bû
Te zanîbû cewaba wan nedabû

⁴⁷ pes: pey, paşî, piştî

⁴⁸ ne fekrî: lê nenêrî

⁴⁹ 'uqba('e): axîret

Xudaya dî te bo îlham ji ta kir
Ku te her fi'lê wefqê muqteda⁵⁰ kir

Didîta pîrikek şemtayê⁵¹ fanî
Digot mêze li min ke ey şehani⁵²

Ji te pursek bikem, wî qeṭ nenêrî
Ne berba ket, ne perwa kir, bihûrî

Eva 'umrê dinê go zehfê çûye
We hindik maye nêzî mergê bûye

Be te' cîl ew Xelîlê Rebbê Eqdes
Suwarê ajote Beytel Muqeddes

Tene'em⁵³ Beyte Meqdîs tu bî mehman
Bi lingê wî bûye axa te derman

Tijî der Mescîdîl Eqşa şeref kir
Ji teşrîfa xwe wî Barî şeref kir

Munewwer kir hemî erdê wî alê
Wekî rojê tûlû' da wê hewalê

Ji dergahê Yemanî ve bû daxil
Buraqa xwe girê da çan bû nazil

Bi wê helqa derî ve wek nebîyyan
We daxil bûn di mescîd enwerîyan

Di wê derê ji yalê⁵⁴ roj û hêvê
Du rek'et wan nimêj kir bûn di nêvê

Neborî pir ku cem'ek bûne ber hev
Di enwaê' 'îbadet da bûn ew tev

⁵⁰ wefqê muqteda('e): li gorî şanê pêşivaniyê

⁵¹ şemta('e): pîra yextiyar, acûze

⁵² şehani('e): şahê şahan

⁵³ tene'em('e): xelat

⁵⁴ yal: teref, alî

Nebî zanî ku ew tev enbîya ne
 Di Beytel Meqdesê da lê cevane

 Şeffê xwe çêkirin çehvnêr ewana
 Gelo ka kî bibit îmamê wana

 Emînullah Mûhemmed kir muqeddem⁵⁵
 Teqeddem xeyre xelqîllah teqeddem⁵⁶

 Heqîqî tu be teqdîm û îmam î
 Çikû elbette tu xeyrul enam î

 Tu salarê⁵⁷ cemîê' enbîya bî
 Li ser 'erşan ji hemyan tu xuya bî

 Du rek'et kir nimêjek pêşîya wan
 Jibo salarîyû pîşkarîya wan

 Dibên me'mûmî⁵⁸ bûn hem jî fureşte⁵⁹
 Belê rast e rîyaset bû nuwuşte⁶⁰

 Şena kir ser Xuda her yek şenayek
 Nebî go dê bikem ez jî şenayek

 We go elhemdû lîllahîl lezî ku
 Şîyandî min jibo rehmet bibim ku

 Li ser eşnaf û 'enwaê' di 'alem
 Mubeşşîr munzîrê ewladê adem

 Gerandî ummeta min xeyrê ummet
 Nihandî⁶¹ hem ji min ewzar⁶² û tuhmet

⁵⁵ muqeddem('e): yê li pêşî

⁵⁶ derbasî pêşî bibe ey xeyrê mexlûqan

⁵⁷ salar(f): mezin, reîs

⁵⁸ me'mûm('e): yê tabî' bûye

⁵⁹ fureşte(f): melek

⁶⁰ nuwuşte(f): nivîsandî

⁶¹ nihandî: hilanî

⁶² ewzar('e): barê giran

Bilind kir nav û zîkra min ji hemyan
Gerand fatîh we hem xatem li hemyan

Bi vêha gote Îbrahîmê ‘alî
Mûhemmed girtîye ser we me‘alî⁶³

Ji nageh tihnî bû zêde ji qasek
Jibo ra anî Cebrail du tasek

Yekî xemr⁶⁴ û yekî dî şîrî tê da
Xemir red kir we bo xwe şîrî hilda

Emîn go qencî bû lewra eger dê
Xemir hilday ummet diçû fesadê

Ji geyrî hindikek ned ma li pêy te
Gelek hindik dimana tabîê’ te

Li cem şexrî⁶⁵ li çep dî hûrê ‘eynan
Selam kir wî li ser wan nazenînan

Selama wî vegirtin pir ba ‘îzaz⁶⁶
Suwal û hem cewabê pir ferehbaz⁶⁷

Jibo anîn terencek⁶⁸ pir muzeyyen
Hem ew mî’racî bûbû rûh û her ten

Kesî tişteke wisan zepba⁶⁹ nedîbû
Pulek⁷⁰ zêr û we yek sîmê sipî bû

Be lû’lû⁷¹ çêkirîbû xweş mukellel⁷²
Di Fîrdewsê ewê kir bûn muşekkel⁷³

⁶³ me‘alî(‘e): piranîya şerefê, mezinahîyê

⁶⁴ xemr(‘e): şerab, araq

⁶⁵ şexrî(‘e): cîyê ta’t

⁶⁶ ‘îzaz(‘e): bi qûwet, bi mezinahî

⁶⁷ ferehbaz(f): pir bi şad û kêfxweşî

⁶⁸ terence: derence, merdîven

⁶⁹ Zepba(f): girover û nerm

⁷⁰ Pul(f): pira meriv di ser re diçe

⁷¹ lû’lû(‘e): durr

Belê laîq jibo wî her wisa be
Herêyyê her du payê Muştefa be

Li rast û çep melek vê ra vewestan⁷⁴
‘Urûc⁷⁵ kir wî û Cebrîl çûne esman

Bulend bûn çûn heta esmanê dunya
Dikirna qeşdê ‘ulyater⁷⁶ be ‘ulya

Li wê bû dergevanê wê semaê
Mudam seknî bû ew ender hewaê

Li ber destê wî heftê elfî⁷⁷ emlak
Ji wan her yek serê ew qasî emlak

Be îstîftahê Cîbraîl nîda kir
Melek got ev kîye ey şahê Şakir

Jibo ra Cebrâîlî got: Mûhemmed
Hemîd û Hamid û Mehmûd û Ehmed

Diçe mîhmanîya rebbê xwe ‘erşan
Dike teşrîfê ‘ulya ew ‘elîşan

Melek çawan ku nasî, merheba kir
Mufferreh bû gelek vê ra şena kir

Birayê qenc xelîfê qenc û ehlen
Bi xêr û ber ser û çeşmem⁷⁸ we sehlen

Vekir dergeh we çûn dîtin ku Adem
Di wê da ye difekrî rûhê ‘alem

⁷² mukellel(‘e): taç li serî, biriqandî

⁷³ muşekkel(‘e): qalib û kinc û şiklê wî tam li cî

⁷⁴ vewestan: sekinîn

⁷⁵ ‘urûc(‘e): bilindbûn

⁷⁶ ‘ulya(‘e): berjor

⁷⁷ elf(‘e): hezar

⁷⁸ Çeşm(f): çav

Ji qencan ra digot her⁷⁹ ‘illîyyînê⁸⁰

Ji pîsan ra digo têken siccînê⁸¹

Li alî rastê wî eşxaş û babek

Dihat jê bîhnekî xweş wek gulabek

Li çep dîsa be wê nolê⁸² didîta

Welê bîhna mirarî jê dihîta⁸³

Li rastê ku dinêrî pir dikenya

Li çep mêze fikir vê ra digirya

Li alî rastê bû dergahê cennet

Li yê çep bû derî dozex bi muhnet

Dibû şadan jibo cennetmeaban⁸⁴

Dibû gîryan jibo sahib‘ezaban

Hinek çû, dî rîbaxwar û zûnatan⁸⁵

Di xulqê pîs û hem ‘eqbeş şîfatan

Gehîştin asîmanê şanî Cebrîl

Nîda kir go vekin dergeh be te’cîl

Wekî ewwel suwal kir da cewabê

Digo ehlen be ser çehvê mîrabê⁸⁶

Vebû dergeh we pêva îrtîfa⁸⁷ dan

Li wê Yehya we ‘Îsa merheba dan

Dua’ bo wî kirin hem xêrxewahî⁸⁸

Dixwestin lê nebit eşla tebahî⁸⁹

⁷⁹ her: biçê

⁸⁰ ‘illîyyîn(‘e): kesên li cem Xweda pir qenc

⁸¹ siccîn(‘e): navekî cehennemê ye

⁸² nol: şikil, awa

⁸³ dihîta: dihate

⁸⁴ cennetmeab(‘e): yê têkevin cennetê

⁸⁵ rîbaxwar û zûnatan: faîzxwer û kesên zînakar

⁸⁶ mîrabê(‘e): tèn

⁸⁷ îrtîfa(‘e): bilindbûn

Gehiştin asîmanê sê çû pêşîn
Kirin em qeş serê te pê neêşîn

Didîtin Yûsûfê bedra li şehwî⁹⁰
Xudanê qameta wek saye⁹¹ ser wî

Diçûn çaran li wê Îdrîs didîta
Nebî ra merhebatî pir dirêhta⁹²

Li pêncan dî ku Harûn nîvê lihye⁹³
Reş û nîvek sipî mînanê hirye⁹⁴

Ku Mûsa jê xeydî bû keşa bû
Cihê destê wî beyda bû wisa bû

Gehiştin yê şeşan çûne bi nav da
Gelek jî enbîya dîtin di nav da

Didî wek tîlpê⁹⁵ reş cem'ek ji wana
Pirê pir bûn digo kî ne evana

Emîn got ev kelîmullahê Mûsa
Digel ummet li tu bûne eyîsa⁹⁶

Li rastê dît çû tîlpek yek li çep dî
Gelek zêde ji wanê ku ewwel dî

Exî Cîbrîl eva kî ne ewî go
Eva jî ummeta te pir be haho⁹⁷

Be qas heftê hezarî vê diçêtin
Cinanê, qet hîsab naête dîtin

⁸⁸ Xêrxewahî(f): xêrxwazî

⁸⁹ tebahî('e): mehvûyî, xerabûyî

⁹⁰ li şehwî('e): li ser hişê xwe

⁹¹ sa: sî

⁹² dirêht: pêş dikir

⁹³ lihye('e): rî

⁹⁴ hirye: hirî

⁹⁵ tîlp: grûb, kom, reşe

⁹⁶ eyîsa('e): biriqîye

⁹⁷ haho: ha bi vê

Kelîmullahî jê ra merheba kir
Gelek te'zîm û e'zaz û dua' kir

Ku jê borî Kelîm serxwe esef kir
Digirya û dumû'an⁹⁸ xweş telef kir

Yehûdî min efşel hemyan dizanin
Welê ev efşel e ew pê nizanin

Xulaşê wan şefer kir çûne heftan
Be ayîna berê terhîb⁹⁹ digotan

Xelîlullah li ber dergahê cennet
Li ser kursîkî zer calîs¹⁰⁰ be 'îzzet

We pal dabû be yalê Beytê Me'mûr
Hinek qewmê wî seknîbûn dima dûr

Nebîyallah Mûhemmed kir selamê
Selamê girt û terhîb kir tamamê

Henîen got bixêr hatî be te'zîm
Ji îbnî qencî ra terhîb û tekrîm

Muhîm lê tenbe kir bo ummeta wî
Bulendtir paye bêne şewketa wî

Emir ke go jibo ummet ku bijîn
Ĝerasê¹⁰¹ cennetîl eḫwalê bêjin

Li cem dî qewmekî beydîl wucûhî¹⁰²
We qewmek dî di lewnê wan şelûhî¹⁰³

Evê şîlo¹⁰⁴ ḡesil dikran di nehrek
Şefaê hildidana wan ji qedrek

⁹⁸ dumû'(e): hêstir

⁹⁹ terhîb(e): pirsîna ḫal xatir

¹⁰⁰ calîs(e): yê rûniştî

¹⁰¹ ḡeras(e): çandiniya daran

¹⁰² beydîl wucûhî(e): rûyê wî sipî

¹⁰³ lewnê wan şelûhî(e): rengê wan tarî, şolî

Diger şanî diger şalîs di dîger
Nehîr da pir digeryana munewwer

Ji Cebrâil dipirsî ev çi qewm in
Çi nehr in go ewwel ew fewc û qewm in

Nebû e'malê wan eşla neqencî
We yê dî têkilîhev pîs û qencî

Rucû' bûn û kirin tewba neşûhî
Vegeryan wek ewwel rend û sipahî¹⁰⁵

We ev nehîr di rehetmet hem jî nî'met
We hem şirba şeraba pakê cennet

Vira ye cî te û yê ummeta te
Eva şemmek¹⁰⁶ qelîle-j ne'meta te

Li wê bû daxilî wê Beytê Me'mûr
Digel be'dek ji ummet qencê meşhûr

Nemaz kir bûn bi hev ra der derûnê
Melek heftê hezar her roj diçûnê

Diger ew 'ewde¹⁰⁷ nedbûn ta qiyamet
Diger rojê diger hey ev bû 'adet

Li hinda vê muqeddes Ke'beê bû
Ji wan ra qible bû wek Ke'beê bû

Gehîştin saqê¹⁰⁸ sîdreh gotî Cîbrîl
Ji vir pê ve nihîn min seyr û te'cîl

Ji vir evraz te mexşûş e qedemgah¹⁰⁹
Tu yî her layiqê seyra îlellah

¹⁰⁴ şîlo: şolî, nezela

¹⁰⁵ sipahî: xweşik

¹⁰⁶ şemmek('e): masî

¹⁰⁷ 'ewde('e): vegeřin

¹⁰⁸ saq('e): cîyê 'esil

Ne ûlûl ‘ezm û ney ‘alî ferîşte
 Ji vir pê ve kesek naçit ji bil te

 Welê tu serwerê mewcûdê ferş î
 Reîsê cumleyê emlakê ‘erş î

 Diken fexrê bi te her murselûnan
 Diken xîdmet ji ta mûqerrebûnan

 Rikîbdarî¹¹⁰ jibo te em dikarin
 Heya vir lê bijortir ve nikarin

 ‘Eceb dîtî ji sîdrew belçim¹¹¹ û ber
 Ewê belçim çu goşê filê¹¹² yekser

 Welê ‘alem dibû cî bin seha wî
 Dikir yek belçimek sehdarîya¹¹³ wî

 ‘Eceb nîne ke sîdrel munteha ye
 Çikû darê seha ‘erşê Xuda ye

 Wekî meşkê hecer bûn fêkîyê wê
 ‘Eqil naghêje her keyf û kemê wê

 Ji bin kokê dida der çarê nehran¹¹⁴
 Didû bañin diçûn cennatê bustan

 Didû jî zahir ew Diclew Firat in
 Bi wan ava weşîn erd û welat in

 Kete ser şatîê¹¹⁵ Kewşer hetta çû
 Li dergahê cînanî pêvetir çû

¹⁰⁹ Ji vir berjor xasî te ye çûyîn

¹¹⁰ rikîbdarî: rêhevalî

¹¹¹ belçim: pel, pela darê

¹¹² goşî filê(f): guhê filê

¹¹³ sehdarî: sîya darê

¹¹⁴ haşîye: Ji bin kokê wî davêt çarê nehran

¹¹⁵ şatî(‘e): çemê weya nehrê mezin

Didî sê nehrê yek şîr û yekî mey
Yekî jî hingivîn bê tîlp¹¹⁶ û bê key¹¹⁷

‘Ecaîbhayê cennet pir ewî dît
Digel dozex we hem tes‘îrê¹¹⁸ wê dît

Temaşa kir tijî qehr û geđeb bû
Tijî zecr¹¹⁹ û tijî zehmet ji reb bû

Helaket bû gelek ne‘ûzû billah
Xelaskî me ji wê ya Rebbenallah

Dixwarin qewmekî tê da mirarî
Dipirsî kîne ey Cebrîlê yarî

Digo geybetkerê ser rû dinê ne¹²⁰
Li vê dê ew xweyê vê xwarinê ne

Didît Malik ‘ebûs¹²¹ we bihnîţeng bû
Ĝedeb girtî wekî ba herb û ceng bû

Vegeryan dî sehatên¹²² muntehayê
Li wê ‘ewrek be çar eţrav gehayê

Li wê Cebrîlî go yê min bes îdî
Dişewţim ez ji nûrê ger bêm îdî

Meger ew ‘ewrê Refref bû hilanî
Li cayek rast û dûz nageh ve danî

Bihîstî dengê eqlamê fereştan¹²³
Be emrê rebbî wan defter nuwûştan

¹¹⁶ tîlp: durd, tort

¹¹⁷ key: çelqandî

¹¹⁸ tes‘îr(‘e): dadana agir û gûrkirina wî

¹¹⁹ zecr(‘e): zor û ezîyet

¹²⁰ ser rû dinê ne: li ser rûyê dinyê ne

¹²¹ ‘ebûs(‘e): rûtirş

¹²² sehat(‘e): meydan

¹²³ eqlamê fereştan(‘e): qelemên melekan

Didîta merdekî der nûrî mestûr¹²⁴

Di nûra ‘erşê da şadan û mesrûr

Nebî go tu melek î yan nebîy yî

Di vê nûra mu‘ezzem da xeffî yî

Digot ez ew kesê reţbullîsan¹²⁵ im

Ji zîkrê wî xudayê ‘alîşan im

Di mizgeftan dikêşam î’îkafê

Ji sebba¹²⁶ bab û dan dikram kîşafê

Li wî dewlet li wî bû taze dewlet

Ji wî taze hilanî zêde şewket

Gelek şa bin cemîê’ ummeta wî

Muferreh bin be ‘îzz û şewketa wî

Bi wê ‘îzzê biken pir îftîxarî

Wekî baranê nî’met ser we barî

Li wê dît wî cemala rebbê ‘îzzet

Du caran bê hîcab û pir be lezzet

Ji te’zîm û ji heybet çû sicûdê

Ji lezzet wî ji bîr kir xwe wicûdê

Xweşa mîhman û mîhmandarîya wî

Xweşa menzelgeh û dildarîya wî

Şîrîn vê ra xeber da rebbê ‘alem

Xîtab dikra digel vê fexrê ‘alem

Xuda got ey Mûhemmed tu bixwaze

Dikem, dildarîya te pir binaz e

¹²⁴ mestûr(‘e): veşartî

¹²⁵ reţbullîsan(‘e): ziman xweş û nerm

¹²⁶ sebb(‘e): heqaret, peyvên çêr

Nebî got ya îlahî! Te Xelîlî
Xelîl kir, pê te da Nemrûd zelîlî

Be Mûsa ra xeber da te li Tûrê
Te ateş da nîşanî wî ji nûrê

Te da Dawûdî emlak û welîdan
Te jê ra nerm kirî new‘ê hedîdan¹²⁷

Te dayê şewtekî xweş ku tûyûran
Di seknanda dimana pêş ve heyran

Te hukm û selţenet jî da Suleyman
Muxxer kir te jê ra cinn û însan

Te text û pa, be bayê wî dihilda
Te mulkek dayê ku bo kes te nedda¹²⁸

Te ‘Îsa hîre kir¹²⁹ Tewrat û Încîl
Dikir kor û nexweş ber ‘eqsê tehwîl¹³⁰

Ji şeytanî te hîfzand wîw dîya wî
Te kir e‘lanî tevhîra dîya wî

Xuda go min te kir salarê ruslan
Hêbîbê xaş te gêra me ji ruslan

Çiqas zîkra mi bî zîkra te jî tê
Di eflakan mudam behşa te jî tê

Mi xeyrê ummetan kir ummeta te
Mi kir ewwel we axir ummeta te

Nihin wan xutbeyek bê te qebûlî
Heta şehde neden ‘ebdîw resûl î

¹²⁷ hedîd(‘e): hesin

¹²⁸ nedda: nedida

¹²⁹ hîre kir: hîn kir, ‘elimand

¹³⁰ ber ‘eqsê tehwîl(‘e): bi ziddê wan ve diguherand

Mi kir Încîlê wan der sîneyê wan
Bidî wan yek be deh bit qencîyê wan

Mi te ewwel gerandî xilqetê da
Welê axir gerandî be'şetê¹³¹ da

Mudam tu pêşî rusl û enbîyanî
We e'teytûke mîn seb'îl meşanî¹³²

Ji sûre Elbeqer xetmî mi da te¹³³
Di bin 'erşê xwe jî kenzek¹³⁴ mi da te

Di berya te ji wan ruslê di pêşîn
Nedam kes ra ji ta hildam ji mêjîn

Mi da te Kewşer û heşt behrê Îslam
Mi da te herb û hîcret şidqeka tam

Mi da te şewmê mahê remeðanê
Ji kes ra min nedabû şewmê hanê

Mi da te emrê me'rûf nehyê munker
Hezar hemd û şena Allahû ekber

Li ser te ferð kirim pencahê ferðan¹³⁵
Nimêjê ku tu û ummet biken wan

Ji wê ew 'ewrê Refref munqeşî'¹³⁶ bû
Meger danîbû cem Cebrîl û çûbû

Be lez zîvrîn û hatin ba Xelîlî
Li cem tişteke nego j-emrê Celîlî

Ûeta hatin li cem Mûsa peyember
Dikir terhîb û go cem Rebbê ekber

¹³¹ be'şet('e): pêxembertî

¹³² min da te sûreyê Fatîhayê

¹³³ ayetên dawîya sûreyê Beqereyê

¹³⁴ kenz('e): xezîne

¹³⁵ pencahê ferðan(f): pêncî ferz nimêj

¹³⁶ munqeşî'('e): ewrawî

Mijûl bûyî çî xweş girte munacat
Çî îhsan kir li te da te çî hacat

Digo da hedye pencahê nimêjan
Di weqtêl weqtê her şevan û rojan

Kelîmûllahî go ev pir giran e
Rica ke da ji ser te hinde dane

Siviktir min dida Esraîlîyan
Diterkandan ne pêk tanîn hemîyan

Dizanim ku deîf in ummeta te
We ger çî çêtirînin ummeta te

Îşaret dayê Cebraîl kerem ke
Hereh mehder meger hindek jê kem ke

Vegerya xweş be lez ew hate sedrê
Li wê dîsa wî gēşyet¹³⁷ kir wî ‘ewrê

Heman hingavte bin ‘erşê sicûdek
Îlahî! E’ţînî sû’lî bi cûdek¹³⁸

Giran e ev nikarin ummeta min
Bide texffîf jibona xidmeta min

Xuda go penc jibona hûrmeta te
Bila kê m bit ji ser tew ummeta te

Hela¹³⁹ got û hela çû û hela kir
Heta go çil û pengan jê riha kir

Diger Mûsa rica ke got fihête
Ređî¹⁴⁰ me hem şekûrê ne’metê te

¹³⁷ gēşyet(‘e): nixumandin

¹³⁸ Ya Rebbî! Bide min bi daxwaza comerdiyê

¹³⁹ hela: hêjî

¹⁴⁰ ređî(‘e): razî

Ji ġeybê dengekî da, go tamam e
Ev e ferqê ezel texfif jî tam e

Kelîmûllahî go êdî neşîvî
Kerem ke lew Buraqê ma te hêvî

Dihatî xwar û fireşte kîramî
Didan tenbe jibo emrê hîcamî¹⁴¹

Ji Cebrîl pursî go ehlê semayan
Ji ma¹⁴² terhîb dikirna hem dikenyan

Ji ġeyrî yek ‘ebûsî me’de dayî
Nebû heşşaş we beşşaş keyfê dayî

Digot ew xazinê narê ye Malik
Ji roja çêbûye qeş nebye dahîk¹⁴³

Bi kenya gir jibo te dê bikenya
Fereh bibya bidîta te dê bibya

Hubû¹⁴⁴ kir weqtê hat esmanê jêrîn
Duxanek dît û seh kir deng û qêrîn

‘Eceb go ev çi ġewġa¹⁴⁵ û duxan e
Şeyatîn in digo Cebrîl cevane

Diken ewha tefekkur da neken kes
Di erd û asîman û her muqeddes

Weha nekran didîtana ‘ecaîb
Benû Ademîyan hem jî ġeraîb

Li Beytîl Meqdesî dîsa peya bû
Buraq anîn û hê nû lê siwar bû

¹⁴¹ hîcamî(‘e): mezin

¹⁴² ji ma: ji me ra

¹⁴³ dahîk(‘e): yê dikene

¹⁴⁴ hubû(‘e): daketina xwarê

¹⁴⁵ ġewġa(f): şer û mînaqeşe

Şeva wî hêj gelek mabû sefer kir
Bi yalê Mekkeyê ve kerrûfer¹⁴⁶ kir

Li rê borî li karwanê Qureyşî
Du xerwar¹⁴⁷ ser devek dîtî li pêşî

Yekî reş bû yekî dîtir belek bû
Ji wan borî we hêjana nefek¹⁴⁸ bû

Ku dîtî ew deve şeklê Buraqê
Revî û ket şikest wî ling di saqê¹⁴⁹

We borî ser yekî dî karîwanan
Li wan berze¹⁵⁰ bibû şutrek¹⁵¹ digeryan

Selam kir hem deva wana nîşan da
Yekî got çan Mûhemmed bû şeda da

Gehişte Mekkeyê fecrê nedabû
Ne bîd'e lew ku mîhmanê Xuda bû

Şibe rabû gelek gemgîn û dilteng
Dizanîbû diken tekzîb û aheng

Ji ewwel Ummu Hanî kir xeberdar
Beyan kir çan me gotî cumle esrar

Meger got Ummu Hanî, ruhnîya min
Mebêje bo kesek bînahîya min

Çikû emrek gerîb e, cumle zindîq
Ji fertê kufrê naken bo te teşdîq

Nebî go emrê rebbê 'erş e, î'lan
Bikem vî sîrrê nav koman û 'îlan¹⁵²

¹⁴⁶ Kerrûfer(f): hereket, lezandin

¹⁴⁷ xerwar: çewalê mezin

¹⁴⁸ nefek: nenêrî

¹⁴⁹ saq('e): ser gûzekê, ji gûzekê heta çokê

¹⁵⁰ berze('e): bilind, jor

¹⁵¹ şutr('e): deve

Jibo î'lanê çû cem wan neqencan
Di'irsâ hem ji tekzîb û ji rencan¹⁵³

Ebû Cehlê le'în dî gemkesarî¹⁵⁴
Be îstîhza xeber da û be xwarî¹⁵⁵

'Eceb dîsa li tiştêkî numaye¹⁵⁶
Çiye hadîs¹⁵⁷ bûyew te çi xuyaye

Belê go çûme îşev seyrê Eqdes
Li kû got, go îla Beytîl Muqeddes

Meger go çûyîw hatî şubhê vê dî
Belê go, gotî ger qewmê te vê dî

Cemi' bin dê bibêjî vê meqalê
Ji wan ra jî beyankî vê hewalê

Belê go dê bibêm, rabû nîda kir
Benî Ke'b û Lueyyan tev cema kir

Ji wan ra jî beyan kir vê be tevşîl¹⁵⁸
Hinan bû zêde ser wan kufr û teqlîl¹⁵⁹

Li hev dan destê xwe dikran tînazan
Gelek kuffarê pîs dikran fenazan¹⁶⁰

Digo Mût'îm hetta vê dem sehîl¹⁶¹ bû
Umûrê te we hem jî mu'tedîl bû

Ji vir pê ve dizanim îffîra ye
Hemû de'wa te kîzb¹⁶² û îddîa' ye

¹⁵² îlan('e): malbatan

¹⁵³ renc('e): zehmet, ezîyet, xezeb

¹⁵⁴ gemkesarî: bi awayê derd û kederê ji xwe dûr bike

¹⁵⁵ be xwarî: bi zîlletê

¹⁵⁶ numa(f): eşkere

¹⁵⁷ hadîs('e): qewimîn

¹⁵⁸ tevşîl('e): tefsîl, detay

¹⁵⁹ teqlîl('e): delalet, derketina ji rêya heq

¹⁶⁰ fenaz: hîle û desîse

¹⁶¹ sehîl('e): hêsan, rihet

Çikû çendan be‘îran¹⁶³ dikûdînin¹⁶⁴

Be zor çûn hatinê du meh qedînin

Şevêk çan çû û hatî puştî ev dem

Be pût û latê tesdîqa te nakem

Digo Şiddîqî¹⁶⁵ Mût‘îm ra te bed got

Qesem rast e hemî tiştê ewî got

Wekî rast e digotin dê bibêje

Ji ewşafê di wê durran birêje

Mûhemmed dest bi weşfa Meqdesê kir

Berê xwe ser wê kom û meclîsê kir

Xuda da pêşberê çehvê mubarek

Resûlullah beyan kir tev bi carek

Hemû gotin belê weşfa wê ‘eyne

Bila noqşanî û şubhe we meyne

Ebûbekrê Şiddîq go ger gelek jê

Ji vê dûrtir be ez bawer dikim jê

Digotin belkî vê seh kir ji geyrê

Welêkin dê bibêj eḫwalê ‘îrê¹⁶⁶

Digot eḫwalê wê ‘îrê li rewḫa¹⁶⁷

Li Ten‘îmê bû yek jî ewha ewha

Ji xerwarê belek ya dî ku reş bû

Beyan kir hem jî ewşafê ku keşş bû

Li rê ne go li pê min dê ewê bîn

Digotin kengî, go çarşembeyê tên

¹⁶² kîzb(‘e): derew

¹⁶³ be‘îr(‘e): deveyê çar salî

¹⁶⁴ dikûdînin: didin pêş xwe û diajon

¹⁶⁵ Şiddîqî: Hz. Ebûbekîr

¹⁶⁶ ‘îr(‘e): karwan

¹⁶⁷ li rewḫa(‘e): vedigerîya malê

Kete çarşembe dikran întîzarê¹⁶⁸

Derengî bû ta ket hukmê êvarê

Nebî gem kir, ji Rebbê xwe dua' kir

Xuda wê sae'tê jê ra dûta¹⁶⁹ kir

Ûeta kerwan gehiştê ber çehvê wan

Xuda kor ke beşer bişkê devê wan

Ji wan pirsîn temamê ku ji wana

Xeberdabû, kirin teşdîq ewana

Yeqîn zanîn ku tev rast e we dîsan

Ne mu'min bûn digotin sîhr e pîsan

¹⁶⁸ întîzar('e): li hêvîyê bûn

¹⁶⁹ dûta: du qat

12. DI HEQÊ ÎSLAMBÛNA ENŞAR DE (RAZÎBÛNA XWEDA LI SER WAN BE)

Ji ew paş hey digerya ser qebaîl¹

Dipursî kî be Îslamêye maîl²

Kî ye naşir ku kem³ teblîgê dînî

We teklîfatê rebbîl ‘alemînî

Diçû ‘Ûqaz û Mecnew Zîlmecazê

Di wan weqtê ku cem‘îyyet dixwazê

Qebûl nedkirina pîsê rîcalan

Didan îzarê⁴, gotin bed meqalan

Heta ku hate rastî qewmê Enşar

Çi Enşar û çi Enşar û çi Enşar

Belê ‘alem ku çehv e, bîbik⁵ in ew

Ku ‘alem bibte mersî⁶, dîrik⁷ in ew

Kesek îna‘amê îlahî nizane

Ku feđla Heq Te‘alellah çewane

Yehûdan hey digotan di be nezdîk

Bibit mursel nebîyyê Terk û Tacîk

Emê yek bin we bukjin Ews û Xezrec

Li wan bêhed biken tengîyû îşkenc

Çikû em herdû jî ehlê kîtab in

Welê ew herdû bê feđl û hîsab in

¹ qebaîl(‘e): qebîleyan

² maîl(‘e): dilxwaz, bi heves

³ kem: bikim

⁴ îzare(‘e): xistina bin şek û şubhe

⁵ bîbik: bîbika çav

⁶ mersî: (‘e) lîman

⁷ dîrik: dîrek

Welê dewlet gehište wan kîraman⁸

Birin zora yehûdan û lîaman⁹

Ji Teybe şeş tenê qenc û mukerrem

Musulman bûn xweşa wan weqtê efxem¹⁰

Te‘ahud kir ku hûn piştme‘rîyê ken

Ku tebliğa vî pêxemberîyê ken

Digotin gazîyê qewmê xwe ken em

Bi îznîllah ku çêbû qe‘ neke gem

‘Ezîzî wê demê hem xûd ‘ezîzî¹¹

Ji rebbê xwe bi teqwîyyew temîzî

Di sala pêve dozde tîn tamamî

Li balê cemi’ bûn ser wê meqamî

Musulman bûn hemû elhêmdû lîllah

Hilanîn her çi kirbûn şertê lîllah

Vegeryan hatine Yeşrîb mekanî

Xuda geş kir di nav wan muslumanî

Îmam bû Es‘edê lawê Zurare

Di emrê dînî dikran îstîşare

Musulman bûn ji nîswan û rîcalan¹²

Gelek pur dînî muzher¹³ bû di malan

Jibo te‘lîmê xwestin yek mu‘ellîm

Şiyand Muş‘eb be cem wan ve mu‘ellîm

⁸ kîram(‘e): kesên qenc, eshabê pêxember

⁹ lîam(‘e): kesê rezîl û zelîl û çikûs û ‘adî

¹⁰ efxem(‘e): pir mezin

¹¹ xûd ‘ezîzî: xwedî îzzet

¹² nîswan û rîcal(‘e): jin û mêr

¹³ muzher(‘e): eşkere

Di sala pêvetir heftê be îkram
Ji Qeyle hatine daxil di Îslam

Musulmanî heman ket îzdîyadê¹⁴
Dibûn tabî' ji danê¹⁵ hem ji badê¹⁶



¹⁴ îzdîyad(‘e): zêdebûn

¹⁵ dan(‘e): nêzîk

¹⁶ badî(‘e): çol, dûr

13. DI HEQÊ HÎCRETA WÎ (S.‘E.W) YA BAL MEDÎNÊ VE Ê TIŞTÊN PEY WÊ DE

Qureyşan dîn ku Qeyle bûne tabî’

Jibo xeyrê ‘îbadan xeyrê şafî’

We zanin ku di xaric da jibo wan

Hene naşir hene tabî’ jibo wan¹

Xuda jî îznê wî dabû be hîcret

Be qefle qefle hey dikrana hîcret

Wekî kundê li hev cevyan neyaran

Di heqqê wan dikirna îstîşaran

Di Darun Nedwetê da tev cemi’ bûn

Ji hesyana Benî Haşim meni’ bûn

Heman Îblîs di şeklê şeyxê Necdî

Li dest gopalekî hate wî ‘erdî

Dipursî jê ke ey şeyxî ji kuyî

Çi ‘îş e ku tu hafî vir jibo wî

Digot ez xelqê Necdî me mi seh kir

Ku şewrek we heye ez bûme haşir

Tevî şewra we da ez jî xeber dem

Jibo we şîret û xidmet be serdem

Eger re’ya mi baş e hûn be wê ken

We ger ne, hûn be re’ya xwe tenê ken

Xulaş ew jî rûnişte li cem wan

Meger bû serwerê wê meclîsa wan

Yekî got em ewî têken di cayek

Kilîd ken dergeh û qul, bel² şibakek

¹ Haşîye: Di herdu misra da di şûna “wan”ê de “wî” derbas dibe

Ku şîva xwarin û avê bişînin
Be tengasî mirin jê ra bişînin

‘Eceb îblîsî go ev ne şewab e³
Suala te ne muhtacê cewab e

Wiha ken ger, dê tebi’ wî be zorî
Ji wê derxen we ger qir bin derûrî

Yekî dî go li ser naqek⁴ suwar ken
Ji nav xwe der biken xwe jê riha ken

Nîda kir pîsê Necdî ku çî re’y e
Ziman û nuqê wî ma qey we nedye

Du sê rojan ewê pir ket hevalan
Bikêşet ser we getrîf⁵ û rîcalan

Ji wî hingî li we keysa xwe bînê
Di pozê wê va heyfa xwe derînê

Çewan keyfa wî bêtin dê wisa ket
Li we ‘Uzza û Latan berheba ket

Hemî gotin be pût û lat wisa ne
Gelek qenc şeyxê Necdî pê dizane

Ebû Cehlê le‘în go ez dibêjim
Jibo we re’yekî durran dirêjim

Çiye gotin, digo ta her qebîlek
Ji navê em⁶ biken muxtarê qeylek⁷

Bi destê xwe bide her yek ji seyfek
Bi hev ra lê biden bukjin be heyfek

² bel: ji xeyrî

³ şewab(‘e): rast û durust

⁴ naqe(‘e): deveya mê

⁵ getrîf(‘e): kesên reîs û giregir

⁶ Haşîye: Ji navê em bijêrin qencê qeylek

⁷ muxtarê qeylek(‘e): reîsekî bijartî

Ku xûna wî belav bit ser temaman
Benû Haşîm nikan êdî be ‘aman

Be mecbûrî dê xûna wî hilînin
Jibo şulhê jî hem mecbûr bimînin

Digot Necdî eva ye re’yekî baş
Ji vê re’yê kesek hûn xwe nedin paş

Belav bûn ew li ser vê re’ya hana
Welê Cebrîl wehîy anî hemana

Beyan kir qewlê wan û got nerazê
Di îşev da cihê ku hey dirazê

Ku hîcret key Xuda îzna te daye
Jibona we Medîne multeca ye

Resûlullah emir da ku sefer ken
Ji Mekkeh koç û malê xwe be der ken

Welêkin wan be roj tedbîrê dîbûn
Ji wehîya heq wî halî ‘ellimîbûn

Nebî gote ‘Elî, îşev di cî min
Di yatagê mi da razê li cî min

Welê kurkê mi jî ser xwe werîne
Neçirse dê te mekrûhek nebîne

Diseknî ta emanatan di şubhê
Bikey teslîm û bêy tê puştî şubhê

‘Elî ser wê firaşê⁸ bûyî naîm⁹
Kulaban¹⁰ jî li ber der bûne qaîm

⁸ firaş(‘e): nivîn

⁹ naîm(‘e): raketî

¹⁰ kulab(‘e): piranîya kûçik

Dizanîna nebîy ye da ku lêxin
Şewata cîgera xwe jê derêxin

Nebî rabû we qemçek axê hilda
Be ser re'sê di wan wê axê berda

Nedîtin wî, we ew çû beytê Şiddîq
Meger yek hate cem wî qewmê zindîq

Li vir go hûn diken çi întîzarî
Digotin bo Mûhemmed got di tarî

Ji cem we çûye mane hûn di cî da
We hem axê bi ser re'sê we berda

Nebî çan çûbû, çûbû garê Sewrê
Bila Sewrê be wê garê ke fexrê

Li xwar û jorê Mekkeh pur digeryan
Wekî tajî li pêy rêçî digeryan

Ji alî garê Sewrê yek eşer dî
Xeber da wan kîlaban ketne pêy wî

Ji darê ummî gîlan¹¹ tayekî baş
Hişîn bû deryê kehfê girtî pur baş

Xuda emrê kevokan kir ku çêken
Li ser wê darê hêlîn û hêk têken

We hem jî 'enkebûtê¹² tevnê bada
Li ser deryê şikeftê qencî rada

Dema dîtin ku garê hal eva ye
Qesem gotin Mûhemmed ne li ha ye

¹¹ dara ummî gîlan('e): sitrîmişk, sitrîbeloq

¹² 'enkebût('e): pîrê

Ji pêş mîladê¹³ wî belkî li hane
Ji mêjîn da vira bo van mekan e

Vegeryan pîsepîs hatin ji yalê
Welê şed naqe kirbûn ce'lê dallê¹⁴

Bila beyhûde ew hey lê bipirsin
Nebîyyû Bobekir der dîmê îns in¹⁵

Ûeta şê roj di wê kehvê muqîm man
Xeber tanî jibo wan 'Ebdurrehman

Dihat cem wan bi şev dîsan diçûya
Li Mekke şubhê çan ku wî dîbûya

We hem jî 'Amirê lawê Fuheyre
Mudam tanî jibo wan qûtûmîre¹⁶

Jibo rehber ecîr kir Îbnul Erqet¹⁷
Şeva çaran ketin tirhal¹⁸ û hem het¹⁹

Çi qasek çûn mûlaqî bûn Suraqe
Di qelbê xwe cezîm²⁰ kir wî hûmaqe²¹

Di erdê heşkî da espê wî daçû
Ûeta çokan çewan çamûrê da çû

Hewar kir ey Mûhemmed şed emanê
Xelaş ke min ji vê daçûnê hanê

Xelaş kir wî ewî jî 'erdî²² wan kir
Meta' û zad nehilda tenbe lê kir

¹³ mîlad('e): hatina dinyayê

¹⁴ ce'lê dallê('e): yê nîşanî wan bide

¹⁵ der dîmê îns('e): ji zerara însana dûr

¹⁶ qûtûmîr: xwarin

¹⁷ Îbnul Erqet: 'Ebdullah b. 'Ureyqit

¹⁸ tirhal('e): ketina rê

¹⁹ het('e): daketina ji jor ve

²⁰ cezîm('e): qerara qet'î

²¹ hûmaqe('e): ehmeq

Nebêje kes ku min wan dî di rê da
Ji ew paş kî didîta dîzviranda

Di rê da hatine cem Ummî Me'bed
Wekî tekyegehek bû nêvê meqşed²³

Ji goşt û şîrî xwestin da ku bikrin
Bi mişlê qîmetê racû'ê bibrin

Benû hađir li cem dîtin ku şatek²⁴
Li pêşt konê diçêret lê çî şatek

Ji geyrî çerm û hestî lê nemabû
Ji jarbûnê ji sorî paş ve mabû

Nebî go vê bidoşe gotî jar e
Nebî go îznê de em ken îdare

Nebî da der'ê²⁵ wê destê mubarek
Li puşt û der'ê maland deste carek

Nebî girt û hetta Şiddîqî jê dot
Ji şîrî têr vexwarin rawîyê got

Bi dotin carê dî hiştin di cî da
We rabûn ber bi meqşed çûn bi rê da

Ku hat zewcê wî jê ra macera got
Qureyşîyyê nebîy ye ew²⁶ qesem got

Eger weqtê li vir hađir bibûma
Qesem billahî dê tabî' bibûma

Hinan gotin ku ew jî bûn mihacir
Bi teb'a fexrê 'alem xeyrê naşir

²² 'erd('e): teqdîm, pêşkirin

²³ nêvê meqşed: nava rê de

²⁴ şat('e): mîh, mêşin

²⁵ der'('e): guhan

²⁶ Haşîye: ... wî qesem got

Dibêjin ‘ewsecek²⁷ bû cenbê²⁸ konê

Nebî kir meçmeçe²⁹ avête şûnê

Sibe rabûn ku dîtin bûye darek

Gelek mazin û girtî ber³⁰ mubarek

Bi ʔe’ mê hingivîn û bîhnê ‘enber

ʦe’am û hem şerab û hem elembere³¹

Di weqtê seh kirin ehlê Medîne

Qudûma³² xeyrê xelq û ‘alemîne

Herroj diçwane Herret³³ întîzarê

Ûeta nîvro we paş dehtane xwarê

Welê rojek xudan xeyr û mubarek

Di piştî bûn ricûê³⁴ mal be carek

Yehûdek dît ku wek rojê ʦûlû’ da

Berê dabû Qûba û hate serda

Yehûdî da nîda ku hat ewê kû

Li wî Qeyle digeryana be dîlcû³⁵

Sîleh hildan û Qeyle çûne pêşî

Be îstîqbalîya fexra Qureyşî

Peya bû ew Qubaê da duşembê

Li nav ebnaê³⁶ ‘Emr û ‘Ewf di cenbê

Li wê ma bîst du yan bîst û çaran roj

Bîna kir Mescîda Teqwa heman roj

²⁷ ‘ewsec(‘e): dara dirîreşkê

²⁸ cenb(‘e): kêlek

²⁹ meçmeçe(‘e) kir: avê di devê xwe werda

³⁰ ber: semere

³¹ elembere: yê/ya elemê dibire

³² qudûm(‘e): gîhaştin

³³ Herret: cîyê bi kevirên reş

³⁴ ricû(‘e): vege

³⁵ be dîlcû(f): bi dil û can

³⁶ ebna(‘e): zarok

Di roja cum‘e derket ez Qubaê
Nimêja cum‘e kir der Ranûnaê

Suwar bû ta gehište Teybeya xwe
Cihê teblîgê emrê rebb li ba xwe

Xweşa mizgîn li te Teyba Resûl î
Xuda pir kir te teşrîf û qebûlî

Xudanê setr û hem perde nişînan
Dinêrin penceran ve nazenînan

Jibo wan lew heyatê cawîdan bû
Jibo îman û dînê wan eman bû

Mucerred cismê, ew bûn rûhî va bû
Medîne hem bi wî rehn û dîya³⁷ bû

Suwarê ser şutûr³⁸ tê da diborî
Di ber deryê çi nîkê³⁹ merd diborî

Dikir teklîfê teşrîfa Resûlî
Resûlullah jî hey nedkir qebûlî

Digo uştûr meger me’ mûr e lewra
Diçet serbest û tewren şumme tewra⁴⁰

Ûeta ku çû cihê mescîd û nex⁴¹ bû
Ji wê çû deryê Boeyyûbî⁴² nex bû

Ji wê rabû we dîsa çû cihê xwe
Cihê mescîd, li wê kir nîrnîrê xwe

Îşaret kir Resûlullah peya be
Nebî go dê cihê me her li ha be

³⁷ rehn û dîya(f): ronî û zîya û nûr

³⁸ şutûr(‘e): deve

³⁹ nîk(f): baş, qenc

⁴⁰ tewren şumme tewra(‘e): merhale bi merhale

⁴¹ nex(‘e): mexel

⁴² Boeyyûbî: Ebû Eyyûb el Ensarî

Be dîna wî gelek xurrem⁴³ û şa bûn

Be sekna wî di wê da dilkuşa⁴⁴ bûn

Dikirna şahî û şe'ran digotin

Ke mecnûn bûn û Leyla cem xwe dîtin

Ebû Eyyûbî wî cem xwe bi cî kir

Û heta ku mescîd û mala xwe çêkir

Ji mescîd ra be piştta xwe mubarek

Kevir tanîw dixebtîna be carek

Be qasî qametek orte bulend kir

We seqfê⁴⁵ wê ji darê xurme çê kir

Be nû fantazîyû neqş û muzeyyen

Nebîyyû ta'etê dikran muzeyyen

Dilê fexra Qureyşî taze xweş bû

Li wê fexra 'Ereb hey hey be geş bû

Di bin wexma⁴⁶ Medînê kir giranî

Û heta ku êş û ta, ser wan ve anî

Li wan şa bûn yehûd û hem munafîq

Neyar û duşmin û hem namuwafîq

Resûlullah dua' kir ya Îlahî

Ji serme refî'⁴⁷ ke tu ev dewahî⁴⁸

Li me xweş bânî Yesrîb şubhê Mekke

We em hej jê biken buhter ji Mekke

Xuda êşê neqil kir bir be Cuħfe

Welê ew dem Yehûdî bûn di Cuħfe

⁴³ xurrem('e): şad û kêfxweş

⁴⁴ dilkuşa(f): dilrihet

⁴⁵ seqf('e): serbanî

⁴⁶ wexm('e): germahî

⁴⁷ refî'('e): hilanîn

⁴⁸ dewahî('e): bela û afet

14. DI HEQÊ MEŞRÛ'BÛNA AZANÊ DE

Gehîştin Teybeê tê¹ musterîh bûn

Be teblîg û 'îbadet munşerîh² bûn

Be keyfa xwe dikirna new'ê ta'et

Be serbestî bû cum'e hem cema'et

Li hev bûn cem'û dikran îstîşarek

Çewan topken li hev nasan be carek

Hinek bêne cema'et, hin bimînin

Qe nabit, re'yekî jê ra bibînin

Hinan go dê emê naqosê çêken

Bi wê nasan cemi' der mescîdê ken

Hinan go gazî ken em mal be malan

Werin cum'ew cema'et tev delalan

Qerarê wan li ser naqosê çêbû

Welê ew jî ne hezkiryê Nebî bû

Di xew da 'Ebdullahê Zeydî dîtî

Ezan û qameta han belkî dîtî

Ji bil wî cem'ekî eşhabê dîtir

Di şubhê wê, Resûlullah beguh kir³

Ku 'Ummer vê bihîstî hatî ew dem

We got min jî diye ey fexrê 'alem

Resûlullahî pur hemdê Xuda kir

Qerar da vê, we re'yê dî cuda kir

Nebî gote Bîlalî, kay⁴ Bîlalî!

Be şewtê Dawûdî awazê 'alî

¹ tê: tê de

² munşerîh('e): şad û kêfxweş

³ beguh kir: xeberdar kir

Azan de weqtê me'hûdê⁵ şelatan
Îqamet ke dema rabin şelatan⁶

Şeda xûş û be awaz û eda bû
Çewan cuz'ek ji Dawûdî bû, mabû

Yehûdê pîs gelek lê bûne duşmen
Li çerrê⁷ wî dixebtîna de mekmen⁸

Welê tiştêk ji destê wan jî nedhat
Xuda hafîz bû her anat û ewqat⁹

Meger rojek diçûne cem Lubeydî
Kurê E'sem ewê şahîr pelîdî¹⁰

Digotin em diken sîhra Mûhemmed
Qe lê te'sîrê nake ey mumecced¹¹

Tu lê sehrê bike me jê xelaş ke
Tu şê dînarê ucret bo xwe xaş ke

Ewî sîhrek 'eceb kir kafîrê pîs
Bi wê xweş kir dilê ustadê îblîs

Di yek şane¹² û mûyê re's û derzî
Nebî gerya de'îf û jar û lerzî

We avête binê bîra Zîerwan
Xuda wê avê kir memsûx¹³ li ser wan

Çi mîqdarek be ser da çû dewamî
Xeda Cebrîl şiyande îhtîramî

⁴ kay: de ka

⁵ me'hûd('e): diyarkirî, eşkere

⁶ Haşîye: Îqamet ke jibo rabin şelatan

⁷ çerr('e): zerar

⁸ de mekmen('e): di ciyê kemînan de

⁹ anat û ewqat('e): kêlîw weqtan

¹⁰ pelîdî: şeytanî, pîs û zelîl

¹¹ mumecced('e): bi hurmet û şeref

¹² şane('e): şehê por

¹³ memsûx('e): genîbûyî, ecaîb

Xeber dayê ku emrê te weha ye
Ji ta Nas û Feleq dermanê daye

‘Elî derhal şiyand anî wê sîhrê
Vekir vêra bû şubhê felqê fecrê

Meger se’ya yehûdan berheba çû
Be nav her meclîsê va ev neba¹⁴ çû

Çi bêjim pur li derrê wî gerane
Beyana wan di vir da pur giran e

Bixwînin eşeran dê hûn bizanin
Yehûdê ku eşeddî duşminan in

Jibo peygemberan û ummetê wan
Ji cem xwe heq bişîne zehmetê wan

¹⁴ neba(‘e): xeber

15. DI HEQÊ ĞEZWEYÊN WÎ (S.‘E.W) DE: ĞEZWA EBWAÊ

Resûlullah xudan cî bû di Ƨeybe

Ji ehlê kufrê nedkir êdî reybe¹

Li wê seknê bû salek mahê çendek

Şefer da kir îrada herb û cengek

Qureyşan pur ku dabûnê cefayê

We ‘aşî bûn ji îtbaa’ hodayê

Demek ew çûne karwanî û karî²

Nebî seh kir fikir hilde demarî³

Heman rabû digel heftê şhaban

Çû Ebwaê jibo qetla kîlaban

Nedîtin wan, Benû Dumre ku dîtin

Digel wî şulhê eşleh⁴ bo xwe dîtin

Meger keyd⁵ û qîtalek çênebû qet

Vegeryane Medîne şîrê mem‘e⁶

¹ reyb(‘e): şubhe, fikir

² kar: qezenc

³ demar(‘e): heyf

⁴ eşleh(‘e): çêtir

⁵ keyd(‘e): hîle

⁶ şîrê mem‘e(‘e): di haşiyeyê de bi me’na şêrê mîna birçî û leqayê dujmin bûye

16. ĞEZWEYA BÛWAT

Kete mahê Rebûulewwelê da
Ji wê salê hinan got axirê da

Bihîstin ku Umeyyeyê Xelef hem¹
Tevî şed mêr û uştûrhayê² pur cem

Diçen karwanîyê hatin Bewatê
Emir da ku biçen herb û nîşatê³

Du şed mêrê ku hîcret kirbû hilda
We Se'dî Bûweqas⁴ beyraqê hilda

We Se'd îbnû Mûazê mêrê 'adil
Li ser Medîneê bû mîr û 'amil

Welêkin hêj nedîtin wan vegeryan
Bila keyd û qîtal û herb û talan

¹ Haşîye: Nebî seh kir Umeyyeyê Xelef hem

² uştûr('e): deve

³ nîşat('e): fealiyet

⁴ Se'dî Bûweqas: Se'd Bîn Ebî Weqqas

17. ĞEZWEYA ‘UŞEYREH

Demek hate hîsaba şêrê hummet¹

Refî’ bû her xuşûsatê di tuhmet

Demar² û ewwel û îzaê pêşîn

Ne ‘eyb e ku di meqsed da bikêşin

Cumadel axîra ‘eynê wîsalê

We yan yê ûla rind nayê xiyalê

Hela rabûn Qureyşî ba tîcaret

Berê xwe dane Şamê pur be şerwet

Hemû zêr û hûllîyû³ zîvê şandin

Di qelbê xwe gelek rebhê⁴ nîşandin

Be bazirganî û qewm û giranî

Hemû çûn da rebiḥ ken ba emani⁵

Nebî hilda muhacir pencîyû şed⁶

Hucûm kir pêşîya wê ‘îrê efsed⁷

Ḥeta çûne ‘Uşeyre, dîn ku pîsan

Bihurî bûn, vegeryan paş ve dîsan

Benû Mudlîc di rê da bûn muşaliḥ⁸

Muwafîq bûn di ḥacat û meşaliḥ⁹

¹ hummet(‘e): bi ezm û qerarî

² demar(‘e): texrîbat

³ hulle(‘e): tiştê biha

⁴ rebḥ(‘e): kar û qezenc

⁵ ba emani(‘e): bi selamet

⁶ sed û pêncî, 150

⁷ ‘îrê efsed(‘e): karwanê pir xerab

⁸ muşaliḥ(‘e): sulhkirî

⁹ meşaliḥ(‘e): piraniya menfîet

18. ĞEZWEYA SEFWAN

Di çend rojan li mal kir îstîrahet

Dibêjin Kurrezê Fehrî îgaret¹

Dida ser mal û talanê Medîne

Berî daxil bibûna wî di dîne

Nebî rabû be ‘esker çû di hewrê

Gehişte wadîya Sefwanê Bedrê

Neqefland û zîvirya hate pa ra²

Welê ew bû sebab bo Bedrê kubra

¹ îgaret(‘e): talan, êriş

² pa ra: bi paş da

19. BEHSA GUHERÎNA QIBLEYÊ

Li Mekke ber bi dad û beytê ekber¹

Be hêsanî dibû jê re muyesser

Di weqtê çû Medîne çênebû lew

Hîzayek da nebûn lê xweş nehat ew

Yehûdan jî digotin ew xelîf e

Me ra lew qible dabûme redîf e²

Li qelbê wî dihata pur giranî

Emînullah ji nageh wehîy anî

Bifetlîne berê xwe Ke'beya xwe

Bigêre Ke'beê hem qibleya xwe

Nimêja nîvro³ kir bûn dûre Ke'be

Du rek'et dî berê xwe dane Ke'be

Kirin dîdîqodî îman çê'îfan

Belê xweş bû be wan mu'min 'efîfan

Di piştî vê mehek çû sewmê ferq bû

Zekat û fitre jî pêranê ferq bû

Di ewwel da digirt eyyamê bîdan⁴

Xişûşê ummet e ev rojîyê han

¹ Ke'be li pêşya wî, berê xwe bida Mescîda 'Eqsayê

² redîf('e): yê pey re tê

³ Haşîye: ... nîmroz

⁴eyyamê bîd('e): rojên 13, 14 û 15ê mehên hicrî

20. GÊZWEYA BEDRÊ YA MEZIN

Çi tiştê ku Mudebbîr her Xuda bî
Jibo tehsîlê emrê Muştefa bî

Çu gem nîne ewê bibte muyesser¹
Be tebdîlan qe nabit ew muğeyyer²

Cefa û şehîlî û îza Nebî xwar
Niye xalî ji hîkmet hem ji esrar

Be zahir her çi bêza ku bêtin
We meşhûr e mu‘ezzez dê nebînin

We hem jî ecrê mîqdarê cefa ye
Heqîqet muqteda hukmê Xuda ye

Ebû Sufyan bi karwanek giranî
Bi bal Şamê ve çûbû malê tanî

Me‘el qîşse Resûlullah reha³ wan
‘Uşeyreh da xwedî dikra mudaman

Ji nageh rojekê dîn kir nîdaê⁴
Kesê têtin bila bête gezaê

Ke ye’nî têtin ew ‘îrê Qureyşî
Emê nijde bibin bavêne pêşî

Gelek racûf⁵ we hin girtin be sistî
Nezanîn herb e rastî û durustî

Ebû Sufyan jî hey dikra tecessus
Dema kefte⁶ guhê wî pêjn û ev his

¹ muyesser(‘e): serkeftî

² muğeyyer(‘e): hatiye guhertin

³ reh: rêya Qureyşîyan

⁴ Haşiye: ... rojekê girte nîdaê

⁵ racûf(‘e): hejandî

⁶ keft: ket

We zanî hâl wiha ye kefte qelqel⁷
Be dil tîrsa be can gerya jî mu'tel⁸

Hinara⁹ Demdemê 'Emrê Ğefarî
Be bal Mekke be lez bēnit hewarî

Bi rê pozê deva xwe came kir çak¹⁰
Xwe xiste halekî pîsê xeṭernak¹¹

Ku zû rabin xwe pêk bînin be tedbîr
Biçin îmdadê Bûsufyan û hem 'îr

Meta peygamberê me 'Atîke jî
Xewek dîbû ditirsaya gelek jî

Suwarê naqe, yek dî hate Ebṭeh
Hewar kir ey guder¹² ba vê rê eşreh¹³

Werin cayê ku hûn tê bēne kuştin
Di pê sê roj di xûnê bēne riştin

Li xwe top kir rîcal û hem şenadîd¹⁴
We xas û 'am û ğilman û mewalîd¹⁵

Li pê bûn çûne mescîd dorê beytê
Ku dîn naqe wî rakir banê beytê

Li ser dîsa wiha qîr û nîda kir
Ji wê çûbû Qûbeysê hem wisa kir

Li wê hilda zihîmek¹⁶ xwar ve berda
Li xwarê parçe bû hate be serda

⁷ qelqel('e): tirs û endîşe

⁸ mu'te('e): nexweş, seqet

⁹ hinara: şand

¹⁰ came kir çak: baş kinc kir

¹¹ xeṭernak('e): bi talûke

¹² guder('e): bêwefa, xain

¹³ ba vê rê eşreh('e): bi vê rêyê eşkeretir

¹⁴ şenadîd('e): kesên giregir, mezin

¹⁵ ğilman û mewalîd('e): ciwan û zarok an jî kole û gende

Nema beytek di Mekke parçe çûyê¹⁷
 Ji xew hişyarî bû pur fezi'¹⁸ bûyê
 Şibe rabû çewan dît gote 'Ebbas
 Welê qet go nebêjî bil ji min nas
 'Ebbasî gote yekî, ew jî kur xwe
 Xulaşe pur kirin şayi' sirê xwe
 Heta gazî 'Ebbasî kir Ebû Cehl
 Çiye ev pê mijûl in ku hemû xel¹⁹
 Ji we de'wa nubûwwet kir rîcalan
 Ne bes bû ku we nîswanên di malan
 Diken de'wa nubûwwet ev çi hal e
 Dizan her kes ku ev de'wa beçal e
 Di piştî şê rowan ger ev derew bit
 Bila bo Haşemî we'da min ew bit
 Ku dê ez kağidek çêkem beyan kem
 Ku hûn ekzeb²⁰ ji her xelqên²¹ 'eyan kem
 Heman 'Ebbasî kir çêrî le'înî
 Hicûmî wî kir û xel kefte beynî
 Di roja şê, 'Ebas çû mescîdê ve
 Ku dî mel'ûn ji wê diçte bi wê ve
 'Ebbas çû bal ve da ku lê bixîne
 Ku da kîna kevin pozan ve bîne
 Nehêrî ku qe naseknî dibazî
 'Eceb go ev ji çi şuglê digazî

¹⁶ zihîmek('e): parçeyek ta't

¹⁷ Haşîye: Çiqas xanî di Mekke parçe çûyê

¹⁸ fezi'('e): panîk, qurf

¹⁹ xel: gel, xelq

²⁰ ekzeb('e): herî derewker

²¹ xelqên: xelqê re

Çi binhêrî ku demdem²² çan me gotî
Gelek peşmurde²³ hal û pîs û kotî

Dibê rabin hewar e hey hewar e
Mûhemmed daye ‘îra we ‘îgare²⁴

Be pût û lat ku destê wî gehiştî
Ewî talan biket nahêle tiştî

Şenadîdê Qureyşî cumle rabûn
Li şîmşîr²⁵ û rim û tîran belabûn

‘Eceb gotin Mûhemmed, ehlê Yeşrib
Çewan talan biken ‘îra me yek rib

Be nefsa xwe diçûyan, naîbê xwe²⁶
Dişanda yek be ucret wî cîhê xwe

Suheyelê ‘Emrî go ya alê galib
Ji min mal û ji min her qût û ratib

Herin defi’ biken her ‘eyb û ‘aran
Ku malê we nebin hizba neyaran

Welê tîrsa xewa pêşîn di dil wan
Ji nû şebr û şebatê bir ji dil wan

Umeyye terzê gamêşê nerabû
Çikû zanî qiyamet wan ve rabû

Ebû Cehlê le‘în go ma tu naçî
Bibînin te kesê dîtir qe naçî

Tu reyhana Qureyşîw reysekî wan
Gelek şerm e li paş mînî²⁷ tu bê wan

²² demdem(‘e): kesê bi qehr û xezeb

²³ peşmurde(f): perîşan

²⁴ ‘îgare(‘e): talan, hicûm

²⁵ şîmşîr(f): şûr

²⁶ Haşîye: Be xwe her kes diçûyan, naîbê xwe

Hinek binçengîyan da bin milê wî
Mezin kir wî we jîra²⁸ kir dilê wî

Ûeta rakir şîyande pêşî ‘Ezrîl
Ûeyata wî be mewtê kir di tebdîl

Suwar bûne zûlûl²⁹ û badê payan³⁰
We mehrûyan³¹ li dev tanîn ginayan³²

Sîtê³³ xatûnê wan ketbûne pêşî
Li pê dikşan şenadîdê Qureyşî

Binêrin ka çewan kir fexrê ‘alem
We şellellahû ‘eleyhî wessellem³⁴

Dema derket ji Teybe qasekî hat
Li ser bîrek hilavêtin rihalat³⁵

Ji bîrê av kişandin jê vexwarin
Ji wê çûn kehnîyek dî jê vexwarin

Digota avê bîrê gersî³⁶ ‘ezb e³⁷
Wî serkehnî ji cennet çan ku der be

Be emrê ‘alî da emrê rîcalan
Bihejmêrin ji nav derxin rewalan³⁸

Bifetlînin ji pazde sal û berjêr
Bimînin sade beql û pehlewani mêr

²⁷ mînî: bimînî

²⁸ jîra: cesaret

²⁹ zûlûl(‘e): deveya mê

³⁰ badê payan: lezandin ligan

³¹ mehrû(‘e): jin

³² gîna(‘e): gotina dîlokan

³³ sît(‘e): seyyîdetê xanim

³⁴ Haşîye: ‘Eleyhî şellî ya rebbî we sellem

³⁵ hilavêtin rihalat: kurtanên deveyan avêtin (qonax vegirtin)

³⁶ gersî(‘e): ciyê tîrhên daran

³⁷ ‘ezb(‘e): şêrîn û xoş

³⁸ rewali: ciwanên biçûk

Ji Enşarê Resûl û şebhê hîcret
Temam bû sê şed û pencî be hîmmet

Resûlullahî çêkir sê lîwayan
Yekî da destê Muş‘eb lê didû man

Yekî pêşî Nebî destê³⁹ ‘Elî bû
We yê dî destî yekî Enşarî bû

Nebî şûrê xweê ‘eđbî⁴⁰ hilanî
Bi rê keftin du destê xwe hilanî

Dua’ kir go: Îlahî! ‘Eskerê min
Çi kêmayî heye pêk bîne bo min

Hemana dîtî ne’met bû tamamî
Ji kîswet⁴¹ yan ji merkeb yan ze‘amî⁴²

Difetland muşrîkan îlla ku îman
Be anîbû we bibya ehlê îqan⁴³

Meha rojî bû fetrî hem emir kir
Bifişrin, kî nefiştirî lewme lê kir

Li ser heftê devan dikrana newbe⁴⁴
Be şê şexşan be‘îrek⁴⁵ bû di xidme

Li wê dîsa jî wan hejmart kîramî
Ku dît bûn sê şed û sêzde tamamî

Mufferreh bû we go wek şebhê Talût
Li ser nehrê ku çûne herbê Calût

³⁹ Haşîye: ... derdest ‘Elî bû

⁴⁰ ‘eđb(‘e): cûreke şûr e

⁴¹ kîswet(‘e): kinc

⁴² ze‘am(‘e): xwarin

⁴³ îqan(‘e): zanebûna qenc û yeqînî

⁴⁴ newb(‘e): dor, nobet

⁴⁵ be‘îr(‘e): deveyê nêr

We hem jî ew be qasî murselan in
Çewan parastîyê nêvê kelan in⁴⁶

Gehîştin wadîya Zefran bihîstin
Qureyşan ser zûlûlan⁴⁷ waye têtin

Be eşhaban Nebî kir îstîşare
Li wan xen, yan bidin ‘îrê⁴⁸ îgare⁴⁹

Hinan gotin îgara ‘îrê çê ye
Hinan jî go çi bêjî her welê ye

Meger Mîqdadê Kendî go peyember
Çewan tedvê⁵⁰ ‘înanê⁵¹ pêve wergir

Qesem nabêjin em mîna yehûdan
Ku bo Mûsa digotin wan ceħûdan⁵²

Herin şer ken tu û rebbê xwe lê em
Li vir rûnin temaşa we biken em

Welêkin em be xwe herb û geza ken
Tu û rebbê xwe jî pur yardima ken

Tebessum kir Nebîyullah we şa bû
Dua’ kir ew dua’kanê⁵³ şefa bû

We hem Se’dê ‘Ûbade got eger te
Xwe avêt beħrê jî em tîn li pey te

We hem Se’dê Mû‘az wek yê ‘Ûbade
Be ‘eynê vê meqalê kir î‘ade

⁴⁶ nêvê kelan: di nava kelheyana de

⁴⁷ zûlûl(‘e): deveya mê ya jibo lêsarbûnê

⁴⁸ ‘îr(‘e): kerwan

⁴⁹ îgare(‘e): êriş

⁵⁰ tedvê: tu divê, tu dixwazî

⁵¹ ‘înan(‘e): gem, dezgîn, meşandin

⁵² ceħûd(‘e): nankor, yehûdî

⁵³ dua’kan(f): kesê dua’ dike

Ji Enşaran hemî serbest û şa be
 Kesek terka te naket dilkuşa⁵⁴ be

 Nebî go dê sefer ken lew îlahî
 Be min ra we'de daye ku vê gahî

 Ji 'îr û yan ewê hatin ji Mekke
 Yekî nexçîr⁵⁵ te bikem şubhê neke

 Nebîyullah û Bobekir suwar bûn
 Heta dîtin yekî şeyx lê numa bûn⁵⁶

 Ji wî pirsra Qureyşan kîrn û wî go
 E nabêm ta nizam kî ne⁵⁷, Nebî go

 Bibêje da bibêjim ey mumecced
 Ewî go min bihîstî ku Muhemmed

 Digel şehban filan rojê derêne
 Durust bit ger niha l-filan derê ne

 Qureyşî jî be der hatin filan ro
 Eger rast e li bêvan cî ne îro

 Heqîqet jî wisa bû çan wî gotî
 Bi neqlê 'eqlî ew cewher firotî

 Gelo hûn kî ne bêjin hem ji min ra
 Nebî got "Em ji avê ne" ji wî ra

 Ji lew tewrîye kir da pê nezane
 Nebêjit bo Qureyşan ku li hane

 Resûlullah di şubhê mêrê Kerrar⁵⁸
 Tevî cem'ek şiyand tefîşê exbar

⁵⁴ dilkuşa(f): dilrihet

⁵⁵ nexçîr: nêçîr

⁵⁶ Haşîye: Li rê kalek xuya kir lê numa bûn

⁵⁷ ta nizam kî ne: heta bizanibim bê hûn kî ne

Li Bedrê hatine rastî du şexşan
Ku av dibran, ewan girtin we înan⁵⁹

Li cem peyğember û şehbê kîramî
Li ku ne go Qureysîyê lîamî⁶⁰

Ewî got wî li pişt vê tillê⁶¹ han e
Şenadîdê⁶² di wan wê dî cevane

Negot çend in, Nebî go çendî naqe
Di rojê da diken bo xwe nifaqe

Digot rojek deh û yek ne dixun ew⁶³
Nebî go beynî neh şed û hezar ew

Di weqtê ku beyan bû kî û kî ne
Tevî wan da Ebû Cehlê le'în e

Nebî go cumleê wan raweşane
Be ser me da li vir der hilweşane

Welê naşir Xudayê 'alemîn e
Xeberdarê wî Cebrîlul emîn e

Cehem yek bû ji ewladê Muţtelîb
Di xew da dîbû qetla ehlê mewkîb⁶⁴

Yeka yek gote bo wan aşîkar e
Ji lew zivrîn ji wê hin dîlfîkar e

Ebû Cehlê le'în go dê beyan bit
Şibe kuştî kîye dê xweş 'eyan bit

⁵⁸ Kerrar: Hz. 'Elî

⁵⁹ înan: anîn

⁶⁰ lîam('e): kesê rezîl û zefîl û çikûs û 'adî

⁶¹ til('e): gir

⁶² senadîd('e): kesên giregir û mezin

⁶³ rojê neh devan dixun

⁶⁴ mewkîb('e): qafile

Du ten şehbê Nebî çûbûne bîrek
Li ser wê bîrê av dertanî mêrek

Ebû Sufyan di pê wan hate wê dî
Sual kir gote kes nedye li vê dî

Belê got du suwar lê yê neîrsî
Ne hacet bû jibo teftêş û pîrsî

Ebû Sufyan ji bişkulê deva wan
Yeqîn kir Yeşîbî ne rehzenê⁶⁵ wan

Bi lez çû 'îrê xiste rahekî⁶⁶ dî
Mebadayê⁶⁷ serê mekrûhekî dî

Şiyande cem Qureyşan go bifetlin
Selamet hate 'îra me bifetlin

Ebû Cehlê serê fitnew fesadê
Muşîr⁶⁸ ma ser nevînîyû⁶⁹ 'înadê

Qesem kir go hetta şê roj li Bedrê
Nekem zewq û şefa û sekn û şebrê

Diyafet çênekem xemrî nenoşim⁷⁰
Def û çeng lê nedin 'esker nekêşim

Hinek jî bûn muxalîf bûn mufariq
Be wî ra man ewê wek wî munafiq

Meger Exnes⁷¹ digotî: Te diye qet
Direw kirye Muḥammed? Go ne qet qet

⁶⁵ rehzen(f): şaqî, yê rê dibire

⁶⁶ rahek(f): rêyek

⁶⁷ mebada(f): gelo ne

⁶⁸ muşîr('e): bi îsrar

⁶⁹ nevînî: neyartî

⁷⁰ Ziyafet nekim, şarab venexum

⁷¹ Exnes: Ahnes bîn Şerîk

Me dîtîn ew di nav me pur emîn bû
Di şîdî û rastîyê da xweş metîn bû

Welê bo wan sîqayet⁷² hem rîfadet⁷³
Digel meşweretê ger hem rîsalet

Biçit cem wan, jibo me çi bimînit
E nabim tabî' û dê ew bibînit

Ji lew Exnes digel qewmê xwe zivrîn
Xuda eşla li pê wan nîne nifrîn

Benû Haşem kirin ku tev bifetlin
Nehîşt Bûcehlê mel'ûn da bifetlin

Ûeta çûn 'Udwetul Quşwa ser avê
Nebîyyû 'eskerê xwe dûr ji avê

Şehabe tîhnî bûn zêde ji taqet
Li wan kir weswese şeytanê le'net

Ke çan zor ken li we, ew muşrîkûn in
Welîyullahî hûn in, muslîmûn in

Ku bêtaqet ji tîhnan bèn we bukjin
Ji kerba duşminî xûna we mêjin

Xuda 'ellam e, zanî têngîya wan
Şiyand baranekî ser bengîya wan

Ruwê erdê tefa⁷⁴ toz û ğubareş⁷⁵
Ji wan çû weswesa şeytanê rûreş

Li ser ehlê delalê bûye neqmet⁷⁶
Çewan bo musulmanan bûye ne'met

⁷² sîqayet('e): meriv avê bide kesan

⁷³ rîfadet('e): meriv zîyafetê bide mêvanan

⁷⁴ tef('e): toz

⁷⁵ ğubareş(f): toza wê

Nebî hetta şibe seknî dua' kir
Ji rebbê xwe dixwest nuşret şena kir

Nimêja şubhê kir gote şehaban
Qewîdil bin di herba wan kilaban

Be lez çûn xwe gihandin nêzî avê
Qureyşan hê nû kêşan nêvê davê⁷⁷

Hubabê Munzîrî merdê geđenfer⁷⁸
Digo em bîrê ha bigrin we dîger

Zuha ken çimkî herb keyd û xuda'e⁷⁹
Be qetl û fetl û men 'û îmtîna'e⁸⁰

Li ser vê re'yê bû Cebrîlî nazil
Be hev ra tev we kirn⁸¹ û mutmeîn dil

Nebî ra çêkirin kolek sihiban⁸²
Muqabîl me'reka⁸³ cem'a şehaban

Ebû Bekrê Şiddîq şûrê xwe kêşa
Dilê ehlê delalê jê diêşa

Li wê bo newbedarê fexrê 'alem
Şiyar bû lê be şed gûşan⁸⁴ dema dem

'Elîyyû Se'd û hem ba cem'ekî dî
Di hîrsa⁸⁵ fexrê 'alem bûn li wê dî

Ji nageh dîn Qureyşî tîn muselleh⁸⁶
Nebî go rebbî çêke 'îşê eşleḥ

⁷⁶ neqmet('e): heyf hilanîn, xezeb

⁷⁷ nêvê davê: nava kemînê

⁷⁸ geđenfer(f): mêrxas, qehreman

⁷⁹ xuda'e('e): keyd, hîle, xapandin

⁸⁰ îmtîna'e('e): jê vekişîn, xwe jê dîrkin

⁸¹ we kirin: weha kirin

⁸² kolek sihiban(f): holika jibo siyê çêke

⁸³ me'reke('e): meydana herb û şer

⁸⁴ be şed gûşan(f): bi sed guhan

⁸⁵ hîrs('e): veşartin, parastin

Tu fir'ewnê minê Bucehlî bîne
Be qehra xwe di bin şûrê me bîne

Dua' yek yek li ser wan kir be nefrîn
Çewan got yek ji wî halî nefetlîn

Le'înî şand yekî casûs li qencan
Nihêrî sê şed in çû got neqencan

Ji bil wan kes nîne lê mewtê eħmer⁸⁷
Di bin şûrê di wan û zirh û mîgfer

Eger yek em ji wan bukjin ewê yek
Ji me danîn⁸⁸ we belkî zêde ez yek⁸⁹

Hemana 'Utbe rabû xuþbekî xwend
Bifetlin em ji vir go ey eqilmend

Muħemmed ger 'ereb kir tew'ê⁹⁰ ferman
Li ser min 'ar we gir ne derde derman

Ĥekîm⁹¹ go ma dibî şa, min jibo wî
Dema pêşîn we emwalê⁹² birin wî

Çikû de'wayê xûnek bo dibeynî
Beyana wî bila vê gav bimînî

Belê go damînê⁹³ wan im we rabû
Suwar bû naqekî çû nav Ĥeşem bû

Şufûfê⁹⁴ 'eskerê qewî Qureyşî
Hemû şeq kir digerya paş û pêşî

⁸⁶ muselleħ('e): bi sîleh

⁸⁷ mewtê eħmer('e): mirna bixwîn

⁸⁸ danîn: deynin xwarê

⁸⁹ ez yek: ji yekê

⁹⁰ tew'ê('e): tabi'bûna jidil

⁹¹ Ĥekîm îbnul Ĥızam

⁹² emwal('e): piraniya mal

⁹³ damîn('e): kefil

⁹⁴ şufûf('e): piraniya sef

Digota xûna ‘Emr û malê wan bir
Hemû damîn ez im nebne munazîr⁹⁵

Ebû Cehlê le‘în qeṭ guh nedayê
Muşîr ma ser şerr û fitnew belayê

Digo ‘Utbe kurê wî, wî digel wan
Digel ku ew jî pişmam e jibo wan

Ji vê qasî dibe mufsîd jibo me
Tevî me herbê naket nabe bo me

We ‘Utbe çêrî wî kir go dê kifş e
Bibit mufsîd kîyew anha jî kifş e

Xwe meşhûr e ku tu fitnew fesad î
Xudanê şeqwet û ehlê ‘înad î

Musulmanan Xuda hindik nîşan da
Ji ewwel da, we paşê pur nîşan da

Zîravê kafiran qetya ji wana
Dizanîn dê ewê bukjin ewana

Nebî ‘Ummer şiyand cem ‘eskerê wan⁹⁶
Bifetlîn ye’nî navêm⁹⁷ şer digel wan

Li ser destê we navêm qetl û ev herb
Dixwazim ser yekî dûrî we bit derb

Le‘înî go heta herbek nekem ez
Ji vir naçim çukû menşûrî bûm ez

Şiyande cem birayê ‘Emrî meqtûl
Ku ‘Utbe dê me hemyan gêre mexzûl⁹⁸

⁹⁵ munazîr(‘e): yê munaqêşe dîke

⁹⁶ haşîye: ... şiyand nav ‘eskerê wan

⁹⁷ navêm: naxwazim

⁹⁸ gêre mexzûl(‘e): zelîl û perîşan bike

Ne hilden heyfê yê kuştî me şerm e
Bi wê țerzê rezîlî tête ser me

Bike de'wa qîşaş û şarî⁹⁹ taze
Tu heyfa wî birayê xwe bixwaze

Meger 'Amir birayê 'Emrî kuştî
Evî qewlî xwe ra kir bar û piştî

Li nav qewmê xwe gerya zare zarî
Biden yardım ku hildem ez vî şarî

Ji Mexzûmî be nam Eswed yekî bû
Şedîdê duşmanan behrê¹⁰⁰ Nebî bû

Qesem ger dê ji hewdê avê noşim¹⁰¹
We yan hewdê bihedmînim¹⁰² bipoşim¹⁰³

We yan bimrim li ber hewdê bibînin
Tevî hev bin we şarê min hilînin

Li xwe nav da we derket, Hemze hatê
Li hev weryan, ji Hemze ɖerbek hatê

Ji saqê¹⁰⁴ lingekî wî hilfirandî
Bi yê sağ wî ji hewdê hilweşandî

Welê Hemze neberda ta geber kir
Dilê duşmin bi kovan¹⁰⁵ û keser kir

Li pêy bû cem'ekî xortê Qureyşan
Kirin qesdê gihane hewd û bedşan¹⁰⁶

⁹⁹ şar('e): heyf hilanîn

¹⁰⁰ behr('e): hîle

¹⁰¹ noşim: vexum

¹⁰² bihedmînim: xera bikim

¹⁰³ bipoşim: bixetmînim serî bigrim

¹⁰⁴ saq('e): ji gûzekê heta çîp

¹⁰⁵ kovan: êş, elem

¹⁰⁶ bedşan('e): kuştîyên xebîs

Şehaban qesd kirin da ku nehêlin
Resûlullahî ba kir go bihêlin

Kesê ku jê vexwe dê bête kuştin
Ji xûnê cîfeyê¹⁰⁷ wî bête riştin

Hekîm bînul Hezam تنها riha bû¹⁰⁸
Ji kufrê ew jî pê ve hem riha bû

Wisan çêbû çewan got fexrê ‘alem
Jibo mu’cîze çêkir rebbê ‘alem

Hemana ‘Utbe xwestî nîkê megfer
Nebû peyda be burdê¹⁰⁹ pêçîya ser

Kişa meydanê go werne nîzalê¹¹⁰
Werin herb û te’an¹¹¹ û hem qîtalê

Jibo wî derketin şê ten guzîde¹¹²
Ji Enşarê cesûrê herbî dîde¹¹³

Niqab kêşayî¹¹⁴ bûn, go hûnê kî ne
Ji Enşar in digotan, go me nîne

Be herba we qe hacet, lê bişînin
Ji pişmamê di me, em hev bibînin

Ji lew kîna me nîne bil ji hev ra
Ji bil kurmamê xwe naken be kes ra

Vegeryan hatine cî xwe kerîman
Nebî got rabine herba leîman¹¹⁵

¹⁰⁷ cîfe(‘e): laş, term

¹⁰⁸ Haşîye: Hekîm bînul Hezam teke tenê bû

¹⁰⁹ burde(‘e): xirqa

¹¹⁰ nîzal(‘e): menzîl, menzîl

¹¹¹ te’an(‘e): şer

¹¹² ten guzîde(f): kesên qenc û namîdar

¹¹³ herbî dîde(f): herb dîtine

¹¹⁴ niqab(‘e) kêşayî: rûpêçandî

¹¹⁵ leîman(‘e): kesên zelîl û rezîl

Meger gote ‘Ubeyde, H̄ers̄ û H̄eyder
‘Elîyyû Hemze jê ra derkevin der

Ji cî ev her sê rabûn çûne meydan
Jibo Şeybe, Welîd, ‘Utbe pelîdan¹¹⁶

Ji Hemze derbekî xweş hate Şeybe
Cehennem va şiyand bê şek û reybe

‘Elî hem kuşt Welîd û lê ‘Ubeyde
Li ‘Utbe xist û hem wî kir cehîde¹¹⁷

Hevalan cehdî kirn û wî jî kuştin
Be ecra gâzîyan heqqî gehîştin

‘Ubeyde sağ gihandin fexrê ‘alem
Li zivîrînê wefat kir yalê me’tem

We hem Hemze, Te‘îmebnul ‘Edî kuşt
Di bî’sel¹¹⁸ meskenê dozex ewî hişt

Ebû Cehlî bihîstî kuştina wan
Digo ‘Uzza heye bo me ne bo wan

Meger fexrî fikir pîsî be pîsî
Cihê wana di dozex de nivîsî

Ji şehban yek nîda kir go jibo me
Xuda mewla ye peyğember jibo me

Şefî‘e der qiyamet bo we nîne
Cihê wê dozexê bunya¹¹⁹ zemîn e

Hemana bû nîzal û te’n û lêkdan¹²⁰
Li hev du kul kirin wan şehnê meydan

¹¹⁶ pelîd: pîs, rezîl

¹¹⁷ cehîde(‘e): betilî, westîyayî

¹¹⁸ bî’sel(‘e): çî xerab

¹¹⁹ bunya(‘e): binê

Resûlullah di dest tîr û şufûfan
Dikira mustewî¹²¹ şahib suyûfan¹²²

Suwad îbnû Ğuzeyye der ji şef bû
Nebî lê xist xwe ew şahib şeref bû¹²³

Be tîran go li wan xen ger ku hatin
Welê weqtê be nêzîktir ku hatin

Û heta ku ser we va negrin nekêşin
Be dest şûr û neşirsin hem neêşin

Li ser wan xutbekî xwend go şebir ken
Di herbê da ku hûn duşmin qehir ken

Vegerya kolikê¹²⁴ Bûbekrî تنها
Digel bû Se'd û qewmek newbederha¹²⁵

Hilanî quţbetê¹²⁶ ‘Amir kever¹²⁷ ken
Nihande¹²⁸ orte meydan kir nezer ken

Ji herbê narevim hetta firarî
Neket ev kevirê ha kem kirarî¹²⁹

Ji Îslamê bû Muhce' hate meydan
Be tîran wî şehîd gêran nemerdan

Di pê ve Harise lawê Suraqe
Şehîd gerya be dest ehlê humaqe¹³⁰

¹²⁰ te'n(‘e) û lêkdan: şer û li hev lêdan

¹²¹ mustewî(‘e): ‘eynî hîza

¹²² suyûf(‘e): piranîya şûr

¹²³ haşîye: Nebî qamçîk lê da, xweyê şeref bû

¹²⁴ kolik: holik

¹²⁵ newbederha(f): kesên nobet digrin

¹²⁶ quţbet(‘e): sertîrka nişanê

¹²⁷ kever: ta'ta pa'n û bilind

¹²⁸ nihand: bi cî bû

¹²⁹ kem kirarî(‘e): çend cara kir tekrar

¹³⁰ humaqe(‘e): ehmeq, kêmaqil

Ku dîn kel¹³¹ bûn qerîn¹³², ketne dua'yan
Ji rebb nuşret dixwestin dilrûbayan¹³³

Xuda tenzîlî kir ser fexrê 'alem
Qebûl kir min dua'yê we demadem¹³⁴

Melaîk şê hezar îmdad eva hat
Nebîn mehzûn, neçîrsin, hat heman hat

Di pê ve du hezar dîsa hinarî¹³⁵
Jibo eşkence ken ehlê kuffarî

Temam bû penc hezar ferîşte 'esker
Digel şehbê Nebî dan kerrû hem fer¹³⁶

Dibên pêçê¹³⁷ di wan gişkan sipê bû
Ji bil Cîbrîlî, wî rengê zerî bû

We hem heftadê ten¹³⁸ cinnê musulman
Bibûne teqwîye bo ehlê îman

Ji qîr û şeyheta¹³⁹ qewmê delalan
Şeda ket erd û esman û newalan

Qiyamet bû li ser kuffarî rabû
Cunûdê muşrîkînan berheba bû

Xuda her pê bizanît çan¹⁴⁰ û çan e
Nemabû kafîran çarew eman e

Dibên şeytan bibû şeklê Suraqe
Ji Mudlîc, qîra qewmek zû humaqe¹⁴¹

¹³¹ kel: gûrbûn

¹³² qerîn: dev jê berdan

¹³³ dilrûba(f): dilrevîn, dilhebîn

¹³⁴ demadem: di cî de

¹³⁵ hinarî: şandî

¹³⁶ kerrûfer(f): vekişîn û dîsa êrişkirin

¹³⁷ pêç: şaşik

¹³⁸ heftadê ten(f): heftê heb

¹³⁹ şeyhe('e): feryad, qêrîn

¹⁴⁰ çan: çawa

Di dest Hersê Hîşamî destê wî bû
Çukû ew piştewan û nesrê wî bû

Çewan ku wî melaîk dî revî ew
Ji rebb go ez diñirsim hem dikem sew

Be wê da lave¹⁴² lavew zare zarî
Dikir hersê¹⁴³ welê pê nedikarî

Nezanîna şeyatînên muşekkel¹⁴⁴
Li wan lew lave dikran qewmê erzel¹⁴⁵

Ebû Cehlî ku dî go ma neñirsin
Suraqe ku revî qeş lê nepirsin

Muħemmed ra heye mîa' dekî wî
Be wî sistî nekin çan we nedî wî

Muħemmed, şehbê wî nekjin, welêkin
Bedest bigrin li wan ku leyzi çêkin

Be pût û lat qesem kir ta nekêşim
Di heblê¹⁴⁶ da ewan 'esker nekêşim

Bi xwe paşê bişekrîn¹⁴⁷ pîsê mel'ûn
Nezanî ma serê te dê be gerdûn¹⁴⁸

Nebî derket li wan kir we'z û şîret
Qewî bin da di îman û di sîret

Dibên Me'bed be du seyfan dikir şer
'Umeyrî jî di herbê der dida ser¹⁴⁹

¹⁴¹ zû ħumaqe('e): ehlê kêmaqîl

¹⁴² lave: libergerîn

¹⁴³ hers('e): tefîş

¹⁴⁴ muşekkel('e): qalib û kinc û şiklê wî tam li cî

¹⁴⁵ erzel('e): pir zelîl û rezîl

¹⁴⁶ hebl('e): weris, kindir

¹⁴⁷ bişekrîn: pesn û metih kir

¹⁴⁸ be gerdûn: bibe gerden

¹⁴⁹ pir ser jê dikirin

Nebî hilda ji erdê qemçekî qûm¹⁵⁰
Nifir kir ser wa avêt qewmê zî şûm¹⁵¹

Tijî kir çehvê wan toz û xubarê
Be wan pişt dan kirin qeşda firarê

Wekî şeyyad¹⁵² ketin pêy wan şehabe
Qiyamet dê li wan vê gavê rabe

Meger başûkî ketne pê guraban¹⁵³
Ji paş ve lê dixen pencew kulaban¹⁵⁴

Be nefsa xwe kete herb û gezaê
Nebîyyê eşrefê xelqê Xudaê

Nebî go kî yekî bukje ji wî ra
Bimînit hesp û şûr û her çi vî ra¹⁵⁵

Esîr ket kî yekî jê ra dimînit
Dibit ‘ebdê wî hetta ew bimînit

Nebî zanî ku Se’ dî geyrî kuştin
Qe navê, hej jê naket esr¹⁵⁶ û hiştin

Dizanin got hinek hatin be zorê
Ewan nekjin li qetla hende borê

Meger Bulbuhterîyyû ‘Emmî ‘Ebbas
Gerande xaşê ez te’ mîmê¹⁵⁷ her nas

Welê Muczîr li Ebîl Buhterî da
Sebeb terka hevalê xwe ku nedda¹⁵⁸

¹⁵⁰ qemçekî qûm: kulmek qûm û ax

¹⁵¹ zî şûm(‘e): kesê bêyom

¹⁵² şeyyad(‘e): nêçîrvan

¹⁵³ gurab(‘e): qirak

¹⁵⁴ kulab(‘e): pençê heywanan

¹⁵⁵ vî ra: bi wî ra

¹⁵⁶ esr(‘e): esîr girtin

¹⁵⁷ te’ mîm(‘e): ‘ûmûmîkirin

¹⁵⁸ nedda: nedida

Li ser ‘Ebbasî kir yek de’ wekî sar
Welêkin her be wî maqûl û gevtar¹⁵⁹

Kurê Bubekrê Şiddîq ‘Ebdurrehman
Demek hate qêrînê xweste meydan

Heman babê wî rabû, fexrê ‘alem
Nehîşt go ger bijî nef‘e demadem

Mubeşşer bû ‘Ubeyde¹⁶⁰ kuştî babê
Li ser kufrê devê wî kir turabê¹⁶¹

Umeyye hate rastî Îbnî ‘Ewfi¹⁶²
Sipartî xwe be wî ez qetl û xewfî

Digo beşlek welê ewha ‘elamet
Kî ye evqas diket ser me qiyamet

Digot ew Hemzeê şêrê Xuda ye
Belayê asîman e, bo we daye

Bîlalî dît û qeşdî kir ku lêxe
Di pozê wî ve heyfa xwe derêxe

Çukû îza gelek dîbû ji destê wî
Ji zulma wî demek çehvan nebest wî

Menî’ kir ‘Ebdurrehman, lê Bîlalî
Neda, da komê Enşarê li balî

Werin reysê hemû kufrê Umeyye
Li vir va bernedin bukjîn be mudye¹⁶³

Wekî şêran li dû me darê wer bûn
Wî û lawê wî kuştin ew geber bûn

¹⁵⁹ gevtar(f): guftar, gotin

¹⁶⁰ Ebû ‘Ubeyde bîn Cerrah

¹⁶¹ turab(‘e): ax

¹⁶² ‘Ebdurrehman îbnî ‘Ewf

¹⁶³ mudye(‘e): kêra mezin

Nebî go Newfelê lawê Xuweylîd
Çi pê zanin ‘edûwwê pîsê mulhîd

‘Elî go min geber kir wî pelîdî¹⁶⁴
Nebî şa bû li qetla wî şedîdî

Nebî go mêze ken nêv kuştîyan da
Ebû Cehlê le‘în ka nîne wenda

Meger du xortê Ensarî lê rabûn
Gehabûnê birîndar wî gera bûn

Diwerya ew di xak û xûnê nageh
Kurê Mes‘ûd¹⁶⁵, bi mirdarî bû ageh

Nihêrî ku di nez‘a¹⁶⁶ mewtê da ye
Heman zanî ku ev feqla Xuda ye

Di wî hâlî le‘înî go çewan e
Zêfer destê me da yan dest we da ne

Li wî mizgînekî me‘kûsî¹⁶⁷ daye
Ke ey mel‘ûn! Zêfer bo Muştefa ye

Hilanî şûr ku hilke ser ji laşî
Meger şûrê wî nebrî kir qelaşî

Le‘înî dujminî wî kir go m-şîmşêr
Hilîne bibre boğaza mi berjêr

Muħemmed da bibînit pehlewanan
Bibînit helqê¹⁶⁸ merd û pozberanan

Heman wî pî niha ser laşêê wî
Serî hilkir ji pîsî cîfeê¹⁶⁹ wî

¹⁶⁴ haşîye: ... min mirar wî pelîdî

¹⁶⁵ ‘Ebdullah îbnî Mes‘ûd

¹⁶⁶ nezi’(‘e): sekerat, di ber dana can de

¹⁶⁷ me‘kûs(‘e): ya ziddî

¹⁶⁸ helq(‘e): gewrî, gerden

Hilanî hate pêşî fexrê ‘alem
 We go min kuştîye fir‘ewnê erqem¹⁷⁰
 ‘Uqeylî¹⁷¹ cem Nebî wê gê¹⁷² esîr bû
 Nekir bawer we gotî ev derew bû
 Derew karê te ye got Îbnî Mes‘ûd
 Nekî bawer eva nîşanê mewcûd
 Nihêrîn ku belê rast e, wisa ne
 Yeqîn zanîn ku wan şewket¹⁷³ nemane
 Nebî çû secdeya şukrê ji şahî
 Sucûd kir pencî¹⁷⁴ car pê hev wî gahî
 Nebî şa bû, heqq e em cumle şa bin
 Di şaya dînê Îslamê teba bin
 Resûlullah ku seh kir tewşîya wî
 Li‘înî ma ‘eceb fir‘ewnîya wî
 Binêrin ku çi fir‘ewnek şedîd e
 Di wî hâlî jî fir‘ewnew pelîd e
 Şukur fir‘ewnê peygamber geber bû
 Serê kufîr û ‘înadê derbeder bû
 Dilo şabe, dilo şabe, dilo şa
 Kela kufîrê li ser Bûcehlî hilşa¹⁷⁵
 Gelek pê dînê Îslamê qewî bû
 Gelek jî qelbê naşabit bi cî bû

¹⁶⁹ cîfe(‘e): term, laşê bin ketîye

¹⁷⁰ erqem(‘e): marê xerabtirîn

¹⁷¹ ‘Uqeylî: ‘Eqîl îbnî Ebi Talîb

¹⁷² wê gê: we gehe, wê demê

¹⁷³ şewket(‘e): heybeta qûdret û qûwwetê

¹⁷⁴ pencî: pênc

¹⁷⁵ Kelha kufre li ser Ebû Cehîl hilweşîya

Dibên şûrê ‘Ûkaşê ku şikestî
Nebî çoyek hilanî dayê destî

Di dest da bû wekî lahorê xaliş
Be wî herb û geza kir bê munaqiş¹⁷⁶

Li cem ma ew hetta eyyamê Şiddîq¹⁷⁷
Bi wî çû herbê her kuffar û zendîq

Du muşrîk çûne tillek da bibînin
Kiye meglûbê da talanê bînin

Ji nageh dîn di ‘ewrek way û weyla
Şedayê uqdûm Heyzûm¹⁷⁸ hay û heyla

Yekî qetya ziravê wî ji tîrsan
Tefa şem‘a wî û mur¹⁷⁹ ma ji pursan

We ya dî ma di pêşî her nîkayet¹⁸⁰
Heta hat û Nebî ra kir hîkayet

Nebî go rast e, ew cundê Xuda bûn
Mededkarê jibo ehlê Huda bûn

Meger derbê di wan kifş bû ji nasan
Çikû ne yê sîlahê bûn çû nasan

Ji kafir hatin kuştin vê gezaê
Temam heftadê¹⁸¹ beflî pêk ve haê¹⁸²

We hem heftadê jî hêsîr gerandin
Ji zîllet bar serê wan wergerandin

¹⁷⁶ munaqiş(‘e): kêmanî

¹⁷⁷ eyyamê Şiddîq: dewra hz. Ebû Bekîr

¹⁷⁸ Şedayê uqdûm Heyzûm(‘e): dengê lingên hespa Cibrîl

¹⁷⁹ mur(‘e): bêdeng

¹⁸⁰ nîkayet(‘e): zîrar

¹⁸¹ heftadê(f): heftê

¹⁸² haê: bi vî şeklî

Resûlullah emir kir cîfe¹⁸³ wan
Ku tev avête bîrek bû li cem wan

Welê geyrîl Umeyye çunkî ew pîs
Gelek gir bû neçû bîrê ew îblîs

Wekî mercûmê eħbaran¹⁸⁴ tîjî kir
Li ser laşew turabê ser mejî kir

Temamî bîst û çar in şehbê bîrê¹⁸⁵
Ji dozex re heşeb bûn da venemrê¹⁸⁶

Nebî çû ser devê bîrê nîda kir
Be navê wan çira go we wiha kir

Ĥeta hûn bûne meħrûmê ji dunya
Çewan bûn ehlê dozex hûn di ‘uqba

We kir tekzîbê¹⁸⁷ weħy û hem rîsalet
Ji dor ve xel bi min hatin hîdayet¹⁸⁸

We min der kir ji erd û merbe’¹⁸⁹ min
Ĝerîban cî kîrim bûn tabîe’ min

Li wê kuştin ewî murteddê ‘Uqbe
Kurê Ebî Mû‘eyt, dozex wî cî be

Li wê sê rojê dî man paşî rabûn
Bi emrê fexrê ‘alem ber be ca¹⁹⁰ bûn

Şiyand lawê Rewaħew¹⁹¹ Zeydê Ĥarîs
Bibin mizgîna fethê we Ĥewadîs

¹⁸³ cîfe(‘e): laş û term

¹⁸⁴ mercûmê eħbar(‘e): keşîşên recimandî

¹⁸⁵ şehbê bîrî(‘e): hevalên bîrê, muşrîkên avêtine bîrê

¹⁸⁶ Haşiye: Ji dozex re heşeb bûn da venemrê

¹⁸⁷ tekzîb(‘e): înkâr

¹⁸⁸ Haşiye: Ji dor ve xel bi min dehtan hîdayet

¹⁸⁹ merbe’(‘e): mêrg

¹⁹⁰ ca: cî, mekan

¹⁹¹ ‘Ebdûllah îbnî Revaha

Gihane Teybe û gotin fe buşra
Li we mizgîna fetha Bedrê kubra

Welê Ke'bê kurê Eşref munafiq
Nekir bawer we got tiştê ne laiq

Di wê rojê wefat kir bû Rûqeyye
'Eleyha reḥmetullahî teḥîyye¹⁹²

Keça xeyrê resûlan şîn û şahî
Bîla tertîbî hatin ser wî mahî

Be jana dil munafiq bûne meshûr¹⁹³
Ji ber xwe derdixistin firye û zûr¹⁹⁴

Digotin hatiye kuştin Muḥemmed
Digel cem'ek ji eşhabê mumecced

Ji nageh seh kirin ba xeyrê şahî
Ku hatin qewmê menşûr¹⁹⁵ tev tebayî

Bexêr hatin be ser çehvan delalan
Kirin şadanî û de'wet di malan

Sed û pencî deve, deh hespê tazî
Gelek mal û zexaîr çan bixwazî

Ġenîme girtibûn ez malê duşmen
Ġenî geryan ji wê malê tehîmtin¹⁹⁶

Deva Bûcehl û seyfê Zulfekarê
Nebî ra dan ewan zêde ji parê

Esîrê girtibûn ba qehr û zîllet
Wişaqî¹⁹⁷ wan girê dabûn be şîddet

¹⁹² Rehmet û selama Xweda li ser wê be

¹⁹³ meshûr('e): ji kêfa xwe winda kirye, sihr lê bûye

¹⁹⁴ firye û zûr('e): derew û îftîra

¹⁹⁵ menşûr('e): muzaffer, ġalib

¹⁹⁶ tehîmtin(f): gir û qelew

Be eşhaban Nebî kir îstîşare
Di emrê wan ewana dan îşare¹⁹⁸

Be kuştin hin be fîdye hindekî dî
Separtin fexrê ‘alem emrê hin dî

Hinan kuştin be bed kirdarê pîsîn¹⁹⁹
Hinan fîdye sitandin kirne tehsîn²⁰⁰

Ji hinkî rawîyan ku me hilanî
Di defter da jibo rêwer²⁰¹ me danî

Şehîh e yan ne, lê nawer²⁰² qelem ez
Digot hîna Nebî şahê mu‘ezzez

Dema hatin Medîne bê mûşîbet²⁰³
Yehûdî mer‘etek²⁰⁴ kir qeşdê xeybet²⁰⁵

Hilanî berxekî pehtî qelandî
Li ser cefneyekî²⁰⁶ maqûl nihandî²⁰⁷

Reşabû lê gelek zehra hilahîl²⁰⁸
Li her ca zêdetir zendan û kahîl²⁰⁹

Bire pêşî Nebî pir qedr û qîmet
Nebî birsîbû²¹⁰ mana kir ‘ezîmet²¹¹

Ku hilde jê bixwe ew berxê bêcan
Tekellum kir ke ey canê hemû can

¹⁹⁷ wişaqî(‘e): saxlem

¹⁹⁸ îşareh(‘e): teklîf

¹⁹⁹ be bed kirdarê pîsîn: ji ber tevgera xerab yên wan pîsan

²⁰⁰ tehsîn(‘e): xweşikirin û qenckirin

²⁰¹ rêwer: dibe ku bi me’na rêwî be

²⁰² nawer: dibe ku bawer bi xeletî hatibe nivîsîn

²⁰³ Haşîye: Çewan hate Medîne bê mûşîbet

²⁰⁴ mer‘et(‘e): jin

²⁰⁵ xeybet(‘e): xusran û mexlûbîyet

²⁰⁶ cefne(‘e): sehan

²⁰⁷ Haşîye: Li ser cefnekî pur maqûl nihandî

²⁰⁸ zehra hilahîl(‘e): jehra pir bitesîr

²⁰⁹ zendan û kahil(‘e): li ser hêtan û jêra paş sitû

²¹⁰ birsî: birçî

²¹¹ ‘ezîmet(‘e): qerar

Tijî me ez ji zehra tijî qatil
Fe ya lîllah nebe bo min tu akil²¹²

Nebî jê kir keşaf û lê nelorî
Ewî guşşe²¹³ di dil da hişt û borî

Jin û zaran def û 'erbane lêdan
Di berya wan kirin efraḥ²¹⁴ û şadan

Be dengî xweş çû dawûdî dixwendin
Çu nahîde²¹⁵ direqşîn, şe'rê xwendin

Medîne ez fereḥ ted go dihejya
Neşarê kewkeban²¹⁶ ser da dirîjya

Xeber gava gehiştê Mekkeê tev
Ketin şîn û gem û geryan²¹⁷ bi du çehv

Kirin tenbe nekin şîn zêde ez hed
Nebe sehke we pir şabe Muḥemmed

Ji kerban Bûleheb derdek hılanî
Be wî derdê giran reysê xwe danî

Di dil wan ma hemî derd û kulê wan
Şîfa nake birînê nav dilê wan

Ji bil tîryaqê tewḥîdê we teşdîq
Jibo rebb û resûlullah be teḥqîq

²¹² akîl(‘e): yê dixwe

²¹³ guşşe(‘e): parîya di qirêkê de

²¹⁴ efraḥ(‘e): şahî, kêfxweşî

²¹⁵ nahîde(‘e): qîzên nûgihaştî

²¹⁶ neşarê kewkeban(‘e): sitêrkên dibiriqîn

²¹⁷ geryan: girîyan

21. ĞAZWEYA BENÎ SELÎM

Resûlullah dema zivrî ji Bedrê
Di ẓeybe heftî¹ şev seknî we zivrê

Jibo herba Selîman ket be nuşret
Li ser emwal û canê wan ker garet²

Îmam kir ‘Ebdullahê Ummî Mektûm
Sibaî’ ‘Urfete, walî li ser kom

We beyraqek sipî da destê Heyder
Be tedbîr û tedarek derketin der

Gehiştin avê îsmê Elkeder bû
Li wê seknîn hetta şê roj be ser³ bû

Revî duşmin we talanê xwe hiştin
Şehabe hem be talanê gehiştin

Birin penses deve pa ra vegeryan
Nedîtin herb û hatin ẓeybe seryan⁴

‘Elîyyû Faîme ev sal be kabîn⁵
Be hev bûn cemi’ ba e’zaz⁶ û tehsîn

¹ heft şev

² gar(‘e): êriş

³ be ser: derbas

⁴ seryan: seriyar, reîsan

⁵ kabîn(f): mehîr

⁶ e’zaz(‘e): bi îkram û ‘ezîzî

22. GEZWEYA BENÎ QEYNÛQA'

Di Bedrê da dema geryan muzeffer
Yehûdê Qeynûqa'an bûn muğeyyer¹

Şikînandin 'uhûd² û şozê pêşî
Hesed wergirtin û geryane wehşî

Di pêşî da xudan 'ehdek qewî bûn
Di nef'û çerrê mu'min mustewî bûn

Ji geyret yek ji wan kuşt mu'minûnan
We yek mu'min jî kuştin muşrîkûnan

Nebî seh kir tamamê maceraê
Şehaban cemi' kir derket gezaê

Li wan girtin demador û hewalê
Nehîştin derve mîrza³ û mewalê⁴

Nebî gote yehûdan werne rahê
Musulman bin, xelaş bin ez tebahê⁵

Dizanin hûn Nebîyyê mursel im ez
Dizanin merdê wehyê mulzel⁶ im ez

We ger ne, wek Qureyşan we bikêşim
Di her îşkenceyan we pê beêşim

Cewab dan em ji bil herbê çû naken
Wekî qewmê te cibn⁷ û 'arê naken

We hêjan nedye merd û pehlewanan
Neketne herba be'îl û çî⁸ cuwanan

¹ muğeyyer('e): guherî

² 'uhûd('e): piranîya ehdê

³ mîrza(f): reis

⁴ mewal('e): kesê mezin, koleyê azadbûyî

⁵ tebahê('e): mehvûyî

⁶ wehyê mulzel('e): wehya jê re nazil bûye

⁷ cibn('e): bizonekî, tirsîn

Emê qirken li te şehb û hevalan
‘Edem⁹ ken em li te xorç û rewalan

Cihê xwe girtin û ketne kemîyan
Li ser xwe sed kirin rahê zemînan

Nebî ser wan ve pir ceyşek¹⁰ giranî
Heşar¹¹ kir pazde rojan wan di xanî

Temam bûn heft şedê mêrê gedenfer
Lîwa¹² cem Hemze bû mamê peyember

Yeşîn zanîn Yehûdan bezmê boşê¹³
Ketin fîzar¹⁴ û zarîn û xerûşê¹⁵

Digotin: Ey Mûhemmed hûn me berdîn
Li me mal û giranî tev be der din

Jibo me zar û jin, lê malê bo we
Jibo me can û erç û nexlê¹⁶ bo we”

Nebî kir şulhê wan ser vê qerarê
Ji hespê herbê wan dahate xwarê

Ji Teşbe wan şiyande Ezrû‘atê
Di wê da tev vexwarin her mematê

⁸ çî: qewî

⁹ ‘edem(‘e): tune bikin

¹⁰ ceyş(‘e): koma leşkeran, artêş

¹¹ heşar(‘e): dorpêçkirin, muhasara

¹² lîwa(‘e): sencaq

¹³ bezmê boş: kêf û henga vala

¹⁴ fîzar(‘e): feryad

¹⁵ xerûş(f): qêrîn

¹⁶ nexl(‘e): darên xurmeyan

23. ĞAZWEYA SEWÎQ

Qureyşan ku di Bedrê dîn belaê
Ebû Sufyan li xwe bo we'de daê

Li xwe bîhnê xweş û 'uţran¹ neînê
Neçit cem zewceê nêva nivînê

Ĥeta ĥerbek neke ba fexrê 'alem
Ji dil xwe dernexe her ĥuzn û me'tem

Du şed mêrê Qureyşî girt bi rê ket
Gehişte nav Neđîranê be şewket

Şiyandin cem'ekî beţl û hevalan
Li nêzî Teybeê ketne newalan

Li wê çend darê xurma şewiţandin
Du ten kuştin be lez ber fetilandin

Musulmanan bihîstin maceraê
Nebîyullahî kir qeşda ġezaê

Du şed mêran ji Enşar û Muhacir
Sîleĥşor û ġedenfer ba xwe rakir²

Ebû Sufyan bihîstî go hevalan
Sivik bar ken be lez em revne malan

Sewîqê³ xwe be hin banan⁴ dihiştin
Sivik bin, da riha bin, neyne kuştin

Musulmanan sewîqa hildidana
Sewîqbanan⁵ çewankî bazdidana

¹ 'uţran('e): parfum, bîna xweş

² Haşîye: Sîleĥşor û ġedenfer ba xwe ra bir

³ sewîq('e): qawît

⁴ ban: mal, xanî

⁵ sewîqban: xwedyê qawîtê

Go ‘Ezraîl suwarî nedgiha wan
Ewan nedqefiland goya seha⁶ wan



⁶ seha: sî

24. ĞAZWEYA ĞETEFAN (ZÎ EMR)

Du sal borî ji hîcret kefteya şê¹

Benû Su'lebeta bûn cem'ê aşê

Ku Du'sûrê kurê Herş wan cemi' kir

Hucûm ken ser Medîne wan jî seh kir

Nebî hem çar şed û pencî geđenfer

Hilanî çû qîtala qewmê ekfer²

Ewan seh kir revîne deşt û banî

Çîya û kehf û qulle kir emanî

Musulmanan ji wan yek merdî girtin

Birin cem fexrê 'alem şahê muhsin

Mujûl³ bû ew hemû hal û hewalan

We go ew tev revîne ser cîbalan⁴

Nemaye ew ku bên û hem geza ken

We ger bên hûnê wana berheba ken

Bi xwe ew hate îman bû musulman

We bû rehber jibona ehlê îman

Gehiştin Zîemir bû 'ewr û baran

Ji şilbûnê xwe dane bin zînanan

Nebî şil bû cilê xwe ber xwe derxist

Li ser darek be ser xwe da jî raxist

Şehabe her kesek meşgûlê şolek

Resûlullah bi tin mabû li çolek

¹ kete sala sisêya

² ekfer('e): zêde kafir

³ mujûl: peyivîn

⁴ cîbal('e): çîya

Ji nêz bû kafiran dîtin ku tenha
Li wê ye gotine De'şûrî haha⁵

Herê, lewra tu merdê pehlewan î
We Du'şûrî jî şûrê xwe deranî

Nişêv bû⁶ da ku bukje ew resûlê
Bikêşe şemsê ummet der ufûlê⁷

Li ser seknî we go ey behreê min
Kî ye ku te xelaşke j-penceê min

Nebî got ew îlahê 'alemîn e
Ji nageh hatî Cîbrîlîl emîn e

Li De'şûr def'ekî da, ma wisa da
Ku serpişt ket, Nebî şûrê wî hilda

We: Ma kes heyê te ji min riha ke
Ji bil îmanê derdê te dewa ke?

Şedeq go ez dizanim tu resûl î
Heman îmanê anî pur qebûlî

Nebî şûrê wî dayê wî 'efû kir
Bi bal qewmê wî şand û wî perû kir⁸

Ewî qewmê xwe xwend⁹ bal dîne Îslam
Be wî hatin gelek ser dîne Îslam

Nebî bê keyd û qetl û herbê zivî
Be xeyr û şahî bal Teybe va zivî

⁵ haha: bilez

⁶ nişêv bû: xwar bû, tewîya

⁷ ufûlî('e): roavabûn

⁸ perû kir: qencî lê kir, bi xelat kir

⁹ xwend: vexwend, dawet kir

25. ĞEZWEYA BEĤRAN

Di BeĤran cemi' bûn cem'ek Selîmî

Li ðerrê dînî bûn fikra şemîmî

Nebî sê şed ji eşhabê xwe rakir

Ne go meqşed ku we qeşda geza kir

Li rê şexşek ji wan girtin we pursîn

Ji Ĥalê qewmê wî tev got be teĤsîn

Belavê 'îş û şuĤl û hem xebat in

Bila şêwr û cumû' û hem cevât in

Ewî jî bernedan Ĥetta be BeĤran

Gehiştin, dîn ku rast e paşê berdan

Nekir Ĥerb û ji ser ceyšê xwe kêşa

Dilê wî qewmê BeĤran qeĤ neêşa

Li 'Uşman, Ummî Kulşûm kir di tezwîc

Nebîyellah li xwe jî Ĥefşe tezwîc

26. ĞEZWEYA UĤÛD

Di Bedrê da Qureyšan ku vexwarin

Şeraba zehrê meĤlûbî, veşarin

Di qelbê xwe hezar kîn û Ĥedarê

Ku Ĥeyfê hilbidan raken wê 'arê

Li hev bûn cemi' eşraf û şenadîd¹

Be hevdu şêwirîn ehlê meqalîd²

Ku rebĤa³ malê wî karwanê pêşî

Sebeb ku ew bûbû 'ara Qureyšî

¹ şenadîd('e): giregir, mezin

² meqalîd('e): îdare, otorîte

³ rebĤ('e): kar û qezenc

Emê şerf ken li ser herba Mûhemmed
Di Darîn Nedwetê da bû mu‘edded⁴

Ebû Sufyan digel eşhabê malê
Qerar dan tev bi wê şozê meqalê

Heman sermayeê wê dan xudanan
We kar hiştin jibo herba cuwanan

Temam pencî hezar dînarî bo kar
Li hevdu cemi’ bûn kuffarê geddar

Qureyşîyyû Kenanîyyû Tuhamî
Be hev ra şozê mewtê dan temamî

Kirin gazî Ebî ‘Îzzew Musafi’
Be eş‘aran⁵ bibin bo xelqê cami’

Ebû ‘Îzzet digo: Ma min di Bedrê
Be wan ra daye we’de neyme gedrê

Muhîm lê girtin û rakirne sazî
Nizanîna ku cehnem wî dixwazî

Ketin nav xelq û eş‘aran dikotin
Kelamê pîsî, kala⁶ xwe firotin

Ûeta bûn şê hezar ‘esker temamî
Digel heftê ji Ewsî nakîramî⁷

Ku paş ma bûn ji îman û ji dînî
Nebî ra girtibûn ‘eqda nevînî⁸

Xebîrê Mût‘îm⁹ kire gazî Weşî
Ku bukîê Hemze salarê Qureyşî

⁴ mu‘edded(‘e): bi hejmar

⁵ eş‘ar(‘e): piraniya şa‘ir

⁶ kal(‘e): eşya, ber û fêkî

⁷ nakîramî(‘e): bêşeref

⁸ nevînî: dijmintî

Eger te kuşt ji ber ‘emmî Te‘îme¹⁰
Tu aza¹¹ bîw bidem te pur gênîme

Be hêlahêl û zirna def û tenbûr
Ketin pêşî sitê¹² xatûnên meşhûr

Li pê wan ‘eskerê beql û rewalan
Tijî kir bûn ewan deşt û newalan

Be mêranî bidî¹³ mehr û cuwanan
Bixebtin da we çê bin pehlewanan

Bûsufyan ‘ekre¹⁴ meberbûn jinê xwe
Bidî wan da biken raşet dilê xwe

Gelek reqsî û şabû behreê pîs
Digel wan bû be bedtedbîrê îblîs

Gihane Zîlhuleyfe ew tewariq¹⁵
Ketin qelqel yehûd û hem munafiq

Dizanîna ku nekbet¹⁶ tê serê wan
Libasê mewtê eşmer tê berê wan

Meger ‘Ebbas şiyande cem peyember
Nemîmek¹⁷, tê¹⁸ beyan kir hâlê ‘esker

Nebî derhal du casûsan verê kir
Li dorê Teybeê jî herşê¹⁹ çêkir

⁹ Divê Cubeyrê Mût‘îm be

¹⁰ Tu‘eym, apê Cubeyrê Mût‘îm e.

¹¹ aza: azad û serbest

¹² sit(‘e): jin û xatûnên meşhûr

¹³ bidî: di haşiyeyê de bi me’na bedel, li pêşber

¹⁴ ‘ekre(‘e): xwe dûrkerin

¹⁵ tewariq(‘e): piraniya felaketê

¹⁶ nekbet(‘e): felaket

¹⁷ nemîm(‘e): mektûb

¹⁸ tê: di wê de, tê de

¹⁹ herş(‘e): teftêşî

Tecessus kirm û hatin halê gotin
Hemû esrarê wan jê ra firotin

Nebî jî ditibû ru'yakî hail²⁰
Ji hewla wê bibû pur munkesîr dil²¹

Dizanî dê şehîd bit yek ji malê
Digel be'dek şehabe vê qîtalê

Nebî got em ji Teybe derneyên, ger
Hicûm dan, em diden wan mewtê ehmêr

Be be'dek şehbê xwe kir îstîşare
Kurê Îbnî Selûl we kir îşare

Welê be' da ji Bedrê paş ve mayî
Digotin em hicûm ken tev tebayî

Ji lew ger em neçin dê bibte sistî
We qelsîfî we neqş û canperestî

We ye madem emê tev da suwar bin
Li herb û haye hûyê kar û bar bin

Bila duşmin bizanin em çi mêr in
Ji wan bêminnet in şahibhunêr in

Qesem kir Hemzeê şêrê îlahî
Ji herbê paş xwe nadim ez vê gahî

Me îman anîye rebbê me yîk e²²
Bîla mewt û zewal û bê şerîk e

Mûhemmed qaşidê heqq e be teşdîq
Emê bimrin hemîn rojek be tehqîq

²⁰ hail(‘e): bi xewf

²¹ munkesîr(‘e) dil: dilşikestî

²² yîk: yek

Çikû emrek bedîh e bo me ‘adet
Ku îro bit xweşa se’ d û şhadet

Xuda çawan nivîsî dê wisa bit
Nikarî kes ku bêje dê wisa bit

Qe bê emrê Xuda belgej ji darê
Nikaret kes veke, jê bîne xwarê

Nimêja cum‘eyê kir fexrê ‘alem
Li wan kir we’z û go haðir bin endem²³

Ûeta bû weqtê ‘eşrê pêkve hatin
Be tedbîr û tedarek ser ve hatin

Nimêja ‘eşrê kir çû yalê malê
Xwe pêk anî ji tedbîra qîtalê

Nihêrî ku şehaban şef kêşane
Wekî necmê sema²⁴ lê hilweşane

Hinan gotin çira ma we wiha kir
Be zorê we Nebî bo herbê rakir

Peşîman bûn û gotin ew dizanî
Dixwazîtin bila şûrê xwe danî

Nebî go piştî min wergirt libasê
Şerî, caiz nîye kem in‘îkasê²⁵

Be mecbûrî emê herb û geza ken
Ji rebbê xwe emê nûşret rîca ken

We Êbnî Ummî Mektûm gerde walî
Li ser Tejbew jin û zar û ehalf

²³ endem(‘e): her an

²⁴ necmê sema(‘e): sitêrkên li asîman

²⁵ kem in‘îkas(‘e): bikim vegeerînê

Lîwaa Ewsî çêkir da Ûseydî
We yê Xezrec, Hûbabî girt be eydî²⁶

Çikû Mus'îb ji Îbnud Dar, xudanê
Lîwa bû, yê muhacirînî danê

Suwarî Sekbê²⁷ bû fexrê resûlan
Kişand leşker wekî şapew suyûlan²⁸

Nebî zivrand be qasî pazdeh mêran
Biçûk bûn, hêj neketbûn cildê mêran

Hezar bûn lê yehûd û hem munafiq
Temam sê şed nebûn vê ra muwafiq

Vegeryan, man musulman sade heft şed
We kafir sê hezar bûn tev mu'edded²⁹

Welê naşir Xuda ye gem tunîne
Xeberdarê wî Cebrîlul emîn e

Xulaşê çûn gehîştin şe'bê 'edwê³⁰
Nimêja şubhê kîrn û ketne de'wê

Di sebxe³¹ muşrîkûnan şef girê dan
Piyade hin suwarî hin bi cî dan

Nebî jî 'eskerê xwe kir muretteb
Li pêş û paş û qelb û rast û hem çep

Muqabîl şeffekî wan şeffekî kir
Ji tîrhingivê³² pencî ten bi cî kir

²⁶ eyd('e): qûwwet

²⁷ Sekb('e): navê hespa pêxemberê me

²⁸ suyûl('e): lehî

²⁹ mu'edded('e): berê hazirkirî

³⁰ şe'bê 'edw('e): xelqê dijmin

³¹ sebxe('e): erda pî tê de gemarî dibe

³² tîrhingiv: tîravêj

Li ser tillek we gote wan şiyar bin
Cihî xwe bernedin hûn newbedar³³ bin

Ji paş ‘esker ve duşmin hîlekarî
Neken, pêş ve be îznîllah nîkarî

We ger çi duşminê me tev fena bin
Bibînin hûn, ji cayê xwe nerabin

Û heta ku hûn li wê bin, galib in em
‘Edû meqlûb in û hem talib in em

Nebî şûrek hilanî ku kîye bê
Hilîne vê bi heqqê wî di herbê

Gelek destê xwe hildan û dixwestin
Biden wan lê Nebî go dê qewestin³⁴

Û heya rabû ji pêş ve Bûducane
Be herbê xweş xebîr û pehlewane

Çiye go heqqê wî ey fexrê ‘alem
Nebî go heqqê wî ey ku demadem

Li duşmin dî heta ew munhenî³⁵ bî
Li erdê cîfeê wana genî bî

Ez im go ey Resûlullah hilînim
Bi heqqî wî li duşmin dawêşînim³⁶

Nebî dayê we go pa ra³⁷ bimîne
Ku ew hatin ji paş ve bivtilîne³⁸

Ewê go ya Resûlullah neqenc e
Bimînim paş li wan nexim tu pence

³³ newbedar: bi nobet, bekçî

³⁴ qewestin: bisekinin

³⁵ munhenî(‘e): xwarbûn

³⁶ haşiyê: Bi heqqî wî li rû duşmin werînim

³⁷ pa ra: li paş, paş ve

³⁸ bivtilîne: bifetilîne

Kişa pêşî hezebrê³⁹ we'de dayê
Xwe hejyand û kete herb û gezayê

Ji muşrîk rastî kî hata dikuşta
Wekî mirdar li erdê wî dihişta

Ji destê wî ketin zor û belae
Dikirna zarîyû weyl û welaê

Yekî muşrîk hebû gava bidîta
Cerîhek muminan⁴⁰ hala⁴¹ dikuşta

Ji nageh hate rastî Bûducane
Geber kir wî ji vî merdê yekane

Ebû 'Amîr serê kufr û 'înadê
Li xwe peşnan dida dikra cîhadê

Berî dane be eħcar⁴² û nubalan⁴³
Revî wek rovî kir qeşda newalan

Jinan şe'ran dilorandin be ƣe'ne⁴⁴
Hilînin heyfê Bedrê hûn be ƣe'ne⁴⁵

Ebû Sufyan digot ey Ewsî, Xezrec
Ji nav pişmamê me der bin we muxrec

Nehatin em jibo herba welakin
Ĝered⁴⁶ heyfê ji pişmamê xwe rakin

Hemû dujminê wî dan le'nê gotin
Hemû em duşmen in bo we digotin

³⁹ hezebr(‘e): şêr

⁴⁰ cerîhek mumin(‘e): muminê birîndar

⁴¹ hala(‘e): derhal

⁴² eħcar(‘e): piranîya kevir

⁴³ nubûl(‘e): tîrvan

⁴⁴ ƣe'n(‘e): lome, hîcv

⁴⁵ ƣe'n(‘e): êrîşa bi çek

⁴⁶ Ĝered(‘e): armanc, meqsed

Yekî muşrîk suwar bû xwestî meydan
Xwe dan paş ve ji wî pur beşl û merdan

Zubeyrubnûl ‘Ewam ser ve hicûm kir
Suwar bû paş ve wî hêla⁴⁷, ‘edem kir⁴⁸

Xweyê beyraqê muşrîk rabû meydan
Ji xwe zêde xeber da ehlê nîran⁴⁹

We go ey ‘esker û şehbê Mûhemmed
Dibêjin hûn ku em bimirin di meşhed

Ji ehlê cennet in lê yê neîne
Bi xeyrê xelqê⁵⁰ îman, cehnemî ne

Werin da ez bişînim we bi cennet
We ya bukjin min û pur ken xwe şewket

Be pût û latê de’wa we beşal e
Dirûg e⁵¹, îftîra ye, bedmeqal e

‘Elî lê derket û lê ne’re da kir
Be şûrê lingekî wî jê cûda kir

Dema ket ‘ewretê xwe da nîşanê
Kete zar û fiğan û el emanê

‘Elî berda, Nebî go wî nehêle
‘Elî çû kuşt nebe da çêke hîle

Ewan beyraqê dan destê yekî dî
Ewî jî Hemze lê da kir wekî dî

Birayê wî heman beyraqê hilda
Ewî jî Se’dî BûWeqqaşî lê da

⁴⁷ hêla: gindirand

⁴⁸ ‘edem kir(‘e): tune kir, kuşt

⁴⁹ nîran(‘e): cehennem, agir

⁵⁰ xeyrê xelq(‘e): bixêrê mexlûqa, Hz. Mûhemmed

⁵¹ dirûg(f): derew

Geber kir çû, yekî dîtir hilanî
Gihayê ‘Aşim û rûh jê deranî

Birayê wî kesê hilda lîwayê
Heman ‘Aşim ewî jî da fenayê

Diya wan pur fikir şîn û girînê
Digo jim ra serê ‘Aşim kî bînê

Ku ez tê da vexem xemr û şerabê
Dê bid mê şed deve bê îrtîyabê⁵²

Xulaşê yazde ten ser wê lîwaê
Geber bûn çûne meydana fenaê

Ji ew paş ma li erdê rayeta wan
Jinek hilda ji erdê şewketa wan

Wekî gurgan⁵³ çevan lê bûne hamî
Nebe yexsîr⁵⁴ nekêşin pêşînami⁵⁵

Di Bedrê lew ku dîbûn jê nîkayet⁵⁶
Ebû Sufyan digo pur ken hîmayet

Dema ku Têlhe, beyreqdarê kuffar
Dikuştin pur, Nebî pê bû ferehwar⁵⁷

Çikû ew pehlewaneke pur fena bû
Di herba musulmînan pur bela bû

Xulaşê kafiran cayê xwe berdan
Revîn û pur şikestin pê li ser dan⁵⁸

⁵² bê îrtîyab(‘e): bê şubhe

⁵³ gurgan(f): gur

⁵⁴ yexsîr(‘e): mexlûbîyet

⁵⁵ pêşînami: poşmanî

⁵⁶ nîkayet(‘e): zerardayîn

⁵⁷ ferehwar(f): kêfxweş û dilrehet

⁵⁸ pê liser dan: di haşiyeyê de bi me’na li serê zilamê xwe dixistin da nerevin

Dikirna gazîyê esnam⁵⁹ û pûtan
Musulmanan “emît, emît”⁶⁰ digotan

Kurê Şiddiqê Ekber hat bê razî⁶¹
Heman babê wî kir şîmşîrê tazî

Nebî go şûrê têke gemd⁶² û bizvir
Heyata te ji ma ez gezwê⁶³ bêhtir

Dema rev ket li wan, Hîndê defek girt
Li pê wan te’ n⁶⁴ dida wan, qeş venedgirt⁶⁵

Jinê wan ketne fîzar⁶⁶ û fîganê
Musulmanan qe ned da wan emanê

Xuda da muminan rayatê neşrê⁶⁷
Tulû’ ser taliê’ wan dabû fexrê

‘Elî go min nihêrî Bûducane
Nebî şîmşîrê dayê ka çewan e

Xweşî min lew nebû kû dabû jê ra
Çikû min xwestibû bo min nedêra⁶⁸

Çi binhêrim belayê asîman e
Belayê kafiran, şatîr cuwan e⁶⁹

Be kevran tûj dikir şûrê ku ko bû
Di herbê da be serçehv û be go⁷⁰ bû

⁵⁹ esnam(‘e): piranîya senem û pût

⁶⁰ Slogana musulmana ya di herbê de

⁶¹ bê razî: li gorî haşiyeyê li meydanê eşkere bû

⁶² gemd(‘e): kala şûr, qebza şûr

⁶³ ji ma ez gezwê: ji me ra ji gezweyê

⁶⁴ te’ n(‘e): şermezarî, zext

⁶⁵ venedgirt: ne dida sekinandin

⁶⁶ fîzar: feryad

⁶⁷ rayatê neşrê(‘e): nişanên alîkarîyê

⁶⁸ nedêra: nedabû, nexwestibû

⁶⁹ şatîr cuwan(‘e): çelengê jîr

⁷⁰ go: guh

Wekî dasokê xwar kir şûrê lahor⁷¹

Bi wî pur kuştibû jî hem sîleşor

Xweyê tîran ku dîtin nuşreta xwe

Girî berdan şikandin şewketa xwe

Ji deh kêmtir bi tin mane li ser gir

Ji paş ve kafîran ser wan hucûm kir

Ewan tev kuştin û Îslam şikestin

Revîn we kafîran wan radibestin⁷²

Şela da muminan şeytanê mel'ûn

Ji paş ve hay hebin da nebne meğbûn⁷³

Li paş zivrîn xwe şaş kirn û lihev dan

Bi xwe hevdu dikuştin ehlê îman

Li wan cevyan hemû cemi' kuffaran

Belav bûn muminan deşt û qefaran⁷⁴

Welê Hemze wisa herb û geza kir

Ji kafîr kuşt sî û yek ten tamam kir

Heman şemfî û Wehşî derbe lê da

Îlerrîdwanî ersîlhû şehîda⁷⁵

Li yebkî Hemzetel erdîs suyûla⁷⁶

We yebkî Hemzeteş şemsul ufûla⁷⁷

Nebî seknî di cî da qeş neçû jî

Tevî cem'ek dikirna hem geza jî

⁷¹ şûrê lahor: şûrekî hindî yê zêde seqa

⁷² radibestin: dorpêç dikirin

⁷³ meğbûn('e): xapandî

⁷⁴ qefar: çol, erda vala

⁷⁵ bi bal razîbûna Xwedê ve ew bi şehîdî şand

⁷⁶ erda lehiyan li ser Hemze girî

⁷⁷ roja çûye ava li ser Hemze girî

Kuffaran lê ceva bûn daku lêxin
Ku wê kîna dilê xwe jî derêxin

Nebîyûllah wisan celd û qewî bû
Dikir herbek wisan ku kes nedîbû

Kevanê wî şikest û şûrê ko kir
Ku pir pê qet'ê⁷⁸ ling û poz û guh kir

Hevalan pê dikirna îhtîrasê
Ji wê mêranî dikran îqtîbasê

Ubeyyê le'nefi qeşda Nebî kir
Heman yek şehbî çû qeşda berî kir

Li wî da, kir şehîd, rabûn rîcalan
Hicûm kirnê digel şûr û meţalan⁷⁹

Nebî go xwe biden alî ji pêşî
Bila bê ez ku lêdem ew biêşî

Nebî rumhek gihande bin çena wî
Wekî ga borîya, bû zarîya wî

Hevalan gotinê 'eyb û fehête
Çiye bû 'ore'or û zarîyê te

Birîna te tunîne geyrî xedşek⁸⁰
Biseknin go dizanim ez bîla şek

Tifek bavê Mûhemmed ne kû ev rim
Li min de dê bi wê vê carê bimrim

Çikû carek ji ma go dê te bukjim
Dizanim dê bi vê ez mewtê bimjim

⁷⁸ qeti'('e): jêkirin

⁷⁹ meţal: mertal

⁸⁰ xedş('e): zelitî, şermixî

Direw naket be rastîyê şehîr e⁸¹

Emîn û şadiq û zanaw debîr e⁸²

Dibêjin Îbnî Qum'e pîsê makir⁸³

Li Muş'îb da welê zenna Nebî kir

Kire gazî eva min kuşt Muhemmed

Li wan xen, şemlê wan ken hûn mubedded⁸⁴

We şeytanê xwe kir şeklê ce'alê⁸⁵

Ji eşhabê Nebî kir galegalê

Muhemmed hate kuştin hate kuştin

Musulmanan li hev dan hev nehiştin

Hinan jî gotin ev dînê beçal e

Çikû dînê heqîqî bêzewal e

Hinan go wer Mûhemmed hate kuştin

Xuda Heyy û Qeyyûm e nayte kuştin

Ji herbê rûnenin negrin be sistî

Qewîdil bin be rastîyû durustî

'Elî go ez geram nava şehîdan

Muhemmed min nedî nav wan şehîdan

Mi go wellahî ew nake firarê

Tu carî ew ji me'reka⁸⁶ kuffarê

Hebî dîsa Xuda birye semaê

Mi şûr hilda ketim herb û gezaê

Mi şeffa wan qelaşt û dayê alî

Çi binhêrim di nêv da fexrê alî

⁸¹ şehîr('e): meşhûr, namdar

⁸² debîr(f): idarevan

⁸³ makir('e): hîlekar

⁸⁴ şemlê wan ken hûn mubedded('e): temamê wan ji hev belav bikin

⁸⁵ ce'al('e): heywanek, hespê şeytên

⁸⁶ me'rek('e): herb û şer

Diket herbek Xuda hefza xwe lê ke
Ku Rustem jî nikaribû welê ke

Musulman firqekî revyan teyîsîn
We firqek mane heyrî hem eyîsîn⁸⁷

We firqek dîtirê ma cem peyember
Dikirna herb û defê der û hem ker⁸⁸

Li hev hay dan Nebî sağ û selîm e
Negehdarê⁸⁹ wî mewlayê ‘Elîm e

Ûeta cevyane ser hev pur telef bûn
Nebî dîtin ku sağ e pur fereh bûn

Welê çokê mubarek xerîşîbû
We lêva wî yê xwarê qelişîbû

Di goştê rûwê wî çûbû du helqe
Ji mîgfer şeq bibû mîna du felqe

Şikîyabûn diranê wî yê kursî
Ji ber te’ba wî nalî ‘erş û kursî

Dibêjin ‘Utbe lê dabû we Hâtîb
Kete pê wî be şûr û rumh û ratîb

Gehîştê, şûrekê lê da serê wî
Ji leş hil kir we da cehnem berê wî

Ser û şimşîr û espê ku nîşan kir
Nebîyallah gelek jê ra dua’ kir

Li Îbnî Qem‘e jî kir bed dua’ê
Ji nageh nêrîyek kovî gihayê

⁸⁷ eyîsîn(‘e): sekn û bi ser xwe da girîn

⁸⁸ defê der(‘e) û hem ker: dûrkirina zerarê û hem şer

⁸⁹ negehdar(f): nîgehdar, mihafîz

Li ber bû çan ewî kir parçe parçe
Jibo zêde ‘ezabê da ku daçe

Şikeftêk da Nebî seknîbû nageh
Hucûm kir muşrîkan pê bûne ageh

Hemana ‘Ûmmerê Xettab û hindan
Li wan xistin li wana ne’re hildan

Be tîran dane pê wan hin dikuştin
Direvyan, hin hevalê xwe dihiştin

Jina seh kir ji Teybe qefle hatin
Digiryan û şehîdan ra nivatin⁹⁰

Betûla bîntî fexrîl ‘alemînê
Nebî dî, girte awaz û girînê

Birînê wî be avê şuşt û malî
Kewek dayê be nermî û delalî

Ketin nava şehîdan kanî kî ne
Birîndar çend in û ka ew jî kî ne

Temam heftadê ten⁹¹ ehlê şehadet
Heta heştê dibêjin hin rîwayet

Welê kuffarî mirdarê xwe dibran
Heman weqta geber bûna we bimran

Jibo keyfxweş nebit ser wan Mûhemmed
Welê ew jî gelek bûn û mu‘edded⁹²

Jin û mêrê di wan muşrîk pelîdan
Be hev ra dan hucûmê ser şehîdan

⁹⁰ ji bêkesîya şehîdan re lorandin

⁹¹ heftadê ten(f): heftê, 70 kes

⁹² mu‘edded(‘e): bi hejmar

Guh û pozê di wan dibrîn be kêrê
Ji kerba kuştîyê pêşîn di Bedrê

Li wan lewme kirin be'çek hevalan
Ji ew paş şemmirandin bed fe'alan⁹³

Ebû Sufyan li ser tilek nîda kir
Eva min heyfê hilda dil şîfa kir

Eva em bûn wekî hev lêkî⁹⁴ 'Ummer
Kurê Xettabî ew be'le' gedenfer

Digo kengî wekî hev ey xwelîser
Nîzanin ku tucar nabin beraber

Çikû yê me şehîd in cennetî ne
We yê we tev mirar in cehnemî ne

Ewan go naşirê me lat û pût in
Musulmanan me mewlallah e gotin

Ji 'Ummer pursî Bûsufyan be kînê
Muhammed hatî kuştin yan dimînê

'Ummer go sa'g e şed caran şukur bit
Ewê Ma'î⁹⁵ jibo 'erqê⁹⁶ kufur bit

Ewê hêjan çi bênitin serê we
Hezar derd û bela dê bê derê we

Wisân e go dema bû weqtê Bedrê
Ji sala pê ve em ken herb û gedrê

Şehaban go hemana ha'îrin em
Çi weqta tîn werin tev wê der in em

⁹³ şemmirandin bed fe'alan('e): terk kirin hereketên xwe yê xerab

⁹⁴ lêk: yek li yekî

⁹⁵ Ma'î('e): navekî pêxember bi me'na yê kufre mehv dike

⁹⁶ 'erq('e): damar, kok

Nekin fexrê ku galib bûne ev car
Li ser we zaf e derbê par û pêrar

Xîlafa emrê peyğember ku em çûn
Me gir berda ji wê bû em wiha bûn

Çi weqta herbekî çê bî, geza bî
Zêfer dîsa dê para Muştefa bî

Hilanîn ‘esker û kişyane şadan
Nebî jî rabû teftîşa şehîdan

Ku dî Hemze çewan kirbûne ‘îbret
Gelek mehzûn bû jê ra rihtî ‘ebret⁹⁷

Li ser seknî dimûê⁹⁸ wek mirarî⁹⁹
Wekî tavê di baranê dibarî

Dikir jê ra dua’ û xeyr xewahî
Digo tu serfiraz bî cem îlahî

Qesem kir go Xuda ger ket muyesser
Ji wan bukjum ezê heftadê serwer

Wisanim serê wan kes nedîbî
Hilînim heyfê Hemze we’de lê bî

Şehabe lê cevan te’zîye danê
Ewan jî şozê heyfê Hemze danê

Xuda jê ra şîyandî wehy û tenzîl
Şebir dayê be wî bo halê tebdîl

Şefîyye çû birayê xwe bibînî
Zubeyrî çû ku pa ra bizivrînî

⁹⁷ ‘ebret(‘e): hêstirên çava

⁹⁸ dimû’(‘e): yê çavên wî bi girîn

⁹⁹ mirarî(‘e): durr

Çewan kir, nezivî go ma te xêr e?
Birayê xwe dibînim têm li êre¹⁰⁰

E raqî me be emrê rebbê ‘alem
Şukur jê ra be, nakem ez qe me’tem

Dema çû dîtî pur jê ra dua’ kir
Gelek girya û hem jê ra şena kir

Nebî destê xwe ser sîngê wê malî
Şebir kir êdî ew zêde nekalî

Hemana Hemze pêçan û hilanîn
Şiyandin Cenneta Baqî be tehsîn

Veşartin yek be yek nazik şehîdan
Dua’ kir pur Nebî bo wan sei’dan

Jibo wan şehde da ku cennetî ne
Be rûhî lew Xuda ra xebitîne

Jinê Tevbe li mala fexrê ‘alem
Dicevyan Hemze ra dîkrana me’tem

Gelek zor û giran bû nekbeta¹⁰¹ ha
Fe wahren summe wahren summe wahren¹⁰²

Welêkin rebbê ‘alem vê wiha kir
Çikû şehban xilafa Muştefa kir

Xwedî tîran cîhê xwe bernedana
Jixwe kafîr şikestî bûn tevana

We hem jî kifş e nedbûna munafîq
Ji ehlê milletê Îslamê şadiq

¹⁰⁰ êre: vê derê

¹⁰¹ nekbet(‘e): felaket, mûsîbet

¹⁰² wax tiştê hatî serî, wax tiştê hatî serî

Hemû zanin ji ev paş halê çan e
Munafiq kî ne, fikra wan çewan e

27. ĞEZWEYA HEMRAEL ESED

Di şubha puştî fetlîn ji Êhûd da
Nimêj kirn û heman yek hat ji der da¹

Çi seknîne Qureyşî go be kar in
Ku ‘esker ser we va dîsa hinarin²

Digotin serwerê qewmê Muħemmed
Hemû mane tamam cild û musedded³

Çi roj bit dê ji me heyfê hilînin
Zefer êdî be çehvan em nebînin

Meger zû em hucûm ken ser Medîne
Ewan qir ken ku hêj furset nedîne

Resûlullah emir kir go suwar bin
Be şûr û tîr û rim pê wan be kar bin

Duhî⁴ kî bûn di herbê ew tenê bèn
Ji bil ehlê Êhûd kes dî nebê bèn

Di pêşî da şiyandin merdê heftad
Li pê çûn baqîyê şehbê di munqad⁵

Li Hemraîl Esed dîtin ku duşmen
Kîşane, kes nemane cayê me’men⁶

Meger tedbîrê wan ew bû bifetlin
Li ser Teybe, Nebî bukjin bifetlin

¹ ji der da: ji derveyê

² hinarîn: şandin

³ musedded(‘e): jîr û jêhatî, bi xeyret

⁴ dûhî: do

⁵ munqad(‘e): îtaetkar

⁶ me’men(‘e): cîyê ewle, sitargeh

Welê dîtin li rewha⁷ yek Xuzaî'
Be nav Me'bed gelek bû qencê saî⁸

Ebû Sufyan ji wî pursî hewadiş
Cewab da go hezebranê 'ewabis⁹

Muħemmed cemi' kirye, pê we va tèn
Diken te'qîbê rêça we, eva tèn

Wisa 'esker civaye pur giranî
Tijî kirye çîya û deşt û banî

Diçirkandin jibona we diranan
We şonda we dixwarin wan cuwanan

Eger ew we biqeflînin bîla şek
Ji bil qirkirinê naken tu tişteşek

Ew e qenc xwe xelaş ken ba selamet
Biçin mala xwe bê ceng û melamet¹⁰

Heman nava dilê wan bû ji tîrsan
Wekî qetya, revîn nema tu însan

Ebû Sufyan digote qewmê salûs¹¹
Xelaş bin da bimînit nav û namûs

Gelek car çêtir e lingê revînê
Ji wî destê ku şûrê dawêşînê

Mu'awîye hebû lawê Muğeyre
Berî herba Ūħûd ha bû li êre¹²

Dikir casûsîyê teşbîhê rovî
Diçûya Teybeê çewanî kovî

⁷ rewħ('e): vegeřina malê

⁸ saî('e): xebergihan

⁹ hezebranê 'ewabis('e): şêrên bînteng

¹⁰ melamet('e): şermezarî

¹¹ salûs('e): şelaqî

¹² ha bû li êre: ha li vê derê bû

Nihêrî ku ji nageh kefte qeydê
Kete pencê ‘îqab û bazê şeydê

Kire qeşda derê ‘Uşmanê ‘Effan
Jibo nekjun ewî qewmê musulman

Digeryan lê cewasîsê peyember
Li wê qeflandin û wî birne meħder¹³

We hem ‘Uşmanî jî çû mehdera¹⁴ wî
Nebîyullah qebûl kir mehdera wî

We go jê ra hetta şê rojê muhlet
Ji ew paşê ku ma, bukjin be ‘îbret

Be Hemraîl Esed va çan ku ew çûn
Ewî casûsîyê kir pîsê meġbûn¹⁵

Jibo eħwalê wan da tev hilîne
Qureyşan ra bibe we yan bişîne

Revî weqta ku seh kir şehbî hatin
Heman kuştin çewan ku qeffilatin

We hem kuştin Bû‘îzze ‘Emrê şa‘ir
Ewî xaîn, ewî kezzabê makir

¹³ meħder(‘e): cîyê hazirîyê

¹⁴ mehder(‘e): rica ‘efû, şefa‘et

¹⁵ meġbûn(‘e): xapandî

28. ĞEZWEYA BENÎ NAĐÎR

Dibên ‘Emrê Umeyye beqlê mahir

Du ten kuştin ji ebnaê¹ di ‘Amir

Di puştî ku Resûlullah emanî

Be wan dabû welêkin ew nezanî

Nebî çû nav yehûdanê Neđîrî

Jibo ku rake xûn ser wî dilêrî²

Hebûn ew jî Nebî ra hem muwafiq

Di xûndayîn we herb û her murafiq³

Ji deh ten zêdetir vê ra nebû kes

Li hev şêwrîn yehûdê pîsê nakes

Eger vê carê em nekjun Mûhemmed

Wiha تنها wî nabînin muebbed

Selamê lawê Meşkem go muheqqeq

Wehî dê bê û nabin hûn muweffeq

Dibin bê bext û bed kirdar û bed nam

Dikêşe ser we hem rayat û e’lam⁴

Ewan guh nekirin, kevrek çû ber aş

Hilanîn çûne ser da pêşî qellaş

Heman Cebrîlê pîkê⁵ rebbê ‘alem

Ji ‘erşan hat xeber da fexrê ‘alem

Nebî qeşda Medîne kir hemana

Di dil wan da keser ma keydê wana

¹ ebna(‘e): zarok

² dilêr: mêrxasî

³ murafiq(‘e): rêheval

⁴ rayat û e’lam(‘e): sencaq û beyreq

⁵ pîk: xeberbêj

Dema zanîn Nebî nîne li wê dî
Be xef hatin nizanin şehbê wê dî

Şehabe lê geran û pur nedîtin
Welê şêwra bedê wana behîstin

Huyeyyê Extebî go ger serê we
Neçûya, pêk dihat muhtacîyê we

Welêkin ew gelek bûne peşîman
Çikû ser wan şikest her ‘ehd û eyman⁶

Hinan gotin qesem rast e nebî ye
Bi wî îmanê bînin êdî çê ye

Qebûl nekrin hinan man tariyê da
Be sûtîqêşdê çûn korahîyê da

Nebî ‘esker kir û kişya li ser wan
Ewan şeş roj heşar kir ma li ser wan

Ketin kelhan û tê da mane ‘aşê
Şehabe dest ku neghînin newaşê⁷

Nebî rûniştîbû kûlek⁸ be raşet
Muqabîl me’reka, şahê be şewket

‘Ezûkê tîrê hingivê⁹ yehûdî
Be tîrê davête kûlek pelîdî

‘Elî jê ra muheyya¹⁰ bû, xwe qelzand
Li ber wî ta ku nageh va wî qefland

Serî jê kir ji laşê pîs û anî
Ji wî kula Nebîyullah hilanî

⁶ ‘ehd û eyman(‘e): soz û sond

⁷ newaşê(‘e): fitîla donkirî

⁸ kûlek: pencera biçûk

⁹ tîrehingiv: tîravêj

¹⁰ muheyya(‘e): amade

Resûlullah ku dî van keyd û hîlan
Emir da go hila bibrin nexîlan¹¹

Birîn çend darê xurmew şewiţandin
Hinan nîswanî pêsîr qellişandin

Ji hindur ve kirin gazî Muħemmed
Tu ehlê qencîyê bûyî mumecced

Çêkirne bağçegah û darê mêwe
Hemin qetl û cîdale yê me'wûwe¹²

Xulaş wan yeqîn kir bil ji kuştin
Jibo wan nîne, emwalê xwe hiştin

Xelaş ken da jin û zar û rîcalan
Birevne çol û deştan û cîbalan

Kurê Îbnî Selûl pîsê munafiq
Xeber da wan: Ez im bo we muwafiq

Qewî bin, herbê ken mîna dilêran¹³
Heman hatim hewara we be şîran

Hinan gotin muheqqeq ew dirûg e¹⁴
Qe ew naên hemû fortew firûg e¹⁵

Hinan jî xapîyan, axir nerabûn
Nihêrîn ku ne kes hat û ne ew çûn

Sebeb ku tîrsekî bê hedd û ejmar
Kete qelbê munafiq pîsê guvtar¹⁶

Yehûdî keten fîzar û fiğanê
Ji fexrîl murselîn xwestin emanê

¹¹ nexîl(‘e): xurme

¹² me'wûwe(‘e): tedarîk, peyde

¹³ dilêr: mêrxas

¹⁴ dirûg(f): derew

¹⁵ firûg(‘e): vala, pûç

¹⁶ pîsê guvtar: yê peyva wî pîs

Digotin berde jin zar û rîcalan
Ji ta be¹⁷ erq û dar û terş¹⁸ û talan

Nebî go baş e, lê zirh û sîlahê
Bihêlin, wer ne nabînin felahe

Diger bar ken heçî tiştê dikarin
Çikû bêbext in û pîs û neyar in

Musulman bûn ji wan Bûse'd¹⁹ û Yamîn
Gehiştin dewletê dunya û hem dîn

Hinek çûn Xeyber û hin Ezrû'atê
Şukur ew qeştîyan²⁰ çûn ta mematê

Resûlullahî da muhacirînan
Temamê ku ji wê gezwê ve înan

Dida ajotinê erqê di wana
Di xêra salê hiltanî ji wana

We yê zêde dikir tedbîrê herbe
Dida zirh û sîlah û herb û derbe

Çikû dîn bê cîdal û herbe nabe
Di weqtê lazimî ha dir li ha be

¹⁷ ji ta be: ji te ra be

¹⁸ terş: dewar û pez

¹⁹ Bûse'd: Ebû Se'd

²⁰ qeştîyan: qeştîn, teqizîn

29. ĞEZWEYA ZATURRÎQA

Nebî seh kir ku ebnaê muharîb
Digel yê Şu'lebet dibne muharîb

Li Necdê top kirine beql û mêran
Ku bêne ser Medîne wan dilêran

Resûlullah xeber da cumle şehbê
Di xwew go¹ dê biken tedbîrê herbê

Be lez rabin xwe pêk bînin nihanê²
Nedin wan furset û keys û emanê

Çihar şed topî ser hev bûn ji nageh
Hemû beqlê bi hîla herbê ageh³

Nebî ket rê, li pê kişyan kerîman
Be çolistan ketin çûn ser leîman

Gehîştin wadiya Şuqreh şiyandin
Gelek nijdan⁴ li pê wan pur gerandin

Bi şev zivrîn û gotin me nedî kes
Ji wan me seh nekir qeş pêjn û hem hes

Ji wê çûn erdê Nexlê Necdê Ğetfan
Li wê dî jî nebû kes geyrî nîswan

Jinan girtin, dema seh kir rîcalan
Ji tîrsan tev revîn ketne cîbalan

Hinan jî hevdu girtin bûne 'esker
Girê dan şef li pêş ceşşê peyember

¹ di xwew go: yê xwe û got

² nihanê: bi dizî

³ ageh: zana

⁴ nijdan: hicûm

Nimêja ‘eşrê ʔernê⁵ xewfê şeḥban
Kirin da ku bikarin defê ʔerban

Xulaşe ʔetefanîyan newêrîn
Biken herb û belav bûn paş ve zivrîn

Nebîyûllah şikeftê da nivistî⁶
Du ten newbet li ber der radibestî

Ji mêrê wan jinê yexsîr tenê çend
Ketin pê wan be ‘eyyarê gerûfend⁷

Dema dîtin reşê yek newbedarî
Şubandin rayetê⁸ tîrek hinarî⁹

Meger ‘Ubbadî bû, tîr tê de cih bû
Ji cî xwe tevnedê, qeḥ lê neguh bû

Yekî dîtir we yek dîtir jî ‘eynî
Be ser ‘eynî xwe va nanîw nedeynî

Ser û pa xûnê girt û cîh da rûnişt
Revî kafîr ku zanî îns e ew tişt

Jibo ra¹⁰ gotî ‘Emmarî çira te
Nekir ageh hetta yardim bidam te

Sebeb go min nimêj dikra nikarim
Nimêjê berdem û pê ve separim¹¹

Dibêjin rawîyanê rastîgoyan
Xebîrî sîrrê şeḥb û rastîcûyan

⁵ ʔern(‘e): bi hev re

⁶ nivistî: raket

⁷ ‘eyyarê gerûfend(f): bi şiklê hîlekarî

⁸ rayet(‘e): beyreq

⁹ tîrek hinarî: tîrek avêtin

¹⁰ jibo ra: ji wî ra

¹¹ separim: sîperê bigrim

Nivîstîbû Nebî bin sayê darek
Ji nageh dî ku merdek wek çinarek

Di dest da şûrekî lahorê tazî
Be ser da seknîye pê da digazî

Dibê dê çan xelaş bî ey Mûhemmed
Ji van destan we vî şûrê muhedded¹²

Heman Cîbrîlî hat û def'e lê da
Li erdê ket, Nebî şîmşîrê¹³ hilda

Ku ser jê ket, ewî jî qencî zanî
Resûlê heqq e, pê îmanê anî

Gelek qewmê wî hem vê ra tebayî
Musulman bûn be keyfxûşî we şayî

Ce'alî¹⁴ mujde bir ehlê Medînê
We go şa bin eva fexra zemînê

Digel şehban be xeyr û şayî hatin
Selîm in tev tebayî vaye hatin

¹² muhedded('e): tûj

¹³ şîmşîr(f): şûr

¹⁴ Cu'ayl bîn Suraqa

30. ĞEZWEYA BEDRÊ YA DAWÎN

Dema hat mew'îda¹ pêşîn ku dabûn
Be Bûsufyanî ra ku jê qeta bûn

Di roja Uhûdê ew weqtê Bedrê
Ku hatin em biken herbîyyû gedrê

Resûlullah emir da ku ğeza ye
Li hev ber hev bibin me we'de daye

Ûeta kafir nebêjin ãirsîyane
Ji herba me meger xwe paş ve dane

Hezar û pencî sed merdê bijarî
Li hev bûn cemi' bo herba kuffarî

Ebû Sufyan gelek ãirsabû lewra
Virê kir qasidek hîlew direw ra

Here go ãirs bide ehlê Mûhemmed
Bibêj hatin ji Mekke bê 'edd û hed²

Wisani çêke ku ew êdî newêrin
Bi vir va bèn hemana tev bizivrin

Bidim te bîstî naqe³ ucreta te
We hem pur bit di nav me hürmeta te

Heman rê kir ji 'esker du hezaran
Welêkin dil be ãirs bûn wan neyaran

Digota ger ku hatin em bibêjin
Ne ew weqt e ku em xûnê birêjin

Ĝela ye lew bila bibte ferahî
Li hev hay den we herbê ken wê gahî

¹ mew'îd('e): we'd û soza hatiye dayîn

² bê 'edd û hed('e): bê hed û hisab

³ naqe('e): deveya mê

Ji xwe ku ew nehatin êdî baş e
Li ser wan forteê me pur belaş e

Dema qaşid gehişte nav Medîne
Wisani kir tîrsekî ku kes nebîne

Nema êdî ku derkevne gezaê
Şehabe ketne şêwr û helwelaê⁴

Munafiq jî gelek şa bûn û gotin
Di vê carê dê tev da bêne kuştin

Ebû Bekr û ‘Umer çûn cem peyember
We gotin her ‘înanê⁵ pê ve wergir

We gotin qenc ew e ku xwe nedî paş
Li ser me ku nebin pur bijê⁶ û qellaş

Muheqqeq dê Xuda dîne xwe îzhar
Bikew nuşret bide ser qewmê kuffar

Nebî got dê biçim wer ten be tenha⁷
Bimînim dê nebînim ez kederha⁸

Musulmanan qewîdil bûn we rabûn
Wekî şêran be şîran girtin û çûn

Belav bû nav û dengê wan welatan
Tijî kir behşê cem‘a wan cevatan

Qureyşî hatibûne Merrê Zehran
Dizanîna ku naên ew hezebran⁹

Be qaşid lew dilê wana qewî bû
Ji Mekke hatina wana be wî bû

⁴ helwela(‘e): heyirîn, şaşbûyî

⁵ ‘înan(‘e): gem, hefsar

⁶ bij: bêbav

⁷ wer ten be tenha: welew bi tenê bim jî

⁸ kederha(f): kederan

⁹ hezebran(‘e): şêr

Ebû Sufyan ku seh kir girte hîle
Çikû zanî nema bo wî wesîle

Ji geyrî paş ve kêşan û revînê
Heta paşî çî tevbîrê bibînê

Ji wan ra go me çêtir fetilîne
Ji herbê vê demê 'îşê me nîne

Çi weqtê em ketin xeşb û firagê¹⁰
Di wê çagê neken sistîw turaxê¹¹

Ji wê fetlîn welê nedkirna bawer
Xelaş bin ku ji dest şehbê peyember

Resûlullah û şehban jî ku dîtin
Kesek nîne li wê, malan firotin

Ketin bey 'û şira¹² û keyf û karî
Xwe ra dikran li wê erdê tucarî

Li wê heşt roj tamam bû paşê hatin
Be rebhê¹³ mal û qencî balê hatin

¹⁰ xeşb û firag('e): bereketî û bêmeşxûliyet

¹¹ turax('e): sistî

¹² şira('e): kirîn

¹³ rebh('e): kar, qazanc

31. ĞEZWEYA DEWMETUL CENDEL

Di şehrê Dewmetîl Cendel ceva bûn

Ji muşrîk komekî şahibcefa bûn

Li ser wan kî diborî wî dikuştin

Dişêlandin xwe ra malê dihiştin

Kirin şewra ku bêne ser Medîne

Xeberdar bû bi wê fexra zemîne

Nebî hilda hezar beşl û geşenfer

Kêşa ser wan bidet wan mewtê eşmer

Be şev diçwan, be rojê vedşêrandin

Heta nêzîkî wan ku xwe gihandin

Ji ‘Uzrê yêkî ba tedbîr û zana

Îzin xwest go bibim casûsê wana

Nebî go dê here çawan dizanî

Ewî çû heşşê¹ talanê hilanî

Be lez hat û be ageh kir peyember

Hicûmî terş û talan kir seraser

Xeber gava gehişte wan rîcalan

Belav bûn tev revîn ketne newalan

Belav bûn, nejdevanê fexrê ‘alem

Gelek geryan nedîtin ferdê adem

Ji geyrî yek, we ew jî bû musulman

Heman zivrîn Medîne ehlê îman

¹ heşş(‘e): hîs, hes

32. ĞEZWEYA MUREYSÎ

Dibên Ğersê Xezûrî, fexrê ‘alem¹
Cemi’ kir Muştelîq bo herb û me’tem²

Ku bê ser Teybeê herba Medîne
Ku heyfa muşrîkê kuştî hilîne

Di weqta hêj ku ew nebû musulman
Be xeyrîl murselîn nanîbû îman

Reisê wan bû lew tev tew‘ê³ wî bûn
Di fermana wî seknî wek mirî bûn

Nebî seh kir Bureyde⁴ girtî casûs
Şiyand tefîşê hal û keyda salûs⁵

We da serbestîya tiştê ku bêje
Xelaş be daku bêw⁶ eħwalê bêje

Çikû herb hîle û fetl û hunêr e
Kesê pur hîle zanit êdî mêr e

Bureyde çû gehiştê Ğersê nêhrî⁷
Ku top kirye li xwe her beşl û mêrî

Ji kûyî Ğersî go wî, got heval im
Jibo we şahîbê ceng û qîtal im

Ezê top kem heçî bin emrê min da
Emê qir ken Muħemmed eşl û bin da

Eva ez hađîr im rabe suwar be
Bikêşe ‘eskerê xwe kar û bar be

¹ Ji fexrê ‘alem re dibên ku Ğersê Xezûrî

² Ğariş b. Dirarê Xuzaî, meznê Mustelîqa ye

³ tew‘(‘e): tabîbûna ji dil û can

⁴ Bureyde bîn Husayb el-Eslemî

⁵ keyda salûs(‘e): hîla munafiq

⁶ bêw: bê û

⁷ nêhrî: nihêrî, dît

Ji wê fetlî sivik ew hate malê
Xeberdar kir Resûlullah ji halê

Nebî hay da, li hev bûn cem'ê gazi
Heman reh girtî û çûne birazî⁸

Li rê casûsekî girtin ji kafir
Çi pirsîn jî negot wî pîsê makir

Nebî kir emrê 'Ummer wî qellaşî
Serî jê kir be şûrê şîn ji laşî

Dema Herşî evî halê bihîstin
Ji tirsan bû ku êdî nenivîstin⁹

Hevalê wî gelek wî hiştin û çûn
Yeqîn zanî ku bû meglûb û megbûn¹⁰

Resûlullah tewekkul ser Xuda bû
Li ser ava Mureysî'ê peya bû

Li wê der çadirek jê ra vegirtin
Nebî rûnişt we 'esker şeffê girtin

Resûlullah emir kir go bibêjin
Bila îmanê bînin xûn nerêjin

'Umer gazi kir û wan qeş neguh kir¹¹
Kirin şer pur be tîran qewmê kafir

Nebî go dê hucûm ken tev be carek
Hucûm danê ewan şehbê mubarek

Dehan kuştin we yê dî kirne yexsîr
Ji heft şed zêde bûn nekrin qe teşîr

⁸ birazî('e): herb

⁹ nenivîstin: raneketin

¹⁰ megbûn('e): xapandî, xisardîtî

¹¹ neguh kir: guh nedan

Jin û zar û mewaşî¹² kirne talan
Du şed xane be koç û terş¹³ û talan

Hemî teqşîmî kir fey¹⁴ a giranî
Cuweyrîye keça Hêrş bo xwe anî

Hem aza kir li xwe kir mehr û kabîn
Diyafet kir be terz û hem be ayîn

Hemû yexsîrê wan berda ji îhsan
Ji hûr û gir benat¹⁵ û bûk û nîswan

Dema şehban bihîstin maceraê
Li wan îkram kirin malê dimaê¹⁶

Hemî Muştelîqî çûne cihê xwe
Şehabe fetilîn menzelgehê xwe

Devan top kir we ajot Hêrşî anî
Jibo fîdya Cuweyrîyyew emanî

Nihêrî du deve tê da bi jarî
Li rê wan hişt veşart xiste miğarî¹⁷

Dîger anî we pêşkêşî Nebî kir
Resûlullah çewan dî pursê jê kir

We go ka herduyê ku te veşartin
Fulan şe'be¹⁸ 'eqîqê¹⁹ da nixaftin²⁰

Dema seh kir te'eccub ma giranî
Bezî destê Nebî îmanê anî

¹² mewaşî('e): dewar û pez

¹³ terş: dewar û pez

¹⁴ fey('e): genîmet

¹⁵ benat('e): qîzan

¹⁶ dimaê('e): xwîn

¹⁷ miğare(t): şikeft

¹⁸ şe'be('e): qebîle

¹⁹ 'eqîq('e): best, wadî

²⁰ nixaftin: veşartin

Yeqîn çêbû ji ma ku tu Resûl î
Li cem rebbê xwe xwey ‘îzz û qebûlî

Cuweyrîyye ku seh kir şa bû jê ra
Heqq e şa bit ji Îslama ebî²¹ ra

Ji eşşeh²² rawîyan we bûye mesmû²³
Di vê gezwê teyemum bûye meşrû’

Sebeb gerdeniya ‘Aîşe wenda
Bibû, mabûn digeryan lê di cîh da

Cîhek bê avî bû hetta ku dîtîn
Fecir avêt we îmkanê nedîtîn

Xuda Cebrîl verê kir wê demê da
Emir kir ku teyemmemû şe‘îda²⁴

Dibên ew gerdenî dîsa li rê ket
Kirin bar ken we bîra ‘Aîşê ket

Li dor vê rê gelek vê ra bû engel²⁵
Dema dît anî ku çûne hemû xel²⁶

Li cî ma ku li pêy bên û bibînin
Hilînin ta be qefla²⁷ wê gehînin

Meger Şefwanê Zekwanê yekî baş
Li pêy ‘esker dihat jê mayîbû paş

Di weqtê şubhê zû hate ciyê wê
Reşê wê dît we nasî ji cilê wê

²¹ eb(‘e): bav

²² eşşeh(‘e): rast

²³ mesmû’(‘e): bihîstî

²⁴ teyemmemû şe‘îda(‘e): teyemmemû bi axê bigrin

²⁵ engel(t): asteng, mani’

²⁶ xel: xelq

²⁷ qefle: qafîle

Be pêjna wî ji xew hişyar bû rabû
Deve nex kir we ‘Aîşe suwar bû

Li rê dikşand dihata bê xeberdan
Û heta hatin gehiştin qencê merdan

Meger lawê Ubeyyî namusulman
Munafiq, pîs û hem bê dîn û îman

Devê xwe pîs kir û pur îftîra kir
Xwe musteheq jibo nar û ceza kir

Çewan go mêr û jin tenha bimînin
Ji fuhşîyat selamet çan bimînin

Ji ser da hatiyan meşhûr e gotin
Di heqqê yê wiha da ku digotin

Bi xwe pîs e, xwedî feşîyû zanî
Hemû kes jî wekî xwe hem dizanî

Belav kir nav Medîne vê meqalê²⁸
Resûlullah heta hesya be halê

Ebû Bekîr jî seh kir gelkî êşa
Nexweş bû ‘Aîşe bêhemd diêşa

Welê hêj seh nekir bû van meqalan
Ku çêkir îftîra pîsê rîcalan

Dema ‘Aîşe seh kir, nav nivînan
Li wê bûn zêdetir derdê birînan

Be derdê naxweşî çû mala babê
We ma çavnêr heta wehya Xuda bê

Digirya hem digiryand xelqê malê
Û heta sê roj û sê şev ser vî halê

²⁸ meqal(‘e): gotin

Heçî bidya digirya ھاڵê wê ra
Heta kitkek²⁹ digirya pur ji wê ra

Nebî teftîşî kir cuz qencîya wê
Mijûl nedbû Bureyre carîya wê

Yeqîn kir ku dirûg û îffîra ye
Ji berqa ehlê kufrê ve vedaye

Resûlullah ku tehlê xwe beyan kir
Hinan bo întîqamê xwe ‘eyan kir

Nemabû pur ku herbek tam bibûya
Di nava Ewsîyan û Xezrecîya

Neçû pur ku Xuda ba wehy û tenzîl
Jibo wî pîsî kir tekzîb û teqlîl

Şiyand Cîbrîl bi tenzîl go berî ye
Fe wellah summe billahî berî ye

Beraet ma beraet ma beraet
Çi bêjim lew di Qur’an bû tîlawet

Kesê şek bit bîla şek kafir e ew
Li ser lêva cehennem ھاđîr e ew

Di vê herbe jî hem ew kafîrê pîs
Kurê Îbnî Selûl ustadê îblîs

Fesadîkî wisan kir dûrî der bit
Bi tin ser wî hemî fitnew ډerer bit

Sebeb Cehcahî çû kû avê bînê
Jibo peygemberê fexra zemînê

Li ser avê tijî bûn dorê neddan³⁰
Ewî û yêkî Enşarî li hev dan

²⁹ kitkek: kitikek, pisîkek

Muhacir çûne cem Cehcah û Enşar
Civane cem ewê dî kirne hawar

Nemabû pur ku bûbya kuştinayî
Nebî seḥ kir li wan hilda şelayî

Biseknin, qîr nekin, evqas neçê ye
Çikû de'wa nezanîw cahilîy ye

Le'înî got ku em çûne Medîne
'Ezîz her çî zelîlan jê derîne

We hem jî bedmeqalê dinê gotin
Wisana pîs êdî ku naête gotin

Nebî xeydî we da emrê reḥîlê³¹
Di germa nivê ro keljan û qîlê³²

Ġereḍ ew bû ku vekjê³³ fitne ḥîlan
Nebî çêken munafîq ḥîle pîlan

Şehaban seḥ kirin xeyda peyember
Ji qewlê kafîrê eḥmeq ewî ker

'Umer got îzîn de jêkem serê wî
Biṭemrînim ku rûḥ ez beşerê wî

Nebî go jê biger dê xel bibêjî
Muḥammed hîn bûye şehbê xwe dukjî

Kurê wî hat welê ew pir delal bû
Ne wek wî kafîrê ehlê delal bû

Rica kir go Resûlullah mi gorî³⁴
Emir ke ez serî jêkem ji gewrî

³⁰ neddan: nedidan

³¹ reḥîl('e): ketina rêwîtiyê

³² qîl('e): şayîa'

³³ vekjê: bitefine

Munafiq ger çi pîs e, lêkî bab e
Ji bil min kes wî bukjî pur xerab e

Nebî dîsa nehêlabû³⁵ dilê wî
Be ser da hêj tesellî da dilê wî

Dema nêzîkî bûn biçne Medîne
Kurê wî çû qebîd kir wê nivînê

We go îzzet Nebî ra yew zelîl î
Tu pîs î, hem tu bêrûy û rezîl î

Serê te jê bikem te b-kem ‘elamet
Ji te ‘îbret hilînin ta qiyamet

Dema seh kir evî dujmin kelamî
Yeqîn zanî ku ruswa ye di ‘amî

Kurê wî dê ewê rojek geber ket
Ji jîna ro dinê³⁶ wê bêxeber ket

Xwe hat avête peyğember rica kir
Direw şond xwar, Nebî sûcê teka kir³⁷

Temam bû bîst û heşt rojan ku hatin
Gehîştin Teybeê xeyrel emakin³⁸

³⁴ mi gorî: fedayê te bim

³⁵ nehêlabû: nehiştibû, neşikandibû

³⁶ ji jîna ro dinê: ji heyata dinyayê

³⁷ teka kir: ‘effû kir

³⁸ xeyrel emakin(‘e): ciyên bixêrtirîn

33. ĞEZWEYA XENDEQ

Yehûdî dujminê kevnê qedîm in
Jibo Îslamê pur pîsê leîm in¹

Li ðerrê² dînê Îslamê ne daîm
Çewan bo zo³ li ser ðerrê me daîm

Îlahî ger bidî neynûk, nedî wan
Çewan tej wan sitand însaf û wîcdan⁴

Nekêşin gem Xuda dîsa kerîm e
Be hal û heqqê ehlê heq ‘elîm e

Çi ket⁵ hakem ew e, her ew dizanî
Ji bil wî kes be geyba wî nizanî

Dibên piştî Nedîrî qeştîyan⁶ çûn
Li rû erdê ewî mufsîd belav bûn

Di sala çarê hîcret hay li hev dan
Bi hev ra şoz û ehd û hem xeber dan

Ku ew herbê biken ba fexrê ‘alem
Ku da heyfa xwe jê hilden tematem⁷

Çikû anî serê wan yê ku anî
Ji wan ra lew nehêla zindeganî⁸

Ji Xeyber çûne Mekke cem Qureyşan
Ku cem‘a xeyrê xelqê ken perîşan

Li hevdu şewirîn ku em bibin yek
Biçin ser wan ewan bukjin yeka yek

¹ leîm(‘e): kesê zelil û rezil

² ðerr: (‘e) zerar

³ zo: encax

⁴ Haşîye: Çewan tej wan sitand însaf û îman

⁵ çi ket: çi bike

⁶ qeştîyan: qeştîfîn, qewirîn

⁷ tematem: bi temamî, bêkêmanî

⁸ zindeganî(f): heyat

Qureyşî pur fereh bûn şozê wan dan
Kirin teqwîye û ehd û xeber dan

Ji wê çûn qefle qefle qewmê koçer
Digel dêmanîyan⁹ dîtî seraser

Be pût û latê şond xwarin ku yek bin
Di herba ehlê îmanê pulek¹⁰ bin

Temamî deh hezar ‘esker ceva hev
Wekî revdêgerê xûnê bibit dev¹¹

Bi wê şêwr û cevayê bû xeberdar
Resûlullah, cemi’ kir şehbê kubbar

Temamî yek hezar wek şêrê bîşî¹²
Lê her yek deh ji wan nedçûne pêşî

Li hevdu şêwirîn kanî çewan ken
Ku def’a hîle û keydê di wan ken

Meger Selman ji keyd û hîlê Faris
Bibû hîrayê¹³ xendeq beqlê faris

Dema got, ew xweşê wan hat we rabûn
Li tevr û bêr û baylozanê¹⁴ belav bûn

Yekî hilda şevê kuskî¹⁵ yekî dî
Heman kilwan¹⁶ kirin xendeq wî ‘erdî

Ji yalê şerqê ta gerba Medînê
Kirin xendeq jibo seda¹⁷ Medînê

⁹ dêmanî: ehlê niştecî, bicihbûyî

¹⁰ pulek(f): polek, yek firqe

¹¹ wekî refê gurên dev bi xwîn

¹² şêrê bîşî: şêrê şewla

¹³ hîra: hînbûn

¹⁴ bayloz(t): hors, geran

¹⁵ şevê kuskî(‘e): yê kevir pê tê derxistin, qerase

¹⁶ kilwan: kolan

¹⁷ sed(‘e): bend

Dibên peyda bû cîkî hişk û ‘aşê
‘Emil tê nedkira tevê rişaşê¹⁸

Gelek lê xebitîn çare nedîtin
Gelek vê ra cefa û te’bê dîtin

Xeber dane resûlê fexrê ‘alem
Heman zopek¹⁹ hılanî hatî ew dem

Li ser hinkavtê²⁰ şê zopan, belav kir
Ji ber her derbekî birqek xuya kir

Ji ewwel derbê birq avête Şamê
Şukir kir, go wê distînim temamê

Yeka dî Qeşrê Faris tê xuya kir
Şukur miftahê faris min hila kir²¹

Yeka şê birqê avête Yemen va
Birûska çan şeva tarî bi den²² va

Şukur go dê emê bigrin Yemen jî
Nekin şayîşiya²³ te’ba beden jî

Munafiq seh kirin girtin tînazan
Dikenyan pê ewanê fêlberazan²⁴

Digotin va ji tîrsan em newêrin
Ji malê derkevin ma ew çi mêr in

Ku distînin Yemen hem Şam û Faris
Ji tîrsan xendeqê diklon²⁵ fewaris

¹⁸ Haşîye: ‘Emil tê nedkira bêre rişaşê

¹⁹ zopek(t): qutek dar, bi tirkî sopa

²⁰ hinkavt: lê da, lêxist, hingaft

²¹ hila kir: bi dest xist

²² den: reng

²³ şayîş: endîşe

²⁴ fêlberaz: yê weka beraz tevdigere

²⁵ diklon: dikolin

Xulaşê xendeqa wan ku tamam bû
Ji wan ra qûwwet û emn û eman bû

Qureyşan deh hezar ‘esker kişandin
Li yalê di bin xendeq ra weşandin

Nebî jî yek hezar ‘esker hilanî
Be qefle qefle pêşber wan ve danî

Hinan kir newbedarê ser Medînê
Nebî kes hîleke pê de werînê

Bi hev ra ku didan tekbîr û tehlîl
Di dil duşmin tijî dikrane tehwlîl

Ûyeyê Extebê dîndujminê pîs
Li nav xelqê gera teşbîhê îblîs

Qureyzîyan Nebî ra we’de dabûn
Tu caran duşmenî naken em û hûn

Ewî pîsî peşîman kir ewanan
Ûeta ku wan jî bir herba cuwanan

Munafiq dan nîşan bêdînîya xwe
Kirin eşkere tev nevînîya²⁶ xwe

Gelek bû tîrs û xewfa ehlê dînî
Be ser wan da Xuda tehlî neênî

Li ser xendeq cevan, geryan li dorê
Ji kafir kes neşî²⁷ ser da biborê

Ji qewlek rawîyan ku me bihîstin
Xilafa qewlê ku bê vê ve têtin

²⁶ nevînî: dujmintî

²⁷ neşî: nikaribû

Hucûm kir Newfelê Mexzûmê kafir
Ku xeyrê xelqê bukjî pîsê makir

Cerîdek²⁸ da kehilî²⁹ ma çewan bû
Bixwew hespê di xendeq da tera bû³⁰

Şikest ustû geber bû ew di nêv da
Cehennem bû cîhê ew kefte³¹ nêv da

Evî qewlê gerîb digrin jî rawî
Şehîhtirîn niha têtin di dawî

Neborî kes li hev dan wan be tîran
Du sê rojan nebû furset be şîran

Be newbet keşfê dikran da bibînin
Cihê borînê da bên keysê bînin

Nebî jî hey dida şehban qewîfî
Digot jîrhatî bin negrin be sistî

Xudê hisket emê wan berheba ken
Ji ew paş em li hev dû merheba ken

Nebî go şulhê ken da em be wan ra
Biden wan tişteki zivrîn ji pa ra

Hinan go ya Resûlullah çi hal e
Li nik me ev şugul bêşek mehal e

Dema em herdu jî ser baîlê bûn
Mudamî ew li ser wî ‘aqilê bûn

Ku yek heb xurme naken îstîfade
Ji bil ku bêne mîhvanîw ‘îyade³²

²⁸ cerîd(‘e): şiva dara xurmê

²⁹ kehil(‘e): hespê kehêl

³⁰ tera bû: tê wer bû

³¹ kefte: ketê

Niha elhëmdû lillah em ‘ezîz in
Bi tew îman me anînew temîz in

Ji xwe weqtê zelîltîya me borî
Di mabeyna me nîne geyrî şorî

Nebî şa bû we go madem wisane
Qewî bin qeṭ neken sistîw bihane

Bihîstî qaşidê wan çû beyan kir
Dema jê seh kirin çawan ‘eyan kir

Bezîne şûr û hesp û rimḥ û ratib
Li hev haydan hemû cem ‘û mewakib³³

Di xendeq da cîhek ṭengasî dîtin
Ji wê zêde qe îmkanê nedîtin

Di wê ve ‘Emrê ‘Ebdwuddê Hubeyre
Derar û ‘Îkrîme³⁴ borîn li êre

Dibêjin ‘Emrê ‘Ebdûwuddê Zalî
Bibû ‘umrê wî tam nehewête salî³⁵

Gelek ṭirsa wî ser xort û li wan bû
Çikû beṭlek be nav û pehlewan bû

Kişa meydanê mîna filê serxûş
Werin cengê digot wî pîsê kalûş³⁶

Nihêrî kes ku naê pêş muqabil
Dida ṭe’nan ke ey beṭl û muqatil

Dibên cennet heye ka cenneta we
Werin da we bişînim cenneta we

³² ‘îyade(‘e): ziyareta nexweşan

³³ mewakib(‘e): qafîle, kom

³⁴ Dirar b. Xettab û Îkrîme b. Ebû Cehîl

³⁵ ‘umrê wî tam nod salî bû

³⁶ kalûş: celebek gîha, qarûş, bi tirkî domuz ayrığı

‘Elî rabû, Nebî go rûne ‘Emr e
Heta şê car digotê rûne ‘Emr e

Di cara şê ‘Elî go hey bila be
Bila hey ‘Emrê ‘Ebduwudd bila be

Resûlullahî Zulfekarê dayê
Cilê xwe zirhê da û kir dua’yê

‘Elî çû pêş we go ey ‘Emrê ‘Emrê
Mi seh kirye li xwe te kirye nezrê

Ji sê dostînî yek yêkî Qureyşî
Bixwazet dê wisakî tu li pêşî

Belê go rast e, Heyder go wisa be
Were îmanê teb‘ê Muştefa be

Birazê go evê nakem bibêje
Ewê dîtir tu sirra xwe birêje

‘Elî go bizvire xeyr û selamet
Here mala xwe bê xûn û nedamet

Ewî go vê jî nakem lew be zûrî³⁷
Gehiştim vir we hespê min behûrî³⁸

Çiye go bêje yê dîtir, ‘Elî go
Qirîn û herb û şûrhingîv e ha ho³⁹

Kefîr kir qehqehê keyfa xwe anî
Heman şûrê xwe wek agir deranî

Mi bawer nedkira kes vê bibêjî
Li min derdê hinavê xwe birêjî

³⁷ be zûrî: bi zorê

³⁸ behûrî: derbas bû, bihurî

³⁹ ha ho: bi vê şeklî

Bibêje ka kîyû we çi kesî tu
Tu pişmam î, gerîb î, çi ‘esî⁴⁰ tu
‘Elî lawê Ebî Talib ez im go
Di herba kafiran gâlib ez im go
Ewî go hêj terî taze, cuwan î
Gelek heyf î te rakem zindeganî
‘Elî go ez divêm ku her te bukjim
Bi vê şûrê heşîn xûna te bimjim
Gêdeb⁴¹ hatî kire qeşda hucûmê
Ewî le’netîyê ehlê rucûmê⁴²
‘Elî go ez peya me, tu suwar î
Ji hespê da peya bû, hate xwarî
Heman hespê xwe kuşt qeşda ‘Elî kir
Di mîgfer da ewî şûrek bi cî kir
Birîndar kir serî, lê pur neêşa
‘Elî jî Zulfeqarek tê ve kêşa
Ket û mirdarî bû Ellahû Ekber
Be hev ra gotin eşhabê peyember
Ji tekbîran Resûlullahî zanî
Ku Heyder wî nehêla zindeganî
Hemû revyan hevalê wî şedîdî
Dema dîtin ‘Elî kuşt wî pelîdî
Zubeyrî şûrê girt pê wan ve danî
Li Newfel da, kire du şeq we danî

⁴⁰ ‘es: kes, şexis

⁴¹ gēdeb(‘e): hêrs, bîntengî

⁴² ehlê rucûmê(‘e): ehlê recmê, ehlê le’netê

Li her eṭrafê xendeq bû helaket
Ji şinge şinga şûran bû felaket

Ji şubhê ta kete puştî 'îşae
Nerûniştin ji ber herb û gezae

Nimêjê wan ji geyrî şubhê tev çûn
Ji herbê lew beṭal nedbûn we nedbûn

Ḥuyeyê Exṭebî tam bîstî naqe
Hemî bûn barkirî tev da nifaqe

Dibir, yadim dida qewmê Qureyşî
Heman Enşarîyan avête pêşî

Sitendin jê we anîn cem peyember
Resûlullah belav kir wê li 'esker

Bihîstin wan şiyandin nijdevanan
Digeryana be şev bo mal û canan

Resûlullahî nifrîn kir li eḥzab
Ewan bişkîni, nûşretkî li eşhab

Ne'îmê⁴³ eşce'ê şecce'ê mêran
Xuda avête dil gerya musulman

Resûlullahî dît û îzin jê xwest
We go min gêre bo her hîle serbest

Nebî go tu çawan zanî wisa ke
Çiqas hîlan li wan key êdî pake

Heman çu nav Qureyzan go perîşan
Dizanim dê bibin hûn lew Qureyşan

Şibe dê tev biçin lê hûn dimînin
Li nav dest û pîyan de hûn bibînin

⁴³ Nu'eym bîn Mes'ûd

Cihê wan dûr e, wê tev Mekkeê da⁴⁴

Welê yê we jin û zarû di vir da

We jî qûwwet bitin naghêje vana

Wisane rehîn bistînin ji wana

Ji eşrafê di wan heftadê⁴⁵ beţlan

Jibo ku hûn nebînin keyd û fetlan

Welê ev gotina min her liha bit

Hezar tenbe nebe ku eşkera bit

Hemû gotin li ser çehv û serê me

Dizanin em tuyî şîretkerê me

Ji wê çû cem şenadîdê⁴⁶ Qureyşan

Li wan jî hilweşandî hal û hem şan

Ji wan ra got Qureyze poşîman in

Di cem‘a we niha ew bêeman in

Li cem wan bûm şiyandin cem Mûhemmed

Ji nû vê ra dikirna şoz û hem ehd

Ku heftê mêr ji we teslîmî wan ken

Ku bukjin wan Qureyze pê eman ken

We hem çû dît qebîla Ğetefanî

Xeber da çan Qureyşan ra ‘eyanî

Li herdu jî kire tenbe nebêjin

Evî sîrrê ji kes ra hûn nerêjin

Ebû Sufyan şiyand ‘Îkrîme cem wan

Qureyziyan ji wan hildit xeber dan

⁴⁴ Haşîye: Cihê wan dûr e, wê nav Mekkeê da

⁴⁵ heftadê(f): heftê

⁴⁶ şenadîd(‘e): giregir, mezin

Ji wan ra got dizan malê me dûr e
Li vir bo me nemaye qeṭ ‘ebore⁴⁷

Şeva şenbe⁴⁸ ye tev rabin suwar bin
Li herba Qîleyan em kar û bar bin

Cewab dan gotinê emma duşenbe
Nekin herbe li ser me bûye tenbe

Çewan hûn jî dizanin lê wekî dî
Diken em lê heye me şertekî dî

Ku hûn rehîn me ken heftê reîsan
Sebeb bin ku jibo hîlew desîsan⁴⁹

Qesem wellahî go rast e Ne‘îmî
Çi got bê şubhe ye qewlê ze‘îmî⁵⁰

Xulaşê bû xilaf û bû dubendî
Xuda jê rađî çan çêkir vê fendî

Xuda jî pur li wan kir zehmet û zor
Li wan rakir ji nageh ba û bahor

Çewan ba bû wekî baê qiyamet
Nedîbû kes wisan tiştê ‘elamet

Ji erde hildida kevrana û daran
Dihilşanda hemû kelh û hîşaran

Digel wî qasî pur tarî şeva reş
Gelek serma jî bû ser taliê’ reş⁵¹

Resûlullah Hûzeyfe şand be casûs
Binêrit çan dikin ew qewmê salûs

⁴⁷ ‘ebor(‘e): debarî, îdara heyatê

⁴⁸ şenbe: sebt

⁴⁹ Haşîye: Bibin rafi’ jibo hîlew desîsan

⁵⁰ ze‘îm(‘e): lîder, reîs

⁵¹ taliê’(‘e) reş: bextê reş

Welê hişyar be go tiştekek nekî tu
Nebêjî tiştekekî dengê nekî tu

Diçî nav wan ji medhûşî⁵² nenasîn
We ger çî domedarê wan hûrasîn⁵³

Guhê xwe da xebardana di wana
Jibo bibhîz hemû şêwrê di wana

Ebû Sufyan dibê her kes benasîn
Hevalê xwe we baken hev ku nasîn

Ûzeyfe gazî wan kir da nefehmin
Ewî negrin we nekjun qewmê dujmin

Ebû Sufyan digota ev ne baye
Jibo me barber⁵⁴ û xwarin nemaye

Qureyzî jî ji me xwe dane pa ra
Ji ba û şermê jî nakek mudara⁵⁵

Heman bar ken welê komêk bimînîn
Qilawûz bîn giranî hilkişînîn

Şiyar bin seh nekin casûsê wana
Çikû halê bizanin tîn hemana

Ûzeyfe go mi şoz dabû nikarî
Ku tîrek dem⁵⁶ li pêncengan di tarî

Hinek man newbedar û yê dî kêşan
Ji tîrsan û ji ber ba û direvyan

Dema seh kir qebîla Gêttêfanî
Evî qewlê Bûsufyanê nihanî

⁵² medhûşî(‘e): dehşetê

⁵³ hûrasîn(‘e): dinêrew di‘elime

⁵⁴ barber: deveya mê ya bar

⁵⁵ mudara(‘e): tevgera weka dostanî

⁵⁶ dem: bidim, bavêjim

Heman rabûn we bar kîrn û be lez çûn
Revîn erdê xwe ma ew çankî dajon⁵⁷

Hinan gotin Muḥemmed sîhrebaz e
Xilaş ken xwe, çî we herb û çî saz e

Xulaşev tev revîn û çûn nema kes
Di şev da, lê ji wan nedhate qeṭ hes

Ḥuzeyfe hate û got fexrê ‘alem
Revîna wan û wê fîrsa mu‘ezzem

Resûlullah gelek şabû sena kir
Li wî ḥalê gelek şukrê Xuda kir

We got êdî nema ew bêne herbê
Ji vir paş em diçen ser wan be herbê

Ji wan şê ten bi tin⁵⁸ hatibû kuştin
Ji Îslamê jî şeş hatibû kuştin

⁵⁷ çankî dajon: çawa dibezînin

⁵⁸ şê ten bi tin: sê kes bi tenê

34. ĞEZWEYA BENÎ QUREYZE

Yehûdanê Qureyzîyyê di bêbext
Nebî ra ehdê tam dabûn û hem bext

Eger dunya tamam vê ra neyarî
Biken jî ew neken qeṭ ğeyrî yarî

Di herba xendeqê dabûn peşîman
Çewan borî ji eḫwalê leîman

Çewan rûnişt Nebî bo îstîrahet
Di ‘eynî rojê ku xendeq bû raḫet

Heman Cîbrîlî hat û şaşekî reş
Li ser gerdan û pur heşşaş¹ û dilgeş²

Çi seknî ya Resûlullahî rabe
Jibo herba Qureyzîyyan de rabe

Melaîk em diçin ser gotî Cebrîl
Tu jî ‘esker hilîne wer be te’cîl

Ji nageh çûn kirin pur toz û duman
Ji her kes va ‘eyan bû tozê pêy wan

Bîlalî girte gazî û nîdaê
Musulmanan werin herb û ğezaê

Be lez top bin gelî cundîw rewalan
Biçin herba yehûdê bedsekalan³

Werin qurban werin heyran li vê dî
Nimêja ‘eşrê dê ken em li wê dî

Çek û ratib heman gerdan û hatin
Di ‘eynî lehze da tev lê cevatin

¹ heşşaş(‘e): şên û bicoş

² Haşîye: Li ser gerdan û pur heşşaş û gulgeş

³ bedsekal(f): yê mêtîna wî xerab

Resûlullah suwar bû wan li pê kir
Temamî şê hezar ‘esker li rê kir

‘Elî beyraq di dest bû çû di pêşî
Gehişte kelha wan beşlê Qureysî

Çikand beyraqê ber tilma kelê da
Qureyzî mane tev nêva kelê da

Didan dujminî nalaîq Nebî ra
‘Elî seh kir we çû gote Nebî ra

Nebî go ey gelî exwanê meymûn
Gelo têr bûne rusway û rezîl hûn

Didin dijminîw hêjan hûn neyar in
Kirin înkâr û vê ra şondê xwarin

Nebî wan bîst û penc roj xist heşarê
Ji bêhêvîti ketne zarezarê

Reîsê wanî Ke’bî gazîyî wan
Kir û go em xelaş nabin ji dest wan

Ji şê tiştan yekî ken îxtîyarî
Jibo ku dûr biken her ‘eyb û ‘arî

Ewe yek hûn dizanin ew resûl e
Ku pê îmanê bînin ew qebûl e

Eger nebya heşed îman we tanî
Bi wî qeṭ‘a we nedgirta tewanî⁴

Biterkînin evê fikr û ‘înadê
Nebin ba‘îş⁵ jibo fitnew fesadê

⁴ tewanî: ketin û rezîlî

⁵ ba‘îş(‘e): yê dibe sebeb

We dî lawê Xiraşî tenbe da we
Ku dê peygemberek ser dewleta we

Heman dê bê be wî îmanê bînin
Ku hûn poşmanîyê eşla nebînin

Ewan go em ji ser dînê xwe naçin
Welew em tev di korayê ve da çin

Yeka dî ku qetlê ken ma weraê⁶
Bikêşin şûr û derkevne gezaê

Kesê kuştî dilê wî paş nemîne
Kesê ma sağ dika⁷ dîsa jî bîne

Ewan go puştî ewladîw ‘îyalan
Ne baş e ‘eyş⁸ û sağiya rîcalan

Ewê dîtir ew e ku hûn qebûl ken
Şeva yekşenbe ye îşev xwe xûl⁹ ken

Bikevne herb û hîlew keydê wana
Ji me îşev emîn in çimkî wana

Bibînin belkî hûn jî furşeta xwe
Bixin destê xwe taze şewketa xwe

Ewan go ev jî qet‘a bo me nabe
Çikû îro te‘edda¹⁰ pur xerab e

Çikû ew mazinê berya me dabûn
Jibo vê rojê bûn xinzîr û meymûn

Ewê go madem ev naên mezacê¹¹
We ew maye qebûl ken hûn xeracê

⁶ ma werae(‘e): jibo yên li paş hiştine

⁷ dika: dikare

⁸ ‘eyş(‘e): debara heyatê

⁹ xûl: xwarkirin, tewandin

¹⁰ te‘edda(‘e): êrîş

Ewan got ku ke¹² me rakin we naken
Heman bêminnet in çid ken bila ken

Ewî jî got şerîkê we nebûme
Xweyê bêbextîya wan ez nebûme

Ji cem wan derket û rabû revî çû
Wefayî kir ji lew karê revî çû

Nihêrîn feyde nake mane mecbûr
Ji herbê dest kişandin ehlê zencûr¹³

Resûlullah be hev va wan girê da
Dikir çavnêrî emrek ji Xudê da

Temamî şeş şedê ehlê sîlahê
Hezar zar û jin û ehlê necahê¹⁴

Jin û zaran ji kelhê ku deranîn
Li ber wan newbedarek qencê danîn

Bezîn Ewsî be lez hatin ricaê
Dikin çimkî bi me ew îrtîcaê

Çewan te Qeynûqa‘an dabû Xezrec
Heta çûn û ji vir derbûne mexrec

Be wê terzê evana jî ‘effûke
Me jî nava hevalan da be rûke

Nebî raqî nebû lê gote Ewsî
Bila hukim biket yêkî ji Ewsî

Hemû gotin mezin Se‘dê Me‘az e
Çi re’yê dît bila ew wê bixwaze

¹¹ mezac(‘e): yekbûn

¹² ke: eger

¹³ zencûr(f): di haşiyeya ‘erebî de bi me’na silsîla kûçikan

¹⁴ necah(‘e): xelasî

Birîndar e ewî nava nivînan
Ji herba Xendeqê derba nivînan

Ji peygember îzin xwest û hukum kir
Serî lêxistina hemyan hukum kir

Hemana xendeqê kolan di wê da
Serê wan jê kirin avêne tê da

Huyeyê Extebê dîndujmenê pîs
Li nav wan bû reîsê cundê îblîs

Nebî go ey ‘edûwellah tu hatî
Kete pencê ‘îqaba me ku hatî

‘Edûwî got belê emma ne ‘ar e
We duşmanî jî hêj germ e, ne sar e

Qeşabê wan Zubeyr û hem ‘Elî bûn
Du şêrê rebbê ‘alem pur celî¹⁵ bûn

Dilê Se’de Mu‘azî pur be geş bû
We ger çendî birîndar û nexweş bû

Li ber çehvê xwe dî vê neşrê¹⁶ hanê
Nema derd û kulê wî çû cînanê¹⁷

¹⁵ celî(‘e): eşkere

¹⁶ neşr(‘e): alîkarîya Xweda

¹⁷ cînan(‘e): cennet

35. ĞEZWEYA BENÎ LEĦYAN

Sebeb qetla quraan¹ der Recîê'

Jibo wê gedr û bêbextî wecîê'²

Nebî meħzûnî bû xeydî ji LeĦyan

Be xef 'esker kir û kişya li ser wan

Reha Şamê nîşanda wî be zahir

Welê 'esker be ser LeĦyaniyan bir

Benû LeĦyan revîn gava bihîstin

Xulaşê herbê vê carê nedîtin

Selamet fetilîn hatin Medînê

Di dil kuffarê tîrsa wan dimînê

¹ qura('e): xwendekarê Qur'anê

² wecî'('e): izdirab, êşdar

36. ĞEZWEYA ĞABEH

Resûlullah hebû wî naqe ‘îşrîn¹
Di Ğabew Zîqîrad da xweş diçêrîn

Ebûzerî didota şîrê tanî
‘Uyeyne² wan kire talan hilanî

Kurê Bûzerî jî kuşt û jina wî
Kire yexsîr û bir, lê dawîya wî

Hewar hat go Resûlullah hewar e
‘Uyeyne deveê te kir îğare³

Resûlullah û panşed ‘eskerê xwe
Heman rabûn we dan ser wan berê xwe

Di pêşî da şiyand Mîqdadê Kendî
Tevî çendan ku engel ken wê cerdî⁴

Ûeta ‘esker li pê bên biğhêjînin
Berê talan be zorê bizîvrînin

Dibêjin lawê Ekwe⁵ bû peyayê
Wekî başûk diçû kes nedgihayê

Dibezya û diket berya kiğêlan⁶
Difîrya deşt û banî, gaz û bêlan⁷

Be tîran davête duşmen difetland
Dikuşta ew kesê ku wî diqefland

Gelîkî⁸ tengî da çûn reh⁹ nedanê
Heman derket çiya û gaz û banê

¹ bîst deveyên mê

² ‘Uyeyne b. Hisn

³ îğare(‘e): talan, êriş

⁴ cerd(‘e): talan, êriş

⁵ Seleme b. Ekwa’

⁶ kiğêl: hespê ‘esîl û rewan

⁷ gaz û bêl: girik

Be pangoran¹⁰ li wan da û be tîran
Heta wan kir wekî halê esîran

Ji wan talan sitandî, hane¹¹ kuştin
Revîn yê dî we kurkê xwe dihiştin

Ji sîh kurk û ji sîh rumhan jî purtir
Li rê avêtin û çûn qewmê kafir

Heta ketne gelîkî tengî bêdar
‘Uyeyne hat gehište wan bo îmdad¹²

Kurê Ekwe’ ewî beqlê muqatil
Xwe da serdestê wana pêş muqabil

‘Uyeyne got kîye derketye jorê
Ewan got ma ew e daye me zorê

Hemana çar ji wan pê ve virê kir
Kurê Ekwe’ li xwe nav da xwe çê kir

Hemû fetlîn revîn paş ve nişûvî¹³
Çewan şîr¹⁴ berde çîyek qefle rûvî

Li wê rûnişt heta îmdadê hatin
Resûlullah û şehban pê gihatin

Kurê Ekwe’ ji peygember rica kir
Gelek medh û dua’yê Muştefa kir

Îzin de ku xwe ra şed mêr hilînim
Biçim talan û terşê wan jî bînim

⁸ gelî: newal

⁹ reh: rê

¹⁰ pangor: kevirên grover

¹¹ hane: hinek

¹² Di beytê de qafiyê li hev nakin. Dibe ku şûna “îmdad” “hawar” be.

¹³ nişûv: berjêr

¹⁴ şîr(f): şêr

Resûlullah nehişt gote serê wan
Hemû kuşt û te da pa ra berê wan

Te talan jê sitand îdî çî maye
Li ser me ev hemî feđla Xuda ye

37. ĞEZWEYA ĞUDEYBÎYE YANÎ ŞULĞA WÊ

Şevêk mîna şevê şêrîn û şalî¹
Nivîstîbû Nebîyyê fexrê alî

Guh û çehvê di însanî di xew da
Li ‘erşan rûh û qelbê wî cilew da²

Neken zenna ku razî³ bêguman e
Welê razayî behter ba guman e

Ğicaba ‘alemê razayî nîne
Jibo ra her be tecrîdê dibîne

Bila wasîte, emrê rebbê ‘alem
We hem seyrê diket der her me‘alem⁴

Di xew da dît ku çû Beytul Ğeramê
Li dorê kir tewaf û îstîlamê

Digel şehban emîn û bê munazi⁵
Dikirna ‘umre bê tîrs û mewani⁶

Şiyar bû pur geş û hem pur fereh bû
Bi wê ruyayê pur dil munşerîh bû

Çikû xewnê nebîyan wehyê heqq e
Xilafa wê xilafa rahê heqq e

¹ şalî: roja sêşembê

² cilew(‘e) da: cila bû, ronî bû

³ razî: razayî

⁴ me‘alem(‘e): emare, piraniya nişan

⁵ munazi’(‘e): niqaş, gengeşî

⁶ mewani’(‘e): piraniya mani’, astengan

Emir kir go sefer ken ha sefer ken
Jibo ‘umre be bal Mekke sefer ken

Hezar û çar şed eşhabê kîramî
Ji e’rab û xwedî cî bûn tamamî

Hemî şûran kirin barê devan da
Nebû qeşda qîtalê fikrê wan da

Gihane Zîlhuleyfe fexrê alî
Şiyand casûsekî teftîşê halî

Li wê naqey di qurbanê nîşan kir
Jibo ku kifşe bin wana ‘eyan kir

Qureyşîyyan ku seh kir bûn cewa bûn
Li ser fikra şerr û men ‘û cefa bûn

Kişa pêşî be tedbîr û tedarek
Reha Mekke li wan girtin be carek

Dema qaşid vegerya vê beyan kir
Nebî seknî we şêwra xwe be wan kir

Hinan go tu çewan zanî wisa ke
Hinan jî go neperwayê bi wan ke

Nebî go dê tewekkeltû ‘elellah
Biçin em jî be teb‘a îsmê Allah

Çi qasek çûn Nebî go vaye Xalid
Filan ceh⁷ da bûye did⁸ û mu‘anid

Guhastin⁹ reh ji ser, lê wî ewan dî
Kişa pêşî çewan ku wî ewan dî

⁷ ceh: cî

⁸ did(‘e): zid, dijî

⁹ guhastin: guherandin

Kete nêv hindî wan û qibleê da
Şehaban şef girê dan yalê wan da

Nimêj dikran ‘edûwê wan muqabil
Nimêja xewfê belkî bûn muqatil

Resûlullah muretteb kir¹⁰ du şeffan
Teħerrum¹¹ vê re girtin herdu şeffan

Şefek vê ra diçû secdê we yê dî¹²
Wegirtin hers¹³ û newbet paşî yê dî

Nimêj kirn û berê xwe dane meqsed
Be emrê fexrê ‘alem şahê emced

Ketin rê zend û bendan hildimiştin¹⁴
Senîya¹⁵ ser Hudeybîye gehiştin

Deva Quşwa Resûlullah suwarê¹⁶
Ji nageh razîya berda xwe xwarê

Kirin helhel we qîr danê, nerabû
Çikû ew girtiyê emrê Xuda bû

Nebî zanî ku ev emrê Xuda ye
Ne ku seknandina wê ba xwe da¹⁷ ye

Qesem kir go çi tiştê ew bixwazin
Ji te’đîma¹⁸ Herem dê kem¹⁹ ne gazin

Ji heqqê ‘eqreatî qencî başî
Di mabeyna min û qewmê Qureysî

¹⁰ muretteb(‘e) kir: xist nîzamê, tertîb kir

¹¹ Teħerrum(‘e): hurmet

¹² Haşîye: Şefek vê ra diçûn secdê we yê dî

¹³ hers(‘e): nobet, mihafiztî

¹⁴ hildiştin: hilkirin, qatkirin

¹⁵ senî(‘e): cîyê kaş û girikê nizm

¹⁶ suwarê: lê suwar bûye

¹⁷ ba xwe da: ji ber xwe ve

¹⁸ te’đîm(‘e): hurmet, te’zîm

¹⁹ kem: bikim

Eger çi zehmet û zor û cefa bit
Eger weqfa riça emrê Xuda bit

Dema vê got deve rabû bi rê ket
Bihûrî paşiya Hudeybiyê ket

Emir da go li vir der em peya bin
Şehaban gotinê dê çan peya bin

Di bî'rê av tunîne em bikêşin
Ji tenhan²⁰ pur emê zehmet bikêşin

Nebî tîrek ji kêsek ve deranî
Çikande bî'rê û bû şubhê kanî

Heman bû av û lîlav û kişandin
Ji kêmasî ewan ned êvişandin²¹

Bedîlê lawê Werqaê Xuza'î²²
Tevî hindek Xuza'î bûne sa'î²³

Gihane cem peyember, lê xeber dan
Bedîlî got te xêr e şahê merdan

Jibo herbê qe tedbîra te nîne
Qureyşî pêşîya te sekinîne

Be tedbîr û sîlah û pur giranî
Behev ra dane her 'ehd û emanî

Kesek sistî nekej herb û gezayê
Behev ra wer²⁴ hemî biçne fenayê

Nebî go meqşeda me ne geza ye
Welê meqşed me her beyta Xuda ye

²⁰ tenhan: tînbûnê

²¹ êvişandin: teksîrkin

²² Budeyl b. Werqa'

²³ sa'î('e): xebirgihan

²⁴ wer: eger

Emê ‘umre biken pa ra bifetlin
Heman bê zor û te’dayî bifetlin

Bibêje wan nihanî ew ze‘îf in
Bila bîhna xwe den²⁵ hêjan nehiîf in²⁶

Ji mabeyna me û xelqê be der bin
Heta quwwet hilînin muqtedîr bin

Ji ew paş ger bi min îmanê anîn
Ji xwe qenc e şeref bo xwe hılanîn

We ger ne, taze em daxin qirînê
Xuda dûr ket kesek êdî nebînê

Bedîlê lawê Werqa mêrê ‘aqil
Ji wê çû cem Qureyşan pêş muqabil

Ewan top kir ji wan ra kir hewalê
Hinan gotin neêtin ba tu halê²⁷

Welê ‘Urwe kurê Mes‘ûdî rabû
Be wan ra pur xeber da keft û rabû

Xulaşê got Muhemmed ez bibînim
Ji wî seh kem xeberdan bo we bînim

Resûlullahî dî, vê ra xeber da
Bedîlî çî cewabê wî jî ew da

Meger ‘Urwe digotî ger tu galib
Bibî, bistînî her kuçe be ratib

Ji bin qirkî hemî ‘erqê²⁸ Qureyşan
Ji ta nelaîq e ew hal û ew şan

²⁵ den: deynin

²⁶ nehiîf(‘e): ze‘îf

²⁷ neêtin ba tu halê: li cem wî tu rewşê nebêjin

²⁸ ‘erq(‘e): ‘irq, qebîle

We ger ghalib bibin wana li ser te
Hevalê te birevin tev ji cem te

Çikû her yek ji yek qewmê gerîb in
Ne pismam in li ber hev ku bicî bin

Heman Şiddîqê Ekber çêrî wî kir
Xeber gotî we hem tekzîbê wî kir

Qesem go terkê naken ta fena bin
Ji vê hubbû we te'zîmê fena bin

Mugeyre yek ji şehban lawê Şeybe
Kurê Mes'ûdî ku mamê wî 'Urwe

Li cem peygember e, şûrê xwe hilda
Zirih wergirt we hat seknê be ser da

Tekellum 'Urwe ku dikra be carek
Dilîsta hey bi lihye²⁹ wî mubarek

Mugeyre men'ê dikra, nedihîştâ
Ku te'zîma Nebî nebya dikuştâ

Kî ye go ev, Nebî go ew Mugeyre
Kurê Şeybe birayê te ne geyr e

Nihêrî şehbê dî jî tev wisa nin
Muftî'ê wî be rûh û hem be can in

Wisa hürmet ji 'eqil êdî der bû
Çikû paşa nebû, xeyrul beşer bû

Heman çû gote salarê Qureyşan
Qesem hûn herbê ken, dê bin perîşan

Ne Qeyşer ne Muqewqis ne kesî dî
Nika wî hukmê ket³⁰ ku min li wî dî

²⁹ lihye('e): rî

Hemî eşhabê wî der emrê wî ne
Di emrê wî Ellah, van sekê sîne³¹

Ûeta qir bin jî nahêlin qe tēhlî
Be ser da bêl û mekrûhîw necehlî

Be ya min kin gelî qewmê Qureyşî
Xwe den alî be camêrî ji pêşî

Bila ‘umra xwe ken, naken xerabî
Li pê xwe bizvirin tiştek jî nabî

Qebûl nekrin hilanî ‘Urwe yê xwe
Ji qewmê xwe we da Taîf berê xwe

Ûuleysê ‘Elqeme reysê ehabîş
Serê xwe hilda go dê ez herme pêş³²

Bibînim dê Muħemmed ra xeber dem
Jibo derdê we dermanek beser dem

Dema çû deveê qurbanê wan dî
We seh kir dengekî “Lebbeyk” ji wê dî

Te‘eccub kir di çav da qencî rûnişt
Kire tesbîh û ahîna xwe rahişt

Çewan dûrî gerîb heccê bibînit
Kurê ‘Ebdulmuṭṭelîb jî bimînit

Qureyşî dê hemû biçne delalê
Bimînin ger mişir³³ ser vê xeyalê

Dema çû gote wan vanê di hanî³⁴
Ewan gotî tu ‘erab î, nezan î

³⁰ Nika wî hukmê ket: nikare li wî hukum bike

³¹ van sekê sîne: sîn, zîrweya çiya ye; li gorî haşiyeya ‘erebî pêgirtî

³² haşîye: Ji cî rabû we go dê ez herme pêş

³³ mişir(‘e): israr

Huleysî go qesem ger men‘ê wan ken
Ji beytê her ez û qewmê xwe naken

Ez û qewmê xwe paş ve çîn hemana
Be halê hev dizanin hûn û wana

Bisekne gotinê hetta ku çêken
Em û wan ‘îş û mabeyna xwe çêken

Xiraşî qaşidê peyğemberê me
Suwar bû ser deva wî serwerê me

Be bal wan ve Resûlullah hinarî
Biterkînin go vê şarî û ‘arî

Kurê Bûcehlî wî girt û deva wî
Li wê serjê kir û hat bukujî wî

Ehabîşan nehiştin jê sitandin
Be ‘îzzet wî li cem xwe rûnihandin

Ewî berdan şiyandin cem peyember
Hewalî xwe ewî tev gote serwer

Suheylê ‘Amirê ew beqlê ‘aqil
Şiyandin cem Resûlullah muqabil

Mijûl dibya be camêrî gelek baş
Fihêt dikra ji galegalê ew baş

Xeberdar kir Resûlullah ji halê
Xiraşî hem jî kir tefsîlê halê

Di mabeynê diçûyû hem dihata
Digot qencî ji çî alî bihata

³⁴ hanî: li gorî haşiyeyê Qureyşî

Ĥeta ku ŝulhê bû ‘umre bimînê
Bila paŝî qeđa ken sale dînê³⁵

Resûlullah ŝiyand ‘Usmanê ‘Effan
Be mektûbek tevî deh mêrê cem wan

Ku herb û kuŝtinî meqŝed me nîne
Here go Mekke muminan bibîne

Di dil wan xweŝ bike ku çendî pê da
Ewê serbest bibin nêv Mekkeê da

Ĥeta ŝê roj direng bû ma li we’ dî
Xeber gerya ku wan kuŝtin li wê dî

Resûlullah ŝeĥaban topî hev kir
Di mabeyna xwe û wan ‘ehdê çêkir

Yeka yek hatin û destê wî girtin
Bi wî bey‘et kirin ta bêne kuŝtin

Neken terka wî û ser dînê wî bin
Muŝî‘ê emr û fermana di wî bin

Ĥeta ku bêne kuŝtin yan fetih ken
Be wechek yan be wan ra bèn ŝulih ken

Li ser destê xweê çep rastê danî
Eva jî go ji ber ‘Usmanî vanî

Dizanî lew yeqîn saĝ û selîm e
Xeberdarê ji mewlayê ‘Elîm e

Li bin darê kirin vê bey‘eta ha
Dibêjin “Bey‘eta Riđwan” evê ha

Hezar û çar ŝedî bey‘et kirine
Resûlullahî go tev cennetî ne

³⁵ qeđa ken sale dînê: qeza bikin sala dinê

Heman weqtê Suheyli hate şulhê
Temam bû, şulh û şert kir wî, di şulhê

Ûeta deh salê herba me nebêtin
Bifetlînê kesê ba te ve bêtin

Ji me, em jî bifetlînin kesê te³⁶
Ji te poşman bibî bêtin ji cem te

Resûlullah qebûl kir gotî baş e
Yeqîn dikra ku wan meqşed belaş e

Nebî got ey ‘Elî binvîse kağid
Bila rabin ji mabeynê mefasid

Di ewwel kağidê besmele danî
Muhemmedur Resûlullah jî danî

Suheyli got nizanîm wî tu nenvîs
Dizanim Bîsmîkellahumme binvîs

Bizanim ger Resûl î tu be tehqîq
Jibo te dê bikem tehsîn û teşdîq

Xerab ke navê xwe babê xwe dane
‘Elî go qeş ne îmkan e, çewane

Nebî gotî xerab ke, go e nakem
Nebî go kîj kî ye dê ez xerab kem

Xerab kir gotî ‘eynê de’wîya te
Be mecbûrî ewê bê pêşîya te

Îşaret kir be yal Weq‘a Şeffînê³⁷
Eger nemrim Xuda hez ket dibînê

³⁶ Li gorî şertnameya dîrokî divê “nefetlînin” bihata nivîsandin

³⁷ Cenabê pêxember îşaret dike ku wê Hz. ‘Elî jî, di herba Siffînê de şertên lihevkerinê qebûl bike.

Xulaşê wî nivîsî çan digota
Suheyl û fikrê bêhûde firota

Du nusxe çêkirin da ku yekî wî
Bimîne cem Nebîw ba wan yekî dî

Ne raqî bûn bi wî şertî şehabe
Dizanîna jibo wan ra xirab e

‘Umer go ya Resûlullah jibo çî
Qebûl ken vê nerindayî jibo çî

Ji wan vekşin we dîne heqqî yê me
Hem şertê gotina wan bit ne yê me

Nebî got hûn biseknin hûn nezanin
Di paş weqtê eva tev derrê³⁸ wan in

Xulaşê serjê kir qurban û kur kir
Serê xwew cumle şehban jî wisan kir

Ji wê fetlîn û hatin Teybeya xwe
Dikirna întîzara we’deya xwe

Dihatin xelq û pur îmanê tanîn
Di eşnaa ku sulhê bêne danîn

Heqîqet fethekî mazin eva bû
Li ser kuffarê, purtir ev cefa bû

Di mabeyna du salan zêdetir bûn
Ji mîqdarê tamamîw pêşîtir bûn

Ji geyrî fexrê ‘alem sirrê hanê
Nezanîna we wî nedkir beyanê

Ebû Beşîr³⁹ hebû nêv Mekkeê da
Musulman bû hebis kir bûn di wê da

³⁸ derr: (‘e) zerar, xisar

Ji wê derket revî qeşda Nebî kir
 Gehişte Țeybe îltîca be wî kir

 Ji ‘Amir yek digel ‘ebdek şiyandin
 Ku wî bînin we mektûb jî şiyandin

 Ku şertê me ew e yê me biden me
 Li me gêdrê neken ka merîyê⁴⁰ me

 Ebû Beşîr kete zar û fiğanê
 Digot encax li vir ketme emanê

 Eger ku ez biçim dê fitne çêken
 Di dînê min dişirsim bid‘e têken

 Şehabe tev ketin zar û ricaê
 Şefa‘et pur kirin, fayde nedaê

 Nebî got ez li ser ‘ehda berê me
 Xudayê wan be halê wan ‘elîm e

 Muheqqeq dê ji wan ra rê bibînit
 Ji tengasî ewana dê derînit

 Ewî teslîmî wan kir wan birin wî
 Şehabe bûne gemgîn pur jibo wî

 Gehiştin Zuhûleyfe bîhnekî dan
 Siha dîwarekî seknîn xeber dan

 Ewî kafir gelek peşnîw xeber da
 Hebû lahorekî⁴¹ xaliş di ber da

 Digota dê ji eşhabê Muhemmed
 Gelek bukjim bi vî şûrê muhedded⁴²

³⁹ Di haşîyeya ‘Erebî de tê gotin: Ew Îbnî Cabanê Kurdîyê sehabî ye û kurd bi wî û bi kurê wî îftixar dikin. Çewa ku di tercema Şerefnamê de derbas dibe.

⁴⁰ merî: meriv, xwedî û dost

⁴¹ lahor: şûrê lahorî

Ebû Beşîrî go kanî çî şîr e

Deranî dayê go ca lê binêre

Nihêrîw yek hewalê pişt sitû kir

Di ber laşî serê wî jê hilû kir⁴³

Revî ‘ebdê digel wî ew li pê çû

Neqefland wî heta nav Teybeê çû

Resûlullahî dî ku ew çewan tê

Xiraxir xistiye kevrê çiyar tê

Nihêrî ku Ebû Beşîr li pê ye

Di dest da şûrê tazî tê ji wê ye

Heman hat û selam kir ser peyember

We got ya xeyrê xelqî te mi kir der

Te ‘ehda xwe bi cî anî welêkin

Xuda jî xweş li hev anî jibo min

Eva teslîmî te eşyaê kafîr

Nebî go tev ji ta⁴⁴ dîsa jî bizvir

Be keyfa xwe biger çawan dizanî

Ji Teybe derkeve êdî tu zanî

Ji wê çû ser reha Şamê bo nijde

Jibo peşmurdeyan⁴⁵ bo qencê mujde

Musulmanê di Mekke ku dihiştin

Di hebsê hatin û tev pê gehiştin

Ebû Cendel tevî heftê suwaran

Gehiştin Bûbeşîr mêrê hewaran

⁴² muhedded(‘e): tûj

⁴³ hilû kir: jê kir

⁴⁴ tev ji ta: tev ji te re

⁴⁵ peşmurde(f): belavbûyî, perîşan

Xulaşê sê şedê wana tamam bûn
Hemî şatîr⁴⁶ ciwan û pehlewan bûn

Qureyşîkî biqeflandan dikuştin
Dişêlandin xwe ra malê dihiştin

Qureyşî ketin têngasî melûl bûn
Ji mecbûrî jî daxwazê Resûl bûn

Ji wî şertê xwe gotin em peşîman
Peşîman in peşîman in peşîman

Kesê cem te ku bê ba me biden te
Ji yê me hate cem te ew jî bo te

Dizanînaw didîtin hal fena ye
Xuda lewra li tayê Muştefa ye

Nebî mektûb hinara go bila bên
Xuda çê kir we baş çê kir bila bên

Dema mektûbê danê ew nexweş bû
Di nez‘a mewtê lê pur pê be geş bû

Heman maçî kir û ser çehvê danî
Nihayet kir hemana zindeganî

Di dest da bû kîtaba fexrê ‘alem
Dixwenda, rebbî ferde ‘enhû werhem⁴⁷

Îlahî şubhê barana biharê
Li ser qebra wî rehîma te bibarê

Xwedî par bî ji rehmeta Qedîrî
Kesê xwend fatîhe bo Bûbeşîrî

⁴⁶ şatîr(‘e): mahîr, zekî, bikêr

⁴⁷ Xuda jê razî be û lê merhemet bike

Çikû celd⁴⁸ û şecî‘û mêmê çê bû
Bi wî pur karê Îslamê jî çê bû

Ebû Cendel ewî şuşt û hilanî
Defin kir wî di wê erd û mekanî

Li bal qebra wî mizgeftê bîna kir
Li ser jî xwend û pur jê ra du‘a kir

Ji ew paşî hemî zîr û zeber bûn
Kirin vala riha ku ew li ser bûn

Qureyşî çûne karwanî be serbest
Kesek bacê⁴⁹ êdî ji wana nedxwest

Şehabe taze zanîn ku eva bû
Ku re‘ya qencê her cem Muştefa bû

⁴⁸ celd(‘e): saxlem

⁴⁹ bac: beş, wergî

38. ĞEZWEYA XEYBER

Dema şulha Hudeybiye tamam kir
Meh û nîvek Medînê da ‘îqam kir

Heman rojek emir kir ku rehîle¹
Me û Xeyber digel hev qal û qîle

Yehûdî tev li wê cevyane ser hev
Belav ken em ewan derxin ji ber hev

Kevin da çimkî duşman û neyar in
Di wê da jî xweyê kelh û hîşar in

Heman top bûn di gavê da geđenfer
Hezar û şeş sed ez erkan û serwer

Kişane nêzî Xeyber îstîrahet
Kirin hetta ku bû şubha se‘adet

Nimêja şubhê kirn û çûne ser wan
Kîşandin şef muqabil kelhê ber wan

Yehûdî derketin biçne xebatê
Çi binhêrin wekî aşîde² va tê

Dema dorê di kelhan bûye ‘esker
Wekî daçe³ ji ber wan erdê Xeyber

Li hev hay dan ku vaye hat Mûhemmed
Derê kelhan bikêşin da bibit sed

Di mabeyna jin û zar û ewan da
Nebit mekrûhekî bêtin be wan da

Li ber hev em biseknin hêdî hêdî
Li hev xen, pehlewanî ken li vê dî

¹ rehîl(‘e): derketina rê

² aşîde: şape, çix

³ daçe: diçe, diherike

Resûlullah giha kelha Niţatê
Li ser pur kir muhîm cem ‘û cevâtê

Cihê fexra rîsalet bû muqabil
Ji kelhê va dîyar bû şahê ‘adil

Ji wê va tîr ku davêtin leîman
Meger dighiştta cayê wan kerîman

Hebabê Mûnzîrî go vir neçê ye
Çikû pur bê fesal e, naverê ye

Ji wê çûn pişt zinarek kirne qişle
Heta neghêje wan tîrê di sufle

Bîna kir mescîdê bona ‘îbadet
Di her cî da bi wê qasî bû ‘adet

Emir kir go qeţî’ ken darê xurme
Jibo belkî zelîl bin zû li ber me

Birîn miqdarekî fayde nedîtin
Birînê terkî dan fayde we⁴ dîtin

Ku hilden zend û bendê sistîya xwe
Bikevne herb û pehlewaniya xwe

Heman avêtine kelhan be tîran
Ji kelhan jî dihata şubhê baran

Mureh⁵ bû beţlê kafîr kevrê destar
Ji jor avêt yekî muslîm birîndar

Kir û paşê be wê cerhê wefa bû⁶
Li ser fexra rîsalet pur cefa bû

⁴ we: bi vî şiklî

⁵ mureh(‘e): kêfxweş

⁶ be wê cerhê(‘e) wefa bû: bi wê birînê wefat bû

Muhîm kir hefti rojan⁷ ser wê kelhê
Yehûdî pur ketin tengî di kelhê

Şeva domayîyê ‘Ummer di newbet
Yehûdek girt bi wê bû zêde şewket

Ewî go min nekuj ey beqlê es‘ed
Mi bighîne li dîwana Mûhemmed

Dema çû jê eman xwest û xeber da
Eman dayê jina wî jî be ser da

Ji vê kelhê ewî go dê neqil bin
Di îşev bal yekî dê murtehil bin⁸

Di bin erdê di vê kelhê miğarek
Heye ser da sîlah e tev be carek

Heye tê mencenîqek mişlê nîne
Ji bin erdê ewê carek derîne

Li ser kelhê ewê cehde muqabil
Nikarin bêne qarşî da muqatil

Bikevne bin debabatan⁹ rîcalê
Di we qul ken kelê biçne wê yalê

Kela şanî û şalîş hey wiha ke
Bi vî qasî tuyê wan berheba ke

Resûlullah go beyraqê şebahe
Didem destê yekî qencê sîpahê¹⁰

Muhibê bo Xuda û bo Resûl e
Li bal wan jî xwedî dest û qebûl e

⁷ heft rojan

⁸ murtehil(‘e) bin: bi rê bikevin

⁹ debabet(‘e): aleta jibo qulkirina kelhê

¹⁰ sîpah(f): ‘esker

Xwedî rû her kesek dilda dixwesta
Li ber vê dewletê xwe ra dibesta

Şibe rabû nimêjê hem du‘a kir
Heman gazî ‘Elî şêrê Xuda kir

‘Elî jî çehvê wî dêşa di ew dem
Be dest girtin birin cem fexrê ‘alem

‘Elî go ruhnîya çavan çehvê xwe
Nikam hildem bibînim ber pîyê xwe

Nebî tûka mubarek xiste tê da
We destê xwe mubarek malî pê da

Şîfa bû çan ku êşanê nedîbû
Eva jî yek ji mu‘cîze Nebî bû

Cilê xwe zirhê lê kir Zulfekarê
Digel beyraqê da destan hinarê¹¹

‘Elî meşya be lez çû ber kela wan
Çikand beyraqê ber xîma kela wan

Ji kelhê Hêrsî derket pehlewan bû
Gelek mêrxas û pur şatircuwan bû

Li hev dan û li ber hev kirne cewlan¹²
‘Elî wî kuşt û lê qelbandî dewran

Yehûdî tev revîn ketne heşarê
Birayê wî Murehbû hat dîyarê

Bi xwe peşnî ku Xeyber pê dizanin
Ku min beflîyû mêranî çewan in¹³

¹¹ hinarî: şande

¹² cewlan(‘e): li dora hev çûn û hatin

¹³ Di haşfyê de piştî “Ey qale” weha derbas dibe:

‘Elî go ma diya min navê Heyder
Li min kirye ezê te b-kem be ker ker¹⁴

Di xew da wê şevê dîbû Murehheb
Ku şîrek wî dikuşt gava mu‘eqqeb¹⁵

Evî navî bihîst nava dilê wî
Qeta zanî ku nêze ecelê wî

Hucûm dayê be qûwwet derbe lê da
Li merţal ket şikand avête wê da

‘Elî deryek ji qûladê¹⁶ hilanî
Welê merţal li ser destê xwe danî

We avête Murehbû Zulfeqarek
Meţal¹⁷ û mîgferê qet kir be carek

Serî şeq kir giha dindanê¹⁸ kursî
Li erdê ket ku êdî lê nepursî

Birayê wî be nav meşhûrê Yaser
Gelek beţlek be nav û şûr û hem şer

Be şubhê filê serxoş hate meydan
Çedeb girtî heman nedhata tevdan

Diloranda be şe’ran ez fulan im
Xwedî nav im, di Xeyber pehlewan im

Qed ‘elîmel Xeyber ennî Murehheb
Şakissîlahî betelûn mucerreb
Îzîlhurûbû ew qedet telehheb

¹⁴ Di haşîyê de piştî “we qale” weha derbas dibe:

Enellezî semetnî ummî Heydere
Ke leysî ğabatî kerîhel menzere
Eklîlûkum bîsseyfî keyle sendere

¹⁵ mu‘eqqeb(‘e): teqîb û lêdan

¹⁶ qûlad(‘e): kelhe

¹⁷ meţal: mertal

¹⁸ dindan: diran

Xeyber baş zane ku Murehheb im
Ji serî heta lingê xwe bi sîleh im
Çimkî agirê herbê vêket û alav da

Ez ew im ku diya min navê min daniye Heyder

Wek şêrê daristana bejna min meriv ditirsîne

Wek mekîna kuştinê ezê we hûr bikim

Nebî gotî Zubeyrî rabe pêşî
Tu jî beṭlek ji şendîdê¹⁹ Qureyşî

Şefîyye got Nebî ey serwerê min
Ewê bukî kurê min ax kurê min

Nebî go dê kurê te wî geber ke
Mirarî wî di ax û xûnê wer ke

Dema lê da Zubeyrî bo li wî da
Zirava mewtê anî pozê wî da

Kepû²⁰ wî xiste xewlî²¹ hey ku rabe
Heta dunya xerab be ḥesrê²² rabe

Di wê rojê Kela Na'im fetih bû
Bi wî qelbî Nebî pur munşeriḥ bû

Li ser ḥerbê Resûlullah muhîm kir
Ḥeta neh kelhê wan tev da fetih kir

Ji wan nehwîtê ḡê²³ kuştin temamî
Şehabe bûn şehîd pazde kîramî

Dibêjin Bûlḥeqîqê²⁴ pîsê zengîn
Yehûdê dujminê dînî we pur kîn

Tijî kir çermê gakî zêr û zînet
Di kavlek²⁵ da veşartîbû genîmet

Be emrê asîmanî bû xeberdar
Resûlullah bi wî ḥalî we kirdar

¹⁹ şendîd(‘e): mezin

²⁰ kepû: poz, kepî

²¹ xewlî: xwelî, ax

²² ḥesrê(‘e): keder, ğem

²³ 93 kes hatin kuştin

²⁴ Kînane b. Ebîl Hûqayq

²⁵ kavlek: kavilek, xerabeyek

Hemû derxist ji erdê wê xezînê
We hem jî kuşt kurê wî bed le'înê

Musulman bê xwerek bûn weqtekî da
Gelek zehmet ji birsan²⁶ dîn di wê da

Şikayet birne cem fexra rîsalet
Ku bû zêde ji heddê me melalet²⁷

Heman xebtî li fetîha qel'ekî wan
Fetiħ kir tê tijî bû rûn û arwan

Wisani erzanî çê bûbû pêla seng
Firahî²⁸ tev ketin, xweş bû dilê teng

Hebûn panşed silahşor nêv kelê da
Hinan kuştin, revîn hin çûne wê da

Be hemdûllah fetih kir fexrê 'alem
Ji bil kelha Weqî' û hem Selalem

Be raħet bê qital û kuştinayî
Welê yê her du wan bû kuştinayî

Di wan her du kelan da dîn gelek mal
Temam şed zirh û çar şed şûr û merçal

Hezar jî rumh û pan şed qewsê 'alî
Digel wan kîsekî wanê di lalî²⁹

Nebî hilda ji nêv fey'ê Şefîyye
Keça Hüyeyyê Exteb xweş Şefîyye

Ji nesla şed nebî şed padîşahan
Ji paş bû behrê xeyrê padîşahan

²⁶ birsî: birçîbûn

²⁷ melalet('e): acizî

²⁸ seng firehî('e): zêdebûna qîmeta mucewheran

²⁹ lal('e): kevirek biqîmet

Di pêşî da Şefîyye xewnê dîbû
Çewan hêvê di pêşa xwe ku dîbû

Jibo babê xwe wê xewnê nîşan da
Ewî kafîr şîmaqek tahlî lê da

Digot çehvê te lê ye puştî weqtan
Biçî şahê ‘ereb bistînî çawan

Cihê wê ma di rûyê wê zemanek
Heta nîşa Nebî kir jê zemanek³⁰

Di paş herbê jinek navê wê Zeyneb
Tijî jehrî li şatek kir muretteb³¹

Ji ra’ û sermilan zêde zehîr kir
Dizanî ku Nebî wan va ye purtir

Dema loqme Resûlullahî hilda
Ewê bêcanê vê ra xweş xeber da

Ji jehrê ez tijî me ya Mûhemmed
Tu min bavêje ey şahê mumecced³²

Nebî avêt û go jehr e nexun hûn
Şehaban jî nexwarin jê ve rabûn

Welê Bîşrê kurê Berraê qurçand
Di pêşî nehyî loqma xwe ku jê çand

Wefat kir pê, we çû ridwanê ‘alî
Ji ber ve Zeynebê kuştin ehalî

Hemana Ce’ferê Teyyarê serwer
Dema fetih gehişte erdê Xeyber

³⁰ Haşîye: Heta nîşa Nebî kir ew mubarek

³¹ li şatek kir muretteb(‘e): di mêşinekê de tertîb kir

³² mumecced(‘e): yê şan û şerefa wî bilind

Muhacîr bû li nav erdê Hebeş bû
Be hatin wî Nebî pur keyfê xweş bû

Digel wî şazde ten sehbê kîramî
Hemû hatin tebabî³³ tim tamamî

Du şahî kir Nebî, yek jê be Ce'fer
Yeka dî jî be fetħa kelhê Xeyber

Be şîrînî Nebî vê ra xeber da
Heman cezbe³⁴ reqqasî lê be ser da

Ji wî şûfî reqaş û cezbe hildan
Mewacîdê³⁴ heqîqî nîkê merdan

Nebî wan jî şerîkê qismetê kir
Dema teqsîmê fey'ê Xeyberê kir

Ĥucacê Sullemî îmanê anî
Be peyğember li wê Xeyber mekanî

Îzin xwest go di Mekke mal û dewlet
Pir in min cem Mekkîyan hem jî zewcet

Direw bêjim Ĥeta malê xwe bînim
Dişirsim geyrî wî furşet nebînim

Nebî go çan dizanî we bibêje
Virî karê te ne tev da birêje

Dema çû Mekkeê dî çav li rê ne
Hemû tîhnê cewaba Xeyberê ne

Dema dîtî Ĥucacî, çûne pêşî
Ĥesûd û dilbirîndarê Qureyşî

³³ tebabî('e): helakbûnî

³⁴ mewacîd('e): piranîya cezbe

Çewane halê ya Hucacî bêje
Digotin durrê çîrokan birêje

Digo Hucac li we mizgînîya min
Muhemmed girtine mizgînîya min

Heval hin hane kuştin hin revîne
Hinek vêra ne tev hêsîr kirine

Dema anîn ku bukjin, hin nehêlan
Digotan bibne Mekke be nêv ‘êlan

Li wê bukjin jibo kêfxweşîya wan
Bila xûna wî birjê pêşîya wan

Meger herba berana wî nedîbû
Wekî Xeyberîyan wî qet nedîbû

Gelek şa bûn dema ku vê bihîstin
Ji şayan nedihata wan nivîstin³⁵

Bi lez go malê min bînin diçim ez
Berê tucarîyan da bikirim ez

Hemû malê ku jê talan sitandin
Be zora şûr û merçalan sitandin

Hemî malê wî danê lê çewan dan
Wisane çêtir ku jê naê xebardan

Musulmanê di Mekke bûne mehzûn
Welê ‘Ebbasî lingê wî ji ber çûn

Çulamê xwe şiyande cem Hucacî
Hucacî çû ku jê ra det rewacî³⁶

³⁵ nivîstin: raketin

³⁶ det rewacî: rewşê bêje

Li te mizgînî go ‘Ebbasî şa be
Bila çehvê te her jê va zuwa be

Fewellah wî fetîh kir Xeyberê jî
Li wê cî girt qewî peygemberî jî

Be qîza melîkê wan bûye zava
Ji kes ra vê nebêj mala te ava

Ûeta şê roj ku malê xwe xilas kem
Xwe bighînim Nebî pê îhtîras³⁷ kem

Nezir kir deh ‘ebîdan gêre azad
Di halê da ewî qasid kir azad

Dema şê roj bihurî hulle wergirt
Xwe rind xemland û qamçîkî bedest girt

Xwe hejyand û kubar çû meclîsa wan
Guhê xwe da ken û hem me’nesa³⁸ wan

Ûinazan pê kirin gotin qewîtî
Ji meznaya, muşîbet ser te datî

Kenî go hey xwelî seryan nizanin
Ku hal çane gelet hun pê dizanin

Ji wan ra go Hucacî çan beyan kir
Dilê wan pur keser kir ku ‘eyan kir

Didan dijminî Hucacî ji kerban
Digotin ger dipêşî ev xeberdan

Li me me’lûm bûya dê wî bidîta
Ji destê me ji bil derbê nedîta

³⁷ îhtîras(‘e): tedbîr

³⁸ me’nes(‘e): xweşsuhbet

Musulman pur fereh bûn kirne şahî
Jibo neşra Nebîw luţfa îlahî

Neçû pur, seh kirin ku hal wiha ye
Zefêr para Nebîyyê Muştefa ye

Hemû teqşîmî kir malê genîmê
Peyan yek, da suwaran sê ze‘îmê³⁹

Li ser wî erdê hişt wan ku biçînin
Biden hîşşek heçî ku jê hilînin



³⁹ ze‘îm(‘e): mezin

39. ĞEZWEYA WADÎL QURA

Dema fetlîn ji Xeyber tev tebayî
Gehiştin nîvê rê Wadîl Qurayî

Li wê cem‘ek yehûdî topî hev bûn
Li ډerra fexrê ‘alem komî hev bûn

Nebî ser wan ve girt û xist heşarê
Çehar rojan û ‘esker domedarê

Li wan teklîf kirin îman neanîn
Heman mêrxaşî kirn û dest hilanîn

Çiqas yek derkete herba şehaban
Heman lê dan û kuştin lawê baban

Heza yazde ji beqlan dane ‘erdê
Dema zanîn nikan rakin vê ‘ewdê

Heman teslîmî bûn şûrê xwe danîn
Çiku ger herbê ken, qir bin dizanîn

Fetiħ kir fexrê ‘alem wan be zorî
Zemanek pur jî ser wana neborî

Hemû malê di wana kirne talan
Sitandin pur ji wana nave malan

Nebî, ‘Emrê Se‘îdê ‘Aşî walî
Gerand ser wadiyû hem xelqê yalî

Dema vê, ehlê Teymaê bihîstin
Ji ٿirsan êdî nedhat wan nivîstin

Dizanîn wan jî paş weqtê weha ye
Zêfer ku hey jî para Muştefa ye

Ketin lavayîya şulhê Nebî kir
Girê da cîzeye ser wan û qewî kir

Yezîdê lawê Bûsufyan jî da wan
Gerand walîw hûkumdarê li ser wan

Kirin ehlê Fedek fîzar û zarî
Ku erdê me tamamî nîvê karî

Be wan ra jî Nebî kir şulh û raqî
Bi wê nîvê bo gîlla wê eraqî¹

Welê ev xaşî mabû fexrê ‘alem
Çikû bê herb û îza bû bê me’tem

Be dilxweş bar kirin çûne Medîne
Gelek ma reş dilê her bed nevîne

Îlahî! Şuglî naderk palepaşê²
Li hev bînî, nebî meqşed li haşê³

Şemîmî, lew muhîbê dîn û îman
Ew in hem tabîê’ Îslam û Qur’an

¹ gîlla wê eraqî(‘e): qezenca wan erdan

² Xebata han dernexe keda beyhûde

³ haşe(‘e): xistina dafîkê

40. ‘UMRETUL QEḌA

Di ewwel sal nehiştin ku Qureyşan

Nebî ket ‘umre zivrî şahê zîşan

Dema mî‘adê wan hat salê dinê

Xwe haḍir kir heman fexra zemînê

Emir da go nîda ken ha nîda ken

Xwe haḍir ken biçin ‘umre qeḍa ken

Emir kir yê Hudeybîyê bila bîn

Kesek paş ve nemînit tev bila bîn

Ji geyrî jin û zaro, du hezaran

Cemi’ bûn şîr û beḷ û namîdaran

Li ser Teyba xwe Kulşûmê Gefarî

Xelfe kir ewî Şahê bijarî

Sîlah û zirh û rumhê xwe hilanîn

Deve şêşt û welê şed hespê danîn

Nebî eḥram girêda û birê ket

Muḥammed lawê Muslîme bi rê ket

Di pêşî çû gehişte Merrê Zehran

Lîqa bû hin Qureyşî ‘eksê dewran

Ewan go ev çî ceyš e bo çîye ev

Ji ku va tê be ku va dê biçit ev

Cewab da go Resûlullah şibe tê

Li vî erḍê giranî pê ve wî tê

Çîye gotin gelo sûcê me ku ew

Dikêşit ‘eskerê xwe ser me va ew

Li ser ‘ehda xwe ne em bê xiyanet
Heqî nîne me gêre bê şîyanet¹

Muħemmed gote wan naê ğezaê
Welê têtin jibo ‘umre qeðaê

Mekerrîz² tev hinan çûn cem peyember
Ku şertê me ew e ey nîkê serwer

Ku beytê bê sîlah û bê giranî
Be tedbîra sefer bêtê li hanî

Nebî go em sîlahê xwe dihêlin
Ji xaric Mekke qelbê xwe nehêlin

Ji wî şertê me kir, nînim peşîman
Peşîmanî ne qenc e bo kerîman

Mekerrîz got wisan em jî dizanin
Emîn û ba wefa em te dizanin

Sîlahê xwe ji Mekke dûrî hiştin³
Be hêlahêle lebeykê rehîştin⁴

Resûlûllah li pêşî tev li pê bûn
Ji Beṭnê Ye’cecî hatin be rê bûn⁵

Suwarê naqeya Quşwa di mador
Be helqe girtibûn beṭlê sîlahşor

Kurê Rewaħe⁶ dizgînê dikêşa
Digot şe’rê ku wan dil jê diêşa

Gihane dorê beytê wan delalan
Qureyşî derketin gaz⁷ û newalan

¹ şîyanet(‘e): mihafaza

² Mîkrez b. Hafs

³ Haşiye: Le Beṭnê Ye’cecî eslîhe hiştin

⁴ rehîştin: rahiştin, xwe pê girtin

⁵ be rê bûn: ketin rê

⁶ ‘Ebdullah îbnî Rewaha

Suwa⁸ wana dihate pur hesûdî
Dikirna nedviyan mînin li wê dî

Resûlullahî go celd û qewî bin
Be bez werne tewafê şidşidî bin

Qureyşî da nebêjin tayê Yesrîb
Ewan hêlaye jar û bê meratîb

Dibezyana diçûn rehwanîya xwe
Qureyşîyan dibe'candan ji pêş xwe

Digotan yahû ma ev ne hîzal in⁹
Sivik ew baz didin goya gezal in

Be wê terzê kirin se'yê dilêran
Suwarî bû Nebî şahê emîran

Serê xwe kur kirin qurban li Merwe
Hemî ser jêkirin be te'b û her we

Du şed şehban şiyande Betnê Ye'cec
Jibo yê ser sîlağan bèn biken hecc

Nebî şê roj di Mekke bû îqamet
Qureyşan dîn ji kerban pur seamet¹⁰

Şiyandin cem Resûlullah ku rabe
Temam e, muddeê we êdî nabe

Biseknin zêdetir ku dibte gedrê
Ji te me seh nekiryê qehr û gedrê

Resûlullah emir kir ku rehîle¹¹
Heman bar ken ne êdî qal û qîle

⁷ gaz: girik

⁸ suwa('e): di haşiyeya 'erebî de bi me'na bîntengî

⁹ hîzal('e): zeîf, sist

¹⁰ seamet('e): acizî

Keça Hemze Umame bû li wê dî
Digota “Mamo! Mamo!” wê ‘Elî dî

Heman hilda bire cem wê Betulî
Di hewdec Faṭîma bînta Resûlî

Resûlullah jibona ḥurmeta wê
Nihand¹² cem zewcê Ce’fer xaleta wê

Digo xalet wekî ummî şefîq e
Ji wê qasî jî ew êdî heqîq e

Li rê Meymûne Ummul mu’minîn
Mehîr kir fexrê ‘alem nazenîn

Dema hatin Meke şehbê kîramî
Digel fexra rusûl şahê Tuhamî¹³

Nikarî Xalidê lawê Welîdî
Li wan mêze biket derket ji wê dî

Birayê wî şiyand mektûbê pê ve
Were îmanê go ewwel ji rê ve

Resûlê heqq e bêşek û yeqîn e
Xudanê weḥy û tenzîlew emîn e

Dilê wî nermî bû, da meylê îman
Ezel da rebbê ‘alem dabû îḥsan

Di xew da jî munasîb dî tewehhem
‘Înayet herdu destan girtibû hem

We gote çendekan nekri¹⁴ hevalî
Ji ber wê dewletê xwe dane alî

¹¹ rehîl(‘e): birêketin

¹² nihand: şand

¹³ şahê Tuhamî: Hz. Pêxember. Li ‘Erebistanê herêma Tîhame heye

¹⁴ nekri: nekirin

Ĥeta ‘Usmanê Telĥe merdê ‘aqil
Gehiştê ew jî bal îmanê mail

Behev ra muttefîq bûn ta ku hatin
Li ‘Emrê ‘Aşî nageh rastî hatin

Gelek zana debîr û ser de hatin
Li hev şêwrîn be zanaîw cevatin

Ji wan ra ‘Emrî go ma cem Necaşî
Musulman bûme ba qencî û başî

Niha ez talibê dîna Nebî me
Li ser îman û Îslamê qewî me

Ewan gotin meger em jî wekî te
Bide pêşî ku em jî bên li pê te

Xulaşe her şê jî îmanê anîn
Şeref jî ta ebed bo xwe hılanîn

Dibêjin Xalidî seyfê Xuda ye
Xuda bo şewketa dînê xwe daye

Bibêjî heçretî Xalid hemû kes
Dinasî wî gelek meşhûr e wî hes

41. ĜEZWEYA FETHA MEZIN A MEKKEYA XUDA ŞEREF DAYÊ

Qelem wergir libasê zewq û şahî
Bireqşe serserî lew bûye şayî¹

Li şehna defterê ne’re hilîne
Fetiĥ ke muşkîlan her kes bibîne

Bike şadî we şadan ke evînan
Nihayet hatê lew cewra nevînan

¹ şayî: bê ewr

Çi îza dîtibûn borî, şukur tev
Tulû' da şemsê raħet ser ceva şev

Heçî te'ba Nebî kêşa şukur ew
Nihayet bû be ser da hat hemî ew

Qe însaf e ku Mekke bo wî çêbit
Ji xwe xel kêf biket tê, ew ne tê bit²

Îlahî, ħakimê 'edlê dizanî
Ne kes bawer dikir vê ne dizanî

Te çêkir 'îşê ehlê dînê Îslam
Di Mekke jar û bê îmkan û îkram

Bibûn tê da zelîl û hem şefalîk
Ewan kir bûn be teşbîhê memalîk

Xuda heqq e, li banê heqqîyê jî
Dike 'îşan³ di paşê weqtîyê jî

Ji tengasî ewan derxistî dîsa
Li wan fanûsê bextê wan teyîsa⁴

Meger rawî weha kirye rîwayet
Nevîsîne ji wî ehlê dîrayet

Dema şulħa Ĥudeybîye tamam bû
Resûlullah li ser wê 'ehdê mabû

Qureyşîyan şikinandin 'uhûdan⁵
Ketin lubs⁶ û fe'alê bedcuhûdan

Xuzai çimkî ber emrê Nebî bûn
Di bin 'ehd û tebayê şozê wî bûn

² tê: tê de

³ 'îşan('e): heyat

⁴ teyîsa('e): birîqî, vêket

⁵ 'uhûdan('e): piraniya ehd û sozê

⁶ lubs('e): kinc û terz

Ji wan kuştin Benû Bekrî Qureyşan
Gelek mêran li ser wan şûrê kişan

Peşîman bûn Qureyşî lê ji dest çû
Dizanîna ku wan şewket şikest çû

Welê gotin Muḥemmed ger bibîne
Emê înkâr biken ku em ne tê ne

Xudayê ‘alemê weqtê qîtalê
Xeberdar kir Resûlullah ji ḥalê

Nebî go ‘Aîşe tadbîr bibîne
Wihaye ḥal kesek pê neḥesîne

Dema Şiddiqî kir ḥesa tedarek
Çiye go ev eya bînta mubarek

Beyan kir ‘Aîşe jê ra tematem
Heman rabû we çû cem fexrê ‘alem

We got ey ruhnîya çehvan qe nabe
Biçin ser wan we hêjan mudde mabe

Nebî go wan şikînane ‘uhûdan
Beṭal kirne hemî şoz û şuhûdan

Neçû şê roj ku ‘Emrê lawê Salim
Bi hin bizdayî hat cem fexrê ‘alem

Be şe’r û tefqîye⁷ vê ra xeber da
Hemî derdê xwe lê zîr û zeber da

Nebî go gem nekew negre girînê
Wisan bizvir ku qeṭ kes te nebînê

Bedîla lawê Werqaê Xuza‘î
Di pê ve ew jî hate ẖeybe sa‘î⁸

⁷ tefqîye(‘e): dan fêmkirin

Ji wî ra jî Resûlullah wisan got
Ewî zivrand û vê ra dilxweşî got

Qureyşî ketne qelqel dilperîşan
Dizanîna xerab e hal û ew şan

Ebû Sufyan şiyandin bête Teybe
Jibo şulhê biket fîzar û telbe⁹

Giha Teybe we çû mala keça xwe
Ku Ummul Mumînîn ra ket rica xwe

Ewî qeşda bisaşa¹⁰ bin Nebî kir
Ku rûnê ser, keça wî men‘ê wî kir

We go tu kafir î, rîcs î, zebûn î
Li ser cayê Resûlullah nerûnî

Ji bal rabû ku keyfek wê nedayê
Ji wê çû cem Resûlullah ricayê

Kete lavan ku ‘ehdê zêdetir ke
We hem jî ‘ehdekî taze ku çê ke

Nebî vê ra nekir qeş gotina wî
Ne guh dayê bi wî ma gotina wî

Xwe avête Ebû Bekr û ‘Umer jî
Welê ‘Ummer girantir kir li ser jî

Tewesul kir be ‘Uşman û ‘Elî hem
Dikirna red, bibû mînayê sersem

Ji kerbê kes li wî nedkir xweyîfî
Melûl mabû ji tîrs û bêxweyîfî

⁸ sa‘î(‘e): temsîlkar

⁹ telbe(‘e): daxwaz

¹⁰ bisaş(‘e): mînder

Xwe avête derê bînta peyember
Ku ez bextê te me def'ê bikî der

Ewê go fexrê 'alem ma li pêş e
Ji xwe bo qismê jin ra ev ne 'îş e

Li wê bûn Heyder û şiblê Hesen jî
Nikarin bê Nebî em got ewî jî

Ebû Sufyanî go tiplê te hanî
Ewî go zaro ye, tiştekan nizanî

Xulaşê kes nekir vê ra dexalet
Ne vê ra dostinî kir xal û xalet

Li ku diçwa digotanê peyember
Dizanit her ew e sulţan û serwer

Xwe avête 'Elî kir zarezarî
We go dunya li min bû teng û tarî

Li min şîret bike ka ez çewan kem
Çewan hêla li xwe 'ehd û eman kem

'Elî go na ber tê 'eqlê mi tiştekan¹¹
Ji nav şehaban ji ta çêbit qe pişk¹²

Welê tu mazinê Kenanîyan î
Here nav xelqê daxwaz ke emanî

Dizam bêhûde ye ew jî yeqînî
Welê reh çan dizanî wê dibînî

Ebû Sufyan nîda kir mescîdê da
Emîn ken min kesî dengê nehilda

¹¹ nayê ber eqlê min tiştekan

¹² ji ta çêbit qe pişk: ji te ra çê bibe piştevanek

Xulaşê ‘îşekî jê ra neçêbû
Heman rabû suwar bû paşberê bû

Li Mekke întîzara wî dikêşan
Direngî bû kirin şubhê Qureyşan

Ku îman anîye maye Medîne
Hewe ku bêt û êdî wa bibîne

Dema çû Mekke tev da çûne pêşî
Hemî reysê şenadîde Qureyşî

Dipirsîn jê gelo ka te çewan kir
Te ‘ehd û muddeê me qe cewan kir?

Ji wan ra tev beyan kir maceraê
Li wan kir zêdetir tîrs û belaê

Bizanin go nihe¹³ wek wî çu sultân
Ku qewmê wî mûti‘ê emr û ferman

Eger ku bêje wan bimrin dê bimrin
Gelek rabestîyê ferman û emr in

Yeqîn zanîn ku wan şewket nemaye
Li wan kelha mûşîbet hilweşaye

Nebî, Şiddiqî tenha xwende¹⁴ ba xwe
Bi wî kir şêwrê esrarê li ba xwe

Ewî go qewm in û pişmam û xizm in
Eger çî vê demê ew bûne dujmin

Heye ewladê wan îmanê bînin
Di paş rojan heye ku ew jî bînin

¹³ nihe: tune

¹⁴ xwende: gazî kir

Eger bukî tu kişranê¹⁵ Qureyşî
Jibo wê piştî rojan dê biêşî

Ku yek îman ji wan bînit tu şabê
Wekî dunya we ma fiha ji ta bê¹⁶

Nebî bû nermî mîna herbê dane
Li ehlê Mekke negrî dane dane

Di pê ve xwendî Farûqî jî anî
Bi wî jî got hemî razê nihani¹⁷

‘Umer gotî be dengê aşîkara
Nemaye ya Resûlullah mudara¹⁸

Qureyşî ne serê kufr û ‘înadê
Ew in men‘ê jibo fitnew fesadê

Ew in tekzîb kirin gotin te şahîr
Xulaşê cumle îzayan zikir kir

Heta Mekkî nebin meqhûr¹⁹ û teslîm
‘Ereb nabin zebûn û hem melahîm

Ji ewwel wan mûftî’ û binemir ke
Ji ew paş çan dixwazî we emir ke

Nebî go Bûbekir mîna Xelîlî
Melahîmî welêkin wî zemîlî²⁰

‘Umer wek Nûh e, wî pur bîhnî teng e
Heman haqîr di dest da şûrê ceng e

Şewab jî yê wî ye rabin suwar bin
Be tedbîr û sîlah û kar û bar bin

¹⁵ kişran(‘e): keşîr, piranî

¹⁶ ma fiha(‘e) ji ta bê: tiştê tê da ji te re be

¹⁷ razê nihani: sîrrên veşartî

¹⁸ mudar(‘e): medar, sebeb

¹⁹ meqhûr(‘e): yê qehr û perîşan bûye

²⁰ zemîl(‘e): dost, hevalê qenc

Şela dan û xeber dane diyaran
Li hev top bûn dilêran û kubaran

Digot eş‘arê xweş Hîsanê Sabit
Qewî dikra hemî qelbê neşabit

Cemi’ bûn deh hezar ‘esker geđenfer
Di bin şûrê di wan bû mewtê eħmer

Nebî casûs tijî kir rah û dirban
Nebî ku kes xeber bighînete wan

Welê Haţib kurê Bûbelte‘et yek
Jinek şande Mekke dayê nemîqek

Hinara da be lez wana şiyar ke
Be tedbîra Nebî wan goşîdar²¹ ke

Ĝeređ jê ne nîfaq û xainî bû
Welê def‘a qîtal û kuştinî bû

We hem ewladê wî mabûne tê da
Ji wan ra çê dikir piştekan di wê da

We deh dînarê jî da ucreta wê
Gelek tenbî kir û teqwîye da wê

We gotê xef here kes te nebîne
Çikû nava rehan nijde tijîne

Ewê kağid di nav porê xwe xef kir
Be xef rabû be bal Mekke sefer kir

Resûlullah be emrê asîmanî
Be ageh bû ji wê emrê nihanî

Zubeyr û Heyder û Mîqdadê Kendî
Şiyand ku rast biken wê fêl û fendî

²¹ goşîdar(f): agahdar

Ji wan ra got gihaye Rewdeê Xax
Biqeflînin ewê bigrin be kustax

Ewê mektûbê bistînin, nehêlin
Biçit Mekke, li paş ve wê bihêlin

Heman çûn û ewê girtin neborî
Nemîqe²² wan sitandin jê be zorî

Nihêrin ku ewê Hataîb hinarî²³
Hemû girtin li wê vê 'eyb û 'arî

Hinan gotin emê bukjin, nehêla
Resûlullah, çikû zanî ku mêla

Wî nîne bal Qureyşan ve heqîqî
Xweyî îman û teşdîq e heqîqî

Li rê çûn ta gehan erde Kedîdî
Bi rojî bûn, hemî fişrîn li wê dî

Çikû zanî Resûlullah ku çane
Ku wan taqet jibo rojî nemane

Meger 'Ebbasî jî koça xwe hilda
Muhacir bû be yalê Teybeê da

Leqayê fexrê 'alem bû li Cuħfe
Be hecret ew jî bû xwey behr û tuħfe

Şiyande Teybeê mal û giranî
Bi xwe zivrî digel fexra cîhanî

Gehiştî hem Ebû Sufyanê Hershê²⁴
Digel lawê xwe Ce'fer fexrê hersê

²² nemîqe('e): mektûb

²³ hinarî: şiyandin

²⁴ Ebû Sufyan b. Haris b. 'Ebdulmüttelîb

We ‘Ebdullahê Mehzûmî kurê xa²⁵

Ebî pêxemberê şêrîn şekerxa

Muşerref bûn be Îslam û be îman

Be hecret hem Xuda pur feqlê da wan

Nebî rayat û beyraqê xwe çêkir

Qedîdê²⁶ da we teslîmî xweyan²⁷ kir

Temam şê rayet û sêzde lîwa bûn

Li ser qefle be qefle tev belav bûn

Gehîştin Merrê Zehranê bar danîn

Nebî da emir: Agir ken be ayîn

Temamî deh hezar naran emir kir

Heman her yek jibo xwe narê hilkir

Qureyşî da ku bib hîn yan bibînin

Ji tîrsa wan zirav qetyay bimînin

Dilê ‘Ebbasî pur mabû be wan ve

Dizanî ger Nebî bigrî li wan ve

Ewê qir bin hemû serda we pêda

Qe tendarê²⁸ nemînê Mekkeê da

Suwar bû naqeya fexra zemînê

Ku belkî yek be ser wan va bişînê

Ku bîn telbe biken emn û emanê

Li wan îhsan biket fexra cîhanê

Nebêje ku Ebû Sufyan di ew şev

Û Hekîm û hem Bedîlî bûn digel hev²⁹

²⁵ xa: xweha

²⁶ qedîd(‘e): kincê kevn

²⁷ xweyan: xwedîyan

²⁸ tendar: kes, candar

Digeryana be casûsî li halan
Difekrîna³⁰ hemî kuçew newalan

Ku çehvê wan be agir ket nezanîn
Ku kî ne, pur ‘eceb man, kirne ahîn

Be nav qewmê ketin pûrsîn ku kî ne
Nihêrîn xeyrê xelq û şehbê wî ne

Gelek tîrsan û nijde³¹ girt ewana
Heman ‘Ebbasî bû haqîr li wana

Ku dî ‘Ebbasî Busufyan suwar kir
Li paş xwe qeşdê xîma³² Muştefa kir

Li hersê³³ borî lê ‘Ummer tevê bû
Çikû ew şev li ser hîrsa şevê bû

Ewan girtin ‘Umer hat ku wî bukjê
Divaya ku be zû xûna wî birjê

Ebul Feđlî³⁴ ji destê wan deranî
Be tefđîlê dirêj kir zindeganî

Be hev ra lez kirin qeşda peyember
Ebû Feđl û Ebû Sufyan û ‘Ummer

Gihane çadira fexra Qureyşî
Ebûl Feđil bû lê zûtir di pêşî

Xeber dan fexrê ‘alem got emanê
Bide vê bê mehal û bê emanê

Nixaftim wî ji hîrsan û ji nijde
Heta vê dî ‘efûke wî be min de

²⁹ Hekîm b. Hîzam û Budeyl b. Werqa

³⁰ difekrîna: lê dinêrîn

³¹ nijde: leşker

³² xîm: kon

³³ hers(‘e): nobet, tefteşî

³⁴ Ebul Fedil: Hz. ‘Ebbas

‘Umer hey hey li tayê kuştinê bû
Ji destê wî cefayan pur ku dîbû

Nebî wana siparte ‘emmî ‘Ebbas
Heta şubhê li hev ber hev bibin nas

Li wan teklîfî kir ‘Ebbasî îman
Bedîl û hem Hekîm bûn, lê Bûsufyan

Bihêle go dê çawan bit binêrim
Netîca fikrê çêkem lê vegêrim

Dema şubhê veda rabûn nimêjê
Di tîrsa go heye tiştêk bibêjê

Nimêjê da ku dî tev teb‘ê wî ne
‘Eceb go çan mûtî‘ê emrê wî ne

‘Eceb ev seltenet ev padişahî
Tunîne ser qe sultan û ve şahî

‘Ebasî got eva pêxemberî ye
Ne sultanî, hukumdarî, şehî ye

Xulaşe birne cem fexra rîsalet
Ji ewwel kir jibo îman delalet

Ewî go Lat û Uza dê çewan bin
‘Umer ku dê birî ser wan wisan bin

Çiqas ‘eyb e jibo ‘aqilreîsan
Bibin secde jibona wan xesîsan³⁵

Çi ‘eql e ku meriv çêket ji seffal³⁶
Leyîz û gak³⁷ we jê ra bibte ‘ebdal

³⁵ xesîs(‘e): heqîr, ‘adî, rezîl

³⁶ seffal(‘e): yê herî zelîl û rezîl

³⁷ leyîz û gak: lîstin û gok

Xuda qenc e ku ew xulqa merif³⁸ ket
Qelem ser bûd û nabûdan şerif ket³⁹

Xulaşe hate îmanê di piştî
Ku zanî ger nebit dê bibte kuştî

Dibêjin weqtekî Bûcehlê mel'ûn
Şeqamek dabû bînta xeyrê me'mûn⁴⁰

Ebû Sufyan wê heyfê dabû hildan
Nebî seh kir du'a kir bête îman

Du'ayê wî Xuda taze qebûl kir
Ewî jî şahib û şehre⁴¹ resûl kir

Hekîm û hem Ebû Sufyan Nebî ra
Digotin ya Resûlullah te dêra

Digel xwe nas û pişmam û gerîban
Dibî ser qewmê xwe dukjî necîban⁴²

Nebî go ma çira bê soz û 'ehdî
Kirin piştî me kir mî'ad û 'ehdî

Qureyşî bûne puştîvanê Bekrê
Gûzaî qir kirin ba qehr û gedrê

Bedîlî go Qureyşî ger nebûna
Benû Bekrî me zortir nedêbûna

Qureyşî bûn wuha anîn serê me
Belayê ha ewan anîn derê me

Ewan jî got bila ev keydê bêtin
Ji ber me va li ser qewmê Hewazîn

³⁸ merif: meriv, însan

³⁹ li ser yê heye û yê tuneyan teqdîr kir

⁴⁰ bînta xeyrê me'mûn('e): Fatimaya qîza nebyê emîn

⁴¹ şehre('e): merivantî, xezûr

⁴² necîb('e): eşraf, mezin û 'esîl

Çiku hem dûrtirin dujmintirin ew
Ji me da em be wana çê biken sew

Nebî go min ji rebbê xwe ricaye
Ku fetha Mekke muftaha tevaye

Bi wê dînê mubîn dê pur qewî bit
Hewazîn jî ji tîrsan munzewî bit

Jin û zarê di wanaw terş û talan
Xuda hez ket hemû dê bibte talan

Qureyşî ramî⁴³ bin ma qeş kesê dî
Dikarin ku biken serkêşî êdî

Ebû Sufyanî go ger nehilînin
Li ber te destî, ma wê geh emîn in?

Resûlullah belê go hem ji xane
Kesê dernekevit jê ra emane

‘Ebasî got Ebû Sufyan devê pur
Ku navê wî li nav xelqê bibit gur

Resûlullah ku îkramek jibo wî
Biket kifş e ke namûsek jibo wî

Gelek qenc e ku navê wî be qencî
Bibêjin da neçit qelbê wî rencî

Nebî go kî biçit mala Bûsufyan
Ji wî ra ‘ehd û bext e şoz û îman

Ewî go dê çi biçne xanîyê min
Nebî got yê biçe mescîd jî amin

Ewî go dê çiqas mescîd hilîne
Ku tîrsa nêvê dil wana derîne

⁴³ ramî(‘e): mûtî’

Nebî go kî derî ser xwe ku dade
Ji hindur der nebit jê ra jî ‘ehd e

Wisani bî baş e go ev qenc eman e
Nema êdî jibo wan ra behane

Ji bil çendê xweyê sûcê giranî
Temaman ra jî bû ‘ehd û emanî

Nebî go ‘eskerê me weqtê rabit
Bila her kes tevê qewmê xwe da bit

Ebû Sufyan biken engel li ser rê
Dema ‘esker di ber wî ra biborê

Binasînin çiku niqabkirî ne
Bila hemyan be çehvê xwe bibîne

Dilê wî da qewîtir bit bitebte⁴⁴
Li fetha Mekkeê bêxûn bixebte

Digel ‘Ebasî rûnişte di rê da
Be qefle qefle ‘esker hat ji wê da

Çi qefle hat û da tekbîrê sê car
Ji ‘Ebasî fikir wî pûrsê her car

Digo kî ne, digota ev fulan in
Fulan in hey fulan in hey fulan in

Dikir ahîn digo me wan çî tev hev
Ku nageh ve li ser me bûne berhev

Hemî borîn ewî jî dît ewana
Qesem got taqê kes naghêje vana

Dilê wî ser musulmanî qewî bû
Di dil da nûrê îmanê bi cî bû

⁴⁴ bitebte: bitebite, tebat bibîne

Resûlullah hemana wî verê kir
Hekîmubnîl Xezam vê ra virê kir

Bi bal Mekke ji wan ra da bibêjin
Evê mujdê wekî durran birêjin

Ebû Sufyan ku çû rahişt nîdayê
Qureyşîyan dikarin werne rayê⁴⁵

Muhammed hat be tedbîr û giranî
Di nîva 'eskere dikşî li hanî

Nikarin hun li ber rabin be carek
Musulman bin tebarek şed tebarek

Xelaş ken xwe be îmanê ji kuştin
We ger ne yek ji we naête hiştin

Ji bil yê ku here mala Bûsufyan
We yan jî daxilî mescîd bibit yan

Derî daxit li ser xwe mal ve rûnê
Nebit ba'îş jibona qetl û xûnê

Jina wî Hînde rabû kir fisûnan⁴⁶
Be sunbulê wî girt û da dijûnan⁴⁷

Werin go hûn ewwel bukjin evê ha
Evî zikmeşkê bê geyret serê ha

Çuwe avek zelal ket⁴⁸ bo Qureyşan
Nizanîma ku dê me b-ket perîşan

Ebû Sufyan gelek hêrsa xwe anî
We go dê lez here mala xwe vanî

⁴⁵ werne rayê: têkevin Îslam û îmanê

⁴⁶ fisûn('e): efsûn, sêr

⁴⁷ dijûn: çêr, sixêf

⁴⁸ ket: bike

Be peygember were îmanê bîne
We ger ne şûrî qafê te hilîne

Berê xwe da Qureyşan go nexapin
Be qewlê Hîndê şed tenbe nexapin

Qesem mîna sitêrkê asîmanan
Li ser we da rijane bê emanan

Ew e tedbîr ji malê xwe neder bin
We ger ne, dê hemî zîr û zeber bin

Nebî beyraqê da destê Zubeyrî
Hecûnê⁴⁹ da çikand wî şîremêrî

Resûlullah digel ‘êla giranî
Wekî hev û sitêrkê asîmanî

Di ‘ulyayê Senîye bûne daxil
Di birca Mekkeê da bûne nazil

Li Quşwayê suwar bû xadimê wî
Di terkî da suwarî bû li puşt wî

Serê xwe dabû ser barê deva xwe
Tewaşu’ lew fikir bo Xaliqê xwe

Çikû vê ra kubarîw fexrê nîbû
Kerîmî û helîmî karê wî bû

Welê Xalid digel hindek hinarê
Senîyya xwarê ve da biçne xwarê

Gelek lê tenbe kir herbê nedaxin
Meger ew pêşberê we cengê raxin

Benû Bekr û Benû Hîrs û Huzeylî
Li pêşî bûn xwe gêr dane rezîlî

⁴⁹ Hecûn(‘e): cîyê çadira pêxember lê

Be şûran dan hucûmê daku daxil
Nebî Xalid reîsê merd û ‘aqil

Heman Şûrê Xuda şûrê xwe kêşa
Be navê ket wekî başûkê dilşa

Nebî qasîd virê kir şûrê daxê
Di kalan û bila herbê nedaxê

Xwe şaş kir go Nebî vaye nidake
Dibê Xalid bila herb û gezake

Ewî heftê ji wan kuşt û ewî dî
Revîn, Xalid neçû pê wan ve êdî

Eva nezra Nebî kir bû di pêşî
Ku ez heftê tenan bukjim Qureyşî

Bedel Hemze ku wan kuştin Uhûd da
Xuda nezra wî pêk anî di vir da

Nedabû pazde han ‘ehd û emanî
Welê ekşer ji wan îmanê anî

Ji wan yek ‘Ekreme lawê Ebî Cehl
Dema seh kir revî derket ji nav xel

Suwarî behrê bû bakî muxalîf
Li wan rabû we çîrsan bibne talîf⁵⁰

Kire gazî ‘Uza û pût û latan
Hewara xwe gihande her Menatan

Gemîçî go ewan te’ şîrê nîne
Ji bil tewhîdê Barî fayde nîne

Nezir kir go ji vir ger ez riha bim
Ezê tabî’ be dînê Muştefa bim

⁵⁰ talîf(‘e): xisardîtî, wêran

Ji wî halî xelaş bû, zewceta wî
Heman çû cem Resûlullah rica wî

Nebî da xatîrê wê ew ‘efû kir
Bi îmanê ewî jî xwe li rû kir

Nebîyûllahî şa bû pur ku îman
Ewî anî we bû ez ehlê ‘îqan

Çikû beṭl û şecî’ û pehlewana bû
Debîr û hem xweyê şêwrê giran bû

We yek Ke’bê Zuheyrê Mezinî bû
Be şe’rê xwe gelek mu’zê⁵¹ Nebî bû

Qîşa Banet Su‘adu nezmê çêkir
Be wê hat û dexalet ba Nebî kir

‘Efû kir lew ku îmanê jî anî
Nebî burdê xwe ser qeşîdê danî⁵²

Ew e cem padîşahan û selaṭîn⁵³
Be Xirqeê Şerîf ew tête nasîn

Didû Mexzûmîyan Hêrs û Zuheyrî
Musulman bûn, ‘eḏû bûn pêşî deyrî⁵⁴

Ji wan lawê Umeyye navê Şefwan
Reîsê Cemehî serdarê merdan

Revî çû daku xwe bavêje behrê
Sebeb îza Nebî û qehr û gedrê

Kurê mamê wî Saşa fexrê ‘alem
Bire pê va emîn kir anî andem⁵⁵

⁵¹ mu’z(‘e): yê ezîyet dide

⁵² Qesîdeya Burde

⁵³ selaṭîn(‘e): sultan

⁵⁴ deyrî(‘e): li ser zulm û xerabiyê

Jibo îmanê muhlet xweste çend mah
Be mîzana ‘eqil ta bibte agah

Çi bêjim qîşeta wî pur dirêje
Xulaşê ew jî îman anî bêje

Yekî jî Hîndê bû zewca Bûsufyan
Nebî, kuştin jibo wê dabû ferman

Sebeb ku Hemze wê ‘îbret gerabû
Du weqtê ku şehîdê heq gerabû

Musulman bû we hate cem peyember
‘Efû kir wê Nebîyê nîkê serwer

Di mal da yek şenem wê bo ‘îbadet
Dikir jê ra be ‘urf û hem be ‘adet

Çewan îmanê anî girte tevşo
Hucûm kir ser ewê hûr kir be tevşo

Digotî ey xebîsê namubarek
Temamî em bi te garan be carek

Xuda bextê me kir bîna ji korî
Be teb‘a fexrê ‘alem min be gorî

Çira hilkir we da tarîfîya me
Me kir zana di pê wehşetîya me

Xulaşê ew nivînê ku di dil bû
Nebî ra tev be hubbê munbedil bû⁵⁶

Ji wan yek Wehşîyê ku kuştî Hemze
Nebî hêlabû qetla wî be Hemze

⁵⁵ andem(‘e): poşmanî

⁵⁶ munbedil(‘e) bû: guherîn

Dema Mekke fetih bû çûye Taîf
Dema îman letaîf kir teşadîf

Dinê bû teng û tarî serserê wî
Nema êdî kesek bit serwerê wî

Niyet kir ku serê xwe hilde haîm⁵⁷
Gerîbê Yemen û Şamê be daîm

Yekî gotî Muhammed pur kerîm e
Jibo ‘efwa quşûran pur helîm e

Xweyê sûcan ku tèn îman çî pak e
Sebeb sûcan ku qeç dengê xwe nake

Geha fexra rîsalet nagehanî
Ji nageh ve heman îmanê anî

Nebî gotî xwe binxêve ji dînê⁵⁸
Bila çehvê mi rûyê te nebînê

Ûeta puştî wefata fexrê ‘alem
Ji paş ve rûdinişta ew dema dem

Dema ku kuşt ewî Kezzabê makir
Eva ye ‘ewdê Hemze go mi rakir

Bi hemdellah di kufre çendî kirdar
Nerindî kir di Îslamê heman kar

Gelek zêde mi kir rebbî qebûl ke
We hem meqbûlê dergahê Resûl ke

Xulaşê çî kesê ku hat huđûrê
Resûlullah ‘efû kir sûcê borê

⁵⁷ haîm(‘e): ‘eware

⁵⁸ binxêve ji dînê: veşêre ji dîtinê

Me‘elqîşse duşenbe bûye daxil
Di Mekke serwerê me Şahê ‘adil
Be te’zîm û tewafî’ bê tekebbur
Dixwend Înna feteħna bo teşekkur
Li çengê rastê bû Şiddîqê Ekber
Li yê çep bû Useydê mîrê serwer
Dumadorê wî girtin xeylê⁵⁹ Ellah
Li ser Quşwa tewaf kir Ke’betullah
Dema tekbîr didana tev be hev ra
Çiyan goya xeber dana be hev ra
Ji ber tekbîrê wan Mekke dihejya
Serê kufrê mejî jê da dirijya
Kurê Muslîmet dizgînê dikêşa
Be gopal îstîlam dikra Şehînşa
Hemû kafîr revî bûn ser cîbalan
Difêkrîna tewafa wan delalan
Li ser Beytê şenemhayan çika bûn
Li banê sê şed û şêstan niha bûn
Lihîm kir bûn pîyê wan da nerabin
Nezanîna ku pîse pîs terab in⁶⁰
Resûlullah be kopalê rîsalet
Li borînê dida wana îşaret
Digota heqqî hat û dînê baîl
Heman bû muđmeħîl⁶¹ borî we zail

⁵⁹ xeyl(f): kom, zêde

⁶⁰ pîse pîs terab(‘e) in: pîse pîsê bêqîmet in

⁶¹ muđmeħîl(‘e): yê ji berê ve wenda dibe

Dibûna sernişûvî⁶² pîs û bêrû
Ji ber qîra Resûlullahê mehrû⁶³

Zubeyrî gote Bûsufyan çewan e
Çira ted go Hubel bo me eman e

Çira dengê xwe naket pîsê bêcan
Çira destê xwe hilnadet di meydan

Ewî gote Zubeyrî dê bişemrîn⁶⁴
Tînazê xwe dilê min hinde meşkîn

Digel Allah xudakî ger hebûya
Muhammed ewhe galib nedibûya

Welêkin yek bûye dê yek bimînit
Şerîk û did û ‘ezlê kes nebînit

Hemî wan şûret û tîmsalê tê da
Hemû kir yek nehişt serda we pê da

Tewafa xwe tamam kir hat peya bû
Cihek bona deva Quşwa nema bû

Metafê⁶⁵ da pirê ku xel tijî bûn
Be wan rukn û meqam hê nû vijî⁶⁶ bûn

Peya bû ser milê beşl û rîcalan
Deva Quşwa şiyandin wan newalan

Gehişte ber meqamê kir du rik‘et
Nimêja sunnetê tewfet be hürmet

Vegerya hate zezem avê jê xwar
Wuđû jî girt ewî şahê şerefdar

⁶² sernişûvî: serberjêrî, serê wan diket xwarê

⁶³ mehrû(f): rûhêv, rûyê wî weka hêvê birîqandî

⁶⁴ bişemrîn: terk bike

⁶⁵ metaf(‘e): ciyê tewafê

⁶⁶ vijî: vala

Wuđûa wî ji destê hev revandin
Vexwarin hem li rûwê xwe reşandin

Ji dûr ve kafîran ewha didîtin
Digotan padîşe ewha bibîtin

Di mizgeftê ve rûnişt û bihîn da
Li ber Şiddîqî seknî şûrî dest da

Ĥeta ‘Uşmanê Têlhe muftê anî
Derê beytê vekir fexra cîhanî

Digel çendan heman bûn daxilê, tê
Du rek‘et kir we hat ber babê beytê

Li ber seknî we pur xwend û du‘a kir
We xuþbe xwend û eþkaman numa⁶⁷ kir

Berê xwe da Qureyşîyan Xeber da
Ji wan ra şîret û dilxweşî ser da

Ji wan pûrsî çî zennî ma dibin hûn
Ji min, hemyan cewab da Xeyrê Me‘mûn

Tu pişmamê kerîm û xeyrxewaz î
Dikin zenna ku bil qencî nexwazî

Nebî go ez jî çan Yusûf kerem kir
Bîla teşrîbê⁶⁸ wan dil bêelem kir

Mi jî tev we ‘efû kir bê ezîyyet
Nehêlim we di qeyda bend û zîllet

Gelek şa bûn dema ku vê bihîstin
Çewan ewwel ewan nedhat nivîstin

⁶⁷ numa(f): diyarkirin

⁶⁸ bîla teşrîb(‘e): bê lome

Hemana hatin û îmanê anîn
Ji bin kufr û çelalê xwe deranîn

Dilê gişkan xerabî bû welakin
Nikarîn fîtnekî axir ku rakin

Çiku me'lûm e kî vê ra neyar bit
Hemana dê be halê wî şiyar bit

Binêrin hîlm û feql û qencîya wî
Di dil da kê bigirta rencîya wî

Dida rûwê wî ef'alê neqencî
Welê nedkir bi wî ra qeş tu rencî

Be ser da hêj fikir jê ra du'ayan
Jibo ku qenc mehû ket îffîrayan

Dimalanda⁶⁹ li singê wî yedê xwe
Dibû tahir ji her keyd û bedê⁷⁰ xwe

Di qelban da tijî îman û Îslam⁷¹
Dikir taze ji dil dibya musluman

Dibên Şiddîqî çû babê xwe anî
Li ber Beytê ewî îmanê anî

Ji ehlê wî nema ser kufrê qeş kes
Be wan ra xweş kerem kir Şahê Eqdes

Dema Enşarîyan dîn fexrê 'alem
Be qewmê xwe mufferreḥ bûye, me'tem

Kirin gotin ewê êdî li vir bit
Medîna me biterkînit li vir bit

⁶⁹ dimalanda: destê xwe pê dida

⁷⁰ bed(f): xerabî

⁷¹ Haşîye: Di qelban da tijî îman û îqan

Be tenzîlê Xuda e'lamê dayê
Ji esmanan xeber hat û gîhayê

Heman gazîyî wan kir fexra 'alem
Dilê wan xweş kir û go huzn û ma'tem

Nekêşin, dê ezê dîsa li cem we
Bimînim gem neken naçim ji cem we

Di Mekke nozde rojan kir îqamet
Di pê fethê heta bû îstîqamet

Çi fethêk bû çi fethêk bû çi fethêk
Mubarek bit mubarek bit mubarek

Bi wê Îslamê xweş quwwet hilanî
Ewê heyfa cefayan tev deranî

Dilê îmanîyan wê cumle xweş kir
Hinavê kafîran wê zêde reş kir

42. ĞEZWEYA HUNEYNÊ

Dema Rebbî kerem kir fetħa mazin
Li hev şêwrîn Şeqîf û hem Hewazin

Ku derkevne qîtala ehlê dînî
Resûlullah nebit furset bibînî

Bikêşit 'eskerê şubhê suyûlan¹
Be ser wan vew biket qetl û qutûlan

Di pêşî jî hebû wan dujminayî
Welê nedhat feşalê tengînayî²

Dixapanda dilê wana ewana
Digotana di şêwrê da hemana

¹ suyûl('e): lehî

² haşîye: Fesal tu hat hebû wan tengînayî

Muħemmed rastî mêran hêj nehaye
Muqabil pehlewanan hêj nemaye

Hemana ‘eskerê xwe wan cevandin
Temamî sî hezar ‘esker gehandin

Bi rê xistin jin û zar û mewaşî³
Li pêş dikşan, muselleħ⁴ wan li paşî

Bibû qîra pez û hesp û dewaran
Devan û hêstiran û kal û zaran

Jibona kes neket pa ra⁵ firarê
Biken ħerbê ħeta hilden demarê⁶

Weha tedbîrê dîbû Malikê ‘Ewf
Ji talanê qe nedkir bîzîyû⁷ xewf

Gehîştin erdê Ewtasê Dureydî
Kurê Semmet dipursî ev çî vê dî

Beşer kor bû beşîret jî wekî wî
Dibêjin qoçê dozex⁸ bû wekî wî

Ewî serwext kirin ku ħal wehaye
Kire fikîn û go ev pur fenaye

Eger dest det li we meglûbîyû rev
Ewê talan û hêsîr bin hemû ev

We lazim mêr û tedbîr û sîlah e
Çikû we kuştin û ħerb û kîfah e⁹

³ mewaşî(‘e): pez û dewar

⁴ muselleħ(‘e): yên bi sîleh

⁵ pa ra: bi paş ve

⁶ demar(‘e): tunekirin, qirkirin

⁷ bîzî: tirs û endîşe

⁸ qoçê(t) dozex: beranê cehennemê

⁹ kîfah(‘e): herb û ceng

Evê bê ‘eqlîya hana biterkîn
Jin û zar û mewaşî tev bifetlîn

We ger ne, dê tu qirkî tev Hewazin
Qebîla Se’ d û hem qewmê di mazin

Qe Malik guh nekir vê we’z û pendê
We hey xebtî li hîle keyd û fendê

We go dê hûn bibînin ez çewan kem
Merama we kevin dê ez cuwan kem

Dureydî şîretan jî kir ne hilda
We gotî te ‘eqil nîne di vir da

Wekî naket ji vir dê ez bifetlim
Heta ku ez be ruswayî neqetlim

Nehîştin ku bifetlî ma li cem wan
Welê te’şîr nekir fikra wî cem wan

Xulaşe ‘eskerê wana bi rê ket
Be tertîb û be haye hûy û şewket

Nebî seh kir cemi’ kir ‘eskerê xwe
Guhast yalê Hewazin va berê xwe

Hemû dazde hezar şîrê Xuda bûn
Ji tîrs û sistîyû kêmi cuda bûn

Şed û sî elfê¹⁰ dîrhem neqdî kir deyn
Li eşhabê feqîr bexşî we kir zeyn¹¹

Ku tedbîra xwe hadir pê bibînin
Ji eşhabê di ‘esker paş nemînin

¹⁰ sed û sî hezar

¹¹ zeyn(‘e): xweşkayî

Di Mekke pur sîlah û dir'¹² û mîgfer
Sitand 'arîye¹³ da şehban peyember

Suwarî hin, pîyade hin ketin rê
Be keyf û şadî û hem zewq û fexrê

Çewan ku qet ne herb û ne geza ye
Dizanîna ku wan hafîz Xuda ye

Dema nêzîkî dujmin bûn şefê xwe
Kişandin dane e'dayan berê xwe

Lîwa û rayetan teslîmî şehban
Kir û her qewmekî yek dayê ew can¹⁴

Resûlullah suwarî Duldulê bû
Dirû' û mîgferê herbê jî lê bû

Cewasîsê di Malîk ewhe dîtin
Ji tintêla¹⁵ şehaban dûr ve dîtin

Ji tîrs û heybetê nedşîn¹⁶ bibêjin
Jibo Malîk sira halê birêjin

Çiye got tîrs û lerza we ne mêr in
We kifş e hûn be herba wan newêrin

Belê gotin cilê wana sipî ne
Li ser hespê belek heybetwerî ne

Be wana em dizanin kes nikare
Di herba wan kesek naket îdare

Be ya mebkî bifetlîn 'eskerê xwe
Nikarî tu nede wana berê xwe

¹² dir'('e): zirx, mertal

¹³ 'arîye('e): bi deyn

¹⁴ Haşîye: Kir û her qewmekî yek dayê ey can

¹⁵ tintêl: rewş, hal

¹⁶ nedşîn: nikaribûn

Li keyfa wan ket û go hûn newêrin
Newêrok in, ‘eware, qelsemêr in

Welê pur zêde bû tîrsa dilê wî
Ji qazancê qeta bû emelê wî

Ne wan fetland ne îzhara sîrrê kir
Be bal meqşûdê fikra xwe virê kir

Meger casûsê Îslamê li wê bû
Xeberdarê ji peşnîw şêwrê wî bû

Digotan hêj ewan mêran nedîne
Meger poçê¹⁷ beranan hêj nedîne

Şibe rabin be hev ra şef girêdin
Muqabil bin şure puşta şurê din

Biden puşt me’reka şeffa rîcalan
Jin û zar û giranî terş û talan

Bibit geyret ku sistîyê nekêşin
Bi hev ra şûr û lahoran bikêşin

Nedin wan newbeta çerb û qîrînê
Çikû ewwel kî dest hildet dimînê

Gelek bêhûde bincenkî li wan kir
Gelek forte ku te’şîrî di wan kir

Ewî casûsê çan seh kir çewan dî
Yeka yek gote fexra deşt û wadî

Nebî kenya we got fedla Xuda ye
Netirsin gunme¹⁸ ye bona we daye

¹⁷ poç: por

¹⁸ gunme(‘e): xenîmet

Şibe rabûn Hewazin dan hucûmê
Veşartin xwe hinek ehlê rucûmê

Jibo paş ve hucûm ken ew nizanin
Ji wan bukjin ku çawan pê dizanin

Dihatîn tîr wekî tavê bibarê
Ji ‘ewrê mahê Nîsanê biharê

Şehabe ehlê dîn şîrê îlahî
Hucûm dan ‘ewrê wana kirne şahî

Kirin qeşda genîme pêş ve bazîn
Ji paş ve da hucûm ser wan Hewazîn

Revîn ehlê Mekkew qewmê Selîmî
Hinan kir xainî namusteqîmî

Resûlullah tevî şed mêrê kerar
Fîrar nekrin kirin pur herb û pîgar¹⁹

Hilanî qemçekî²⁰ axê we lê xwend
Reşande wan berî her hîle û fend

Ferîşte penc hezar îmdadê hatin
Rim û şûr û sîlahê xwe hilatin

Semawîyan çêkir herb û gezayek
Tebarek şed tebarek şed tebarek

Revîn kafîr, Nebî kir gazî şehban
Werin paş ve biden wan herb û derban

Ji dûrayî nedayê nebihîstin
We yê haqîr be kuffarê dilîstin

¹⁹ pîgar: alîkar, destekdide

²⁰ qemçek: kulmek

Nebî go ‘emmî ‘Ebbasî tu carek
Li wan hilde şedayê xwe mubarek

Wisânî deng bulend û cehwerî bû
Ji nageh qîr bida kê, dilkerî bû

Reha çar sa‘etan wî deng diçûya
‘Eceb hikmet ji hed zêde diçûya

Dema ba kir bihîstin tev rîcalan²¹
Şeda ket lew hemû kuçew newalan

Li hev zivrîn di halê da geđenfer
Gehîştin me’reka tê da peyember

Te şîmşîran digota ateşînin²²
Didan tekbîr digotan dawêşînin

Ji çînge çîngê şûran dê çi bêjim
Ji qîra pehlewanan dê çi bêjim

Ji ber şûran dida herb îltîhabê²³
Tijî kir cehnemê goşt û kebabê

Ji kafîr yek suwarî bû wisa kî
Dikuşt çar teref bighêştîya kî

Di dest beyraqekî reş bû we rimhek
Dirêjî bê feşal û pê ve cum‘ek

Ji gîtrîfê²⁴ Hewazîn ew li pêşî
Ji nageh ve ‘Elî fexra Qureysî

Digel yekî ji Enşarî liqa bûn
Li qetla wî şedîdî hem teba bûn

²¹ Haşîye: Dema ba kir bihîstin tev rewalan

²² Te digo qey şûr agir in

²³ îltîhab(‘e): şewat û gûrbûn

²⁴ gîtrîf(‘e): mezin, xwedî otorîte

Şehaban xwe şidayî dane herbê
Kirin roja qiyamet pur ji derbê

Piran yexsîr kirin girdan û anîn
Di ‘erda tîrs û pursê va deranîn

Birîndarek giran bû Xalidê şer
Gelek jî kuştibû kafîr wî xweşmêr

Resûlullahî çû sehwasîya²⁵ wî
Dema ku dî cerahetdariya²⁶ wî

Ji tiryaqê tifa xwe xiste tê da
Şîfa bû ew di ‘eynê sa‘etê da

Ji Îslamê şehîd bûn çar û lêkin
Ji kafîr sê sed û heftê dibêjin

Esîr bûn şeş hezar nefse jin û zar
Ji naqe²⁷ bîst û çar elfê be ejmar

Ji zêde çil hezar egnamê anîn
Ji zîvê çar hezar ewqîyye anîn

Çiqas deynê di pêşî tev eda kir
Resûlullah, Xuda jê ra weha kir

Hey û hey jî dê nuşret parê wî be
Şehê qewman dê ustûxwarê wî be

Çikû wî mifte dest Cîbrîlê daye
Ewî gencîne bin tenzîlê da ye

Ewî ‘esker semawî ne ferîşte
Ji wî ra ‘esker û tedbîr çi tişte

²⁵ sehwasî(‘e): halpîrsîn

²⁶ cerahetdarî: birîndarî

²⁷ naqe(‘e): deveya mê

43. ĞEZWEYA TAÎF

Seqîf û hin Hewazîn hane¹ Taîf
Ketin kelhê Seqîfan cumle xaîf²

Be erzaq û sîlahê sale weqtê
Derê kelhê kişandin kirne sextê³

Resûlullah li rê barî⁴, di borî
Li bagê wan dema girte ‘eborî⁵

Xweyê bagê, xwe ‘asê kir be carek
Nebû teslîmê mewlayê mubarek

Nebî da emr û şewtandin wî bagî
Jibo reğma⁶ xudanê wî yên tagî

Meger Xalid digel ‘esker hezarî
Heman ‘esker peya kir ber hîşarî

Ji kelhê avêtin wana be tîran
Şehîd xistin ji wana dazde mêran

Kişand ‘esker muqabil berberojan
Ewan xiste heşarê hîjde rojan

Li wan rast kir dibab û mencenîqî
Dikir gazî digo mêrê heqîqî

Werin derkevîne herb û gezaê
Nebin rûreş di nava maweraê

Cewab da ‘Ebdû Yalîl go ne em tîn
Muqabil we ji kelha xwe ne der tîn

¹ hane: hatine

² xaîf(‘e): tirsî

³ sext(‘e): hişk, saxlem

⁴ barî: derbas bû

⁵ ‘eborî(‘e): bi ser de derbas bû

⁶ reğm(‘e): li hember

Dikarin em xwedî ken çendî salan
Di kelhê da xwe û beql û rîcalan

Di paşî dê emê şûran hilînin
Bikevne herbê ta qir bin nemînin

Şehabe ketne nîva yek dibabe
Ku kelhê qul biken lê bed ‘îşabe⁷

Ji kelhê va be şîşê şor weratin⁸
Heman terkandin û pa ra ve hatin

Ji kelhê va dihavêtin be tîran
Muheyver man ji tedbîrê debîran⁹

Resûlullah emir kir ku rez û bağ
Xerab ken da bibin teslîmê qaçağ

Birîn hindek, ketin fîzar û zarî
Kirin meherçîyê xwe rehm û Barî

Wisan hiştin yekî kir gazîyê wan
Be emrê fexrê ‘alem, şahê merdan

Kesê der bit ji kelhê bal me va bê
Li wechîllahî hurr e dê bila bê

Deh û çendek ji kelhê derketin der
Muşerref bûn be ruxsarê peyember

Ewan azadî kir her yek ji wana
Hinare cem yek ez eşhabê dana

Ku dîtin ehlê Taîf vê fe‘alê
Li wan zor hat welê çibken ji halê

⁷ bed ‘îşabe(‘e): çeteya xerab

⁸ weratin: bi ser wan de avêtin

⁹ debîr(f): îdarevan

‘Uyeyne lawê wî Huşnî Fîzarî
Be peyğember ve kir fîzar û zarî

Îzin de ez biçem nava Seqîffî
Bixûnim¹⁰ wan be bal dînê henîffî

Îzin da rabû çû kelhê, li cem wan
Be xaînî xeber da lê li cem wan

Ji wan ra got ji kelhê xwe neder bin
Welew hûn tev ji ser da tê da qir bin

Nekin piştî birîna dar û bağan
Giran nexwê¹¹ li we qeş weqt û çagan

Hemana em wekî kolan zelîl in
Ji te’dayû ji gedrîyê ‘elîl in

Dikarin xwe nexin bin minneta wan
Mudamî dûr biken xwey şewketa wan

Gelek bêhewde kir we’z û neşîhet
Li wan bar kir gelek qehr û feđîhet¹²

Dema hat fexrê ‘alem go te çan kir
Te çan şîret li rûh û canê wan kir

Ewî got ya Resûlullah mi tenbe
Li wan kir bêne Îslamê we tewbe

Mi got cennet wiha qencew sedîd e
We agir jî wiha zor û şedîd e

Nebî go qeş nebêje wan dirûgan
Meke bêhûde van firyew firûgan¹³

¹⁰ bixûnim: dawet bikim

¹¹ nexw(‘e): mezinayî, xurûr

¹² feđîhet(‘e): rezalet

¹³ firyew firûgan(‘e): îftîra û derewî

Te ewha got û ewha got û ewha
Beyan kir lê hemî şoz û direwha

Ji nû teşdîqî kir wellah resûl î
Li cem Ellah xwedî fexr û qebûl î

Xulaşê wê demê teslîm nebûn ew
Di kelhê xwe nixaftî bûn hemî ew

Xuda îzna xerabkîrnê nedabû
Resûlullah ji ser kişya we rabû

Du‘a kir got îlahî tu Şeqîfî
Hîdayet ke bîla wehn û deîfî

Giha Ce‘raneê fexra Qureyşî
Suraqe hem li wê dî hate pêşî

Musulman bû ji xwe feðlek hilanî
Gehişte feðl û fexra cawîdanî¹⁴

Li wê teqşîmî kir fexra zemînê
Ĝenîme çî hilabû wî emînê

Ĥeta hatin Hewazîn bûn musulman
Li wan bexşî hemû nîswan û ĝilman¹⁵

Diya fexra rîsalet nûrî sîma
Ĥelîma Se‘dîyew bînta xwe Şeyma

Esîr bûn nêv jin û zarê Hewazîn
Hewazîn wan virê kir da bixwazîn

Ji peyğember ji wan ra feðl û îhsan
Li wan îhsan biket ewlad û nîswan

¹⁴ cawîdanî(f): ebedî

¹⁵ ĝilman(‘e): ciwan, kole

Li Şeyma pur kirin tenbew qewîfî
Bike fîzarê pê ve çan te dîtî

Digotanê tu madem xwahera wî
Tu serbestî di mal û meħdera wî

Dizanîna wefadar û emîn e
Digotan dê bi te tev bexişîne

Çewan çû heçreta ‘alîw xeber da
Ji nav û qewmê nîşanê xwe ser da

Nebî nasî, be dîna wê fereh bû
Li ser kurkê xwe danîw munşerîh bû

Çi bêjim yek wekî fexra zemînê
Di wî halê ku xuşka xwe bibînê

Nebî go xwahera qenc û delalê
Bixwaze telbeke¹⁶ zîba xişalê¹⁷

Ezê îhsan bikem çawan bixwazî
Bidem qewmê te jî pur serfirazî

‘Efû kir qewmê wê tev şeş hezaran
Bi wê şa kir hemû wan dilfîkaran

Binêrin feql û îhsana îlahî
Xela¹⁸ bûn tev ji korayîw tebahî¹⁹

Di bin beyraqê feqla mer’etek da²⁰
Bi wê bûn daxilê çî hîkmetek da

Îlahî hey wiha feql û keremkî
Me tevlî zumreya ehlê keremkî

¹⁶ telbe(‘e): daxwaz

¹⁷ zîba xişal(‘e): exlaqxweş

¹⁸ xela(‘e): xaric, dûr

¹⁹ tebahî(‘e): mehwbûyî

²⁰ Haşîye: Di bin beyraqê feqla hurmetek da

Çikû îhsan û îh'ama te 'am e
Dema tê, seylekî²¹ zafê tamam e

Helîme ummê hêva qewmê Se'dî
Dema ku fexrê 'alem wê li wê dî

Gelek şa bû ji şayan dem'ê barî
Ridaa xwe jibo²² raxiste xwarî

Li ser rûnişt delal û hem be 'îzzet
Ji ser qelbê xwe hilda barê minnet

Musulman bûn û teşdîqî rîsalet
Kirin dûr bûn ji kufr û hem çelalet

Resûlullah gelek jî malê da wan
Ji wê zivrîn be dilxweş û musulman

Xulaşê kes di hêsîrî nehiştin
Be keyfa xweş be erdê xwe gehiştin

Belav bû mal û talan û zexîre
Gehiştê hadîrî herba li îre²³

Resûlullah dinasî her çêfî
Di îman û di wî dînê henîfî

Dema teqsîmî kir malê genîmê
Gelek da wan ji wî malê kerîmê

Di îman qewîdil bûne be çerzê²⁴
Nema îmanê da qeş şed²⁵ û derzê

Ji Ce'rane Nebî eħramê 'umre
Girêda 'umre kir zivrî li îre²⁶

²¹ seyl('e): lehî

²² jibo: ji wê ra

²³ li îre: li wir

²⁴ çerz('e): şekil, awa

²⁵ şedi'('e): terk, neqeb, derizîn

Ji wê rabûn û zivrîne Medîne
Îlahî dînî wî nekbet²⁷ nebînê



²⁶ yanî vegeriya Ce'rane

²⁷ nekbet('e): felaket, tengasî

44. ĞEZWEYA TEBÛK

Li Şamê cemi' bûn cem Qeyşerê Rûm

Neşarayê 'ereb hem cem'ekî Rûm

Digotin nêv 'ereb qeḥṭ û ğela ye¹

Ji ta² furşet li herba wan niha ye

Guhê Qeyşer tijî bû kizb û tezwîr

Heman xebtî li 'esker hay û tebdîr

Qubazê³ mazinek wana virê kir

Digel wî çil hezar 'esker li rê kir

Gelek zengînê malê bûn kuffaran

Be tebdîr û muselleḥ bûn neyaran

Nebî seh kir nebû quwwet di nasan

Jibo tebdîrê erzaq û lîbasan

Reha dîr û di raz û tev peya bûn

Di pêşî deşt û kendal û çîya bûn

Welê gem nîne wan mewla şiyar e

Hey û hey jî be wan ra dost û yar e

Resûlullah emir ku go de rabin

Li herba Qeyşerê Rûmê cema bin

Du şed naqe heman 'Uşmanê 'Effan

Muheya⁴ kir digel eḥlas⁵ û kurtan

Du şed ewqîyye jî hem zîvê anî

Jibo tebdîrê wê ceyšê⁶ giranî

¹ qeḥṭ('e): hişkayî, xela

² ji ta: ji te ra

³ Qubaz: qumandarekî Herakliyûs

⁴ muheya('e): hazir

⁵ eḥlas('e): bin kurtan

⁶ ceyš('e): artêş, ordû

We hem Şiddîqê Ekber çar hezaran
Ji dîrhem xiste ‘ewna ser neyaran

We ‘Ummer malê xwe du behrî çê kir
Temam behrek jibo ‘esker virê kir

Du şed ewqîyye fiðde lawê ‘Ewfî⁷
Teberu’ kir jibo tedbîrê xewfî

We heftê wesqî temrî⁸ ‘Asim anî
Xulaşe rebbê ‘alem lêkî anî

Resûlullah ji wan ra pur du‘a kir
Ji ‘Uşman ra gelek medh û şena kir

Şiyande Mekke û dîger qebîlan
Mukatîb û cewab û hem resûlan⁹

Bila bîn û bila bîn û bila bîn
Digel Rûmê me cengê xweş bila bîn

‘Elî kir walîyê Teyba xwe rabû
Digel wî sî hezar ‘esker cema bû

Belav kir rayet û elwiyye¹⁰ xwe
Li eşraf û serê eşhabeê xwe

Ji rê lawê Ubeyyê ew munafiq
Vegerya paş nebû vê ra muwafiq

Munafiq lê cema bîn û digotin
Eva Rûm in, ne zarok in digotin

Şibe hûnê bibînin tev ewana
Esîr ken tev girêden wan hevana¹¹

⁷ ‘Ebdurrehman îbnî ‘Ewf

⁸ 70 bar xurme

⁹ resûl(‘e): qasid

¹⁰ elwîyye(‘e): piranîya lîwa, beyreq

Wekî herba ‘ereb vê jî dizanî
Muḥemmed beṭliya wana nizanî

Resûlullah be weḥyê bû xeberdar
Ji van ehlê nîfaq û gotinên şar

Hemî kir eşkere sirrê di wana
Beyan bû cem hemî kes virrê wana

Gelek paş man hinek bêçaretî bû
Welê hin jî nîfaq û dujminî bû

Ebû Xeyseme jî mabû ji pa ra
Ji mecbûrî we tedbîr û mudara¹²

Dema çû bağçeê xwe dî sîha wî
Xweş e tê da geş e sêv û biha wî

Be ‘eqlî şewirî wê keyf û ḥalê
We go wellah ne însaf e di malê

Bikem raḥet vexwem vê avê hanê
Resûlullah di te’b û germîyanê

Li bin daran birûnim cem nîgaran¹³
Resûlullah li nêv deşt û qîfaran

Li cem ‘Eyşo Xeco kem keyf û şuḥbet
Resûlullah bikêşet te’b û muḥnet

Şela da zewcetan ha ha tedarek
Biçim bighêjime şahê mubarek

Heman tedbîrê dîtin herdu zewcet
Suwarî naqe bû, filḥal birê ket

¹¹ yanî wan bi hev ve girê bidin

¹² mudara(‘e): nezaket

¹³ nîgar(f): dîlberên xweşik

Giha bûne Tebûkê, ew giha wan
Li wê bû haðirê cem‘îyyeta wan

Dibên ava Tebûkê hindikek bû
Ne pêkhatiyê wê ceysê gelek bû

Resûlullahî qemçek jê hilanî
Di dev werda we rêhte nêvê kanî

Wekî karêzê¹⁴ der bû av û lîlav
Tijî bû qişlegaha wan cûwê av¹⁵

Niha jî tu dibînî bağ e bostan
Gelek şîn e di havîn û zivistan

Nebî Xalid şiyande cem Ukeyder¹⁶
Li Kelha Dewmetîl Cendel li ew der

Li ser Neşranîyan ew padişîa bû
Hireqlî şewketek pur jê ra dabû

Nebî go, wî di nêçîra dewarê
Di kovî, Xalidê mêrê hewarê

Tevî çar şed geđenfer çûne pê va
Şeva rewşen bû dîtîni tê ji wê va

Birayê wî Hisan vêraye wê tîn
Dewarek kovî hildane li pê tîn

Dema dûrî di wan ‘esker periştin¹⁷
Ewî girtin, bira lê hate kuştin

Be wan ra çend gulamkê bûn, revîn tev
Xwe meşhûr e kela mêran rev û şev

¹⁴ karêz: kanî

¹⁵ cûwê av: cihoka avê

¹⁶ Ukeyder b. ‘Ebdulmelîk, qiralê Kînde

¹⁷ periştin: qontrol, tefûşkirin

Heman anîn selamet wan Ukeyder
Gehiştandin derê xîma peyember

Resûlullah ji xûna wî bihorî
Xeracê danî ser berda we borî

Gelek hatin li wê dîtin peyember
Xerac girda¹⁸ li ser wan defî' kir çer

Li Hemsê bû Hireqlî bo hinara¹⁹
Nemîqek²⁰ beşê wî têtin ji pa ra

Deh û çend rojekê seknî li ew der
Nekir herb û geza û kerr û hem fer

Welê ehlê kîtab tevda revî bûn
Qulûbê wan ji xewfê pur teji bûn

Resûlullah emir kir go rehîle²¹
Berê xwe dane Teybe qefle qefle

Di nav rê bîstê mizgeftan bîna kir
Li xîmdanîna dîne î'tîna kir

Munafiq vê re bûn, qeşda xerabî
Kirin, lê qeti' kir Mewla xerabî

Li hevdu şewirîbûn hîlebazan
Nebî gava kete gêdûk û gazan²²

Emê fendek biden bavêne erdê
Ji ser heywan wisan kû mîne²³ erdê

Be emrîllah ketin têngasîyek da
Zînar û zuğr²⁴ û hem rê asîyek da

¹⁸ girda: girê da

¹⁹ hinar: şandin

²⁰ nemîq(‘e): mektûba nivîsandî

²¹ rehîle(‘e): birêketin

²² gaz: girik

²³ mîne: bimîne

Yekî destkêş dikir naqew yekî dî
Li pê dajot ji nageh qewmekî dî

Li pê wan dane ser wan kirne ʔengî
Deva fexra rîsalet girte bengî

Wisani sil²⁵ bû ku eşya hin hilavêt
Heman ew bû Resûlullah neavêt

Resûlullah li wan qîrek hilanî
Kî e' daellahi îleykum 'enni²⁶

Xwe pêça bûn ku kes wana nenasî
Ji reng û yan ji deng û yan lîbasî

Be lez tev 'eskerê bûn da nebîne
Kesek wan, lê Nebî zanî ku kî ne

Dema şehban bihîstin maceraê
Li peygember ketin zar û rîcaê

Bide nîşan û nasîn em bibînin
Emê filhal serê wana jî bînin

Nebî kir meni' go dê xel bibêjî
Muhemmed şehbê xwe încar dikujî

Dema nêzî Medîne bûn be şayî
Jin û zar çûne pêşî tev tebayî

Wekî nahîde²⁷ reqş û bazîya wan
Wekî wîldanê cennet şahîya wan

Ji qîr û şewtê Dawûde tebarek
Ruħ û qelban ji nû tanîn be carek

²⁴ zuğr('e): zixur, neqeba nava çiyar

²⁵ sil('e): tirsîn

²⁶ Ey dijminên Xweda! Ji min li we ye

²⁷ nahîd('e): yê dîloka dinihurîne

Dibên heştê û çend mabûne pa ra
Nebî go kes bila nexêve wan ra

Ji wan yek Ke'bê Malik Xezrecî bû
Welê îman di dil da pur bi cî bû

Murare yek Hîlal ew her du Ewsî
Gelek îman qewî bûn çan bipursî

Jibo van hersîyan kir întîzarê
Heta Cîbrîlî tiştik bîne xwarê

Çikû rast gotibûn û hem Nebî jî
Dizanîbû be wan û hem hemî jî

Gelek ew her sê ketne tengiyê da
Dikirna ku xwe bukjin koriyê da

Şev û roja ketin şîn û girînê
Meger Cîbrîl jibo wan ka çi bînê

Heta der heqqê wana hate tenzîl
Ji esmanan be wehyê hate Cebrîl

Welê ehlê nîfaqê 'uzrê xwestin
Be kîzûb û fîrye²⁸ xwe dil dibestin

Nebî 'uzrê di wan zahir qebûl kir
Di başîn lê Xuda wana melûl kir

Resûlullah helîm bû hem dizanî
Ku kufra wan ji wan naçêt zemanî

²⁸ fîrye(f): derew

45. DI HEQÊ SERÎYEYÊN HZ. MUHEMMED (S.‘E.W) DE (Pêncî û Şeş in)

Resûlullah dikir cehd û cîhadê

Jibona quwweta dîn îctîhadê

Gelek îza dikêşa pur cefa jî

Didîta lew Xuda kir Muştefa jî

Heçî seyra bi xwe çûye geza ye

Çê bû herb û çê ne ew her wisa ye

Welê yê ‘eskerê xwe rê kiriye

Bi xwe neçwe dibên jê ra serîyye

We ger yek tin şiyandî ew jî be’şe

Çiku meqşed ji wê tefîş û behs e

Hurûbê wî neh û bîst in temamî¹

Seraya pencîyû şeş ey kîramî²

Geza borîn di pêşî da be tefşîl

Serîya tèn Xuda hez ket be te’cîl

¹ Temamê herbên ku kirine 29 in.

² Seriyeyên wî jî 56 in.

**46. SERÎYEYA HZ. HEMZE B. ‘EBDULMUTTELÎB (R. ‘E) YA LI SER
KARWANÊ QUREYŞÎ YA JI ŞAMÊ TÊ**

Resûlullah ku hîcret kir Medîne

Heman xebtî ku tedbîrek bibîne

Jibo ku dîn qewî bit hem rîsalet

Biket îcra, hilînit tev ðelalet

Xuda wehya cîhadê şande balê

Yeqîn zanî ku nabînit zewalê

Heman Hemze tevî sî mêr muhacir

Bi bal ‘îra Qureyşan ve virê kir

Çiku seh kiribûn ku wê Ebû Cehl

Digel sê şed Qureyşan cebel û sehl¹

Qetandin, karê wan anîne cîkî

Ewî barê xwe bavêjin li cîkî

Xulaşê Hemze çû da wan bibînî

Li dev behrekî bû laqî le‘înî

Şefan çêkir ku dakevne gezaê

Biken herb û qirîn û helwelaê

Heman Mecdê kurê wî ‘Emrê Cehnî

Kete şulhê heta da herbê wehnî

Teftand wî agirê herbê be carek

Sebeb bû ew jî bû şulha mubarek

Jibo ðe’fa xwe jî Îslam be şek bûn

Çiku ew hindî ku kafîr gelek bûn

¹ cebel û sehl(‘e): çîya û deşt

Jibo Îslamê qenc bû şulhê hana
Li cî ma şewket û namûsê wana
Xulaşê wan nedîtin herbê ev car
Vegeryan hatine cem xeyrê exyar

47. SERÎYA ‘UBEYDE B. HERŞÊ B. MUÛTTELÎB BAL NEWALA RABÎGÊ VE

Di puştî heşti mahê hîcretê da¹
Qureyşî çûne karwanê bû tê da
Ebû Sufyan û şed mêr jî be wî ra
Ji wî halî xeber çûbû Nebî ra
‘Ubeyde lawê Herşî xiste nijde
We hem şêşt pehlewanan da ‘Ubeyde
Di betnê² Rabîgê avêne pêşî
Şikestin hem revîn ber wan Qureyşî
Dizanîna ku wan îmdadê têtin
Li wan kîna kevin dê bête rêhtin
Jibo herbê neçêbû qeç çû tadbîr
Welê Se’de Ebî Weqqaşî çend tîr
Li wan da çend birîndar kir ji wana
Dibên tîrê wî nedborî ji wana
Vegeryan hatine Teşbe selamet
Qureyşî tîrsiyân û kirne heybet

¹ heşt meh piştî hîcretê

² betn(‘e): newal

48. SERÎYA SE'D B. EBÎ WEQQAS (R.'E) A BAL XERARÊ VE

Şiyande pêşî karwanê Qureyşan

Resûlullah ewî Se'dê 'elîşan

Kudandin¹ xwe gehiştandin Xerarê

Newala ku li Cuhfe tene xwarê

Nihêrîn borîye karwan û fetlîn

Li herb û kuştinê ev car neheblîn²



¹ kudandin: bi rê ve çûn

² neheblîn: pêk neanîn

49. SERÎYA ‘EBDULLAH B. CEÛŞ (R.‘E) BAL NEWALA NEXLEYÊ VE

Resûlullah şevêk mēja¹ ‘îşa kir
Vegerya jê we gazî ‘Ebdullah kir

Emir kir got çewan rabûy şebahe
Li vir hadîr bibe tevli sîlahê

Resûlullah nimēja şubhe çan kir
Nihêrî ‘Ebdullah ku vaye hadîr

Ubeyyê lawê Ke’bî xwend² û anî
Nivîsî kağidek jê ra nihanî

Emir kir go nexûne vê nemîqê
Heta du roj dewam key ser terîqê

Digel wî heşti mêran jî virê kir
Ji wan ra kir du‘a û wan be rê kir

Du roj çûne bi rê da paşê anîn
Nemîqa fexrê ‘alem sirrê zanîn

Nivîsîbû berê xwe bidne Nexle
Di orta Taîf û Mekke bû Nexle

Kesê naê hevalê te be zorê
Neke girtî bila paş ve nezîvrî

Herin teftîş biken halê Qureyşan
Beyan ken belkî em wan ken perîşan

Hevalan ra beyan kir, kes nema paş
Hemî çûn vê ra mêrê bevl û pur baş

Be du şexşan devek bû çûn gehîştin
Li Behran zend û bendan hildimiştin

¹ mēja: nimēja

² xwend: gazî wî kir

Jibo keyd û jibo hîla Qureyşan
Xuda Îslamê naket qeṭ perîşan

Li wê Se'dê Ebî Weqqaş û 'Utbe
Kurê Ğezwan deva xwe kirne geybe

Li pê geryan û 'Ebdullah û şehban
Li rê çûn ta gehiştin wî cihê wan

Li ser rê sekinîn dîtin ji nageh
Be karwanê Qureyşan bûne ageh

Serê xwe kur kirin da ku nezanin
Li nav rê sekinîne nijdevan in

Dema serkurkirî wan dîn Qureyşan
Digotin hac in kes naken perîşan

Be serbestî li wê barê xwe danîn
Heman şehban li keydê dest hilanîn

Yekî kuştin didû hêsîr gerandin
Hinek dî jî revîn wan neqeflandin

Kirin talan ewî karwanê tev da
Li rê anîn gelek nav û şeref da

Di Îslamê eva talanê ewwil
Welê kuffarê ser wan kirne muşkil

Digotana ku der şehrîl heramê
Muḥemmed nake perwa ihtîmamê

Dibe talan û hem dukjî rîcalan
Ewê daxê di herme da qîtalan

Qureyşan qaşidê xwe hin hinarin
Be bal fexra rîsalet da beyarin³

Ewan her du hevalê xwe ku yexsîr
Bibûn fîdye biden ger bibte teysîr

Nebî go du neferê me nihane⁴
Eger wan kuştibin ev rehnê⁵ wane

Di puştî çendî rojan her du hatin
Yedê esrê⁶ ji ser wana hilatin

50. SERÎYA ‘UMEYRÎL E’MER ÎBNÎ ‘EBDÎ (R.‘E) JIBO KUŞTINA ‘EŞMA BÎNTÎ MERWAN A YEHÛDÎ

Jinek navê wê ‘Eşma pur bela bû
Be dujminî Nebî pur muftela bû

Resûlullah ‘Umeyrî bal ve rê kir
Ji herdu çehvê kor bû tenbe lê kir

Be şev çû kuşt li pê xwe zivîrî Teybe
Nimêja şubhê ew şev kir di Teybe

‘Umer go ca binêrin korê bêçev
Çi mêranî û nuşret kir di îşev

Nebîyûllahî go: Bîna⁷ bibêjin
Qe jê ra kor û nabîna nebêjin

Çiku ev fe’lê bînayê be çav e
Ji bîna jî ne yê bêdil zirav e

³ beyarin: tên

⁴ nihane: nexuyane

⁵ rehn(‘e): rehîne

⁶ yedê esrê(‘e): destê hêsîr girtinê

⁷ bîna: kesê dibîne

51. SERÎYA SALÎM B. ‘UMEYR (R.‘E) JIBO KUŞTINA EBÎ ‘EFEKÊ YEHUDÎ

Ebû ‘Efkê yehûdî pîs û mûroğ¹

Şed û bîst salî bû lêvşorê çarog

Be şe’rê xwe dida dujminî Îslam

Nelaîq pur digot ew pîsê yednam²

Jibo peygember û yê balê qaîm,

Nebîyûllah şiyande pêşî Salîm

Here go bukje wî pîsî geber ke

Ji nav dest û pîyan wî derbeder ke

Bila ewqas wekî kelban ne‘ewtî

Be dujminî wî, kes êdî nelewtî

Ku Salîm çû şevêk pur ruhînî bû

Xebîs nav cihê xwe raketibî bû

Li ser singê wî Salîm şûrê danî

Di nav puştê li doşek va deranî

Mirar kir wî heramê bedmeqalî

Ji sebb³ wî xelaş kir fexrê ‘alî

¹ mûroğ(t): yextîyarê hezizî

² yednam(‘e): xwedî nav

³ sebb(‘e): zimandirêjayî

**52. SERÎYA MUHEMMED B. MUSLEMEYÊ EWSÎ (R.‘E) JIBO KUŞTINA
KE’B B. EŞREF**

Yekî zikmeşkê serdîzê¹ musexxef²

Digotan wî xebîsê Ke’bê Eşref

Şeref jê dûr bû wellah bêşeref bû

Xebîs û pîs û şexşek namerif³ bû

Bibû reysê yehûdanê Hîcazî

Bi malê pur be keyd û hîlebazî

Di dev dabû zimanê marê erqem⁴

Dida-jminî mudam bo fexrê ‘alem

Be şe’rê xwe dikir kişkiş sekê har⁵

Li ser peygember û hem şehbê exyar

Li hev şêwrîn ew û cem‘a yehûdan

Nebî bukjin li cem xwe wan hesûdan

Kirin gazî li ser navê diyafet⁶

Birin mala serê keyd û xiyamet

Digel bûn şehbê, Cîbrîl hate xwarê

Xeberdar kir ji wê keyda kuffarê

We hem jî wî nixaftî ta nedîtin

Ji wê derket nema ku fetkî⁷ bêtin

Nihêrin ku li wê nîne belav bûn

Dema şehbê resûlullah cema bûn

¹ serdîz: wek beroşê sermezî

² musexxef(‘e): ehmeq

³ namerif: nemeriv, ne însan

⁴ erqem(‘e): marê herî xerab

⁵ sekê har: kûçikê har

⁶ diyafet(‘e): ziyafet

⁷ fetkî(‘e): nêrîn, hatin

Nebî go ka kîye merdek be geyret
Be merdî Ke'bê da bukjê be 'îbret

Muħemmed lawê Muslîme qiyam kir
We got ya fexrê 'alem va me ħadır

Digel bûn çarê dîtir îzin xwestin
Di keyd û ħîleyan em siħrebest in

Resûlullah îzin da ew bi rê bûn
Jibo xewna wî dindanê gurî⁸ bûn

Dema hatin ħuďûra wî xeber dan
Ji ŧekwayê Resûlullah be ser dan

Digotan ŧedeqe daniye ser me
Welêkin nîne tiŧtek bête ber me

Hilanîn hev we çûn ŧe'bul 'Ecûzê⁹
Jibo emrê Nebî bête nifûzê

Ebû Naîle girt pora serê wî
Qepaçe kir¹⁰ birî keyd û ŧerê wî

Li ber ŧûran wekî gayê qeŧaban
Kirin qet qet wekî goŧtê kebaban

Mirarî wî kirin torbek hılanîn
Serê wî bo Resûlullahî anîn

Yehûdan seh kirin tev dane pê wan
Neqeflandin çiku rê der dihatan

Dema gehiŧtine Beqîê' Ğerqed
Be ŧewtê 'alî dan tekbîrê bêhed

⁸ dindanê gur: diranê gur, pehlewan

⁹ Mehela Ecûzê

¹⁰ qepaçe kir: zevt kir bi hijdîn

Resûlullah ji tekbîran yeqîn kir
Ku wana kuştine wî pîsê makir

Yehûdî tîrsîyan tevzîn¹¹ di cih da
Ne dizviryan be serbestî di dih¹² da

Birin cem fexrê ‘alem va şîkayet
Ku bedbextî li me kirnew nîkayet¹³

Çira şehbê di we reysê me kuştin
Çira rûmet me nav xelqê nehiştin

Nebî îjmarit tev bedbextîya wan
Li derê dînê dujmin sextîya¹⁴ wan

Bihîstin tev yeqîn zanîn belaş e
Nebit şulhek îdara wan li haş e¹⁵

Ketin lava, kirin şulhek tamamî
Ji hev serbestî bûn her du tamamî

We meşhûr e dibêjin ku bizin mir
Sehil bû îş û ‘îş¹⁶ û hem vemir gir¹⁷

¹¹ tevzîn: tevîzîn, sekinîn

¹² dih: gund

¹³ nîkayet(‘e): tîştê acizî û xisarê dide

¹⁴ sextî(‘e): hişkîw zorbatî

¹⁵ haş(‘e): vala, beyhûde

¹⁶ ‘îş(‘e): debar, heyat

¹⁷ gir: ‘esabîyet, kîn

**53. SERÎYA ‘EBDULLAH B. ‘ETÎK (R.‘E) JIBO KUŞTINA EBÎ RAFÎ’
SELLAM B. EBÎL HEQÎQ**

Dema Ewsî ku kuştin Ke’bê geddar
Li hev şêwrîn hemû Xezrec şerefdar

Kîye mînanê Ke’bî nav me da jî
Emê bukjin şeref hilden xwe ra jî

Ebû Rafî’ Sellam gotin wisa ne
Nebî ra dujminek pîsê yeman e

Ewî daxist şerê Xendeq li ser me
Kîşand ehezab ewî ehezab li ser me

Jibona kuştina wî penc gedenfer
Muheya bûn û çûne cem peyember

Îzin xwestin Nebî jî îzin da wan
We ‘Ebdullahî da amir li ser wan

Du‘a kir pur ji wan ra jî mubarek
We go nekjun jin û zaran be carek

Ebû Rafî’ di wê gê¹ bû li Xeyber
Kirin te’cîl gehiştandin xwe ew der

Be şev girtin demadorê li xanî
Wekî gurgê² ji emrê asîmanî

Hemî deryan kilfd kirnew hila bûn
Li ber oda ku tê da bû cema bûn

Li qata jorê bû ednayê ‘alem³
Li ber danîbû yek merqayê sullem⁴

¹ wê gê: wê gehê, wê demê

² gurg(f): gur

³ ednayê ‘alem(‘e): sinifên bilind

⁴ merqayê sullem(‘e): pêlika merdîwen

Be wê ve derketin jorê cihê wî
Kirin gazî be derket zewceê wî

Sual kir kîne, gotin em gerîb in
Emê erzaqê bikrin namurîb in⁵

Ewan bir hundur û ku pê gehîştin
Derî bestin li ser wî tê ve kuştin

Jina wî kir hewar ket tirsê tê dan
Be lez rabûn be sullem va xwe berdan

Heman lawê ‘Etîkî jor ve ket xwar
Ji cîh çû lingê wî hem bû birîndar

Heman hildan ku bîn, bû qîr û zarîn
Hewarî, wê şevê pê wan ve danîn

Li wan geryan be mûm û wer be fanûs
Gelek zivrîn li wan ew qewmê salûs⁶

Ewan jî xwe veşartin ta ku ker bûn
Be lez rabûn li bazdana xwe wer bûn

Gehîştin Teybe çûne cem peyember
Mufferreh bû du‘a kir xeyrê serwer

Li ser lingê birîndar destê malî
Heman vê ra şîfa bû jî nenalî

⁵ namurîb(‘e): ne bişubhe

⁶ salûs(‘e): du rû, munafîq

54. SERÎYA ZEYD B. HARÎŞE (R.‘E) YA BAL QARDEYÊ, SER KERWANÊ QUREYŞAN VE

Dema dîtin di Bedrê da Qureyşan

Ku dîtin tîrsîyan û bûn perîşan

Ji Bedrê rê guhaştin alîyek dî

Digotan Qeredet navê wî erdî

Di wê va çûne karwanê li Şamê

Be wê agahî bû Xeyrê Enamê

Şiyand Zeydê kurê Harîşe ‘aqil

Digel şed mêrê ebталê helaħil¹

Li ser avê gehiştin kariwanê

Revîn mêrê li ser çawan gihanê

Hemî talan kirin anîn û rehber

Li wê bû wî jî anîn cem peyember

Musulman bû Nebî malê xumûs kir

Xumûs wî bîst hezarî zêdetir kir

¹ ebталê helaħil(‘e): betlên biquwwet

55. SERÎYA EBÎ SELEME ‘EBDÛLLAH B. ‘EBDULESEDÎ (R.‘E) YA BAL QEṬENÊ VE

Ṭelîhew Seleme lawêd Xuweylîd
Nebî ra bûne did û hem mu‘anîd

Resûlullah bihîst ku şewirîne
Di fikra herbê wî da êwirîne¹

Nîda kir ‘Ebdullahî kur metê xwe
Bişînit nijdehê bal xidmetê xwe

Jibo ra da lîwa û hem jî ‘esker
Şed û pencî ji eşhabê geđenfer

Gehîştin bin Qeṭen talan hılanîn
Be gavan û şivanê wan ve anîn

Nişêf² kirne Medîne bê mekîde³
Ewî talanê bê hedd û ‘edîde⁴

Ewel para delîl da paşê kir par
Ji pencan çarê da wê ceyšê muxtar

¹ êwirîn: civîn û bicî bûn

² nişêf: nişêv, serejêrbûn

³ mekîde(‘e): entrîka, hîle

⁴ bê hedd û ‘edîde(‘e): bê hed û jimar

**56. SERÎYA ‘EBDULLAH B. UNEYS EL CUHEMÎ ESSULEMÎL ENŞARÎ
(R.‘E) JIBO KUŞTINA SUFYAN B. XALÎDÊ HUZELÎ¹**

Nebî seh kir ku Sufyan lawê Xalid

Li ser fikra fesadîyew mekaîd²

Dilê wî ew dixapînit ku ‘esker

Biket bê ser Medîne ser peyember

Resûlullah şiyand lawê Enîsî

Here go bukje wî bedbext û pîsî

Nîşanê wî sual kir hem îzin xwest

Jibo hîlan, Nebî gêr³ ewî serbest

Nîşanê wî ew e ku wî bibînî

Ji xewfa wî di heybet da dimînî

Bi tin tenha kete rê merdê dana

Li beṭnê ‘erne⁴ bû tev cem‘ê wana

Dema çehvê wî pê ket tevzî hatê

Ji wê ew nasî nava wê cevate

Li pê bûn cem‘ekî pîsê wekî wî

Dimeşyana giranî nêzîkî wî

Ji ‘Ebdullahî pursî çi kesî tu

Tu dost î, dujmin î ma çi ‘esî tu

Ewî got ez Xuza‘î me mi seh kir

Te fikr e ku biçî herba wî şahir

Bibim tevlî we ez jî bême herbê

Bibim enbazê⁵ we der qetl û ḡerbê

¹ Di Siyera Asim Köksal de Xalid bin Sufyan derbas dibe.

² mekaîd(‘e): enrîqca

³ gêr: gerand, kir

⁴ beṭnê ‘erne(‘e): nava devîyan

Dizanim dûrî ‘eql e de’weya wî
We hem bê kakil e nebîtiya wî

Xulaşê got û got van gotinê han
Kîşand meyla wî bal xwe ve be burhan

‘Edûwwî go belê min dil wisane
Nezanit hêj ku mêranî çewane

Wekî min rastî beçlek hêj nihaye
Kesî jî derbekî baş lê nidaye

Be şev lê da dema ku ket feşalê
Serî jî hilkir û xwe dayê alê

Be roj hat û be şev hat û be xef hat
Di gaz û banî û hem ber çeref hat

Serî anîw Nebî jê ra du‘a kir
Gelek şadanê bû medh û sena kir

⁵ enbaz: heval, dost

57. SERÎYA ‘AŞIM B. ŞABÎT ELEŖSARÎ (R.‘E) YA BAL RECÎ‘Ê VE

Dema Sufyanê Xalid hate kuştin
Benû Leħyan li ħeyfa wî periştin¹

Li hev cevyan Huzeylanê di Leħyan
Ketin bêbextî û fetlan û ħîlan

Gihane ‘Eđl û Fare² şêwrê danîn
Ji wan ra çendî naqe şozê danîn

Be xapandin ku çend şehbê Mûħemmed
Ji wan ra bibne ber şûrê mûħedded³

Şiyandin cem Nebî ħeft mêrê zana
Ku çend şehban virê ket erđê wana

Digotan em musulman in, nizan in
Ji dînî tiştêkî da em bizanin

We hem Qur’an bidin dersê cuwanan
Bibin hîra be wan tev musulmanan

Nebî jî hem di dil bû ku bişînit
Be bal Mekke ve qaşid da ku bînit

Ji exbar û ji eħwalê Qureyşan
Biket teftîşî her efkar û her şan

Ku wan jî xwest, Nebî şeş ten virê kir
Li ser wan ‘Aşimê Şabît serî kir

Gihan ava Recî‘ê nav Huzeylan
Li wana ‘Eđl û Fare ketne ħîlan

Xeber dane Huzeylan ser ve hatin
Du şed mêrê be şûr û rim ve hatin

¹ periştin: civîn û teftîş kirin

² Di Asim Köksal de navên qebîleyan ‘Eđl û Qare derbas dibe.

³ mûħedded(‘e): tûj

Heman şîrê Xuda ‘Aşim be şûrê
Xwe girt şehbê di wê xwe dane dorê

Ketin şondê direw fetlan Huzeylî
Ku em we nakujin naken rezîlî

Nexapan û ketin herb û gezaê
Cewab dan em tu car naêne raê⁴

Dibên ‘Aşim di kîsik heftê tîran
Hilanîbû jibo gedra şerîran

Be her yek jî mirar kirbû xesîsek⁵
Di qewmê xwe ku her yek bû reîsek

Ji ew şûn rumhê girt û rumhê bazî
Dikir hetta şikest ma şûrê tazî

Emir ‘Aşim digel Xalid we Mursed
Şehîd bûn çûne Firdewsî muebbed

Xubeyb û Zeyd û ‘Ebdellahê Tariq
Revîne ser çiyakî ‘alî şahiq

Ketin pê wan wekî revda gurê har
Ewan girtin we kuştin axirê kar

Be darê ve Xubeybî ‘elliqandin
Li Mekke wî delalî şeniqandin⁶

Li wan nifrînî kir salek ne borî
Ku hatin kuştinê yek yek be zorî

Resûlullah be emrê asîmanî
Bibû ageh bi vî emrê nihanî

⁴ naêne raê: teslim nabin

⁵ xesîs(‘e): rezîl

⁶ şeniqandin: îdam kirin

Ji şehban ra hîkayet kir yeka yek
Ji mu'cîzatê wî jî bû eva yek

Evê bedbextîya wana xwe rakir
Çikû emnîyeta wan tevde rakir

58. SERÎYA QURRAÊ (XWEDA JI WAN RAZÎ BE) BAL BÎRA MU'EWNE VE

Ebû Bera' ku bû navê wî 'Amir
Nebî teklîfê qenc îmanê lê kir

Nebû mumin welê hişkî jî nedgirt
Digo baş e, tamamî paş ve nedgirt

Nebî ra got eger cem'ek bişînî
Be bal qewmê mi va dê xeyr bibînî

Ewê îmanê bînin pur temîzî
Tu behter¹ wê demê celd² û 'ezîzî

Nebî got ez ji keyda wan diîrsim
Ewî got ez li emna wan dipursim

Resûlullah ji qurraê xwe heftad³
Digel Munzîr kurê 'Emrê furûstad⁴

We hem mektûbekî dabû nivîsîn
Ku bidne ehlê hîlanê xebîsîn

Ku çûn bîra Me'ûnet wê nemîqê
Sipartin Îbnî Mulhan wî refîqê⁵

Şiyand cem 'Amirê Tufeylê Malik
Jibo belkî vebin pê her mesalik⁶

¹ behter: bêtir

² celd('e): xurt

³ qurraê('e) xwe heftad: heftê xwendekarê Qur'anê

⁴ furûstad(f): yê qenc li hespê siwar dibe

⁵ refîq('e): heval

Dema mektûbê dayê çan ku rûnişt
Nehat îman û hem lê da ewî kuşt

We hem qîr da tamamê bed sukalan⁷
Ji cinsê xwe jibo qetla rîcalan

Selîmî, Re'1 û Zekvan û 'Uşeyye
Li wan bûn cem 'û tev kuştin seriyeye

Gelek jî herb kirin geryane gazi
Îlahî tu bidî wan serfirazi

Heman Cebrîl Resûlullah di halê
Xeberdar kir bi wê gedrê û halê

Jibo gezwa Benî Lehyan eva bû
Sebeb çan ku di pêşî da beyan bû

Ebû Bera' ji kerban mir ji lewra
Ku şozê wî gera firyew direw ra

⁶ mesalik('e): rê, tevger

⁷ bed sukal(f): xwedyê mîzana xerab

59. SERÎYA MUḤEMMED B. MUSLÎME BAL QURṬAÊ VE

Dibên Qurṭa' Ḍerîyye¹ da diseknîn

Di çerrê fexrê 'alem da dixebtîn

Resûlullah, MuḤemmed kir seriyye

Digel sî beṭlî şande ser Ḍerîyye

Be şev çûn û be roj seknîn rîcalan

Jibo hilden ji ser wan terş û talan

Hucûm danê wihan² kuştin we yê dî

Revîn, talan kirin heywan ne yê dî

Şed û pencî deve bûn şê hezar pez

Esîrek girtin û hatin be lez bez

Gihane Ṭeybeê selîmî, danîn

Esîrî cem Nebîyullahî danîn

Musulman bû gehişte fexrê daîm

Xuda bextê wî jê ra kir mulaîm³

¹ Li herêma Necîdê hemiyek e.

² wihan: hinek

³ mulaîm('e): minasib, xweş lêhatî

60. SERÎYA ‘UKAŞE B. MEHŞÎL ESEDÎ (R.‘E) BAL ĞEMRÊ MERZÛQ VA

Li Ğemrî cem‘ekî qewmê Esed bûn

Li derê fexrê ‘alem bê meded bûn

Nebî go ya ‘Ukaşe rabe rabe

Digel çil mêrî ser wana peya be

Ji wan bistîne cumle terş û talan

Xwe dan herbê eger, bukje rîcalan

Dema çûn ew revîn wana nedîtin

Ji nageh ve yekî wana jî girtin

Emîn kîrn û cihê heywan nîşan da

Hucûm danê Xuda furset be wan da

Du şed uştîr ji talanê hilanîn

Nedîtin herb û wê talanê anîn

61. SERÎYA MUHEMMED B. MUSLÎME (R.‘E) BAL ZÎLQIŞŞE VA

Li Qişset cem‘ekî dujmin xuya kir
Nebî deh mêr digel wî beqlê rakir

Digotanê Muħemmed ew ji enşar
Di emrê fexrê ‘alem da bû her car

Kîlaban pê hesabûn xwe veşarin
Di kêşik¹ da dema şehban hinarin

Gihane dorê Qişşe xwe li wan da
Ketin razan û dujmin jî li wan da

Şiyar bûn ketne herb û hem gezaê
Ji tevdîra Xuda tîra qedaê

Li wan da yek be yek hatine kuştin
Ji bil mîrê seriye kes nehiştin

Welê ew jî birîndarek gedar bû
Ji nav xûna şehîdan qet nerabû

Musulmanek ji nageh tê ve derket
Hilanî ber Medîne mêrê şewket

Resûlullahî Bû‘ubeyde ‘Amir
Tevî çil mêrî bo heyfê virê kir

Hucûm dan neqfilandin² kes ji wana
Hemî talan kirin malê di wana

Digel hindek ji nav malê jî anîn
Li Teybe cem Resûlullahî danîn

Ji wan şexşek jî girtin bû musulman
Xelaş kir xwe ji qetl û kufr û nîran³

¹ kêşik: jiya kevan, bi me’na kemînê

² neqfilandin: neqefilandin, zevt nekirin

62. SERÎYA ZEYD B. ẖARÎŞE (R.‘E) BAL BENÎ SELÎME LI CEMÛM VA

Resûlullahî Zeydê ẖarîşe şand
Digel cerdek be nav beṭnê Nexil rand⁴

Digotanê Cumûm tê da Selîmî
Diêwrîna⁵ dikirna pur leîmî⁶

Jinek girtin digotanê ẖelîme
Nîşa wan kir hemî terşê seîme⁷

Kirin talan kirin talan û talan
Esîr vê ra kirin cem‘ek rîcalan

Hemû anîn Medîne malê hanê
Be‘îr û pez çiqas bûn kes nizanê

³ nîran(‘e): agir, cehennem

⁴ rand: hinarand, şand

⁵ êwrîn: hewandin

⁶ leîmî(‘e): rezîlî, xerabî

⁷ seîme(‘e): heywanê li çolê çêrîyane

63. SERÎYA ZEYD B. HARÎŞE (R.‘E) BAL ‘ÎŞÊ VA

Nebîyyullahî seh kir ku Qureyşî

Ji Şamê tîn û karwanek li pêşî

Emir da Zeydî go rabe suwar be

Tevî heftê suwaran pêş ve kar be

Heman ‘esker kişand û çûye ‘Îşê

Li wê karwanê xiste heyşe beysê¹

Hemî talan kirin çend mêrî girtin

Gelek jî zîvê şedwan² tê ve girtin

Ebul ‘Aşê ku zavayê peyember

Ku zewcê Zeynebê bû bîntê serwer

Be Îslamê ji Zeyneb ew qeta bû

Di hêsîran meger ew jî teba bû

Gihane Teybeê wî îltîca kir

Be Zeyneb hem emanê jê rîca kir

Resûlullah emîn kir wî be Zeyneb

We hem karwanê bexşî wî heb û heb

Bire Mekke kire gazî cuwanan

Hemû teslîmî kir şehb û xudanan

Gelo go ka çi jê kê m e, çi maye

Hemû gotin tamam e, qeş nemaye

Hemana Laîlahe îllallah got

Muhemmedur Resûlullahî hem got

Qesem bîllah dizanim ew resûl e

Li bal rebbê xwe zu şan û qebûl e

¹ heyşe beys(‘e): rewşeke zor û dijwar

² şedwan(‘e): fîraq, eşya

Li Yeşrîb ger musulman ez bibûma
Be tîrs û pursê jî mewhûm dibûma

Eva malê we min anî we da we
Ji Mekkê dê biçim êdî ji ba we

Berê xwe da Medîne bû muhacir
Li wê wuşlet be cahê Muştefa kir

Nebî Zeyneb heman dîsa jî dayê
Dikir jê ra jî pur medh û şenayê

64. SERÎYA ZEYD B. HARÎŞE (R.‘E) BAL TERFÊ VA

Be emrê fexrê ‘alem Zeydê ‘alî
Digel pazde tenê ehlê me‘alî¹

Kişane ser Teref talanê anîn
Revîn e‘rab û destan nehilanîn

Dizanîna ku cerde lê giranî
Li paşe weqte tev bên ser Cumanî

Be banga subhê ra hatin Medîne
Ji beytîmalê ra pur bû xezîn

¹ me‘alî(‘e): pir bi şeref

65. SERÎYA ZEYD B. HARÎŞE (R.‘E) BAL HİSMA VA

Nebî Dihye şiyand cem Qeyşerê Rûm

Jibo teklîfê îman emrê me’lûm

Be mektûbek mubeyen her hewalan

Dema ku xwend kire gazî rîcalan

Li wan teklîfê kir emrê peyember

Bicî nanîn riçaa mêrê serwer

Welê Qeyşer gelek keyfa xwe anî

Jibo îman û lê çîrsa neanî

Be îhsan û hedîye wî virê kir

Gelek îhsan û te’zîmî jî lê kir

Huneydê ‘Arîd û çendek hevalan

Li Hîsmayê gihanê kirne talan

Hemî şêlan û tiştêk cem nehiştin

Ji bil kincê kevin cil jî nehiştin

Debîbê Muslîmê qewmê Rufa‘et

Bihîstin girtine celd û şeca‘et

Sitandin malê Dihye tev ji wana

Kirin teslîmî Dihye tev cuwana

Yeka yek Dihye gote fexrê ‘alem

Resûlullahî Zeydî xwend heman dem

Seriye wî gerand beyraqê dayê

We panşed mêr digel ev Dihye dayê

Be şev çûn û be ro jî xwe veşartin

Ûeta ku ser Benî ‘Uzre gihatin

Be şubhê ra hucûm dane li ser wan

Li ser wan xistine şingînê şûran

Xwedê nîşan nede êdî çî çêbû
Kesê ku jê revî bû êdî çêbû

Huneydê ba'îşê¹ fitnew fesadê
Digel lawê wî kuştin der cîhadê

Kirin hêsîr jin û zaran û talan
Kirin malan li pê qetla rîcalan

Debîbî hatine cem Zeydî gotin
Musulman in hemû em hem digotin

Bike tecrîbe ger tu pê nizanî
Sual kir fatîhe, hessanî² zanî

We hem gotin nemîqa fexrê 'alem
Li cem me wê dihefzînin dema dem

Bibexşîne me mal û can seraser
We cem'ek jî şiyandin cem peyember

Gihane cem Nebî ketne ricaê
Jibo derdê xwe xwestin wan şîfaê

Nebî got dê ewê kuştî çewan bin
Ewan got ew bila bin pê te dabin

Tu berde terş û mal û hem jin û zar
Digel sagê me ey mewlayê muxtar

Heman got ya 'Elî rabe suwar be
Be wan ra rêkeve yar û şiyar be

Bila malê di wan tevda bidin wan
Hemû hêsîrê wan berdin biden wan

¹ ba'îş('e): yê tehrîq dike

² hessanî('e): guhdar kir

‘Elî go Zeydî naket bê ‘elamet
Nebî go vaye şûrê min ‘elamet

‘Elî şûrê Nebî hilda be rê ket
Gehişte Zeyd û eşhabê be şewket

Nîşanî Zeydî da şûrê peyember
Beyan kir emrê ‘alî tev seraser

Heman Zeydî cemi’ kir ‘eskerê xwe
Ji wan ra gotî emrê serwerê xwe

Heman emrê bicî anîn û malan
Be wan bexşîn û hem nefis û rîcalan

Be xeyr fetlîn û hatin ba selamet
Gehîştin fexrê ‘alem bê melamet³

³ melamet(‘e): lome, şermezahî

66. SERÎYA ZEYD B. HÂRÎŞE (R.‘E) BAL WADÎL QURA VA

Resûlullah şiyande nijde Zeydî
Li ser Wadîl Qura çêken ku keydî

Gehîştin hev li hev dan, çendî kuştin
Ji herdu alîyan jî hate kuştin

Çerêd ew bû ku tirsandin Fîzarî
Li Îslamê neken da hîlekarî

67. SERÎYA ‘EBDURREHMAN (R.‘E) BAL DÛMETUL CENDEL VA

Cihek bû Dûmetul Cendel digotin
Kelîbtî¹ fikrê bêhûde disotin

Muñî’ nedbûn di emrê fexrê ‘alem
Li çerrê ehlê dînî bûn dema dem

Resûlullahî Îbnî ‘Ewfi anî
Reîs kir wî li ser qewmek giranî

Dibêjin heftê şed beşlan jî dayê
Lîwa dayê we pur tenbe jî dayê

Nekin gedrê, ji şer‘ê der nebin qet
Kesî kuştî neken ‘îbret qet û qet

Biçûkan jî hezar tenbe ku nekjun
Welê yê hate herba we wî bukjun

Keça sultânê wan jî tu mehîr ke
Ewê bîne xudan mesken li vir ke

Li ser emrê Nebî rabû suwar bû
Li dorê Dewmetîl Cendel be kar bû

¹ kelîbtî: kûçîktî, harbûnî

Li wan teklîfê kir îmanê bînin
Ewan go em xweyê şûrê hişînin

Ûeta şê roj ewan xiste heşarê
Nikarîna ku qeş bêne hewarê

Di roja sê reîsê wanê Eşbeg
Musulman bû hinan gotin ku Eşbeg

Reîs e hate îmanê ji xwe em
Heqî ye bêne Îslamê tematem

Musulman bûn welê hindek dimayîn
Li ser kufra xwe man cîzve hilanîn

Nîkah kir Bîntî Eşbeg navê Maðir
Çewan fexra rîsalet wî emir kir

68. SERÎYA ‘ELÎ B. EBÎ TALÎB (R.‘E) LI SER BENÎ SE’D B. BEKR

Nebî seh kir Benû Se’dê ji Bekrê
Fedek da çêdikin cem‘ek be gedrê

Ku îmdadê biden hîzba yehûdan
Di Xeyber da ewan cem‘a heşûdan

‘Elî Heyder be ser wan ve hinarî
Digel şed mêrê mêrxaşê bijarî

Be şev çûn û be roj seknîn gehiştin
Li ser ava Gemîc yek şexşî girtin

Sitandin jê hewalê wan be zorê
Ewî anîn nehiştin ku biborê

Kete pêşî ewan talan nîşan kir
Xilaşî xwe be wî qasî ji wan kir

Hinan talanê hildan mane vê ra
‘Elî ‘esker kişand rehber jî vê ra

Cihey wan dî kesek tê da nemabû
Mija mewtê xwe da alî we rabû

Ji wê malê xwe hilda bûn revî bûn
Ji hev zîr û zeber¹ bûn berdevî bûn

Heman panşed deve hem du hezar pez
Di pêş ajotin û anîn be lez bez

69. SERÎYA ZEYD B. HARÎSE (R.‘E) BI SER UMMÎ QIRFÊ VA

Dibên ev Zeydê mêrxasê bijarî
Jibo şehbê Nebî çûbû ticarî

Diçû Şamê Benû Bedrîw Fezare
Li pêşî dan li ser kir neh îgare²

Nebî ra çû beyan kir wan hewalan
Nebî dayê sîlah û hem rîcalan

Be şev diçwan be rojê radizana
Be tedbîra emîrê Zeydê zana

Be ser sehwasîyan³ ketbûn Fezare
Li ser dirb û rihan⁴ danîn nezare⁵

Reîsê wan bû ew rûspîkê pur pîs
Dîya deh qîz û kur bû maka îblîs

Be navê Ummî Qirfe bû gedarê
Keça Rebî‘etê Bedrê Fezarê

Li rê nazorekî danî didîta
Reha rojek şevê jî yek didîta

¹ zîr û zeber(f): serûbin, perîşan

² îgare(‘e): êrîş, hicûm

³ sehwasî(‘e): halpîrsîn

⁴ dirb û rihan: rêçîk û rêyan

⁵ nezare(‘e): bekçî

Xebata roj xewa şev wan bi wî bû
Xuda dîsa jî agahî ji wî bû

Şehabe hatin û reh gelitandin⁶
Bi wê nuşret jibo xwe qefilandin

Rehek dî çûn Fezare fehmi nekrin
Şibew êvar li wê jî ku bifekrin⁷

Ji nageh zêde derket ser Fizare
Li wan dor girtin û danê îgare

Ewan kuştin we Ummî Qirfe girtin
Be ‘îbret hem be îza wê jî kuştin

Çiku sebba⁸ Resûlullah dikir wê
Jibo herba Nebî ‘esker dikir wê

70. SERÎYA ‘EBDULLAH B. REWAHE ELEŒARÎ ELXEZRECÎ (R.‘E) SER USEYRE

Ebû Rafî’ dema ku hate kuştin
Yehûdê Xeyberê tevda gehiştin

Esîrê wî jibo xwe kirne ağa
Çiku bêbextî bû bê qulpê ağa

Be hîlan girt û go ma hûn nizanin
Muhammed, qewmê xwe ku çi yeman in

Be ku ve çûne hey qazanckirî ne
Ezê tişteke bikem ku hêj nedîne

Çewan key gotinê go dê cemi’ kem
Qebîla Ğeţefanî ser ve rê kem

⁶ gelitandin(‘e): şaş kirin

⁷ fekrîn: nêrîn

⁸ sebb(‘e): nifir, devdirêjayî

Be ser wan ve di mala wan ve bigrim
Ji wan heyfa kevin taze jî vekrim

Li tedbîra xwe xebtî gah û bergeh
Resûlullah be wê fikrê bû ageh

Şiyand lawê Rewahe da ku teftîş
Biket halê yehûdî qewmê yek xîş⁹

Heman lingek ji baê girt emanet
Be lez teftîşî kir qewmê xiyamet

Digel wî şê nefer bûn ketne bostan
Bihîstin gotin û şewra nedostan

Ji bil wan jî yekî dî jî beyan kir
Nebî jî ‘Ebdellah ser ve rewan kir

Digel sî mêrê beqlê herbê dîde
Cewan û çapik¹⁰ û merd û guzîde¹¹

Direw go ger bibêjim min ‘efûkî
Nebî go başe nîne sûc û sûkî¹²

Be hev ra çûn huđûra wî esîrî
Binêre fend û qîl û keyd û seyrî

Be nermayî xeber da ew mumecced¹³
Be hostayî wisa kir go Muħemmed

Diket gazî te da bêti bibî tu
Mezin ser Xeyber û aġa bibî tu

Gelek şa bû be wê keyfa xwe anî
Hemana sî suwarê xwe hilanî

⁹ xîş: pûç û xerabûyî

¹⁰ çapik: hijdîn

¹¹ guzîde(f): nişmî

¹² sûkî(‘e): xerabîyekê

¹³ mumecced(‘e): yê mezin û xwedî şeref

Berê xwe dan Medîne rê ve hatin
Li rê fikra dilê xwe jî guhastin

Muğeyyer bû ku ‘Ebdullahî bukjit
Be fetl û hîleyan xûna wî bimjit

Be sirra sîne û îmanê safî
Hesa pê ‘Ebdullah jî kir kîşafî

Hemana ‘aqilê lawê Rewaḥet
Be şûrê tûjê dayê îstîrahet

Hevalê wî hemû kuştin we hatin
Be xeyrê xelqê der Ẓeybe cevatin

Resûlullah ji wan ra pur du‘a kir
Li ser fê’lê cuwanmerdî şena kir

71. SERÎYA KURREZ B. CABÎR EL FÎHRÎ (R.‘E) BI SER QEBÎLA ‘EKL Û ‘UREYNÊ VA

Dibên çend mîrekê ‘Ekl û ‘Ureynê
Nexweş bûn hatine Ẓeybe Medîne

Zikê wan şubhê yê heywanê avis
Ji wan dernedketa hes û tenafus

Bibû rengê di wan mîna biha zer
Be zorê xwe gehiştandin peyember

Musulman bûn be dev îmanê anîn
Be sekna Ẓeybeê qîma xwe nanîn

Digotan em ku zozanî ne lewra
Nikarin Ẓeybeê da ken mudara¹

Resûlullah îzin det dê biçin em
Li çolê ber devan ta qenc bibin em

¹ mudara(‘e): îdare

Nebî da îzn û da wan çendî naçe
Ku şîrê wan biken bo xwe nifaçe

Dema qenc bûn hemû geryan peşîman
Ji teb‘a dînê Îslam û ji îman

Şivan kuştin welê kuştin be ‘îbret
Birîbûn dest û pê wî wayê heyret

Di çehvê wî da şewkî² daçikandin
Çi bêjim bedfinazan³ pê gihandin

Devan hildan kirin talan leîman
Revîn bal qewmê xwe bê dîn û îman

Hewar hat û Nebî şand ‘eskerek lez
Emir danî li ser ‘esker jî Kurrez

Dibêjin bîstî bûn pê wan ve danîn
Ewan girtin we dîsa paş ve anîn

Ewan kuştin wekî qetla şivanê
Ku kes dê pê nedet ser fê‘lê hanê

² şewkî(‘e): sitirî, dirî

³ bedfinaz(f): hîlexerab

72. SERÎYA ‘EMRÎ B. UMEYYE EDDEMÎ (R.‘E) BI SER EBÎ SUFYAN VA

Ebû Sufyan digo dê kes nebînim
Jibo qetla Muḥammed ra bişînim

Yekî ‘erabî go ma ez li ha me
Jibo qetla wî bin emrê te da me

Ji min mêtir ji min çêtir tunîne
Dixwazî min be wê rê ve bişîne

Mihe¹ xencer wekî zehra hilahil²
Jibo wî ez bi wê dê bibme qatil

Be lingê xwe wekî baê seran im³
Be cîker⁴ şubhetê şîrê jîyan im

Dinasim rah û dirbê wî diyarî
Ji başûka felek nakem fikarî

Heman dayê deve hem zadê rahî
Be ḥalê wî şiyare lê îlahî

Dema çû wê, Resûlullahî wî dî
Ji e’caza⁵ nubuwwet agehî dî

Ji dûr bû hêj, Nebî go ḥal weha ye
Welê mani’ jibo meqşed Xuda ye

Dema nêzîkî hat û kir îrade
Bikêşet xencer û danit îvade⁶

Useyd îbnul Heḍîrî destî pê girt
Kîşande cem xwe va xencer jî jê girt

¹ mihe: tune

² zehra hilahil(‘e): jehra pir bitesîr

³ baê seran(‘e): dîreka ku mêwa tirî li ser disekinînin

⁴ cîker: ceger, cesaret

⁵ e’caz(‘e): mûcîze

⁶ îvade: min me’na wê peyde nekir, dibe ku bi me’na derbeyê be

Be gewrî girt û xenqand da ku bukji
Kete fîzarê da xûna wî nerjî

Resûlullah nehişt bukjin jibo da
Beyan ket meqşedê serda we pê da

Heman îmanê anî, tev beyan kir
Temamê wan ku hê nû me ‘eyan kir

Nebî ‘Emrê Umeyye jî virê kir
Yekî dî jî dibên pê ra virê kir

We go bukjin Ebû Sufyan ji malê
Jibo we ger kete keys û feşalê

Gihane Mekkeê çûn tewfê beytê
Ebû Sufyan ewan dî dûrî beytê

Heman wî ‘Emrî nasî û yeqîn kir
Jibo xeyrê nehaye merdê mahir

Cewab da ehlê Mekke tevde rabûn
Kirin te’qîb li pê wan ve belav bûn

Welê ‘Emrê Umeyye pur sivik bû
Wekî başûkê pê revda qijik bû

Li ku çan pur geran wana nedîtin
Welê ‘Emrî hevalê yêkî dîtin

Ji eşraf û serê kuffar û kuştin
Be ‘Ebdellahê Teymî çûn gehiştin

Ewî jî kuştin û hem yêkî dî jî
Du casûsê Qureyşan dîn li rê jî

Yekî kuştin yeka dî kirne hêsîr
Heta birne Medîne wî be te'sîr⁷

Di Mekke çan revîn dîtin Xubeybî
Be darê da ku şelb⁸ kir bûn hebîbî

Be zorê xwe gihandê anî xwarê
Kutan⁹ pê ve ku dîn revva hewarê

Cenaze wî revand û ta veşêra
Direqya ba jî tozê nedveşêra

Gihane ser çiyakî dîn ku kalek
Benî Deylî şivan e dînbeşalek

Çevêk kor e dilorîne be şe'ran
Dibê heta hebim nabim musulman

Di dil da 'Emrî, wê qewlê hilanî
Heta raza çevê sağ jî deranî

Xulaşê mêrekî pur çêyîw qewî bû
Di heqqîl musteqîm jî munzewî bû

73. SERÎYA 'UMER B. XEŦŦAB (R.'E) BAL TURBET VE

Li erdê Turbetê top bûn Hewazin
Musulmanan ji wan dikrane gazin

Resûlullah şiyand ser wan ve 'Ummer
Reîs kir wî li ser sî ten gedenfer

Hewazin hissê hilda bûn revî bûn
Hemî zîr û zeber tev berdevî bûn

Serîyye kes nedî zivrî ji pa ra
Welê zêde bû şewket Muştefa ra

⁷ te'sîr('e): zordayîn

⁸ şelb('e): şeniqandin

⁹ kutan: kudandin, meşîn, bi rê ve çûyîn

74. SERÎYA EBÎ BEKRÊ ŞIDDÎQ (R.‘E) BI SER BENÎ KÎLAB VA

Kîlabî hinde bûn ‘aşî li Necdê
Tecawuz dê bikirna wan ji heddê

Resûlullah şiyand Şeddîqê Ekber
Hucûm da terş û talan tevî ‘esker

Hemî malan kirin talan vegirtin
Hinek beşl û rîcalê wan jî kuştin

Jinek pîr û keça wê kirne hêsîr
Welê husna keçê nedhate teqrîr¹

Di Mekke muslîman yexsîr hebûn pir
Keçê da wan Nebî wana riha kir

¹ teqrîr(‘e): qerar

75. SERÎYA BEŞÎR B. SE'D ELENŞARÎL XEZRECÎ (R. 'E) BI SER BENÎ MURREYÊ LI FEDEKÊ

Benû Murre Fedek da diskinîna¹
We hem tedbîr jibo keydê didîna

Resûlullah Beşîrê Se'd û sî mêr
Şiyand ser wan ku raket hukm û te'sîr

Gehîşte meskenê wan dî şivanan
Nebû kes dî, hilanîn heyewanan

Li rê anîn heta şev hate ser da
Li wê razan 'edû girte be ser da

Musulman hindik û duşmen gelek bûn
We hem gafil ji bedbextê felek bûn

Di şev tarî li hev dan hev dikuştin
Welê kafir heman wana nehiştin

Beşîrê Se'dî jî hem bû birîndar
Vezelya cem şehîdan merdê hişyar

'Edû geryan li nav hizba şehîdan
Binêrin sağ heye nav wan se'îdan

Beşîrî dîn, emaratê heyatê
Nedîtin, zen kirin çûye mematê

Ewan terkandin û wî malî talan
Hilanîn paş ve dîsa birne malan

Ji wê ew jî be xef rabû virê bû
Fedek da cem yehûdek ta qewî bû

Xulaşe çû Medîne pur şikestî
Ji ew paşê sitandin heyf û destî

¹ diskinîna: disekinîn

**76. SERÎYA ĞALÎB B. ‘EBDÛLLAH ELLEYŞÎ (R.‘E) BAL MEYFE‘A
NAHÎYA NECDÎ VE**

Benû ‘Ewwal û cem‘ek yalê Necdî

Li ser ډerra Nebî dikrana wecdî

Ji Leysî betlekî navê wî Ğalib

Heqîqet hem ji Leys û hem jî Ğalib

Şiyande ser digel ‘esker şed û sî

Hinek rawî dibêjin dû şed û sî

Hicûmî ser kirin serbest hilanîn

Diwar û pez deve ajotin anîn

Dikuştin hem ji gişîf¹ û rîcalan

Kesê dehta² hewar û terş û talan

Nehîkê lawê Merdas Eslemî bû

Ji eşhabê Nebî furşet birîbû

Pezê xwe berneda teslîm nebû hem

Dema xistin heşar û tengîyû gem

Be dev teşdîq û tewhîda Xuda kir

Usame şûrekî lê da cuda kir

Resûlullah ku seh kir jê xeydî

We got ewha neke tu carekî dî

Nebî xûna qetîlê jî eda kir

Usame ‘ebdek aza bo Xuda kir

¹ gişîf(‘e): xwedî otorîte, mezin

² dehta: dihate

**77. SERÎYA ĞALÎB B. ‘EBDÛLLAH ELLEYŞÎ (R.‘E) BI SER MULÛĦÊ LI
KEDÎDÊ VA**

Li ser ava Kedîdê qewmekî bûn

Ji ebnaê Melûhê cem‘ekî bûn

Musulman nedbûyan, îman netanîn

Serî ber fexrê ‘alem ra netanîn

Resûlullahî Ğalib girte nijde

Şiyande ser ku wan talanê hilde

Ketin rê çûn gihane Ħerşê Malik

Girê dan wî be hebla her mehalik¹

Çiqas got ez musulman im neberdan

Li ber hersek² nihandin bê xeberdan

Di weqtê megrîbê hatin Kedîdê

Şiyandin Cundebê mîna hedîdê³

Serê girkî ku wana rind bibînê

Xezîna furşeta xwe jî hilînê

Vezelya ser girê dinhêrîya wan

Ħeta razîn dikir çavnêrîya wan

Ji wan yek dît û go zewcê xwe vanê

Reşek ser gir, bide tîr û kevanê

Yeka ewwel li orta ebrûyan⁴ da

Yeka şanî li nav polê⁵ milan da

Welê Cundeb xwe tev nadet metîn e

Ewî jî zanî ku tişteke tunîne

¹ hebla her mehalik(‘e): werîsa bi talûke

² herş(‘e): mihafîz, beqçî

³ mîna hedîdê(‘e): weka hesin xurt û qewî

⁴ ebrû(‘e): birûyên ser çava

⁵ pol: sermil

Li wê seknî heta fecra şibê da
Li talanê belav bûn ser da pê da

Gelek malan kirin talan rîcalan
Gelek kuştin belav bûne newalan

Şehabe ketne alyekî newalek
Hewara wan jî pê wan bû li alek

Xuda baranê rehmî şande ser wan
Lehî rabû li ser hîzba 'edûwwan

Wisani bû ku tijî kir wê newalê
Nikarî kes biborit jêlî yalê

Li talî⁶ man şehabe malê tanîn
Ji jêlî da dimêzîn nedikarîn

Digel xwe Herşê Malik hem hevalî
Wî anîn Teybeê cem fexrê 'alî

Musulman bûn gehiştin 'îzzê sermed
Muşerref bûn be dîwana Muhemmed

78. SERÎYA ĞALÎB B. 'EBDÛLLAH ELLEYŞÎ (R.'E) BAL FEDEKÊ VE

Benû Murre Fedek da çan ku borî
Li eşhabê Beşîrî kirne zorî

Li peygember gelek zor û giran hat
Ji wan ra bayîsê⁷ derd û geman hat

Zubeyrî kir seriyye da bişîne
Be ser wan ve ewê heyfê hilîne

Ji nageh dî ku hat menşûr û galib
Şehê Leysî be navê mêrê Galib

⁶ talî: jor

⁷ bayîs('e): musebbîb, me'ne neyînî ye

Nebî gote Zubeyrî de tu rûne
Bila Ğalib here belav nebûne

Hemana ew digel du şed geđenfer
Ketin rê ba sîlah û zirh û mîgfer

Welê Ğalib li rê beţlê rîcalan
Biratî xiste mabeyna hevalan

Li hev şîret kirin haya ji hev bin
Ji hev fariq nebin cemi' li hev bin

Ji emrê mêrê Ğalib kes nebit der
Ji bêemrî dixeydî lew peyember

Be ser da girtin û Ellahû Ekber
Be hev ra gotin û dane hucûm ser

Ketin nav wan be şûrê tûjê lahor
Simê hespan di kol wan duşminan gor⁸

Jin û zaran kirin hêsîr û talan
Hilanîn û gelek kuştin rîcalan

Meger heyfa Beşîrî tev hilanîn
Nevînî⁹ tev di pozê wan ve anîn

Ji talan deh deve para yekî bû
We deh pez jî muqabil naqekî bû

⁸ gor: mezel, meqber

⁹ nevînî: dujminî

**79. SERÎYA ŞUCA' B. WEHB ELESEDÎ (R.'E) BI SER BENÎ 'AMIRÊ SÎYYÊ
VE**

Benû 'Amir ji Hewazin numa bûn
Di ava Sey'ê Zafîl 'Erqî da bûn
Li bedbextîyû bêdînî muşir man
Li ser kufra xwe bûn nedbûn musulman
Nebî nijde grand Şecca'ê şecca'
Ku talan ket hemû wî qewmê menna'¹

Digel wî bîst û çar mêrê bijare
Virê kir go biden ser wan îgare
Be şev çûn û be rojê xwe veşartin
Heta ku xwe be wî erdî sipartin
Be fecra şubhê ra talan hılanîn
Dewar û pez deve hildan û anîn
Digirt para yekî tam pazde naqe
We deh pez bû muqabil yekî naqe

**80. SERÎYA KE'B B. 'UMEYRÎL ĞEFARÎ (R.'E) BAL ZATU EŦLAĦÊ JI
ERĎÊ ŞAMÊ**

Nebî kir nijde ev Ke'bê Ğefarî
Be yalê Zate EŦlahê hinarî²
Digel pazde ji şehbê ehlê îman
Be şev çûn û be roj seknîn kerîman
Gehiştin wê be wan hisya jî casûs
Li ber wan xwe veşartin qewmê salûs

¹ menna'('e): baş sitirandî

² hinarî: şand

Şehaban kirne gazî werne îman
Ewana dane ber tîran leîman

Şerek danîn ku agir hildibû jê
Didan ne're felek ku sil dibû³ jê

Hemî şehbê Resûlullahî kuştin
Şehîdê heq be firdewsê gehiştin

Birîndar yek tenê ma nav şehîdan
Nenasîn wî ji şêla wan se'îdan

Xeber bir bal resûlê fexrê 'alem
Li ser wan pur kesir hilda û me'tem

Didî tedbîrê da 'esker bişînit
Be çapa⁴ heq ji wan heyfê hilînit

Bihîstin ku ji wê kirne kerûfer
Revîne êdî 'esker jî neçû ser

³ sil dibû: diqehirî

⁴ çap(t): 'ewn, çaba

81. SERÎYA MU'TE

Nebî mektûbekî da Hersê Ezdî
Şiyande Beşre ve wî şêre merdî

Gehişte Mu'tetê ew nagihanî
Şerehbîlê kurê 'Emrê Ğesanî

Liqa bû go bi ku ve dê biçî tu
Diçim Şamê ewî go ma nebî tu

Ji Teybe têtî peykî¹ bo Mûhemmed
Belê go rast e wî merdê mumecced

Heman girt û girê da dest û pê wî
Bila heq û sebeb jê kir serê wî

Resûlullah ku seh kir fê'lê bedrû
Temarê² Haşimî avête ebrû

Hemana şê hezar 'esker deranî
We Zeydê Harîşe amir wî danî

We go ger ew şehîd bû mêrê serwer
Bila beyraqê hilde mêrê Ce'fer

Ku ew jî çû bila Lawê Rewahe³
Hilînit rayeta ehlê şelahe

Ku ew jî çû ji nav xwe yêkî danin⁴
Ji dil herb û geza ken ça dizanin

Nebî rawestiya qasek be wan ra
We beyraqek sipî çêkir ji wan ra

¹ peykî: qasidî

² temar: damar

³ 'Ebdûllah bîn Rewahe

⁴ danin: deynin, bikin

Siparte destê Zeydî wan kefalet
Gelek kir şîreta teqwîw ‘edalet

We go nekjun jin û zaran û kalan
We hem jî rahîbê dêr û cîbalan⁵

Nebit bibrin ji bagê wan jî darek
Nehedmînin bînaê wan be carek

Yeka yek xaîrê xwe xwestin û çûn
Helalî xwestin û paşê bi rê bûn

Ji Teybe wan çewan kişan giranî
Şerehbîlî be guh bû his hilanî

Cemi’ kir şed hezar ‘esker jî zêde
Çetê xwe şand birayê wî jî tê de

Musulman bûn peya Ummul Qura da
Ji nageh wê çetê ser wan nîda da

Serê wan bû Sedûs exê⁶ Şerehbîl
Xudanê şeqwet⁷ û kufran û teđlîl⁸

Be hevdu wan û Îslamê gehîştin
Li hev dan û Sedûsî hate kuştin

Revîn tev nijdeya wî bê emanî
Musulman jî ji wê hatin Me‘anî

Bihîstin ku Hireqlî ‘eskerê Rom
Li cem xwe şed hezarî girtine kom

Digel yê ser Şerehbîlî cema bûn
Hemî du şed hezar ‘esker cema bûn

⁵ cîbal(‘e): çîyan

⁶ ex(‘e): bira

⁷ şeqwet(‘e): bêtisîbî

⁸ teđlîl(‘e): delalet

Musulman şê hezar bûn çan me gotî
Ji heddê zêdetir kuffarê kotî

Ji wan tîrsan ji ewwel muslîmanan
Ku zanîn wek sitêrkê asîmanan

Welê Lawê Rewahe go neîrsin
Li herb û şûrê hingivî⁹ bipirsin

Nebêjin em qelîl in, ew keşîr in¹⁰
Li domay¹¹ û li qazancê binêrin

Be zehfaya xwe em galib nebûne
Welê galib be dînê heqqî bûne

Li tayê¹² me îlahul ‘alemîn e
Du‘a çê bo me xeyrul murselîn e

Eger em bêne kuştin em şehîd in
Ku em wana qetil ken mustefîd in¹³

Hemî se‘ya me jî bêhûde naçe
Wisane em li herbê bin qepaçê¹⁴

Bi vê nutqê gelek merdan qewî bûn
Wekî bazê di herbê munhewî¹⁵ bûn

Hiraqlî ‘eskerek boşê¹⁶ giranî
Digel tebdîr û zêr û zîvê anî

Jibo Îslam bibînin mal û zînet
Li wan bişkê hemû tebdîr û şewket

⁹ şûrhingivîn: bi şûran li hev xistin

¹⁰ qelîl(‘e): hindik, keşîr(‘e): pîr

¹¹ domay: ‘eqîbet

¹² ta: teref

¹³ mustefîd(‘e): yê qezenc kirî

¹⁴ qepaçê: dorpêç, jidyayî

¹⁵ munhewî(‘e): bi eşq û hewes

¹⁶ boşê giranî: zêde bi qûwwet

Xulaşê Zeydî beyraqê hilanî
Kişâ nav ‘eskerê boşê giranî

Şelewat dan û lêdan jî dikuştin
Heta Zeydî şehîd bû hate kuştin

Hemana Ce’ferî beyraqê hilda
Be navê ket li ser wan ne’re hilda

Li paş û pêş û rast û çep difetlî
Dikuştâ hem li şehbê xwe difetlî

Dumadorê wî girtin kafirê reş
Li erdê jî tijî bûn cendek¹⁷ û leş

Ji hespê xwe peya bû hate xwarê
Feres¹⁸ kuşt daneket êdî firarê

Dihingavta¹⁹ li wan şûran û şî’ran
Digota çan ku nedkir zenn û fikran

Qetî’ bû destê rastê rayeta xwe
Be çep girt û neberda şewketa xwe

Qetî’ bû çep li ber singan hilanî
Şehîd bû, ‘Ebdûllahî çû hilanî

Digot şe’ran û hem dikra gezaê
Li wana hildida ne’rew şedaê

Dikir herbê peyade geh suwarî
Dikuştâ beşlî û mêrxasê bijarî

Meger çerxa felek çep lê xuya kir
Şehîdan ra ewî jî hem teba kir²⁰

¹⁷ cend(‘e): ‘esker

¹⁸ feres(f): suwarê hespê

¹⁹ hingavtin: lêdan

²⁰ teba kir: tabî’ bû, tevî wan bû

Heman şûrê Xuda Xalid hilanî
Ji cî beyraqê ser destê xwe danî
Ciyê rast û çepê xwe tev degiş kir
Ewî pêşî be ya paşî degiş kir
‘Edû zanîn ku wan îmdad gihaye
Ku kêmasî ji wan ra qeç nemaye
Kîşa navê şehîn şahê geđenfer
Ketin pê cumle eşhabê peyember
Ji şinge şingê şûran ya îlahî
Qiyamet te digo rabû wê gahî
Ji xûnê rûyê erdê kirne rengîn
Birîndaran be hâlê xwe dinalîn
Ji derbê şûr û hem dengê şelatan
Revîn kafir ketin deşt û welatan
Wiha tişteke di dinya kes nedîbû
Eva mu’cezîkî xaşê Nebî bû
Bi tin dazde ji Îslamê şehîd bûn
Ji kuffarî ketî ez hed mezîd bûn²¹
Gelek girtin ji wan malê genîme
Di pozê wan şikîrandin şekîme²²
Cewab dane Resûlê rebbê ‘alem
Jibo Ce’fer gelek kir huzn û me’tem
Ji wan ra pur Nebî medh û sena kir
Dibarand hêstiran vê ra du‘a kir

²¹ ez hed mezîd(‘e) bûn: ji heddê zêdetir bûn

²² şekîme(‘e): xurûr, berxwedan

Digota Ce'ferê Teyyarî lew ra
Du cengan²³ rebbê 'alem dabû jê ra

Bedel wan herdu destê çûn şehadet
Gehîştin cenneta baqîw se'adet

Dema 'esker giha nêzî Medîne
Be îstîqbalê çû fexra zemîne

Digel zar û jin û kal û cewanan
Jibona hûrmeta şatîr²⁴ cewanan

Mubarek bit ji wan ra nav û namûs
Helal bit wan belav kir qewmê salûs

82. SERÎYA 'EMR ÎBNÎL 'AŞ (R.'E) BI SER BELDEYÊN BELÎW 'UZREYÊ VA

Resûlullahî seh kir ku Quða'e
Li hev top bûne da çêken şena'e

Ku heywanê Medîne bikne talan
Nebî rakir tamam sê şed rîcalan

Li ser wan 'Emrê 'Aşî mêrî danî
Be şev çûn û be rojê bûn nihanî

Dema nêzîkî bû, seh kir ku zeħf in
Şehabe dê di cenga wan bimeħfin

Şiyandin qaşidek cem fexrê 'alem
Xeber da seyyîdê ewladê Adem

Hemana Bû'ubeyde hem du şed mêr
Virê kir tev pulengê cengîyû şêr

²³ ceng: bask

²⁴ şatîr('e): zîrek û mahir û hişyar

Gehiştin hev be hev ra bûne cem‘ek
Kişane ser Bîlew ‘Uzre be cem‘ek

Li hev dan sa‘etek kafîr şikestin
Nema çare ji bil ku rev dixwestin

Xulaşê tev revîn deşt û qifaran
Ji hev zîr û zeber bûn tev neyaran

Nehişt ‘Emrî li pê wan ku biçit kes
Nehişt agir jê hilket tu kes û ‘es

Nebit dujmin bibînîn qilleta²⁵ wan
Nebit bişkê ji nageh şewketa wan

Nebit îmdadê kuffarê li pê bê
Li wan zivrit şugul ba ‘eksê çê bê

Û heta şê roj li wê seknîn û her roj
Be ser wan ve dişandin cerdê dilsoj

Ji talanê di wan tanîn dixwarin
Di wê carê genîme nehinarin

²⁵ qillet(‘e): hindikayî

83. SERÎYA XEBTÊ

Qureyşî weqtê bedbextîw şena‘e¹

Deranîn hîlekarî ser Xuza‘e

Resûlullah şiyandî Bû‘ubeyde

Digel sê şed rîcalê herbê dîde

Jibo bavêjine ser ‘îrê wana

Biken talan esîr ken mêrê wana

Nebû zad û te‘am geyrî hebanek

Ji xurme ye‘nî tedbîra cuwanek

Gehîştin sahîlek, nava reha wan

Kirin çavnêrîya borandina wan

Gelek man û li wan xurme xelaş bû

Li wan bersîfîyê² ser da we xaş bû

Ji darê selemê belçîm³ dixwarin

Be rebbê ‘alemê her xwe siparin

Ji nageh dîn Xuda yek masîyek hût

Be navê ‘enberî da wan jibo qût

Ji wan ra pazde rojan bû kîfayet

Nehat ser wan ji bersîyê nîkayet⁴

Çiku pur mazin û hem jî qelew bû

Jibo şed naqe belkî ew gerew⁵ bû

Dibên parxanê wê naqe diborî

Suwarek jî li ser hêja diborî

¹ şena‘e(‘e): şoretî, xerabî

² bersîfî: birçîbûnî

³ belçîm: pel

⁴ nîkayet(‘e): acizî

⁵ gerew: bedêl

Neşîbek bû hinara rebb ji wan ra
Nebit çêbit demek geflet ji wan ra
Ji ew paş Qeysê wî Se'dê 'Ubade
Li ser wan kir cuwanmerdîw se'ade
Devan serjê kir û da wan û hatin
Selamet tev be Teyba xwe gihatin
Be qerdê⁶ xurme wî naqan hilabû
Dilê wî xweş be malê Se'dî mabû
Meger Se'dî jî wî dêynî eda kir
Resûlullahî pur jê ra du'a kir
Xulaşê qeṭ nedîtin herb û keydê
Neqeflandin ewê nêçîr û şeydê

⁶ qerd(‘e): deyn

84. SERÎYA EBÎ QETADE (R.‘E) BAL NECDÊ VA

Meħarîb erdeke waye li Necdî

Ĝeţefanî diseknîna li wê dî

Serî ber dînê Îslamê netanîn

Muţî’ nedbûn we îmanê netanîn

Resûlullah virê kir Bûqetade¹

Tevî pazde tenan² daku li wan de

Ku mal û tersê tevda gêre talan

Eger herbê kirin bukjit rîcalan

Be şev çûn û be roj ketne kemînê

Li wan keys û feşalê xwe ku bînê

Digel şubhê hucûm da mal û koçan

Revîn hindê ketin koşan û kûçan

Hinek rabûne herb û hem cîdalê

Çi mîqdarek kirin ceng û qîtalê

Hemî kuştin ewê der bûn ji malan

Jin û zar û pez û mal kirne talan

Temam ajotine Teybe selamet

Li ser kuffarê jî pur bû nedamet

¹ Bûqetade: Ebû Qetade

² ten: can, kes

85. SERÎYA EBÎ QETADE (R.‘E) DÎSA BAL ÎDEMÊ VA

Resûlullah di wê fikrê demadem
Ku ‘esker ket, çêbit fetha mu‘ezzem

Ku da fikrê nezanin¹ kir îrade
Şiyand yalê Îdem va Bûqetade

Digel heşt mêrê dinya dîtin zana
Fenê herbê tijî sîmayê wana

Debîn² hatin di rê da rastî ‘Amir
Kurê Eđbeţ li ser wana selam kir

Be teslîm û we tehya dînê Îslam
Kurê Ceşame lê da kuşt be îlam³

Nebî xeydî ji wê fê’la ne meşrû’
Dema seh kir ewê mekrûhê memnû’

Dema lawê Ceşame mer, tebah bû⁴
Di qebrê nestirî pur rûsîyah bû

Jibo nifrînê fexra ‘alemînê
Îlahî kes ewî halî nebînê

Me‘el qişşe dema ‘esker birê bûn
Be yalê Mekkeê va rê be rê bûn

Jibona ku fetih ken Mekkeê jî
Biken ‘ewda⁵ şekîna we’deê jî

Ewan seh kir li pê çûn ta gihanê
Li seqyaê⁶ teba fexra cîhanê

¹ nezanin: nizanibin

² debîn: dibînin

³ îlam(‘e): bi ezîyet

⁴ mer, tebah(‘e) bû: mir, telef bû

⁵ ‘ewde(‘e): lê veşerîn

⁶ seqya(‘e): avdan, du‘a xêrê

**86. SERÎYA XALID B. WELÎD (R.‘E) BAL NEXLEYÊ VE JIBO
XERAKIRINA ‘UZZA**

Qureyşan pûtekî danîn li Nexle
Be nav ‘Uzza serê teđlîl¹ û gefle

Meger ‘Emrê Luheyî dabû zanîn
Ku rebbek şanî² ye hatîye kuştin

Digota wan zivistanê, Îlahî
Li cem ‘Uzzaye da wê ket nigahî³

Dişêwrit pê di emrê erđ û esman
Di havîn li cem Suwa‘e⁴ ew han

Jibo herdu bedan⁵ te’zîmê zêde
Dikirn û pur digotin tiştê zêde

Resûlullah şiyand Seyfê Îlahî⁶
Digel sî farisan⁷ da ket tebahî⁸

Dema xidmetçîyê ‘Uzza be guh ket⁹
Ku dî Xalid ewê ‘Uzzaê raket

Hila şûrê xwe û derket çîyayê
Kete fîzar û zarîn û du‘ayê

Be ‘Uzza ve fikir zarî ku bukje
Ewî Lawê Welîdî xûnê bimje

Çi eħmeq bû nizanî ku berê¹⁰ hişk
Çi jê teta çî çiket ku diken şirk

¹ teđlîl(‘e): delalet, ji rê derxistin

² şanî(‘e): duyemîn

³ nigah(f): mihafaza

⁴ Suwa’: navê pûtekî din

⁵ bedan: bidine

⁶ seyfê îlahî(‘e): Şûrê Xuda, Xalid b. Welîd

⁷ faris(f): suwarî

⁸ tebahî(‘e): mehvûyî, xerabûyî

⁹ be guh ket: pê hesîya

Dema Xalid gehiştî xanîyê wê
Xerab kir wê helavit¹¹ ser rûyê wê

Şikinand û vegerya cem peyember
Beyanê jê sual kir xeyrê serwer

Çi jê derket çî jê kifşew beyan bû
Qe tiştêk got ji min ra ne‘eyan bû

Here go carê dî dê tu bibînî
Nefetle ta tu tiştêk jê nebînî

Dema çû dî ‘ecûzek pîsê tazî
Xwelî ser xwe diket hem pur digazî

Serî lê da be şûrek wê geber kir
Vegerya cem Nebî jê ra zeber kir

Nebî go ew bû ‘Uzza hew ku ew bê
Bibit me’bûd li vê erdê we hew bê

87. SERÎYA ‘EMR B. ‘AŞ (R.‘E) JIBO XERAKIRINA PÛTÊ SUWA’

Qureyşî çan li ser ‘Uzza cema bûn
Huzeylî ser Suwa‘ê muhtela bûn

Suwa‘ê lawê Şîşê îbnî Adem
Ji dunya çû ewî heykel demadem

Li cem xwe heşte Mehlayîlê Qeynan
Diçû secda wî pêşî Nûh û tûfan

Dema çû Nûhê zana, tev fena bûn
Huzeylî bîl‘umûm pê muhtela bûn

Ûeta ku wê birin heddê Xudatî
Diçûna secde jê ra tev cevafî

¹⁰ ber: kevir

¹¹ helavit: pê girt û avêt

Resûlullah şiyand ‘Emrê kurê ‘Aş
Here go rake wê pîsê ji aşaş

Dema ‘Emrî diçit xadim dibêjî
Nikarî wê xerabkî ew dibêjî

Gelî merdê şehabe lê bixînin
Bena¹² wê ji xîmê hilweşînin

Dihilşînin we dişkînin ewî jî
Qe nabînin gem û tēhlî ji wî jî

Dibêjit ‘Emrî ey sadin¹³ çewa ne
Ji wî da ma gelo derr û emane

Çi ‘eql e hûn bi destê xwe dikin saz
Diçin secde jibo wê hem be î’zaz

Bes e ev cehl û bê‘eqlîw nezanî
Eva hem tu dibînî hem dizanî

Heman teşdîqî kir sadin musulman
Di halî bû qewî kir dîn û îman

¹² bena: xanî, bîna

¹³ sadin(‘e): xidmetçiyê pûtê

88. SERÎYA SE'D B. ZEYD ELEŞHELÎ (R.‘E) JIBO XERAKIRINA PÛTÊ MENAT

Muşellel da hebû pûtek Menatî

Digotanê, peristan wî welatî

Nebî geyret kişande secdeya reb

Ji bil wî nîne mescûd û xuda reb

Virê kir Se'dê Zeyd û bîstî mêran

Herin raken ji eşl û xane wêran

Dema çû sadinê go dê çewan key

Ewî go dê Menatî dem helakey¹

Ûinaz kir go here vaye kerem ke

Dizanîbû nikarîrî munhedim² ke

Dema çû pêş ji nav şeytanê der bû

Jinek tazî reş û mekşûfê³ ser bû

Heman wê kuşt û pûtê kir be ker kir

Xerab hem xanîyê wî ser be ser kir

¹ dem helakey: bidim helakê

² munhedim(‘e): xerakirin

³ mekşûf(‘e): eşkere

89. SERÎYA EBÎ ‘AMIR ELEŞ‘ERÎ (R.‘E) BAL EWŦASÊ VA

Dema revyan Huneynê da Hewazin

Li EwŦasê kirin ‘eskerkî mazin

Resûlullah Eba ‘Amir virê kir

Digel cem‘ek ji şehban tenbe lê kir

Ji wê jî rake hîna pê gehiştin

Berê xwe dane ceng û herb û kuştin

Ji wan kuşt neh birayan bîttewalî⁴

Çiku yek piştî yek dehta nizalî⁵

Ebû ‘Amir şehîd bû hate şûnê

Ebû Mûsa birazê wî⁶ we çûnê

Li ser destê wî EwŦasê fetih bû

Dilê şehban gelek pê munşeriş bû

Gelek anîn esîran û gênîman

Jin û zar û ji talanê leîman

⁴ bîttewalî(‘e): bi şeklê li pey hev

⁵ dehta nizalî(‘e): dihate şer

⁶ Ebû Mûsa El‘eşarîyê birazyê wî

**90. SERÎYA TUFEYL B. ‘EMRÎ EDDEWSÎ (R.‘E) BI SER ZULKEFEYNÊ
VA**

Dibêjin ‘Emrê Dûsî yêkî Dûsî
Ne, babê vî Tufeylî ‘Emrê Dûsî

Li cem xwe wî niha pûtek ji darê
Diçû secda wî hişkê naşiyarê

Digotan Zîlkefeyn û destê nêbû
Ne xaliq, lêkî mexlûqek dinê bû

Resûlullah Tufeylî bal ve rêkir
Be agir şewîrand lêzokê¹ çêkir

Ku Dûsî dîtin ev hal û ‘elamet
Li halê xwe bêrî² kêşan nedamet

Çihar şed mêr gehîştin mêrê serwer
Jibo îmanê hatin cem peyember

Musulman bûn û ser dînî qewî bûn
Di emrê fexrê ‘alem munzewî bûn

¹ lêzok: leyzok, pêlistin

² bêrî: borî

91. SERÎYA QEYS B. SE'D (R.'E) BAL ŞUDA' VA

Şudaî qewmekî jalî³ Yemen bûn
Ji dînê bê behir⁴ bûn der emîn bûn

Nebî Qeysê kurê Se'dî virê kir
Çihar şed mêrî jî ber emrê wî kir

Be wan ra herbê ken ta bêne hêrê⁵
Bi bal mizgeftê va zivrîn ji dêrê⁶

Ji nageh dîn Ziyadê Hers Şudaî
Gehişte Teybe ew merdê Xudaî

Çiye ev 'eskerê ha kir sualê
Be guh xistin hemû tedbîr û halê

Çi hacet go heye herb û gezaê
Kefil im ez jibo qewmê Şudaê

Resûlullah îzin det⁷ wan bibînim
Ewan hildem tamamê vir ve bînim

Hemana nijde rûniştand peyember
Bi rê ket ew Ziyadê nîkê serwer

Hemî anî, Şudaî bûn musulman
Be rûyek rûsipî tev hane⁸ îman

³ jalî: ji alî

⁴ behir: pay, nisîb

⁵ hêre: hînbûn, îtaet

⁶ Haşîye: Bi bal mizgeftê va fetlîn ji dêrê

⁷ det: bide

⁸ hane: hatine

92. SERÎYA ‘UYEYNE B. HÎŞN EL FEZARÎ BAL BENÎ TEMÎM VA

Nebî Buşrê kurê Sufyanê Kelbî
Be bal Ke’bê Xuza‘e şand wekel¹ bî

Ku bistînit zekatê fiţrê ser wan
Meger bûne Temîmî jî li cem wan

Hemî berhev kirin malê giranî
Temîmîyan ku dîn wê sermîyanî

Li wan bû bar û puştî serweta ha
Çewan dê hûn biden wan dewleta ha

Xuza‘ew Ke’bî gotin mu’min in em
Li me ferq e zekatê dê bidin em

Temîmî guh nedan û cebrê girtin
Ewî malî ji destê wan vegirtin

Hemana Buşrî hate cem peyember
Beyan kir macerayê ha seraser²

Resûlullah heman rakir ‘Uyeyne
Digel pencî suwarê herbê dîne

Virê kir go biken kabûsîya wan
Ceza den wan li ser salûsîya wan

Be şev çûn û be roj ketne kemînan
Heta girtin be ser konê nivînan

Ji wana sî şebîyyû yazde mêran
Digel yazde jinan hêsîrî dêran

Li Teybe xistine hebsêw kemînê
Nikarî kes ji wan der va bibînê

¹ wekel: ji ba Nebî wekîl

² Haşîye: Beyan kir macerayê wan seraser

Reîsê wan ketin pê van esîran
Xwe avêtin derê mîr û wezîran

Ketin fetlan û hîlan qeṭ neçû pêş
Ji hîlan hêj didîtan renc û dilêş

Be şe'r û xuṭbeyan pur îffîxarê
Kirin lê qeṭ nehate î'tîbarê

Yeqîn çêbû ji wan ra ku resûl e
Xudanê wehy û tenzîl û qebûl e

Be hev ra hatin û îmanê anîn
Ji bin barê ḡelalê xwe deranîn

Nebî îḡsanê jî pir kir be wan ra
We hem berda esîran jî ji wan ra

93. SERÎYA WELÎD B. 'UQBE (R.'E) BI SER BENÎ MUŞTELÎQ VA

Benû Muştelîqê qewmê Xuza'e
Musulman bûn û nedkirna şena'e

Resûlullah Welîdî şande cem wan
Jibo bînit zekatê malê ser wan

Bihîstin dê Welîdî bêt we rabûn
Be te'zîm û sîlahê xwe lîqa bûn

Zekatê wan jî tevda bû be wan ra
Di pêş Îslamê lê duşmen bû wan ra

Welîdî dî ku tedbîr û sîlahê
We hem çêkir ku rabûne kîfahê¹

Ewî go dê emên bukjin yeqînî
Jibo duşmanîya kevn û nevînî

¹ kîfah('e): şer, herb

Li paş zivrî berê xwe da Medînê
Şikayet anî cem fexra zemînê

Nebî qeşd kir ku cerdek det li ser wan
Ku terbîyetekî çê dane ber wan

Bihîstin macerayê Hershî² şandin
Wekîlê Mutleqa³ bû xwe nihandin

Gehişte heçreta ‘alî xeber da
Resûlullahî vê ra lewme ser da

Kî ye’nî mani‘ê malê zekatê
Digel wî curmê çawan vir ve hatê

Me‘azellahî go ey fexrê ‘alem
Xuda bêemrî nîne ser xiyalem

Beyanê macerayahê Welîdî
We şubhew gelîfîya wî Seîdî

‘Ubadê Buşrî nû ve şand û anî
Zekatê ferqê wî malê giranî

94. SERÎYA ‘EBDÛLLAH B. ‘EWSECE (R.‘E) BAL BENÎ ‘EMR BÎN ĤARÎŞE VE

Resûlullah ‘Ebdellahî virê kir
Bi bal qewmek digotanê Benî ‘Emr

Be wan ra şandî hem mektûbekê baş
Qewîtî kir ji dînê xwe neden paş

Dema teblîgî wan kir bûne ‘aşî
Tînazan pê kirin girtin me‘aşî

² Hers b. Ebî Dirar

³ reîsê Mustelîqa

Nemîqê şuştin û lê kagidê wê
Li bin ‘elbek ve dan bo sededê⁴ wê

Ji wê zivrîn be xufînî Huneynê
Nebî ra dan beyana hal û şîne

Nebî nifrîn li wan kir dîn bibin ew
Niha jî bê‘eqil dîn in hemî ew

Dibêjin wan ne ‘eqlew ne ziman e
Wekî meflûcê⁵ lerza canê wan e

95. SERÎYA QUTBE B. ‘AMIR XEZRECÎ (R.‘E) BAL XEŞ‘EMÊ VA

Dibên rawî ku weqtek fexrê ‘alem
Şiyand Qutbew hinan ser qewmê Xeş‘em

Emir kir go li wan xe bîne talan
Eger rabûn şerî bukje rîcalan

Wekî bazî li ser emrê peyember
Digel bîstî geđenfer hilkişa ser

Muselleh⁶ Xeş‘emî rabûne pêşî
Kirin herbek ku dil jê ve diêşî

Birîndarî gelek çêbûn du alî
Li her yalê birîndar bû dinalî

Revî Xeş‘em hemî koçê xwe hiştin
Ku rûhê xwe xelaş ken neyne kuştin

Şehabe koç û talanê hılanîn
Be bal Teybe ve ajotin û anîn

⁴ seded(‘e): girtina terkê, xetimandin

⁵ meflûc(‘e): felcîbûyî

⁶ muselleh(‘e): kesên çekdar

**96. SERÎYA DEHĤAK B. SUFYAN ELKÎLABÎ (R.‘E) BAL BENÎ KULABÊ
VA**

Hilanî ‘eskerek DehĤakê Sufyan
Be bal qewmê xwe va teklîfê îman¹

Li wan kir, hilnedan, rabû qîtalê
Li wan xistew şikînan wê delalê

Hemî malê di wana kir gênîme
Kişan Teybe ku çan da wan hezîme

**97. SERÎYA ‘ELQEME B. MUCZÎRÎL MUDLÎCÎ (R.‘E) BI SER HEBEŞÎYÊN
TAÎFÊ VE**

Nebî ‘Elqemeyê lawê Mucezzer
Digel sê şed rîcalê çê virê kir

Be ser qewmek Hebeş va nêzî Cîdde
Li dev behrê be tedbîr û be ‘îdde²

Gihane adekî³ behrê muqabîl
Cihê wan, lê ewan dî wan ji saĤîl

Revîn qewmê Hebeş bûn pêre pêre⁴
Xulaşê wan neqeflandin li êre⁵

Heman fetlîn li pê xwe tev selamet
Li ser kuffarê pur bû wan şehamet⁶

¹ Di Siyera Asim Koksâl de navê qebîleyê “Benî Qurata” derbas dibe

² ‘îdde(‘e): amadekirî

³ ade(t): girav

⁴ pêre pêre: ji hev belav bûn

⁵ li êre: li wê derê

⁶ şehamet(‘e): mêrxasî

98. SERÎYA EMÎRUL MUMÎNÎN ‘ELÎ (R.‘E) JIBO XERAKIRINA FELSÊ PÛTÊ TÛYYÎ

Nebî rojek virê kir mêrê Hêyder
We dayê hem şed û pencî gedenfer

Here Fulsê li ser wan qewmê Tâî
Şenem bişkîn bide şer‘ê numaî¹

Heman şîrê Xuda ‘esker be rê xist
Gehişte qewmê kafir kîjke² lê xist

Be fecrê ra gehişte qewmê Hâtem
Şenem şewtand û kir cayê wê mehdem³

Gelek talan û hêsîran hilanî
Heman ajot û bal Teybe ve anî

Di nav hêsîrê Tâî bû Sefanet
Keça Hâtem xwedî ‘edl û emanet

Nebî qedrê wê girt û hem jî îhsan
Gelek lê kir we ew jî bû musulman

Rica kir ya Nebî! Da ez exê xwe
‘Edîyê Hâtemî bînim rexê xwe

Îzin da çû gehişte wî jî anî
Be îmanê jî wî kir şadûmanî

Ji eşhabê mezin yek jî ‘Edî ye
Çewan zanit kesê sîret ku dîye

¹ numaî(f): zahir, eşkere

² kîjke: kîjanî

³ mehdem(‘e): xerabûyî

**99. SERÎYA ‘UKAŞE B. MUĖŞÎN ELESEDÎ (R.‘E) BAL CÎBABÊ ERĐA
‘UZRETÊ VA**

‘Ukaşe nijdebû çû ser Cîbabê
Ku ‘Uzrew Bellî kêşe der ‘ezabê

Ne me’lûm e sebeb vê nijdeya ha
Ne çend in ne çewan çêbû eva ha

**100. SERÎYA CUREYR B. ‘EBDÛLLAH ELBECELÎ (R.‘E) BAL
ZÎLXELEŞETÊ VA**

Li Zîlxeleşetê bû pûtekî pîs
Şîrîn kirbû be Xes‘em pîsê îblîs

Nebî go tu çewanî ey Cerîrî
Ku bişkînî ewî pûtê şerîrî

Cerîrî got çewan bêjî wisan im
Di emrê te be rûh û hem be can im

Ji EĖmes bir şed û pencî suwaran
Suwar bûn û ketin deşt û qîfaran

Gehîştin ser şikinandin di Ėalê
Ewî şewket birin deşta niwalê

Cihê wê vê demê mizgevt e, rawî
Dibê lewra musulman bûn di dawî

Dema fetlîn nedîtin xeyrê alî
Çikû kir bû ji dunya îrtîĖalî

**101. SERÎYA USAME B. ZEYD (R.‘E) BAL UBNAYÊ VE KU WÊ DEMÊ
PÊXEMBER WEFAT KIR Û EBÛBEKİRÊ SIDDÎQ (R.‘E) BÛ XELÎFE**

Di bîst û şeş Şefer roja duşenbe
Di sala yazdehê hîcret bû tenbe

Ku ھاڊیر بڻ هرڻ ھرب û ڦتالê
Li ser Romê biken ceng û cîdalê

Nebî şubhê Usame bal xwe ve xwend
We go ser‘esker î tu ey ‘eqilmend

Di ھاڤşenbe nexweş ket fexrê ‘alem
Şikînan serweta ewladê Haşem

Di roja pencîşenbe¹ bîstê jê ra
Liwayek qenc bedest û dayê jê ra

Tu yî ser‘esker û bikşîn giranî
Cihê babê te kuştin wê mekanî

Li Ubne² de be şubhê ra be merdî
Bişewtîn bağ û ser da şîne³ cerdî

Wisane lezke xeber bighêje wana
Di pêşî her xeber bighêje wana

Liwayê da Berîdew⁴ ‘eskerê xwe
Bire Curfê nihand mu‘eskerê⁵ xwe

Hemî ‘esker muhacirîn û enşar
Digel baqî ji eşhabê di exyar

Mezintir ji Usame tê⁶ gelek bûn
Be wana xweş nebû jî jê ne fek bûn⁷

Digotin pur nebaş e nik debîran⁸
Biçûkan ken emîrê ser kebîran⁹

¹ pencîşenbe: pêncşem

² Ubna: Gundê Hanuzzeyt

³ şîne: bişîne

⁴ Bureyde bîn Husayb

⁵ mu‘esker(‘e): qerergeh

⁶ tê: tê de, di nav leşker de

⁷ fek bûn: veqetîn

⁸ debîr(f): îdarevan

⁹ kebîr(‘e): kesê mezin

Nebî seh kir li wana pur neşîhet
Kir û go nîne ev bo we feđîhet¹⁰

Usame ger çî ‘emrê va şegîr e¹¹
Ji ‘eql û feđl û tedbîrê kebîr e

Neken weswese û negrin şîqaqê
Cemi’ bin vê re bigrin îttîfaqê

Be feđla rebbê ‘alem hûnê menşûr¹²
Bibin ser dujmin û ba neşrê mesrûr¹³

Yeka yek xařirê xwe jê dixwestin
Li tedbîra cîhadê radibestin

Ku dîtî naxweşî lê kir giranî
Ji çûyînê kirin dîsa tewanî¹⁴

Dikir tenbe Usame hûn beşînin
Ji herba Romê qeř pa ra nemînin

Tevî ‘esker bû hem Şiddîqê Ekber
Digel yê dî ji wan ‘eşrê mubeşşer¹⁵

Gerand Şiddîqî îmamê di cî xwe
Çikû nedkarîya rabî ji cî xwe

Diçûn û hem dihatin pursiyaran
Usame cumleê eşhab û yaran

Duşenbe rojê, da emrê Usame
Bikêşe ‘eskerê xwe lez ji ba me

Xwe pêk anîn û da rabî, suwar bin
Li rah û oğira xwe kar û bar bin

¹⁰ feđîhet(‘e): rezalet

¹¹ şegîr(‘e): biçûk

¹² menşûr(‘e): yê alîkarî lê bûye, xalib

¹³ mesrûr(‘e): şad

¹⁴ tewanî(‘e): sistî, gewgiranî

¹⁵ ‘aşere-î mubeşşere

Xeber danê bila barê xwe dane¹⁶

Resûlullahî êşa wî girane

Peya bûn û bezîn hatin hewarê

Ji Teybe seh kirin pur zare zarê

Nihêrîn ku Nebî fexra cîhanî

Sefer kirye ji vê dunyayê fanî

Medîne da rişaye ser girînê

Hemû heywan û dar û ber di şînê

Çikû derdek giran bû ser ve hatî

Ne tenha ser wî, ser ‘alem ve hatî

Berîde anî beyraqê we danî

Çikandî cem cihê fexra cîhanî

Emîrul mumînîn bû Bekrê Şiddîq

Dema rûniştî kir tehrîk û teşfîq

Şiyand beyraqê dîsa cem emîrê

Dewama şuglê ke bêjin debîrê

‘Ereb jî hindekî geryane murted

Hinek teklîfê Îslamê kirin red

Şehaban gote Şiddîqî ew e baş

Tu mîqdarek evê herbê bidî paş¹⁷

Tijî murted demadorê Medîne

Be herba dûrekan¹⁸ hacet me nîne

Evan carek biken der tew‘ê¹⁹ ferman

Ewê dûr hêdî hêdî ken musulman

¹⁶ dane: deyne

¹⁷ Haşîye: Tu mîqdarek evê ceysê bidî paş

¹⁸ dûrekan: cîyên dûr

¹⁹ tew‘(‘e): îtaeta jidil

Ebû Bekrê Şidîq qeṭ guhnedayê
Usame dê biçit herb û gezayê

Liwaa ku Resûlullah girê da
Digel ceyšê ku derxiste di rê da

Ḥeta herbek neket eşla venabit
Welew ‘erqê musulmanan fena bit²⁰

Şehaban gotine Farûqî bêje
Hemî serra dilê me lê birêje

Wekî ev emrê meqtû‘ew²¹ tamam e
Bila emir biket geyrî Usame

Çikû zarok e wî heybet tunîne
Nika tedbîra şindîdan²² bibîne

Dema Farûqî ev gotin xeber da
Şidîqî girt be rîşê²³ wîw xeber da

Çewane ma çewane ma çewane
Diya te ey ‘Umer şîna te dane

Be emrê fexrê ‘alem bûye amîr
Nikarim bînime emrê wî teğîr

Xulaşê meşlîhet ew dîn şiyandin
Neza’ û îxtîlafê hem nişandin²⁴

Emîrul mumînîn gote Usame
Îzin de da ‘Umer mînit li ba me

Jibo tedbîr û heللê muşkîlatan
Jibo îcraê her şewm û şelatan

²⁰ welew yek musliman jî nemîne

²¹ meqtû‘e(‘e): hatiye birîn

²² şindîd(‘e): mîrxas, qehreman

²³ rîş: rî

²⁴ nişandin: sekinandin

Îzin da û cemi' kir 'eskerê xwe
Felek puşt û li oğir dan berê xwe

Digel wî şê hezar 'esker cema bûn
Hemû jî ew ji şehbê Muştefa bûn

Gehişt Ubna we lê da kir îgare
Cumû'ê wan ji hev kir pare pare

Ji kuştî pur, ji talan pur pur û pur
Esîr û yeğme pur hem pur gev û gur²⁵

Xirab kir xanîyan, daran ji reh ve
Deranîn hespê, dajotin di cîh ve

Ji Îslamê nehat kuştin şukur kes
Birîndar jî dibêjin qeş nebû kes

Usame bû suwarê hespê babî
Sitand hem jî ewê heyfa wî babî

Gelek ev nijde Îslamê qewî kir
Dilê gişkan li îmanê bicî kir

Çikû wê gêh eger ev nebûya sed
'Ereb dê pur bibûna pê ve murted

²⁵ gev û gur: gef û gur, çavtirsîn, tehdît

102. DI HEQÊ QASIDÊN WÎ (S.‘E.W) DE, ŞANDINA ŞIDDÎQ (R.‘E) JIBO ÎNSANÊN LI HECCÊ

Di sala neh ji hîcret fexrê ‘alem
Şiyand Şiddîqê Ekber da mu‘alim

Bidet nîşanî xelq û hem menasik¹
Emîrê heccê bit ey merdê nasik²

Ji Teybe ket berî sê şed hîcacan³
Dida nîşan jî her rahew ficacan⁴

Di rê da çû gehîştê mêrê Heyder
Welê dîsa emîr Şiddîqê Ekber

Gereç ku men‘ê kuffaran ji beytê
Bikew tazî negêrin kes le beytê

We hem şozê Nebî dabû ji wan ra
Ji ehd û emnê bavêjit di pa ra

Heç û ‘umre kirin, tenba xwe gotin
Dilê duşmen bi vê tenba xwe şotin

Di wê salê da mir lawê Ubeyyî
Serê ehlê nîfaq û ehlê geyyî⁵

Libasê fexrê ‘alem xwestibû da
Jibo def‘a ‘ezabê bixne berda

Hemû ehlê nîfaqê bûn peşîman
Bihîstin ku ji nû ve bûn musulman

Hezar Xezrecî zivîne dînî
Dema dîtin peşîman wê nevînî⁶

¹ menasik(‘e): ‘îbadetên heccê

² nasik(‘e): yê li emrê dîn baldar e

³ di metnê de hîcaban derbas dibû, min “hîcacan” nivîsand, herhal xelet hatiye nivîsîn

⁴ ficac(‘e): rêya navbera çîyan da

⁵ geyy(‘e): dalaleet, guneh, fesadî

103. ŞANDINA EBÛ MÛSA ELEŞ‘ERÎ WE MU‘AZ B. CEBEL (R.‘E) BAL YEMENÊ VE

Ebû Mûsa ji qewmê Eş‘erî bû

Ji keyd û hîle, bêdînî berî bû

Mu‘az ubnul Cebel jî hem ji qencan

Ji kubbarê şehabe herdu qencan

Nebî şand herduwan yalê Yemen va

Yekî jor û yekî xwarê Yemen va

Li wan kir tenbe ku îza neçêken

Û heta îmkân dibit hûn qencîyê ken

Ewan dilxweş biken bigrin be nermî

Wisa bit ku nemînin ew di şermî

Heman gote Mu‘azî ey emînî

Heye bêyî tu êdî min nebînî

Diçî cem wan xudanê qelbê nazik

Bibêje wan be nermîw qewlê nazik

Bicî bînin bila erkanê dînî

Ji Îslamê kesek pa ra nemînî

Be etba‘ê di mumîn neşrê çêke

Li ser pê paşve mayî wan di rêke

Ebû Mûsa di Mekke da Nebî dî

Mu‘azî hew bibînit carekî dî

Liqa wî ma heta roja qiyamê

Neşîb key ya îlahî bo temamê

⁶ nevînî: dijminî

104. ŞANDINA XALID B. WELÎD (R.‘E) BAL BENÎ ‘EBDULMEDANÊ LI YEMENÊ VA

Nebî şand Xalidê gewwaşê behran
Be bal ebnaê Herşê ku di Necran

Here go wan ewel teklîfê dînî
Bike pa ra ji îman kes nemînî

Eger mumin nebûn hatin qîtalê
Be wan ra jî bike ceng û cîdalê

Dema çû ‘eskerê xwe domedarî¹
Qebîlan kir belav û girt dîyarî

Li wan ba kir werin îmanê bînin
Xwe ez pencê ‘îqabê biflitînin²

Be merdî hatin û îmanê anîn
Ji ser xwe kufr û bednamî hilanîn

Li nav wan Xalidê şêrê Xuda ma
Ewan te’lîmê dînî kir temama

Ûeta qaşid şiyande cem peyember
Ji wana xwest wefedkî³ xeyrê serwer

Xuda hez ket dê beşsa wefdê bêtin
Ji paş beşsa wufûdan⁴ weqtê têtin

¹ domedarî: dormedor, hawêrdor

² biflitînin: bifilitînin, xelas bikin

³ wefd(‘e): heyet

⁴ wufûd(‘e): heyetan

105. ŞANDINA ‘ELÎ BÎN EBÎ TALÎB (R.‘E) BAL YEMENÊ VA

Resûlullah liwaek ba ‘Elî da
Be destê xwe ‘emama wî girê da

Şiyande ser Yemen go şer nedaxe
Nîda bal dînê Îslamê ve raxe

Ji bil qewlê şehadet tişteki dî
Neke teklîfê wan ba zivr û serdî¹

Li ser singê ‘Elî destê xwe danî
Du‘a kir go nebînî poşîmanî

Di her hukm û qeda û feşlê de’wa
Be cehlî lew ‘Elî nabûye riswa

Digel sê şed rîcalî wek gedenfer
Be rê ket heqretî Kerrarê Heyder

Gehîştin ser diyar û kon û malan
Jin û zar, terş û malan kirne talan

Gihane beşl û mêrxasê di wana
Kirin teklîfê îmanê li wana

Qebûl nekrin we rabûn herb û cengê
Be tîran û kevir hem hingedingê²

Yekî Muzhîc kişa şehna niza‘î³
Ewî kuşt Eswedê lawê Xuza‘î

Jibo xwe selebê⁴ wî cumle hilda
Ji ew paş Heyderî şeffek girê da

¹ ba zivr û serdî: bi hişkî û xeşîni û sertî

² hingeding: qerepere, lêdan

³ niza‘(‘e): şer

⁴ seleb(‘e): kinc û amûrên herbê

Ji wan bîst mêtî kuşt û ew revîn çûn
Ji qetlê bes kirin pê wan ve hey çûn

Ewana qefilandin carekî dî
Li wan teklîfê îman kir wî merdî

Çetarîfê⁵ di wan îmanê anîn
Kefîl jî bûn li ser wanê di mayîn

Di yek roj Hemedan⁶ tev bûn musulman
Dema seh kir Nebî pur pê bû şadan

Heman ehlê Yemen hatin li pê hev
Musulman bûn li dînî bûne ber hev

⁵ çetarîf(‘e): kesên mezin, giregir

⁶ Hemedan: Qebîla Hemdan

106. HECCA XATIRXWESTINÊ

Dema “Elyewme ekmeltu lekum” hat
Nebî zanî ecel nêze ji ayat

Li wî wacib bûbû hecc û neçûbû
We ger çi pêşî îcabê da çûbû

Ji Zîl‘eqdet¹ dibên penc rojê mabû
Li tedbîr û reha heccê numabû

Xeber da cumle eşhabê kîramî
Ku hadir bin biçin heccê tamamî

Temam nehewêt hezar eşhabî hatin
Li ber emrê wî rabestin, cevatin

Be hecc û ‘umre eħramê girê da
Dirêje behşê eħwalê di rê da

Ji qîr û dengê lebbeyke di haccan
Qiyamet bû te go ketye ficacan²

Be hêlahêl û lebbeyke gehiştin
Li dorê beytê tewwaf tev rehiştin

Li nav Mekke bibû heşr û qiyamet
Ji pêş ve kafiran dikran nedamet

Nebî gava li halek radiwesta
Ji eşhabê di xwe xatîr dixwesta

Di eşnaê hecc û hem puştî wê jî
Ji vê Heccîlweda’ bû navê wê jî

Neçû pur ku Resûlullah wefa bû
Hemû zanin sebab tewdî³ eva bû

¹ Meha Zîlqadeyê

² ficacan(‘e): newalên navbeyan çîyan

107. DI HEQÊ HEYETÊN HATINE CEM PÊXEMBER (‘E. S) DE

Dema lê kifşe bû fexra rîyaset⁴

Teemmul lê kirin şahîb kîyaset⁵

Be îstîdlalê ‘eqlî gişkî zanîn

Ku heq peyğember e, meynê⁶ hilanîn

Ji çar alî be yalê ve dihatan

Be dînê hel dikirna muşkilatan⁷

Ji wan galib musluman jî dibûna

Muñî‘ê şer ‘û Îslamê dibûna

Hinan jî ‘ehdê emnîyet dixwestin

Gelek der emrê wî jî radibestîn

Bihurî tev serîyan yê Hewazîn

Digel Malik Temîmî ger dixwazîn

Welê yê dî tamam tete beyanê

Eger rebbî bidet mehl û emanê

108. HEYETA NEŞRANÎYÊN NECRANÊ

Ji Necran şêst suwaran hevdu girtin

Ji Neşranî be bal Teybe ve hatin

Ji ber ‘Îsa peyember da cedel ken

Ku teşrîk û kirînê bo wî hel ken

Gelek bêhûde girtin hezeyanan

Be meglûbî gelek kêşan ziyanan

Xulaşe fexrê ‘alem gote wana

Mubahelet⁸ biken em we hemana

³ tewdî’(‘e): weda’, xatirxwestin

⁴ rîyaset(‘e): reîstî

⁵ şahîb kîyaset(‘e): ehlê zana û xwey peyva rast

⁶ meyn(‘e): şik, şubhe

⁷ muşkilat(‘e): problem, pirsgirêk

Jin û zar û hemû ehlan cemi' ken
Biken le'net li ser ehlê şeni'⁹ ken

Li hev şêwrîn û gotin ew Nebîy ye
Be de'wa xwe li şidqê her qewî ye

Eger nifrîn û le'net ket li ser me
Ewê qir ket ji dunyâê meger me

Xulase wan xeracê ser xwe danîn
Du bedlan¹⁰ wan qebûl kirn û hilanîn

Emînê ummetê Babê 'Ubeyde¹¹
Ewan derbazê kir ba şoz û we'de

Li ser wê 'ehdê mektûbek jî da wan
Ku piştî wî nebînîn 'eyb û tawan¹²

⁸ mubahelet('e): anîna le'netê

⁹ şeni'('e): xerab, derewçîn

¹⁰ bedl('e): qat kinc, taximê kincan

¹¹ Ebû 'Ubeyde bîn Cerrah

¹² tawan: sûc

109. HEYETA TEMÎMÊ DARÎ (R.‘E) Û HEVALÊN WÎ

Temîmed Darî ew merdê yekane

Cemi’ kir Darîyan û ehlê xane

Li wan kir we’z û nuş û hinde şîret

Musulman bûn teba qewm û ‘eşîret

Hilanîn hevdu hatin cem peyember

Muşerref bûn be dîna xeyrê serwer

Ji xeyrê xelqê xwestin erdê Cîrûn

Nebî da wan û hem jî Beytê ‘Înûn

We Beyta Îbrahîm û Beytê Mertûm

Hemî bo wan gerand meqtû¹ û nextûm²

Ji wan ra da nivîsanê nemîqek

Muhur kir dayê wan da bit weşîqek

Temîmê Darî bisyar³ in feđaîl

Ji feđla wî xeber dadin⁴ delaîl

Xwe meşhûr e ‘eceb ew qişseta wî

Ne mehcûr e⁵ di dunya şuhreta wî

Beyana wî gelek dûr û dirêj e

Meger kurtî dibêjêtin nebêje

¹ meqtû’(‘e): hatiye birîn

² nextûm(‘e): tiştê muhîm

³ bisyar in: bi siwar in, xwedyê

⁴ dadin: didin

⁵ mehcûr(‘e): bitenê, terikandî

110. HEYETA SEQÎFÊ

Resûlullah li pê herba Tebûkê
Seqîfê xiste heşr⁶ û bedxudûkê⁷

Dema fetlî be bal Teyba xwe va çû
Li pê ve ‘Urweê Mes‘ûdî hey çû

Di rê da xwe gihandê jê rica kir
Seqîfê ger çî ewwel ve xeta kir

Welê ez hatime ‘ehdek bidey wan
Ezê bakem ewê bibne musulman

Nebî go dê te bukjin ez dizanim
Ewî go ne, çikû cem wan be şan im

Heman ‘Urwe li wê îmanê anî
Dema hat çû ciyek ‘alî û banî

Nida kir go werin îmanê bînin
Ji ser xwe kufr û tuğyanê hilînin

Kesek wî guh nekir dîsa muşir man
Li ser kufr û çelalê bê beşer man

Di wê weqtê meger pê negihiştin
Di pê ve tîrekê lê dan û kuştin

Weşîyet kir dema ku tîrê lêdan
Veşêrin min li nav hîzba şehîdan

Çikû ez jî musulman im, şehîd im
Be fedla fexrê ‘alem ez se‘îd im

Ji ew paşê Seqîfî şêwrê danîn
Be bêtaqetîya xwe taze zanîn

⁶ heşr(‘e): muhasara

⁷ bedxudûk(f): dîqet

Xeber bû yek: Virê ken ser ve qaşid
Jibo wan da girêdet her meqaşid

Ji cem xwe nozde mêran wan virê kir
Resûlullah be wan ra ‘ehdê çêkir

Musulman bûn û hatin nêvê ‘êlê⁸
Kirin teblîgê koç û mal û xêlê⁹

Be Îslamê muşerref bûn tamamî
Heta heta hilanîn nîkê namî¹⁰

111. HEYETA BENÎ ‘AMIR BÎN ŞE’ŞE‘E

Şenadîdê Benî ‘Amir be ‘Amir
Kurê Tufeylî giştin bûn musafir

Be yalê Teybeê va da bibînin
Resûlullah û hîle pê gehînin

Li Erbed tenbe dabû ‘Amirê pîs
Ku meşgûl kem tu wî bukje be texlîs¹¹

Welêkin wî qilawûz hey şîyar e
Li ser guhdar e pêş ve hey dîyar e

Dema çûn meclîs û pêş meşdera¹² wî
Be wan heybet gelek da menzera wî

Be ‘Amir ra dikir gava tekellum
Dibû beşaş û hem dikra tebessum

Ewî jî diştegîlya hey Nebî ra
Be xapandin mijûl dibya be wî ra

⁸ nêvê ‘êlê: nava ‘eşîrê

⁹ xêl: qebîle, ‘eşîr

¹⁰ nîkê namî(f): navekî baş û xweş

¹¹ texlîs(‘e): firsenda bikeys

¹² mehder(‘e): cîyê lê hazir

Nihêrî tişte naêtin ji Erbed
Ker û lal, destê şal¹³, pêşî Mûhemmed

Rica kir go weşîyyet ke li pê te
Bibim peyğember û rûnim cihê te

Nebî got ev wezîfa ha wisan e
Ji geyrî rebb ne der destê kesane

Welê ez te bikem ser'eskerek baş
Cewab da go niha jî nîne talaş

Li ser Teybe ezê 'esker tijî kem
Jibo xwe dewletek hê nû vijî¹⁴ kem

Li wî nifrînî kir fexra rîsalet
Bidey derdek nebit derman delalet

Benû 'Amir bibin pê ve musulman
Mu'ezzez bin be hukmê dîn û îman

Dibêjin çû li rê derdek gihayê
Sitû wermand û wî bir ber fenayê

Li hespê xwe suwar bû şûrê kêşa
Li 'Ezraîlî hey ne're dikêşa

Digot 'Ezrêl were ceng û hewarê
Ji nageh dîn ji hespê hate xwarê

Bezîne ser ku rûh tê da nemaye
Li erdê cendekek¹⁵ bêcanî maye

We Erbed jî nelaiq pur xeber da
Ji esmanan birûskek hate ser da

¹³ şal('e): felcî

¹⁴ vijî: vejîn, îhyakirin

¹⁵ cend('e): beden, ceset

Geber kir, ‘Amirî tev bûn musulman
Mu‘ezzem bûn be Îslam û be îman

112. HEYETA DEMAM BÎN SU’LEBE

Demamê Su’lebe merdê bijarî
Berê xwe da Resûlullah suwarî

Giha Teybe berê ber mescîda da
Li deryê mescîdê naqe girê da

Muhammed kêj ke bêjin kir sualî
Nîşanî wî kirin wan fexra ‘alî

Dipirsim got sualek çend mu‘edded
Be şîddet lê nexeyde ya Mûhemmed

Nebî go dê bibêje got be qedrê
Xudêkî tu resûl î ser vî emrê

Xuda kirye emir da wehdetê ken
Şerîk û dîddê¹ jê ra em ne çêken

Emir kirye biken şewm û şelatê
Emir kirye biken hecc û zekatê

Resûlullah cewaba wî belê got
Musulman bû şerîn teşdîqî wî got

Giha qewmê xwe û teblîgî wan kir
Be Îslamê hemî qewmî cewan kir

Ji mêr û jin, ciwan û pîr û bûkan
Kirin eşkere Îslamê di sûkan

¹ dîd(‘e): zit

113. HEYETA ‘EBDULQEYS

Ji ‘Ebdulqeyse Beħreynê bû Carûd

Di şe’ran da şebîhê nar û barûd

Li ser dînê Neşara bû meger ew

Dikir medhê Nebî jî ba şî‘êr ew

Selemew îbnî ‘Eyađ jî gihanê

Di dil şê mes’ele kirne nihanê¹

We gotin ger bizanit mes’ela me

We hem hel ket jibo me muşkula me

Ew e peygemberê ‘Îsa ku mizgîn

Be wî daye be me hem daye zanîn

Dema gotin peyember maceraê

Nebî qasek bû xermaşê Xudaê

Ji wan ra kir beyan her şê sualan

Beyan kir hem cuwaba wan meqalan

Heman îmanê anîn bê teweqqûf²

Kirin teşdîqê bê reyb û tekelluf³

Nebî tenbe li wan kir go nenoşin⁴

Şerabê ku ‘eqil serde dipoşin⁵

Qebûl kir wan li ser xwe ħukmê dînî

Be keyfa xweş be ħizkîrn û şîrînî

¹ nihan: veşarî

² teweqquf(‘e): sekin

³ reyb û tekelluf(‘e): şubhe û nejidil

⁴ nenoşin: venexun

⁵ dipoşin: dinixumînin, wenda dîkin

114. HEYETA BENÎ HENÎFE

Dibên Benû Henîfe qewmê Waîl
Bihîstin ku ji peygember delaîl

Gehîştin hev hemana hevde rakib¹
Digel Muslîmeyê kezzabê kazib²

Berê xwe dane Teybe da bibînin
Ji nûra me'newî rohnî hilînin

Dema dest da li wan ew dewleta baş
Musulman bûn ji bil Kezzabê qellaş

Dikir de'wa nubuwwet wî le'înî
Nebî navê wî da "Kezzabê dînî"

Wekî fexra rîsalet mu'cîzatan
Dikir de'wa li nav kom û civatan

Welê her tiştê wî me'kûs³ dibûya
Li tîbqa fê'lê wî menhûs⁴ dibûya

Dibên rojek şebîkî birne balê
Ku destê xwe serê wî ve bimalê

Keçel bû da şîfa bit çan peyember
Dimalanda şîfa dibya seraser

Dema malî serî wî rûçikî tev
Ji çerm û goştê derket tev jiber hev

Du'a kir bo du zaran pîsê fuccar
Yekî ket bîr û xenqî yek gurî xwar

¹ rakib('e): suwarî

² kazib('e): derewçîn

³ me'kûs('e): vajî

⁴ menhûs('e): bêyom

Tifek avête bîrek pîsê kençor⁵

Hemana avê wê bîrê gera şor

Digel wî bûn wekî wî qewmekî pîs

Ji ‘eqlê eħmeq û ef‘alê îblîs

Çikû evqas didîtyan van delîlan

Xwe jê bêzî⁶ nedikran wan ‘elîlan⁷

Di puştî fexrê ‘alem wî le‘înî

Gelek kir fitneya Îslam û dînî

Cemi’ kir ceyšê⁸ da bê ser Medîne

Ku xîmê⁹ dînê Îslamê hilîne

Cemi’ kir ceyšê hem Şiddîqê Ekber

Digel şûrê Xuda Xalid şiyand ser

Ewana berheba kîrn û nehiştin

Ewî mel‘ûnê jî wê çagê kuştin

Hinan got ‘Ebdellahê Zeydî lê da

Hinan jî gotine Wehşî bû lê da

We got va heyfê Hemze min hilanî

Mi keyfa fexrê ‘alem bo xwe anî

⁵ kençor(f): di haşiyeya ‘erebî de bi me’na “xwedî exlaqê xerab” derbas dibe.

⁶ bêzî: nefret

⁷ ‘elîl(‘e): seqet, bêfêhm

⁸ ceyš(‘e): leşker, artêş

⁹ xîm: bingeh, esas

115. HEYETA ҶЕҶҶҶ

Be merdî Zeydê Xeyl û hinde Ҷаф

Kirin qeşda Resûlullah tebaî

Dema hatin muşerref bûn be menzer

Be wan xweş bû du‘a kir hem peyember

Be destê fexrê ‘alem girt û îman

Hemana Zêdî anî bû musulman

Resûlullahî Zeydîl Xeyrî gotê

Gelek medh û şena jî hem digotê

Musulman bûn hevalê wî tamamî

Be teb¹ û yumnê² wî merdê kîramî

Dema fetlîn li rê Zeydî wefa bû

Wefata wî le şehbê wî cefa bû

116. HEYETA ‘EDÎ BÎN ҶАТЕМÊ ҶАІ

‘Edîyê Ҷatemê kenza sexawet³

Ji peygember dikêşa pur qesawet⁴

Dema ғalib gera rayatê Îslam

‘Edîyê ku ça xwe hildaw revî Şam

Musulman bû berê da xwehera⁵ wî

Li cem fexra rusûl kir mehdera⁶ wî

Nebî go ma ‘eceb ew cîfê⁷ nîne

Ҷeta ku ew li ser kufrê dimîne

¹ teb’(e): lipey çûyîn

² yumn(e): bereket, bi oxir

³ kenza sexawet(e): xezîna comerdîyê

⁴ qesawet(e): hişkî, bêmerhametî

⁵ xweher: xuşk, xweh

⁶ mehder(e): şefaet

⁷ cîf(e): mirî, berate

Be lez rabû berê xwe da li yalê
Xulaşe çû gehişte wî delalê

Xeber da ku tehumten⁸ ma çi maye
Ji teşdîqa nubûwwet şubhe maye

Be lez rabe muşerref be be dînî
Ku hêj nûra beşîret te dibînî

Xulaşe dewleta ‘alî gihayê
Giha Teybe huđûra Muştefayê

Ji îmana bi wî dewlet hilanî
Şeref kir ‘alî û hem cawûdanî⁹

Xweşa dewlet ku per¹⁰ bavê du alî
Xweşa nav û xweşa namûsê ‘alî

117. HEYETA ‘URWETÎL MURADÎ

Dibêjin ‘Urwe xweş merdê Muradî
Dema bextê wîyê qenc bû munadî

Riha kir¹¹ xwe ji sultânê di Kende
We got nefsî nebe gemrahê¹² hinde

Berê xwe bizvirîne dîn û îman
Giha cem fexrê ‘alem bû musulman

Nebî wî ‘amilê ser qewmê wî kir
Gelek medhê Muradê qewmê wî kir

⁸ tehumten(‘e): zenn û tuhmet

⁹ cawûdanî(f): ebedî

¹⁰ per: bask

¹¹ riha kir: azad kir

¹² gemrah(f): yê rê wendakirî, ji rê derketî

118. HEYETA BENÎ ZUBEYDÎ

Dibên ‘Emrê kurê Me’ dîkereb hem
Digel qewmê Zubeydî bûn cema hem

Li hev şêwrîn di emrê fexrê ‘alem
‘Ecêbe tabi‘in dunya û ‘alem

Çi ‘eql e em ji dûr va lê dinêrin
Ji bil me cumle kes pê va digêrin

Tebayî hatine Teybe be merdî
Musulman bûn hemî qewmê Zubeydî

119. HEYETA KENDE

Ji Kende cem‘ekî heştê tamamî
Kirin qeşda Resûlullah kîramî

Xwe xemlandin wekî nûroz û şahî
Çevan kil dan jibo dîna wî mahî

Dema çûne huşûrê mu‘cîzatan
Teleb kîrn û emarat û şifatan

Nebî qemçek ji kevrê hûrî hilda
Dikir tesbîhê kevran destê wî da

Hemû teşdîqê kirin gotin Nebîy yî
Di meydana rîsalet da qewîy yî

Be hev ra wan hemû îmanê anîn
Ji bin kufr û delalê xwe deranîn

120. HEYETA EZDÊŞENÛ‘E

‘Înayet kir dema sultânê Yezdan
Tewafuq bû ji cem‘ek qewmê Ezdan

Hilanîn hevdu hatin cem peyember
Bi wî îmanê anîn qewmê serwer

Şured bû lawê ‘Ebdellahê Ezdî
Nebî gêra serî wî şêre merdî

Emir dayê biçit herba kufarê
Di pozê wan ve mewtê bîne xwarê

Ji peyğember weda‘ê kirn û hatin
Yemanê der Cureş bûn ser ve hatin

Musulmanan li wan girtin dumador
Heta mahek wekî kolan li wan gor

Kişan Îslam be bal kohê¹ Şeker va
Kufaran dîn ku ew kişyan ji ser va

Kirin zenna rev û tengîw firarê
Li hev haydan biken hemlew kirarê²

Gehiştin wan, li wan fetlîn musulman
Gelek kuştin ji wanê ehlê nîran³

Du ten ehlê Cureş bûn cem peyember
Ji wan ra tev beyan kir xeyrê serwer

Du‘a kir hem ji ser wan fetkî⁴ rabe
Dema hatin ku dîtin hal xerabe

Du‘ayê fexrê ‘alem kirye te’şîr
Jibo ehlê Cureş tev kirne teqrîr

Şiyandin wefdê cem fexra rîsalet
Jibo wan dînê Îslam kir delalet

¹ koh(f): çiya

² kirarî: lêdan, şerkirin

³ nîran(‘e): agir, cehennem

⁴ fetk(‘e): kuştin, qirkirin

Be cem' û kom hemî ew bûn musulman
Geran hezbek ji ehlê dîn û îman

121. HEYETA QAŞID ҲARÎŞ B. KELAL Û HEVALÊN WÎ

Dibêjin Ҳarişê lawê Kelalî
Digel cem'ek be şîrînîw delalî

Musulman bûn û şandin qaşidek hem
Be mektûbek be bal Resûlê ekrem

Resûlullah jî şukrê qencîya wan
Şiyand mektûbekî dilxweşîya wan

Be navê Lawê Seyfê Zîyezen bû
Ku zur'et seyyîdê betlê Yemen bû

Gelek tê da weşayayê¹ di qencî
Nivîsî bû ku jê nedhate rencî

¹ weşaya('e): wesîyetan

122. HEYETA QASID FERWE BÎN ‘EMRÊ CIZAMÎ

Dibên Ferwet kurê ‘Emrê Cizamî

Musulman bû be camêrî kîramî

Şiyand qasid be bal fexra rîsalet

Jibo Îslamê jê ra ket delalet

Dema Romî bihîstin ku musulman

Bûye, girtin ku zivrînin ji îman

Çiqasî lê xeber dan bê rehiştin

Nefetlî paş û lê dan û wî kuştin

Wekî baranê reşmet lê bibarê

Giranî ew nebînit der mezarê

123. HEYETA HARIŞ BÎN KE’B

Dema şêrê Xuda Xalid ji Necran

Vegerya pê ve Hariş şêrê merdan

Digel çendî ji qewmê nîkênamî

Kirin qeşda Nebî xeyrê kîramî

Be dîna wî muşerref bûn we fetlîn

Ji şoşbet feqlê pur hildan û xemlîn

124. HEYETA RUFÂ‘E BÎN ZEYDÊ XUZA‘Î

Rufa‘et lawê wî Zeydê Xuza‘î

Ji dil şemrandî¹ kufr û îmtîna‘î

Be merdî xwe gihande cem peyember

Musulman bû we kufrê kir ji dil der

Nebî mektûbekî vê ra verê kir

Be bal qewmê wî hem jî wî virê kir

¹ şemrandî: şemirandin, terkkirin

Bi wî qewmê wî tev bûne musulman
Nema qet kes ji wan ser kufr û tuğyan

125. HEYETA HEMEDAN

Cemi' bûn rojekê hin Hemedanî

Kirin qeşda Resûlîllah 'eyanî

Ji wan yek Malikê lawê Nemeţ bû

Dibêjin şa'irek qencê feqet bû

Dema çû heçreta 'alî be şî'ran

Tehîyyet kir li pêşî şahê merdan

Musulman bûn, Nebî wî jî gerand ser

Li ser cumle hevalê qencê serwer

Hemî qewmê di wan îmanê anîn

Hemî eħkamê şer'ê nav xwe danîn

Dema seh kir resûlê fexrê serwer

Ji şahî secdeya şukrê heman bir

126. HEYETA QEBÎLA TUCÎBÎ

Tucîbî merdê merdan e, musulman

Be hev ra bûn û hatin şeha îman

Zekatê xwe hılanîn sêzde mêran

Kirin qeşda Nebî mînanê şêran

Be 'erda¹ heçreta wî ku gehiştin

Di emna nuşreta wî rûdiniştin

Dema 'erqê Nebî kir wan zekatê

Nebî got ma nedin hun vê cevate

¹ 'erd('e): teqdîm, pêşkirin

Biden miskînê cem xwe êdî çê ye
Çiku çehvê di wan mêjîn ve lê ye

Ewan go pir me daye wan feqîran
Ji wan zêde ye, ev bo van dilêran

Dema xaîr ji peyğember dixwestin
Be nehy û emrê wî hem radibestin

Nebî go kes ji we paş ve nemaye
Ewan go xorçekî, wî cem devaye

Dema fexra rîsalet dî, rica kir
Resûlullahî jê ra pur du‘a kir

Ku qelbê wî mudam zengîn genî bit
Li îman û li Îslamê qewî bit

Dibêjin ta mematê ew wisa bû
Ne muhtacê kesek geyrî Xuda bû

127. HEYETA BENÎ ŞU‘LEBE

Benû Şu‘lebe bûn mumin ji cem xwe
Çihar ten şandine bo me’mena¹ xwe

Be bal fexra rîsalet çan ku hatin
Be zuhrê² ra be nav Teybe gihatin

Nebî wan dî ji wan ra kir îşaret
Wuşûla heçretê da wan tîcaret

Xeber dan vê ra ba xweş û şirînî
We gotin bo me re’yê çan dibînî

Dibêjin kê nedîbit ferr û hicret
Qebûl nîne ewî Îslam û millet

¹ me’men(‘e): îman anîn

² zuhr(‘e): nîvro

Resûlullahî go haşa fe haşa
Kesê îman qewî bit tê temaşa

Nebî penc ewqîye jî zîvî da wan
Virê kir paşê wan bal weţenê wan

128. HEYETA SE'DÊ HUZEYMÊ JI QUDA'E

Benû Se'dê Huzeymîyyû Qeda'e
Be Îslamê virê bûn ez şena'e

Jibo tefdîlê şohbet hinde hatin
Be bal Teybe bi wê feqlê gihatin

Cenazek bû, Nebî mêja wî dikra
Di mescîd da du'a jê ra jî dikra

Dema fetlî kirin 'ehda tamamî
Temaman geyrî xorçek çi kîramî

Li ber barê di wan bû wî jî anîn
Be destê fexrê 'alem girt be ayîn

Nebî jê ra du'ayê qencîyê kir
Xuda wî hem ji hemyan qencîtir kir

Be wan ra kir wekî yê pêşî dayîn
Dema çûn qewmê wan îmanê anîn

129. HEYETA BENÎ FEZARE

Deh û çendek ji eşraf û bijarî
Kirin qeşda Nebî qewmê Fezarî

Meger qeht¹ û gela bû hem di ew dem
Dema dîtin reîsê wuldê² Adem

¹ qeht('e): hişkayî, xela

² wuld('e): nesil, zurrîyet

Ji gedr û tengîya salê xeber dan

Ji birsînê û bêgavî xeber dan

Li cem wî ketne fîzar û ricaê

Ku mehder ket jibo wan cem Xudaê

Xuda vê qeht û tengayê cûda ket

Ji gedra salê ser wana jî raket

Resûlullah reîsê cumle serwer

Hemana dest bulend derkevte mînber

Ji can û dil du‘akî kir jibo wan

Xuda ser wan ve şand hem ‘ewr û baran

Leyî rabû dişirsana ji gerqan

Dikolana li dor malan jî xerqan

Nebî destê xwe hilda go îlahî

Nedî Îslam bi vê seylê tebahî³

Ji ser wana refî’ bû gerq û tengî

Xelaş bûn hem ji birsînîyû bengî

Resûlullah be wan ra qencî pur kir

Be ser qewmê di wan va wan virê kir

³ tebahî(‘e): mehvûyî

130. HEYETA BENÎ ESED

Ji ebnaê Esed yek cemi' rabûn
Li dîna fexrê 'alem hem teba bûn

Gihane mescîdê dewlet be dest dan¹
Selamê lê kirin, vê ra xeber dan

Musulman bûn dikirna îftîxarî
Jibo dînî kirin xweş pursîyarî

Li wê seknînê çendek ta ku zanîn
Xelex² tev da ji îmanê deranîn

Nebî îhsanê kir hem jî be wan ra
Be camêrî heta zivrîn ji pa ra

¹ bi destê dewletê, Hz. Pêxember, girtin

² xelex('e): kêmanî, nedurustî

131. HEYETA BENÎ ‘UZRE

Benû ‘Uzre Yemen da cem‘ekî bûn
Ji wan sêzde tenê¹ pur qencê rabûn

Kirin qeşda Nebî ba keyf û şahî
Gehîştin heḏreta bala² wî mahî

Tehîya ‘em şebaḥen jê re gotin³
Nebî pursî kîn in hun, jê re gotin

Bizane em bira makê⁴ Quseyy in
We hem puşt û penahê⁵ bo Quseyy in

Xuza‘îyy û Benî Bekrî me derxist
Ji nav Mekke we hem dewlet me raxist

Nebî pur keyfxweşî da merḥeba kir
Ji wan ra hem gelek medhḥ û şena kir

Musulman bûn û hem eḥkamê dînî
Hemû jî hîre bûn⁶ xûb⁷ û şîrînî

Nebî mizgînê da wan fethê Şamê
Li ser wan û we serbestî di ‘amê

Gelek da wan ‘eṭaya û hedaya
Weda‘ê jê kirin geyrî gezaya

¹ ten: kes

² bala: bilind

³ merheba, siba te bixêr gotin

⁴ mak: dê

⁵ penah: sitarî, muhafiz

⁶ hîre bûn: ‘ellimîn

⁷ xûb(f): baş, qenc

132. HEYETA BENÎ BELÎYY

Belîyê hizbekî qewmê Quḍa‘et
Xuda rakir ji ser wan her şena‘et¹

Hilanîn hevdu hatin cem Nebîyyê
Be îmanê şeref dane Belîyyê

Nebî şa bû li ser îmanê wana
Gelek eḥkamê da nîşanê wana

Sitandin hem hedaya paş ve zivrîn
Be yalê meskenê tê da diêwrîn

133. HEYETA BENÎ MURRE

Benî Murre ji eqwamê Qureyşan
Ji ḥalê salê geryabûn musulman

Berê xwe dane fexra murselînan
Ji dûr ve kirne qeşda dûribînan²

Gehîştin dewleta erḍa huḍûrê
Şikayet dane ji eḥwalê diborê

Ku hem qewm û ‘eşîrata te yin em
Musulman in di têngasî de yin em

Du‘a ke da ji ser me qeḥtê rabit
Rica ke da hemû têngî kuta bit³

Du destê xwe mubarek bir be bala
Du‘akî xwest ji Rebbê ‘erşê e’la

Li ser erḍê di wan baranê barî
Ji têngî wan xelaş kir Rebbê Barî

¹ şena‘et(‘e): xerabî

² dûribîn: xwest ji Rebbê yanî Nebî û eshab

³ kuta bit: biqede

Virê kir wan be îhsan û be qencî
Di dil wan qeş nehişt te'biyû rencî

134. HEYETA XEWLAN

Yemen da qewmekî bûn îsmê Xewlan
Ji nava xwe bijartin deh ricalan

Şiyandin cem Resûlullah be merdî
Jibo derman biket her êş û derdî

Dibên 'Emmî Enes bû pûtekî pîs
Be wan şîrîn gerabû pîsê îblîs

Nebî tenbe li wan kir go wî raken
Ji nav xwe xanîyê wî hem xerab ken

Be wan ra kir gelek îhsan û qencî
Dilê her yek ji nûrê kir çû gencî

Dema çû wî xebîsê jî şikandin
'Îbadet bo yekane her nihandin

135. HEYETA BENÎ MUĤARÎB

Ji ebnaê muĤarîb deh bijarî
Ji kufrê da peya bûn hane xwarî

Be hev ra hatine cem fexrê 'alem
Ku hîra bin her eĤkam û me'alim

MûĤî'ê wan bû çol û deşt û banî
Ĥeta dîtin ewan fexra cîhanî

Ji wan yek peylekî dîtir dipêşî
Eziyyet dabû vî fexra Qureyşî

Kete fîzarê¹ go tu min ‘efûkî
Li min negrî tu sûc û hem tu sûkî²

Nebî mizgînê dayê go ‘efû ye
Be Îslamê çî ku pêşî da bûye

Be îhsan û be qencî hem bi rê bûn
Di îman û di Îslamê li rê bûn

136. HEYETA ŞUDA’

Dema Qeysê kurê Se’de ‘Ubade
Resûlullah muheyya³ kir bo nijde

Digel çar şed ku biçne ser Şudaê
Ziyadê Hershî dî kom û cevaê

Li wê bû daminê⁴ wan merdê pur baş
Nebîyellah serîye bo wî da paş

Be lez çû ehlê, hell û ‘eqdê anî
Ji bin qehr û delalê wan deranî

We gotin em kefilê yê dimayî
Ewê tev bêne îmana Xudayî

Meger Se’de ‘Ubade merdê mêran
Be wan ra kir gelek qencîyû îhsan

Vegeryan çûn cihê xwe ew kîramî
Musulman bûn Şudaî tev tamamî

Ziyadê Hershî go ya fexrê ‘alem
Heye bîrek Şudaê qewm û ‘alem

¹ fîzar(f): feryad

² sûkî(‘e): xerabîyekê

³ muheyya(‘e): hazir, amade

⁴ damin(‘e): kefil, yê xerantî dike

Zivistanê keşîr e, êpe⁵ pak e
Di havînê qelîl e⁶, têrê nake

Ji kêmasî dibin tev pêre pêre⁷
Zivistanê jî dîsa tên li êre⁸

Resûlullahî heft kevran hilanî
Di destê xwe ewana bir we anî

We dayê go yeka yek bîsmîllah bêj
Yeka yek wan be nav bîrê ve bavêj

Wisn kir avê pur bû qeş nebû kêrn
Niha jî zêde ye ew avê neykêrn

⁵ êpe(t): gelekî, epey

⁶ qelîl(‘e): hindik

⁷ pêre pêre: parçe parçe

⁸ li êre: li vê derê

137. HEYETA ĞESSAN

Ji Ğessan şê nefer îmanê anîn
Ji ser xwe barê teqlîlê¹ hilanîn

Kirin qeşda Nebîw dîtin vegeryan
Be feđla şoşbetêw qencîyû îhsan

138. HEYETA SULAMAN

Selamanî dibêjin heft meriv bûn
Kirin qeşda Nebî ehlê şeref bûn

Dema dest da li wan feđla wîşalê
Şikayet lê kirin eđwalê salê

We gotin em musulman in, wekal in
Li ser yê mayî û koç û ‘îyal in

Li ser ma salê hişk e hem gela ye
Jibona me îdare qeş nemaye

Me kir qeşda te ez Barî rica ke
Ji ser me da vê tengayî kuta ke

Resûlullah hila destan du‘a kir
Hilanîna gela ser wan rica kir

Xuda baranê şande ser debîran
Ji tengasî xelaş kir wan feqîran

Ji peygember wida‘ê kîrn û hatin
Digel qencî be qewmê xwe gihatin

¹ teqlîl(‘e): qelalet, ji rê derketin

139. HEYETA BENÎ ‘EBS

Benû ‘Ebsî Xuda îmanê da wan
Li wan şîrîn gera Îslam û îman

Ji wan şê ten¹ jibo dînê xwe rabûn
Li Teybe ba Resûlullah liqa² bûn

We gotin ruhniya çehvan wisan e
Kesê hîcret neket ne musluman e

Nebî got wan qulûbê ku tijî ne
Ji teqwayê li ku bit deyrê³ nîne

Dilê wan xweş bû zivrîne li malan
Ewê mizgînê dan koç û hevalan

140. HEYETA MUZEYNE

Çihar şed mêr Muzeynî hem cema bûn
Li Teybe cem Resûlullah numa bûn

Be dîna wî muşerref bûn be şuhbet
Mufeddel⁴, hem refî⁵ bû reyb û tuhmet

Dema wana xatîrê xwe dixwestin
Zewada reh xwe ra hem jê dixwestin

Be wan ra yek be yek danî kifayet
Ji kêmasî nekir qeş kes şikayet

Nebû nuqsan ji ‘enbarê jî temrek⁶
Ji mu’cîzatê wî bû ev jî emrek

¹ ten: kes

² liqa(‘e): hevditin

³ deyr(‘e): zerar, beîs

⁴ mufeddel(‘e): tercihkirî, qencîr, lê îkram bûye

⁵ refî(‘e): rabûn

⁶ temr(‘e): xurme

141. HEYETA ŞA‘IRAN

Dibên eş‘erîyanê¹ dilhezîne
Li hev hay dan kirin qeşda Medîne

Dipêşî şa‘iran medhan digotin
Di dil guhdarekan pêş ve dişotin

Be hev ra hatin û îmanê anîn
Hemû hukmê musulmanî jî zanîn

Nebî medhê di wan kir pur be qencî
Xuda belkî nedet wan te’b û rencî

142. HEYETA DEWSÎ

Ṭufeylê ‘Emrê Dewsi weqte rabû
Kire qeşda Nebî hêj Mekke da bû

Qureyşan gotinê qet wî nebîne
Nebî ku te ji dîne te derîne

‘Eceb xapxapînok û sehrebaz e
Di dev da erqeme² zehrê dixwaze

Kesê vê ra xeber da, xapîyaye
Li ser dîne kevin êdî nemaye

Ṭufeylî cezmê³ kir ku wî nebînit
Nebî ku wî ji dîne wî derînit

Guhê xwe penbo xistê da ku nebhî⁴
Meqalatê Muḥammed nebhî nebhî

Diçit mescîd ku peygember li wê ye
Di zîkr û ta‘et û mêja Xudê ye

¹ eş‘erîyan(‘e): şairan

² erqeme(‘e): marê herî xerab

³ cezm(‘e): qîrar, biryara qet’î

⁴ nebhî: nebihîse

Digel sedda guhan jî dengek seh kir
Be şîrînî di dil da wî be cih kir

Dilê wî nermî bû hem pur jî geş bû
Be Îslamê gelek qelbê wî xweş bû

Li pê fexra rusûl çû yalê malê
Li wê îmanê anî wî delalê

We got ya fexrê ‘alem ez muta’ im⁵
Li cem qewmê xwe û xwey îmtîna’ im

Du‘a ke da Xudayem yek ‘elamet
Li min kifşe biket da bîn hîdayet

Nebî jê ra du‘a kir nûrekî pir
Di qam çê kir diçû jî şu’lekî gir

Xulaşe tev ‘eşîr û ehlê malê
Musulman bûn be teb‘a wî delalê

Di puştî hicretê hin bûn muhacir
Muqîmê Teybeê man ew di axir

Nebî wê gê meger çûbû gezaê
Li Xeyber pê gehîştin tev tebaê

Nebî wan kir şerîkê fey’ê Xeyber
Sebeb ku qeşd kirin, hatin jibo şer

⁵ muta’(‘e): yê peyvê nexweş jê re tên gotin

143. HEYETA ҶАРИҚ БÎН ‘EBDULLAH ELMUҶАРИҚ (R.‘E)

Ji ebnaê muḥarîb yêkî şadiq
Digotan wî cuwanmerdê jî Ҷариқ

Meger go weqtekî çûm Zîlmecazê
Mi dî yek xelqê ba reb va dixwazê

Li pê bû kalekî tekzîbê dikra
Be mecnûnî ewî mensûbê¹ dikra

Mi pûrsî dane nasînê bi min wan
Ku yek jê fexrê ‘alem şahê merdan

We ya dî ‘Ebdê ‘Uza Bûleheb bû
Jibo geşkirina agir sebeb bû

Mi êdî guh nedayê ta ku hicret
Nebî kir çû Medîne çûme mîret²

Li rê min dî yekî enwer mubarek
Devê bazar kir û min da be carek

Ji ber va xurme der Ҷeybe bidet min
Welê şed şayişî³ kefte dilê min

Gehiştim çan li wê deynê mi anî
Ewî merdê munewwer xweş zubanî

Gelek camêrîyê jî tenbe dabû
Dilê min ku di şerma wî we mabû

Dema çûm Ҷeybe çûme mescîdê ve
Mi dî ew merdê nûrîn wî di wê ve

Mi guh dayê ku durr in ew dirêje
Çi bêjim fedl û nuṭqa wî dirêj e

¹ mensûb(‘e): îsnat, wesifandin

² mîret(‘e): xwarin, erzaq

³ şayişî: endîşe

Li wê em tev musulman bûn û hatin
Be herdu dewletan mana gihatin

144. HEYETA BEHZAE

Ji Behzaê Quða‘e sêzde rakib
Gehiştin hev be tedbîr û be ratib¹

Musafir bûn li cem Muqdadê Kendî
Be wan xweş bû gelek ew nîkê merdî

Ji wan ra cefnekî² çêyî wede‘³ kir
Kifayet xwarin û yê dî refe‘ kir

Şiyande cem Nebî qeş‘ek⁴ ne mazin
Nebî jê xwar digel hem cem‘ê mazin

Heçî tê da hebû teslîmî wan kir
Dixwarin jê hemû mêhvan û haqîr

‘Eceb ew bû ku jê nuqşan qe ned bû
Ji te‘ma wê kesek şeb‘an⁵ qe ned bû

Đuyûfan⁶ dîtî û pursîn ji halê
Ebû Me‘bed ji wan ra kir hewalê

Li îmanê dilê wan pur be geş bû
Musulmanî bi qelbê wan jî xweş bû

Be rûh û can hemî îmanê anîn
We hîra bûne eħkaman û zanîn

Dema fetlîn Nebî îhsanê pur kir
Be wan ra hem be dilxweşî virê kir

¹ ratib(‘e): çek û sîleh

² cefne(‘e): sehan, xwarin

³ wede‘(‘e): amade

⁴ qeş‘ek(‘e): kaseyek, tasek

⁵ şeb‘an(‘e): tîr

⁶ đuyûf(‘e): mêvan

145. HEYETA ĞAMID

Ji Ğamid qewmê Ezdî sêzde mêran
Gehiştin hev cewanmerd û dibîran

Be hev ra çûne cem fexra rîsalet
Ji wan ra da reha heq ket delalet

Nebî mu'cîze da nîşanî wana
Ku qenc muhkem bibit îmanê wana

Dema dîtin be îstîdlalê¹ zanîn
Be hev ra wan hemû îmanê anîn

Ji wan ra çêbû zanînek muretteb²
Ji wan dûr bû çukû cehla murekkeb

Jibo te'lîmê dînî çende seknîn
Be îhsan paşê fetlîn şubhê pêşîn

146. HEYETA EZDÎ

Demek rabû Suweydê Herşê Ezdî
Hilanî heftê mêr ez qewmê Ezdî

Musulman bûn û çûn qeşda ziyaret
Ji şuhbet hem helînin qenc ticaret

Be 'erda heqretê gava gehiştin
Ji şayî derdê dil tê da nehiştin

Nebî wan da xeberdan û mijûlê
Mujûlî zêde kir cem wî qebûlê

Resûlullah li wan kir çend weşîyyet
Helanîn we virê bûn ba di minnet

¹ îstîdlal('e): jê derxistin, nîşandayîna delîlê

² muretteb('e): nîzamî, li cî

147. HEYETA BENÎ MUNTEFÎQ

Benul Muntefîqê ebnaê ‘Amir
Cema‘etkî ‘eqilmend û gur û pir

Kirin qeşda Hêbîullah Muḥemmed
Ku qelbê xwe be îmanê bikin sed

Gehîştin cem Nebî îmanê anîn
Derûratê³ di dînî cumle zanîn

Nebî xweş bû bi wan hem jî sena kir
Li ser wan û be wan pur î‘tîna kir

148. HEYETA NEXE’

Di sala yazdehê hîcret du şed ten
Kirin qeşda Nebîyyê nîkê me‘men⁴

Di berya hatinê da bûn musulman
Li ser destê Mu‘azê nîkê merdan

Zerare lawê ‘Emrî bû di pêşî
Munewwer bûn be rû fexra Qureyşî

Ji wan ra hêllê kir pur muşkilatan
Ji eḫwalê ku hêj tê her welatan

Muḡîbatê⁵ ku qet‘a kes nedîbû
Ji te‘bîra menamê⁶ yek ku dîbû

Xweşa dewlet jibo wanê ku dîtin
Xweşa şewket li wanê pê gehîştin

Xweşa zewq û xweşa fedl û xweşa weqt
Xweşa ‘ehd û xweşa dîdar û şuḫbet

³ derûrat(‘e): mecbûriyet, ferziyet

⁴ me‘men(‘e): cîyê emîn, stargeha qenc

⁵ muḡîbat(‘e): yên geybî

⁶ menam(‘e): xewn

Xwezî wê gêh e jî hadir hebûma
Ne vê weqtê bedê bedbextê bûma

Welê dîsa şukur çan ku niha me
Sekî exyarê qewmê Muştefa me

Ne bêdîn û ne ser dînê beşal im
Muebbed ne di êgir da dinalim

We ger çendan gunahê min keşîr e
Li tîbqa wan ceza narê se'îr e⁷

Welê umîdê min waşiq⁸ ji şahî
Ew e ku min nehêlit der tebahî⁹

Bibêjit Nûrî bûye kelbê alî
Bila miskîn nemînit der melalî¹⁰

Xuda jî bêdilî naket dizanim
Muheqqeq wê demê tev¹¹ hezbê wan im

Di rîşa tûj¹² dimînit guh nevînan
Dibin şadan bi min koma evînan

⁷ se'îr(‘e): agirê gûrkirî

⁸ waşiq(‘e): emîn, saxlem

⁹ tebahî(‘e): mehvûyî

¹⁰ melal(‘e): acizî

¹¹ tev: li nav, tevî

¹² rîşa tûj: nexweşiyeye giran

**149. DI HEQÊ MEKTÛBÊN WÎ (S.‘E.W) DE YÊN JI MELÎK Û SEROKAN
RA**

Resûlullah di teblîga rîsalet
Gelek kêşa cefa û hem melamet¹

Gelek îza ji destê xelq dikêşa
Ku canê wî mubarek jî diêşa

Digel ewqas delîl û mu‘cîzatan
Ku dengê wan gihane her welatan

Ji tekzîbê leîman² qeş venedbûn
Ji teşdîqê nedîman³ çan venedbûn

Xuda şebr û şebatek zêde dayê
Û heta ku hêdî hêdî hane rayê⁴

Dema serbestîya xwe baş hilanî
Ji herbê êdî lahorê nedanî

Ji ewwel ve bi xwe diçwa gezayê
Digel şehban be cumhûr û tebayê

Serîyyew nijdeyan caran dişanda
Gur û gev ser kufaran hin dişanda

Dikir şîret li şe‘lûk⁵ û biçûkan
Dişand mektûbê cem agaw milûkan

Li ser her qewmê tîrsa wî gelek bû
Jibo casûsîya wî lew melek bû

Di xenşer⁶ da hebû yek nîkê gustîl
Dikir neqşê wê pur texwîf û tehwîl⁷

¹ melamet(‘e): lome

² leîm(‘e): kesê rezil û zelil

³ nedîm(‘e): kesê poşman

⁴ hane rayê: hatine/ketine dînê Îslamê

⁵ se‘lûk(‘e): belengaz, feqîr

Muħemmeder Resûlullah li ser bû
Jibo her du dinan zîr û zeber bû

Ku dinvîsîn ewî pê muhrê dikra
Dida qaşid be bal paşan ve dibra

150. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA JI QEYŞERÊ MELÎKÊ RÛMÊ RA

Nebî şulha Hudeybîye tamam kir
Li Teybe çan ku rûnişt û îqam kir

Şiyand mektûbekî cem Qeyşerê Rûm
Be destê Dihyê Kelbê şahê me’lûm

Nivîsîbû were îmanê bîne
Ji bin qehr û ‘ezabê xwe derîne

We ger ne, hem gunahê xwe dikêşî
We hem yê wan serê wanî li pêşî

We go mektûb bidî tu nefse Qeyşer
Bibêjî va ye mektûba peyember

Bisekne ta ku mektûbê bibîne
Cewaba wê çiyê hilde we bîne

Dema çû gotinîya dê tu secde
Bibî jê ra ku bal xwe ve te berde

We yan danî cihek ta ku bibînit
Heta ku te be bal xwe va bixunit

Mi go secde meħal e, lê nihim ez
Cihek hetta bibînit seh bikem ez

Dema dî bal xwe va xwend qaşidê wî
Beyan ke ka çiyê ev kağidê wî

⁶ xenşer(‘e): tilfya qilîçik

⁷ texwîf û tehwîl(‘e): tirsîn û tirsandin

Be emrê Xaliqê Xellaqê Qadir
Ebû Sufyan wê çagê cem bû haqir

Li ser kir şahid û wî da xeberdan
Dipursî jê xîşalê⁸ Şahê Merdan

Ji Dihiye pursî û wî go weha ye
Ebû Sufyan digo şeddeq wisa ye

Dema seh kir hemû ewşaf û halê
We dî tekzîbê naken yek meqalê

Qesem got ev ne hukm û serwerî ye
Yeqîn zanim eva peyğemberî ye

Ebû Sufyan digo bû qîr û zarîn
Çi gotin wan ji hev ra me nizanîn

Welê pursî ji min go ka çewan e
Di qewlê rastîgo ye ew we yan ne

Ebû Sufyanî go qeṭ'a dû sozê⁹
Me jê nedye welê der ewhe rozê¹⁰

Digot îşev ku çûme Beytê Meqdes
Ji wê fetlîme Mekke Beytê Eqdes

Me wî teşdîq nekir êdî nizanim
Ji bil vê ez direw qeṭ pê nizanim

Heman biṭrîqekî¹¹ go rast e wellah
Me rêç û eşerê wî dîtî wellah

Cihê gir da bû dergeva¹² Buraqê
Niha jî kivşe ye negrin şîqaqê

⁸ xîşal(‘e): xesletan, wesfan

⁹ dû sozê: li pey soza xwe ye

¹⁰ ewhe rozê: wê rojê

¹¹ biṭrîq(‘e): patrîk

Ji xane me deranîn min yeqîn kir
Di dil wan da ku tîrsê pur be cî kir

Ku îsmê wî di pêş yê Qeyserî dîn
We navê wî nedaye şahî, xeydîn

Kirin mektûbê tîş¹³ ken, lê nehêla
Li wana Qeyserî qîra xwe hêla

We go ger ew Nebî bit heq wisa ne
Nebêjit şahî jî ma çi ziyan e

Li wan hay da, werin îmanê bînin
Jibo xwe dewleta daîm hilînin

Hemana zîqîyan¹⁴ mîna hemîran¹⁵
Hucûm danê ji çar alî be şîran

Ku em terka evî dînê xwe naken
Îta'eta li ser wî dînî naken

Ji tîrsa wan jî wî îmanê nanî
Nekir dewlet jibo xwe cawîdanî

Ji wan ra got meger min we dicerband
Ne ku min dewletê ser we diqelband

Nebî ra şand nemîqek ku nikarim
We ger ne ez li teşdîqê şiyar im

Dizanim ku resûlê heq yeqîn î
Li cem rebbê xwe xwey dost û emîn î

Digel qaşid hedîyek şande jê ra
Nebîyûllahî wî şadiq nedêra

¹² dergev: ciyê gavê

¹³ tîş: çirandin

¹⁴ zîqîn: nêrîna tûj a bi çavan

¹⁵ hemîr('e): ker

151. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA KÎSRAYÊ MELÎKÊ FARIS RA

Nebî mektûbekî da nîkê faris¹

Be bal Kîsra hinara², şahê Faris

Ku navê fexrê ‘alem dî di pêşî

Xeyîdî kağidê kir tîşe tîşî

Ku navê xwe berî navê mi tînit

Ku ew ‘ebdê mine dê ew bibînit

Fe haşa summe haşa summe haşa

Resûlullah geda bit ew bibit şa

Welê her kes xwe mîna xwe dinasê

Diket her kes li şexşê xwe qiyasê

Heman Kîsra virê kir yalê Bazan

Nemîqek pur ji efkarê di erzan

Here go çan gehîştî wî te dîtî

Çira binhêr diket de’wa nebîtî

Bide tewbe ji balê paşê bizvir

We yan bigre ewî bîne heta vir

We ger ne, wî bukuj xûna wî birjîn

We ger ne, tê serê te cumle ew kîn

Ji min ra ma çira ewha dişînit

Nezanit dê ji destê min bibînit

Heman Bazan li ser emrê le‘înî

Du qaşid şande cem fexra zemînî

Çewan mektûbê xwendin sîrrê zanî

Heman Cebrîlî jê ra mujde anî

¹ faris(f): suwarê hespê

² hinara: şand

Fulan weqt û fulan sa‘et filan dem
Ewî dukjin qe negre fikr û me’tem

Ji qaşid ra beyan kir hem nivîsî
Ji Bazan ra hemû halê wî pîsî

Be emrîllah di ‘eynî dem kurê wî
Ewî kuşt da be dozex³ va berê wî

Dema Bazan ‘eyan kir vê meqalê
Musulman bû digel xelqê hewalê

Şiyande cem Nebî qaşid beyan kir
Musulmanî we yê borî ‘eyan kir

Li wî nifrînê peygember eşer kir
Ku Kîsra dewletê zîr û zeber kir

³ dozex: cehennem

152. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA JI NECAŞÎYÊ (R.‘E) MELÎKÊ HEBEŞ RA

Melik Necaşî sulţanê Hebeş bû
Musulmanî gelek pê rind û xweş bû

Nebî mektûbekî jê ra virê kir
Şirîn teklîfê îmanê jî lê kir

Dema mektûbê danê sirrê zanî
Heman maçî kir û ser çehvê danî

Ji ser textê peya bû hate xwarî
Tewaçu’ kir Nebî ra wî şiyarî

Meger îmanê anî bê teweqquf¹
Musulmanî qebûl kir bê tekelluf

Ji ‘acê² huqqekî³ bihbûdê⁴ anî
Ewê mektûbê danî tê hilanî

We go hetta evê ha nêv Hebeş bit
Hebeş dê daîma dilxweş û geş bit

Nivîsî bal Nebî va hem nemîqek
Li cem fexra cîhanê kir weşîqek

Kurê xwe şand digel şêştê bijarî
Be te’zîma Nebîyyû nîkê karî

Be emrîllah di behrê tev telef bûn
Be firdewsê xwedî par û şeref bûn

Îlahî! Şubhê barana biharê
Li ser rûhê di wan reħmet bibarê

¹ teweqquf(‘e): sekin

² ‘ac(‘e): diranê fil

³ huqqe(‘e): qab

⁴ bihbûd(f): saxlem, sihhet

153. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA JI MUQEWOIS RA

Nebîyyê xeyrê her ewqam û meclis
Nemîqek şande Mişrê cem Muqewqis

Be bal Îslamê va wana nida kir
Ferîda¹ emrê teblîgê eda kir

Dema mektûbê dî lê kir firaset²
Nihêrî lê be tedqîq û kiyaset

Ji qaşid pûrsê kir go ew çewan e
Li ewşafê di wî nedkir bihane

Wiha ne got ‘elamatê rîsalet
Çewan Încîlê jî kirye delalet

Wisan e dê ezê tê da binêrim
Musulman bim ji Qibtan ger buwêrim³

Heman hûqqek muzeyyen şand û anî
Nemîqa fexrê ‘alem tê hilanî

Nivîsî cem Resûlullah cewabê
Di heqqê te ku nakem îrtîyabê⁴

Newêrim ez ji nû ve eşkera bim
Nikarim hem ji ser mulkê xwe rabim

Şiyand jê ra hedaya û du carî
Ku Marîye we Sîrîn du bijarî

Digel hesp û ker û hêstir gulaman
Ji bînha hingivîn û hinde aman⁵

¹ ferîd(‘e): ferz

² kiyaset(‘e): zanebûn

³ buwêrim: cesaret bikim

⁴ îrtîyab(‘e): zen, şubhe

⁵ aman: qab

Welê dunya nehişt bête kemalê
Xulaşê çû zewala bin delalê

Ûeta ‘Emmer li ser ‘esker li ba kir
Fetiþ kir selþenet wî berheba kir

154. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA JI MUNZÎR B. SAWÎYÊ TEMÎMÎ RA

Dibêjin Munzîrê Sawî Temîmî
Li ser dînê mecûsan bû şemîmî

Nebî mektûbekî jê ra virê kir
Ewî hişyarî dîn û rastê rê kir

Dema mektûbê xwend û kir muþale
Yeqîn kir ku mecûsiyet beþal e

Be camêrî heman îmanê anî
Ji qewmê jî hinan ser rengê anî

Yehûd û hin mecûsî mane bê re¹
Kî batil terk nedan û mane gumre²

Ji nû Munzîr nivîsî go weha ye
Ji ma³ emrê Resûlullah çewa ye

Nebî jê ra nivîsî kî bimîne
Li ser dînê kevin cizye nihîne

Resûlullahî Munzîr kerde walî
Li ser ehlê Temîmî wê hewalî

Be emrê şer‘ê kir hukm û reîsî
Virê bû hey ji her zulm û xesîsî⁴

¹ re: rê

² gumre: ‘înat

³ ji ma: ji me ra

⁴ xesîsî(‘e): cîmrîtî

**155. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA JI DU ZARYÊN CULENDÎ YÊN MELÎKÊ
‘UMMAN RA**

Burader bûn du ten lawêd Culenda
Li ‘Ummanê be wan şewket weşen da

Resûlullahî ‘Emrê ‘As hinarî
Be mektûbek ku çêken karûbarî

Dema mektûbê da wan du delalan
Nihêrîn û ketin fikr û meşalan¹

Xwe me’lûm e ku ‘Emrî jî çewan e
Debîr û ‘aql û şaşir cewan e

Be îstîdlal û hem nuşq û xeberdan
Meger serwextî kir wan nîkê merdan

Heta ku herdu wan îmanê anîn
Digel cem‘ek pir û yê dî ku nanîn

Xerac û cizyeyê danîne ser wan
We ‘Emrê ‘Asî jî mabû li cem wan

¹ meşal: heyret

156. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA JI HEVZE B. ‘ELÎYÊ HENÎFÎYÊ LI YEMAME RA

Dibêjin Huvze bû reysê Yemame
Nebû dewlet lê reysê wê ‘emame¹

Suleytê ‘Emrî mektûbek hilanî
Ji peyğember be bal ve kir rewanî

Nivîsîbû ku dînê min dizanî
Gihaye her welat û her mekanî

Musulman be selamet da bimînî
Di bin destê te mulkê te bimînî

Dema seh kir kete bañil delîlan
Dirêj kir lê cîdal û qal û qîlan

Meger Erkûnê neşranî li cem bû
Di ‘ilmê da xudanê parî cem bû

Ji Erkûnî soal kir go çewan e
We Erkûn go Nebî axir zeman e

Eger îmanê bînî, tu dimînî
Li ser seltenet û feqlê dibînî

Nebû mumin welê qencî gelek kir
Be qaşid ra be camêrî virê kir

Xulaşê ew li ser kufrê muşir² ma
Be kufra xwe di dozex mustemir³ ma

Welê Erkûn musulman bû di axir
Jibo xwe dewleta cawîdî⁴ her bir

¹ ‘emame(‘e): emîrtî

² muşir(‘e): yê israr dike

³ mustemir(‘e): daîmî

⁴ cawîdî(f): ebedî

157. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA JI HERSÛ B. EBÎ ŞEMRÎYÊ ĞESSANÎ RA

Dimeşqê da dibên Hershê Ğessanî

Emîrek bû we îmanê netanî

Nebî mektûbekî jê ra virê kir

We teklîfa musulmanbûnê lê kir

Dema danê, nihêrî, lê nexweş hat

Li bextê wî belîdî pur be reş hat

Heman bêperweyê mektûbê avêt

Meger şewket ji dewlet xwe hilavêt

Meger şeytan tijî kir ber milê wî

Ji bextê bed ewî xapand dilê wî

We girte fitne û şerr û fesadê

We ‘esker kir jibo bête cihadê

Şiyand cem Qeyserî îzin dixwesta

Li tedbîra cihadê radibesta

Şiyand Qeyser cewaba wî ku rûne

Selamet mal ve rûniştin, neçûne

Mureyyê dergevanê Hershî îman

Be xeyrê xelqî anî bû musulman

Beşîret wî ji Hershî ruhnîtir bû

Rîyaset ra ji wî pur ehlîtir bû

158. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA JI BENÎ NEHD RA

Benû Nehdê Yemen, qewmek ‘eceb bûn

Xeberdanê di wan pur muđterib¹ bûn

¹ muđterib(‘e): bi endîşe, xwaromaro, ya herkes jê fêm nake

Kelamê wan kesek ji fehmê ned kir
Feşaḥet qeṭ be bal ve wehmê ned bir

Be ṭerzê wan Nebî mektûbê çêkir
Be yalê cemi' wan ve wê virê kir

Çiku fexra rîsalet her zubanî
Be te'lîma îlahî tev dizanî

Dema dibhîstî jê her kes be yê xwe
Gelek pê xweş dikir unsîyetê xwe

Xulaşê çan emir kir mumteşil bûn
Di emrê wî be can û hem be dil bûn

159. MEKTÛBA WÎ (S. 'E.W) YA JI ZULMÎ'ŞARÊ HEMEDANÎ RA

Yemen da bû qebîla Hemedanî
Gelek qewmek be tedbîr û giranî

Reîsê wan bû Zûlmî'şarê Malîk
Kurê Nemeṭ nebînit qet mehalîk¹

Musulman bûn û şandin cem peyember
Ji xwe wefdek şerîf û qenc û serwer

Resûlullah dema wefdê bi rê kir
Digel wana nemîqek hem virê kir

Beyan kir lazimê dînî ji wan ra
Gelek tewşîye jî kir hem ji wan ra

¹ mehalîk('e): cîyên bitalûke

160. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA JI QETEN B. ẖARÎŞEYÊ ‘ELÎMÎ RA

Kurê ẖarîşe ez qewmê ‘Elîmî
Qeţen wek quţnê¹ bû nermîw ẖelîmî

Digel hindek seranê² qewmê hatin
Wekî zerre be têr tijî gihatin

Qeţen weqtê Nebî dî girt medîhan
Be îş‘arê şe‘arê her fesîhan

Nebî jê ra şena got û nemîqek
Şiyand bal qewmê wî ve kir weşîqek

Derûratê di dînî tê beyan kir
Musulmanî ji wan ra tê ‘eyan kir

¹ quţn(‘e): pembo

² seran: reîsan

161. MEKTÛBA WÎ (S.‘E.W) YA JI WAÎL BÎN HÛCER RA

Dibêjin Waîlê HÛcrî ji Hêdrem¹

Gelek qenc bû mufeddel bû mukerrem

Ji bin tarîfîyê dewlet deranî

Be fexra ‘alemê îmanê anî

Ji peygember rica erdê Yemen kir

Nebî dayê we wî jî mu’temen² kir

Nivîsî kağidek jê ra sicîl kir

Digel wî qaşidek jî mumteşîl³ kir

Ji emr û nehy û hukm û wacîbatan

Beyan kirbû jibo kom û civatan

Muhîmma wî li dînî çimkî pur bû

Li her cî cem hemî kes tenbe gur bû

¹ Hêdrem: Hedramewt

² mu’temen(‘e): serçav

³ mumteşîl(‘e): îtaatkar

162. DI HEQÊ TIŞTÊN JI MU'ZÎCATÊN WÎ (S. 'E.W) DE

Dema îna' am û îhsana îlahî

Be 'ebdek ra gelek bit bê tenahî¹

Ji çar alî li çerrê wî dibin kar

Neyar û hem li tenkîsa² wî hişyar

Ûeta çare bibînîn wî dixînin

Ûeta îmkân biken wî dişikînin

Çiqas nî'met mezin bit dujminâî

Dibit zêde ji merdê bê Xudaî

Çiqas peyğemberek rabû di 'eşrek

Dema teblîgê emrê kir di mişrek³

Ji dûr û gir ji nêzîk pêş ve rabûn

Li tekzîb û cefaya wî bela bûn

Çiku tiştekek gerîbî dûrî 'eql e

Xilafa mentîq û zanîn û neql e

We hem jî inqilabek pur bedî 'e

We hem jî insilabek⁴ pur fecî 'e

Dixwazitin şuhûdê pur 'ecaîb

Dixwazitin delîlê ba geraîb

Ev e hukmet ji neqşê mu'cîzatan

Ev e 'illet di ferşê muşhîzatan⁵

Rusûl bê mu'cîze lewra nebûne

Xuda kîjkî şiyand vê ra hebûne

¹ tenahî('e): qedîn, bidawîbûn

² tenkîs('e): sertewandin

³ mişr('e): welat

⁴ insilab('e): derxistin, tunekirin

⁵ muşhîzatan('e): di haşîyeya 'erebî de bi me'na muxewîfat yanî tirsan derbas dibe

Muḥemmed serwerê her serwera bû
Ji nav qewmek ḥedîdê hişkî⁶ rabû

Ji didî⁷ her rusûl wî zêdetir bûn
Çenedar⁸ û be‘eql û merdîtir bûn

Ji her mu‘cîze ger dergeh venebya
Derê teblîgê belkî lê venebya

We hem peyğemberî wî ‘ammetir⁹ bû
Ewî de’wet ji ḥemyan tammetir¹⁰ bû

Gelek muḥtacê bû bal mu‘cîzatan
Jibo teşdîq û tesxîra¹¹ welatan

Xuda jî zêdetir mu‘cîze dayê
Li ṭibqa¹² şandin û emr û nîdayê

Dema peyğemberê pêşîn wefa bûn
Hemî mu‘cîzeê wana jî rabûn

Welê salarê ruslan¹³ fexrê ‘alem
Muḥemmed serwerê ewladê Adem

Mudam şems e¹⁴ li orta asîmanan
Diçin mu‘cîzeta axir zemanan

Çiku cumle kiramatê di qencan
Xudanê înzîwa û ehlê rencan¹⁵

Temamê mu‘cîzat in her jibo wî
Delîlê ḥeqqî îsbat in jibo wî

⁶ ḥedîdê hişk: exlaqsert

⁷ did(‘e): zit

⁸ çenedar: di xeberdanê de mahir

⁹ ‘ammetir(‘e): şimûltir

¹⁰ tammetir: mukemmeltir

¹¹ tesxîr(‘e): wezîfedarkirin, xistina xizmetê

¹² li ṭibqa(‘e): li gorî, mutabiq

¹³ salarê ruslan(f): Serokê resûlan, reisê pêxemberan

¹⁴ mudam şems e(‘e): roja daîmî

¹⁵ renc(‘e): ezîyet, ta’de

Çiku ew şems e, wana yîn kewakib¹⁶

Dikêşin nûrê ser tîbqa meratib¹⁷

Ji xwe Qur'an li ser rûyê zemîn e

Mezin mu'cîze ye, her kes dibîne

Binêrin wan pirofsor û hekîman

Ji bêdîn û ji kuffar û leîman

Li derrê wî diken hey goşîdarî

Ji bil azadegî¹⁸ naynin tu karî

Digel wî qasî jî cumle funûnan

Dikin jê îstîfade hem şûnan

Ew e mu'cîze ku de'wa rîsalet

Biket yek daku heqqî ket¹⁹ delalet

Li şidqa de'weyê bînit²⁰ 'ecîbek

Bidet nîşan li ser de'wa gerîbek

Muhemmed mu'cîze nayên hîsabê

Be hindek em muzeyyen ken kîtabê

Ji her mu'cîzeê zahir mezintir

Duşeqbûna heyîv e ba tewatir

Di Mekke weqtê de'wa kir rîsalet

Qureyşan gotinê kanî delalet

Nebî derhalê bû gerqê şuhûdê

Ji xwe havêt emaratê wucûdê

Be rûh û can be Xaliq mutteşil bû

Wucûdê der şuhûdê muđmeñil²¹ bû

¹⁶ wana yîn kewakib(‘e): wanê din sitêrk in

¹⁷ meratib(‘e): derencan

¹⁸ azadegî(f): hurriyet, serbestî

¹⁹ ket: dike

²⁰ bînit: bîne

Ji emrê “qum feenzîr”²² bû xeberdar
Li îlzama xusûman²³ geştî hişyar

Îşaret bal heyîve kir du şeq bû
Li esmanê du alî munfelîq²⁴ bû

Hemû kes lê dinêrîn û didîtin
‘Eceb man rahê înkare nedîtin

Meger çare nedîn gotin ku sîhr e
Çewan gotin kitaba wî jî şe’r e

Ebû Cehl û digel hin bedsukalan²⁵
Kirin tekzîb û gotin bedmeqalan²⁶

We gotin purs biken xelqê cihatan²⁷
Didîtin hem jî xelqê her welatan

Eger geyrî me jî dîbin wisa ne
Şehîhew rast e, bê şubhew guman e

Ji kê pursîn we ye²⁸ gotin be tehqîq
Digel vî qasî jî nekrin be teşdîq

Gelek hingame bû mu’cîzekî wî
Ku meşgûl bû be wehyê li serê wî

Li ser çokê ‘Elî bû hem ‘Elî jî
Be wî meşgûl, nimêja ‘esrê çû jî

Ġurûb²⁹ kir şems û dîsa fexrê ‘alem
Du‘a kir paş ve zivrî rojê ew dem

²¹ muđmeñil(‘e): yê bere bere wenda dibe

²² rabe bitirsîne

²³ îlzama xusûman(‘e): mecbûrkirina dujminan

²⁴ munfelîq(‘e): fêlqe, perçe

²⁵ bedsukal(f): mîzanxerab

²⁶ bedmeqal(‘e): gotinên xerab

²⁷ cihat(‘e): hêl, derûdor

²⁸ we ye: weha ye

²⁹ ġurûb(‘e): çûyîna ava

Nebî ‘îrabîyek dî lê kerem kir
Ku lê teklîfê dînê muhterem kir

Kî ye go şahidê te ku resûl î
Xudanê şidqiyû qewlê qebûl î

Nebî got şahidê min ev çinar e
Resûlullah çewan lê kir îşare

Xwe hejyand û ji erdê reh deranî
We hate heçreta fexra cîhanî

Nebî jê xwestî şê car şehdeya wî
Ku şahid bit li peyğemberîya wî

Be ezmanek feşîh go tu resûl î
Xudanê ‘ezz û temkîn³⁰ û qebûl î

Îzin jê xwest û dîsa çû cihê xwe
Heman şîn bû li ser kok û rehê xwe

We e’rabî jî vê ra bû musulman
Be wechê wî qewî kir dîn û îman

Dibêjin Hecera Eswed mubarek
Xeber daye Nebî ra şed tebarek

We hem jî dar û ber erd û nebatan
Xeber dane we seh kirne welatan

Li ser kohê³¹ Uşud tev hinde yaran
Uşud hejya li bin cem‘a xiyaran³²

Nebî lingê mubarek lê hilanî
Şela da³³ go Uşud ma tu dizanî

³⁰ ‘ezz û temkîn(‘e): îzzet û teyît

³¹ koh(f): çiya

³² xiyar(‘e): kesên bijartî, bixêr

³³ şela(‘e) da: deng lê kir

Li ser te yek Nebî ye, yek jî Şiddîq
Di wê dîtir şehîd in hem be tehqîq

Bisekne hey bisekne ew jî seknî
Ji cezba girtibû kefte³⁴ di wehnî³⁵

We merwî³⁶ ye ji her cem‘ê ruwatan³⁷
We meşhûr e di nav kom û cevatan

Ebû Bekr û ‘Umer, ‘Uşman û Bûzer³⁸
Li dorê fexrê ‘alem girtibûn ger³⁹

Nebî hilda be destê xwe mubarek
Ji erdê heft kevir wanê mubarek

Di destê wî mubarek kirne tesbîh
Be dengê cehwerîyyî⁴⁰ pur be teşrîh⁴¹

We da destê Ebî Bekr û ‘Umer jî
Wisî ‘Uşman û hem dest Babê Zer jî

Dema datanîyan erdê diseknîn
Be wan ra lê didan tesbîh û vingîn⁴²

Dibêjin xwarinek anîne pêşî
Dikir tesbîhê pêş fexra Qureyşî

Di mescîd da hebû ciz‘ek⁴³ sitûnek
Ji darê xurme hişk û bê şûnek

Nebî xutbe dixwenda pal didayê
Ku mînber çêkirin êdî nedayê

³⁴ kefte: ketin

³⁵ wehn(‘e): zeîfî

³⁶ merwî(‘e): hatiye gotin, hatiye rîwayetkirin

³⁷ ruwat(‘e): piraniya rawiyan

³⁸ Bûzer: Ebû Zer el-Ġifarî

³⁹ ger: daîre

⁴⁰ cehwerîyyî(‘e): dengdawûdî

⁴¹ teşrîh(‘e): eşkere

⁴² vingîn: nihurîn

⁴³ ciz‘e(‘e): kutik

Ku dî êdî Nebî naçête balê
 Girî kir îske îsk û hem jî nalê

 Nebî destê xwe lê malî we telîf⁴⁴
 Digel kir pur, nekir êdî teessîf⁴⁵

 Deva yêkî ji Enşar girte hêçî⁴⁶
 ‘Inanê înciyadê⁴⁷ jê ve pêçî

 Şîkayet kir li cem fexra zemînê
 Deva min har e, girtîye nevînê

 Wisan bû kes neşî⁴⁸ biçwa muqabîl
 Nebî got ka çewan e wî delaîl

 Dema nûra Nebî jê ve xuya kir
 Kire nîrnîr we jê ra secdekî bir

 Nebî gotî çera tu dîn û hêç î
 Ji fermana xweyê xwe ser dipêçî

 Ewê go ruhnîya çehvan wisan e
 ‘Elef kême we barê min giran e

 Resûlullahî gote şahibê wê
 Neke gedrê di bar û ratibê⁴⁹ wê

 We gote wê jî serkêşî beşemrîn⁵⁰
 Di fermanê tu gerden dîse dayîn⁵¹

 Be wî emrî jî herdu mumteşil bûn⁵²
 Di ferman û nihêrîn wek ewwil bûn

⁴⁴ telîf(‘e): qencî, xelat

⁴⁵ teessîf(‘e): xemgînî

⁴⁶ hêç: har

⁴⁷ ‘inanê înciyadê(‘e): hevsarê girêdanê

⁴⁸ neşî: nikare

⁴⁹ ratib(‘e): xwarin, êm

⁵⁰ beşemrîn: bişemirîne, terk bike

⁵¹ Di emrê xwediyê xwe de dîsa sitûyê xwe deyne

⁵² mumteşil(‘e) bûn: xwe pê ve girê dan

Pez û dar û beran secde birin pur
Bila hed in çi bêjit pîsê munker

Çiqas heywan di nav malê di wî bûn
Di ‘erda hedreta wî munzewî bûn

Dema hadir bûya te’zîmî dikran
Serî ber ejnûyê⁵³ te’zîmî dibran

Dibên gurgex hucûm kir ser kerek pez
Ji nav hildan jibo qûta xwe yek pez

Şivanî jê sitand û gur xeber da
Çira rizqê mi bo te l-min beder da

Şivanî got binêrin van ‘ecîban
Gurê binxîve⁵⁴ mêze ken gerîban

Gurî go ma ji vê e’ceb bibîne
Muhammed bal heqqî va xel dixune⁵⁵

Dide nîşanê wan her mu’cîzatan
Li çol û deşt û nav kom û cevatan

Pezê xwe anî û hate Medîne
Musulman bû ku ruswayî nebîne

Dibên Ye’fûr kerê fexra rîsalet
Xuda jê ra bulendî kir delalet

Nebî wî girt dema Xeyber fetih bû
Dema hat cem Nebî pur munşerih bû

Nebî ra kir tekellum pur be şêrîn
Digot ez cem yehûdek bûm di pêşîn

⁵³ ejnû: çoka ling

⁵⁴ binxîve: biaxive, bipeyîve

⁵⁵ xel dixune: xelqê dawet dîke

Dibûm ‘aşî li ser wî pîse merdî
Ditirpilyam⁵⁶ mi wî davête ‘erdî

Ji min da ku neket qeṭ îstîfade
Ḥeta min ket be bal te va î‘ade⁵⁷

Mudam çavnêrîya rojê he dikram
Yeqîna weşleta te hey jî dibram

Çiku abae⁵⁸ min şêstê tamamî
Muheyya bûn jibo ruslê kîramî

Ji nesla wan ji bil min qeṭ nemaye
Ji bil te murselek jî qeṭ nemaye

Dibên weqtê resûlullah wefa bû
Sebeb ku pur li ser zor û cefa bû

Ji kerban çû xwe avête di bîrê
Ḥeta wî jî vexwartî mewtê zehrê

Dibên e’rabîyek qewmê Selîmî
Nelaîq got, Nebî girte ḥelîmî

Meger keftarekî kovî digel bû
Nedîbû keskî heywanê cebel bû

Heman î’rabî go ger ez bibînim
Bi te îmanê bînit ev, e tînim

Heman keftar be ezman hat xeber da
Ji teşdîqa nubuwwet wek şeker da

Çewan e’rabî wî dî hate îman
Xelaş kir xwe ji teḏlîl û ji tuḡyan

⁵⁶ terpilîn: şewişîn, teyisîn

⁵⁷ î‘ade(‘e): vegerîn

⁵⁸ abae(‘e): bavik

Nebî rojek diçû di deşteki da
Ji nageh dengêki lê hate peyda

Nihêri ku girêdayî gezalek
Li cem razaye e'rabî mîsalek

Nebî got te çiyê hacetê gezalê
Be ezmanek feşîh got wê delalê

Evî e'rabîyê ha min girê da
Du têtjik⁵⁹ min we birçî vê çirê da

Tu min berde biçem da nêzikî wan
Niha jî da ku têr kem ez zikê wan

Ji ew paşê Xuda dîsa kerîm e
Be halê wan Xebîr û hem 'Elîm e

Nebî ra 'ehdê paşfetlandinê da
Resûlullah be wî 'ehdê wê berda

Wezîfa xwe qedand û care jî hat
Kete qeyda xwe dîsa ça ji wê hat

Ji xew e'rabî rabû dî li balê
Resûlullahî xeyrê xelq û alê

Çiyê gotî eya bînaheya min
Be min hacet ku seknî hêvîya min

Nebî got vê gezalê ku tu berdî
Tu dermanê li derdê wê beserdî

Jibo fexra rîsaletê wê riha kir
Birîna ser dilê wê hem dewa kir

Be çolê ket xwe davêt cotik û cot
Şehadet ser nubûwwetê wê ra hem got

⁵⁹ têtjik: çêlikên xezalê

Dibên weqtek li hişk erdek Nebî bû
Digel cem‘ek pir û wan avê nî bû

Nimêja ‘eşrê bû çare nedîtin
Welê cem yêkî hindek avê dîtin

Nebî destê xwe danî navê der bû
Ji nêv tilyê mubarek cobe ser bû

Hemû destmêjê girtin kes nema paş
Hemû hacet hilanîn jê gelek baş

Meger derbûnîya avê mukerrer
Bizanin hun ji wan tilyê peyember

Di herban da biman mecbûr cuwanan
Dibûn daxwazê fexra asîmanan

Xulaşê tîhnîyû tengî nedîtin
Çiku Kewşer be wan ra bû didîtin

Dema xendeq li dorê Teybe kolan
Tijî bûn ser ji kehlan⁶⁰ û ji rolan⁶¹

Nebî şê roj li ser hev mabû birsî
Li sewra cû‘ê⁶² cem kes qeş nepirsî

Meger Cabîr be halê wî bû ageh
Îzin jê xwest we çû mala xwe nageh

Xwerek pirsî gelo haqîr çî maye
Fedabim fexrê ‘alem birsî maye

Jina wî got heye fetrek⁶³ cehê me
Heye kehrek de‘îf e, puşt cihê me

⁶⁰ kehl(‘e): yextîyar

⁶¹ rol: ciwan, rewal

⁶² sewra cû(‘e): hîsa birçîbûnê

⁶³ fetrek(‘e): hinek, destek

Be lez çêke, bihêre go bipêje
Digel goştê wî kehrê hêj nemêje

Dema çêbû, Nebî pê kir xeberdar
We got encax heye têra du şê çar

Nebî got dê bihêlî ta bibînîm
Heval û hogîran hildem bibînîm

Nîda rahişte her kom û cema'et
Werin got Cabirî danî diyafet

Bezî Cabir be mal ve, heyirî ma
Ji şerman rengê wî pur geyirî ma

Jina wî got çiyê, go hal wiha ye
Neke gem got be emrê Muştefa ye

Binêrin çi jinek îman qewî bû
Li ser qewlê peyember dilqewî bû

Nebî tûka mubarek kir di dîzê⁶⁴
Hevîrê hem ku şeytan pê nelîzê

Heman pehtin kişandin ber cuwanan
Kifayet kir dilêr û pehlewanan

Ji ber wan zêde kir hin ma di malî
Ji e'cazê Nebîyyê fedlê alî

Gelek caran wiha çêbûye jê ra
Welê teqşîrê⁶⁵ nezmê tev nedêra

Gelek bêcan ji nûv jiyandiye wî
Be bal dînê mubîn va xwendîye wî

⁶⁴ dîz: qaba ji heriyê çêkirî, kûza mîna teştê

⁶⁵teqşîr('e): kurtkirin

Eb û ummê⁶⁶ di erkanê se‘adet
 Vejand û her du pê hatin hîdayet
 Gelek car tîflê newzade⁶⁷ ji e‘caz⁶⁸
 Tekellum vê ra dikra pur be î‘zaz⁶⁹
 We pur exres⁷⁰ jî pê dehta zubanî⁷¹
 Dibûna na‘îqê⁷² qencê zumanî
 Xudê êşan dema tanîne balê
 Nebî destê mubarek lê dimalê
 Di halê da şîfa dibya ji êşî
 Be fe‘dla Şahê Luqmanê Qureyşî
 Ku heywanek ‘edûdî⁷³ yan teralî
 Bigirta, ger bigotan fexrê alî
 Du‘a bikra we yan destan bimala
 Di halê da dibû bihbûd⁷⁴ û wala⁷⁵
 Du‘aê mu‘cîzê wî bê hisab in
 Ne heddê ser qelem şefhê kitab in
 Xeber daye ji geyban û nedîtî
 Ji hed purtir wekî çawan ku dîtî
 Cemî‘ê mu‘cîzatê enbîyaan
 Kiramatê tamamê ewlîyaan
 Di fexra ‘alemê de bûne mewcûd
 Hene yê wî li cem kes nîne mewcûd

⁶⁶ eb û umm(‘e): bav û dê

⁶⁷ tîflê(‘e) newzade: gedê nû welidîye

⁶⁸ e‘caz(‘e): mû‘cîze

⁶⁹ î‘zaz(‘e): bi hurmet

⁷⁰ exres(‘e): lal

⁷¹ dehta zuban: dihatin ziman, dipeyîvîn

⁷² na‘îq(‘e): yê dipeyive

⁷³ ‘edûdî(‘e): serkêş, gezok

⁷⁴ bihbûd(f): saxlem, bi sihhet

⁷⁵ wala: bala, bilind

Ne îmkân e hemû bêne hîsabê
Weha nade niçaqa⁷⁶ vê kîtabê

Jibo xişrê⁷⁷ kîtaba xwe me hindek
Nivîsî lê ji behrê nîne çendek

163. DI HEQÊ WESFÊN ZATÊ ŞERÎF (S.‘E.W) DE

Ewê ku erd û esman, ‘erş û kursî
Jibo wî çêbe, weşfê wî çî pirsî

Ewî ewşafê ne îmkân zuban e
Ne heddê defter û her qeleman e

Qelem kol⁷⁸ e we defter rûsîya⁷⁹ ye
Zuban lal e di weşfa Muştefa ye

Welê şewqa dil û canê dixwazî
Ji beş û weşfê wî det⁸⁰ serfirazî

Dizanî jî ku xwe kasid⁸¹ qumaş e
Nivîsayê wê bê rûy û belaş e

Rûwê wek roj û hêvê wî didêra
Nezer bal ve be dîqqet kes nedêra

Ji pûlûrîyê⁸² şor û hem sipîtî
Dikir gazî resûlî û nebîtî

Munewwer ne wekî şems û qemer bû
Gelek çêtir ji wan û nûrîtir bû

Dida ruhnî di ro nûra heqîqî
Di tarî wî didîtan her reqîqî⁸³

⁷⁶ niçaq(‘e): bergeh, şimûl, sînor

⁷⁷ xişr(‘e): xeml, qîmet

⁷⁸ kol: tewandî

⁷⁹ rûsîya(f): rûreş

⁸⁰ det: bide

⁸¹ kasid(‘e): ya nayê firotin

⁸² pûlûr: pelûr, têkilhev

Ji nageh ve xuya bikra ji kê ve
Neşî teqdîrî bikra roj e hêv e

Ji puştê ve xuya dikra rûwê wî
Enî rast û kişandî ebrûwê wî

Digel rindî delalî xûnşirînî
Dikir heşmet ji husnê her nevînî

Cemala wî ji Yûsif zêdetir bû
Kemala wî ji weşfê zêdetir bû

Du çehvê reş tebarek şed tebarek
Bibûne rewşê ser husna mubarek

Ji teşbîha wî zulfê reş kovan e
Ji insa⁸⁴ wî di şêfa reş⁸⁵ cevane

Be destê qudretê kuhlê⁸⁶ kişabû
Ji qudret neqşekî pur dilkuşa⁸⁷ bû

Be roj û hem be şev wek hev didîta
Li pêş û paşê jî wek hev didîta

Li ser sipyan bû şorayî du alî
Bijangê wan dirêj û ba delalî

Ji neqşê qudretê goşê cemaleş⁸⁸
Zuban naşî tamam weşfê kemaleş⁸⁹

Ji dûr û nêz û ez bêcan û ba can
Wekî yek seh dikir canê hemû can

⁸³ reqîq(‘e): narîn, nermexlaq

⁸⁴ ins(‘e): ulfet

⁸⁵ şêfa reş: şeva tarî

⁸⁶ kuhl(‘e): kil

⁸⁷ dilkuşa(f): dildikşîne

⁸⁸ goşê cemaleş(f): guhê cemala wî

⁸⁹ weşfê kemaleş(f): wesfê kemala wî

Çewan weşşemsî husna rûyê wî bû
Wisana welleylî sonda mûyê wî bû

Serê wî anegora⁹⁰ ‘ilmê mazin
Welê nedbû ji efratê⁹¹ qe gazin

Ji neqşê rebbê ‘alem pozekî bû
Ne mazin ne piçûk û pur zekî bû

Devê wî xatemek⁹² bû ez melaḥet⁹³
Welê mazin li ser tîbqa feşaḥet

Xulaşe çehreyek bêhed bedew bû
Ku husna ‘alemê lê ne gerew⁹⁴ bû

Wekî tiryaqê bû wellah tifa wî
Nesîma cennetê bû hem pifa⁹⁵ wî

Tif û puf wî gelek êşan şîfa kir
Bila ḥedd in ewê ku Muştefa kir

Zimanek bû di dev da şubhê şeker
Şirîntir bû ji şehd⁹⁶ û şîr û şeker

Xeberdanek di dev bû maşaellah
Feşaḥet ḥîkmetek bû barekellah

Xeberdanê wî zengîn û feşîḥ bûn
Kelamê wî gelek nef’ û melîḥ⁹⁷ bûn

Diden şehdeyîya rastgoyîya wî
Kesanê ku diken duşminîya wî

⁹⁰ anegor: li gorî

⁹¹ efrat(‘e): îfrat

⁹² xatem(‘e): mohr

⁹³ melaḥet(‘e): peyva xweş

⁹⁴ gerew: bedel

⁹⁵ pif: nefes

⁹⁶ şehd(‘e): hungiv

⁹⁷ melîḥ(‘e): xweş, bi nukte

Jixwe qencî ew e duşmin bibêjin
Feđîlet hem ew e e'da⁹⁸ birêjin

Ji dengê wî meger Dawûd fihête
Zebûra wî ji Qur'an çan fehête

Bikenya wer bigirya pur nizim bûn
Şehîq⁹⁹ û qehqehê jî munhezim¹⁰⁰ bûn

Ji wî ra bûn du destê pur sexawet¹⁰¹
Kefa destan sitûr¹⁰² û pur celadet¹⁰³

Tilîw pêçî dirêj û hâkimî bûn
Gelek nerm û delal û 'alimî bûn

Dida destê wî bîna misk û 'enber
Meger bihîn digot vaye peyember

Fireh bûn kefê destan ez sexîfî
Sitûr bûn zend û baskan ez qewîfî

Ji zend û baskê wî ezman çî bêje
Çiku qeşwayê¹⁰⁴ beşşê pur dirêj e

Binê çengan sipî wek rengê leş¹⁰⁵ bû
Çu misk û 'enberê jî bihnê xweş bû

Zik û sîngê mubarek bûn musawî¹⁰⁶
Mubarek pur fireh ew eqdesa¹⁰⁷ wî

Dilê ku pur ji her esrarê Ellah
Qelem naşî bidet weşfa wî wellah

⁹⁸ e'da('e): dujmin

⁹⁹ şehîq('e): keser

¹⁰⁰ munhezim('e): di binî re, kêr

¹⁰¹ sexawet('e): comerdî

¹⁰² sitûr('e): xurt

¹⁰³ celadet('e): bi qûwwet

¹⁰⁴ qeşwayê('e): qissetên

¹⁰⁵ rengê leş: rengê ten

¹⁰⁶ musawî('e): wek hev, di eynî hîzayê de

¹⁰⁷ eqdes('e): pîroztir

Nihayet bêjî beħrek pur ji daniş¹⁰⁸
Ji teqdîrê dibit dîsa jî yaniş¹⁰⁹

Xuda encax be mîqdarê dizane
Ne heddê eqlê însan û zubane

Hebûn wî du sitûr û hem qewî leng
Nerim bûn şubhetê evrîşimê peng¹¹⁰

Şerefdar û şerefbexş û ‘elîşan
Çi bêjim lingê ku derketye ‘erşan

Qed û qamet ne wek serwa¹¹¹ sihê bû
Ji wê serwa sihê xef der sihê bû

Ne kurt û ne dirêj û mu’tedîl¹¹² bû
Be bal tûlê¹¹³ ve berçav ew meyîl bû

Çiqas merdê dirêjî bê feşalî
Li ber meşya, Nebî bû dîse ‘alî

Xuda nedhişt ku kes jê zêdetir bî
Hey û hey jî ji her kes zêdetir bî

Li ber tavê diseknî ew mubarek
Siha wî nedkete erdê be carek

Wekî evrîşimê pora serê wî
Ne girdayî ne berdayî berê wî

Dihata nav milan gava ku berda
Li ser goşan diseknî ku neberda

Dihûna çar kezî dikra muzeyyen
Be tezyînek¹¹⁴ ji nik Xaliq mu‘eyyen

¹⁰⁸ daniş(f): ‘ilm û zanîn

¹⁰⁹ yaniş(f): kok, ‘eslî

¹¹⁰ peng: hevrişim, îpekî

¹¹¹ serwa(‘e): dara serwiyê

¹¹² mu’tedîl(‘e): navîn

¹¹³ tûl(‘e): dirêj

Ji şeybêti¹¹⁵ sipîtayê nehabû
Ji bil nozde mûyan ebyed¹¹⁶ nerabû
Be muştê¹¹⁷ şeh dikir lihye¹¹⁸ mubarek
Serê xwe duhnî dikra tev be carek
Ewî nav mil fireh bû pehlewani
Qewî hem rastê wek halê cuwanî
Hebû muhra nubûwwet nav milê wî
Dixwend her kes ji ser biçwa cilê wî
Muhemmedur Resûlullah nivîsî
Li ser bû ma xetek şêrîn kuwîsî¹¹⁹
Li dorê xatemê helqek mûwê reş
Be destê qudretê lê ew bibû neqş
Bese ev mu'cîze ey Nûrî nadan
Jibona şehsuwarê 'erşê Yezdan
Be rê ve ku diçû xwe nedhejanda
Di meşyê da beden têkve dişanda
Li ber pê wî dibû teş¹²⁰ deşt û banî
Kesê vê ra dimeşya pê dizanî
Çi reh biçwa ji e'caza rîsalet
Dida bihnek li ser dikra delalet
Heta şê rojê jî kî pê ve biçwa
Ji wê bihnê di defnê¹²¹ wî ve diçwa

¹¹⁴ tezyîn('e): xemilandin

¹¹⁵ şeybe('e): yextîyarî

¹¹⁶ ebyed('e): sipî

¹¹⁷ muşt('e): şeh

¹¹⁸ lihye('e): rî

¹¹⁹ kuwîsî('e): xweşik, qenc

¹²⁰ teş('e): kudandin

¹²¹ defn: poz

Ji xwehdana wî bîhna misk û ‘enber
Difewrî¹²² zêdetir Ellahû Ekber

Gelek zêde beşerm û hem heyra bû
Şebûr û hem weqûr û ba wefa bû

‘Efûker bû ji şemtîna¹²³ nezanan
Nebû wek wî kesek dewr û zemanan

Di her weşfê xwe da yek ‘alemek bû
Be tenha heqqê wî yek ademek bû

Welêkin ew jibo tefdîlê¹²⁴ adem
Ji ademzad û bû salarê¹²⁵ ‘alem

Digel vî şanê pur dikra tewađu’
Tu caran ser kesî nedkir terafî¹²⁶

Nedişkinande keyfa xadimê xwe
Suwar dikra li pişt xwe xadimê xwe

Be şehbê xwe dikir caran tînazan¹²⁷
Berî bûn lê ji kizb¹²⁸ û hem finazan¹²⁹

Dikir dîwan be wan ra carî caran
Jibo keyfxweşîya eşhab û yaran

Dibû enbazê¹³⁰ wan der şîn û şahî
Dida ser qencîyê wana guwahî¹³¹

Giran û pur kerem bû meclîsa wî
Ferehbexş û şîrîn bû me’nesa¹³² wî

¹²² difewrî: difûrî

¹²³ şemtîn: xeta kirin, şemitîn

¹²⁴ tefdîl(‘e): hurmet, bilindkirin

¹²⁵ salar(f): serok, pêşîvan, mezin

¹²⁶ terafî(‘e): doz lê vekirin

¹²⁷ tînaz: henek

¹²⁸ kizb(‘e): derew

¹²⁹ finaz(f): hîle

¹³⁰ enbaz: dost, heval, model

¹³¹ guwahî: şahidî

Di meclîs ser nehiltanîn şehabe
Ji ejnûyê¹³³ tewađî' çê 'eşabe¹³⁴

Kesê bûya ji derve taze daxil
Dima mebhût¹³⁵ ji heşmet¹³⁶ pêş muqabil

Heyakarê wekî wî kes nedîbû
Ku 'ewret wî helalê¹³⁷ wî nedîbû

Neqencîkî ku bibhîsta ji şermê
Diher¹³⁸ nedkir digirta hem be zemmê¹³⁹

Li ser dînî meger bû pir be geyret
Li geyretkêşîya dînî be şîret

Digel çendî ku yekta bû di 'alem
Di feqlê serwerê ewladê adem

Dikir ahîn ji xewfa rebbê 'alî
Ku 'erşê rebb ji ber ahîn dinalî

Meger xewfa wî te'zîma Xuda bû
Çiku rebbê wî mizgîna wî dabû

Xuda vê ra wisan kir bû kiramet
Ku dabû wî heme new'ê sexawet¹⁴⁰

Ji kuffarê qe nedgirta pêxavê¹⁴¹
Kela¹⁴² herbê xwe davêta di navê

¹³² me'nesa('e): xoşsuhbet

¹³³ ejnû: çok

¹³⁴ 'esabe('e): kom, zumre

¹³⁵ mebhût('e): şaş, heyirî

¹³⁶ heşme('e)t: tewazû, edeb

¹³⁷ helal('e): xanim

¹³⁸ diher('e): izhar

¹³⁹ zemme('e): qewî girêdan

¹⁴⁰ sexawet('e): comerdî

¹⁴¹ pêxav: wehm û tirs

¹⁴² kel: germî

‘Efffîyû emînê rastîgoyê
Ciwanmerdîyû zuhd û nîkê poyê¹⁴³

Ne cinn û ne di ins û ne di emlak
Nebûn wek wî di erd û ne di eflak¹⁴⁴

Di exlaq û di ewşafê bedî’¹⁴⁵ bû
Ji kêmasîyû nuqşanî meni’ bû

Di Qur’an û di Tewrat û di Încîl
We hem cumle semawîyê di tenzîl

Kemalatê di wî tefşîlê mezkûr
Meqalatê di wî wan dane mezbûr¹⁴⁶

Ji eḫbarê hemî ehlê kitaban
Ji weşfê wî didan nuṭq û xiṭaban

Li hev tenbe didan ku hat Muḫemmed
Be wî ‘ehdê biken taze mucedded¹⁴⁷

Şev û rojê dikirna întîzarê¹⁴⁸
Ne dîtî pur dikirna întîşarê¹⁴⁹

Hezar salan di pêşî hatina wî
Li dunya û di pêşî dîtina wî

Tebi’ jê ra be kovan¹⁵⁰ û keser bû
Be rûhê xwe jibo ṭewqê¹⁵¹ kemer bû

Li pê gerya nebû jê ra muyesser
Cemala dîtina rûwê peyember

¹⁴³ nîkê poyê(f): qencê li rê bezayî

¹⁴⁴ eflak(‘e): kaînat

¹⁴⁵ bedî’(‘e): xarîqûlade

¹⁴⁶ mezbûr(‘e): nivîsandî

¹⁴⁷ mucedded(‘e): nûkirî

¹⁴⁸ întîzar(‘e): bendewarî

¹⁴⁹ întîşar(‘e): zefer

¹⁵⁰ kovan: êş

¹⁵¹ ṭewq(‘e): îtaeta jidil

Ji dûr îmanê anî pê bû qani'
Rica kir ku jibo wî bibte şafi'¹⁵²

Nivîsî danî Teybe wî delalî
Ku hat teslîmî ken vê erdêhalî

Dema çû Teybeê fexra rîsalet
Be meçmûnî¹⁵³ wî wana kir delalet

Ji peygember dema vî qasî dîtin
Li îmanê qewî bûn sîrrê dîtin

Yehûdî dujminê dunya û dînî
Digel vî qasî jî girtin nevînî¹⁵⁴

Li ser kufra hesûdî hem muşur man
Be tekzîba Resûlullah mu'îr¹⁵⁵ man

Dizanîna ku heqçen ew resûl e
Xudanê de'weya şidq û qebûl e

Di dunyaê ewan girtin kewa¹⁵⁶ xwe
Ji bedbextî ewan berdan kewa¹⁵⁷ xwe

Şena'et ew bû ku hate serê wan
Rezalet ew bû ku hate berê wan

Kesê bû tabî' û îmanê anî
Şukur şed car şukur dewlet hilanî

¹⁵² şafi'('e): şefaetkar

¹⁵³ medmûnî('e): tevî naverokê

¹⁵⁴ nevînî: dijminî

¹⁵⁵ mu'îr('e): rezîl, bi 'eyb

¹⁵⁶ girtin kew: dağ bûn, hatin kewandin

¹⁵⁷ berdan kew: kew yanî firsend berdan

164. DI HEQÊ WEFATA WÎ (S.‘E.W) DE

Felek doma te kurtew bê wefa yî
Xwedî xapandin û cewr û cefa yî

Te ne ‘ehd e, ne şoz e, hem ne bext e
Bixapit kî bi te, karê wî sext e¹

Dilê şehbê Resûlullahî geş bû
Be wechê wî mubarek weqtê xweş bû

Dizanîna ku wan dewlet dewamî
Ji kîna dehrê emîn bûn kiramî

Gula bagê di wan şên û cuwan bit
Felek hey hey li pê keyfê di wan bit

Nezanîna ku dê baê xezan² bê
Ku dê payîz li ser bagê di wan bê

Ji nageh dîn felek kînê li wan kir
Gula bagê dil û canê di wan bir

Hucûm da şebr û teskîna dilê wan
Gem û tehlê giran kir ser milê wan

Li wan roja wîşalê muntehî³ bû
Şeva furqet be ser wan da sihî bû

Çewan “elyewme ekmeltu” bû tenzîl
Dilê Şiddîqî bû kovan û tehwlê⁴

Resûlullah dizanîbû be halê
Kete tedbîra halê îrtîhalê⁵

¹ sext(‘e): zor, dijwar

² xezan(f): payîz

³ muntehî(‘e): herî dûr

⁴ tehwlê(‘e): tirs

⁵ îrtîhal(‘e): ketina rê, wefat

Dibên çan Sureê Neşrê bû munzel
Nebî zanî ku wî nêzîk e murhel⁶

Heman derkefte mînber xutbekî xwend
Nefehmî meqşedê her kes ‘eqilmend

Ji bil Şiddîqê Ekber ew jî girya
Ji şînê ku zuban qenc nedzivirya

Be lez çû hecc û xaîr xwest ji beytê
We hem tewdî‘ê⁷ yek yek kir li beytê

Di sala yazdehê hicret di mahî
Şefer da emrê gezwê kir wî mahî⁸

Usame lawê Zeydî re’sê⁹ ‘esker
Gerand û dayê ‘esker go biken şer

Li ser Ubna we ew ketne cihazê¹⁰
Li tedbîra reha herb û birazê¹¹

Resûlullahî ta girt û nexweş bû
‘Eceb çi tali’ û bextek be reş bû

Wisani takî giranî bê feşalê
Ji ber erq û sema ku hem dinalê

Kesê messa¹² lîbasê wî ku dikra
Di wî da jî meger te’sîrê dikra

We hey tenbe dikir ‘esker bişînin
Nebe paş ve ku hûn wan bizivrînin

⁶ murhel(‘e): ketina rê

⁷ tewdî(‘e): weda, birêxistin

⁸ Haşîye: Şefer da emrê gezwê kir wî şahî

⁹ re’s(‘e): ser, serî

¹⁰ cihaz(‘e): amadehî

¹¹ biraz(‘e): pevçûn, şer

¹² mess(‘e): pê dibû

Çiku pur îhtîmama wî be dînî
 Hebû hem reh dida nîşan emînî

 Ku ‘esker dî mereq¹³ lê bû giranî
 Di cih da her kesek girte tewanî¹⁴

 Ji rûhê wan bû çimkî ew şirîntir
 ‘Ezîz û hem hebîb û hem emîntir

 Di roja şenbeê bû îbtîda wî
 Fecî‘a hemyû¹⁵ hem naxuşîya wî

 Li cem Meymûne Ummul mu‘mînîn bû
 Di qismê da wekî qayda berîn bû

 Digirya ode ode xanî xanî
 Welê gava mereq lê kir giranî

 Îzin xwest û li cem ‘Aîşeê ma
 Jibo wê dewleta cawîdê her ma

 Ji ber êş û giranî nav nivînan
 Nikarî rabe bê nava evînan¹⁶

 Emir da heqretî Şiddîqê Ekber
 Bibit îmam jibo şehbê di efser¹⁷

 Nimêjek da ‘Umer îmametî kir
 Nebî seh kir xeyîdî hem nehî kir

 Li mescîd cemi’ bûn Ensariyê wî
 Jibo pursa wîyûw dildariyê wî

 Xeber danêkê ey ruhnahîya me
 Me dil dîna te ye bînahîya me

¹³ mereq(‘e): nexweşî

¹⁴ tewanî: tewîn

¹⁵ hemîy(‘e): sincirîn, ates

¹⁶ nav evînan: nava dost û eshaban

¹⁷ efser(‘e): bêtir bişeml

Heman rabû serê xwe qenc girêda
Ketin bin çengê wî birne be wê da

Wisane mescîd tijî bû reh nema bû
Çiku purs û 'îyada¹⁸ Muştefa bû

Li xwarê mînberê rûnişt sena kir
Li rebbê xwew li şehban hem du'a kir

Ji ewwel tewşîya Muhacirînan
Li Enşaran kir û cumle evînan

Jibo tewqîrê¹⁹ Enşaran qewîtî
Li kubbaran kir û tenba evîntî

Reha heq da nîşanî wan yeka yek
Reha herdu dinan²⁰ jî hem yeka yek

Neşîhet kir ji enwa'ê neşîhet
Ji nuşê lew nedî ummet fedîhet²¹

Li ehl û qewm û cîran û evînan
Dida tenbe jibo rêza nevinan²²

Ji wê rabû we çû nava cihê xwe
Sebat nedkir ji geyrî palgehê xwe

Mereð hey lê fikir geh geh giranî
Du geh jê ra wekî hev nedimanî

Duşenbe rojê Cebrîl hate balê
Çewanî got û kir teftîşê halê

Ehed rojê we hem roja duşenbe
Dipursî lê welê şubha duşenbe

¹⁸ 'îyad('e): serdana nexweşan

¹⁹ tewqîr('e): hurmet

²⁰ din: dinya

²¹ fedîhet('e): rezîltî

²² rêza nevinan: me'mela bi dujminan re

Digel bû heḍretî ‘Ezrîlê canan
Melek mewtê hemû pîr û cewanan

Îzin jê xwest we paşê bûyî daxil
Li cem rûnişt xeberda pêş muqabil

Kî ey mehbûbê rebbê asîmanî
Jibo neqla be bal heq va çewanî

Xudayê te te gêraye muxeyyer²³
Di mewt û jînê da ey şahê serwer

Welê Cebrîlî go rebbê liqayê
Dixwazit ku biçî darel beqayê

Resûlullahî go madem wisan e
Me rehlet²⁴ çêtir û behter eman e

Şiyande cem Usame xwend û anî
Du‘a kir pur îşaret hem nihanî²⁵

We go ‘esker bi rê bêxew neseke
Ji gezwê paş nemîne qeṭ neseke

Yeka yek xatîrê xwe xwestin û çûn
Li tedbîr û cihazê²⁶ hey belav bûn²⁷

Ji bil Şiddîqê Ekber kes nema paş
We ew jî ma be emrê serwerê baş

Bihûrî sêzde şev naxuşîya wî
Rebî’ ewwel di dazde paşîya wî

Mija reş hate ser erd û semaê
Ximara²⁸ reş kişa çetr²⁹ û seraê

²³ muxeyyer(‘e): di tercîhê de serbest

²⁴ rehlet(‘e): rêwîti

²⁵ nihanî: bi dizî

²⁶ cihaz(‘e): amadehî, hazîrî

²⁷ Haşîye: Li tedbîra cîhadê hey belav bûn

Resûlullahî kefte sekretê da
Ji wî sist bûn û mane heyretê da³⁰

Li ber singê keça Şiddîqê Ekber
Dikir sekret Hebîbûllah peyember

Digota daîmî refîqel e'la³¹
Heta çû heçreta Quddûsê e'la

Hemana dîn Resûlullah wefa bû
Li ser erç û semaê pur cefa bû

Dema rûhê muqeddes munfeşil bû
Be dîwana îlahî mutteşil bû

Heman 'Ezrîl kete şîn û girînê
Jibo mewta şehê rûwê zemînê

Digiryanda jî hem cem'ê di emlak
Ji erçê bû gelectir şînê eflak

Şela da heçretî Xîdrê mu'ezzem
Dikir te'zîye bo ehlê mukerrem

Wekî baran digirya me'temî bû
Meger huzna wî ser destê hemî bû

Şehabe darê jane ser girînê
Dimu'an³² te digo tofane tîne

Ji wan giş 'eqlê der dan şubhê mecnûn
Welê 'Ebbasî herdu ling ji ber çûn

Ji kerban hin ker û hin sersem û lal
We hin bê gav û bê çûn û çem û şal³³

²⁸ ximar('e): perde

²⁹ çetr('e): kon

³⁰ Leşkerên Usame weha sekinîn

³¹ refîqê e'la('e): dostê herî bilind

³² dimu'('e): hêstir

We ‘Ebdullahî ewladê Enîsî
Ji kerban mewtê ser xwe hem nivîsî

‘Umer şûrê xwe kêşa û qesem kir
Cilê mecnûnîyê jî hem di ber kir

Kesê bêjit wefat kirye bibînim
Ezê vî şûrê ser ustû ve bînim

Xeber dane Şidîqê Ekberê wî
Hewalê şahê E’zem serwerê wî

Bezî hat û be lez wechî nihêrî
Kete şîn û girîn û hale hîrî³⁴

Dema wechê mubarek pur be nazî
Vekir ramûsiya, kir qîr û gazî

Fîda bim ya Resûlullah tu çûyî
Fîda bim ya Hebîbullah tu çûyî

Qesem bîl mewtetel ûla³⁵ çunîne
Ji ta³⁶ mewtek dîger êdî çunîne

We gote ‘Ummer û dîger şehaban
Binêrin ayetê husnê xîtaban

Xuda “îneke meyyîtun” virê kir
Be wê îqna‘ê şehb û ummetê kir

‘Umer go wayê weyla cez‘ê³⁷ mînber
Çewan gerya li ser feqda³⁸ peyember

Digel bêcanîyû hişkîw cimûdê³⁹
Dikir êskînîke⁴⁰ pur wê ‘umûdê⁴¹

³³ şal(‘e): felcî

³⁴ hale hîrî: halê hîn bû

³⁵ mewtetel ûla(‘e): mirina ewwel

³⁶ Ji ta: ji te ra

³⁷ cezi’(‘e): mîl, şaft

³⁸ feqda(‘e): wendakirin

Heq e ummet ji şîn û purgirînê
Hemû bimrin ji kerban kes nemînê

Digerya hem feđaîl wî digota
Ji bêgavî şemaîl wî digota

Xulaşe Teybe bû gola girînê
Dihejya û dirijya pur ji şînê

Wekî nahidê⁴² mersîyan digotin
Kul û derdê dilê xwe pê didotin

Ji cin û îns û emlak, dar û hem ber
Digeryana li ser feqda peyember

Çiku ew rûhî bû bo kaînatana
We hem rûhê rûhê mukewwenatan

Ebû Bekir Şidîq teskînî da wan
We got nîne wefata wî wetawan⁴³

Beyan kirye hemû eħkamê dînî
Kîtaba wî li nava we dimînî

Wefat bû lê Xuda heyy û qeyyûm e
Îlahek waħid e, dîsa jibo me

Me me'bûd her ew e ney ku Muħemmed
Me Xaliq her ew e ney ku Muħemmed

Ketin şewra ku em çawan ğesil ken
Be lubsê wî ve yan tazî ğesil ken

Musellet bû li wan nageh xewek xweş
Jixwe her kes di cî xwe bû muşewweş

³⁹ cimûd(‘e): bêcan, bêhereket

⁴⁰ êskînîk: îskeîska girînê

⁴¹ ‘umûd(‘e): sitûn

⁴² nahid(‘e): yê/ya dinuhirîne

⁴³ wetawan: xwedî qûdret, Allah

Di xew da her kesek dît ku mucerred
Neken eşla Resûlullah Muḥemmed

‘Elî ‘Ebbas û Feḏl û hem Quşem bûn
Digel Şeqran Usame hem behem bûn

Be lebsê wî ve şuştin wî temîzî
Be cil wî miz didana wî ‘ezîzî

Ji bihna misk û ‘enber pur jî xweştir
Difewrî jê çû cennet belkî geştir

Lefandin şê lefaîf lê delalî
Melek hatin li dorê çar ḥewalî

Nimêja wî kirin her kes yeka yek
Çiku hê nû negêra bûn îmam yek

We hem jî ew îmamê ‘alemê bû
Reîsê ‘alem û hem ademê bû

Îmamî kes li ser nedşî ku bikra
Riyaset kes li ser nedşî ku bikra

Be şed derdê giran qebra wî kolan
Dil û canê xwe jî vê ra dikolan

Di beyta ‘Aîşe çawan wefa bû
Wisani ew qebr û rewḏa Muştefa bû

Ketin qebra wî ‘Ebbas û ‘Elî hem
Digel wan Feḏl û Ews û hem jî Quşem

Nida kir Faḩîme kay dilbirînan
We çan dil da terabê⁴⁴ ser ve înan

Ji remsê⁴⁵ qemçekî hilda we danî
Li ser çehvê xwe û zevratê ani⁴⁶

⁴⁴ terab(‘e): ax

Çi şe'n e bo kesê ku vê bihin ket
Ji bil wî tiştê dê ku nebihin ket

Bi ser min da rijane ev muşafb⁴⁷
Hucûm kirne li ser min ev 'ecaîb

Bihatana ger be ser roja sipî geş
Wekî şev dê bibûna tarîyû reş

Hemû vê ra digiryan û dinalîn
Be jana dil dilorandin dikalîn

Dixenqîn giş ji ber peyla girînê
Xuda derdek giran e kes nebînê

Xuşûşa weqtê yê wek Faîmaê
Didîtin ku di şîn û welwelaê

Li wan zêde dibû êşa dilê wan
Li wan taze dibû derd û kulê wan

Dilo derdek nehêsayê qelîl e
Dilo wellahî pur xetbek celîl e

Dilo ma tu dizanî çan cefa ye
Dilo ma ev wefata Muştêfa ye

Çiku ew mehbêta⁴⁸ wehîya Xuda bû
Çiku ew mesleka raha Huda bû

Ji mewcûdatê dabû 'illeê⁴⁹ paş
Li ser mehra⁵⁰ şefa'et sîkkeê baş

Reîsê cumle nazik murselînan
Supehsalarê⁵¹ hîzba wan emînan

⁴⁵ rems('e): axa qebrê

⁴⁶ zevr('e): binsing

⁴⁷ muşafb('e): mûsîbetan

⁴⁸ mehbê('e): cîyê nuzûlê

⁴⁹ 'ille('e): sebeb

⁵⁰ mehr(f): roj

165. DI HEQÊ HEJMARA XANIMEN WÎ (S.‘E.W) YÊN TAHIR Û ZEKÎ DE

Ji banûyan⁵² kî ber mehra Nebî bûn

Kî dayikanê ummet dazdehî bûn

Xudeyce serwerê nîswanê cennet

Diya Faḫîmetuz Zehra be şuhret

Keça Xuweylîdê alê Esed bû

Jibo gişkê Qureyşan jê meded bû

Nikaḫ kirbû di berya weḫy û tenzîl

Li nik peyḡemberî negrifte teḏlîl⁵³

Di îman ew e sabiq⁵⁴ ji ummet

Ji teşdîqê negirte reyb û tuhmet

Jixwe feḏla wê meşhûr û ‘eyan e

Ne muḫtacê nivîsan û beyan e

Resûlullahî zewcet qeṭ neanî

Ḥeta ku ew ḥeyatê da dimanî

Wefat kir paşê jî wî **Sewde** anî

Keça Ze’me Qureyşî pê ve anî

Keça Şiddîqê Ekber ‘**Aîşa** baş

Di ‘ilm û feḏl û ‘îrfanê nema paş

Nikaḫ kir ‘umrê wê şeş salekî bû

Dema bir neh tamam bû, pur zekî bû

Eḫadîsê di wê jî du hezar in

Digel du şed we deh şahib şimar in⁵⁵

⁵¹ supehsalar(f): serqûmandar

⁵² banû(f): xanim

⁵³ negrifte teḏlîl(‘e): girîftî rêya kufr û delaletê nebû

⁵⁴ sabiq(‘e): ya/yê pêşî

⁵⁵ 2210 hedîs rîwayet kirine

Keça Farûqê ‘Ummer bû yekê jî
Musemmatê be **Hefşe** ew zekî jî

Yekê dî **Zeyneba bînta Xuzeyme**
Kurê Hêrsê Hîlalî bû Xuzeyme

We yek **Hîndu**⁵⁶ keça Ebî Umeyye
Ji rawatê⁵⁷ hedîşê Qasimîye

Digel **Zeyneb** keça lawê Ruyabî
Diya me muminan ehlê hîcabî

Cuweyrîye keça Hêrsê Xuza‘î
Ji alê Muşteliq ew nîkê sa‘î⁵⁸

Digel **Reyhane** bînta wî Yezîdî⁵⁹
Neđîrî, lê hinan memlûkê wî dî

Digel bînta Ebî Sufyan ku **Remlet**
Di pêşî babê ku dûr bû ji suflet⁶⁰

Şefîyye hem keça Hûyeyê Exteb
Li Teybe hate kuştin namueddeb

We **Meymûne** keça Hêrsê Hîlalî
Ku Berret bû ewel navê delalî

Nebî yumna⁶¹ wê dît û navê lê kir
Be meymûnet⁶² Xuda jî hem welê kir

Xudeycew ‘Aîşe efđeltirîn in
Ji nîswanê di wî tev çêtirîn in

⁵⁶ Kunya wê Ummu Seleme

⁵⁷ rawat(‘e): yê rîwayet dike

⁵⁸ nîkê(f) sa‘î(‘e): postevanê qenc

⁵⁹ Di Tabaqata İbnî Sa‘d de bîntî Zeyd derbas dibe

⁶⁰ suflet(‘e): xerabî, rezilî

⁶¹ yumn(‘e): bext, şens, xêr

⁶² meymûnet(‘e): bixêr, bibext

We yê dî jî hemû durr in di yekta
Di feqlê da neh in bo wan jî hemta

Ji bil Faḫîme û Asîyye, Meryem
We ger çî feqlê yek yek maye mubhem

Ji hemyan jî Xudeyce çêtirîn e
Meger bînta wê çêtir jê bibîne

Xudeycew Zeyneba bînta Xuzeyme
We Reyḫaneh ji dazde dayikê me

Di berya fexrê ‘alem da wefa bûn
Nehê dîtir di puştî Muştefa bûn

Qubûrê wan Beqî‘ê da li cem hev
Li rêzê ne wekî necman⁶³ li ber hev

Meger mil dane hev da ken şefa‘et
Xelaş ken me ji her curm⁶⁴ û şena‘et

166. BEHSA EWLADÊ WÎ (S.‘E.W)

Ji heft ewladê fexra murselînan
Xeber dane rîwayet dûrîbînan⁶⁵

Sisê kur çar keçê ehlê kemal in
Hemî şems û qemer, bedr û hîlal in

Ku Îbrahîm û ‘Ebdellah we Qasim

Zikûr⁶⁶ in ev xudan feql û mekarim⁶⁷

Benat⁶⁸ in **Faḫîme** hem **Emmî Kulşûm**

Ruqîyyew Zeynebê ez şînê⁶⁹ mehrûm

⁶³ necm(‘e): sitêrk

⁶⁴ curm(‘e): guneh

⁶⁵ dûrîbîn: yên xwedî feraset

⁶⁶ zikûr(‘e): kur, law

⁶⁷ mekarim(‘e): ‘esalet, bilindî

⁶⁸ benat(‘e): qîz

Ji ewladê di Kubra⁷⁰ ne tamamî

Ji bil Îbrahîm efîdelê kiramî

Ji Marîye ku carîya Nebî bû

Be wî ez⁷¹ qeydê memlûkê berî bû

Kurê wî hêj ku neghiştin bilûgê

Li darê axretê dane furûgê⁷²

Ji lew dewra nubûwwet muntehî⁷³ bû

Ne behr e êdî ew bona kesî bû

Xuda pê ve nehişt ehlê nubûwwet

Ji ebnaê⁷⁴ kîramî ehlê hürmet

Benatê wî ji bil Zehra nema kes

Di pêşî da hemî çûn cayê eqdes

Welê Zehra li pê wî şeş mehan ma

Ku mesken wê jî cennet cawîdan ma

Sebeb ku ew ji wuldê Muştefa ne

Feđîlet wan ne muhtacê beyan e

⁶⁹ şî: mêr

⁷⁰ Kubra: Hz. Xedîce

⁷¹ ez(f): ji

⁷² furûg(‘e): ji dinyê barkirin

⁷³ munteh(‘e)î: dûr

⁷⁴ ebnae(‘e): zarok, ewlad

167. BEHSA MAM Û METIKÊN WÎ (S.‘E.W)

Ji ‘Ebdulmuṭṭelîb nozde weled bûn

Kurê wî sêzde, qîzî şeş ‘eded bûn

Ku Hers û hem Ebû Ṭalîb, Zubeyr hem

Ebû Leheb û digel Ğeydaq, Muqewwem

Derar û Quşem û hem ‘Ebdî Ke’bet

We Hecl û Hemze, ‘Ebbas ehlê şuḥbet

We ‘Ebdellahê babê fexrê ‘alem

Xezîna seyyîdê ewladê adem

Ji wana Hemze û ‘Ebbasî hatin

Li ser dînê be tefḏîl¹ gihatin

Li ser kufrê yeqîna Boleheb çû

Li ser fitret jî damadê Weheb² çû

We hem yê dî jî ehlê fitretê ne

Ne ehlê kufr û cewr û zehmetê ne

Di Îslama Ebî Ṭalîb xîlaf e

Çiku ḥubba Nebî ra bêxîlaf e

Çi dît û hem çi kêşa hem çi danê

Di ber fexra rusul şahê cîhanê

Bes in jê ra delaîlê behrê teşdîq

Jibo peygember û hem dikra teşfîq

Muqewlatê³ wî yê îmanê zaf in

We terġîbatê wî jî bêguzaf⁴ in

¹ tefḏîl(‘e): bi fezîlet

² damadê Weheb: ‘Ebdûllahê bavê pêxemberê me

³ muqewlat(‘e): gotinên

⁴ bêguzaf(f): nebeyhûde

Ji eşşeh⁵ rawîyan babê peyember
Ji e'cazê becan bû nîkê serwer

We hem jî maderakanê⁶ kiramet
Gera mumin, reha bûn ez nedamet

Benatê wî: Şefîyye xweş Şefîyye
Digel Erwa we 'Atîke behîyye⁷

Digel Ummu Hekîm, Berre, Umeyme
Şefîyye muminet in bê tuheyme⁸

Dibêjin hin ku Erwa, 'Atîke hem
Musulman in welê tehqîqê mubhem

⁵ eşşeh('e): rast

⁶ mader(f): dê

⁷ behîyye('e): peyva xweş

⁸ tuheyme('e): şubhe

168. BEHSA KOLEYÊN WÎ (S.‘E.W) YÊN AZADKIRÎ

Ji ‘ebd û carîyê fexra cîhanî

Sîh û şeş ev qelem her pê dizanî

Cîhan bû koletî jê ra heqîqe

Du kewnan ser li bin pê bit heqîqe

Ewî bit ‘illetê nefsa wucûdê

Sebeb wî bên jibo Adem sucûdê

Ne zaf e kaînatê mewcûdatan

Biken koletîya wî mexlûqatan

Ji mêran bîst û neh mewlê¹ tamam in

Yek in **Zeyde** digel **lawî**² kiram in

Selîm û hem **Uneyse** hem **Rebahî**

Digel **Sewban**, **Yesarî** pur şebaî³

We hem **Rafî**’ digel **Şuqran** we **Eslem**

Digel Îbnî ‘Ubeyde îsmî mubhem

Fedalet, **Bomuweyhîbet**⁴ we **Mud‘em**

We hem **Teħman** we **Me‘yûn** we **Huşam** hem

Digel **Zeydî** ku **bapîrê** hilalî

‘Ubeyd û **Bo‘eseybê**⁵ pur delalî

Ebû Dumeire, **Bowaqid**⁶, **Sefîne**

Digel **Ebû ‘Ubeyd**, **Sender**, **Xuzîne**

Ebû Lubabe we hem **Hinde** nas e

Digel **Enceşetê** meşhûrê nas e

¹ mewla(‘e): kole

² law: Usame b. Zeyd

³ şebaî(‘e): rind, xweşik

⁴ Ebû Muweyhîbe

⁵ Ebû ‘Asîb

⁶ Ebû Waqid

Ricalê bendeê wî vanê ha ne
Cuwarî⁷ jî bibêjim tu bizane

**Ku Meymûne we Reyhane we Selma
Bereke, Marîye, Xedret we Redwa**

Welê Reyhanete zewcet dinasin
Muxalîf der heqîqet purhewas in

169. BEHSA XIZMETKAR Û MUHAFIZÊN WÎ (S.‘E.W)

Xudamê wî **Enes, Esmâ** we **Hîndê
Rebî‘e, ‘Uqbet** û hem nîkê **Se‘dê**

Muhacir hem digel **Erbed** hîlalî
Digel **Eymen** we **Eswed** hem **Bîlalî**

Di pêşî ayeta ‘uşmet⁸ hebû wî
Di reyba suêqêşdê, hîrsekî⁹ wî

Ji bed ef‘al û sûêqêşdê kuffar
Cuhûd û wer yehûd û dujminê har

Digirtin hersê¹⁰ Se‘dê wî Mu‘azî
Di Bedrê da dihefzandan be nazî

Muħemmed lawê Muslîme we Zekwan
Di Xendeq da Zubeyrî hem digel wan

Di Xeyber Se‘dê Bî Weqqaşê ‘alî
Digel ‘Ubbadê Buşrê zîlme‘alî¹¹

Welê Wadîl Qîra da bû Bîlalî
Dikir hersê li ber şemsê hilalî

⁷ cuwarî(‘e): cariyê

⁸ ‘uşmet(‘e): parastin

⁹ hîrs(‘e): mihafîz

¹⁰ hers(‘e): mihafîza, parastin, beqçîtî

¹¹ zîlme‘alî(‘e): xwedî şeref û bilindayî

Dema “wellahî yu’şîmûke”¹² tenzîl

Li ser wî bû gerand wî halî tebdîl

Yeqîn kir ku ji xelqê sûtî naê

Heman hersê siparte yek Xudaê

Negirt hers û diraza hem jî serbest

Ku hîrsa xwe hevalan ez Xuda xwest

We ger çendan ku ‘esker hers digirtin

Ne bo keyda¹³ Nebî, bo wan digirtin

170. BEHSA KATIB Ê EMÎRÊN WÎ (S.‘E.W)

Dibêjin katibê wî çan celî¹⁴ bûn

Ebû Bekr û ‘Umer, ‘Uşman, ‘Elî bûn

Ubeyy û Zeyd û Şabit herdu Xalid

Digel ‘Amir, Mu‘awîye ku macid

Zubeyr û Telhe, ‘Emr û Henzelet hem

Mugeyre, Erqem û hem Lawê Erqem

Cuheym û Se’d û hem Cuheymê Şultê

Hzeyfe bûn û welê her gav û se’tê¹⁵

Mudam hađir jibo tenzîlê Rehman

Şehîdê darê bû ‘Uşmanê ‘Efan

Di nêv ‘amê şehîr¹⁶ e wî reîsî

Gelek Qur’an be destê xwe nivîsî

We merwî¹⁷ ye ku Qur’anan cemi’ kir

Hemû şewtand û xwendin wan meni’ kir

¹² Muheqqed wê Allah te mihafaza bike (Maîde 67)

¹³ keyd(‘e): hîle, kemîn

¹⁴ celî: sirgûn, hîcret

¹⁵ se’tê: saetê

¹⁶ şehîr(‘e): meşhûr

¹⁷ merwî(‘e): hatiye rîwayetkirin

Ji nû nusxe nivîsî wî delalî

Jibona îxtîlaf neyte li yalî

Xuda bo xwe hesêb ket mekseba¹⁸ wî

We hem ‘alî biket pur merteba wî

Dibên yê fexrê ‘alem kir bû amir

He yin Bazan û kurî¹⁹ hem Muhacir

Ebû Sufyan, Mu‘awîyew Zîyadî

We Îbnû Cuz û Şiddîqêl fuadî

Kurê Bûl‘aş²⁰ ku navê wî bû ‘Usman

Digel ‘Ettab û Heyder şahê merdan

Ebû Mûsa we hem lawê Se‘îdî

‘Edîyy û ‘Emrê ‘Aşê pur sedîdî²¹

171. BEHSA KESÊN KU DI HIZÛRA WÎ (S.‘E.W) DE LI SITÛYÊ DUJMIN DIXISTIN Û MUEZZÎN Û ŞA‘IRÊN WÎ (S.‘E.W)

Jibona serfîrîna musteşeqqan

Dikir emrê cuwanmerdê di xelqan

Ji şûrkêşê dema her şubhê Heyder

We Mîqdad û Zubeyr xwarzê peyember

Digel Dehak we Lawê Muslîmet²² jî

We hem ‘Aşim kurê Sabit sebet²³ jî

Ji ehlê kufrê kînê hildidana

Di pozê wan ve tanîn fi’lê wana

Çiqas weqtê nimêjê ku bihata

Heman emrê humayûn²⁴ jî dihata

¹⁸ meksebe(‘e): kar û qazanc

¹⁹ kurî: kurê Bazan

²⁰ kurê Bûl‘aş: ‘Usman b. Ebul ‘As

²¹ sedîdî(‘e): di cî de, bi îsabet

²² Muhammed bîn Muslîme

²³ sebet(‘e): mêrxas

Ezanê da biden xelqê bixûnin²⁵

Bi bal mescîd cema‘et bên û rûnin

Muezzîn dengbulend û dengê xweş bû

Bîlalî fexrê eqwamê Hebeş bû

We yek jî ‘Emrê îbnî Ummî Mektûm

Be dil bîna²⁶ welê ez çavê mehrûm

We yek Se‘dul Qerez bû der qubaî

Ebû Mehziûre der Mekke nîdaî

Welê yê daimî herdu di pêşî

Yekî fexra Hebeş yek yê Qureyşî

Bi xwe şa‘ir nîbû fexra cîhanê

Be şe‘ran kî bihata îmtîhanê

Digota Ke‘b we ‘Ebdelleh û Hissan

Cewabê wî biden hun jî be şe‘ran

Heman şe‘rê terî taze digotin

Ku duşmin êdî kasid²⁷ nedfirotin

Çiku şe‘r û feşahet mu‘teber bû

Be wan nîva ‘ereb da kerrûfer bû

Zuman şûrek qewî bû nav ‘ereb da

Gelek çê bû kesê çêtir edeb da

Dihatan û dikirna îftîxarê

Be wan Hesan²⁸ dihişta şar û ‘arê

Du‘a kirbû Nebî der heqê Hêsan

Ji lew meglûbî nedbû qeç be lîsan

²⁴ humayûn(f): padîşah, Allah

²⁵ bixûnin: dawet bikin

²⁶ bîna: yê dibîne

²⁷ kasid(‘e): malê nayê firotin

²⁸ Hesen b. Sabît

We merwî ye ku heftê beytê Cebrîl
Jibo yardim kirî mînanê tenzîl

Feşîhî cem Nebî jî hem gelek bûn
Xeîbê xweş heîmî wek melek bûn

Nitaqa²⁹ kurtîyê va îxtîsarê³⁰
Me jî nanî yeka yek der şimarê³¹

172. BI KURTAYÎ BEHSA SÎLEH Û KINCÊN WÎ Û EŞYAYÊN MALA WÎ (S.‘E.W)

Jibo herba hemû e’daê dînî
Hebûn neh şûrê çê fexra zemînî

Kevan şeş zêde heft û sê jî mertal
Çihar rumhê dirêjî malê ebîtal³²

We yek jî kurtî bû navê wê ‘Enze
Du qamew kîşikek tîr nebne berze³³

Du kolosê zirhê ku navê³⁴ Mîgfer
We gopalek we palge navê Mîxşer

We hem darek serûbin qamçîyek jî
Digel beyraqekî reşkemek jî

Sipî sencegekî bû maşaallah
Dihedmand fikrê kufrê barekallah

Ji van teqwîyyeyê dînî bû meqşed
Muqabil kafîran û qewmê murted

Ne zînet bû ji lew nav mal nedanî
Ji bil mecbûrîyê fexra cîhanî

²⁹ nitaq(‘e): sînor

³⁰ îxtîsar(‘e): kurte

³¹ şimar: hejmar, hejmartin

³² ebîtal(‘e): qehremanan

³³ berze(‘e): bilind, jor

³⁴ navê: navê wê, jê re digotin

Ji cubbew îşlik û derpîw kirasan
Hebûn hîjde lîbasê xeyrê nasan

Lehêfek bû digel pêçek ‘emamet³⁵
Dibarîna ji va qencîw kiramet

Hebû tasek ji zîvî pîne dayî
Digel kasek ji şûşe teb‘ê dayî

Cihê henna ji wan şûşe şebah bû
Cihê pêvane muddek jî li cem bû

Digel şa‘ek³⁶ jibo îxracê fitrê
Jibo cilşuştinê teştek ji şifrê

Ji me‘den kevirî şekrek³⁷ hebû wî
Ku tê da avê vedxwar hem hebû wî

Be çargoşe firağ û kuhlêdanek³⁸
Digel şanew³⁹ meqîş, ‘eynew suwakek

Kulînek, doşekêk xaliş ji çermî
Tijî kirbû ji qerzîlê⁴⁰ di xurmî

Digel gustîlekî zîv û du xuffan⁴¹
Digel mendîlekî destan û çehvan

Ji bil vana nebûn qeş serweta wî
Jibo dunya nebûn qeş şewketa wî

Muhîm cem wî nebûn dunya û serwet
Li xwe pur nedkira nav mal û kiswet⁴²

³⁵ ‘emamet(‘e): şaşik

³⁶ şa‘e(‘e): mîqdar

³⁷ şekrek: dibe ku bi mana tasek an jî grover be

³⁸ kuhlêdanek: kildankek

³⁹ şane: şeh

⁴⁰ qerzîl: pel

⁴¹ xuff(‘e): mest

⁴² kiswet(‘e): kinc, unîforma

Ji bil wanê derûrî nedvîya⁴³ wî
Nebû behrê dinê gemxwarîya wî

Kesan dunya di vana bû 'ezîzî
Eşasê⁴⁴ pur di vana bû temîzî

Welêkin wî 'ezîzî bo cebellî⁴⁵
Delalî û temîzî bo cebellî

Jixwe ew serwerê herdu dinan bû
Resûlullah û fexra murselan bû

Li bin pî bû serê Kîsra û Qeyser
Ewî me'lûlê bû dunya seraser

Jibo zînet bes e bo wî nubûwwet
Jibo şerwet bes e bo wî futûwwet⁴⁶

Rîsalet, tacê şahê ser serê wî
Delalet, dewletê pêşaderê⁴⁷ wî

Çi hacet wî be mal û yan menalan⁴⁸
Ji cahê wî ne her sulţanê nalan⁴⁹

Eger dunya bixwesta rebb dida wî
Temam, belkî dinê yek rib dida wî

Şehînşah e li erd û asîmanan
Xwe sulţan e li ser şatîr cuwanan

Ferîşte xadimê wî ne bes in wî
Melaîk pêkê wî ne hem bes in wî

⁴³ nedvîya: nedixwest

⁴⁴ eşas('e): eşyayê malê

⁴⁵ cebellî('e): fitrî

⁴⁶ futûwwet('e): ciwanmerdî

⁴⁷ pêşader: pêşîvan

⁴⁸ menal('e): bidestxistin

⁴⁹ nalan('e): yên naîl, gihane meqsedê

Jibona xidmeta wî belkî ‘alem
Muheyya ye, ne ten ewladê adem

Sebeb ku rehetel lîl ‘alemîn e
Zebûnî⁵⁰ puştî wî nasan nedîne

Be wî fexra hemû kes zêdetir bû
Ji wî da parê her kes zêdetir bû

Bila fexrê be wî ken erd û eflak
Bila wurdê xwe ken Lewlake Lewlak⁵¹

Eger ku ew nebî, ‘alem çira ye
Di tarî ‘alem ew jê ra çira ye

Be rûwê wî bûye ruhnî li ferşan
Be lingê wî şeref pur bû li ‘erşan

Xelîlullah dikir pê îftîxarê
Kelîmûllah dikir pê îftîqarê⁵²

Şemîmek⁵³ hukmê wî daye Suleyman
Nesîmek hikmetê wî daye Luqman

Ji yek fedlê wî ye ‘Îsayê Meryem
Dikir heyayê mewtê ku demadem

Li Mûsa narê kifşe nûrê wî bû
Ne tenha şewketa der Tûrê wî bû

Li Îbrahîm vemirya narê Nemrûd
Ji feyda wî bû hem ew behrê mewrûd⁵⁴

Vebû pê dergehê tewbe li Adem
Be wî kir dîlek⁵⁵ û zarî di ew dem

⁵⁰ zebûnî(f): perîşanî, ketî

⁵¹ lewlake lewlak(‘e): ne ji te ba, ne ji te ba

⁵² îftîqar(‘e): bi wî ji Xwedê dixwest

⁵³ şemîm(‘e): bilind

⁵⁴ behrê mewrûd(‘e): qismek bexçê gula

Temamê kutûb û şuhfê semawî
Şuhûd in ser ‘ulûwwa⁵⁶ merteba wî

Ji Beytîl Meqdesê pursin dizanit
Ji ‘erşîllahê pursin pur dizanit

Qedemgaha mubarek ‘erş û kursî
Ji feđl û mekremeh⁵⁷ êdî çî pursî

Ewî merkeb bi rava⁵⁸ nazenîn bû
Rekîbdarê⁵⁹ wî Cebrîlê emîn bû

Mudam rabestîyê emrê humayûn⁶⁰
Ferîşte fewce fewc û dest kemer bûn

Îmam e hem li pêşî murselînan
Îmam e hem dikêşî dûrêbînan

Ew e sabiq di meydana şefa‘et
Ew e saiq⁶¹ di keywana⁶² se‘adet

Ew e Mahî⁶³ jibo ‘erqê⁶⁴ ðelalê
Ew e Haşîr jibo ehlê kemalê

Ew e Fatîh jibo babê⁶⁵ hîdayet
Ew e Muncî⁶⁶ ji her keydê nîkayet⁶⁷

Penah⁶⁸ e ew jibo me bêpenahan
Şefî ‘e hem jibo şahîb gunahan

⁵⁵ dîlek(t): daxwaz

⁵⁶ ‘ulûw(‘e): bilind

⁵⁷ mekremeh(‘e): ‘esalet, hêjayê teqdîrê

⁵⁸ rava: meş

⁵⁹ rekîbdar: rêheval

⁶⁰ humayûn(f): padişah, Allah

⁶¹ saiq(‘e): ajovan

⁶² keywan(f): sitêrka saturnê, zuhal

⁶³ Mahî(‘e): navekî pêxember bi me’na yê mehv dike

⁶⁴ ‘erq(‘e): damar

⁶⁵ bab(‘e): derî

⁶⁶ muncî(‘e): yê di emnîyetê de

⁶⁷ keydê nîkayet(‘e): hîla zirar dide

Delîlê enbîya û murselan e
Kefîlê bêkefil û me'đelan e⁶⁹

Kemal e ew li erđ û asîmanan
Cemal e ew li rûwê her temaman

Cemala Yûsifi her wî tamam e
Şemala Mûsewî her wî dewam e

We ger çendî ku Dawûdê tûyûran
Dihîştâ paş be şewtê ez'ubûran

Welê serxweş dikir wî cem'ê emlak
Muzamîran⁷⁰ dişande ewcê eflak⁷¹

Ew e serwer li ser her kaînatan
Ew e mufxer⁷² di ber her mumkînat

Du kewnan ram û teşw'ê emrê wî ne
Şuûnan tev ji emr û fer'ê wî ne

Jibo qedrê wî ye cennet muzeyyen
Jibo emrê wî ye dozex musexxen⁷³

Be wî Adem bûye mescûdê 'alem
Be wî 'alem bûye menzûrê⁷⁴ adem

Be wî Mekke hilanî rutbeya xwe
Be wî hilda Medîne 'ulweya xwe

Be wî Ke'be gera qible li qencan
Be wî eswed⁷⁵ gera meqbûlê qencan

⁶⁸ penah: ciyê sitariyê

⁶⁹ me'đelan('e): kesên bêçare

⁷⁰ muzamîr('e): mezmûr

⁷¹ ewcê eflak('e): zirweya felekan

⁷² mufxer('e): pê tê îftixarkirin

⁷³ musexxen('e): disincirîne

⁷⁴ menzûr('e): tê dîtîn, menzere

⁷⁵ eswed('e): zencî

Li ser wî ayetê neşrê bû munzel
Beyan bû lê hemû eḩkamê mucmel

Meqamê ewlîyan tev da be wî ne
Kemala etqîyan⁷⁶ tev da ji wî ne

Ji rêça wî muxalîf bêkemal in
Be fi'la wî mewaşif⁷⁷ bêzewal in

Ĝered raha wî yê rast e mezahîb
Ji ḩubba bê kem û kast⁷⁸ e mewahîb⁷⁹

Kemala dil, meger ḩubba wî ye bes
Zewala dîn û dil, buğda wî ye bes

Be nûra wî dibînit ruhnîya çav
Ji feyda wî ku dikşit kehnîya av

Dilê purnûrî qendîle ji wî da
Zubanê Nûrî qerzîye⁸⁰ ji wî da

Şuhûda wî bû, da qelbê şehîdan
Su'ûda wî bû, da qelbê se'îdan

Wîlayet daye mîranê şerî'et
Wekalet daye pîranê terîqet

Be wî rah û mezahîb her tamam in
Be wî cem 'û mewakîb der eman in

Ji bihna wî ku ehlê sukrê medhûş
Ji 'eksa wî ku ehlê xemrê serxûş

Felek qewsê gemayek dîtina wî
Semek ḩeyran e yek axiftina wî

⁷⁶ etqî('e): yê ji Xweda ditirse, mutteqî

⁷⁷ mewaş if ('e): wesfan

⁷⁸ kem û kast: noqsan

⁷⁹ mewahîb('e): hedîye

⁸⁰ qerzî: qerimî, westîyayî

Ji xemra wî ku ‘uşaqaan wewelhan⁸¹

Ji şebra wî ku muştqaan weferhan⁸²

Li weşla wî digêrin ba û bahûr

Li şugla wî kewakib⁸³ bûne nazûr⁸⁴

Li wî şems û qemer hey dergevan in

Li wî çerx û felek hey cowîvan⁸⁵ in

Meger seyareê seb‘e⁸⁶ jibo wî

Ketin sêr û sefer bo dîtina wî

Ji lew reh şaş kirin ketne burûcan

Didin xwe geh nuzûl û geh ‘urûcan

Ji yek cezbe cemala wî zelazil⁸⁷

Ji yek nuqte xiyala wî newazil⁸⁸

Bulendî hem li tîbqa fi’lê wî ne

Siyadet⁸⁹ hem rîyaset⁹⁰ jî ji wî ne

Kesê pê ve neçit korahî da ye

Ji bil ronaheya wî tarî maye

Ewî hilkiyye lambe pêşî her kes

Fener kêşaye pêşî rahî her ‘es⁹¹

Şerî‘et kir tamam û paşê rabû

Neşîhet kir li ‘am û paşê rabû

⁸¹ wewelhan(‘e): muteheyyîrî

⁸² weferhan(‘e): kêfxweş

⁸³ kewakib(‘e): sitêrk

⁸⁴ nazûr(‘e): dûrbîn

⁸⁵ cowîvan(f): yê zêde hez dike

⁸⁶ seyareê seb‘e(‘e): heft seyare, heft gerstêrk

⁸⁷ zelazil(‘e): piraniya zelzele, erdhej

⁸⁸ newazil(‘e): piraniya afet

⁸⁹ siyadet(‘e): îdarevanî, hakimî

⁹⁰ riyaset(‘e): reîstî

⁹¹ ‘es(‘e): kes

Reha qenc û xerabî wan nîşan kir
Terîqa musteqîm hem zerfêşan⁹² kir

Beyan kir her çerûratê di dînî
Nîşan da her evînî û nevînî

Cilê Kîsra jê da kurkî zewalê
Li Selman da serê taca kemalê

Milê Qeyşer girê da kir di şe'lûk⁹³
Şehê koman gerand mînanê memlûk

Bîlalan wî şiyand banê bulendî
Eba Cehlan kişand suflî be tundî⁹⁴

Şikînanand şewketa pûtan û latan
Nihînanand⁹⁵ qedrê her Lat û Menatan

Beçal kir hukmê teşrîkan û teslîs⁹⁶
Be cih kir hem me ra tewhîd û teqdîs

Ebû Bekr û 'Umer, 'Uşman û Heyder
Be wî geryan reîs û mêr û serwer

Be wî memlûk dibûn mîrê bulûkan⁹⁷
Be wî şu'lûk dibûn pîrê mulûkan

Hezar cûyanê⁹⁸ wî mîna tebi' bûn
Dilovanê wî metbû' û tebi' bûn

Selamkarê wî bûn ba can û bêcan
Telebkarê di dîdarê wî her can

⁹² zerfîşan: feşandin, belavkirin û xemilandin

⁹³ şe'lûk('e): parsek

⁹⁴ tundî: şiddet

⁹⁵ nihînanand: tune kir

⁹⁶ teslîs: ('e) bawerîya fillehan

⁹⁷ bulûk(t): kom, bi tirkî bölük

⁹⁸ cû(f): yê dixwaze, lê digere

Ji fedla wî Xuda sed navê dayê
Di her yek da tecella sirrê dayê

Wiha vê ra be îhsanê kerem kir
Ji tekrîmê⁹⁹ jî erda wî herem kir

Çiku meqşed ji kewnê zâtê wî bû
We Adem bestê¹⁰⁰ temhîdatê¹⁰¹ wî bû

Be wî şondê dixun weşşê di berran¹⁰²
Be wî rizqê dixwazin hûtê¹⁰³ behran

Du‘a bê wî ne mercî û qebûl e
Be weşfa xwe tamamî lew resûl e

Îlahî Nûrîyê¹⁰⁴ kelbê derê wî
Di heşrê da beşînî pêşberê wî

‘Efû key¹⁰⁵ wî ji her curm û cenayet
Begefîrînî jibo wî her nikayet¹⁰⁶

Be heqqê hürmeta şahê mubarek
Be heqqê al û eşhaban be carek

Be heqqê cahê alê Muştefa kî
Be heqqê hürmeta ehlê ‘eba kî

Be heqqê “kullî zî şe’nî” li cem xwe
Be heqqê “kullî zî emnî” li cem xwe

Be heqqê enbîya û murselînan
Be heqqê ewlê ‘ezmê dûrêbînan

⁹⁹ tekrîm(‘e): şeref

¹⁰⁰ best: îlham

¹⁰¹ temhîdat(‘e): piraniya amadehî

¹⁰² berr(‘e): bejayî

¹⁰³ hût(‘e): masî

¹⁰⁴ Li ser peyva “Nûrî”, “Fadil”ê navê Mustensîxê kitêbê hatiye nivîsandin.

¹⁰⁵ key: bikî

¹⁰⁶ nikayet(‘e): yê zirar dide

Be heqqê ehlê enfasê di qudsî

Be heqqê munteha û ‘erş û kursî

Be heqqê cennet û riđwanê wî hem

Be heqqê dozex û emlakê wî hem

Be heqqê beyt û zemzem wan meqaman

Be heqqê meş‘er û đif¹⁰⁷ û temaman

Be heqqê Eswed û Merwew Şefaê

Be heqqê garê Sewr û hem Heraê¹⁰⁸

Be heqqê turbetê ehlê Beqî‘ê

Be heqqê Uđûd û ehlê refî‘ê

Be heqqê quţb û ğewşê serzemînê

Be heqqê ehlê ‘urfan û yeqînê

Bibexşîne gunahê me temamî

Me nespêrî bi rê nefşê lîamî¹⁰⁹

Temamê da û bab û eqrebaan

Temamê dost û yar û eşdîqaan¹¹⁰

Cemî‘ê ummeta ehlê şhadet

Cemî‘ê tabi‘ê ehlê se‘adet

Be riđwana xwe kî dilşad û memnûn

Nekî dilxeste û bîzar û mehzûn

Ji behra te qe kêm nabe dilopek

Ji berra te jî hem kêm nabe çopek

Ji luţfa te me jî hêvî wisan e

Wesaîl¹¹¹ me ji wê zêde nemane

¹⁰⁷ đif(‘e): mêvan, zîyaretkar

¹⁰⁸ garê Sewr û hem Heraê(‘e): şikeftên Sewr û Hîrayê

¹⁰⁹ lîam(‘e): rezîl û zelîl

¹¹⁰ eşdîqa(‘e): dost, heval

Tu bêhêvî nekî Nûrî ji daxwaz
Li cem eqranê gêrî¹¹² wî serefraz

Bibên amîn behev ra ey birader
Qebûl ket belkî ew Ellahê Ekber



¹¹¹ wesaîl(‘e): piranîya wesîle

¹¹² gêrî: bigerîne

173. PAŞGOTINA KITÊBÊ

Şukur ku em musulman in, be îman
Ji teb‘ê xeyrê xelqêw ehlê îqan

Ji ehlê şer‘ê, Qur’anê we Îslam
Xwedî Qur’an in û ba ‘îzz û îkram

Ji ehlê qibleya Beytîl Heram in
Ji ehlê sunnet û cem‘ê tamam in

Ji tewhîda îlahî yên xeberdar
Be teşdîqa Resûlullah şerefwar

Ji her ummet jî lewra efşel in em
Di nêv her cemi’ da jî ekmel in em

Em in şahdê li ser her ummetan jî
Em in macid di nêv her milletan jî

Ji efraţ û ji tefrîtê jî dûr in
Ji heddê weşfê xwe em bêquşûr in

We ger çendî be zâtê xwe gunehkar
Şefa‘et lê me umîd e ji exyar

Li ser destê Nebîyyê me şefa‘et
Dibit meftûhê her roja qiyamet

Hemû muhtacê fexrîl murselîn in
Ku em wî ummet in hem pê emîn in

Ji me ‘alem¹ di hîza enbîyan e
Ji me ‘amil di rêza ewlîyan e

Be dînê me nesîx bûne hemû dîn
Nebîyyê me bûye xatem bilameyn²

¹ ‘alem(‘e): ‘alim

² bilameyn(‘e): nederew

Me Qur'an³, nasixê her defteran e
Ewî eħkamê 'amê her deran e

Me Ke'be qible bû nasix li Eqşa
Berî lê ne li her edna û eqşa⁴

Jibo feđla Nebîyyê macida me
Mekanan cumle bûne mescîda me

Gunahek me be yek têtê nivîsîn
We yek qencî be deh têtê nivîsîn

Yeqîn e ku ji qencê me şefa'et
Diken bona ewanê xwey şena'et

Ĝirasê⁵ cennetê rebb bo me daye
Ji zembê pur mezin hem tewbe daye

Ji ser me rabûye mesx û zebûnî
Li ser me pur bûye feđl û hebûnî

Ji me 'ilm û ji me feđl û keramet
Ji me ħilm û weqar û hem şehamet⁶

³ me Qur'an: Qur'ana me

⁴ edna û eqşa('e): nêz û dûrtir

⁵ ĝiras('e): fidan, dar

⁶ şehamet('e): hurmetî û merdîtî û zekawet

174. DERBARÊ NESÎHETA LI XELKÊ DE

Divêtin kî sîyadet¹ ba sîyaset
Li ser herdu dinan daket rîyaset²

Bila her tabîê' vî dînê ha be
Bila hem tew'ê³ şer'ê Muştefa be

Be Qur'anê bila îmanê bînê
Ji bin kufr û delalê xwe derînê

Bi rengê şer'ê rengîn wuşifa bit
Li ʔibqa mezhebek ehlê wefa bit

Reha rast û bîla îza⁴ dixwazî
Li rêya murşîdek kamil bibazî

Xwe teslîmî hemû adabê wî ke
Xwe te'limî hemû esbabê wî ke

Be îxlaş we be teslîma tamamî
Wekî axê be bin pê wî kîramî

Xwe neyxe pencê wan xamê nepehtî
Li nav dest û pîyan meynî⁵ çû bextî

Xwe bispêre be dil ehlê kemalê
Di her şolê⁶ nebînî da zewalê

Di her şolê dixweke îstîşare
Di pur şolê dixweke îstîxare⁷

Derer nabînî ger tu ku wusakî
Tu xeyr nabînî ger tu ne wusakî

¹ sîyadet('e): îdarevanî, seyyîdî

² rîyaset('e): reîstî, serokatî

³ tew'('e): îtaeta ji dil

⁴ bîla îza('e): bêyî ezîyetê

⁵ meynî: nehêlî

⁶ şol: tevger, hereket

⁷ îstîxare('e): xwestina ya xêrê

Ji hev nase⁸ hemû qenc û xiraban

Ji hev tefrîqeke her lawê baban

Biran purke di emrê axreta xwe

Di her şolê dibînî şewketa xwe

Ji ehlê îstîqamet bin birader

Gelek çêtir ji wanê bab û mader⁹

We ger ne, rûnê mala xwe nederkev

Hevalê bed¹⁰ li cem te nebne berhev

Beçalî tiştêkî pîs e nekêşe

Dilê te dê ji te'ba wê biêşe

Ji kesba zend û bend û bazûwê xwe

Mudamî her bixwe nan û dewê xwe

Nebe muhtacê dûnan¹¹ û nemerdan

Nerêje abê rû¹² pêşî çû merdan

Bila xûna te birjê abê rû ne

Çikû xûn tê kirîn lê abê rû ne

Nebit cem te jibo dunya sîyaset

Be wê eşla nekiryê kes rîyaset

Ji her tiştî jî rastî çêtirîne

Derew eşla li ser ezman neîne

Nebe xaîn ji dost û dujminan ra

Heyaker be ji her mêr û jinan ra

Ji te meztir be, bîne hürmeta wî

Biçûktir be, neke qeç zehmeta wî

⁸ nase: binase, nas bike

⁹ bab û mader: bav û dê

¹⁰ hevalê bed: hevalê xerab

¹¹ dûn(‘e): zelîl, ‘adî

¹² abê rû: şeref û rûmet

Bihîn tengî meke tu her cihê da
Nebe bîhna fireh jî her gehê¹³ da

Ji her yek ra meqamê wî benase
Meqamê her yekî başqe¹⁴ dinase

Xeberdanê xwe bêperwa mebêje
We hem sirrê xwe her cih da merêje

Meîne emyeta xwe serzemînê
Zeman bê emnîyet lew te dibînê

Zemanê te di bin emrê te da bit
Bizane ku kesek tevlî te nabit

Welê sirrê xwe ger te eşkera kir
Qiyamet ser xwe da zane te rakir

Li cem te meħremek ger yek bibêje
Ewî sirrê jibo kes ra mebêje

We ger ne, dê bibêjin tu fesad î
Tu bê qufl î we hem bê î' tîmad î

Meken¹⁵, gava xeberdî ey dîlawer
Kena te hikmetê te b-ket muğeyyer¹⁶

Mekev pê geyrî meqşed pirsîyarî
Dibînî jê gelek şarî û 'arî

Ji dîwana te navên¹⁷, pur xwe dûr ke
Welê şêwrê bivên, tu fikrê hûr ke

Di meclîs rûne cayê ranebî tu
Eger ehl î, be jortir dê biçî tu

¹³ geh: car û zeman

¹⁴ başqe(t): dîtir

¹⁵ meken: nekene

¹⁶ muğeyyer('e): guherîn

¹⁷ navên: naxwazin

Kesê ku te bivê, hem tu bivê¹⁸ wî

Kesê ku te nevê, hem tu nevê wî

Kesê bê cem te vê ra dilkuşa¹⁹ be

Li rûwê wî xweş û heşşaş û şa be

Welê her kes li wefqa²⁰ merteba wî

Qedir girtin li tîbqa merheba wî

Ji ehlê fehşîyan pur xwe biperhêz

Li dorê te bila ewqas nebin rêz

Çikû însan be şehban²¹ tete nasîn

Be teb' û fê'lê wana tete nasîn

Be ehlê 'ilmê ra heyhey ke şuhbet

Be zatê 'alîyê wana de²² ulfet

Bila pîrsa te jî daîm ji wan bit

Bila însa²³ te jî daîm be wan bit

Bike teftêşê hal û sîretê wan

Bikev bin qîl û qal û şîretê wan

Ji wan hîra be dînê xwe bes in te

Welê yê dî hemû jî 'ebes in te

Di îmkanê xwe hîrake funûnan

Ku dizgûn²⁴ ke be wana hem şuûnan

Çiqas ezman û şin'et jî dikarî

Welê pê menfe'et ke îxtîyarî

¹⁸ bivê: bixwaze

¹⁹ dilkuşa(f): yê dil rihet dike, ferah dike

²⁰ wefqa('e): lîyaq

²¹ şehban('e): dost û sahib

²² de: bide

²³ însa('e): texîrkin, an jibîrkin

²⁴ dizgûn(t): serrastkirin

Jibo bin nef^e dîn û milletê te
Nebîn ‘illet²⁵ li kesr²⁶ û ‘illetê te

Ji hemyan jî gered²⁷ raha Xuda bit
We hem jî ‘ewnê²⁸ şer‘a Muştefa bit

Çiku dîn, bê dinê nayê kemalê
Dinê bêdînî jî diçte zewalê

Ji hev ra herdu astar û beşan in
Ji hev ra herdu pişt û hem eman in

Ji menşeb²⁹ dûr here hetta dikarî
Nebe bînit serê te hîlekarî

Serê raşet dixwazî musteqîl be
Ne binemr û ne ba kes mutteşîl be

Te cîran ku nebin qeş çêtirîne
Hebin ger heqqê wan çêtir bibîne

Gelek îzaê wana jî bikêşe
Wisanke ku ewana dil neêşe

Te‘amek çêkî wana behrewer ke³⁰
Ji wan xaşir bixwaz paşê sefer ke

Dema hatî bide wan merhebatî
Be wan ra ke³¹ bedilxweşî cevâtî

Neşîhet ke li wan çawan dizanî
Ewan rastî reha heq ke tu zanî

²⁵ ‘illet(‘e): sebeb

²⁶ kesr(‘e): şikîn

²⁷ gered(‘e): meqsed, armanç

²⁸ ‘ewn(‘e): alîkar, nesret

²⁹ menşeb(‘e): xizmeta dewletê

³⁰ behrewer ke: bi par bike

³¹ ke: bike

Tu qencîke bi wan ra, wer xerabî
Biken, lewra şeref ra tişte nabî

Li ku çû kufletê xwe şîretan ke
Li wan ez şerweta xwe mîretan ke³²

Biçûkanî edeb de³³ hem tîfalan
Heta bighêjene cildê rîcalan

Bi zarotî bike hîra bulendî
Bila hîra nebin eşla nerindî

Ji ewwel dînê, te'lîmî di wan ke
Têhûr û tahirî te'lîmî wan ke

Nehêle ku biden dujmin û feşî
Nehêle ku bibin nadan û weşî

Nebêje hêj biçûk in fehmê nakin
Mezin jî ku bibin dîsa wisa kin

Weled çendî şêrîn û nazenîn e
Edeb dîsa ji wê çêtir bibîne

Benase qedrê 'alî da û baban
Li wefqa wan nivîsayê kîtaban

Ji emrê wan nederkev xusrê nakey
Ji nuşhê wan li xwe çêke bênakey

Ji bil qencîyê nîşanî te nadin
Be rencîyê³⁴ çû pêşanî te nadin

Bulendtir wan ji her kes xwe bibîne
Di rêza³⁵ jin û eţfalan mebîne

³² mîretan ke: mal bide wan

³³ de: bide

³⁴ rencî('e): ezîyet

³⁵ rêz: paye, sewîye

Xweda der heqê wan şandîye tenzîl
Ewan îza qe hîlnade tu te'wîl³⁶

Şev û rojê ewan hilde milê xwe
Ewan av dey be cobarê³⁷ dilê xwe

Kefa destan bikey tawe³⁸ jibo wan
Dil û cergê xwe pêjî tê da bo wan

Ji bin mi'şarê³⁹ heqqê wan tu nabî
Be der esla jî pêghayî tu nabî

Rîdaek wan tu haşilkî bes in te
Du'æk wan hemî dîlkî bes in te

Wekî wan e hem ustad û emekdar
We murşîd zêdetir ey merdê hişyar

Hevalê gurbet û hem sîretê xwe
Bike dîlxweş ji we'z û şîretê xwe

Bike xîdmet ji wan ra çan dikarî
Bixwaze uzrê xwe ger yên nikarî

Li wan nîşan meke 'eyb û fehêtan⁴⁰
Xişûsatê xwe da wer çend fihêtan

Bidin nîşanî te qencî wehaye
Ji va şermî, Xweda eşla nedaye

Dikey⁴¹ dostînî rast û ba şefa be
Be wan dostê kevin ra ba wefa be

Hisaba qencîyan ba wan nebîne
Ji wan qencî jî hem neêvîşîne⁴²

³⁶ te'wîl('e): şîrove, şerh

³⁷ cobar: çem

³⁸ tawe: miqîlk

³⁹ mi'şar('e): ji dehan yek

⁴⁰ fihêt: şermî, fedî

⁴¹ dikey: ger bikî

Be yek ra bûyî dujmin heq neberde
Li ser dinyayê dînê xwe nederde

Çiqasî jê giran bit dujminayî
Neke bêpaşîyû hem tengînayî

Jibo şulhê şivêlek⁴³ rê bihêle
Derê şeytanê jî vekrî nehêle

Welê ewqas neberde pêşîya wan
Nekêşî da tu pur dilêşîya wan

Ji te'zîyew 'îyadan paş nemîne
Ji şahîyanê 'îdan paş nemîne

Cewanmerd û sivik nefse giran be
Şecî'ê dîlek û her mehderan be⁴⁴

Jibo Îslamê xwey hîlm û 'efûker
Li pêş kuffarê şûrkêş û gedenfer

Jibo dînê, ba geyyûr⁴⁵ û cesaret
Jibo dunya, sexîyû⁴⁶ ba tîcaret

Musafirperwer û merd û be dil be
Di her şe'nê xwe da hem mu'tedil be

Ji mîhmanê xwe berjêr rûne daîm
Di emrê wî mudam rabeste daîm

Li rûwê wî mudamî devliken be
Di xidmet wî sivik can û beden be

Resûlullah çikû tenba⁴⁷ wî daye
We hürmetkarê merdîyyê Xweda ye

⁴² êvişîn: evişîn, hêvişandin, teksîrkin

⁴³ şivêl(f): tişteki pir hindik

⁴⁴ mêrê daxwaz û her rîcayan be

⁴⁵ geyyûr('e): bi xîret, xwedî namûs

⁴⁶ sexî('e): comerd

Ûeme'karî nekey eşla be carek
Nebe ferhan⁴⁸ be cahê⁴⁹ ey mubarek

Be zengînî neke qeş îftîxarê
Çikû Qarûn ji wê bû kefte xwarê

Bigre destê feqîran û gerîban
Bibe dilbestê mehzûn û keîban⁵⁰

Jibo feqrê nebe qeş dilşikestî
Di feqrê da ji merdî negre sistî

De her nekrî⁵¹ be jî hem çêtirîn e
Bila kes sîrrê xaşê te nebîne

Mebêje 'eybê mala xwe ji kes ra
Neke hem medhê mala xwe ji 'es⁵² ra

Meke forte di nav cem'ê hevalan
Nepesne hem be pîrbûna rewalan

Ji mal û serweta xwe kêr xeberde
Jibo qencîw şeref, malê bederde

Bike malê, çira raşetîya xwe
Neke barê dil û hem rehtîya xwe

Bike wasîteya muhtacîyê xwe
Be wê çêke di dû cîh da cîyê xwe

Rezîlke mal û canê xwe 'ezîzke
Bide hem mal û balê⁵³ xwe temîzke

⁴⁷ tenbe('e): tenbîh

⁴⁸ ferhan('e): kesê kêfxweş

⁴⁹ cah('e): meqam

⁵⁰ keîb('e): mehzûn

⁵¹ nekrî('e): neqencî

⁵² 'es: kes

⁵³ bal: cem, hizûr

Bide dostan jibo cebra⁵⁴ dilê wan
Bide hem duşminan bigre milê wan

Ji xwe çêtir hesêb ke her evînê
Ji xwe kêmtir nezane her nevînê

Mebêje ku heqîr û natûwan e⁵⁵
Meger yê geyrî Qadir pir yeman e

Ji dostê te hemû dostînî xef bit
Dibit rojek ji te ew berteref bit

Li wî dostînîyê heyfa te bêtin
Li ketmanî di wê keyfa te bêtin

Be yek ragirte wergirte nevînê
Temamê tehlîyan jê ra neînê

Dibit rojek bibit dostê dilê te
Tu şermî bî ji fê'1 û şugulê te

Be qismê jin meke emnîyeta xwe
Be 'ehda wan tu neşkîn şewketa xwe

Beşêwre hem bi wan lê ke xilafê
Ji re'ya wan bike fikr û keşafê

We ger re'yê te bo wefqê wê baş e
We ger ne, xeyrê jê dûrew li haş e

Di bazarê meke sond û dirûgan⁵⁶
Mekir, mefroş be her firyew firûgan

Çi ye 'eyba meta'ê te bibêje
Fîet bêje li wefqa ku dihêje

⁵⁴ cebr: cebirandin, başkirin

⁵⁵ natûwan(f): bêqûwwet, bêçare

⁵⁶ dirûgan(f): derewan

Di bazarê hevalê xwe mexapîn
Neke hetta bi giryê wan meğabîn⁵⁷

Be camêrî bide deynê li ser te
Heta memnûn bibin merdan li ber te

Dema deynek bixwazî xweş bixwaze
Dilê deyndarê miskîn da negaze

Meke tevlîtiya her heq nexoşî
Bike teftîş ji ewwel ger bi hoşî⁵⁸

Sirîrid⁵⁹ pur meke der xwestina xwe
Meke îro şibe der destina xwe

Bikey kesbek ji yek ra sağlemîke
Ecîrke yek be wî ra dilxweşîke

Jinan tenê ji eşrafan tu bîne
Ji ewwel her xîşalê wê bibîne

Bike te'bîr be ef'alê dîya wê
Çikû şuglê keça ne hêvîya wê

Wisa ne her kes nas e ji celîsan
Bike mîzan jibo her kes enîsan⁶⁰

Bide qîzan esilzadê bi namûs
Nede pîsê di bê eslê di salûs⁶¹

Jibona her terefê jî ke rî'ayet
Ciwanmerdî û teqwa û dîyanet

We hem jî 'eqî û tehbîr û emînî
We hem jî heqşenasîyû⁶² evînî

⁵⁷ meğabîn('e): yê danûstendinê de hatiye xapandin

⁵⁸ hoş(f): hiş, 'eqîl

⁵⁹ sirîrid('e): israra zêde, zorlêkirin

⁶⁰ enîs('e): dost

⁶¹ salûs('e): menfîetperest

Bi husnê jî eger ku ew be meşhûr
Feza feđlun keza nûrî ‘ela nûr⁶³

Bibe ʔalib li jin bona cemalê
We yan teqwaw dîyanet yan jî malê

Welê ʔal û cemal bê dînî nabin
Webal û hem nîkal⁶⁴ û hem ezab in

Be ehlê dîn dibî ehlê sea’det
Be yê dî ra dibî ehlê şeqawet⁶⁵

Jina salih ji her sermaye çêtir
Ji destê xwe neke hey lê biêwir⁶⁶

Wisani jî emrê fexrul murselîn e⁶⁷
Li ser wê tenbeh û qewlê bemîne

Meke zûlmê li ʔeywan barberê xwe
Giranî bar meke ga û kerê xwe

Di bin emr û zelif û bêzeman in⁶⁸
Esîrê qeyd û bin barê te da nin

Qiyas ke çan ku ew destê te da ye
Wisani ʔakim li ser te her Xweda ye

Meke teqşîrîya⁶⁹ av û ‘elef wan
Mede te’sîrîya⁷⁰ derdest û kef wan

Bila reh bî, bila dûr bî here lê
Bila bûr⁷¹ bî, bila kûr bî, were lê

⁶² ʔeqşenasî(f): nasîn û qebûlkirina ʔeq

⁶³ Ev fezilet e weka nûra li ser nûrê

⁶⁴ nîkal(‘e): ezabê şedîd

⁶⁵ şeqawet(‘e): gazin, şîkayet

⁶⁶ biêwir: bici be, bihewe

⁶⁷ ʔaşiye: Wisani jî emrê fexrul ‘alemîn e

⁶⁸ zeman: ziman

⁶⁹ teqşîrî(‘e): kêmkirin

⁷⁰ te’sîrî(‘e): qedexekirin, meni’kirin

Nekev deşt û qîfaran nêzîkayî
Ne şert e belkî şertê êmenayî⁷²

Li raha dûr meçe hem bê hevalek
We hem ‘îşê xwe nespêre tîfalek

Nebêje dujminê min kes tunîne
Te mal û can be xwe dujmin dişîne

Ûesûdî qeş neke tîstek nebaş e
Çikû ehlê Ûesûdê her li paş e

Xulaşe geyrî meşrû‘an biterkîn
Ji emrê ‘adetê jî ba xwe cih bîn

Ûeta ku navê te însan bimînî
Hevalê te te mumtazek bibînî

Nebe mîna reşê hafa rezê xwe
Ne bêkifş e ji wanê ber pezê xwe

Xebatker be di mala xwew şîrîn be
Di dil xelqê we berçav dûrîbîn be

Nebe turtur û ta’msarê hemûşkan
Nebe barê dilê exwan û xuşkan

Be kêrî xwe bi xwe hatî şîrîn î
We ger ne, tehl û mirdar û nivîn î

Girancanî meke bînahîya min
Sivikserî meke ronahîya min

Dibên ‘eqlê sivik barê giran e
Çewan terk û gemê jî zehrê⁷³ can e

⁷¹ bûr: bihur

⁷² êmenayî: emîntî, pêbawerîti

⁷³ zehr(‘e): zehîr

Li çi tiştî dinêrî ke teemmul
Tu çi tiştî dibêjî ke tefe‘ul

Ûeta ku tu peşîmanî nekêşî
Ji ber tîra zemanan dil neêşî

Ji zarê⁷⁴ bed gelek jê xwe biparêz
Ji yarê bed gelek jê hem biparêz

Ji le‘b û lehwê hifza xwe gelek ke
Be teb‘ û dînî xwe teşbih melek ke

Di ef‘alan li ser destê xwe binhêr
Di nav malan li bin destê xwe binhêr

Meke fantazîyû şerfa fuđûlî
Ji her tiştî meke behs û mijûlî

Bihêle mal jibo tengasiya xwe
Bike tedbîr jibo kêmasîya xwe

‘Ezîzê dil evan we‘zan hilîne
Li ser wan şîret û pendan bimîne

Dibî serwer di her cem‘ê hevalan
Dibî dilber di nav komê rewalan

Be tilyan te nîşan dabin ji dûr da
Ji dûr ve têtê xwendin fikrê hûr da

Îlahî me ji wana behrewer key
Îlahî me be wana ba xeber key

Bidî me qûwweta hilgirtina wan
Muyesser kir te çawan gotina wan

Nebin wek wai‘zê lem yette‘îz⁷⁵ em
Ji nef‘a wê nebin bê par û hez em

⁷⁴ zar: peyv, gotin

We hem se'ya me jibo xwe hesîb key
Sewaba wê di defter me ketîb key

Xeşaê min pur in estegfirullah
Peşîman im jî hem estegfirullah

Gunehkar im gunehkar im gunehkar
Peşîman im peşîman im be dilzar

Xwe davêjim derê Xellaqê 'alem
Dikim dilek jibo 'efwê demadem

Dikem wasîte pîranê terîqet
We hem enbazê mîranê şerî'et

Biçin cem Fexrê 'alem lê bigazin
Biçin cem Rebbê 'alem jê bixwazin

Ku Nûrî tu bigefrînî ji îhsan
Bibexşînî wî hem îman û Qur'an

Me defter bû xîtam elhemdûlîllah
Me meqşed bû tamam elhemdûlîllah

Di sala elf û sê sed heştê û heft⁷⁶
We yan heştêyû sê Rûmî be derkeft⁷⁷

Di neh sed şeşt û heftê paş hezaran⁷⁸
Ji mîladî ku bû tuhfe li yaran

Şelatullah selamullah bila 'ed⁷⁹
Li ser rûhê resûlullah Mûhemmed ('e.s)

Li ser al û li ser eşhabê wî hem
Li ezvac û zurrîyatê di wî hem

⁷⁵ lem yette'îz('e): yê we'zê xwe bi cî nayne

⁷⁶ Sala 1387an a Hicrî

⁷⁷ Sala 1383an a Rûmî

⁷⁸ Sala 1967an a Mîladî

⁷⁹ bila 'ed('e): bê jimar

We hem etba' û tevda ummeta wî
Xuşûşen çarê yarê heçreta wî

(Temmel kîtabul musemma bîl Cewahîrur Reşadiye Fîs Sîretîn Nebewiyye 'ela yedî katîbihel heqîr Molla Muḥammed Faḍil ezzelîlîl kesîr fî qeryetî Kogaka Nahîyetî Bûlaniq fî leyletîl cum'etî fî şehrî Nîsan mîn senetî ١٩٧٨ Qed meḍa mîneş şehrî 'îşrîn yewmen.

Qed şaret mecmu'ul ebyatîl kîtabî xemsete elfîn we erbe'ete 'îşrîn beyten. Ellahumme'elhû xalişen lî wechîkel kerîm, wec'el nafi'en we şayî'en fil xewaşî wel 'ewamî.

Temmet, 'ela nazîmîhî we 'ela katîbihî elfû rehmetîn, we billahî tewfiqî wel îstî'anîhî, bîrehmetîke ya erhemerrahîmîm. Subḥane rebbîke rebbîl îzzetî 'emma yeşîfûn we selamun 'elelmurselîn welḥemdûlîllahî rebbîl 'alemîn)

Ev kîtaba bi navê "El Cewahîrur Reşadiye Fî Sîretîn Nebewîyye" bi destê rebenê belengazê şikestî Mela Mûhemmed Fadilê ji Koxaka gundê nahîyeya Bûlaniqê, di şeva cum'eyê, di meha Nîsanê, di sala 1978an a Mîladî de nivîsandina wê tamam bû. Ji mehê bîst roj borî bûn.

Temamê hejmara beytên vê kitêbê bû 5024. Ey Xwedayê me! Wê xalis jibo wechê xwe yê kerîm qebûl bike û di nava xas û 'amê de bifeyde û belav bike.

Bîllahî bi tewfiq û alîkarîya Xweda tamam bû, li yê nezmandîye û nivîsandîye bi rehmeta xwe hezar rehmet bike ya erhemerrahîmîn. Rebbê te rebbê îzzetê, ji ya ku ew wî pê diwesifînin pak û berî ye. Selam li hemî pêxemberan be. Hemd jî jibo rebbê 'alemê ye. (Saffat 180-182)

ÇAVKANÎ

Adak, Abdurrahman, *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk*, Nûbihar, Çapa Yekem, Stenbol 2013.

Adak, Abdurrahman, *Teşeyên Nezmê Di Edebiyata Kurdî Ya Klasîk De*, Nûbihar, Çapa Yekem, Stenbol 2019.

Adak, Abdurrahman "Helbestvanên Klasîk Ji Perspektîfa Herêmî: Nimûneya Herêma Bedlîsê" *The Journal of Mesopotamian Studies* 1. 1 (2016): 33-56.

Amîdî, Zeynelabidîn, *Jiyan Berhem û Xebatên Wî Yên Destnivîsî*, Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enst. Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Mardin

Badla, Ahmed, *Resulullah'ın (s.a.v) Hutbeleri 2*, Siyer Yayınları, İstanbul 2019.

Bakırhan, Cihat, *Mele Nurullahê Godîşki'nin Çenta Yetîman Adlı Eserinin Transkripsiyonu, Türkçeye Çevirisi, Tahlil Ve Tenkidi*, Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî, Zanîngeha Mûş Alparslanê Enstîtuya Zanistên Sosyal, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Muş 2017.

Baqustanî, 'Elî, *Mewlûd (Metn û Lêkolîn)*, Amd. M. Zahir Ertekin, Zanîngeha Soran, Çapa Yekem, Hewlêr 2017.

Dilçin, Cem, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Türk Dil Kurumu, Ankara 2016.

El-İsfahanî, Rağîb, *Müfredat Kur'an Kavramları Sözlüğü*, 4. Baskı, Yarın Yayınları, İstanbul 2015.

Ertekîn, Zahir, *Qelem Di Rewdinne 'îma Şêx Ebdurrehmanê Aqtepî de*, Kovara Enstîtuya Zimanên Zindî ya Zanîngeha Bîngolê, 1: 2, Bîngol 2015.

Etik, Arif, *Farsça-Türkçe Lûgat*, Salah Bilici Kitabevi Yayınları, İstanbul 1968.

Farqînî, Zana, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê, İstanbul 2013.

Godiškî, Mela Nûrûllah, “*Elcewahîru’r-Reşadiye Fî Sîretî’n-Nebewîyye*” (fotokopiya destxetê)

Gündüz, Hüseyin (Êsî); Seyhan, Mehmet, *Meala Qur’ana Pîroz a Kurdî*, Çapa Yekê, Weşanên Serokatiya Karûbarên Diyanetê, İstanbul 2015.

İbn Sa’d, *Kitabut Tabakatil Kebir (Resûlullah’ın Kutlu Sîreti)*, Ed. Adnan Demircan, Siyer Yayınları, 2. Baskı, İstanbul 2015.

İslam Ansiklopedisi, c. 41, r. 58, c. 42, r. 54-57. TDV Yayınları, İstanbul 2012.

Kızıl, Hayreddin “*Di”Ya Kırpandinê/Tekîdê Di Kurmancî De*” Kovara Enstîtuya Zimanên Jîndar a Zanîngeha Bingolê, c. 5, hej. 10, r. 47-74, 2019.

Köksal, M. Asım, *İslam Tarihi*, Köksal Yayıncılık, İstanbul 2005.

Külekçi, Numan, *Açıklamalar ve Örneklerle Edebî Sanatlar*, Akçağ, 6. Baskı, Ankara 2013.

Pala, İskender, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Kapı Yayınları, İstanbul 2004.

Sağınç, Feqî Huseyn, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2002.

Sarı, Mevlût, *El-Mevarid Arapça-Türkçe Lûgat*, İpek Yayınları, İstanbul b.t.

Tan, Samî, *Rêzimana Kurmancî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2011.

Turan, Cihan, *Dîwana Fethî*, Teza Lîsansa Bilind a Neçapbûyî, Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanên Jîndar, Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî, Bingöl 2017.

Werqanisî, Şêx Fethullah, *Elhemaîlû Fîşemaîlî*, Amd. Zeynelabidîn Zinar, Doz, Çapa Yekê, Stenbol 2007.

Xanî, Ehmedê, *Hemû Berhem*, Ed. Kawa Nemir, Lîs, Çapa Yekem, Stenbol 2008.

Xerxurî, ‘Ebdurrehman, *Mewlûda Sîyer*, Weşanxaneyê Dua, Çapa Yekem, Stenbol 2013


Yeğîn, Abdullah; Badıllı, Abdulkadir; İsmail, Hekimoğlu; Çalım, İlham
Osmanlıca -Türkçe Ansiklopedik *Büyük Lûgat*, Türdav, İstanbul 1992.

Yıldırım, Kadri, Temel Alıştırma ve Metinlerle *Kürtçe Dilbilgisi*, 2. Baskı,
Mardin Artuklu Üniversitesi, Mardin 2012.





PÊVEK 1: Ji berhemê çend rûpelên ewil



Rûpela serqapaxê

مقالات منى مقالات اللواتى نقلها الله

مير آوه كو امك بدت كوكرى معنوى فزريت نواوه كو خيتره وكري ماري برتريت

دیگر: گری بار کیشی چیتیره زکری سکر کیشی

دیگر: کز کز له ستر سترم چیتیره ستر هسک هجووم که گره

دیگر: دژینی عوول مند چیتیره ز دوست احمق دژینی احمق بترتیره ز شیطان جازو

دیگر: اگر دکارې کوشک ز خور اچیکه اگر نه دکارې کول کاخو ز دست خونکه

دیگر: اگر عوول هیه بگر اگر کوینه ی خونفر و شه

دیگر: خف گوئی مال خلق یه چه نگوئی بر طار نه به

دیگر: چه ز دل نه هانه ستر مانی ترد چه بر طار خلق ایدی نکاری ز پستیخ

دیگر: زنا املدار شه زنی جورط و زمان در بر دژمن

دیگر: بلا برایت بلان لفرابت ز ووه کوهان هیه

دیگر: خوی خرابان دلا خا پاندیه خوی قحان عمر قانديه

دیگر: ستر تار دوست عوول مند ز هسک فنی برتیره وگر چه دله زی ز باشت

دیگر: میراب چه بیستی بست خور گران زنا

دیگر: عوول دلان در بزه چه دلان اگر نه

دیگر: باغ طویانیا سر با بیان چه خلاصه کمران باغ بتر بانه

دیگر: دنیا کوناه کاکله باغغان وی چه هشی وچه عاقل

دیگر: دکارې نافی خود زیند کور کت دنگ خو بکسی راد زیننه

دیگر: علم صنعه ز نور فالان ز سیری کلون لالان ندر ز دینی نه تالان

دیگر: قیتمایران هنره چه زنا نرینه و جوهره

دیگر: زنا حکمدار شور دشمنان دار و شین

دیگر: ز کفری هسک تر با سوچه زنا نه دکل وی قاس خوب کاز ز زان

دیگر: کرمی کرمی ز با چه خوما قول تیره چکو بار کا گران د کیشنه

دیگر: شو و با فاطو کو عیبت ز دوست و بر بجاما امیر چیتیره

دیگر: بیفان و سیر چیتیره ز گوست و بر بجاما امیر

Rûpela beriya fîhrîstê 1: Nukteyên Mela Nûrûllah

دیگر ^{۳۳}

کاخِ غدی پیا لگوی بیک کو تفاقیم رد و نا حقیت نبی احمقیتہ ^{۳۴}

دیگر ^{۳۳} چہای مزید بہن شی خلاصی ناہے جانی کو دیکھے مزید چناور ناہے ^{۳۴}

دیگر ^{۳۳} اگر مال تہ زافہ بیکہ کفیل نہ بر جو کسبیاں اگر کفیل نہ ہیتم نہ ہفا ل نزا نا ^{۳۴}

دیگر ^{۳۳} سے حفظ صورت دوست احمق نہیں بلکہ زندہ می زانا کو زاعقل ہر فیلیا شری بندت ^{۳۴}

دیگر ^{۳۳} اگر ماہا پلیت ہی فیلیا زماں پستینہ اگر ہم پستینہ سینا ندینہ ^{۳۴}

دیگر ^{۳۳} چھانسن زوش دچی انسان در بری جفا العس انسان در بری زیدہ بلا دگری ^{۳۴}

دیگر ^{۳۳} کزیراں نکلہ وزیر دولت اور زکراں حیفہ وزیران وی نکلہ کزیراں جوامیزان لوں حیفہ ^{۳۴}

دیگر ^{۳۳} تہ نفاق و قیمت بلند دے سفرانان خہ ہے بینہ برہم خانا تہ دیک بلند دے کمری برہہ چاہر جیمان ^{۳۴}

دیگر ^{۳۳} اگر تہ دے سیراں فتح اشکرہ کے بیڑہ دتھیناں اگر تہ دے دلعان پیڑہ زیدہ کے بیڑہ تران ^{۳۴}

دیگر ^{۳۳} کے ترانہ بیکہ دیندارہ کے طاریاں ہم تنکارہ کے باورنگہ ہر دیوارہ ^{۳۴}

دیگر ^{۳۳} بی نزاہ جاہلہ ہے ہزانہ و نکلہ احمق ^{۳۴}

دیگر ^{۳۳} احمق نہ اوہ کو شغل نزاہ دیکہ بلکہ احمق اوہ کو جبری نزاہ دیکہ ^{۳۴}

دیگر ^{۳۳}

اگر تگری راسری جاہر دھیدی ہم نا حوہ ^{۳۴}

دیگر ^{۳۳}

چھوی کمری لاسری زوفہ ہے صبی لہ دگری نہ چندان نہی ما قول ترہ ^{۳۴}

دیگر ^{۳۳}

بوکا پشت پڑی نہی کو زحفا برہمی ہے دزدیہ و گنہ پڑی ہے دی بطرہ ہے ^{۳۴}

دیگر ^{۳۳}

لتما خوش بدہ رؤتانا نہماں خوش بدہ دشمنان زوالا تہ جینا بت ^{۳۴}

Rûpela beriya fîhrîstê 2: Nukteyên Mela Nûrûllah

فهرست الجواهر الرشارية في السير

| صفحة | العنوان | العنوان | صفحة |
|------|---|--|------|
| ٢ | سبب نظم الكتاب | غزوة بنه النضر | ٦٧ |
| ٩ | في بيان نسبة الشريف صمعه | غزوة ذات الرقاع | ٦٨ |
| ٧ | ذكر وقت حمل وتاريخ ولادة صمعه | غزوة بدر الاضية | ٧٤ |
| ٩ | ذكر بعض آيات مولده صلى الله عليه وسلم | غزوة دومة الجندل «غزوة الريع» | ٧٢ |
| ١٠ | ذكر مضاعفة وضاعته وموت ابيه وامه صمعه | غزوة الخندق | ٧٥ |
| ١١ | ذكر وصوله اليه وغيرها وولادته في | غزوة بنه قريظة | ٨٣ |
| ١٢ | ذكر مروجته كانه مرة الى بهر في تجارة لخير | غزوة بنه لحيان، غزوة الغابة | ٨٥ |
| ١٣ | ذكر مروجته في حجة ربه وبناء الكعبة | غزوة الحديبية اي صلحها | ٨٧ |
| ١٤ | ذكر بعثته صلى الله عليه وسلم | غزوة خيبر | ٩٤ |
| ١٨ | باب في بيان معراج صلى الله عليه وسلم | غزوة وادي القرى | ٩٤ |
| ٣١ | في بيان اسلام الانصار رضوان الله عليهم | عمرة القضاء | ٩٩ |
| ٣٢ | في بيان هجرة مكة الى المدينة المنورة وما كان في | غزوة الفتح الاعظم وهو فتح مكة ثم الى | ١٠٣ |
| ٣٧ | باب في مشروع عمرة الاذان | غزوة حنين | ١١٤ |
| ٣٨ | باب في بيان مغازية مكة «غزوة ابواء» | غزوة الطائف | ١١٦ |
| ٣٨ | غزوة بواط | غزوة تبوك | ١٢١ |
| ٣٩ | غزوة العبية «غزوة سفوان» «بأمر النبي» | باب في سرماية صمعه الست والخسوف | ١٢٤ |
| ٤٠ | غزوة بدر الكبرى | سرية حمزة بن عبد المطلب اليه عمير بن قيس القادم اليه | ١٢٤ |
| ٥٤ | غزوة بنه سليم | سرية عبيدة بن الرث بن المطلب اليه بطي بن | ١٣٥ |
| ٥٤ | غزوة بنه قينقاع | سرية سعد بن اب وقاص اليه الى الخزار | ١٣٥ |
| ٥٥ | غزوة السويق «غزوة غطفان» او زمام | سرية عبد الله بن مسعود اليه بطي بن | ١٣٩ |
| ٥٧ | غزوة بجران | سرية عمير الاعمري اليه ابي عدي اليه قتل عاصم بن | ١٣٧ |
| ٥٧ | غزوة اخذ | سرية سالم بن عمير اليه ابي عوف اليه عكك اليه يهودي | ١٣٧ |
| ٦٩ | غزوة صمراء الاسد | سرية محمد بن مسلم اليه ابي عوف اليه قتل كعب بن | ١٣٧ |

فهرست الجواهر الرشارية في السيرة النبوية

| صيف | العنوان | صيف | العنوان |
|-----|--|-----|---|
| ١٢٤ | سرية عبد الله بن عتيك لقتل ابي رافع سلام | ١٤٢ | سرية خالد بن عبد الله الليثي رقة الى اهرايم العفيف |
| ١٢٨ | سرية زيد بن حارثة رقة الى القرية لوقوعه في | ١٤٢ | سرية خالد بن عبد الله الليثي ايضا الى بنه اللوح بالكديد |
| ١٣٤ | سرية ابي سلمة عبد الله رقة في عبد الاكبر الى قطن | ١٤٣ | سرية خالد بن عبد الله الليثي رقة ايضا الى فداك |
| ١٣٤ | سرية عبد بن ابي البرية الانصاري لقتل بني خالد | ١٤٤ | سرية شجاع بن وهب الكندي رقة الى بنه عامر بالسبع |
| ١٣١ | سرية عامر بن ثابت الانصاري رقة الى الرجيم | ١٤٤ | سرية كعب بن عمير الغفاري رقة الى ذات الطلح من ارض الشام |
| ١٣٢ | سرية القارظ رقة عنهم الى بئر معونة | ١٤٤ | سرية مؤتة |
| ١٣٣ | سرية محمد بن مسلمة رقة الى القطاء | ١٤٧ | سرية عمرو بن العاص رقة الى بلاد بلو وعذرة |
| ١٣٣ | سرية عكاش بن محض الكندي رقة الى عمر بن قنق | ١٤٧ | سرية الخطط |
| ١٣٤ | سرية محمد بن مسلمة رقة الى ذي القصة | ١٤٨ | سرية ابي قتادة رقة الى نجد |
| ١٣٤ | سرية زيد بن حارثة رقة الى بنه سليم بالجحيم | ١٤٩ | سرية ابي قتادة رقة ايضا الى اضم |
| ١٣٤ | سرية بن حارثة رقة ايضا الى العيص | ١٤٨ | سرية خالد بن الوليد رقة الى نخلة لمهم الغزاة |
| ١٣٥ | سرية زيد بن حارثة رقة ايضا الى الطائي | ١٥٤ | سرية عمرو بن العاص رقة الى هدم سواع |
| ١٣٥ | سرية زيد بن حارثة رقة ايضا الى حسملة | ١٥٤ | سرية سعد بن زيد الكندي رقة الى هدم مناة |
| ١٣٦ | سرية زيد بن حارثة رقة ايضا الى واد القرى | ١٥١ | سرية ابي عامر الاشعري رقة الى اوطن اسن |
| ١٣٦ | سرية عبد الرحمن بن عوف رقة الى ربيعة الجندل | ١٥١ | سرية طه بن عمرو رقة الى ذي الكفيع |
| ١٣٧ | سرية علي بن ابي طالب رقة الى بنه سعد بن بكر | ١٥١ | سرية قيس بن سعد رقة الى صداء |
| ١٣٧ | سرية زيد بن حارثة رقة ايضا الى ام قرفة | ١٥٢ | سرية عيينة بن صفيان الفزاري رقة الى بنه عميم |
| ١٣٨ | سرية عبد الله بن رواحة الانصاري رقة الى اسيير | ١٥٣ | سرية الوليد بن عقبة رقة الى بنه المصطلق |
| ١٣٩ | سرية كوف بن جابر الفهري رقة الى قنق وعلو وعربيه | ١٥٣ | سرية عبد الله بن عمرو رقة الى بنه عمرو بن حارثة |
| ١٤٤ | سرية عمرو بن ابي الصخر رقة الى ابي صيار | ١٥٣ | سرية قطبة بن عامر الخزرجي رقة الى خثعم |
| ١٤١ | سرية عمرو بن الخطاب رقة الى تربة | ١٥٤ | سرية الضحاك بن سفيان الطالبي رقة الى بنه كلاب |
| ١٤١ | سرية ابي بكر الصديق رقة الى بنه كلاب | ١٥٤ | سرية علقمة بن مجزرا الداجي رقة الى الطائفة من الحبشة |
| ١٤١ | سرية بشير بن عبد انصار الخزرجي رقة الى بنه قنق | ١٥٤ | سرية امير المؤمنين رقة الى هدم صنم بفلسف |

فهرست کتابت الجواهر الشارعية في السيرة النبوية

| صفحة | القنوان | صفحة | القنوان |
|------|--|------|---|
| ١٥٨ | سرية علي بن محص الكندي عن النبي صلى الله عليه وآله | ١٦٤ | وفد الحارث بن كعب |
| ١٥٩ | سرية جبر بن عبد الله الجعفي عن النبي صلى الله عليه وآله | ١٦٧ | وفد فاع بن زيد الخزامي |
| ١٥٩ | سرية أسامة بن زيد عن النبي صلى الله عليه وآله وقصة وفاته | ١٦٧ | وفد هذان |
| ١٥٧ | في بعثة صخره بعث الصديق عن النبي صلى الله عليه وآله | ١٦٨ | وفد نجيب، وفد بن ثعلبة |
| ١٥٨ | بعث أبي موسى الأشعري ومعاذ بن جبل | ١٦٨ | وفد بن عديهم في قضاء |
| ١٥٨ | بعث خالد بن الوليد عن النبي صلى الله عليه وآله | ١٦٩ | وفد بن فرارة، وفد بن أسد |
| ١٥٩ | بعث علي بن أبي طالب عن النبي صلى الله عليه وآله | ١٦٩ | وفد بن عذرة |
| ١٥٩ | حجة الوداع | ١٧٠ | وفد بن بلي، وفد بن مرة |
| ١٦٠ | باب ذكر الوفود التي وفده عليه صخره | ١٧٠ | وفد خولان |
| ١٦٠ | وفد نصارى جبران | ١٧١ | وفد بن محارب، وفد صداء |
| ١٦١ | وفد تميم الدار عن أصحابه | ١٧١ | وفد غسان |
| ١٦١ | وفد ثقيف | ١٧٢ | وفد سلامه، وفد بن جهمي |
| ١٦٢ | وفد بن عامر بن صعصعة | ١٧٢ | وفد مزينة، وفد الاشعري |
| ١٦٣ | وفد بن عامر بن ثعلبة | ١٧٣ | وفد كعب بن عبد الله الحارثي |
| ١٦٣ | وفد عبد القيس | ١٧٤ | وفد بهزاد، وفد غامد |
| ١٦٣ | وفد بن حنيفة | ١٧٥ | وفد لاذ، وفد بن المنتفق، وفد النضر |
| ١٦٤ | وفد طي | ١٧٥ | باب بيان كتب النبي صلى الله عليه وآله وسلم المملوك والموالي |
| ١٦٥ | وفد عبد بن حاتم الطائي | ١٧٥ | ذكر كتابه صلى الله عليه وآله وسلم المملوك والموالي |
| ١٦٥ | وفد عروة المرادي، وفد بن زيد | ١٧٨ | ذكر كتابه صلى الله عليه وآله وسلم المملوك والموالي |
| ١٦٤ | وفد كندة، وفد اشوشة | ١٧٨ | ذكر كتابه صلى الله عليه وآله وسلم المملوك والموالي |
| ١٦٤ | وفد رسول الحارث بن كلال واصحابه | ١٧٩ | ذكر كتابه صلى الله عليه وآله وسلم المملوك والموالي |
| ١٦٦ | وفد رسول فرقة بني عم الجذامي | ١٧٩ | ذكر كتابه صلى الله عليه وآله وسلم المملوك والموالي |
| | | ١٧٩ | ذكر كتابه صلى الله عليه وآله وسلم المملوك والموالي |

وَسَيِّدِي
بِسْمِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

| | |
|---|--|
| أَمِي حَمْدُ وَتَأَكَّنْ ذَاتِ عَالِي | بِنَافِ وَيِ خُدَايَ لَا يَزَالِي |
| لَسْرَ قَافِلَهْ سَا لَا رِي سَا لَهْ | صَلَوُهُ وَهَمَّ سَلَامِي بِرِهَايَهْ |
| كُوَاقِ شَخْلَاهَهْ نَيْفِي شَكَانِ مَيْنِي | رِجَالِي أَوْ رَبِّ الْعَالَمِي |
| بَوَصْرِكَ أَحْسَنُ وَبِنَيْدِي كَرَمَهْ | لَوْجِي حَيْرِي أَوْ بَيْتِي نِهَابَهْ |
| لَوْجِي لَلَّهِ وَيَا بِيغَاؤُ وَإِيْتَامِ | شَرْفِي بَخْشِي وَشَرْفِي أَرْزُقُونَامِ |
| حُصُوصِي جُورَانِ وَجَمَلِي نَاسَانِ | دِكْلِي نَقَاعُومِ بُوَانَا سَانِ |

هَذَا بِرِغْلِ الْوَصْفِ وَيِ كَرَمِي

لَسْفِي فِي أَوْقَاتِ جُومَهْ تَمَامِي كَرَمِي

سَبَبِ نَظْمِ الْكِتَابِ

| | |
|--|---|
| دَمِيدَانَا تَهْ بَطْلَانِ خَاصِي سِينَهْ | قَلَمِ فُرْصَهْ زَمِيدَانِ هَلِينَهْ |
| خَبْرَهْ تَوْبِيهِ زَمَانَانِ | لَمَقِي بَادَهْ تَوْبِيهِ هَرِ زَمَانَانِ |
| زَمِي رَالُو كَلَكِ مَقْصُودِ وَدُرْدَهْ | زِأَحْوَالِ جُوَانَانِ خَوْشِي خَبْرَهْ |
| بَلَرِ سِينَهْ بَيَانِ كَوْمِ تَعَجِيلِ | زِجُوَالِ دِرْوَانِ بِنَزَهْ بِتَفْصِيلِ |
| كَلَكِ تَهِي بَيَانِ دَقْتَرِ سِينَهْ | جَلُو كُو دَاشِي كَرِ جَانَانِ لَرِينَهْ |
| بَدَهْ زَادِيَا هَرِ قِيدِ وَبِنْدَانِ | قَلَمِ رَابَهْ هَلِينَهْ زَنْدُ وَبِنْدَانِ |
| دِكُو زَاخَوَهْ تَهِي كِهْ أَبِ كُو شَرِ | رِكِي تَغْتَرِ تَهِي كِهْ دَرِ جَوْهَرِ |
| قَدَحِ بَرِ كِهْ لَيْشِي جَمَلَهْ شَاعِرِ | بَلَكِهْ تِيرَانِ هُو كِهْ بَدَارِ حَاضِرِ |
| بَلَكِهْ كَرِ خَاهُو كَارُ زِيَانَانِ | بَلَكِهْ عَدْلَاقَاتِ وَبَيَانَانِ |
| زِيَا زَارِي مِينَهْ لِحَظْتِكِي يَا شِي | دِرِ دِيرِي كَرِ كَلَكِ سَفَايِيهْ يَا شِي |
| بَدَهْ حَلِ جُوَانَانِ وَرَايِي | قَلَمِ هَلِينَهْ سِلَاحِ رَدَوَانِي |
| جِي دَرِي وَبَطْلَانِ بِلَوَانِي | بِرَانِي قَلَمِ دَا مِيرَكِ جَوَانِي |
| زِي بَرِ كَلَمِ تَهْ أَمِ قُو مَانَهْ بِنْدَانِي | دِهْ خَاخَوَهْ سَرِي طُوبِي وَتَقَالِي |

Serê berhemê 1

سری خودانه جده قطنه رابه
میر آید و صبه نو باشی بنده
قلم بکرم رضا سطر کاغذ
جهاد نه در شان دفتره
گویی برونه لیسر محراب و این
بلکه الله مقصودا خوفه عالم
مگر سستی ز نام سستی نه باشه
تلویحی قلم را کن خنایت
لوقفا سریان مه فقیران
بجا آئی اوه شرفی مینائی
چینه دی هلیسی بیدرا خو
بیره مینائی هورک هینکینئی
کلاک مقنن بپنی دیران
زبان مانونه لای ده خبره
لهقی برهقی بکه مشته بر خو
زسوقا کونان ماهر زیره
اگر هیز ایچی بزور دیمه خو
دکه زیده خودیمی گز کجی
بامید قبولی هی هلاقی
زنی باور مکنی شغل و هلاکی
زدست هی کسی که پیاسه
زدست بی که نافع مسره
گر آندن چرخ حول دون ندی کسی

الان طان چکلی بوته پر خرابه
شیر بر آید و صبه باشی ندینه
مکه کشیمی نین ته معاند
نه تدبیر پیش لایسه و فنون
براهیل کار نی خوه سوغا
بلکه اثبات دعوا خوه تمام
چکوزده آریستی صقی لایسه
بامتلو اخصانافی و لایق
همینه کفک بده میر و ویران
لپستی کای بران خوی نوبینی
زحق مبه امید و مرد را خو
زهر داخود خوه هر دم نشیرین
سرف داره دهر جمع و زیران
زجو گهد ارکان کین ستره
زبان ناسه هزدل جان قریبی خو
مبزه کویک انانی لیر پیره
پدیوانا کلاک بزور دیمه خو
دیمنی باشی اگر بزگور صلحی
لدست خوه آقی رطل گراخی
خدا یامی زبنی بازنی رهاکی
لخو و گز تیه هی تی کراسه
چکوزده ای دضای چور شیر
زبلی نوری ناصیر و ناکی

Serê berhemê 2

مَهْمُ رَانِيَنَه سَر دِي نَوِيَرِي ^{اگر تغزل و ستر}
 نِي احوالِ سَيِي مَه و صَحَابَانِ
 دِكَل حَرْبِ دَوَانِ مَوْتِ دَقَانِ
 بَارِ مَانِ مَرِيَتِ رَا اَمِ بِيَمِيَنِ ^{ايشتم}
 كَلَامِ مَشَاقِقِ كَرِيَا وِي مِيَنِ اَمِ
 زِي لَوَا مَزِي نِي حَرْبِ بَكِ اَمِي نَه
 چِرَا مَنَاجِ بِي دَرِي غَرِي بِيَانِ
 1 چِرَا شَوِيَرِ مِ خَلِي بِلِيَنِ ^{اگر بلبص}
 1 مَرِ مَالَمَه و كِي سَفَر مَه بِيَتِي
 حَقِيَقَه مِي كَلَامِ نَفْسِي كَرِي جُو
 زِي اَصَافِ اَمِ كَرِي مَه جِيَرِ
 زِي جَنَافَه مِي اَمِ كَرِي مِيَسْتَانِ
 دَرِ غَانِدِي نِي دَقِ هَمِي وِي مَقَالِي
 يَمَانِي مِيَسْتَانِ اِي مَحْمَدِ
 دِي حَوَسْتِي جَمِي وِي سِي مَحْمَدِ
 هَمِي عَرِي دِي مَشَاقِقِ وَا نِي جُو
 عِدَا اُرُوعِ وَا نِي جُو مِيَرِي وِي
 زِي رُوعِ حَوَه كَلَامِ زِي دِه دِي غَانَا
 زِي دَانَا وَا دِي حَوَه دِي بِيَشِي
 چِرَا نَدِي مِيَرِي جُو مَه نَدِي نَه
 چِرَا هَر كِي مَه اَنَدَرِ حَصَارِي
 مَكْرَدِي دِي دَارِيَا مَه قَطْمَانِه
 زِي طَالِ وَا نِي دِي مِي مَه اَكْر

دِي لَوَا بَا نِي ظَمِ جِنْدِ طَا ^{اگر بلبص}
 جَوَانِ لَاسْتِه نِي رِيَسْتِ وَا نِه كِنَا يَانِ
 هَمِي نِي دَا كَرِي نِه بِيَهَلَوَا نِي
 كِنَا يَمَه بَا نِي مَانِ مَه كِيَمِي ^{اگر بلبص}
 كَلَامِ مَشَاقِقِ اِنِيَا وِي مِيَنِ اَمِ
 نِي لَوَا مَزِي نِي سَبَا يِي دَعُو فَرِي
 بِي مِي مَه كَشَانِ هَرَا دِي بِيَانِ
 يَدِ مِ خَلِي نِي يَانِ شَمِشِيَرِي نِيَرِي
 لِيَسَرِ بَا قِي مَه اَوَا نِي دِي فَيَتِي
 زِي حَقِيَقِي كَلَامِ دِي رِي مِي كَرِي جُو
 مَحْمَدِي نِي جُو نِي دِي دَوِي حَمِي جِيَرِي
 و كِي حَفَه دِي دَانِه هَمِي مِيَسْتَانِ
 زِي جُو حَبَا رَسُو لِي فَضَرِ اَلِي
 دِي جُو كَالِي نِي رِي جُو شَاهِ مَحْمَدِ
 دِي غَانَا مِيَسِي وِي يَتِ مَحْمَدِ وَا نِي
 هَمِي مَه دِي دَوِي اَوَا نِي وَا نِي جُو
 حَيَا نَا عَقَرِ وَا نِي جُو شِيَرِي وِي
 زِي جَانِ وَا مَالِ وَا لَوَا رُو تَقَانَا
 كَلَامِ كَانِي دِي يَانِ دِي كَرَانِ دِي اَبِيَشِي
 كَلُو مَاقَطَانِه اَمِ نِي اَدَمِي نِه
 چِرَا اَقْصَاسِي هَا اَمِ اَمِ صَطْرِ سَوِي
 كُو بَارَامَه نِه بِيَرِهِي دِي مَدَانِه
 اَوِي دَعِي دِي مِي دَانِي دَا كَرِي

زنجبوری

Serê berhemê 3

PÊVEK 2: Ji paşiya berhemê çend rûpel

(٢١٥)

| | |
|--|---|
| <p> لَيْسَ كُفَّارُ شَوْكَيْشٍ وَغَضَبٌ
 زَبُودُنْيَا سَبْحَتُ وَيَاخَارَةٌ
 دَهْرُ شَانِ ضَوْهٍ دَاهِمٌ مُقَدَّلَةٌ
 دَامُ رُويِ مُدَامٍ رَابِتَةٌ رَائِمٌ
 دَخْدَمَةٌ وَيِ رِفْكَ جَانِ وَبَلَدَةٌ
 وَفَرْمَنْتَارِي مَرْضِي حُدَايَةٌ
 نَبِيٌّ فَرْحَانٌ جَاهَةٌ أَمْتَارِكُ
 جَلُوقَارُونَ زُويِ بُولُكْفَتُهُ خَارِي
 بِيهٍ دَلِيسَتٌ فُحْرُونَ وَكَلِيَانُ
 دَقْفَرِي دَارُ مَرْدِي نَكْرَةٌ سَيَسْتِي
 بِلَاكْسُ شِي خَاصِي كَتَةٌ نَبِيكَةٌ
 نَكْرَةٌ هَمُّ مَدْمُ مَا لَأَحْوَهُ نَحْسُ
 نَبِيصَةٌ هَمُّ بِيهِ بُونَارُ وَالْآنُ
 زَبُودُنْيَا وَيِ شَرْقِي مَالِ بَدْرَةٌ
 نَوِي جِيكَةٌ دَرُودِي خَيْرِ حَوْهٍ
 نَكْرَةٌ بَارِي دَلُوهَمُ رَحْمَتِيَا خَفِي
 بَدَهٌ هَمُّ مَالِ وَبَالِ حَوْمِيهِ كَه
 بَدَهٌ هَمُّ نَشْمَانِ نَكْرَةٌ مِلِي وَنَا
 زُحْوَةٌ كَمْتَرِي تَرَانَةٌ هَمُّ نَقِيصَةٌ
 مَكْرِي خَيْرِ قَارِ رِي مَانَةٌ
 دَبْتٌ رُوزِكُ زَنْهَةٌ أَوْ بَطْرُقَاتُ
 لَكْتَمَانِ دَوِي كِي مَانَةٌ بِيحِي </p> | <p> زَبُوسَالَامِ حَوْيِ جَامِ وَخَفُوكِرُ
 زَبُودِي نِي عَمُورُ وَبِصَارَةٌ
 مَسَافِرِي رُوزُورُومُ زُوبَدَلَةٌ
 زَمِهَامِ حَوْهٍ بَرِي زِي رُوزِنَةٌ رَائِمٌ
 رُوزِي وَيِ مَدَامِي نَقْفَالِكُنْ بِيهٍ
 رَسُولُ اللَّهِ جُكُوهْفَانِ وَيِ دَايَةٌ
 طَمْرُوكَارِي نَكْرَةٌ أَصْلَاجِيَارِكُ
 بِنِي نَكْرَةٌ قَطَا أَفْتِي خَارِي
 بَكْرِي سَتِ فَعِيرَانِ وَغَرِي سَانِ
 زَبُوقُويِ نَبِي قَطَا دَلِ شَكْسَتِي
 دَهْرُ نَكْرِي بَرِي هَمُّ حِي تَرِي نَبِيهٍ
 مَبِيهَةٌ عَيْبِ مَا لَأَحْوَهُ زَكْسَرَا
 مَكْرَةٌ قُوزِنَةٌ دِنَاقِ جَمْعِ هَفَالَانِ
 زَمَالُ وَشَرُوقَانِ حَوْهٍ كَمِ خَيْرِنَه
 نَكْرَةٌ مَالِي بَرَارِ أَحْتِيَا حَوْهٍ
 نَكْرَةٌ لَطْمِ يَا مُحْتَا جِي حَوْهٍ
 زَنْدِي كَه مَالِ وَجَانِ حَوْهٍ عَمْرِي نَكْرَةٌ
 بَدَهٌ رُوزِنَانِ زَبُوقِي بَرَادِي وَنَا
 زُحْوَةٌ حِي تَرِ حَسِي سَبَلِكُهُ رَافِي نَبِيهٍ
 مَبِيهَةٌ كُوهْفِي رُوزَانِ نَوَانَةٌ
 زَبُودُنْيَا نَهْ كَه وَنَوِي نَبِي خَفِي
 لَوِي رُوزِنِي حِي صِفَانَةٌ بِيحِي </p> |
|--|---|

بیکرا

Ji paşiya berhemê 1

بیک را گزیده و ز گزیده نغیب
 د ببت رگ شک بست دوست در نه
 بقسم شکر مکه امنیتا خوه
 بشیوره هم بوان لی که خلا فی
 و گزری نه بود فقی وی باشد
 د بازاری مکه سوند و دروغان
 چید عیانتا ته بسیره
 د بازاری صفال خوه مخا پین
 بجامی به دین بسره نه
 د مار نیک بخواری خوش بخواری
 مکه تقویتا هر حق خوشی
^{اولی} بسره بر د مکه در خوشنا خوه
 مکه کسبک شک را ساغلی که
 ز ناه تینی ز اشرفان تو بسینه
 بکه جری به افعال د یاب
 وساده تقریبی ناسد شجلیسان
 بده قیزان اصل زاری بناموئ
 ز بونا هر طرف زنی که سر عایه
 و تعزیری عقل و تدبیر و امینی
 بحسن زری اگر کو او به مشهور
 بیه طالب لایه بونا جمال
 ولی مال و جمال به دین نابین

تمامی طلیان شبرانه اییب
 دوشتری به شرف و شغل نه
 بهرند وان نه نشکرت و کنا خوه
 ز ریا و ان بکه فکر و کشا فی
 هر گز نه خیر زنی دوره و بخاشه
 مکه مضر ووش به فریاد و فرغان
 فاه بیوه لوققا کور د هیزه
 نکه حتی بگیر می وان مفا بین
 حتی محمود بین مران لبر نه
 دل دیندار مسکین و انگازنه
 بکه تقویتا ز اول گز بهوشی
^{اول العطاء والایمان الی احدی}
 مکه ایرد صبه در دستنا خوه
 اجیر که یکه بویرا دل خوشی که
 ش اول صخر خصال وی بسینه
 چکو شغل کجا نه هفتیا و ب
 بکه میزان ز بوهر کس ایسان
 نه پیس به اصل د سالوس
 جوانمردی و تقوا و د یا نه
 و تعزیری حق شناسی و اقیبی
 فدا و فضل کذا نور علم نور
 و یان تقوی و دیا ندیان زرمالی
 و باله هم کمال و هم عذاب

Ji paşiya berhemê 2: Ev rûpel, destxeta Mela Nûrûllah e.

نه اهل بيت دې اهل سعاده
 ز ناصالح ز هرسر مائه جيترو
 وسانه زى امر خزان الملائكة
 مکه ظلمي لحيوان بار برب خوه
 دې امر و ز ليلو به زمانى
 قياس که چان کو اورست نه رايه
 مکه تقصير باقى و علف وان
 بلا ره به بلاد قريه هره لب
 نكف دست و وفاران نيز كاي
 لراهار و ز رجه هم به هفا لك
 نيره دشمن من كس نسينه
 حسودى قطنه نيشك نه باشه
 خلاصه غير مشروران بتر كئي
 حتى كو ناي نه انسان ميسرى
 نه مينا ريش مافار زى خوه
 خبات كره به ما لاصوه و شرنى به
 نه طوطو و طوطا صارى هموطن
 بكيرى خوه بخوه هان بى سيني
 گران جان مکه بينا هيا مې
 دې بې چقل سيفك بارى گرانه
 لجه نيشت د نيرى که تا مل
 هت کو تو پيشه مانى نكيشه

نه ي ديار دې اهل شفا و
 ز دست خوه نكه صفى به با يور
 لردى نيه و قول بميسنه
 گرانى باز مکه گاه و كرى خوه
 اسيرى قيد و بى بارى نه دانه
 وسان حاكم لشرته هر خدایه
 مده تقصير ياد ندست و كفوان
 بلا بو و به پلا كو ز به و ره لب
 نه شرطه بلکه شرطه ايمانى
 ولهم عيشى خوه نسپره طفلک
 نه مال و جان خوه دشمنى دشمنه
 چكو اهل حسودى شه ليا شه
 ز امرى عار به زى با خوه به بيا
 هفا له نه نه همتار كى بسينى
 نبي كفته روان بر بزي خوه
 در دل خلو و بر چاقى دور بى نه
 نه بارى در اخوان و مؤظان
 و گرنه طوطو و فرلر و نقينى
 سيفك سرى مکه رونا هيا مې
 چوان ترك نجوى زى زهر جان
 توجه نيشت د نيرى که تهل
 ز بر تيران مانان د نه ايشه

ژداری

Ji paşiya berhemê 3

ز راری بدگلك زى خوه بيار ^{احفظ}
 ز لقب و تم و حفظا حوه گلا كه
 ز افعال ان لسر دست حوه بزير
 مكه فانتارى و صر فاضولم
 بهيله مال ز بوطنكا سيا حوه
 عزيريدل آفان و عطلان هيليم
 دجه سرور دهر حجه هفالا ان
 به تليان خه نشان رايي زيوردا
 الهى مه زوانا بهره ور كن
 بدي مه فوتاهلكه تينا وان
 بئي وك وا عظم لم يتعظا ام
 وهم حيا مه زى بو حوه صيكن
 خطا مه بربى استغفر الله
 كنهكارم كنهكارم كنهكار
 حوه دافيرم زى عطلاق عالم
 دكم واسطه پيران طريقه
 جني هم فخر عالم لى بكارين
 كو نورى تو يقربى راحسان
 مه دفتر بو حاتم الحمد لله
 رسالا التوسيد حنينه و ^{۱۳۴۷}
 دنه صد شيت و حفت پان هزاران
^{۱۹۹۷} صلاة الله سلام الله بلاعد
 ز راري بدگلك زى هم بيار بز
 بطنج و دى حوه تشبيه ملك كه
 دناق مالان لى دست حوه بنهير
 بز همر تشيت مكه بخت و مير و لى
 بكه تدبير ز بوقها ميا حوه
 لسروان شيرة و بندان بيمينه
 دجه دلبردناق كورم زوالان
 ز دورقه تپه خوندى فكر هورا
 الهى مه توانا با خبر كن
 ميسر كرته جاوان كو تينا وان
 ز نقعا وى بئي به بار و عطا ام
 تو ابا وى دفتر مه كتبت كن
 پشيمانم زى هم استغفر الله
 پشيمانم پشيمانم بدلا زان
 دكم ديكك زى بو عصى دما دم
 وهم انبان ميران شريعه
 جني هم تبه عالم زى بخواران
 بيخينى وى هم ايمان و قرآن
 مه مقصد بو تمام الحمد لله
 ويا حشيت و خي روى بدر كفت
 زميلارى كو بو حقه لياران
 لسرفوم رسول الله محمد

Ji paşiya berhemê 4

لَسْرَالٌ وَلَيْسَ رَأْسَابٌ وَيْ هَمَّ لِأَرْوَاحٍ وَزُرِّيَاتٍ رَهْمِ هَمَّ
وَهُمْ أَتْبَاعٌ وَتَقْدَامُ تَأْوِي خُصُوصًا جَارِيَارِي خَصْرَتَاوِي

٥٠٢٤

تم الكتاب المشتمل على الجواهر الرشارية في السيرة النبوية عليه السلام
 كتابها الخبير الحاجد فاضل الدليل
 الكسير في قرية كوخاك ناحية
 بولاق في ليلة الجمعة في شهر
 نيسان سنة ١٩٧٨
 قدمناه في الشهر عشرين
 يوماً ٢٢ ٢٢ ٢٢
 اللهم اعطنا الصالحين والبركة
 قد صارت بحسب آيات الكتاب خمسة الف واربعة وعشرون بيتاً
 ٥٠٢٤

تمت على فاضله وعلى كاتبه الفرحمة وبالله التوفيق
 والاستعانة برحمتك يا ارحم الراحمين سبحان
 ربك رب العزة عما يصفون وسلام
 على المرسلين والحمد لله رب
 العالمين
 ام

Ji paşıya berhemê 5: Dawiya berhemê

PÊVEK 3: Mektûba malbata Şêx Fethûllah Werqanîsî ya derheqê ku berhema “El Hemaîlû Fîş Şemaîl” aydiyê Mela Nûrûllah e.

“ELHEMAÏL FÎŞŞEMAÏL” adlı eserin Nurullah Özdemir (Godîşki)’e ait olduğuna dair Şeyh Fethullah Verkanîsî hazretlerinin ailesinin mektubu:

Biz Şeyh Fethullah Verkanîsî (ks) Hz. torunlarından ve Oxin medresesinin müderrislerinden Fethullah AYTE ve Mesut TÜREL, kendisinin ilmi varisleri ve geride bıraktığı ilmi eserlerin sahipleri olan ailesi adına beyan ediyoruz ki dedemiz Şeyh Fethullah Verkanîsî (ks) hazretlerine ait “ŞEMAÏL” adında ya da Şemaîl konusunda ne nesir ne de nazım olarak bir eseri yoktur. “EL HEMAÏLU FÎŞŞEMAÏL” adlı eser her şeyiyle Oxin medresesinin yetiştirdiği âlimlerden biri olan Mella Nurullah Özdemir (Godîşki) ‘e ait bir eser olup dedemiz Şeyh Fethullah adına sehven neşredilmiştir. Âlimin ve ilminin hakkını vermek açısından bu gerçeği bir daha ilgilenenlere Şeyh Fethullah Verkanîsî (ks) hazretlerinin ailesi olarak teyid ediyoruz.

Nameya malbata Şêx Fethullahê Werqanîsî di derheq berhema “EL HEMAÏL FÎŞŞEMAÏL” ko ya Mella Nurullah Özdemir (Godîşki)’e.

Em ji malbata Şêx Fethullahê Werqanîsî (ks) û muderrisên medreseya Oxînê, nevyên wî Fethullah AYTE û Mesut TÜREL. Em wek warisên Şêx Fethullah (ks) yên ilmi û xwediyên berhemên wî yên ilmi ko paşva hiştîye, bi navê malbata Şêx Fethullah (ks) daxuyan dikin ko di nav berhemên kalikê me Şêx Fethullah (ks) de berhemek bi navê “ŞEMAÏL” an ji tu berhem derheq Şemaîlê de ne bi nezm, ne jî bi nesr tune ye. Berhama bi navê “EL HEMAÏLU FÎŞŞEMAÏL” ya yek ji wan alimên ko medreseya Oxîn xwedikirîye Mella Nurullah ÖZDEMİR (Godîşki)’e. Ev berhem bi şaşî li ser navê kalikê me Şêx Fethullah (ks) hatiye weşandin. Ji bo dayîna mafê âlim û ilmê wî em, malbata Şêx Fethullah evî rastîyê ji bo kesên ko di vî derheqê de têkildarin teyîf dikin.

رسالة في أن الكتاب المسمى ب"الحمائل في الشمائل" ملا نور الله أوزدمر (الكوديشكي)

نحن من أحفاد الشيخ فتح الله الوركاني (ق س) ومن مدرسي المدرسة الفتحية العلانية الأوخينية فتح الله آيته و مسعود ترل نبين بإسم ورثة الشيخ فتح الله (ق س) العلمية وأصحاب كتبه التي أورثناها منه : بأنه ليس لجدنا الشيخ فتح الله (ق س) كتابا مسمى ب "الشمائل" ولا كتابا في موضع الشمائل لا نظما ولا نسرا نظمه الآخرون. والكتاب المسمى ب "الحمائل في الشمائل" الذي طبع بإسم جدنا الشيخ فتح الله (ق س) سهوا كله ل"الملا نورالله أوزدمر الكوديشكي" من العلماء الذين تخرجوا من المدرسة الفتحية العلانية الأوخينية

نؤيد هذه الحقيقة مرة أخرى لمن يهتم بالأمر أداء لحق العالم وعلمه

فتح الله آيته
Fethullah AYTE



مسعود ترل
Mesut TÜREL

PÊVEK 4: Resmekî Mela Nûrûllahê Godîşkî

